KT

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

# BERAWIRDKIRINA *ŞEREFNAME*YA ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ Û *ŞEREFNAMEYA MENZÛM* A CEGERXWÎN


Şükran COŞKUN

16711007


Şêwirmend

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2019

**KT**
**Zanîngeha Mardîn Artûklûyê**
**Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê**
**Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**
**Teza Lîsansa Bilind**

# BERAWIRDKIRINA *ŞEREFNAMEYA* ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ Û ŞEREFNAMEYA *MENZÛM* A CEGERXWÎN

**Şükran COŞKUN**
**16711007**

**Şêwirmend**
**Doç. Dr. Hayrullah ACAR**

**Mêrdîn 2019**

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu ÜniversitesiLisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Berawirdkirina Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî û Şerefnameya Menzûm a Cegerxwîn" adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

□Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

□Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

□Tezimin/Projemin… süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

…./…./…….

**Şükran COŞKUN**

# KABUL VE ONAY

**Şükran COŞKUN** tarafından hazırlanan "Berawirdkirina Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî û Şerefnameya Menzûm a Cegerxwîn" adındaki çalışma, 28/06/2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili Ve KültürüAnabilim Dalında**YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

________________________________

________________________________

________________________________

# PÊŞGOTIN

Tu netewe tune ye ku ne xwedî dîrokekê be û li ser dîroka xwe nesekine. Çawa ku mirov bê hafize nikare jiyana xwe bi rêk û pêk bike, netewe jî bê dîrok nikarin tevbigerin, ji ber ku dîrok hafizeya neteweyê ye. Dema ku li pênaseya dîrokê bê nêrin bi gelemperî mirov dikare bibêje dîrok, zanyariyeke wisa ye ku bûyerên kevin bi awayekî objektîf, bi nîşandana delîl, cih û demê ve vedikole. Lê her milet dixwaze dîroka xwe ya bav û kalan bi qehremaniya wan binivîsine. Di vir de tê dîtin ku di nav bûyerên dîrokî û ji bo hestên neteweyî yên gel xurt bibe nivisîna bi têşeya hînker (pragmatîk) derdikeve pêş. Ji aliyê din ve çawa her netew xwedî dîrokekê ye, xwedî edebiyatê ye jî. Her netew ji xwe re edebiyatekê diafirîne ku edebiyat wek rehên jiyana gel tê dîtin. Edebiyat, ji bo nîşandana rihê neteweyî neynikek e û di neqilkirina bûyerên girîng ên dîrokî de xwedî roleke mezin e.

Wek ku tê dîtin di prosesa inşakirina fikrên netewî de edebiyat wek iksîreke hatiye ditîn. Çimkî fikra netewe û edebiyatê, ji heman çavkaniyê sûd werdigirn. Neteweyên ku di vê prosesê re derbas dibin çi romannûs, çi helbestvan, çi şanonivîs; bi giştî wek îdeologekî tev digerin. Bi taybetî di nav têşeyên edebî de hêmana helbestê ji bo hestên netewî tiştekî kirdarî ye ku bi kêf û coş tê vegotin. Helbest bi zimanê xwe yê bi taybet û ahengî ji têşeyên din ên edebî vediqete. Helbestvan ji zimanê rojane yê ku gel pê diaxive bi hêmaya xwe zimanekî nû peyda dike. Herwiha helbesvanên ku helbestên neteweyî dinivîsînin ji bo helbestên bi wate û bi tesîr pişta xwe didin dîrokê. Ji aliyê din ve ji ber ku dîrok roja me ronî dike û ji paşeroja me re neynikê digire me xebata xwe li ser peywendiya dîrok û menzûmeyê saz kir. Cegerxwîn ev dîwana ku bûye mijara xebata me bi têşeya menzûme nivîsandiye ku menzûme bi piranî ji mijarên dînî, dîrokî, dîdaktîkî û exlaqî de tên nivîsîn.

Di vê xebatê de rêbaza înterdîsîplîn hatiye bikaranîn ku înterdîsîplîn, ji tevlihevkirina rêbaz û zanyariyên cûda pêk tê û ji bo çareserkirina diyardeyên ku tenê bi teşeyekî nayên ravekirin tê bikaranîn. Ev rêbaz di sedsala XIX. de li Rojava derketiye û her çûye di warê perwerdehî û xebatên akademîk de zêdetir cih girtiye. Di nav înterdîsîplînê de peywendiya dîrok û edebiyatê cihekî girîng digire. Tê dîtin ku berhemên edebî yên di serdemên cûda de hatine nivîsîn ji gelek aliyan ve ji hev

ciyawaz in. Sedema vê yekê ev e ku nêrîna jiyanê ya her heyamê ji hev cûda ye. Lewma dema li ser berhemekê lêkolîn bê kirin, pêwîst e li gor şert û mercên serdema ku ew tê de hatiye nivîsîn bê nêrin. Ji bo rewşa wê serdemê baş bê fehmkirin pêdivî bi dîrokê heye. Belê, gelek caran edîban berê xwe dane dîrokê û xwestine bi vî awayî gelê xwe perwerde bikin û ji xeletî û şaşîtiyên serdemên kevn dersê bigirin. Ji bo careke din van şaşîtiya nekin. Yan jî xweşî û aramiya serdemên kevn bi bîr bînin û bi vî awayî rewşên nebaş ên dema tê de dijîn rexne bikin. Lê belê carinan berevacî ji bo lêkolîna dîrokî ji berhemên edebiyatê jî sûd tê wergirtin. Cegerxwîn jî bi van hest û ramanan û bi endîşeyên giştî yên serdema xwe berê xwe daye dîrokê. Li ser hîmê *Şerefname*yê *Şerefnameya Menzûm* nivîsandiye ku yek ji xalên herî girîng ên sedemê nivîsandina vê berhemê hişyarkirina gel e. Ew xwestiye balê bikişîne ser demên kevn û bi vî awayî rewşa nebaş a gel têde ye li ber çavan raxe..

Wekî ku di naverokê de hatiye diyarkirin ev xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de me cih da jiyan û kesayetiyên Şerefxanê Bedlîsî û Cegerxwîn, behsa xebat û berhemên wan kir. Di beşa duyem de em li ser rewşa *Şerefname* û *Şerefnameya Menzûm* tê de hatine nivîsîn rawestiyan. Ji bo hîmê beşa sêyem van her du beşên pêşî me pêwîst dîtin. Em di beşa sêyem a vê xebatê de bi giranî li ser berawirdkirina naverok û şêweya *Şerefname* û *Şerefnameya Menzûm* rawestiyan. Jixwe armanca sereke ya vê xebatê ew e ku neverok û teşeya van berheman berawird bike û wekhevî û cudahiyên berheman derxe holê. Xebata me bi vî awayî dixwaze nirxandineke nû bîne ser van herdu berheman da ku biçûk jî be sûdek jê bê wergirtin. Berî berawirdkirina naverokî, diyarkirina qada xebatê û danasîna nivîskar, berhemên wan bi kîjan fikr û hestan hatine nivîsîn me girîng dîtin ku bêguman wê berawirdkirina bi vî awayî wê zelaltir û xurttir be.

Spasiyên xwe ji şêwirmendê xwe Hayrullah Acar re pêşkêş dikim ku di hevgirtina wateyê û teyîdkirina agahiyan de alîkariya xwe ji min kêm nekir. Di heman demê de spasiyên xwe pêşkêşî Abdurrahman Adak dikim ku hilbijartina vê mijarê pêşniyarî min kir. Herwiha ez spasiya xwe ji hevalê xwe Haşim Esen re pêşkêş dikim, ji bo ku bi pêşniyarên xwe xebata me xurt kir. Digel vê yekê ez spasiya malbata xwe û ya heval û dostên xwe yên din jî dikim ku li ser vê xebatê keda wan jî heye.

# KURTE

## BERAWIRDKIRINA ŞEREFNAMEYA ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ Û ŞEREFNAMEYA MENZÛM A CEGERXWÎN

ŞÜKRAN COŞKUN

Şerefxanê Bedlîsî ji bo dîroka Kurdan winda nebe û bigihîje neslên pêşî di sedsala XVI. de kitêba xwe ya *Şerefname*yê nivîsiye ku cara yekem dîroka Kurdan ji aliyê Kurdekî ve bi berfirehî hatiye nivîsîn. Serdema tê de jiyaye bûye şahidê peywendiya Sefewî û Osmaniyan. Ji aliyê din ve Cegerxwîn helbestvanê sedsala XX. e û di dîrok û edebiyata Kurdan de helbestvanê herî bi nav û deng e. Di berhemên wî yên curbicur de dîroka Kurdan rengvedaye. Cegerxwîn, di serdema tê de jiyaye bûye şahidê her du şerên cihanê û gelek bûyerên siyasî û civakî yên din. Berhema xwe ya *Şerefnameya Menzûm* li ser bingeha *Şerefname*yê bi çil û pênc menzûmeyên nivîsandiye. Di vê xebatê de *Şerefname* û *Şerefnameya Menzûm* hatine berawirdkirin û hêmanên naveroka wan bi awayekî înterdîsîplîner hatine analîzkirin.

Her du berhem jî di bin bandora rewşa siyasî û civakî ya sedsala tê de hatine nivîsandin de hatiye nirxandin û ev yek bûye pirsgirêka xebata me. Xebat ji destpêk û ji sê beşan pêk hatiye. Di beşa yekem de jiyan û berhemên herdu nivîskaran cih girtine. Di beşa duyem de di bin bandora kîjan rewşa siyasî û civakî de hatine nivîsandin hatiye diyarkirin. Di beşa sêyem de herdu behrem ji aliyê ziman, naverok û termînolojiyê ve hatiye tehlîlkirin. Di heşt kategoriyan de termînolojiya berheman hatiye derxistin. Di gelek cihan de peywendiya dîrok û edebiyatê berbiçav bûye ku Cegerxwîn pirî caran xwestiye bi behskirina bûyer û kesayetiyên dîrokî xwe serbilind bike û rihê neteweyî bi vî awayî vejîne. Di van menzûmeyên wî de tê dîtin ku dîrok bi helbestê re bûye yek û peywediyeke xurt di navbera wan de çêbûye. Hebûna vê bingehê destûrê daye ku *Şerefname*ya Şerefxan û *Şerefnameya Menzûm* a Cegerxwîn hem ji aliyê jiyan, berhem, fikr û ramanên nivîskarên wan hem jî ji aliyê naverok û teşeyê ve bên berawirdkirin. Bandora *Şerefnameyê* li ser *Şerefnameya Menzûm* çi ye, bi çi awayî tê de cih girtiye bi vê xebatê hatiye tespîtkirin.

**Peyvên Sereke:** Dîrok, Edebiyat, Şerefxanê Bedlîsî, Cegerxwîn, Şerefname, Şerefnameya Menzûm, Helbest, Neteweya Kurd.

# ÖZET

# ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ'NÎN ŞEREFNAMESİ İLE CEGERXWÎN'NİN MENZÛM ŞEREFNAMESİ'NİN KARŞILAŞTIRILMASI

Şerefxanê Bedlîsî, Kürtlerin tarihinin kaybolmaması ve gelecek nesillere aktarılması için XVI. yüzyılda *Şerefname* adlı kitabını yazmıştır. İlk kez Kürt tarihi bir Kürt tarafından geniş bir şekilde kaleme alınmıştır. Fakat Şerefxan, kitabın yazımında Fars dilinin atmosferi altında kalmıştır. Diğer taraftan Cegerxwîn XX. yüzyıl şairidir ve Kürt tarih ve edebiyatında oldukça meşhurdur. Onun çeşitli eserlerinde Kürt tarihinin yansımaları görülür. Cegerxwîn, yaşadığı dönemde iki dünya savaşına ve daha birçok siyasi ve sosyal olaya şahit olmuştur. Cegerxwîn, *Menzûm Şerefnamesi*'nde *Şerefname*'yi temel alarak kırk beş menzûme yazmıştır. Bu çalışmada *Şerefname* ve *Menzûm Şerefname* adlı eserler karşılaştırılmış ve içeriklerindeki unsurlar interdisipliner bir şekilde analiz edilmiştir.

Çalışmamızda her iki eser de yazıldıkları yüzyılın siyasi ve toplumsal durumunun etkisi altında değerlendirilmiştir ve bu durum çalışmanın problematiğini oluşturmuştur. Çalışma giriş kısmı ve üç bölümden oluşmuştur. Birinci bölümde her iki yazarın yaşam ve eserleri yer almıştır. İkinci bölümde eserlerin hangi siyasi ve toplumsal olayların etkisiyle kaleme alındığı belirtilmiştir. Üçüncü bölümde her iki eser dil, içerik ve terminoloji bakımından karşılaştırılarak içerikleri tahlil edilmiştir. Sekîz kategorideeserlerin terminolojisi çıkarılmıştır. Tarih ve edebiyat arasındaki ilişki gözler önüne serilmiştir. Cegerxwîn çoğu zaman tarihi şahsiyet ve olaylardan söz ederek onlarla gururlanma ve ulusal ruhu bu şekilde diriltme yoluna gitmiştir. Onun bu manzumelerinde, tarihin şiirle birleştiği ve aralarında güçlü bir bağın oluştuğu görülmüştür. Bu yapının varlığı Şerefxan'ın *Şerefname*'si ile Cegerxwîn'in *Menzûm Şerefnamesi'*ni hem yazarlarının yaşam, eser, fikir ve düşünceleri açısından hem de eserlerin içerik ve şekilleri açısından karşılaştırılma imkânı vermiştir. Şerefxan'ın eserinin Cegerxwîn'in eserine olan etkisini anlamamıza da katkı sağlamıştır.

**Anahtar Sözcükler:** Tarih, Edebiyat, Şerefxanê Bedlîsî, Cegerxwîn, Şerefname, Şerefnameya Menzûm, Şiir, Kürt Ulusu.

# SUMMARY


## THE COMPARISON OF SHARAF-AL DIN BITLISI'S SHARAFNAMA WITH CEGERXWIN'S MENZUME (POEM) OF SHARAFNAMA

Sharaf-al Din Bitlisi, wrote *Sharafname* in sixteen century to pass down the history of Kurds and not let it be forgotten. It was the first time that Kurdish history had first been narrated widely by a Kurdish. However Sarafhan had been under the influence of Persian Language while writing the book. On the other hand, Cegerxwin is twentieth century poet and he is famous in Kurdish Literature and History. The effect of Kurdish history can be seen in Cegerxwin's various works. He focussed on the oppression, captivity, pain that his nation suffer and he also witnessed two world wars and many social and political events. In Cegerxwin's *Menzum Sharafname*, he wrote forty five poems that based on Bitlisi's *Sharafnam*a. In this study the Sharafnama and Cegerxwin's Sharafnama are compared and the elements of them were analyzed in an interdisciplinary method.

Both works has been evaluated in terms of the effects of the society and political events in their century and that evaluation came up with the problem of the study. Thestudy consists of an introduction and three main parts. In the first part, both writers' personality and life was mentioned. In second part, the political and social events that influenced the works were stated. In the third part, both works have been compared in terms of language, content and terminology and content of the texts has been analyzed. Terminology was made in 8 categories. In many parts the relation of history and literature has been observed. Because Cegerxwin, mostly, chose revitalizing his nation's soul by narrating historical figures (people) and events and feeling proud of them. It is seen that Poetry and History strongly bounded each other in his poems. That bound enables these two works to be compared in terms of both the ideas, personality, life of writers and content, form of works and we will be able to explain. What is the effect of Menzume (Poem) of Sharafnama on Cegerxwin's Menzume of Sharafnama and How Sharafnama is involved in Menzume (Poem) of Sharafnama.



**Key Words:** History, Literature, Sharafh-al Din Bitlisi, Cegerxwin, Sharafnama, (Poem) Menzume of Sharafnama, Poetry, The Kurd Nation

## NAVEROK

1. PÊŞGOTIN ..... I
2. KURTE ..... III
3. ÖZET ..... IV
4. SUMMARY ..... V
5. NAVEROK ..... VI
6. KURTEBÊJE ..... X
7. DESTPÊK ..... 1
1. Mijar û Giringiya Tezê ..... 1
2.Armanc û Sînorên Tezê ..... 1
3. Rê û Rêbaz ..... 2
4.Binyada Çavkaniyên Xebatê ..... 4
BEŞA YEKEM ..... 6
JIYAN Û BERHEMÊN ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ Û YÊN CEGERXWÎN ..... 6
8. 1.1. ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ ..... 6
1.1.1. Jiyan û Kesayetî ..... 6
1.1.2. Berhema Şerefnameyê ..... 13
1.1.2.1.Destxet, Werger û Çapên Şerefnameyê ..... 19
1.1.2.2. Çavkaniyên Şerefnameyê ..... 23
1.1.3. Cihê Şerefnameyê di Dîroka Kurdan de ..... 26
9. 1.2. CEGERXWÎN ..... 31
1.2.1. Jiyan û Kesayetî ..... 31
1.2.2. Berhemên Cegerxwîn ..... 35
1.2.2.1.Çavkaniyên Helbesta Cegerxwîn ..... 48
1.2.2.2. Şerefxanê Bedlîsî Di Helbestên Cegerxwîn de ..... 51
1.2.2.3. Di Helbestên Cegerxwîn de Şêwaz û Ziman ..... 53
1.2.3.Cihê Helbestên Cegerxwîn di Edebiyat û Dîroka Kurdî de ..... 54
BEŞA DUYEM ..... 56
REWŞA SÎYASÎ YA SERDEMÊN ŞEREFNAME Û ŞEREFNAMEYA MENZÛM HATINE NIVÎSÎN ..... 56
10. 2.1.ŞEREFNAME ..... 56
2.1.1. Di Sedsala XVI. de Rewşa Kurdan ..... 56
2.1.2. Helwesta Sefewiyan li Hemberî Kurdan ..... 60
2.1.3.Peywendiya di Navbera Kurd û Osmaniyan de ..... 62

2.1.4.Di Nav Mîrektiyên Kurdan ên Serdema Osmaniyan de Mîrektiya Bedlîsê65
2.1.5. Bandora Vê Serdemê li ser Nivîsandina Şerefnameyê ............................. 67
11. 2.2. ŞEREFNAMEYA MENZÛM ................................................................ 68
2.2.1. Di Destpêka Sedsala XX. de Rewşa Kurdan ........................................... 68
2.2.2. Bandora Şerê Cihanê yê Yekem Li Ser Kurdan ...................................... 73
2.2.3. Piştî Şerê Cihanê yê Yekem Kurd û Neteweyetiya Kurdan ..................... 73
2.2.4. Bandora Şerê Cîhanê yê Duyem Li Ser Kurdan ...................................... 78
2.2.5. Di Helbesta Kurdî de Perspektîfên Neteweyî ........................................... 81
2.2.5.1. Helbesta Kurdî û Avakirina Nasnameya Kollektîf ................................ 85
2.2.6. Bandora Vê Serdemê Li Ser Nivîsandina Şerefnameya Menzûm ............ 88
12. 2.3.JI ALIYÊ POZÎSYONA NETEWEYÎ VE ŞEREFNAME Û ŞEREFNAMEYA MENZÛM ........................................................................ 90
2.3.1. Ji Aliyê Fikra Neteweyî ve ..................................................................... 90
2.3.2. Ji Aliyê Teoriyên Neteweperweriyê ve .................................................... 91
BEŞA SÊYEM ....................................................................................... 94
BERAWIRDKIRINA HÊMANÊN ŞEREFNAME Û ŞEREFNAMEYA MENZÛM94
13. 3.1.BIKARANÎNA ZIMAN ..................................................................... 94
3.1.1.Ji aliyê Binyada Derekî û Ruxsariyê ve .................................................... 94
3.1.2.Ji Aliyê Şêwazê ve ................................................................................. 96
3.1.3. Ji Aliyê Hunerên Edebî ve ..................................................................... 102
14. 3.2. JI ALIYÊ CUDAHÎ Û WEKHEVIYÊN NAVEROKÊ VE ..................... 105
3.2.1. Mîrên Diyarbekir û Cezîrê ..................................................................... 105
3.2.2.Mîrên Dînewer û Şehrezorê ( Hesnewiyye) .............................................. 113
3.2.3. Mîrên Lora Mezin (Buzurk) .................................................................. 120
3.2.4.Mîrên Lora Biçûk ................................................................................... 127
3.2.5. Siltanên Misir û Şamê ............................................................................ 143
3.2.6.Mîrên Erdelan ....................................................................................... 150
3.2.7.Mîrên Hekkariyê .................................................................................... 158
3.2.8.Mîrên Behdînan( Imadiyyê) ..................................................................... 164
3.2.9.Mîrên Cezîrê ......................................................................................... 169
3.2.10. Begên Gurgilê ..................................................................................... 182
3.2.11. Mîrên Hesenkêfê .................................................................................. 185
3.2.12. Mîrên Çemîşgezekê .............................................................................. 192
3.2.13. Begên Micengerdê ................................................................................ 196
3.2.14. Mîrên Pertekê ...................................................................................... 199
3.2.15. Begên Seqmanê .................................................................................... 201

3.2.16. Mîrên Misdasî ........ 204
3.2.17. Mîrên Egilê (Buldukanî) ........ 208
3.2.18. Mîrên Paloyê ........ 211
3.2.19. Mîrên Çermûkê ........ 216
3.2.20. Begên Sasonê (Hezzoyê) ........ 220
3.2.21. Mîrên Xîzanê ........ 227
3.2.22. Begên Miksê ........ 231
3.2.23.Mîrên Esbayêrdê ........ 234
3.2.24. Mîrên Kilîsê ........ 237
3.2.25. Begên Şêrwanê ........ 242
3.2.26. Mîrên Kurnê (Şebistan) ........ 248
3.2.27. Mîrên Êrûnê ........ 250
3.2.28. Mîrên Dêrzînê ........ 251
3.2.29. Mîrên Girdikanê ........ 254
3.2.30. Mîrên Etaqê ........ 257
3.2.31. Begên Tercîlê ........ 260
3.2.32.Begên Suweydî ........ 264
3.2.33. Begên Silêmaniyê -Begên Qulp û Batmanê-Begên Meyafariqînê ....... 270
3.2.34. Mîrên Sohran ........ 279
3.2.35. Mîrên Baban ........ 286
3.2.36. Mîrên Mukrî ........ 291
3.2.37. Mirên Biradostî ........ 295
3.2.38.Begên Mehmûdî ........ 301
3.2.39. Begên Dinbilî ........ 306
3.2.40. Begên Kelhurê - Begên Pilingan ........ 312
3.2.41. Begên Dertengê ........ 315
41/1 Were Serxab binêre kanê Derteng? ........ 315
3.2.42. Begên Mahîdeştê ........ 316
3.2.43. Begên Banê ........ 318
3.2.44. Begên Pazûkî ........ 320
3.2.45. Mîrên Bedlîsê ........ 327
15. 3.3. JI ALIYÊ TERMÎNOLOJIYÊ VE ........ 340
3.3.1. Termînolojiya Navên Avahiyan ........ 340
3.3.2. Termînolojiya Qadên Xwezayî ........ 342
3.3.3. Termînolojiya Faûna (Alema Heywanan) ........ 344

3.3.4. Termînolojiya Flora (Alema Nebatan) .................................................. 348
3.3.5. Termînolojiya Amûran ............................................................................. 350
3.3.5.1. Nîşaneyên Hikumdariyê: ..................................................................... 350
3.3.5.2. Amûrên Şer: ......................................................................................... 353
3.3.6. Termînolojiya Îta'et û Dagirkeriyê ........................................................ 355
3.3.6.1. Hêmanên Îta'etê: .................................................................................. 355
3.3.6.2. Hêmanên Dagirkeriyê: ......................................................................... 356
3.3.7. Termînolojiya Unwanên Siyasî ............................................................. 358
3.3.8. Termînolojiya Neteweya Kurd ............................................................... 360
3.3.8.1. Eşîretên Serekê yên Kurdan ................................................................ 360
3.3.8.2. Netewe û Dewletên bi Kurdan re Peywendîdar in ............................... 362
ENCAM ........................................................................................................... 365
ÇAVKANÎ ......................................................................................................... 372

# KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| **amd.:** | Amadekar |
| **A.Y.:** | Abdullah Yegin |
| **b.** : | Berg |
| **bnr.** : | Binêre |
| **b.z.** : | Berî zayinê |
| **ed.** | Edîtor |
| **hwd.** : | Her wekî din |
| **İ.S.:** | İbrahim Sunkur |
| **j.** : | Jimar |
| **k. :** | Koçî/ hîcrî |
| **m. :** | Mirin |
| **r.** : | Rûpel |
| **rr.:** | Ji rûpela…heta rûpela |
| **wer.** : | Werger |
| **z. :** | Zayin |
| **Z.A.:** | Ziya Avci |

# DESTPÊK

## 1.Mijar û Giringiya Tezê

Mijara teza me li ser *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî û *Şerefnameya Menzûm* a Cegerxwîn e. Şerefxanê Bedlîsî di sedsala XVI. de li ser dîroka Kurdan di berhema xwe ya *Şerefname*yê de agahiyên berfireh daye. Cegerxwîn jî di sedsala XX. de bi paşxana *Şerefname*ya Bedlîsî ya berga yekem, *Şerefnameya Menzûm* nivisiye û bangî serok û rêberên Kurdan ên kevn kiriye ku werin neviyên xwe ji zilm û zora dijminan xelas bikin. Cegerxwîn di vê dîwana xwe de bal kişandiye ser wêranbûn û perçebûna Kurdan. Wek ku tê dîtin bûyerên dîrokî û civakî di van menzûmeyên Cegerxwîn de roleke girîng girtiye. Di vê xebatê de em ê bi perspektîfekî berawirdî herdu berheman bidin berhev û şîrove bikin.

Herdu berhem jî bal kişandine ser mîrektiyên Kurdan û behsa mîrên Kurdan kirine. Mîrên Kurd heta sedsala XIX. li ser axa Kurdistanê rêveberiya Kurdan kirine. Mîrên Kurdan bac nedane Dewleta Osmanî, lê ji bo seferên Osmanî yên rojhilat alîkariya leşkerî û lojîstîk dane. Di sedsala XIX. de Dewleta Osmanî ji ber polîtîkayên navendparêzî xwestiye mîrektiyên Kurdan têxe bin serweriya xwe û ji dêvla mîran, rêvebirên xwe bişîne hakimtiya Kurdan. Mîrên Kurdan li hemberî van polîtîkayan serî hildabin jî Osmanîyan serhildan dane sekinandin û rêveberiyeke navendparêzî damezrandiye.

## 2.Armanc û Sînorên Tezê

Di nav pêvajoya dîrokê de “edebiyata neteweyî” di bin bandora edebiyatên neteweyên din de maye û ev yek bandorê li wan kiriye. Di dîroka edebiyatê de berdewamiya têkiliyê heye. Tu edebiyat û bûyer bi tena serê xwe nayên qebûlkirin. Ew di nav têkiliyên bi edebiyatên neteweyên din re tên nirxandin. Heke hatibin qebûlkirin jî baş nayên fehmkirin. Wisa xuya ye ku armanca berawirdkirinê destnîşankirina taybetiyên hevbeş û cuda ye. Ji ber ku her tişt di nav têkiliya sedem-encamê de pêk tê, pêwîst e li ser sedema nivîsîna berheman bê rawestan. Di heman

demê dedi nivîsandina berheman de hem bandora neteweyên din hem jî yên arkaîk ê neteweya tê de dijîn heye. Dema em li sedema nivîsandina herdu berhemên mijara xebata xwe binêrin, her yek di nav rewşa siyasî û civakî ya serdema xwe de pêk hatine. Şerefxan, di dîroknivîsînê de Farisan û Osmaniyan mînak girtiye. Herwiha Cegerxwîn bi gelemperî ji bo hişyariya neteweperwerî nivisiye ku ew jî di bin bandora bizava neteweperweriya Ewropî de maye.

Di vê lêkolînê de armanca me ya sereke ev e ku em ê bi awayekî zanistî *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî û *Şerefnameya Menzûm* a Cegerxwîn berawird bikin û rewşên siyasî û civakî yên li ser nivîsîna van berheman tesîr kirine tespît bikin. Di nav armancên me de li gor serdema tê de jiyane, nêrînên herdu nîvîskaran rave bikin û ji aliyê naverok, teşe û termînolojiyê ve hêmanên hevpar, ên dişibin hev û hêmanên dijberî hev ên herdu berheman li ber çavan raxin.

Xebata me bi berawirdkirina her du berheman hatiye sînorkirin. Ji ber ku *Şerefname* bi nesrê, *Şerefnameya Menzûm* bi nezmê hatiye nivîsandin xebata me xebatek înterdîsîplîner e. Û bi peywendiya dîrok û edebiyatê ve girêdayiye. Ji bo mijar baş bê fehmkirin piştî danasîna her du nivîskar û berhemên wan, ji ber ku ev nivîskar ne hevdemê hev in li ser atmosfera serdemên herdu berhem tê de hatine nivîsîn hatiye sekinîn. Piştre naveroka wan bi vekolîneke dîrokî, tehlîlî hatiye şîrovekirin. Ji aliyê termînolojiyê ve *Şerefname,* bi *Şerefnameya Menzûm* ve hatiye bi sînorkirin. Ji ber ku *Şerefname* kitêba dîrokê ye û tê de bûyer bi teferruat hatine dayin gelek kategoriyên termînolojiya wan bên derxistin tê de peyda dibin.

## 3. Rê û Rêbaz

Rêbaza ku me di vê xebatê de bi kar aniye bi awayekî berawirdî rêbaza şîrove û analîzkirina herdu berheman e. Piştî destpêkê, ji bo mijar baş bê fehmkirin di beşa yekem de li ser jiyan û berhemên herdu nivîskaran hatiye rawestan. Li ser kîjan çavkaniyan ava bûne û cihê wan di dîrok û edebiyata Kurdan de çiye hatiye destnîşankirin. Ji ber ku derdora nivîskar, perwerdehiya dîtiye û şert û mercên tê de jiyaye gelekî bandor li ser nivîsîna berhema wî/wê dike, berawirdkirina me bi vî rengî wê xurttir bibe.

Di beşa duyem de em li ser rewşa siyasî ya serdema *Şerefname* û *Şerefnameya Menzûm* hatine nivîsîn sekinîn. Me xwest pirsên wek berhem di kîjan atmosferê de û bi kîjan hestan hatiye nivîsîn, rola serdemê li ser nivîsîna berhemê çiye, Cegerxwîn bi çi awayî ji *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî sûd wergirtiye û hwd. bibersivînin. Di vê beşê de em ê li ser teoriyên kokên netewe û neteweperweriyê jî bisekinin ku ev, bi xetên giştî nêrînên prîmordîalîzm, modernîzm û etno-sembolîzm in. Me pêwîst dît ku li ser peywendiya van berheman a bi neteweperweriyê ve rawestin ku mijara neteweperwerî mijareke ji nîqaşan re vekiriye û gelek teorî li ser ava bûne. Li Ewropayê geşedana ewil a neteweperweriyê ne bi hestên etnîk ên neteweperweriyê bûne, berevacî bi hestên dînî ve girêdayîbûne. Li welatên Misilman bingeha merheleya ewil a neteweperweriyê Îslam bûye. Di serdema împeratoriyan de piraniya Kurdan xwe wek Misilman, xwedî erd, reîsên eşîretan û wek gundî dane nasîn.

Me di beşa sêyem de jî menzûmeyên Cegerxwîn ên *Şerefnameya Menzûm* de cih digirin bi *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî re berawird kir û Cegerxwîn çi lê zêde kiriye çi jê derxistiye, her du berhem bi kîjan fikran hatine nivîsîn me di vir de destnîşan kir. Di berawirdkirinê de malikên *Şerefnameya Menzûm* li gor sernavên menzûmeyan, menzûme bi mezûme hat dayin û temamê malikên dîwanê di xebatê de cih girtin. Ji bo taqîbkirina malikên menzûmeyan sê hejmar hatin dayin. Hejmara yekem a menzûmeyê ye. Hejmara duyem di nav menzûmeyê de malika çenda ye hatiye diyarkirin. Hejmara sêyem jî di nav 724 malikên *Şerefnameya Menzûm* de malika çenda ye daye xuyakirin. Di vê xebatê de her menzûmeyek bi mîrektiyên di *Şerefname*yê re hatin muqayesekirin û piştre di derheqê her mîrektiyê de tabloyek ji şexsiyetên dîrokî yên wê mîrektiyê, dem û mekanan pêk hatiye me lê zêde kir. Digel vê ji bo şêwaza nivîskaran baş bê fehmkirin berî derbasî berawirdkirina naverokî, bi kurtasî em li ser bikaranîna zimanên wan rawestiyan. Piştî berawirdkirina naverokî jî, ji aliyê termînolojiyê ve ji bo wekhevî û cudahiya berheman derkeve holê me cih da berawirdkirina termînolojiyê û di heşt kategoriyan de terminolojiya berheman derxist. Di kîjan warî de kîjan term zêdetir hatiye bikaranîn hatiye diyarkirin. Li ser her beşek termînolojiyê jî tabloyek hatiye amadekirin. Ji xeynî van hersê beşan em ê di encamê di analîza van berheman de encamên ku hatine bidestxistin li ber çavan raxin.

## 4.Binyada Çavkaniyên Xebatê

Di vî warî de herçiqas ji ber rewşa Kurdan a siyasî û civakî berhemên Kurdî kêm bin jî li ser van berheman lêkolînên hatine kirin hene. Lê rasterast bi giştî berawirdkirina herdu berheman di lîteraturê de heta niha cih negirtiye. Xebatên akademîk ên li ser *Şerefname*yê hatine kirin kêm in. Çavkaniyên ku hene jî bi gelemperî bi zimanên biyanî ne. *Şerefname* bi zimanên Erebî, Kurdî, Tirkî, Rûsî û hin beşên wê bi Elmanî hatiye wergerandin. Lê ji xeynî çend pêşgotinên ku ji bo *Şerefname*yê hatine nivîsîn û çend gotarên ku gelemperî ji zimanên din hatine wegerandin pê ve çavkaniyên akademîk ên bi zimanê Kurdî tune ne. Teza doktorayê ya M. İ. Şemsî bi navê "*Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî*" ji zimanê Azerî ji aliyê Hejarê Şamil ve ji bo zimanê Tirkî hatiye wergerandin. Lewma ji bo vê xebatê em ê berê xwe bidin çavkaniyên biyanî. Di vir de pêwîst e xebatên Sacha Alsancakli jî neyên jibîrkirin, wî li Zanîngeha Sarbonneyê li ser *Şerefname*yê gelek xebatên hêja kirine û teza xwe ya doktorayê li ser *Şerefname*yê bi zimanê Fransî nivîsandiye. Li ser helbestên Cegerxwîn jî lêkolînên akademîk ne zêde ne. Hin berhemên wî bi zimanên din ve hatine wergerandin û di derheqê wî de di kovar û rojnameyan de gelek gotar hatine nivîsîn; lê di vî warî de xebatên akademîk ne zêde ne. Ji van lêkolînan tezên lîsansa bilind ji aliyê Yusuf Kaynak, *Jînenîgriya Cegerxwîn û Berhemên Wî*; Mîkaîl Bilbil, *Helbesta Cegerxwîn û Îqtîdar*; Ibrahim Ibrahim, *Rengvedan*a *Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de* hatine nivîsîn. Projeya Feyzullah Arslan a bi navê *Di Dîwanên Cegerxwîn de Çînên Serdest û Bindest* a lîsansa bilind a bêtez jî ji van xebatan e.

Ji bo *Şerefname*yê em ê ji sê nusxeyan sûd wergirin. Ev yek wergera Kurdî ya Ziya Avci ye ku ji ber wergera Soranî ya Hejar Mukriyanî hatiye girtin. Ziya Avci ev wergerê di sala 1997an de temam kiriye û werger ji aliyê weşanxaneyên cihê ve çend caran hatiye çapkirin. Ziya Avci di wergera xwe de piştî pêşgotina xwe cih daye pêşgotina Hejar Mukriyanî ya wergera Soranî, pêşgotina Erebî ya Mihemed 'Elî Ewnî, peşgotina Kemal Mezher û pêşgotina Frensî ya Zernov ku berê hatine nivîsîn. Kitêb bi tevahî ji 639an rûpelan pêk hatiye. Beşên ku Şerefxan nivîsandine di navbera rûpelên 47-508an de cih girtiye. Piştre di rûplên 509-591an de di derheqê kitêbê de 513 jêrenot hatine dayin. Di dawiya kitêbê de piştî 20 tabloyên minyaturên

*Şerefname*yê yên ji kitêba Ebdurreqîb Yusif a bi navê *Hunerê Tabloyên Şerefnameyê* û ji xebata Enwer Sultanî ya bi zaravayê Soranî *39 Destnivîsên Şerefnameya Şeref Xanê Bedlîsî di Kitêbxaneyên Cîhanê de* hatine girtin. Êm ê berga ji Weşanxaneya Azad derketiye bi kar bînin. Dîsa nusxeya ji Weşanên Nûbiharê ya ji aliyê Abdullah Yegin ve di sala 2013an de ji Farisî bi zimanê Tirkî hatiye wergerandin li ber destê me ye. Di vê kitêbê de di serî de ji bo *Şerefname*yê ji aliyê Yusuf Baluken ve bîbliyografyayek hatiye amadekirin. Kitêb bi tevahî 487 rûpel e. Beşên ku Şerefxan nivîsandine di navbera rûpelên 45-487an de cih girtiye.  Ji xeynî vê yekê, em ê di xebata xwe de cih bidin nusxeya ji Weşanên Sîtavê ya ji aliyê İbrahim Sunkur ve di sala 2016an de ji Farisî ji bo Tirkî hatiye wergerandin. Di amadekirina vê kitêbê de ji nusxeya Mihemed ‘Elî Ewnî ya Erebî û ji nusxeya A. Cerbezedar a Îranê sûd hatiye wergirtin. Di kitêbê de piştî pêşgotina wergêr, pêşgotina Mihemed ‘Elî Ewnî û pêşgotina Zernov a di sala 1860an de nivîsandiye cih girtiye. Kitêb ji 488 rûpelan pêk hatiye. Beşên ji aliyê Şerefxan ve hatine nivîsandin di navbera rûpelên 54-488an de hatine dayin. Ji ber ku gelek nusxeyên *Şerefname*yê hatine wergerandin, ji bo berawirdkirinê tedbîren ji sê wergerên *Şerefname*yê sûd hat wergirtin.

Me ji bo vê xebatê wergera Ziya Avci esas girt, lê ji bo beşa sêyem a berawirdkirina naverokî me ji her du nusxeyên din jî sûd wergirtine. Ji bo *Şerefnameya Menzûm* jî me çapa Weşanxaneya Avestayê tercîh kir ku ev dîwan wek dîwana dehan hatiye çapkirin. Avesta ji bo sedsaliya Cegerxwîn, di sala 2003an de hemû helbestên wî di deh bergan de kom kiriye. *Şerefnameya Menzûm* a vê weşanxaneyê çap kiriye bi tevahî ji 127 rûpelan pêk hatiye. Piştî bi sernavê *Gotinek Pêdivî* ya Dilawerê Zengî 45 menzûmeyên Cegerxwîn ên di derheqê 45 mîrektiyên Kurd de cih girtine. Di dawiya vê dîwanê de jî *Ferhenga Kesan* a ji aliyê Dilawerê Zengî ve hatiye amadekirin heye.

Di vê xebatê de bi tevahî ji 38 pirtûk, 2 tezên lîsansa bilind, 29 gotar û 9 çavkaniyên dijîtal sûd hatiye wergirtin. Ji çavkaniyên sereke 3 pirtûk ji wergera nusxeyên *Şerefname*yê, 9 pirtûk jî ji dîwanên Cegerxwîn pêk hatine. Ji bilî vê ji bo jiyana Cegerxwîn ji pirtûka wî ya *Jînenîgariya Min* sûd hatiye wergirtin. Çavkaniyên din jî ji xebatên lêkolînê yên li ser mijara tezê pêk hatine.

# BEŞA YEKEM

## JIYAN Û BERHEMÊN ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ Û YÊN CEGERXWÎN

## 1.1. ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ

### 1.1.1. Jiyan û Kesayetî

Şerefxanê Bedlîsî, xwediyê berhema *Şerefname*yê ya li ser dîroka Kurdan e. *Şerefname* di vî warî de wek berhema yekem a ji aliyê Kurdekî ve berfireh hatiye nivîsîn tê zanîn. Lewma di lêkolînên dîrokî yên li ser Kurdan de cihekî girîng girtiye. Navê Şerefxan bi vî awayî bûye nemir.

Nivîskarê *Şerefname*yê Şerefxanê kurê Şemseddînê Bedlîsî hin dîroknasan wî wek Şerafeddin dane nasîn. Eşîreta Şerefxanê Bedlîsî Rojkî ji 1384an heta 1849an geh serbixwe geh nîvserbixwe hikumdariya Bedlîsê kirine. Di nav hikumdarên Kurdistanê de serweriya Rojkiyan bi rûmet hatiye hilbijartin. Ji aliyê gelek şahên serdemê yên wek Emîr Tîmûr, Qere Yûsifê Qereqoyunî û xelîfeyên Emîr Tîmûr ve bi fermanên fermî hatine tesdîqkirin. Aqqoyuniyan Mîrektiya Bedlîsê bi dest xistine. Mîrektî 29 sal (1466-1495) di bin serdestiya Aqqoyuniyan de maye. Di dawiyê de Bedlîs bi têkoşîna xelkê rizgar bûye. Şah Îsmaîlê I. (1501-1524) ê damezrînerê Dewleta Sefewiyan di 1504an de Mîrektiya Bedlîsê bi awayekî fermî nas kiriye û îqtidara wan tesdîq kiriye.[1]Lê belê dema Şah Îsmaîl di 1514an de di Şerê Çaldiranê de têk çûye. Mîrê Bedlîsê Şerefxan (bapîrê nivîskarê Şerefnameyê) hîmayeya Osmaniyan qebûl kiriye. Şerefxan, ji aliyê Tekelû Ulema Xan ve di 1531an de hatiye kuştin.[2]

Di serdema hikumdariya kurê wî Şemseddîn Xan (1531-1535) de, wilayeta Bedlîsê ji aliyê siltanê Osmanî Qanûnî Siltan Silêman (1519-1566) ve hatiye girtin. Ji ber vê yekê Şemseddîn Xanê Bedlîsî îlticayî Tebrîzê kiriye. Şah Tehmaspê I.(1524-1576) rêz li ber girtiye û pêşwaziya wî kiriye.[3]

---

[1]M.İ.Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, Hejarê Şamil (wer.), Avesta , İstanbul, 2010, r.29-30.
[2]Osman Özgüdenli, “Şeref Han” **TDV İslam Ansiklopedisi,** b.38, 2010, r.548.
[3] M.İ. Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî,** r.30.

Şerefxan, di dawiya *Şerefname*yê de behsa vê bûyerê kiriye ku bavê wî mecbûr maye welatê xwe terk bike:"Dema ku bavê min ê mezin û birêz, li gor qederê bûyerên di serî wî de derbas bûne, di bin tesîra şert, merc û bûyeran de welatê xwe yê bab û bapîran di cî de hiştiye. Ji meskenê xwe yê diyar vediqete û di welatê 'Eceman de cîwar dibe; bi diya vî hejarî re mehra xwe dibre."[4]

Mîrên Kurdan di navbera van her du hêzên reqîbên hev ên Osmanî û Sefewiyan de mane. Ji bo xwe biparêzin li gor rewşa siyasî nêzî wan dewletan bûne. Têkiliyên siyasî bi wan re danîne.[5]

Şemseddîn Xan, piştî îlticayî Îranê kiriye, tevlî hin şerên Şah Tahmasb bûye. Li gorî Hesen Rûmlû gotiye, di 1552an de Şah Tehmasb ji bo welatê Rûman bistîne artêşa xwe şandiye. Ji Şemseddîn Xan re jî peywira bidestxistina herêmên Exlat û Mûşê daye û hin fermandarên Qizilbaş xistine bin emrê wî. [6]

Şerefxan, heft salan piştî bavê wî Şemseddîn Xan, ji ber siltanê Osmaniyan çûye Îrane di 20ê Zilhîcceya 949ê k. /1543ê z. li qesebeya Kerheruda girêdayî bajarê Qûmê hatiye dinyayê. Mala ku ew lê hatiye dinyayê mala Qadiyên Kerherudê bûye. Nesla Qadiyên Kerherudê digihîje Qadî Şureyh el-Kufiyeyê zana û xwedî fezîlet. Şerefxan dema behsa malbata Qadî kiriye ji aliyê zanyariyê ve gelek pesnên wan daye û gotiye: "Ez tu wext ji hevaltiya van zanayên xwedî fezîlet û kesên gelek biqedir û birêz veneqetiyam."

Şerefxan, di Seraya Şah Tehmasb de bi zarokên Şah re perwerde bûye. Çimkî Şah Tehmasb zarokên beg û fermandarên xwe girtiye nav harema xwe ya taybet û bi tevî şehzadeyên xwe daye perwerdekirin. Şerefxan li wir dersên wek Qur'an, fiqih û hikmên şerî'êtê xwendine. Dîndarî, paqijiya beden û giyanê hîn bûye. Ji wan dersan a herî balkêş jî hînbûna pîşeya resim çêkirin û neqaşiyê bûye. Şah ji bo vebûna zekayên wan û derketina qebîliyeta wan ew ders pêwîst dîtiye.[7] Di vir de tê dîtin ku Şerefxan di Seraya Şah Tehmasb de perwerdehiyek baş dîtiye. Di heman demê de wî, gelek qîmet daye kesên kamil ên xwedî fezîlet û ji wan sûd wergirtiye.

Ji ber ixtiyariyê Mîr Şemseddîn Xan, dev ji wezîfeya xwe ya mîrektiyê berdaye. Eşîreta Rojkî ji bo kurê wî Şerefxan bibe mîr serî li Şah dane. Şerefê dozdeh

---

[4] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname,** Ziya Avcı (wer.), Azad, Stenbol, 2014, r.499.
[5]E. Glassen, "Bedlisi Şaraf-al-Dîn Khan", **Encylopaedia Iranica**, b.4, 1990, r.76.
[6]M.İ. Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî,** r.30.
[7]Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname,** r.499-500.

salî bi emrê Şah li Salyan û Mehmûdabadê ya girêdayî wîlayeta Şêrwanê hatiye tayinkirin. Ji mezinên Eşîreta Rojkî Şêx Emir Bîlbasî wek lala, rêber û micawir (qeyûm) dane cem wî. Di sala sêyemîn a mîrektiya wî de ji ber ku Şêx Emir Bîlbasî wefat kiriye Şah desthilatdariya Şerefxan, bi dawî kiriye. Ew, li havîngeha Xerekanê ya nêzî Hemedanê bi Şah Tehmasb re hevdîtinek çêkiriye. Şerefxanê Bedlîsî şandine cem xalê wî Mihemmed Beg ê ku walîtiya Hemedanê dikir. Mîr Şerefê Bedlîsî ji aliyê xalê xwe ve bi hurmeteke mezin hatiye pêşwazîkirin. Ew, piştî demekê bi qîza xalê xwe re zewiciye[8]

Şerefxan, li ser vê mijarê nivîsandiye ku Şah Tehmasb ji bo kar û barên Eşîreta Rojkî ji Hemedanê bimeşîne jê re maaş û xercîrah veqetandiye. Bi vî awayî sê salan li Hemedanê maye. Di vê demê de bûyera îlticaya Siltan Beyazid[9] a Seraya Şah Tehmasb derketiye. Ji ber vê rewşê Şah, carek din bavê wî Şemseddîn Xan aniye Qezwînê. Eşîreta Rojkiyan û herêma Kerherud a girêdayî Qumê daye destê wî. Lê piştî çend salan bavê wî aciz bûye û vê wezîfeyê nexwestiye. Şah jî ev wezîfe ji nû ve daye Şerefxan. Şerefxan du salan bi berdewamî li cem Şah Tehmasb maye.[10]

Şemseddîn Xanê bavê wî di şêst û heft saliya xwe de ji ber nexweşînê li Qezwînê wefat kiriye. Şemseddîn Xan, li pey xwe du zarokên kur hiştine. Yek jê Şerefxan e, yê din jî birayê wî Xelef e. Xelef Begî, di nav parêzgerên Şah Tehmasb de wezîfeya parêzgeriyê kiriye. Piştre di dema Siltan Mihemmed de heta rutbeya begîtiyê bilind bûye. Serdema Siltan Murad de wezîfeya Senceqa Eleşgîrdê û Melazgîrdê dane wî.[11]Îhtimal heye ku vê rewşê otorîteya Şerefxan a li ser birayê wî lewaz kiribe. Li gor belgeyên Osmanî Xelef li Bedlîsê rêvebirekî bihêz bûye û ji berhevkirina baca gundan berpirsiyar bûye. Li gor hin agahiyên din herdu kurên Xelef, Elî Xan û Mistefa girêdayî apê xwe Şerefxan bûne. Zeameta di destê xwe de bi rê ve birine. Xelef Beg, piştî mirina Şerefxan bi hin kar û barên Bedlîsê re mijûl bûye û otorîteya wî bihêz bûye.[12]

---

[8]Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.501.
[9] Siltan Bayezid kurê Qanûnî Siltan Silêmanê Osmanî yê sêyem e.Ji bo serweriya text bi birayê xwe Selîm re ketiye nav têkoşînê û têk çûye. Lewma îlticayî Seraya Şahê Îranê kiriye ku tevî kurên xwe ji aliyê zilamên bavê xwe ve hatiye kuştin.
[10] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname,** r.501.
[11] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.494.
[12]M.Dehqan-Genç V.,"Reflections On Sharaf Khan's Autobiography",**Manuscripta Orientalia**, Vol.21, (j.1) June 2015, r.50.

Ji *Şerefname*yê diyar e ku hin zarokên Şemseddîn ên keç jî hene. Lê di derheqê van keçan de Şerefxan tu agahî nedaye. Şerefxan tenê dema behsa hatina bavê xwe ya Qezwînê kiriye wisa gotiye: “Bavê min demeke dirêj ji keç û kurên xwe û ji hemû Eşîreta Rojkiyan dûr ketibû ku ev tesîrek gelek xerab li ser wî hiştibû.”[13]Piştî jiyana Kerherud û perwerdehiya serayê bûyerên siyasî û civakî yên wîlayetê, li ser jiyan û fikrên Şerefxan bandoreke mezin çêkirine. Mîrê ciwan taybetiyên siyasî yên serdema xwe bi awayekî zexm dikaribûye analîz bike. Lewma li serayê gelek girîngî dane fikrên wî.

Hakimê Geylan Biynopîşê (Biye) Xan Ehmedê Geylanî, li hemberî Sefewiyan serî hildaye û hatiye girtin. Ji bo rêveberiya erdên wî di 1568an de tevî çend fermandarên Qizilbaş Şerefxan jî şandine Geylanê. Ji aliyê Şah Tehmasb ve hatiye ser walîtiya Tonîkabonê (Tonîkabon, li rojavayê Mazenderanê navê herêmekê ye.). Ji ber serhildana ku Xan Ehmed dabû destpêkirin hîn berdewam bûye, gelek leşkerên Qizilbaş dane bin emrê Şerefxan.

Siltan Haşimê alîgirê Xan Ehmed li Geylanê hakimê herêmekê bûye. Li hemberî Qizilbaşan ketiye nav têkoşîneke çekdarî. Li gor Şerefxanê Bedlîsî nivîsiye, di sala 1568an de Siltan Haşim, tevî 18 hezar siwarî û piyade êrîşê hakimê Tonîkabonê yê Şerefxan kiriye. Şerefxan, bi alîkariya fermandarên Qizilbaş û pêncsed Kurdên dora xwe piraniya serhildêran qetl kiriye. Ji qaqotê serê wan sê minare hatine çêkirin. Şerefxan bi vî awayî li Îranê nêzîkî pazdeh salan bi navber li wîlayetên cuda de hakimtî kiriye. Ew wextên hakimtî nekiriye li Seraya Sefewiyan xizmeta xwe meşandiye. Xizmetên ku Şerefxan li Geylanê kirine, hurmet û baweriya Şah Tehmaspê I. di derheqê Şerefxan de zêdetir kiriye. Li gorî ku di *Şerefname*yê de derbas bûye Şerefxan heft salan hakimtiya herêma Geylanê kiriye. [14]

Lê ji ber qirêjî û nepakiya hewaya vê herêmê ji Eşîra Rojkiyan gelek kes nexweş ketine û mirine. Ji ber vê yekê, Şerefxan hêvî ji Şah kiriye ku wî ji vê wezîfê ezil bike. Şah jî daxwaza wî qebûl kiriye û ew aniye Qezwînê qesra xwe û xistiye nav dîwana xwe. Lê Şerefxan dîtiye ku tifaq û yekîtî di navbera Qizilbaşan de nemaye, ew li hev nakin. Dijîtî û nelihevî di navbera serok û fermandarên Qizilbaş de ewqas di pêş de çûye ku di qesrê de dek û dolaban li pey hev gerandine. Di vê

[13] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.494-495.
[14] M. İ .Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî** , r.32-34.

rewşê de wî nexwestiye li qesrê bimîne. Ji Şah xwestiye ku li dervayî navendê rêveberiya herêmeke Îranê bide bin destên wî. Li ser vê daxwazê Şah hin herêmên bi ser eyaleta Şêrwanê ve dane bin destên wî. Ji bo jiyana Eşîra Rojkiyan jî cihên wek Terakemat, Areş, Akdaş, Kabale, Baku û Kenarabê dane bin emrê wan ku ev cih girêdayî Şêrwanê bûne. Şerefxan û eşîr û maiyeta xwe çûne li Şêrwanê bi cih bûn.[15]

Heşt meh şûnde Şah Tehmasb miriye, piştî hin tevliheviyan Şah Îsmaîlê II. hatiye ser text. Wî ji Şerefxan hêvî kiriye ku ew ji Şêrwanê biçe cem wî. Şah xwestiye ku mîrêmîrantiya Kurdan bide destê wî û ew jî dê di maiyeta Şah de be. Bi vî şertî ew ê rêvebiriya kar û barên mîr, beg û serokeşîrên Kurdistan, Loristan û Goranê bimeşanda. Ew ê tiştên giring ên ji wan karan jî pêşkêşî Şah bikira, welhasil ew ê di dîwanê de bibûya wezîrê Şah ê berpirsiyarê van herêman. Şerefxan ev wezîfe qebûl kiriye û çûye Qezwînê, dest bi karê xwe kiriye. Şah ewqas baweriya xwe pê aniye û rûmeta wî girtiye ku ev yek di nava serok û fermandarên Qizilbaşan de bûye sedema çavnebarî û hesûdiyê. Bêbextî kirine ku Şerefxan bi dizî tevî Huseyîn Mîrza li dijî Şah komployan çêdikin.

Şah di bin tesîra van fesadiyan de maye, hin kes ji serayê kuştine, hin avêtine hepsê û hin ji wan jî ji wezîfeyên wan ezil kirine. Hikumeta Nahciwanê jî daye Şerefxan û ew ji bajêr derxistiye. Yekîneyek eskerî jî digel wî bi rê xistiye ku ew heta Azerbaycanê muhafiziya wî û maiyeta wî bike. Ew çûye ser rêveberiya Nahciwanê, salek û çar mehan li wê derê maye. Li wir xeber jê re hatiye ku bi saya xebata Mîrêmîranê Wanê Xusrev Paşa, hakimê Hekkariyan Zeynel Beg û Hesen Begê Mehmûdî siltanê Osmaniyan; Siltan Mûradê III. berat derxistiye ku Eyaleta Bedlîsê bidine wî[16]

Em di vir de pêşbîniya Şerefxan dibînin ku berî van bûyeran wî xwestiye ji serayê dûr bikeve û nebe qurbanê dek û dolabêndi nav fermandarên Qizilbaşan de derbas dibin. Şerefxan ji aliyê kesayetiyê ve mirovekî xwedansoz, pêewle û serkeftî bûye. Lê mixabin mirina Şah Tehmaspê I. û bi derketina Şah Îsmaîlê II. a ser text, tevlîheviyê jî bi xwe re aniye. Şerefxan di *Şerefname*yê de ew bûyer wisa îfade kiriye:

[15] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname,** r.503.
[16] Murad Ciwan, “Şerefname; Pencereya Kurdan a Ber li Mejûyê”, https://muradciwan.com

“Şahê mezin rêzek wisan li min girt û qedrê min ewqas bilind kir ku di nav giregirên Qizilbaşan de li hemberî min hesûdî û çavnebariyek xerab dest pê kir û wan li dijî min kir nav bizaveke xurt. Fîtnebaz û fesad, li dijî min dest bi ristina benên dezgehên komplo û ji holêrakirina min dayêxistin. Ji Şah re bi dizî gotin ku, min bi hinek fermandarên Qizilbaşan li hemberî wî leyistikek hazir kirine û em dixebitin ku biraziyê wî Sultan Huseyîn Mîrza di ciyê wî de bînin ser textê şahîtiya Îranê. Ew hewil û fîtdana fesad û xêrnexwazan li ba Şah Îsmaîlê II.saheyek fireh û zeviyek bi pit û bereket dît.”[17]

Piştî rêwîtiya wî ya Nahciwanê di sala 986ê k./1578ê z. de, Şerefxan bi fermandarê Osmanî Xusrev Paşa re hevdîtinek pêk aniye. Vê yekê bandor li ser vegera wî ya Bidlîsê kiriye.[18]Şerefxan ji wir ji Mûradê III. re nameyek nivîsiye û nêzîkahiya xwe ya bi Osmaniyan re aniye zimên. Siltan Mûradê III. hin diyarî jê re şandine û Şerefxan wek mîrê Bedlîsê tayin kiriye.[19]Şerefxan di jînenîgariya xwe de ne behsa hevdîtina xwe û Xusrev Paşa ne jî behsa nameya ji Siltan Mûrad re şandiye kiriye. Li ser vê pêvajoyê tenê piştî ku salek û çar mehan li ser meşandina kar û barên hikumeta Nahciwanê maye, behsa agahiya mizgîniyê ya ji aliyê Xusrev Paşa, Zeynel Beg û Hesen Begê Mehmûdî ve daye. Li ser vê agahiyê di sala 3yê Şewala 968ê k./ 1597ê z. de tevî 400 kesên bi xwe re ji Nahciwanê derketine û çûne Wanê. Li Wanê bi Xusrev Paşa re hevdîtinek pêk aniye.

Piştî Şerefxan, tevî 400 kesên bi xwe re hatiye Eyaleta Bedlîsê, tevlî şerê Osmanî-Îranê bûye. Di seferên Osmanî yên Şêrwan, Gurcistan[20] û Azerbeycanê de cih girtîye. Deh salan di xizmeta Siltan Mûrad de şuxilîye. Di sala 991ê k./1584ê z. de dema ku Serdar Ferhad Paşa Êrîwanê îstila kiriye di muqabeleya xizmetên Şerefxan de herêmên di bin desthilatdariya wî de ji aliyê Siltan ve hatiye firehkirin. Di muqabilê 200 hezar akçeyan de hinek gundên taybetî (xas) yên girêdayî

[17]Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.503-504.

[18]Mistefa Dehqan- V. Genç, “Şerefxan Bo Çi Hat Kuştin?” Fexriye Adsay (wer.), **Zarema,** (j.7), Diyarbekir, 2017, r.32.

[19]Necip Mansı İz, “Şerefhan Bitlisi’nin Şerefnamesi’nde Kürtler “, http://diroknass.bolkspot.com.tr

[20]Li gor M. Dehqan-V. Gençdi gotara xwe ya” Reflections On Sharaf Khan’s Autobiography”, de ji arşîvên Osmanî neql kirine ku piştî Sefera Gurcîstanê Şerefxan ji aliyê siltan ve gelek hurmet dîtiye. Siltan tevî Bedlîsê pênc gundên Mûşê jî (Horos, Pesel, Urban, Hacîkend, Ekuçkî) daye rêvebiriya wî (r.147). Lê di *Şerefname*yê denavê van gundan derbas nebûye, Şerefxan gotiye ku; “ piştî Sefera Tiflîs û Gurcistanê herêmên di destê min de hat firehkirin û hinek gundên xas ên girêdayî nahiya Mûşê kirin ser Eyaleta Bedlîsê.” (r.505).

nahiyiyeya Mûşê kirine ser Eyaleta Bedlîsê. Bi vî awayî xasseyên wî yên wek ocaklik hatine dayin, bi giştî gihîştiye 410 akçeyên Osmanî.[21]

Şerefxan dawiyê kar û barên mîrektiyê daye destê kurê xwe Ebû'l-Me'alî Şemseddîn Begû dest bi nivîsandina *Şerefname*yê kiriye. Di *Şerefname*yê de ji xeynî Ebû'l-Me'alî Şemseddîn Beg, behsa tu zarokên wî yên din nehatiye kirin. Lê li gor M. Dehqan-V. Genç, diyar kirine ji xeynî vî kurê wî du kurên Şerefxan ên din jî hene. Kurê wî yê bi navê Ehmed, rêvebiriya Senceqa Mûşê kiriye (1579). Di çavkaniyên Sefewiyan de behsa kurê wî yê din ê bi navê Diyaeddîn hatiye kirin. Ew, yekî wek bavê xwe bûye û di 1602-1603yan de miriye yan jî dev ji desthilatdariyê berdaye. Di heman gotarê de li gor arşîvên Osmanî navê kurekî wî yê din jî hatiye diyarkirin. Ev kurê wî yê bi navê Tatar[22] kurê wî yê biçûk bûye. Bi saya Xelefê apê wî ji vî kurê wî agahdar bûne ku di sala 1601-1602yan de nêzî heşt salî bûye. Di derheqê wî de zêde agahî tune ne, tiştê tê zanîn ji aliyê Ehmed Paşa ve rehîn hatiye girtin. Li ser vê apê wî Xelef, ji bo serbest berdana wî ji siltan re nameyek şandiye.[23]

Dîroka mirina Şerefxan heta niha baş zelal nebûye. Li gor hesabê ku ji piştî nivîsîna *Şerefname*ya xwe (berga duyem) xelas kiriye zêde nejiyaye. Îhtîmala mezin Şerefxan demeke kurt piştî meha nehan a 1598ê z. miriye. Yan jî bi nexweşiyeke giran ketiye. Heke ji piştî *Şerefname*yê demeke zêde bimaya, pêwîst bû hin berhemên din jî bidaya. Madem tu berhemên wî yên din tune ne nexwe ew ji piştî xelasbûna *Şerefname*yê miriye.[24] M. İ.Şemsî jî di heman fikrê de ye ku dîroka mirina Şerefxan ne zelal e. Lê dema dest bi nivîsîna jinenîgariya xwe kiriye nêzî 60 salî bûye.[25] Di kitêba Mehmet Tahîrê Bursali ya bi navê *Osmanlı Müellifleri* de di berga sêyem de behsa mirina Şerefxan hatiye kirin. Dîroka mirina wî wek 1603 z. daye ku ev dîrok ji aliyê gelek dîroknasan ve nayê pejirandin, wek anekdoteke bêbingeh hatiye dîtin.[26]. Di Teqdîma *Şerefname*yê berga duyem a ji weşanên Nûbiharê derketiye de Abdurrahman Acar dîroka mirina Şerefxan wek 1604ê z. diyar kiriye.

---

[21] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname,** r.504-505.

[22] Ji ber di derheqê kurê Şerefxan de agahiyên zelal tune ne û ev nav ji arşîvên Osmanî hatiye girtin, îhtimal heye ku xelet hatibe nivîsandin. Çimkî di nav mîrektiya Bedlîsê de ev nav qet nehatiye bikaranîn.

[23] M.Dehqan-Genç V.,“ Reflections On Sharaf Khan's Autobiography”, r.48-49.

[24] Murad Ciwan, “Şerefname; Pencereya Kurdan aBer li Mejûyê”, http://muradciwan.com

[25] M. İ. Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, r.40.

[26] Bursalı Mehmet Tahir (195-1916), **Osmanlı Müellifleri**, amd. İsmail Özen, Meral, İstanbul, 1975, r.141.

Gora Şerefxan, li Bedlîsê di nav Kulliyeya Şerefiyê de ye.[27] Ji aliyê din ve Mistefa Dehqan û V. Genç bi xebata xwe ya li ser hin belgeyên arşîva Osmanî diyar kirine ku Şerefxan ji aliyê Osmaniyan ve hatiye kuştin. Sedema kuştina wî bi piştgiriya belgeyên arşîva Osmanî şîrove kirine. Lê herçiqas li ser kuştina wî îhtimalên ku hene li ber çavan raxistibin jî sedema kuştina wî yan jî mirina wî ne zelal e. Di vir de divê bê destnîşankirin ku Şerefxan dema Celaliyan li hemberî Osmaniyan serî hildane miriye. Di vê demê de, di navbera Şerefxan û Ehmed Paşayê fermandarê sereke yê Osmanî de hin şer çêbûne. Ehmed Paşa li di jî Celaliyan di nav têkoşînê de bûye. Ev yek ji bo kuştina Şerefxan îhtimaleke xurt hatiye dîtin û li ser Şerefxan û peywendiya wî ya bi Celaliyan re hatiye rawestan. [28]

### 1.1.2. Berhema Şerefnameyê

*Şerefname* ji aliyê Şerefxan ve bi Farisî hatiye nivîsîn û ji du bergan pêk hatiye. Agahiyên derheqê jiyan û rewşa çînî ya nivîskar deynin aliyekî berga yekem ji aliyê dîrok û civaka Kurdan ve berhemeke girîng e. Ji demên kevnare heta 1005ê k./1597ê z.behsa mîrektî û eşîretên Kurdan kiriye. Berga duyem li ser bûyerên 689-1005ê k./1299-1597ê z.ye û ev berg wek *Dîroka Osmanî-Îran* derbas bûye. Di naverokê de agahiyên derbarê Sefewî, Selçûkiyên Anatoliyê, Artûqî, Aqqoyunî, mîrektiyên Îran û Anatoliyê, peywendiya Memlûk û Osmaniyan cih girtine.

Şerefxan di berhema xwe de mîrên Kurdan li gor asta wan a serxwebûnê rêz kirine. Kitêb ji çar beşan pêk hatiye. Di beşa yekem de behsa hikumdarên Kurd ên ala saltanat û serxwebûnê bilind kirine sekiniye. Beşa duyem li ser desthilatdarên Kurd ên serbixwe ye ku nebûne xwedî dewlet, lê li ser navê xwe xutbe dane xwendin û dirav çap kirine. Beşa sêyem li ser mîr û desthilatdarên Kurdistanê yên din in. Di beşa dawî de jî wî, behsa desthilatdariya Bedlîsê kiriye.

Li ser dîroka destpêka nivîsandina *Şerefname*yê nêrînên cuda hene. Li gorî nêrînên Vladimir Zernov, M. Volkov Şerefxanê Bedlîsî çawa vegeriyaye wîlayeta Bedlîsê dest bi xebatên li ser berhema xwe kiriye (1578). N. Felsefî gotiye ku, Şerefxanê Bedlîsî, ji sala 1581an pê ve dest bi xebatên nivîsandina *Şerefname*yê kiriye. Dîroknasê hevdem ê Kurd Şakir Xesbak, vê yekê wek 1586 diyar kiriye. Piştî Şerefxan hatiye ser mîrektiya Bedlîsê ji bo sedaqeta xwe riya Siltan Mûradê III. bide

[27]Şerefhan Bitlisi, **Şerefname,** b.2, Osman Aslanoğlu (wer.), Nûbihar, İstanbul, 2018, r.11.
[28]Ji bo agahiyên berfireh bnr. Mistefa Dehqan- V. Genç, “Şerefxan Bo Çi Hat Kuştin?” .

deh salan tevlî şerê wî bûye. Lewma sala 1586an ango dîroka Şakir Xesbak behs kiriye dibe ku wek destpêka nivîsandina *Şerefname*yê ya berga yekem bê qebûlkirin.[29]

Sal baş ne diyar be jî bi gelemperî destpêka nivîsandina *Şerefname*yê, piştî vegera Şerefxan a Mîrektiya Bedlîsê hatiye dîtin. Li gorî hin agahiyan, Şerefxan hê li Îranê dest bi berhevkirina agahiyên derheqê malbat û mîrektiyên Kurdan kiriye. Ew, bi hîs û rûhiyeta Kurd jî xwedî dîrok in hewl daye. Ji bo serpêhatî û bûyerên dîroka Kurdan winda nebin û neyên ji bîr kirin agahiyên derbarê wan de berhev kirine.

Şerefxan berî ku dest bi nivîsandinê bike, naverokeke ku ji mijarên ew ê li ser binîvîse amade kiriye. Ev naveroka kitêbê jî, li gor rewşa desthilatdarî û serwerî ya wan malbat û mîrektiyên di derheqê wan de agahî daye de ye.

Şerefxanê Bedlîsî berhema xwe bi vî awayî sêwirandiye:

1.Pesnê Xwedê

2.Pesnê Mihemmed Pêxember

3.Mezinahiya Xwedê û girîngiya Qur'anê

4.Pesnê Siltan Mihemmedê III.

5.Pesnê Dîrokê

6.Tercumeîhal a xwe (Ez û Ev Kitêba Han )

a) Armanca nivîsandina kitêbê

7.Naveroka kitêbê, ji destpêkek û pêvekek pêk hatiye.

a) Di destpêkê de behsa eslê Kurdan û rewşa jiyana wan kiriye.

b) Di beşa yekem de hikumdarên Kurdan ên ji aliyê dîroknasan ve wek şah hatine wesifandin cih girtine.

c) Di beşa duyem de hikumdarên Kurdan ên serbixwe yên li ser navên xwe xutbe dane xwendin û dirav çapkirine ye.

d) Di beşa sêyem de mîr û hakimên din yên Kurdistanê

e) Di beşa çaran de li ser dîroka Mîrên Bedlîsê sekiniye.

Di pêvekê de jinenîgariya nivîskar cih girtiye.

Şerefxan armanc û daxwaza nivîsandina *Şerefname*yê, wek xanedanên mezin ên Kurdistanê navê wan di nav navan de bimîne û neyê jibîrkirin rave kiriye: "Ji ber ku heta niha ji aliyê dîrokansan ve li ser hikumdarên Kurdistanê û weziyetên wan tu

[29] M. İ. Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, r.40.

kitêbên bi rêk û pêk nehatiye nivîsîn, min bi îmkanên xwe li ser rewşa Kurdan û jiyana wan bi bingeha zanyariya ji dîroka Îranê min bixwe dîtine û yên guhdariya mirovên bi hiş, zîrek û rastgo kitêbek nivîsîm û navê wê *Şerefname* danîm."[30] Şerefxan, xwestiye bi nivîsandina vê berhemê diyar bike ku Kurd jî xwedî hikumdariyê ne û dikarin xwe îdare bikin.

Dijene Bajalan, li ser vê mijarê li hemberî fikrên Amir Hassanpour rawestiyaye. Li gor Hassanpour di *Şerefname*yê de behsa dewletbûna Kurdan hatiye kirin. Li ser vê Bajalan gotiye ku: "Helbet Şerefxan dixwaze diyar bike ku Kurd jî dikarin rêveberiya saz bikin. Lê gihîştina fikra 'Şerefxan behsa fikra dewleta Kurd' kiriye zehmet xuya ye. Di şiroveyên Hassanpour de, Şerefxan ji ber ku Kurdan mafên xwe yên xwedî dewletbûnê neparastine ji wan gazinan kiriye. Lê ev îfade wek gazin bê qebûlkirin jî mihtemelen ji ber li hemberî desthilatdarên Osmanî yên xwestine otonomiya mîrektiyên Kurdan lewaz bikin derketine holê."[31]Dijene Bajalan bal kişandiye ser *Şerefname*yê ku herçiqas tê de behsa kevneşopiya desthilatdariya Kurdan hebe jî bi tu awayî behsa pêwîstiya dewletbûna Kurdan nehatiye kirin. Çimkî piştî Şoreşa Frensayê fikra netewe-dewlet derketiye holê.

Piştî Şerê Çaldiranê dema Siltanê Osmanî ji Tebrîzê ber bi Rûmê çûye li ser navê mîrê Kurdistanê Îdrîsê Bedlîsê raporek pêşkêşî textê siltan kiriye. Li ser vê siltan xwestiye ku mîrên Kurdan wezîfeyên xwe yên berê bi cîh bînin. Ew bi hev re di bin desthilatiya yekî de herin Diyarbekirê ji destê waliyê Sefewî Qere Xan xelas bikin. Di nav xwe de bi rutbeya mîrêmîrantiyê şexsiyetekî tayin bikin. Siltan vê daxwaza wan pejirandiye û gotiye ku bila di nav xwe de desthilatdarekî hilbijêrin. Di bin fermandariya wî de Qizilbaşan ji welat bavêjin. Lê Îdrîsê Bedlîsî bi raporek din ji siltan re rave kiriye ji ber ku kesek ji kesekî din re serî natewîne mîrêmîran ji aliyê siltan ve bê tayinkirin baştir e. Li ser vê yekê, Biyikli Mehmet Paşa bi Mîrêmîrantiya Eyaleta Diyarbekir û Serfermandarê Giştî yên Leşkerên Kurdistanê hatiye tayinkirin.[32] Ev yek xuya dike ku di sedsala XVI. de mîrektiyên Kurdan nexwestine bikevin bin emrê hevudu. Ji ber ku kesek ji kesekî din re serî netewandiye yekîtiya Kurdan nehatiye pêkanîn.

---

[30]Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.56.
[31]Dijene Bajalan, "Erken Modern Dönem Etno-Politikası: Şerefhan'ın Şerefname'si ve Kürt Beyleri", Alp Kanzık (wer.), **Toplum ve Kuram, (** j.1), Mayıs 2009, 244.
[32] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname,** r.472-473.

Şerefxan demekê li cem Siltan Mihemedê kurê Siltan Mûradê III. maye. Ew berga duyem, li ser daxwaza wî nivîsandiye. Berga duyem ji bûyerên 689ê k./ 1290ê z. dest pê kiriye. Heta gihîştiye bûyerekê ku di çaryeka dawîn a meha Rebîulewwela sala 1005ê k./ 25ê Kewçêrêya 1596ê z. dewam kiriye. Dîroka temambûna berga duyem ne diyar e. Çimkî di vê destnivîsê de Şerefxan heman dîroka xelasbûna berga yekem li dawiya berga duyem jî danîye. Li gor qenaeta Kemal Mezher Ehmed, berga duyem teqrîben di dawiya meha heştan a destpêka meha nehan a 1598an de xelas bûye. Nusxeya destnivîsê ya kevntirîn, binirxtirîn û rasttirîn ew e û çapa yekem ji 307 rûpelan pêk hatiye.[33]Şerefxan di serê berga yekem de piştî pesnê Xwedê û pesnê pêxember, pesnê siltanê Osmanî Siltan Mihemed Xan daye ku Siltan Mihemed Xan ji wan re aramî û dilxweşî aniye.

Di pêşgotina Hejar Mukriyanî ya *Şerefname*yê de Hejar Mukriyanî li ser *Şerefname*yê wisa gotiye: "Ji serî heta biniya Şerefnameyê Kurdekî tirsonek nakeve berçav, hemû kesên mêrxas, gernas û bêemsal in."[34]Mirov dikare bibêje ku Şerefxan vê berhemê ji nivîsevaniyên dîrokî bi nivîsevaniya hînker (pragmatîk) nivîsandiye. Di dîroka Kurdan de rûpeleke nû vekiriye. Şerefxan gelek girîngî daye zanyariya dîrokê û dîroknasiyê. Wî dîrok û dîroknasiyê di ser hemû huneran re girtiye. Bi gelemperî pesnên bav û kalên xwe dabe jî di hin cihan de di derheqê hin mîran de taybetiyên wan ên nebaş jî daye xuyakirin ku divê vana li ber çav bên girtin. Wek mînak dema behsa begên Somayê kiriye di derheqê Hesen Begê kurê Mihemed Beg de gotiye ku: "Wan, li hember xelkê, serokeşîran û giregirên welat xerabiyên mezin kirin; ji bilî vê, ji ber helwestên xwe yên xerab ên li hemberî mîr û mezinên cîranên xwe wan, ew gelek xeyidandin û hêrsa wan li xwe vekir."[35]

Herçiqas *Şerefname* ji du bergan pêk hatibê jî hem di nav Kurdan de hem jî di nav Rojhilatnasan de zêdetir berga yekem a li ser Kurdan bal kişandiye. Sedemê vê yekê ne ew e ku qîmeta berga duyem ne qasî ya yekem e. Her du berg wek hev bi rûmet in û cih dane bûyerên balkêş û belgeyên dîrokî. Li gor qenaeta Kemal Mezher Ehmed ji bo ku berga pêşîn li ser Kurdan e û ne berî wê ne jî di dema jiyana Şerefxan de tu kesî bi wê berfirehî û giştayetîyê cih nedaye jiyana Kurdan, berga yekem li ber

[33] Murad Ciwan, "Şerefname; Pencereya Kurdan a Ber li Mejûyê" htpp://muradciwan.com
[34] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname,** r.52-53.
[35]Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.345.

çavan e. Ji ber ku yên li ser dîroka Kurdan rawestiyane serî li vê bergê dane û bi vî awayî ew berg balkêştir bûye.[36]

Şerefxan jî dema sedema perçebûna Kurdan rave kiriye, behsa çîrokekê Oxuz Xanê efsanewî yê Osmanî xwe ji nesla wî dibînin kiriye. Di vê çîrokê de Kurdekî esîlzade bi heyeta Oxuz Xan a çûye cem Hz. Mihemmed ve girê daye. Ev etno-polîtîk, mobîlîzasyona neteweperweriyek nasnameya cuda berpêş dike nîne. Ev etnopolîtîk, ji bo peywendiya di navbera Kurdan û wek parêzerê Îslama Ortodoks Xanedana Osmanî nîşan bide hatiye bikaranîn.[37]Ev jî diyar dike ku di nêzîkatiya Kurdan a li hemberî Tirkan de hêmana dînê Îslamê ji hêmanên herî girîng e. Şerefxanî di warê dînî de xwe nêzî Osmaniyan dîtiye, lê bi awayekî zelal behsa bav û kalên xwe û behsa dîroka Kurdistanê kiriye. Di sedsala XVI. de bal kişandiye rewşa Kurdan a di navbera şerên Îran û Osmaniyan de.

Li gor îddiaya Arshak Safrastian *Şerefname* li ser xwesteka Şah Abbasê I. (1585-1628) bi zimanê Farisî hatiye nivîsîn. Li gor vê, Şah Abbasê I. xwestiye ku bi vî awayî Kurd, munasebetên xwe yên ligel Îran û Rojhilatê bi bîr bînin û ji Osmaniyan dûr bikevin.[38] Ev îddîa wek bê binyad xuya dike ku ew, mihtemelen di bin bandora hin dîroknasên Îranî de maye. M. İ.Şemsî jî behsa vê mijarê kiriye ku, li gor îddîayên hin dîroknasan qaşo Şerefxan bi teşwîqkirina Şahê Îranê *Şerefname* nivîsandiye. Lê di rastiya xwe de dema Şerefxanî *Şerefname* nivîsandiye nêzîkahiya wî bi siltanên Osmaniyan re zêdetir bûye. Divê neyê jibîrkirin ku Şerefxan piştî vegeriyaye Bedlîsê ev kitêb nivîsandiye. Di vê demê de wî peywendiyên baş bi siltanên Osmanî re daniye.[39]

Di *Şerefname*yê de behsa helwestekî bi vî awayî tune ye. Herçiqas *Şerefname* di dewra Şah Abbasê I. de hatibe nivîsandin jî di bin bandora Şah Abbas de nehatiye nivîsîn. Belê, *Şerefname* bi zimanê Farisî hatiye nivîsîn lê ev divê wek çandekê bê dîtin. Şerefxan di cografyaya Îranê de hatiye dinê, li wir mezin bûye û di bin bandora

---

[36] Murad Ciwan, "Şerefname; Pencereya Kurdan a Ber li Mejûyê" htpp://muradciwan.com

[37]Dijene Bajalan, "Erken Modern Dönem Etno-Politikası: Şerefhan'ın Şerefname'sive Kürt Beyleri", r.247; Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.65.

[38] Kitêba Kurd û Kurdistan a xwediyê vê îddiayê Arshak Safrastian di 1948an de bi zimanê Îngîlîzî li Hollandayê çap bûye. Di derheqê nivîskar de di lîteratura Kurdolojiyê de tu agahî tune ne. Lê wek ku ji navê wî xuya ye, ew Ermen e. Ji naveroka kitêbê tê fehmkirin ku kitêb di destpêka sedsala XX. de hatiye nivîsandin. Dîroka Kurd û Kurdistanê ya ji zemanên kevn heta nîvê sedsala XX. nivîsandiye. bnr. Arshak Safrastian, Kurd û Kurdistan, Ergîn Opengîn (wer.), Avesta, Stenbol, 2007, r.49.

[39] Kemal Mezher, " Şerefname di Kurdnasiya Sovyetê de", Ziya Avci (wer.), **Nûdem,** (j.22), Havîn 1997, r.47.

nivîskarên Faris de maye. Ji aliyê din ve Farisî ji bo wê demê hem zimanê edebiyatê bûye hem jî Farisî bi qasî li Îranê hatiye axivîn li welatên Osmanî heta Hindistanê jî dikaribûye bihata xwendin.

Çimkî di serdema berî metbaayê de destxetên *Şerefname*yê li Dewleta Osmanî, Îran û Hindistanê dest bi dest geriyane.[40] Ev jî dibe ku bûbe sedema *Şerefname* bi zimanê Farisî hatiye nivîsîn. Ebdulla Merdux jî di vî warî de gotiye ku di wê serdemê de ‘edet bûye ku şah û şehzade kitêban binivîsînin. Şah Tehmasb bixwe jî xwediyê kitêba bi navê Tezkîretu’l-Tehmasb bûye. Dîsa birayê wî Sam Mîrza bi navê Tuhfeê Samî kitêbek nivîsiye. Şerefxan jî di bin bandora wan de maye û fikra nivîsîna *Şerefname*yê pê re çêbûye.[41] Lê herçiqas Şerefxan ji ber perwerdehiya Seraya Tehmasb dibe ku fikra nivîsîna kitêbê pê re çêbûbe jî ev nayê wateya ku *Şerefname* li ser xwesteka Şah Abbasê I. hatiye nivîsandin.

Herçiqas piştî bi dehan salan re li Bedlîsê hatibe nivîsandin jî, ne tiştekî ecêb e ku *Şerefname*ya Şerefxan wek nûnerekî dereng ê êwra dîroknûsiya Qezwînî bê dîtin. Eşkere ye ku Şerefxan, wek dîroknasekî, îlhama xwe ji nivîskarên serdema Şah Tehmasp girtiye. Ji aliyê dinve xuya ye haya wî ji weqayinameyên piştî vegera wî ya Bedlîsê tuneye yan ev weqayiname bala wî nekişandine.[42]

Wek ku tê zanîn Şerefxan di Seraya Şah Tehmasb de dersa neqaşiyê xwendiye. Di dema nivîsa *Şerefname*yê de, li ser hinek bûyerên dîrokî wek nivîskî tişt negotine. Lê ew bi minyatur teswîr kirine. Di *Şerefname*yê de bi tevahî bîst tabloyên minyatur hene. Di berga yekem de şazdeh tabloyên minyatur û berga duyem de jî çar tabloyên minyatur cih girtine. Li ser van tabloyan nîqaş heye ku di xisûsa tablo ji aliyê Şerefxan bixwe hatine çêkirin yan ji aliyê hinekên din ve hatine çêkirin ne zelal e û di vî warî de fikrên cuda hene.[43]

Di *Şerefname*yê de ji serî heta dawiyê helbest derbas bûne. Ziya Avci di wergera Kurmancî de di jêrenotê de behsa helbestên ji destpêkê heta dawiya

---

[40]Amir Hassanpour, “Şeref-name: Dewlet-Avakirin, Derebegîtî û Desthilatî”, Ergîn Opengin (wer.) **Yazınca,** (j.7), 2005, r.112.

[41]Ebdula Merdux, “Şerefname û Şerefxanê Bedlîsî”, Sidqî Hirorî (wer.), http: //www.bitlisname.com/ 2015/11/19/ serefname-u-serexane-bedlisi

[42]Sacha Alsancakli, “Tiştên Kevn Niha Nû ne: Lêkolînek li ser Şerefnameya Şeref Xanê Bidlîsî (1005-7/1596-99)” Fexriye Adsay (wer.), **Zarema**, (j.11), 2017, r.110.

[43] Kadri Yıldırım, “ Şerefname’de Mînyatür Tablolar”, **Tîroj**, ( j.30), 15 Adar 2008, r.4.

*Şerefname*yê derbas bûne gotiye ku di wergera Tirkî de ev helbest tune ne. Wî li ber wergera Hejar Mukriyanî ya Soranî ev helbest dane.[44]

### 1.1.2.1.Destxet, Werger û Çapên Şerefnameyê

Gelek lêkolîner li ser *Şerefname*yê xebitîne. *Şerefname* bi zimanên cuda hatiye wergerandin. Herwiha gelek çavkanî yên wek berhemên Katib Çelebî-*Keşfu'z-Zunûn*, Ewliya Çelebî-*Seyahatname*, Zeynelabîdîn-*Riyazu's-Salihîn* û hwd. ji *Şerefname*yê sûd wergirtine. Ew nusxeya ku Şerefxan bi destê xwe nivîsiye li Brîtanyayê li Kitêbxaneya Bodleiana Oxfordê di bin hejmara 312an de tescîl kiriye. Ebdulreqîb Yûsif kopyeyeke vê destnivîsê ji wê kitêbxaneya binavkirî daye anîn û li ser lêkolînek kiriye. Li gor agahiyên ku ew daye, destnivîs wek du bergan lê bi hev re hatiye nivîsandin. Kitêb bi navê *Şerefname Tarîxa Kurdistan* derbas bûye. Şerefxan bixwe navê *Xatîme* li berga duyem daniye.[45]

Herî kêm çil û pênc destxetên *Şerefname*yê hene. Di destxeta Şerefxan a bi qîmet a li Kitêbxaneya Bodleiana Oxfordê, Şerefxan di 13yê Tebaxa sala 1597ê z. temam kiriye.  Di berhemê de bîst mînyatur jî cih girtine. Ji xeynî vê destxetê panzdeh destxetên herî kevn ên *Şerefname*yê jî di vê kitêbxaneyê de hene. Destxeta duyem a bi qîmet a *Şerefname*yê, Şerefxan bi destê xwe di Gulana 1599an de nivîsiye. Ev destxet di kitêbxaneya îbadetgehê ya Şêx Safî de li Erdebîlê bûye ku ji aliyê Şah Ebbas ve di 1608an de ji kitêbxaneyê re hatiye bexşandin. Piştî şerê Rûs-Îranê di sala 1828an de Rûsan ev destxet birine kitêbxaneya Petersbûrgê. Ev destxet di bin hejmara Dorn 306an de tescîl kiriye.[46]Li gor Alsancakli diyar kiriye, ji destnivîsên *Şerefname*yê 42 destnivîs gihîştine roja me. Ji van destnivîsan rasterast li ser 6 destnivîsan lêkolîn hatiye kirin. Wî, di demên dawiyê de 4 nusxeyên *Şerefname*yê yên balê dikişînin tespît kirine. Ji van 4 nusxeyan a dawî kopyeyek metnê bûye. Ev destxet, wek Ms. Dorn 306 (Gulan, 1599) hatiye diyarkirin ku li jor behsa vê destxetê hatiye kirin. Lê herdu nusxeyên beriya vê destxetê jî gelek girîng

---

[44] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.498.
[45]Murad Ciwan, "Şerefname;Pencereya Kurdan aBer li Mejûyê", http://muradciwan.com
[46]Sacha Alsancakli, "El Sharafnama de Sharaf Khan Bitlisi" https://www.academia.edu

in. Yek ji van destxetan di sala 1598an de ji Mîrê Erdelanê Hulu Xan re ya din jî ji mîrê Kilîsê Huseyîn Canpolat re hatiye şandin.[47]

Li Ewropayê cara yekem Hêrbilo di du gotarên xwe de behsa *Şerefname*yê kiriye. J. Malcolm Ewropiyê yekem e ku li pêşiya hemû Ewropiyan nusxayek *Şerefname*yê bi dest xistiye. J. Malcolm nusxeya *Şerefname*yê ji serokê Eşîreta Muheyzî ya Kurd girtiye. Ev nusxe hê jî li kitêbxaneya Asya ya Qraltî ya Brîtanyaya Mezin û Îrlandayê ye. Mr. Ferach jî di sala 1826an de li ser *Şerefname*yê kurtelêkolînek weşandiye. Mr. Quatremeredi dîroka Moxol û Fars a çapa Parîsê û di rûpelên 319-329an de ji *Şerefname*yê hin deq wergirtine û di derheqê dîroka Kurdan de gotarek taybet nivîsiye. Ev destxet, li St. Petesburgê Kitêbxaneya Qeyseriyê de di fihrîsta destxetên rojhilatde ye.[48]Ji xeynî van gelek xebatên bi vî rengî hene ku di sedsala XIX. de ji aliyê dîroknas û lêkolînerên biyanî ve hatine kirin.

Qimetdana Rojhilatnasên Sovyetê bi *Şerefname*yê, di dawiya salên 1950yan de gihîştiye dereceya bilindtirîn. Di vê navberê de Beşa Kurdî Qismê Lenîngradê ya Zanîngeha Rojhilatnasî ya Akademiya Zanyarî ya Sovyetê, wergerandina *Şerefname*yê ji zimanê Farisî bi ser zimanê Rûsî sipartiye Yefgina Vasiliva. Wî di sala 1967an de berga yekem, di 1976an de berga duyem a *Şerefname*yê cara yekem wergerandiye zimanê Rûsî. X. D.Fren, yekemîn zanayê Rûs e ku di sala 1826an de, di rojnameyek St. Petersburga paytextê de behsa *Şerefname*yê wek “çavkaniyek dîrokî ya herî girîng” kiriye. Zana û karbidestê Akademiya Zanyarî ya Rûsya, Vladimir Zernov, di sala 1860an de berga yekem bi pêşgotineke bîst rûpel bi zimanê Fransizî[49] ve belav kiriye.[50] Çapa Zernov ku weşandiye bi zimanê Farisî ye. Zernov li ser lêkolîn kiriye û jê re pêşgotinek fireh amade kiriye. Berga duyem jî di 1862an de ji aliyê weşanxaneya Akademiya Împeratoriya Petersbûrgê ve hatiye çapkirin.[51]

Wergera *Şerefname*yê ya zimanê Frensizî, di navbera salên 1868-1875an de ji aliyê Farisîzanê mezin F.B.Charmoy ve li St. Petersburgê hatiye kirin. Ji bilî van, xebateke gelek hêja ji aliyê Mihemed Şemsî yê Azerî ve hatiye kirin. Wî, xebata xwe

---

[47]Alsancakli, Sacha, “From Bidlis to Ardabil Via Aleppo and Işfahân” **EURASIAN Studies**, (j.13), 2015, r.134-137.
[48] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.41-42.
[49] Li gor wergera İbrahim Sunkur, pêşgotin piştî li Franseyê çap bûye bi Fransizî hatiye wergerandin. bnr. Mir Şerefhan Bitlisi, **Şerefname Kürt Tarihi**, İbrahim Sunkur (wer.), Sîtav, Van, 2018, r.22.
[50] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.31-32.
[51] M. İ. Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, r.54.

ya li ser *Şerefname*yê weke teza doktorayê û bi zimanê Azerî amade kiriye û li Bakûyê weşandiye.

Mele Mehmûdê Bazîdî, yekem kese ku berga yekem a *Şerefname*yê ji Farisî wergerandiye Kurdî. Berhem ji aliyê Seîd Dêreşî ve bi navê *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî Tercumeya Mele Mehmûdê Bazîdî* di nav weşanxaneya Spîrêzê de li Dihokê hatiye çapkirin.[52]Ji xeynî vê wergerê herî dawî bi zaravayê Soranî û Kurmancî wergera wê hatiye kirin. Herî dawî ji aliyê Ziya Avci ve li ber wergera Soranî ya Hejar Mukriyanî, li ber a Tirkî û li ber hin destxet û wergerên din bi Kurmancî hatiye wergerandin. Li gor ku Ziya Avci di pêşgotina wergera Kurmancî de gotiye ya Soranî rasterast ji çapa Farisî ya Misrê hatiye girtin.

Li Kitêbxaneya Stenbolê destnivîsên kevn ên vê berhemê di 1034ê k./ 1625ê z. de ji aliyê mustensîxek navê wî nayê zanîn, hatiye îstinsaxkirin û li Kitêbxaneya Silêmaniyê ya Halet Efendî (j.584) ye. Di 1036ê k. de ji aliyê Mihemmed b. Mihemmed el-Helebî (Îbn Ezgar) ve yên hatine îstinsaxkirin nusxeyên Lala Îsmaîl Efendî ne (j.357). Di kitêbxaneya Stenbolê de sê nusxeyên din jî hene. *Şerefname*ya ji aliyê Vladimir Zernov ve wek du bergan hatiye weşandin, ji aliyê Mihemmed Ebbasî ve wek esas hatiye girtin. Mihemmed Ebbasî tevî muqeddime, pêvek û fihrîstê, ev berhem ji nû ve weşandiye (Tahran,1343ê k./ 1965ê z. -1347êk./1968ê z.).[53]

Li gor gotina Yefgina Vasiliva, kevintirîn wergera *Şerefname*yê ew herdu wergerandinên cihêkirî yên zimanê Tirkî ne. Yek ji wan kurteya *Şerefname*yê ye, ya din jî temamê wê ye. Kurteya *Şerefname*yê ji aliyê Mihemed Begê kurê Ehmed Mîrza ve di sala 1078ê k./1667-1668ê z. de hatiye wergerandin. Ya din jî di salên 1680an de ji aliyê yekî navê wî Şem’î ve hatiye wergerandin.[54]

Ji aliyê din ve li gor Sacha Alsancakli berevaciyê Yefgina Vasiliva, kurteya *Şerefname*yê Şem’î, ya din jî ji aliyê Mihemed Begê kurê Ehmed Mîrza, bi xebatekî berfireh û baldarî hatiye wergerandin. Şerefxanê III. kurê Evdal Xan e û piştî bavê xwe hatiye ser mîrektiya Bedlîsê. Şerefxanê III.,di 1078ê k./1667-1668êz.de çawa hatiye ser desthilatê xwestiye *Şerefname*ya mîrata bapîrê xwe yê mezin wergerîne Tirkî. Ji dema Şerefxan vir ve berdewamî û mezinahiya Mîrektiya Bedlîsê di nav

---

52 AbdurrahmanAdak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, Nûbihar, Stenbol, 2014, r.342.
53Osman Özgüden, “Şeref Han”, r.550.
54Kemal Mazhar Ehmed, “Şerefname di Kurdnasiya Sovyetê de” r.44-45.

mîrektiyên Kurdan de berbiçav bike. Lewma bi pismamê xwe Mihemed Begê kurê Ehmed Mîrza re *Şerefname*yê daye wergerandin. Mîrê Paloyê Yansûr Beg jî ji ber meraqa xwe ya dîroka bav û kalan *Şerefname*yê bi katibê xwe Şem'î daye wergerandin. Sacha Alsancakli ji ber ku wergera *Şerefname*yê ya Mihemed Begê kurê Ehmed Mîrza ji 372 rûpelî, wergera Şem'î ji 87 rûpelî pêk hatiye gihîştiyê vê encamê. Wî vê baweriya xwe bi gelek delîlên dî jî piştrast kiriye.[55] Wergera Şem'î, di 2017an de bi navê *Terceme-i Tevarih-i Şeref Han* di nav weşanên Nûbiharê de derketiye. Di navbera van herdu wergeran de ferqa balkêş ev e ku Şem'î bûyerên Mîrektiya Palo yên ji 1597an ango ji xelasbûna *Şerefname*yê bigirin heta 1680an li *Şerefname*yê zêde kirine. Piştre bûyerên Mîrektiya Egilê yên heta roja xwe jî ji bo mîrê Egilê Mistefa Beg lê zêde kirine.

Ji wergerên Mihemed Begê kurê Ehmed Mîrza û Şem'î xuya ye ku piştî sedsala XVII. hêza Farisî li herêmên Kurdan kêm bûye. Mirov dikare bêje ku li van herêman zimanê Tirkî raserî zimanê Farisî bûye. Lê di heman demê de edebiyata Kurdî ya nivîskî jî bi taybetî di warê helbest û metnên dîdaktîk ên olî de bi pêş ve çûye.[56] Peywendiyên siyasî yên bi Faris û Tirkan re li ser edebiyatê jî bandoreke mezin kirine. Ev yek bûye sedema wergerên bi zimanê Tirkî zêde bibin.

Wek ku tê dîtin ji ber ku *Şerefname*yê dîroka Kurdan ronî kiriye bûye mijara xebatên lêkolîneran. Herçiqas bi zimanê Farisî hatiye nivîsîn jî li zimanên wek Rûsî, Elmanî, Frensî, Kurdî, Erebî û Tirkî jî hatiye wergerandin. Wergera Elmanî ji aliyê Dr.Heinrich Alfred Barb ve di sala 1858an de ji Akademiya Dewletê ya Vîyanayê re hatiye pêşkêşkirin. Di wergera *Şerefname*yê de girêdayî eslê wê yê Farisî maye. Lê ji ber ku destxet bi tevahî li ber destên wî tunebûne, beşên bi dest xistine wergerandine Elmanî. Ev werger ji sê beşan pêk hatiye. Li gor di destxeta *Şerefname*yê ya li Zanîngeha Oxfordê di bin hejmara 312an de, di wergera Elmanî ya Dr. Barb de beşa sêyem kêm e.[57] Piştî ku di nîvê yekem ê sedsala XIX. de ji aliyê oryantalîstan ve

---

[55]Sacha Alsancakli, "Historiography and language in 17th-century Ottoman Kurdistan: A study of two Turkish translations of the Sharafnama" **Kurdish Studies,** vol.6,( j.2), 2018, r.173-177.
[56]Sacha Alsancakli, "Historiography and language in 17th-century Ottoman Kurdistan: A study of two Turkish translations of the Sharafnama", r.185.
[57]İlhami Yazgan, "Kürt Tarihi Şerefname'nin Batı Serüveni",www.bitlisname.com/2015/11/17/kurt-tarihi-serefnamenin-bati seruveni

behrem hatiye kifşkirin, bûye mijara gelek lêkolîn, werger û edîsyonan. Bi taybetî edîsyona ji aliyê Vladimir Zernov di vî warî de edîsyona herî navdar e.[58]

Mihemmed Cemîlbendî Rojbeyanî (Bexda,1372ê k./1953ê z.) û Mihemmed Ewnî-Yehya el-Heşşab (I-II. Qahîre, 1958-1962) *Şerefname* wergerandine Erebî. Wergera Silêman Sawci ya du bergan jî di Kitêbxaneya Gel a Bajarê Diyarbekirê de ye. *Şerefname* li ber wergera Erebî ya Mihemmed Elî Ewnî û Yehya el-Heşşab ve ji aliyê Mehmet Emîn Bozarslan bi navê *Şerefname, Kürt Tarihi* û *Şerefname Osmanlı-İran Tarihi* wek du bergên cuda bi Tirkî hatine wergerandin (Stenbol 1971).[59]

### 1.1.2.2. Çavkaniyên Şerefnameyê

Çavkaniyên *Şerefname*yê ji rîwayetên kesên xeberan neqil kirine, ji mirovên xwedîtecrûbe, rastgo, rîsipî û zana ku Şerefxan dema behsa wan kiriye gotinên wek " ji mirovên ji derewan dûr, bi bîr û bawer, kesen xeberxweş ên bibîr û zîrek, ji aliyê kesên xeberan neqil dikin û xwediyê berheman, ji aliyê hostayên zîrek ên ku deng û behsên kevin neqil dikin û cewhernasên bazara cehwerîstana pîrên dîrok û çîrokan bi xwe ve hatiye gotin û hwd." bi kar aniye. Carinan jî ji bo neqlkirinê wek mînaka "Waqîdî, ji Newfelê kurê Ebdullah vê yekê neql dike" de tê dîtin ku navê veguhêz diyar kiriye. Kitêbên dîrokê yên wê demê û beriya wê, helbest (şi'ir) û destanên helbestvanan, belgeyên li ber destên wî, jiyan, tecrube, serpêhatiyên wî û yên hemdemên wî yên wek di " nivîskarê van rêzan, ji Mihemed Şahneman Qewalîsî yê peywendiyên pê re heyî û lalatiya min kirî, ev yek seh kiriye" de derbas bûye agahiyên ji hemdemên xwe yên bi dest xistine jî di nav malzemeyên *Şerefname*yê de ne.

Şerefxanî, tiştên ku bihîstine heta rastiya wan tekûz nekiriye nenivîsîne. Kengî gumana wî ji rastî û dirustiya agahiyan nemaye wê çaxê ew bikar anîne. Wek ku Şerefxan dema behsa bajarê Xîzanê kiriye, herçiqas hin riwayet hatibin gotin jî ji ber di çavkaniyan de navê damezrînerê bajêr nedîtiye ev yek bi vî awayî destnîşan kiriye: "Nivîskarê van rûpelan di nav çavkanî û ciyên ku hêviya wî pê hebûye, gelek navê damezrînerê vî bajarî geriyaye, ji bo vê meselê gelek kitêb li hev dane. Lê rastî navê hukumdar an sultanekî wisan nehatiye ku avakerê bajarê Xîzanê be." Bi heman

[58]Sacha Alsancakli, "Tiştên Kevn Niha Nû ne: Lêkolînek li ser Şerefnameya Şeref Xanê Bidlîsî (1005-7/1596-99)", r.108.
[59]Osman Özgüden, "Şeref Han", r.550.

awayî dema behsa begên Suwediyê kiriye jî gotiye ku: “Min, di kitêbên dîrokê de aqîbeta Mûsa û ciyê çûna wî lêkola. Lê mixabin min tiştekî zelal di derheqê wî de bi dest nexist.”[60]

Şerefxan, bi taybetî li ser dîroka sedsalên XV-XVI. rawestiye. Dema li ser berhema xwe şuxiliye, welatên cîran ên Azerbeycan, Îran, Asya Biçûk (Anatolî) û dîroka welatên Ereban jî vekolaye. Wî gelek daneyên ji bo dîroka Kurdistanê pêwîst ji çavkaniyên welatên cîran bi dest xistine.[61]

Di destpêka *Şerefname*yê de agahiyên di derheqê eslê Kurdan û rewşa jiyana wan de, nesla Kurdan digihîje efsaneyên *Şehname*ya Fîrdewsî. Şerefxan, ji kitêba *Tacu't-Tewarîx* a Mewlana Se'deddîn jî agahî wergirtine. Şerefxan navê Fîrdewsî û berhema wî ya *Şehname*yê daye. Dema behsa nêrînên Mewlana Se'deddîn ên di derheqê Kurdan de kiriye ew navê wî gotiye, lê navê berhema wî nedaye. Di destpêkê de Mewlana Taceddînê sedrezamê Orhan Gaziyê Osmanî jî wek Mewlana Taceddînê Kurdî daye nasîn.[62]Ji bo lêkolîna koka peyva “Lor” wî ji kitêba *Zubdetu'l-Tevarîx* sûd wergirtiye. Ev kitêb di sefheya yekem, beşa sisiyan de di nav çavkaniyên hatine bikaranîn de çavkaniya yekem e.[63]Dema bûyera xezîneya Îsmaîlliye di sala 1171ê de ji aliyê Selaheddîn Eyyûbî ve hatiye bidestxistin neql kiriye. Wî bûyerê sipartiye berhema *Tarîxa Yafi'i*ya Ibnu'l Xelkan. Dîsa di bûyerên dewra Selaheddînê Eyyûbî de rûxandina bajarê Esqelanê ji aliyê waliyê Şamê Melîk Efdalê kurê wî ve, ji kitêba *Mir'atu'l-Cenan* îqtibas kiriye. Ji bo taybetiyên cografyaya Kurdistanê ji kitêba *Tarîx-î Guzîde* ya ji aliyê Hemdullah el-Mustewfî el-Qezwînî ve hatiye nivîsîn sûd wergirtiye. Ji xeynî *Tarîx-î Guzîde*, kitêba *Nuzhetu'l-Qulûb*[64] a Hemdullah el-Mustewfî el-Qezwînî jî di nav çavkaniyên *Şerefname*yê de ye. Şerefxan dema behsa navê Bedlîsê kiriye li ser taybetiyên Bedlîsê *Ferhenga Qamûsê ya* Fîrûzabadî bi kar aniye ku ev gotin rasterast ji aliyê Şerefxan ve hatiye neqlkirin. *Rewdetu'l-Sefa*ya Mîrxwand û *Hebîbu's-Siyer*a Xiyaseddîn Mihemmed Xwandmîr jî ji çavkaniyên herî zêde di *Şerefname*yê de hatine bikaranînin.

Şerefxanê Bedlîsî wextê alimên Bedlîsê aniye bîra xwe, kitêba *Nefehatu'l-Uns* a Ebdirrehman Camî bi kar aniye. Dema behsa ji aliyê Tîmûr ve dagikirina

---

[60]Şerefxanê Bedlîsî,**Şerefname,** r.256, 299.
[61]M.İ.Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, r.46.
[62]Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname,** r.61-67.
[63]Şerefxanê Bedlîsî,**Şerefname**, r.77.
[64] Nuzhetû'l-Qulûb di Şerefnameyê de bi navê Zînetu'l-Qulûb jî hatiye bikaranîn.

Kurdistanê ya di sala 1393yan de kiriye ji nav çavkaniyên sedsala XV. de *Zafernameya* Mewlana Şerefeddîn Alî el-Yezdî derxistiye pêş. Kitêba *Metleu's-Se'deyn* a Mewlana Ebdurrezzaq Semerkendî û kitêba *Mecmeu'l-Behreyn* jî wek çavkanî bi kar aniye. Ji bilî van, kitêba Şêx Rukneddîn Elauddewle Semnanî ya *Rîsalatu'l-Igabliyye,* kitêba Dewletşah Semerkendî ya *Tezkîretu'l-Dewletşah* jî di *Şerefnameyê* de cih girtine. Di berga duyem de dema dîroka koka Osmaniyan nivîsîye kitêba Qezwînî ya *Tarix-î Cîhan-Ara* (Dîroka Cîhanê ya Xemilandî) bi bîr aniye. Şerefxanê Bedlîsî, carinan navê nivîskarên wek Mewlana Se'deddîn, Ibnu'l-Xelkan gotiye berhema wan bi kar neaniye. Carinan jî behsa berhemên wek *Zafername, Tarîxa Yafi'î, Tezkîretu'l-Dewletşah* kiriye lê navê nivîskarê wê nedaye.

Di *Şerefnameyê* de ji çavkaniyên sedsala XVI. tenê navê berhema *Tarîx-î Cîhan- Ara* ya Ehmed el-Xeffarî el-Qezwînî bi bîr aniye.[65]

Şerefxan, di berga duyem a behsa dîroka Osmanî û Îranê de çavkaniyên rasterast diyar kirine kêm in. Tenê li serê berhemê de behsa *Tarîx-î Cîhan-Ara*ya ji dîroknasên Îranê Ehmed el-Xeffarîel-Qezwînî û *Hebîbu's-Siyer*a Xiyaseddîn Mihemmed Xwandmîr kiriye. Di rûpelên piştre jî navê Hemdullah Mustewfî bêyî navê berhema wî daye. Navê berhema *Metle'us-Se'deyn* jî bêyî navê nivîskar daye ku ev berhem ji aliyê Mewlana Ebdurrezzaq Semerkendî ve hatiye nivîsîn. Digel vê ew, li gor berga yekem di berga duyem de navê helbestnavên helbestên di navberê de daye zêdetir diyar kiriye.

*Tarix-î Cîhan-Ara,* mezintirîn îlhama Şerefxan bûye di sêwirandina *Şerefnameyê* de. Ev dibe ku ji nasîna Ehmed Xeffarî ya şexsî be û ji ber ku dema mayina Şerefxan a dirêjtirîn li qesra Sefewî, ji 973ê k./1565ê z. heta 975ê k./1568ê z., *Tarix-î Cîhan-Ara* xelas bûye. Ewçax *Tarix-î Cîhan-Ara* meyla dawîn a dîroknûsiya Faris temsîl kiriye. Mehrdad Izady û Mustafa Dehqan, li gor çavkaniyên Şerefxan bi kar anine; îddia kirine ku Erebiya Şerefxan pir lewaz bûye. Merwanî, binemaleke Kurd bûye ku li derdora Amîd û Meyafarqînê, li herêma Diyarbekirê niştecih bûne. Pêbawertirîn çavkaniyên dîroka vê binemalê Erebî ne. Lê Şerefxan, ji hebûna van çavkaniyan haydar be yan ne haydar be, wî ew bi kar neaniye/nikaribûyebi kar bîne. Ji dêvla vê xwe spartiye *Tarix-î Cîhan-Ara* yê.[66] Di

---

[65] M. İ.Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî,** r.47-49.

[66]Sacha Alsancakli, "Tiştên Kevn Niha Nû ne: Lêkolînek li ser Şerefnameya Şeref Xanê Bidlîsî (1005-7/1596-99)", r.112.

heman demê de navê kitêba Belazûrî *Fethu'l-Bîlad* jî di nav çavkaniyên bi kar aniye de cih girtiye.

Berhema yekem a jê sûd wergirtiye serê sefheya yekem beşa sisiyan de kitêba *Zubdetu'l-Tewarîx* e. Şerefxan, ji ewil heta hukimdariya Dewlet Xatun *Tarîx-î Guzîde* bi kar aniye. Ji wir pê ve bi *Tarix-î Cîhan-Ara*yê domandiye, heta hukimdariya Cîhangîr Siltan b. Şah Rustemê ku bi fermana Şah Tehmasp di sala 949ê k./1543ê z. de, sala Şerefxan hatîye dinyayê, hatibû kuştin. Ji bo dewra 949-1005ê k./1543-97ê z., dema hukimdariya Şah Rustem b. Cîhangir, Mihemedî Cîhangîr û Şahwerdî b. Mihemedî, Şerefxan di derbarê bûyeran de xwe tenê spartiye agahiyên xwe û ji çavkaniyên devkî ku dikaribûye xwe bigihênê. Yek ji van çavkaniyan teqez xalê Şerefxan, Mihemed Begê Emîr Xan Mûsillû bûye. Herwiha çavdêr û xezûrê Şerefxan bûye û ji bo wî xwediyê rola bavekî bûye. Ew wek waliyê Hemedanê têkilî nav şerên desthilatdariyê yê begên Lor bûye. Ew bûyerên Şerefxan behs kiriye gengaz e ew bi xwe jî bûbe şahidê wan, herçiqas ew vê destnîşan nake jî[67]

### 1.1.3. Cihê Şerefnameyê di Dîroka Kurdan de

Di derheqê Kurdan de agahiyên ewil ji aliyê Heredot ve b.z. di sedsala V.de di kitêba wî ya Historica de cih girtiye. Wî navê Pacty, Bohtî, Botan bi kar aniye. Di sedsala IV. a b.z. de Ksenefon kitêba xwe ya Anabasîs de navê Kardukhî bi kar aniye.[68] Di Anabasis de behsa erdnîgariya Kurd li ser dijîn kiriye û bi qehremanî wan aniye zimên[69]

Agahiyên berfireh di derheqê Kurdan de b.z. dîroknas û cografyanasê Yewnan ê navdar Strabon daye. Di çavkaniyên kevn ên Azerbaycan, Îran, Ereb û Tirkan de kêm zêde malûmat li ser dîroka Kurdistanê cih girtine. Lê ji vana yek jî ji aliyê dîroka Kurdistanê ve bi qasî *Şerefname*yê girîng nehatiye dîtin. Vladimir Zernov, dema behsa rola *Şerefname*yê ya di zanista dîroka Kurdî de kiriye nivîsandiye ku: "Ev berhema ji aliyê zanistî ve girîng û dîroka Kurdistanê bi peyrewî

---

[67]Sacha Alsancakli, "Tiştên Kevn Niha Nû ne: Lêkolînek li ser Şerefnameya Şeref Xanê Bidlîsî (1005-7/1596-99)" , r.118.

[68] Kadri Yıldırım-Ramamzan Pertev-Mustafa Arslan, **Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî,** Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013, r.136.

[69] Ji bo agahiyên berfireh bnr. Ksenophon, **Anabasis-Onbinlerin Dönüşü**, Oğuz Yarlıgaş (wer.), Kabalcı , İstanbul , 2014.

ronî dike, nêzî 300 salî mewcûd e. Ji wê demê vir ve di Rojhilat de tu berhem nehatiye nivîsîn ku bi vê berhemê re bê qiyaskirin."[70]

Yefgina Vasiliva ya *Şerefname* wergerandiye zimanê Rûsî, girîngiya *Şerefname*yê bi vî awayî aniye zimên: "Qîmeta zanyariya vê çavkaniyê ewqas zêde ye, pêwîst û îhtiyaca wê bi methê nîne, qet nebe ji ber vê ku, bi alîkariya *Şerefname*yê mirov dikare cihê girîng ê windabûyî yê gelê Kurd di dîroka Rojhilata Navîn de diyar bike."Vasiliva derheqê naveroka *Şerefname*yê daye fehmkirin ku, Kurdnas bi alîkariya vê çavkaniya dîrokî ya esîl, dikarin bi awayekî berfireh gelek rûyên jiyana siyasî û civakî ya îro ya Kurdan tê bigihin.[71]

*Şerefname* di warê jiyana Kurdan de agahiyên wek berhemên wan ên ziraetê têra wan dike yan na, bigirin heta baweriya ola Îslamê, şêx û ewliyayên ji nav wan derketine, sedemên nasnavên began û etîmolojiya navên cihan, xwezaya Kurdistanê, navên gol, çiya û deştan, xebatên îlm û îrfan, di nav Kurdan de baweriya ji falên sêlê û zanistiya stêrnasyê gelek agahiyên balkêş dane.

Şerefxan civak û eşîretên sereke yên Kurdan ji aliyê ziman, urf û adet û rewşa wan a civakî ve kiriye çar beş: Beşa yekem Kurmanc, beşa duyem Lor, beşa sêyem Kelhûr û beşa çaran Goran in.[72]

Şerefxan bi zimanekî eşkere û bi serbilindî pesnê neteweya xwe daye. Li gor Şerefxan gotina "Kurd" a tê wateya serbest, bicerg, canfîda wek leqebek bi wan ve hatiye danîn. Çimkî piraniya pehlewan û mêrxasên bi nav û deng û qehermanên qada şer û cengan û serdarên bi nav û deng ji nav Kurdan derketine. Ji aliyê din ve Kurd di warê zanistê de jî xwedî hişmendiyê bûne. Zanîngeh û medreseyên hikumdar û siltanên Îran û Osmanî li ber wan vekirîne. Di mijarên edebî û civakî yên wek helbest, înşa û xweşnivîsê de li pêş bûne. Yên nexwendine jî ji bo kar, rêzlêgirtin, mêvanperwerî, di meşîna li ser riya serdar û mezinên xwe de bi dil û can bûne. Ew, di her warî de çavtêr û destvekirî, di mêraniyê de jî li ser hemû kesan bûne.[73] Di Ş*erefname*yê de li ser zanyariya Kurdan gelek agahî hene. Wek mînak, Şerefxan di vî warî de behsa Derwêş Mehmûdê Keleçîrî yê di Dîwana Qanûnî Siltan Silêman de kiriye. Di derheqê wî de gotiye ku: "Di warê rexnegiriya helbest (şi'ir), înşa û di

[70] M.İ.Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, r.61.
[71] Kemal Mezher Ehmed, "Şerefname di Kurdnasiya Sovyetê de", r.45.
[72] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.63.
[73]Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.64.

uslûba nivîsandinê de yek ji wan şagirtên Mewlana Idrîsê Bedlîsi ye."[74] Ew, dema behsa mîrên Dêrzînê kiriye di derheqê Yaqûb Begê Kurê Mihemmed Beg de gotiye ku:"Piraniya helbestên wî bi Kurdî ne û ez bawer dikim dîwanek wî ya bi Kurdî jî heye."[75] Şerefxan, herçiqas pesnê neteweya xwe daye jî hin kêmasiyên wan jî li ber çavan raxistiye. Di destpêka *Şerefname*yê de di derheqê Kurdan de piştî gelek agahiyên xweş dane, li ser bêtifaqiya wan rexneyên xwe jî kêm nekirine. Şerefxan di vî warî de wisa fikiriye: "Eger rewşek Kurdan a nebaş hebe ew jî ew e ku kesek ji kesekî din re serî natewîne. Bi hev re fikra bi serbilindiya muşterek nakin, pişta hevudu nagirin û nabin yek."[76]

Agahiyên li ser daweta bavê Şerefxan jî hem ji bo fehmkirina peywendiyên civakî yên wê serdemê hem jî ji aliyê peywendiyên siyasî yên di navbera mîrektiyên Kurdan de di *Şerefname*yê de hatiye ravekirin. Bapîra Şerefxan keça 'Elî Begê Sasonî bûye. Ji bavê wî Şemseddîn Xan re jî keça Mihemmed Begê Hezzoyî xwestine û heft roj û heft şev dawet û şahî kirine. Tê dîtin ku daweta wan de leyistikên wek tawle û şahiyên din yên di nav gel de belav bûne ji ber ku li gor qanûnên olî qedexe bûne, nehatine leyistin. Mîrên Kurdistanê vexwendiyê dawetê bûne û di dawetê de ziyafetek mezin hatiye dayin. Ji xeynî leyistina çalo, gog û avêtina kevirên cerabê yên di nav xortan de, xulaman li ser serên civatê zêr û pereyên zîv reşandine.[77] Hin şahiyên di nav gel de belavbûyî ji ber bi qanûnên olî qedexe bûne di dawetê de nehatine leyistin ku ev yek oldariya mîrên Bedlîsê xuya dike. Wekî hem di mînaka bapîra Şerefxan de hem jî ya diya wî de tê dîtin, herdu jî keçên mîran in. Ango di zewacan de armanca peywendiyên siyasî hene. Bi heman awayî kalikê Şerefxan, ji bo hem navbera xwe bi mîrên Kurdan re xweş bigire hem jî dewlemendiya mîrektiya xwe rê bide piştî dawetê diyariyên giranbuha pêkêşî mîrên Kurdistanê kirine.

Mîrektiyên Kurdan di xaçerêya împeratoriyan a weziyetek stratejîk de bûne. Ji bo dema êrîşên li ser herêmê piştgiriyê bidin hev û bi riya merivatiyê di şer de

---

[74] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.178.
[75] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.286.
[76] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.65.
[77] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname,** r.486.

leşkeran ji hev re bişînin di navbera wan de zewacên siyasî çêbûne.[78] Ebdal Begê kurê Emîr Ehmed Beg ê mîrê Miksê, dema ji Dîwana Siltan Silêman Xan fermana mîrektiyê bi dest xistiye, bêsekin bi keça Zeynel Begê Hekkarî re zewiciye ku hêza xwe zêde bike. Dîsa li hemberî wî Rustem Begê kurê Hesen Begê kurapê wî, bi keça Hesen Begê Mehmûdî re zewiciye. Ew, bi alîkariya Eşîreta Mehmûdî bûye muxalîfê kurê apê xwe. Mîrên Kurd ev zewac, ji bo li hemberî hevudu hêza xwe xurt bikin bi kar anîne. Mîrza Begê kurê Mîr Mihemmedê mîrê Baneyê bi xwişka Beyke Begê mîrê Erdelanê re zewiciye. Li ser vê nav û dengê wî belav bûye û bi awayekî berfireh serbixwetî bi dest xistiye.[79] Zewacên ji bo têkiliyên siyasetê, di navbera xanedanên Kurd û Sefewiyan de jî gelek zêde bûne. Dema ku Şah Ebbas hatiye ser text, ji bo zêdetir dereceya dostî û siyaseta ligel Eyaleta Loristanê qahîm bike bi xwişka mezin a Şahwêrdiyê mîrê Lora Biçûk re zewiciye. Wî keça kurapê xwe jî ku neviya Behram Mîrza bûye, li Şahwêrdî mehr kiriye.[80]

Şerefxan bixwe, Sunniyê Şafi'î bûye, nerazîbûna wî li ser baweriya Êzîdîtiyê diyar e. Herçiqas wê teswîb nekiriye û aciziya xwe aniye zimên jî Êzîdiyan wek beşeke civaka Kurd qebûl kiriye. Di têgihîştina Şerefxan a neteweyê/qewmiyetê de rengekî sekuleriyê heye. Wek di mesela ziman û eşîretan de, dîn û mezheb jî sub-îdentîte ne, Kurdîtî super/major îdentîte ye.[81] Ew, di *Şerefname*yê de dema behsa mîrên Cezîrê kiriye, aciziya wî ya ji fikra Êzidîtiyê tê dîtin. Şerefxan ji ber mîrên Cezîrê beriya ola Îslamê Êzidî bûne, wan wek ji rê derketî hesibandiye. Li gor wî, piştre Xwedê riya rast bi ber wan xistiye û ew hatine ser riya mezhebê ehlê heq û sunnetê.[82]

Danasîna civaka Kurdan, di *Şerefname*yê de wek miletekî bi nasnameya xwe ya serwer/giştî (ango Kurd) û bi nasnameyên lipeyhatî (sub-identity) jî diyar e.

[78] Sacha Alsancakli, "Matrimonial Alliances and the Transmission of Dynastic Power in Kurdistan: The Case of the Diyâdînis of Bidlîs in the Fifteenth to Seventeenth Centuries", **EURASIAN Studies,** vol.15, 2017, 246.
[79] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.265, 371.
[80] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.104.
[81]Murat Ciwan, "Rola Şeref Xan di Peydabûna Bîrûbaweriya Neteweyiya Kurd de" https://muradciwan.com/2017/03/29/rola-seref-xan-di-peydabuna-birubaweriya-neteweyiya-kurd-de(Di 25/03/2017an de li Stenbolê li Weqfa Îsmail Beşikçi, di konferansa li ser "Şerefxan û Şerefnameyê'' de hatiye pêşkêşkirin.).
[82] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.161.

Civakek heye, ji aliyê ziman, lehce, dîn, eşîret û mîrektiyan ve xwediyê cudahiyan e û jê re Kurd hatiye gotin. Nasnameyeke di ser hemûyan re heye ew jî 'Kurdbûn' e.[83]

Di serdemên pre-modern de *Şerefname* di nav rêveberên mîrektiyan de hîsa aîtbûna Kurdistanê belav kiriye. Wisa xuya ye ku gelek rêveberên Kurd ev kitêb ne tenê bi awayekî sade xwendine. Wan *Şerefname*yê kirine dîrokeke zîndî, berdewam a desthilatdariya dewletê (mîrektiyê). Hinek ji binemalên rêveberên Mukrî, Erdelan, Egil, Palo û Baneyê ji bo beş an binbeşan pêvek an "paşko-supplement" nivîsîne ku wan pêvekan dîroka mînî-dewletên wan bi kurtî vegotiye. Di serdema nasyonalîzma modern a Kurdan de jî *Şerefname* hê jî şekl dide nasnameyên (identity-kesayetî) etnîk û neteweyî.[84]

Ji ber ku *Şerefname*, heta dawiya sedsala XVI. li ser dîroka Kurd û Kurdistanê û welatên cîran agahiyên hêja û bêhempa daye cihê wê yê dîroka Kurdan ji aliyê tu kitêbên din ve nehatiye tijekirin. Gelek lêkolîneran jê sûd wergirtine û kirine mijarên lêkolînên xwe. Di berhemên xwe de cih dane vê çavkaniya Serdema Navîn. Lewma *Şerefname*yê heta îro jî girîngiya xwe parastiye. Di *Şerefname*yê de taybetiyên Kurdan ên ji Tirkan, Farisan, û Ereban tên dîtin. Amir Hassanpour ji bo vê serdemê têgehên wek neteweperweriya feodal, hestên neteweyî bi kar anîne.[85]

Piştî *Şerefname*yê bêdengiyek di dîroknivîsîna Kurdan de çêbûye. Zanyariyên li ser Kurd û Kurdistanê yên di destpêka sedsala XVII. heta dawiya sedsala XVIII. di kitêbên dîroka Îran û Osmanî de ji agahiyên gerok û dîplomatên biyanî hatine bidestxistin. Di dawiya sedsala XVIII.  de bi lewazbûna İmperatoriyên Îran û Osmanî, êl û eşîretên Kurdan ên xwedî desthilatdarî ji bo azadiyê dest bi xebatê kirine. Waliyên Erdelanê yên ku baregehên hikumdariya Îran û Osmaniyan dîtibûn hewl dane ku ew jî wek wan baregeh, koşk û kelehan çêkin. Wan hurmet dane helbestvan, zana, nivîskar û hunermendan. Lewma di vê serdemê de Erdelan bûye navenda desthilatdariya siyasî, aborî û çandî.[86]

---

[83]Murat Ciwan, "Rola Şeref Xan di Peydabûna Bîrûbaweriya Neteweyiya Kurd de" https://muradciwan.com

[84] Amir Hassanpour, "Şeref-name: Dewlet-Avakirin, Derebegîtî û Desthilatî" r.112.

[85] Amir Hassanpour, "Kürt Kimliğinin İnşası: Yirminci Yüzyıl Öncesi Tarihsel ve Edebi Kaynaklar", **Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri**, Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç (wer.), Avesta, Stenbol, 2005, r.170.

[86]Merdux,Ebdulla,"Şerefname û Şerefxanê Bedlîsî", http: //www.bitlisname.com/ 2015/11/19/ serefname-u-serexane-bedlisi/

## 1.2. CEGERXWÎN

### 1.2.1. Jiyan û Kesayetî

Cegerxwîn, helbestvanekî Kurd ê serdema nûjen e û nivîskarekî piralî ye. Ji xeynî helbestvaniyê wek dîroknas, zimanzan, folklorîst û nivîskarê serpêhatiyan jî hatiye naskirin. Bi berhemên xwe yên curbicur binavûdeng bûye. Lê di nav van berheman de herî zêde bi dîwanên xwe yên helbestan hatiye naskirin.

Cegerxwîn, di serê sedsala XX. de hatiye dinyayê. Wî diyar kiriye ku li gor nasnameyawî ya fermî dîroka zayîna wî, sala 1900e, lê dibe ku ev dîrok ne rast be. Ji îfadeyên wî yên din tên fehmkirin ku ew di sala 1903yan de hatiye dinyayê. Di helbesta xwe ya bi navê "Bi Kurtî Jîna Min" de bi risteya"Sala hezar û nehsed û sê ez hatim dinyayê." dîroka 1903yan piştrast kiriye. Ji vê helbestê jî diyar e ku ew dîroka zayina xwe wek 1903 qebûl kiriye û di *Jînenîgariya Min* de jî bi vî awayî diyar kiriye. Lê cihê ji dayikbûna wî li gor jînenîgariya wî nediyar e. Ew dibe ku li gundê Hesarêyê girêdayî Kercewsê hatibe dinyayê, yan na li gundê Qesra Qelendera girêdayî Mêrdînê hatibe dinyayê. Navê wî yê esil Şêxmûs e, lê ew bi navê Cegerxwîn ê ku ji xwe re hilbijartibû hatiye naskirin. Ew kurê Hesenê kurê Mihemed e. Bavê wî cotkarekî biehlaq û xebatkar bûye. Navê diya Cegerxwîn Eyşan e. Eyşan bi karê dirûnê re mijûl bûye û di xwedîkirina malê de roleke girîng lîstiye. Ji ber nexweşiyên ku li herêmê belav bûne ji xwişk û birayên Cegerxwîn heşt heb mirine, tenê xwişk û birayekî wî li jiyanê mane. Navê birayê wî yê mezin Xelîl e, wî xwendina olî girtiye. Piştre Xelîl neçar mayeçûye leşkeriyê. Ji ber ku rewşa malê ya darayî nebaş bûye, diravên jê zêde mane ji bavê xwe re şandiye.[87]

Malbata Şêxmûs kurtedemekê berî Şerê Cîhanê yê Yekem ji ber xizanî û şerê di navbera ol û eşîrên Kurdan de bar kirine û çûne li gundê Beydermemo[88]bi cih bûne. Li wir jî axayê gund û cendirmeyan rehetî nedane wan û ji wir jî cardin vegeriyane û hatine gundê xwe yê berê. Carek din ji ber Şerê Cihanê yê Yekem mecbûr mane û bar kirine, çûne li Amûda Sûriyê bi cih bûne.[89]

Xuşka wî ya Asya bi kurmeta xwe Mele Xelîl re zewiciye û ew li Amûdê bicî bûne. Piştî salekêdi sala 1918an de li Amûdê bavê wî wefat kiriye. Berî ku salek di

---

[87] Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, Apec, Stockholm, 1995, r.21-27.
[88] Gunde Baydermemo gundekî girêdayî Midyadê ye.
[89] Yusuf Kaynak,**Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî**, Do, İstanbul, 2010, r.12.

ser mirina bavê wî re derbas bibe, di sala 1919an de, diya wî jî li gundê Beydermemoyê wefat kiriye û sê zarok (Xelîl, Şêxmûs û Asya) li pey xwe hiştine. Ji bo Cegerxwîn jiyaneke nû dest pê kiriye, nema zanîbûyeka wê çawa bike. Nemaze piştî ku birayê wî Xelîl bi keçxala xwe ya nezan re zewiciye, ji ber ku gotinên tund û nexweş ji Cegerxwîn re digotin ew gelek ji vê rewşê aciz bûye. Ji ber zirzbûna jinbira xwe Cegerxwîn neçar bûye ku xwe bavêje cem xuşka xwe Asya û pêre bijî. Lê xuşka wî di danûstendina xwe de ji jinbirê baştir nebûye; wê jî gotinên çirr û nebaş jêre gotine. Wê zarokên xwe şandine xwendinê lê Cegerxwîn xistiye ber pez û kiriye şivanê malê. [90]

Wefata bav û diya wî jiyana wî ya asayî tevlîhev kiriye. Şêxmûs ji ber belengazî û hejariyê neçar maye ku di temenê zarok de karên şivanî, paletî, gavanî bike da ku bikaribe debara jiyana xwe bi rê ve bibe.[91]

Cegerxwîn, zaroktiya xwe bi zehmetî derbas kiriye, pir êş û azar kişandiye. Lê ligel wê jî daxwazeke xurt a xwendinê pê re hebûye. Ew ji ber li Beydermemo li ber destê Mele Seîd fêrî xwendina Qur'anê bibû xwestiye xwendina xwe berdewam bike. Piştî vegera ji Beydermemo li Hesarê li ber destê Zeyneba keça Mele Seîd xwendina xwe dewam kiriye.[92]Lê tenê xwendina Qur'anê têra wî nekiriye, ew xwestiye di vî warî de bi pêş ve here; bibe feqe, mele, xelîfe û dawiyê jî bibe şêx. Di sala 1920î de dema Mele Ubeydullahê Kolatî hatiye Amûdê, wî biryara xwendinê daye. Cegerxwîn tevî hevalên xwe Ebdillah û Hesîb ber bi Deşta Diyarbekir ve çûye. Ew li gundê Sînanê ji nû ve dest bi xwendinê kiriye. Ji bo xwendinê li gelek medreseyan geriyaye û piştre cihê ku lê xwendiye û geriyaye di helbesta xwe ya bi navê "Cihê Ku Min Lê Xwendin" de yek bi yek diyar kiriye.[93]

Sê cihan bandoreke mezin li ser jiyan û kesayetiya wî û pêkhatina edîbtiya wî hiştine. Ev cih; Dêrika Çiyayê Mazî, Tel Şeîr û Amûd e. Mele Iskender li Dêrikê û Mele Ubeydullahê Seyda li Amûdê roleke mezin di fêrkirina Cegerxwîn de leyistine. Lê hinek alimên din jî hene ku wî xwendina xwe li ber destên wan kiriye. Ji van aliman; Mele Ebdilhelîmê kurê Mele Sma'îlê Îşê li Amûdê, Mele Mihemedê Pîran li Amûdê, Mele Necmeddînê kurê miftiyê Midyadê li Kercewsê, Mele Fethullahê

---

[90] Cegerxwîn, Jîneñîgariya Min, 27-64.

[91] Kakşar Oramar, "Seyda Cegerxwîn Azadîxwazê Neteweyî û Helbestvanê Rewşenbîrîya Netewî Di Nava Kurdan De",http://www.kncsite.com/kurdi/latin/cgerxwen.pdf

[92]Cegerxwîn, **Jîneñîgariya Min,** r.58-59.

[93]Cegerxwîn, **Jîneñîgariya Min**, 83-84.

Seyda li Sinceqa Emîn a nêzî Amûdê, Şêx Ehmedê Xeznewî li gundê Xezna nêzîkî Qamişlo, Mele Birahîm ê ji gundê Sîha nêzî Xezna û Şêx Kemalê ji malbata Şêx Hemîd (Şah Mardîn) ji gundê Ehmediyeyê ye. Wî dersên ewil ji Mela Ubeydullahê Kûlatî wergirtine. Lê ji ber mirina Seyda, Cegerxwîn îcaza xwe li cem birayê wî stendiye. Piştî destûrnameya seydatiyê girtiye,wî dest bi melatiya gundan kiriye.[94]

Di sala 1927an de Cegerxwîn bi keçxala xwe Kehla Selîm re zewiciye. Bi navên Cemşîd û Xurşîd du kurên wî çêbûne lê di temenê biçûk de mirine; yek ji wan sala wî ne qediyaye û yê din sê salî bûye. Wê demê Cegerxwîn meleyê gundê Hasda Jorîn bûye. Du kurên wî yên bi navên Keyo û Azad, pênc keçên wî yên bi navên Sînem, Gulperî, Rojîn, Benîsuada û Haştî mane.

Di sala 1936an de bi alîkariya Haco Axa ji xwe re bi navên Çêlek û Cehennem nêzî Amûdê du gund ava kirine û li wan bicî bûye. Lê ji ber di nav gundiyan de gengeşî derketiye Cegerxwîn ji wir çûye. Cegerxwîn li ser vê gotiye ku; di sala 1945an de serpêhatiya Çêlekê pêk hatiye. Ji ber di navbera gundiyan de tevlîhevî û kuştinê rû daye, di sala 1946an de Cegerxwîn mala xwe bar kiriye, çûye bajêr.

Dema ku li gundê Hasdê bûye û ta ku hatiye herdu gundên xwe ava kiriye jî, Cegerxwîn ji ber hestên xwe yên neteweyî peywendiya xwe bi Amûdê re qut nekiriye. Ew hestên pê re çêbibûn, piştî serhildana Şêx Seîdê Pîran di 1925an de gurtir bûye. Wî xwe berdaye nav xebata siyasî, ta ku di sala 1937an de li Amûdê qlûbekî Kurd vekiriye. Cara yekem bûye ku dest bi fêrkirina xortan kiriye. Wî dersên xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî dane.

Wî li Dêrikê (Şebextan) dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Cara yekem li hemberî meleyêkî ku nehiştibû Cegerxwîn xwarinê bi wan re bixwe û ji bo xwarinê bi feqî û zarokan re bixwe ew şandibû cem wan nivîsandiye ku li ser nebaşiya wî meleyê bi navê Mele Yûnis sekiniye.[95]

Ew ketiye pey rêyekê ku dermanekî ji van êşên giran re peyda bike. Haveynê bîr û fikrên wî yên niştimanperweriyê di van salan de hatine darijandin. Dilêşiya Cegerxwîn a ji bo qedera gelê wî ji kûrahiya dil û canê wî hatiye. Pênaseya herî rast

---

[94]Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r.85-90.
[95] Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r.178-.242.

û durist ji bo kesayetiya siyasî-civakî ya Cegerxwîn helbestên wî yên qehremanîyê ne. Ew ji keç û xortên Kurdistanê û Kurdayetiyê re bûne manîfestoyeke bêmirin.[96]

Cegerxwîn heta sala 1935an li Sûriyeyê bi dizî maye ku wê wextê Sûriye hê jî di bin mandateriya Frensayê de bûye. Cegerxwîn heta wê çaxê ne tenê bi nivîsandina helbestê re mijûl bûye, wî di "Komeleya Nadiya Ciwan Kurd" de jî cih girtiye.Di kongreya vê komeleyê ya yekemîn de ew wek sekreterê komeleyê hatiye hilbijartin. Bi riya vê komeleyê Kurd dîroka xwe û rewş û mercên gelê xwe yên civakî hîn bûne.[97]

Ev komele piştî demekê ji aliyê Frensewiyan ve hatiye girtin. Cegerxwîn 1946an de tevlî rêxistina Xoybûnê bûye. Ji 1946an heta 1957an bi komînîstan re xebitiye. Piştî ku ji komînîstan veqetiyaye, ew û hevalên xwe rêxistina bi navê "Azadî"yê damezrandine. Di sala 1958an de ew, tevlî Partiya Demokrat a Kurd bûye. Di sala 1959an de ji ber ku Kurdan hinek mafên xwe bi dest xistine, rêxistinê ew aniye Iraqê ku ji bo li Zanîngeha Bexdayê dersên Kurdî bide. Lê piştî ku navbera Ereb û Kurdan xera bûye, Cegerxwîn ji mamostetiyê hatiye derxistin û di 1962an de wî dersînor kirine. Piştî vegera Sûriyê, di sala 1969an de dîsa çûye Iraqê û tevlî şoreşê bûye. Lê piştî salekê vegeriyaye û di 1973an de ji ber zextan çûye Lubnanê, heta sala 1975an li wir maye. Di 1979an de çûye Swêdê.[98]

Cegerxwîn pênc salên jiyana xwe ya dawî li Swêdê maye û li wir bûye endamê Rêxistina Nivîskarên Swêdê. Li Swêdê gelek fersend ketiye destê wî ku li hin welatên Ewropayê bigere. Di sala 1981ê de li ser vexwendina Kurdên Sowyetê çûye Lenîngradê.[99] Ji xeynî vê, li welatê Elmanya, Norwec, Frensa û Belçîkayê beşdarî kongre û şevên Kurdên diasporayê bûye.[100] Cegerxwîn di 22yê Cotmeha 1984an de çûye rehma Xwedê. Niha gora wî li Qamişlo di hewşa mala wî de ye. Herçiqas ew ji çanda medreseyan hatibe jî ku medrese pirek e di têkiliya wî û kevneşopiyê de, bi formeke nûjen nivîsiye. Ew, ji vê çandê veqetînek e. Hem bi awayekî ruxsarî hem jî bi awayekî naverokî, wî berê xwe daye nûjeniyê. Lewma ew

[96] Kakşar Oramar, "Seyda Cegerxwîn Azadîxwazê Neteweyî û Helbestvanê Rewşenbîrîya Neteweyî Di Nava Kurdan De", http://www.kncsite.com/kurdi/latin/cgerxwen.pdf
[97] Yusuf Kaynak, **Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî,** r.32-33.
[98] Cegerxwîn, bnr. **Jînenîgariya Min** (r.176-354).
[99]Yusuf Kaynak, **Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî,** r.55-57.
[100]Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r.358-385.

ji edebiyata tesawûf a klasîk a Kurdî şikestineke epîstemolojîk e ji ber ku ew sekuler e.[101]

Ligel helbestvaniyê, Cegerxwîn –wek zarokên wî gotine- wek bavekî dilovan, diltenik, nefsbiçûk bûye. Nêrîna kesê hemberî xwe pejirandiye û rêzgirtina wî ji mirovan re hebûye. Zarokên xwe li ser hezkirina welat rakirine, armanca wî bi destxistina welatekî azad û bi rûmet bûye.[102]

### 1.2.2. Berhemên Cegerxwîn

Cegerxwîn bi helbestên xwe yên neteweperwerî navdar be jî ji xeynî vê yekê mijarên wek dîrok, evîn, jin, pesndan, civak, felsefe, pêşketina madî ya cîhanê û hwd. jî di helbestên wî de cih girtine. Wî di derheqê mijarên wek tenduristî, nêçîrvanî, lîstik û yarî, aşîtî, zanistî, biratî û dostiyê de jî nivîsandiye. Hin xebatên wî yên mensûr jî hene ku di nav Kurdan de gelek qedrê wan tê girtin. Dîwana wî ya yekem di sala 1945an de û ya dawî di 1985an de hatiye çapkirin. Di çil salên vê navberê de her dîwanek wî li cihekî hatiye çapkirin.

Wek Heyv Omerî diyar kiriye, di helbestên Cegerxwîn de têsîra kolonyalizmê têsîra derûniya bindestiyê tê dîtin. Gelek caran bi sebreke mezin hizrên xwe dubare kiriye. Herçiqas ev dubarekirin ji bo helbestan wekî astengiyekê bê dîtin jî, ji bo helbestvanên bindest ev yek ji neçariyê hatiye. Ger  hûn mamosteyek bi sebir bin û ji dil û can bixwazin şagirtên xwe hînî tiştên pêwist bikin û hûn bibînin encama vê yekê nayê ser, divê hûn dubare bikin. Ev dubarekirin ne kêmasiya mamosteyan e, kêmasiya şagirtan e. Ev bi sebreke mezin gotinên xwe pêşniyarên xwe fikr û ramanên xwe di her helbestên xwe de carek din parve kiriye. Em dikarin her haletî ruhiyeyên mamosteyan jî di nav helbestên wî de bibînin, “ sebr, dubare, şîret, gazinc, bêhêvîtî, qehr û heqaret…”[103] Li gor vê tespîtê di helbestên Cegerxwîn de armanca dûbarekirinê ji bo fêrkirin û hişyarkirina mafên netewî ye. Ramazan Alan jî bi heman awayî fikiriye û gotiye ku: “Ev tekrar, tekrareke wisan bû ku di dîwanekê  de

---

[101] Mîkaîl Bilbil, **Helbesta Cegerxwîn û Îqtidar,** Lîs, Diyarbakir, 2016, r.18-20.

[102] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artûklûyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, 2016), r.11.

[103] Heyv Omerî, “Di Helbestên Cegerxwîn de Vebêj û Hêmanên De-Kolonyal”, http://www.academia.edu/32264544/dı_helbestên_cegerxwîn_de_vebêj_û_hêmanên_de_kolonyal.doc

hemû dîwanan vedigot, di eyna dîwanekê de hemû portreyên helbestkar destnîşan dikir!...Lê mifta sedemê vê tekrarê jî dîsa wî dabû dest me:”[104]

Serî hişke wek kevir
Divê bişkê bi bivir
Divê gurzan deynim ser
Yan jî jê re bêjim her
(Keko Ez Bilûrvan im*,* Şefaq, r.22)

Lê Rojen Barnas, sedema vê yekê bi şert û mercên jiyana Cegerxwîn ve girê daye. Li gor fikra wî heke hunermend, nivîskar û helbestvan bi berdewamî nexwîne, negere, nebîne, lêkolînê neke wê çawa bi pêşkeve? Dema xwe bi pêş ve nexe wê çawa berhemên nû derxe holê? Cegerxwîn negeriyaye, ji ber zor û çewisandinê reviyaye û ji Sûriyê heta Iraq, Libnan û Swêdê çûye. Ev ger ne çandî ne, reveke mecbûri ye. Lewma piştî dîwana wî ya duyem “*Sewra Azadî*”yê di helbestên wî de dîtina nûjenî û hevrûbûnê kêm e.[105]

Em jî di vê baweriyê de ne ku Cegerxwîn gelek hesreta welat kişandiye. Ji ber xwestiye fikrên wî baş bên fehmkirin di helbesta xwe de ketiye dubareyê.

Wek me li jor jî got, mijarên berhemên Cegerxwîn curbicur in. Cegerxwîn hewl daye ku li ser her tiştî binivîse. Ew, bi vê yekê wek neynika civak û miletê xwe, xwe daye berçavan. Di gelek helbestên xwe de li ser zilm û zora neteweya Kurd sekiniye. Li gor wî heta şêx, axa û beg serdest bin û pêşengiya xelkê bikin tu derd û kulên Kurdan çareser nabin. Lewma dijberiya şêx, axa û began kiriye û ji bo li hemberî vê rewşê bêdeng nemînin xelkê Kurd hişyar kiriye. Cegerxwîn, ji ber ku helbestên xwe bi fikrên siyasî û civakî nivîsandiye helbestên wî dîdaktîk in. Di dîwanên wî de hin helbestên wî yên bi hestên helbestkarane nehatine hûnan jî tên dîtin.

Navê wî yê ewil Şêxmûs be jî ji ber kul û derdên neteweya xwe ji dil hîs kiriye ji bo xwe navê Cegerxwîn guncav dîtiye. Li gor di helbesta wî ya “Ez û Gundê Hesarê” de derbas bûye wî navê xwe ji ber ku di çîroka *Mem û Zîn*a Ehmedê Xanî de

---

[104]Ramazan Alan, “Em” di Eyna Dîrokê de” **Bendname**, Avesta, Stembol, 2009, r. 226.
[105] Rojen Barnas, “Uyanış ve Aydınlanma Şairi Cegerxwin”, **İnatçı Bir Bahar**, Vecdi Erbay (ed.), Ayrıntı, İstanbul, 2012, r.525.

derbas bûye Cegerxwîn daniye. Di helbesta "Ez Nizanim Çi Bêjim" de di risteya "Ez Şêxmûs im, bê mirîd" de navê xwe yê ewil jî bi kar aniye. Dîsa di helbesta "Bi Kurtî Jîna Min" de hem sala ji dayikbûna xwe hem jî navê xwe diyar kiriye ku di vî warî de risteyên "Sala hezar û neshed û sê hatim dinyayê/ Bi navê Siltan Şêxmûs[106] ez çêbûm ji dayê" rêz kiriye. Li ser bikaranîna navê Cegerxwîn jî ew gotiye ku:

Ma qey tu nizanî, ji kulan bûme Cegerxwîn
Dermanê me ye serxwebiwîn, bo me werênin
(Ji Kulan Bûme Cegerxwîn, Agir û Pirûsk, r.51)

Ji çîroka Mem û Zîn
Navê xwe kir Cegerxwîn
(Ez û Gundê Hesarê, Şefaq, r.96)

Ew di helbestên xwe de wek li jor me diyar kiriye, gelek caran şêx û melayan rexne kiriye û hezkirina welat daye pêşiya fikrên dînî. Zülküf Ergün vê helwesta wî wisa destnîşan kiriye: "Welat ji bo Cegerxwîn 'dîn, îman, but û lat' e. Ji ber vê çendê Kurd wî wek gawir û bêdîn bi nav bikin jî ji bo Cegrxwîn ne xem e, lewra dîn û îmana wî welat bi xwe ye. Loma jî li ser navê hemû xortên Kurd miletperestiyê wek dîn qebûl dike."[107]

Ola me xortan miletperestî,
Ji me re dûr dixî xwarî û sistî
(Ola Me Xortan, Agir û Pirûsk, r.118)

Wî, şêx, mela, axa, serok û begên roja xwe rexne kiriye. Li gor wî şêx, mela, axa û begên Kurdan gelê xwe xapandine û hevkariya dijmin kirine. Ji bo berjewendiyên xwe wek di mînakên li jêr tê dîtin gel nezan û bindest hiştine. Yan jî Cegerxwîn ne dijminê dîn e, ew xwestiye dînê bi rastî bide xuyakirin ku dîn ji bo çi

[106] Siltan Şêxmûs ewliyayekî Kurd e û di navbera sedsalên XI-XII. de li herêma Şêxan a girêdayî Mêrdîn de jiyaye. Îro jî turbeya Siltan Şêxmûs a di navbera Diyarbekir û Mêrdînê de mekanê ziyareta xelkê ye. Ji ber hurmeta dane vî zatî li herêmê navê Şêxmûs pir hatiye bikaranîn.

[107] Zülküf Ergün, "Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn", **Nûbihar Akademî**, (j.1), 2014, r.28.

hatiye. Çimkî ew dînê ku ji bo ji neqencî û pîsîtiyê paqijkirina dilê mirovan hatiye şandin, bi xwînrêjî, talankerî, dizî û keleşiyê re xerabûye. Dîn ji kuştin, talan, dizî û berberiyê re bûye alîkar.[108]Çend malikên li ser rexnekirina şêx, axa û began bi vî awayî ne:

Xwedêkî bêje beg çiye?
Ji dijminan re bekçî ye

Qey birçî ye, yan bê çi ye?
Na, serbilindî tê de ye
(Begê Dijmin, Sewra Azadî, r.33)

Ta kengî em ê karkerê axa û bega bin
Ta kengî em ê hestiyê ber lingê sega bin
(Ta Kengî Emê Karker û Cotkarê Baga Bin, Sewra Azadî, r.51)

Şêx warisê pêxember û rêberê dîn in
Fatîha belaş li ser miriya naxwînin
(Rencberê Jînê, Sewra Azadî, r.170)

Di helbesta "Mela Rabe" de bangî mela kiriye û ji mela xwestiye helwesta xwe biguherîne. Cegerxwîn aciziya xwe ya ji tevgera mela diyar kiriye û ji ber mela; xulamtiya şêx, axa û dijmin kirine mela rexne kiriye.

Tu xwenda ye, tu zana ye
Xulamê şêx û axa ye

Dixwazim ko li pêş millet
Tu ronî bî, wekî ro bî
(Mela Rabe, Hêvî, r.13)

[108]Cegerxwîn, **Jînenîgariya Min**, r.9.

Herwiha şêx, axa û begên roja xwe rexne bike jî bi gelemperî hesreta demên berê kişandiye, lewma ew mêrxasî û serfiraziya rojên berê aniye zimên. Ev yek dide xuyakirin ku ew, rewşa Kurdan a nebaş bi bêserokbûnê ve girê daye. Li gor wî ji ber tunebûna pîr, mîr û begên Kurdan, Kurd li ber destê dijmin mane.

Eger pîr û mîr û eger beg
Çi Eyûbî, çi Merwanî, çi Bermek

Hemû çûne tenê em mane nêçîr
Jixwe dijmin li pey me her wekî seg
(Cegerxwîn Bes, Agir û Pirûsk, r.28)

Cegerxwîn edîb û rewşenbîrên Kurdan di helbestên xwe de ji bîr nekirine. Hem rewşenbîrên dîrokî hem jî yên dema xwe gelek caran di helbestên xwe de bi bîr anîne. Ehmedê Xanî di helbestên wî de rêberê gelê Kurd e ku hişmendiya Kurdan zêde kiriye. Çi helbestên wî yên neteweperwerî, civakî, evîndarî û felsefî hene, tema çi dibe bila bibe gotina "Mem û Zîn" a Ehmedê Xanî tê de derbas bûye. Cegerxwîn xwestiye bi nirxên civakî û edebî gel ji xewa bêdengiyê hişyar bike. Di helbestên wî de metafora ku herî zêde hatiye bikaranîn, metafora hişyarkirinê ye. Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Siyahpoş, Seyfulmilûk û hwd. jî ji bîr nekiriye. Dîsa rewşenbîrên hemdemên xwe yên wek Osman Sebrî, Qedrîcan jî di helbestên xwe de bi bîr anîne.

Ne pêxemberê me ne Zerdeşt û Mezdek û Manî
Yek rehberê me heye Seydayê Xanî
(Rêberê Me Seydayê Xanî, Agir û Pirûsk, r.59)

Bi rengê dêwê Guhderzî bikin dinya bibî lerzî
Hezar rengê Kemal Fewzî şehîd in, wan ji nû rakin
(Hêj Dey Nakin, Agir û Pirûsk, r.45)

Di helbestên wî de tê dîtin ku bûyerên siyasî û civakî yên dewra wî bandoreke mezin li ser jiyan û kesayetiya wî kirine. Cegerxwîn, di van helbestan de gelek caran bi raweya fermanî gazî serok û rêberên Kurd kirine.Wî di helbesta "Şehnama Şehîdan" a ji 196 risteyan pêk hatiye de li ser çil û du şoreşgerên Kurd (Şêx Seîd, Ûsiv Ziya, Fuad Beg û hwd.) nivîsiye.

Were ey Şêx Seîdê pir minewwer
Bes e, îro tu rabe ey dîlawer
(Şehnama Şehîdan, Agir û Pirûsk, r.92)

Sonda me xwîna Seîd û Qazî
Hetta bi zorê tu min nexwazî
Ez dê binalim hawar û gazi
(Mêrane Rabin Xortên Kurdistan, Sewra Azadî, r.16)

Cegerxwîn welatê xwe şibandiye qîzekî ku dijmin dest avêtiye namûsa wê. Bi hestên şoreşgerî, ji bo wê ji destê dijmin xelas bikin bi qîrîn û hawar bangî xortên Kurd kiriye û gotiye rabin!

Axîn welatêm zanim tu qîz î
Çibkim ko dijmin bite dilîzî
Qêrîn dikim ez kes nabihîzî

Namûs e rabin xortên Kurdistan
Dijmin tev girtin ev bax û bustan
(Mêrane Rabin Xortên Kurdistan, Sewra Azadî, r.16)

Wî, gelek nirx daye axaftina zimanê Kurdî û zanyariya dîrokê. Ji ber ku ew wek hêmanên bingehîn ên netewebûnê ziman û agahdarbûna dîrokê dîtiye, her tim bangî gel kiriye ku xwedî li ziman û dîroka xwe derkevin.

Şerm û esef e, ger tu bi zarê xwe nexwênî
Raborî û şopa xwe li tarîxê nebênî
(Hey Qehreman Milletê Kurd, Sewra Azadî, r.19)

Xwestekên Cegerxwîn ên wek wekhevî, biratiya gelan, aşîtîxwazî, azadîxwazî di helbestên wî de derbirînin. Geh bi fikrên şoreşgerî û serxwebûnê êş û jana gelê xwe aniyê zimên, geh li cem gelên bindest cih girtiye û li ser mafên wan rawestiye.

Em şer naxwazin bimrin şer û ceng
Me natirsênin ev qêrîn û deng
Eger dixwazin silma alemî
Ji axa Qorê derkevin hemî
(Em Şer Naxwazin, Sewra Azadî, r.73)

Fikrên sosyalîzmê gelek li ser wî bandor kirine û riya xelasiyê di sosyalîzmê de dîtiye. Li gor wî Yekîtiya Sovyetê dostê neteweyên bindest e. Wî di gelek helbestên xwe de pesnê Stalîn daye. Di helbesta "Çîroka Zoro Axa" ya ji 195 malikan pêk hatiye de dema bavê Rewşê Şêro, Zoro Axa kuştiye gundî ji zilma axa xelas bûne û gundê xwe kirine kolxoz. Cegerxwîn di vir de xwestiye balê bikişîne ku heke pale û kedkar li hemberî zordestiyê bibin yek wê di têkoşîna xwe de wê bi ser kevin. Di helbesta "Ji Xwedê Divên û Em Firinga Didin" de ya ku ji 88 malikan pêk hatiye dema rejîmeke Marksîst ava bibe wê li welat çawa dewra aramî û xweşhaliyê bê bi deh xalan îfade kiriye.

Kurdo serê xwe rake, dostên me ne Hind û Çîn
Kela mêra li pişt me, paşmêrê me Stalîn
Sewra munezzem çêkin, ji Dêrsim ta bi Hemrîn
Em ê zûzû xelas bin, mizgîn ji bo te mizgîn
(Destê Ismet Şikandin, Sewra Azadî, r.79)

Ew, xwestiye ku gelên Rojhilatê dest bidin hev û ji bo azadiyê di berxwe bidin. Di helbestên wî de nêrîneke enternasyonalîst heye. Ji bo dewra wekhevî û bihevrebûnê bê ew, xwestiye gelên cîhanê dest bidin hev. Lê ew dizanibûye ku riya enternasyonalîzmê bi xwedîderketina neteweyê ve girêdayî ye. Lewma di van helbestan de jî her tim Kurdîtiya xwe aniye zimên. Di “Kurd û Felestîn” de li ser derd û kulên Filîstîniyan (Felestîniyan) ên ji bo welatê xwe dikişînin sekiniye. Bi helbesta “Peymana Tirk û Pakistan” li hemberî emperyalîzma Emerîqa û Ingilîzan xelk hişyar kirine. Ji xeynî van helbestan gelek helbestên wî yên wek “Diyan-Biyan-Fû”, “Naçin Şerê Qorê” û hwd. li hemberî emperyalîzmê hatine nivîsîn. Bi vê helwestê Cegerxwîn biratiya gelan a gerdûnî berbiçav kiriye.

Zû gihande ev Tirk û Pakistan
Da bête xwarin heqqê Kurdistan
(Peymana Tirk û Kurdistan, Sewra Azadî, r.105)

Hin helbestên wî yên peywendiya wan bi otobiyografiyê re hene nivîsiye ku behsa jiyana xwe kiriye. Ji xeynî mînakên ku me li jêr daye di helbestên “Cihê Xwendina Min”, “Ez û Yarê”, “Sîh û Sê Roj di Zindanê de” jî Cegerxwîn bi hêmanên otobiyografîk û bi awayekî lihevhatî risteyên xwe îfade kirine.

Diya min a belengaz pêncî salî dilovan
Salek piştî bavê mine ew jî li wî bû mêvan

Paşê ji Amûdê çûn
Bêdermemo me kir şûn
(Bi Kurtî Jîna Min, Agir û Pirûsk, r.278)

Piştî ku Cegerxwîn dev ji melatiyê berdaye, du gundan ava kiriye û navê gundê ku tê de rûdinê kiriye cehennem.

Me rîş û cibe avêtin
Du gund ava kirin carek

Go: Seyda, ev çi dolab in
Nizanî gundiya nakim
(Kurdistan Ji Min Xeyidye, Aşitî, r.58)

Wî, Kurdistan baş nas kiriye û di gelek helbestên xwe de xweşikiya xwezaya Kurdistanê daye berçav. Ji zinar û bax û bostanan, berên çandinê, ajalan bigirin heta fêkî û nebatan, gul û çîçekan xweşikiya Kurdistanê li ber çavan raxistiye. Di helbestên xwe de behsa çem, deşt, zozan çiya û çolên welatê xwe kiriye ku di her dîwanên wî de temaya xwezaya Kurdistan derbas bûye.

Gulnaz û çîçeka zer, rîhan û hem qedîfe
Beybûn û nêrgiza reş, xweş yasemîn û gulnar
……

Birinc û nok û şolik, nêsk û genim, cehê reş
Têtin di çol û deştan, dara ê Kurd e cotar
(Bilbil Digot, Agir û Pirûsk, r.26-27)

Ka Ferat û kanî Xabûr kanî Dîcle kanî Zab
Kanî Gola Wan û Nazûk, kanî ewqas gêr û gol
(Ka Welat û Al û Ol, Agir û Pirûsk, r.57)

Cegerxwîn helbestên xwe wek ayetên bi Kurdî ditiye û xwestiye helbesta wî di nav civatê de belav bibe. Wî pêwîst dîtiye ku bi vê rêyê perdeya tarî ya li ser gel rabe, gel hişyar bibe. Çimkî derdê welat gelek dijwar e û Cegerxwîn xwe berpirsiyarê pirsgirêkên welat û civaka xwe dîtiye. Perçebûna welat nepejirandiye û berteka xwe bi helbestên xwe nîşan daye. Herçiqas Kurd ne xwedî dewlet bin jî wi her tim behsa Kurdistanê kiriye.

Xêzên me nivîsîne bi xwe ayetê Kurd in
Dê piştî me re ew di civatan de bixwînin
(Ji Kulan Bûme Cegerxwîn, Agir û Pirûsk, r.51)

Li ser sînga te sê çar xet kişandin
Wekî berzex ji hevdî raqetandin
Li her alî milên me raşidandin
(Welat Derdê Te Dijwar e, Sewra Azadî, r.41)

Di dîwanên wî de ji her çar kitêbên pîroz ên tên qebûlkirin *Tewrat, Kur'an/Firqan, Încîl* derbas bûne. Digel vê navê Mûsa, Îsa, Mihemmed Pêxember derbas bûne, lê ne navê Dawid Pêxember ne jî kitêba Zebûr a jê re hatiye derbas bûye. Wî, ji dêvla wê behsa Zerdeşt an jî Manî kiriye û ji bo çar kitêban jî ji dêvla *Zebûr*ê cih daye *Avesta*yê. Wer xuya ye, ev nêzîkahî ji ber baweriya Kurd bi eslên xwe Aryan in hatiye. Ew raman ji aliyên gelek dîroknasên Kurd ên neteweperwer ve hatiye pejirandin.

Ez im pîrê mixan îro tu guhderê li tefsîlê
Çibkim îro bi Tewrat û bi Firqan û bi Încîlê

Ne Mûsa ma, ne Îsa ma, ne Zerdeşt û ne Taha ma
Kufir nîn e di vê wextê bi hikmê serf û tehwîlê
(Ez im Pîrê Mixan, Agir û Pirûsk, r.182)

Helbestên Cegerxwîn, di salên siyî de kovarên wek *Hawar, Ronahî, Roja Nû* de hatine weşandin. Bi taybetî jî di sala 1932an de kovara *Hawar*ê ya ji aliyê Mîr Celadet Elî Bedirxan ve hatiye weşandin. Ev yek bandor li ser şewaza helbestên Cegerxwîn kiriye.[109] Di jimara yekem a *Hawar*ê de ji sernavê "Armanc, Awayî Xebat û Nivisandina Hawarê" tê fehmkirin ku şertên hebûna neteweyê, danasîna Kurdî ye.[110] Cegerxwîn di helbesta xwe ya bisernavê"Ji Hewarê re" de pesnê vê kovarê daye û xwendina wê pêşniyar kiriye. Di helbesta xwe ya bi navê *Ji Xwediyê Hawarê re* pesnê Celadet Elî Bedirxan daye û li ser edîb û jîrektiya wî rawestiye.

[109] Ömer Faruk Yekdeş, **Nazım Hikmet ve Cegerxwin de Aşk Şiirinin İdeolojisi**, (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Bilkent Üniversitesi Türk Edebiyatı Bölümü, Ankara, 2008), r.36.
[110] Ji bo agahiyên berfireh bnr."Armanc, Awayî Xebat û Nivisandina Hawarê" **Hawar,** (j.1), Nûdem, Stockholm, 1998.

Qelen kêm e û erzan e pêsed qirûş
Bixwazin ji Alî Celadet bi xar
(Ji Hawarê re, Agir û Pirûsk, r.147)

Çi hewce ye ko bêjim çêtir ji min dizanin
Hawar çiqas delal e naket li me delalî
(Ji Kiryarên Hawarê re, Agir û Pirûsk, r.150)

Cegerxwîn tenê neteweperestiyê berçav nekiriye, ew rê û rêbaza têkoşînê û rizgariyê jî bi helbestên xweî fade kiriye. Li gor wî divê berî her tiştî ji nezaniyê xelas bibin û riya îlim û zanyariyê bigirin. Di vê mijarê de jî şêx û melayan rexne kiriye, wan sedemê cahilmayina Kurdan dîtiye. Çimkî şêx û melayan xwendin wek guneh dane xuyakirin, ciwan tirsandine û riya xwendinê li ber gel girtine.

Şev û rojan bixwînin, bibin serbest û zana
Tovê jînê biçînin, ji bo dîl û nezana
Carek hon dê bibînin van bexçe û rezana
Kurdistan derênin ji destê wan dizana
(Dezgirtiya Xortan, Agir û Pirûsk, r.16)

Helbestên wî bi gelemperî hêmanên satirîk di xwe de hewandine. Ew ji ber ku xwestiye bêdengiya serdema xwe bişkîne û li ser yekîtiya Kurdan bandorê bike, carinan bi zamanekî tund bêkêriya Kurdan rexne kiriye.

Ji dijminan re egîd û comerd û navdar in
Ji xwe re parsek û bêmirês û pergal in
(Xewa Birçiyan Nayê, Agir û Pirûsk, r.22)

Ji dijmin re dibî rencber
Bi paş de mayî bê rêber

Ji bo dijmin dibî şevger
Bes e îdî weha nabî!?
(Hetta Kengî di Xewda Bî, Şefaq, r.11)

Wî piştperdebûna jinê rexne kiriye û xwestiye ku jin di qada jiyanê de bi mêran re wek hev be. Di helbesta xwe ya "Jin, Jîn û Jîndarî"de erk û rola jinê diyar kiriye û ji bo ku jin ji rewşa bindest xelas bibe xwendinê wek çareserî dîtiye.

Hezaran ji salan tu piştperde ma
Perîşan û bindar û pejmerde ma
…..

Bixwe hem bixwîne, bixe dest xwe dar
Li bin destê mêran nemêne hejar
(Jin, Jîn û Jîndarî, Zend-Avista, r.18)

Ji ber ku di folklora Kurdan de erotîka her tim hebûye Cegerxwîn jî li ser vê mîratê hin helbestên xwe yên evîniyê hûnandine û deriyê erotîzmê ji helbesta xwe re vekiriye. Di van helbestan de pirî caran dema tesewira yarê kiriye; diran wek birinc, birû kevan, lêv gulên sor, xonce, erxewan, memik sêvên sor in.

Bi lêv û dev kelaco ye
Kevan ebrû perî ro ye
Şêrîn gotin, piling xo ye
Memik sêv û tirincî ne
(Gulî Şengê, Şefaq, r.145)

Hin berhemên Cegerxwîn, berî wefata wî li Şam, Bexdad, Beyrût û Stokholmê hatine çapkirin. Di navbera salên 1980 – 1984an de çar dîwanên wî çap bûne (Ronak 1980, Zend-Avista 1981, Şefeq 1982, Hêvî 1983) û hin jî piştî wefata wî hatine çapkirin. Hejmara berhemên wî yên çapkirî 22 ne. Di dawiya berhema Cegerxwîn *Jînenîgariya Min de* bîst xebatên hatine çapkirî cih girtine. Lê ev behrem

ji ber ku di sala 1995an de derketiye, piştre 2 berhemên wî yên din jî hatine çapkirin. Li gor dîroka derketinê berhemên wî yên heta niha hatine çapkirin ev in:

1- Dîwana Yekem, Prîsk û Pêtî, ç. 1, Şam, 1945. (helbest)

2- Cîm û Gulperî, ç. 1, Şam, 1948. (çîrok)

3- Dîwana Duyem, ç. 1, Sewra Azadî, Şam, 1954. (helbest)

4- Reşoyê Darî, ç. 1, Şam, 1956. (çîrok)

5- Gotinên Pêşiyan, ç. 1, Şam, 1957. (lêkolîn)

6- Awa û Destûra Zimanê Kurdî, ç. 1, Bexda, 1961. (rêziman)

7- Ferheng, Beşa Yekem, ç. 1, Bexda, 1962.

8- Ferheng, Beşa Duyem, ç. 1, Bexda, 1962.

9- Dîwana Siyem, Kîme Ez, ç. 1, Beyrûd, 1973. (helbest)

10- Salar û Mîdya, ç. 1, Beyrût, 1973. (çîrokek helbestî)

11- Dîwana Çara, Ronak, ç. 1, Roja Nû, Stockholm, 1980. (helbest)

12- Dîwana Pênca, Zend-Avista, ç. 1, Roja Nû, Stockholm, 1981. (helbest)

13- Dîwana Şeşa, Şefaq, ç. 1, Roja Nû, Stockholm, 1982. (helbest)

14- Dîwana Hefta, Hêvî, ç. 1, Roja Nû, Stockholm, 1983. (helbest)

15- Dîwana Heşta, Aşitî, ç. 1, Roja Nû, Stockholm,1985. (helbest)

16- Tarîxa Kurdistan, c. 1, ç. 1, Roja Nû, Stockholm, 1985.

17- Tarîxa Kurdistan, c. 2, ç. 1, Roja Nû, Stockholm, 1987.

18- Folklora Kurdî, ç. 1, Roja Nû, Stockholm, 1987.

19- Jînenîgariya Min, ç. 1, Apec, Stockholm, 1995.

20- Nivîsarek li ser Dîbaca Ehmedê Xanî, ç. 1, Apec, 1995, Stockholm.

21- Şerefnameya Menzûm, ç. 1, Amîral, Bêrûd, 1997. (helbest)

22- Tarîxa Kurdistan, Împeratoriya/Dewleta Kurdî Eyûbî, c. 3, ç. 1, Roja Nû, Stockholm, 1999.

Li Tirkiyê wergera Tirkî ya helbestên wî yekem car ji aliyê Gani Bozarslan ve di sala 1970an de hatine belavkirin.[111] Hê 30 destnivîsên wî yên neçapkirî hene, ew jî li Siwêdê li cem kurê wî Keyo ne.[112] Ji xeynî van berheman di 1961an de dema Cegerxwîn piştî rejîma Nûrî Seîd li Zanîngeha Bexdayê ji bo xwendekarên Kurd ders dane Wezareta Iraqê ya Çandî berhema Cegerxwîn a bi navê *Klavûza Kurdî û*

[111] Metin Yüksel, "Qêrîn Dikim Ku Şiyar Bî: Helbest û Siyaseta Şiyarkirinê Ya Cegerxwîn", Fexriye Adsay (wer.), **Zarema**, ( j.6), Diyarbekir, 2016, r.31-32.
[112] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.18-19.

*Rêbazên Hînbûnê* bi tîpên Erebî û bi zimanên Kurdî çap kiriye.[113] Yusuf Kaynak di pirtûka xwe ya *Jinenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî* de behsa 16 berhemên çapkirî û 23 berhemên Cegerxwîn ên neçapkirî kiriye, lê navê mijara teza me ya *Şerefnameya Menzûm* tê de derbas nebûye.

### 1.2.2.1.Çavkaniyên Helbesta Cegerxwîn

Helbestên Cegerxwîn bingeha xwe ji helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî girtîye. Helbestvanê koma Muelleqatê jî ji bo helbestên wî bûne îlham ku Cegerxwîn bixwe ev xal destnîşan kiriye. Ew gotiye:“Muelleqat,[114] ji aliyê herkesî ve dihate xwendin. Min jî pir ji wan hez dikir û dixwendin, ji ber ku min bi Erebî baş dizanî. Ji bilî van helbestan jî min nivîskarên Kurd ên klasîk ên bi nav û deng wek Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî jî dixwend.”[115] Di helbesta bi navê “Sebebê Çêkirina Ristê Mîn” a dawiya dîwana wî ya sêyem de hatiye derxistin ku helbestên Cegerxwîn ên ewil bi teqlîda helbestên Melayê Bateyî û Xanî dest pê kiriye.[116] Nemaze li ser herdu dîwanên wî yên pêşî bandora Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî xuya ye. Ji ber ku Cegerxwîn zêde bi wan ve hatiye girêdan; derketina wî ya ji bin baskên wan pir zor bûye. Di helbesta xwe ya bi navê “Ji Wanî re” ku ji helbestvanê Kurd ê hevdemê xwe Wanî re nivîsandiye, berê xwe daye xelkê û ji wan re gotiye ku herdu Ehmedan (Cezîrî û Xanî) ew ji wan re kirine rêber û rênas: [117]

Du Ehmed, min ji bo we kirne rêber
Cizîrî yek ewê dî Xaniyê min
(Ji Wanî re, Agir û Pirûsk**,** r.165)

Cegerxwîn xwe wek mîratgirê Cizîrî û Herîrî ditiye. Li ser şopên helbestvanên serdema klasîk helbestên xwe hûnandine.

---

[113] Ordîxanê Celîl, **Cegerxwîn’in Yaşamı ve Şiir Anlayışı**, Edib Polat (wer.), Evrensel Basım, İstanbul, 2004, r.36.
[114] Muelleqat, wan helbestên romantîkî ne ku berî Îslamiyetê bi forma qesîdê hatine nivîsîn. Wan helbestan bi gelemperî li ser jiyana bedewiyên Erebîstana kev in.
[115] Yusuf Kaynak, **Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî,** r.23.
[116] Rojen Barnas, “Uyanış ve Aydınlanma Şairi Cegerxwin” r.517.
[117]Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.13.

Cizîrî û Herîrî çûn ji meydan
Di ristê da Cegerxwîn bû cihangîr
(Pîrî ne Kêmanî ye, Hêvî, r.166)

Cegerxwîn jî Kurd û Kurdistan wek *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî daye ber hevudu. Ehmedê Xanî (1650-1706) di sala 1695an de *Mem û Zîn*bi forma menzûm bi malikan wek epîkek neteweya Kurd nivîsiye. Resenê *Mem û Zînê* bi tîpên Erebî û bi zaravayê Kurmancî ye.[118] Di helbesta Cegerxwîn a "Qulingê Perşikestî" de nêzikahiya Cegerxwîn a li hemberî quling şopên Evdalê Zeynikê yên xwedîkirina qulinga perşikestî tîne hişê mirov.[119] Cegerxwîn bi vî awayî kariyera xwe ya helbestê bi helbesta Kurdî ya klasîk ku di medreseyê de xwendibû nivîsandiye.[120]

Ji çavkaniyên helbestên Cegerxwîn yek jê jî *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî ye ku li ser hîmê *Şerefname*yê, *Şerefnameya Menzûm* nivîsiye. Di vî warî de Cegerxwîn di helbestên xwe de gelek hêmanên dîrokî bi kar anine.

Ew carinan kesayetiyên ku di dîrokê de bûne bi nîşan û sembol aniye zimên ku ji bo qîmeta dîroka Kurdan destnîşan bike. Şexsiyetên dîrokî yên di *Şahname*ya Fîrdewsî de derbas bûne ne tenê di dîroka Îranê de wek xwedî roleke mezin bi bîr aniye (Guhderz, Restem, Ferhad,....). Wî xwe bi wan serbilind dîtiye ku ew bapîrên Kurdan û lehengên wan in. Cegerxwîn xwe bi Kawayê Hesinkar ê Newrozê ji Kurdan re kiriye semboleke neteweyî payebilind dîtiye.[121]

Cegerxwîn, hişyarkirina milletê xwe di nav perspektîfeke dîrokî de, di nav do û îro de pêşkêş kiriye. Vê pêşkêşiyê ji bo nasnav û helwesta netewî, noqteyeke hereketê damezrandiye. Lê nakokiyek jî bexşî Cegerxwîn kiriye ku mîr, beg, şêx û melayên do xurtemêr û canfîda bûne û heman kes îro bûne qelsemêr û xwînmij. Kitêba *Şerefnameya Menzûm* bi hemû leheng, mîr, bajar, sirûşt, jiyan, dilşadî û dewlemendiya xwe ve yadkirina wan xurtemêr û dilbijiya wan serdeman pêk hatiye.[122]

Ji aliyê din ve dema neseba Eyûbiyan destnîşan kiriye, gotiye ku ew Rewadî ne û daye zanîn ku wî zanyariyên xwe ji kitêba "Ibnu'l-Esîr, el-Kamil Fi't-Tarîx"

[118] Yusuf Kaynak, **Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî,** r.138-139.
[119] Ordîxanê Celîl, **Cegerxwîn'in Yaşamı ve Şiir Anlayışı**, r.41.
[120] Metin Yüksel, "Qêrîn Dikim Ku Şiyar Bî: Helbest û Siyaseta Şiyarkirinê Ya Cegerxwîn", r.30.
[121] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.53.
[122] Ramazan Alan, "Em di Eyna Dîrokê de" r. 226-227.

stendine. Gava ku em herdu deqên Ibnu'l-Esîr û helbesta Cegerxwîn bidin berhev, tê dîtin ku heke ne ji hin pêdiviyên pêkanîna wêneyên edebî û avakirina hîmên helbestê ba, wê bihata dîtin ku herdu deq wek hev in. Ji aliyekî din ve ew peywendiya di navbera Şêrgoh û Selaheddîn de teqeze kiriye û bandora Şêrgoh li kesayetiya Selaheddîn destnîşan kiriye.[123] Di derheqê Eyûbiyan de di *Şerefname*yê de jî gelek agahiyên hêja hene ku Şerefxan wan bi serweriya wan daye berçavan.

Bêguman di mijara şanazîkirina dîroka Kurdan de helbesta herî navdar "Kî Me Ez" a Cegerxwîn e. Ev helbest seranser li ser nêrîna romantîk hatiye hûnandin. Di vê helbestê de lehengê herî bihêz ê Cegerxwîn Selaheddîn e. Helbestvan serfiraziyên Selaheddîn yek bi yek jimartiye û li ser hisabê Kurdayetiyê şanazî pê aniye. Selaheddîn ew kese ku leşkerê Richard şikandiye û hemû Rojhilata Navîn parastiye. Tirk û Eceman xwe dane ber siya wî û padîşahan serê hespê wî girtiye. Di helbesta Cegerxwîn de ji bilî Selaheddîn, Erdeşêr û Nûşîrewan ji pehlewanê dîroka Kurdan in. Di serdema wan de sînorên hikumraniya Kurdan berfireh bûye û Kurd ji Hind û Yewnanan xeracê stendine. Bi vî awayî Cegerxwîn di dîroka Kurdan de behsa serdemeke zêrîn kiriye û ji bo avakirina paşerojeke geş tabloyeke romantîk pêşkêş kiriye.[124] Wî, dema ku helbestên şoreşgerî nivîsiye ji helbestvanên Kurd ên Faîk Bêkes, Pîremêrd û Hacî Qadirê Koyî sûd wergirtiye û wan wek rêberê xwe dîtiye.[125]

Cegerxwîn, ji van helbestvanan zedetir nêzî Hecî Qadirê Koyî ye ku di helbestên wan de gelek xalên hevpar tên dîtin. Her du helbestvan jî edebiyatê kirine navenda karûbarên siyasî û civakî. Helbesta wan di bin xizmeta hişyarkirina gel, afirandina fikra netewî, nasandina pêşhatên cîhanê, ji bo xwendin û zanistên pozîtîf teşwîqkirina gel, dijberkirina diyardeyên kevin û dijayetiya nûnerên civaka paşdemayî de ye.[126] Li gor van tespîtan Cegerxwîn wek peyrewê Hacî û li ser şopa rewşênbîrên Ewropî ji pêşengên romantîzma neteweyî ye. Di helbesta nû ya Kurdî de ji wek damezrînerê îdeolojiyeke nû hatiye dîtin.

Cegerxwîn, bihayek giran daye helbestên li ser dîrok û şerê Kurdan ê ji bo serxwebûnê. Bedirxaniyên Cizîra Botan, Pêşewa Qazî Mihemmed, Şêx Seîdê Pîran,

---

123 Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.133.
124 Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.24.
125 Ordîxanê Celîl, **Cegerxwîn'in Yaşamı ve Şiir Anlayışı**, r.66.
126 Zülküf Ergün,"Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn", r.31.

Dr. Nûrî Dêrsimî, General Mistefa Barzanî, Dr. Fûad, General Îhsan Nûrî Paşa, Simkoyê Şikakî, Şêx Mehmûdê Berzencî û hwd. ji wan kesan in ku navê wan di helbestên Cegerxwîn de tên dîtin.[127] Bi gelemperî Cegerxwîn pişta xwe daye dîrokê û ji tiradisyonê sûd wergirtiye. Bi vî awayî xwestiye hişmendiya gelê Kurd zêde bike, esl û koka Kurdan berbiçav bike. Wî ji bo xelasiya ji mêtingeriyê, paşxaneya dîrokê li ber çavên gelê Kurd raxistiye. Ji aliyê din ve piştî Cegerxwîn îdeolojiya Marksîzmê pejirandiye, berê xwe daye bûyerên dîrokî yên têkiliya wan bi Komunîzmê ve hene.

Ji aliyê din ve di navbera wî û hin nivîskarên hemdemê wî de hin xalên hevpar tên dîtin. Ew, ji ber ku di bin bandora fikra sosyalîst de maye, helbestên wî cih bi cih dişibin helbestên Nazim Hîkmet. Wek mînak li ser stranbêjê reşik Pol Robson, hem Cegerxwîn bi navê "Heval Pol Robson" hem jî Nazim Hîkmet bi navê "Tirs(Korku)" helbest nivîsiye. Bi heman awayî Abdulla Goran jî bi navê "Bangêk bo Ropsin" bi hestê humanîst û bi helwesta dij- mêtinger helbestekî nivîsiye. Ji aliyê mijarê ve bi helbestvanên wek Nerûda, Aragon ên di edebiyata dinyayê de hatine zanîn û ji helbestvanên civakparêz-realîst ên wek Huseyîn Korkmazgîl, Hasan Îzzettîn Dînamo, Ehmed Arîf ve li ser hin mijarên hevpar nivîsiye. Sedema vê yekê pejirandina fikrên wî yên Marksîst û Sosyalîst in.

### 1.2.2.2. Şerefxanê Bedlîsî Di Helbestên Cegerxwîn de

Cegerxwîn di gelek helbestên xwe de cih daye serok û rêberên Kurdan ku di nav wan de Şerefxanê Bedlîsî cihekî girîng girtiye. Diyar e ku berî dest bi nivîsandina helbestan bike Cegerxwîn *Şerefname* xwendiye û di bin bandora wê de maye. Lewma dîwana xwe ya dawî bi paşxana *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî nivîsiye. Di heman demê de mirov dikare bibêje ku çawa Şerefxan di dawiya *Şerefname*yê de jînenîgariya xwe daye, Cegerxwîn jî di dawiya dîwana xwe ya yekem *Agir û Pirûsk* de bi navê "Bi Kurtî Jîna Min" behsa jînenîgariya xwe kiriye. Ji xeynî vê yekê çawa Şerefxan di dawiya *Şerefname*yê de ji kurê xwe re hin nesîhetan kiriye. Cegerxwîn jî di helbesta"Ji Keyo re"de bi risteyên xwe ji bo kurê xwe nesîhetan rêz kiriye. Bi heman awayî Şerefxan nexşeya Kurdistanê di *Şerefname*yê de diyar kiriye, Cegerxwîn jî di helbesta xwe ya "Kurdewarî" de nexşeya Kurdistanê

[127] Kakşar Oramar, "Seyda Cegerxwîn Azadîxwazê Neteweyî û Helbestvanê Rewşenbîrîya Netewî Di Nava Kurdan De", http://www.kncsite.com/kurdi/latin/cgerxwen.pdf

bi malika “Welatê te ji Derya Spî ta biçî Pingava Hurmiz/Û ji Sêwas diçî ta dighête bi Taran û Rey Rey (Kurdewarî, Aşitî, r.55)” diyar kiriye.

Şerefxan di *Şerefname*yê de armanca nivîsandina *Şerefname*yê daye, Cegerxwîn jî bi heman nêrînê di helbesta“Sebebê Çêkirina Ristê Min”de armanca nivîsîna helbestên xwe bi van risteyên;“Wextê min dî qewmê Kurdî pir delal/Ew di nav ehlê cihan de bê heval/Ba sexawet, ba diyanet ba hiner/Min li goşê lewhê qelbim kir xeter/Ko beyan kim esl û ewsafên di wan/Milk û hikm û padîşah û hem ziman/Da belaxetgahê çûme pêşî ye/Da nabêjin:Qewmê Kurdî wehşî ye (Sebebê Çêkirina Ristê Min, Kî Me Ez, r.318)″vegotiye. Hin mînakên helbestên wî yên behsa Şerefxan kirine ev in:

Binêrin hon cihê textê Şerefxan
Xerab bûye ji destê lawê Tûran
(Şehnama Şehîdan, Agir û Pirûsk, r.90)

Dema xweşikiya dîlberê aniye zimên ji bo esaleta wê berbiçav bike eniya wê şibandiye taca Şerefxan.

Çîn çîn e zilf û reyhan, enî taca Şerefxan
Ebrû kevan û eywan, rû gulgeş e di kaşa
(Ava Heyatê, Agir û Pirûsk, r.235)

Bi heman awayî şan, şeref û xweşiya serdema Şerefxan bi van risteyan hûnandiye.

Ger dil û canê Cegerxwîn şah Selaheddînê Kurd
Ger tu Betlîsa welat î, ez Şerefxanê te me
(Ava Heyatê, Agir û Pirûsk, r.235)

Di helbesta“Pêncika Min û Zibêrê Kurd”a ji bo Celadet Elî Bedirxan nivîsiye jî Cegerxwîn, tevî navê Kawisê Zêrînkulah û Ristem cih daye navê Şerefxan jî û wî wek serwerekî cihanê daye xuyakirin.

Ey şahê elîcenab, wey hakim û bextiyarê Kurd
Wey Şerefxanê cihan, wey bingehê hawarê Kurd
(Pêncika Min û Zibêre Kurd, Agir û Pirûsk, r.170)

Ji xeynî van mînakan serfirazî û aramiya serdema Şerefxan di helbestên "Şekerlêvê", "Sertaca Keyan"de derbas bûye û di helbesta "Beganê Bedlîsê" de bi herdu malikên dawî li ser dîroknivîsiya wî sekiniye. Cegerxwîn, xwe bi vê meziyeta Şerefxan serbilind kiriye.

### 1.2.2.3. Di Helbestên Cegerxwîn de Şêwaz û Ziman

Cegerxwîn helbestên xwe bi zimanekî sade û belaxet nivîsandiye. Di serî de ji ber di bin bandora Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî de maye kêşeya êrûza Erebî bi kar aniye. Lê dema ew û Celadet Bedirxan hevudu naskirine û Celadet jê xwestiye ku stîla nivîsandina xwe biguherîne Cegerxwîn berê xwe daye helbesta nûjen.[128] Ji vê pê ve bi gelemperî kêşeya kîteyî bi kar aniye. Di helbestên wî de riste di dawiyê de bi hev ve hatine girêdan ango bi kafiye hatine nivîsîn.[129]

Helbestên wî bi kêf û coş tên xwendinû ji van helbestanên wek "Kurdistan im Ka, Kî Me Ez, Lorî, Ez Nizanim Çi Bêjim, Helbest, Jîn û Hebûn, Agirê Evîndarî, Ez û Yar, Nûroz e û Ferat im-Kêferat"im bûne bingeha stranan ku helbestên wî ji bo stranbêjên Kurd, çavkaniyên hêja ne.

Wî di helbestên xwe de hin peyvên Erebî û Farisî bi kar aniye. Di hin helbestên wî de peyvên ji zimanê Tirkî, Fransî, Îngilîzî jî tê dîtin. Peyv û termên biyanî yên wek"kerneval, pîano, senfonî, garson, mekanîk, otmatîk, mîtralyoz, borcewaz, futoxraf, ebrû, zulf" jî di helbesta Cegerxwîn de cihê xwe girtine. Ji ber salên xwe yên dawî li Swêdê derbas kiriye di helbesta"Flîka flîka kom tîl mî"de ( keçê keçê were ba min) wek dubare risteya"Flîka flîka kom tîl mî"bi Swêdî nivîsiye.

Ji xeynî zimanên biyanî di helbestên xwe de peyvên Soranî yên wek "çon, belam, mindal, şeqam, heste, estêre"jî bi kar aniye û helbestên wî yên bi navê "Lê Xewî Xeflet Helse, Zilma Bêgane Debînim, Bersiva Ebedil-Xaliq Esîrî û Reş Mepoşe"bi zaravayê Soranî hatine nivîsîn.

[128] Cegerxwîn di *Jînenîgariya Min de* bi berfirehî behsa vê rewşê kiriye û li Amûdê li ser pêşniyara mîrê Botanê çawa şêwaza xwe guherandiye daye diyarkirin (r.177-178).
[129] Metin Yüksel, "Qêrîn Dikim Ku Şiyar Bî: Helbest û Siyaseta Şiyarkirinê Ya Cegerxwîn", r.28.

Ji bo lihevanîna kîteyên risteyan û ji bo serwayê çi dengdêr çi dengdar tîpên hin peyvan nehatine nivîsîn. Peyv di nav helbestê de bi çend awayên wek “şa/şah, çiqa/çiqas” hatiye bikaranîn. Cihên dengdêrên nehatine nivîsîn wek di mînaka“Koma wan j’hev bela bû”de tê dîtin bi hêmaya birînê/apostrof (‘) hatiye diyarkirin.

Cegerxwîn gelek peyvên wek “koma kera, zira kerê, lota devê, çirto-virto, hirç, hov, kerê reş, seg, gayê beş, mîkrob û hwd.” ên di jiyana rojane de derbas bûne bi kar anîne. Digel vê biwêjên wek“Giyayê hewşê tal e/Xwediyê miriya kor e/Bûkê didî tûtûk/Çiqa dûr e bi nûr e”ji bo vegotinê xurt bike xistiye nav helbesta xwe. Di gelek helbestên xwe de jî ji bo xurtkirina vegotinê ji dubarekirina peyvên wek “şox û şeng, mûm û find, gale gal, lave lav, xum xum, guv guv û hwd.”sûd wergirtiye. Gelek cureyên hunerên edebî yên wek îstîare, teşbîh, teşxîs, mubalexe jî di helbestên wî de tên dîtin.

Termînolojiya civakî û siyasî ya çepgir jî di helbestên wî de berbiçav in. Peyvên wek “Markis, Markisî, Lenîn, Stalîn, demuqrat, heval, pale proleter, karker, cotkar, burjuwazî (borcewaz), rêncber, dîl, belengaz, bindestî, zordestî, sewra oktobir, wekhevî, sermayedar û hwd.” di helbestên wî de xuya ne.

### 1.2.3.Cihê Helbestên Cegerxwîn di Edebiyat û Dîroka Kurdî de

Cegerxwîn xwestiye ku helbestên wî ji bo civaka wî bibe neynikek. Lewma wî her êşên gelên xwe di helbesta xwe de vegotiye. Ew mîna pendiyarekî/ hekîmekî pêşeroja welat û civakê zanibe şîret li gelê xwe kirine. Mîna rêberekî riya rast bide ber xelkê Kurd ku ji vê tarûmariyê xelas bibin. Ew ecêbmayî maye ku çawa ewqas êş û azar nikaribûne wan di riya rizgariyê de bikin yek!! [130]

Herçiqas ji çanda medreseyê hatibe jî wi bi helbestên xwe yên sekuler di edebiyata tesewwûfa klasîk a Kurdî de şikestineke epîstemolojîk çêkiriye. Helbestên wî hem bi naverok hem jî bi ruxsarî ji helbestên serdema klasîk cudatirin bûne. Helbestên wî bi meyla tradîsyona romantîk hatine hûnandin. Piştî Hecî Qadirê Koyî bi sed salan Cegerxwîn jî riya romantîzma neteweyî bi kar aniye. Helbestvanên romantîk ên Kurd jî wek rewşenbîr û edîbên Frensî bi têkoşeriya xwe derketine pêş û

---

[130] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.251.

rêberiya felsefeya nû ya jiyanê kirine.[131]Ji bo hemû tezaxûrên bindestiyê û çareseriya wê, lazim e mirov li benda Cegerxwîn be. Bi rastî jî ew yekemîn helbestkarê ji fikra mêtinkariyê rizgar e. Di wî de şertê îttifaqê, wek qonaxên tekamûleke şexsî, qulibiye ser şoreşeke çînî.[132]

Armancên wêneya hunerî ya Cegerxwîn pirr reng e, lê ji bo navtêdana xortan, kesayetiyên dîrokî bi kar anîne ku ev bi vî awayî zêdetir bi pêş ve çûye û helbesta wî bûye xwediyê nirxeke bilind.[133] Wek ku me li jor gotiye û ji berhemên wî jî xuya ye ku wî, di bin siya dîrokê de helbestên xwe nivîsîne. Wî, bi helbestên xwe yên dîdaktîk bandor li ser gelê Kurd kiriye. Rojen Barnas di gotara xwe ya bi navê“Cegerxwîn Helbestvanê Ronakbûn û Hişyarî yê”de girîngî û mezinahiya helbesta wî wisa rave kiriye:“Girîngî û mezinahiya wî, ev e ku deriyê helbesta têkoşînê ji edebiyatê re vekiriye. Heta heyama Cegerxwîn helbesta Kurdî pêncsed-şesed salî li dû xwe hiştiye; xuya ye ku di wê demê de hê behsa dewlet û zimanên modern ên îro nehatiye kirin.”[134]

Cegerxwîn wek ku ji jînenîgariya wî jî diyar e, di cografyaya jiyaye bûye şahidê gelek bûyerên dîrokî. Gelek serûbinbûnên civakî û şikestinên dîrokî pêk hatine. Şerê Cîhanê yê Yekemîn, Şoreşa Oktobirê ya li Rûsyayê, avabûna netewe-dewleta Tirkî, serhildana Şêx Seîd, dagirkirina Frensayê ya Sûriyê, perçebûna cografyaya Kurdan, Şerê Cîhanê yê Duyem, avabûn û hilweşîna Komara Kurdistanê li Îranê, Şoreşa 1958an a li Iraqê ji wan şikestinên sereke ne. Van bûyeran tesîr li wî kirine, şikestin pêk anîne û ji bo krîstalîzekirina êşên wî bûne dînamîkên xurt. Ew li pêvajoya avabûna netewe-dewletan rast hatiye ku Kurd ji vê yekê bêpar mane û hewldanên wan şikestine. Enteljensiya Kurdan a wê demê jî ketiye nav liv û tevgeran ku saziyên siyasî, çandî pêk anîne û kovar, kitêb û hwd. çap kirine. Cegerxwîn jî çi di nav van saziyan de çi aktîf çi ne aktîf cih girtiye. Di avabûna paşxaneya teorîk a helbesta wî de van fikran cihekî girîng girtine.[135]

---

[131] Zülküf Ergün,“Di Helbesta Kurdî di Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn”, r.26.
[132] Ramazan Alan, “Em di Eyna Dîrokê de” r.224.
[133] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.269.
[134] Rojen Barnas, “Uyanış ve Aydınlanma Şairi Cegerxwin” r.511.
[135] Mîkaîl Bilbil, **Helbesta Cegerxwîn û Îqtidar**, r.20.

# BEŞA DUYEM

## REWŞA SÎYASÎ YA SERDEMÊN ŞEREFNAME Û ŞEREFNAMEYA MENZÛM HATINE NIVÎSÎN

## 2.1.ŞEREFNAME

### 2.1.1. Di Sedsala XVI. de Rewşa Kurdan

Pêwîst e ku bi kurtasî li dîroka Kurdan a berî sedsala XVI. binêrin ku rewşa Kurdan a siyasî û civakî baştir bê fehmkirin. Bi awayekî giştî, dîroknas li ser wan wek yek ji şaxê Îranî yê malbata mezin a gelên Hînd-Ewropî bi hesibînin li hev kirine. Di dema heyamên berî zayinê de, qiraliyetên bi navê Mîtanî, Kasît, Hûrî li ser axa çiyayî ya di navbera deşta Îranê û hewza jorîn a Firatê de xwedî desthilatdariyê bûne. Di sedsala VII. a b.z. de, Medên Kurd tên hesêb wek çawa ku Golois Fransî tên hesêb, împeratoriyekê ava kirine. Ew jî b.z. di sala 612an de desthilata Asûriyan ji holê rakirine. Ew li hemî Îranê û Anatolya Navîn bûne xwedî desthilat. Heta belavbûna îslamê, pêşeroja Kurdan, ku cografyanas û dîroknasên Grekî ji wan re gotine Karduk/Carduques (an Kardoukhoy) dê bi ya gelên din ên împaratoriyên li ser axa Îraniyan li pey hev ava bûne; Selçûkî, Partî û Sasaniyan ve girêdayî mane.[136] Digel vê yekê gelek hîpotezên li ser eslên Kurdan hatine gotin hene. Ev hîpotez wek mînakên Kurd têkiliyekî efsanewî ya di navbera cin û xulamên Qral Silêman de çêbûne bigirin heta ku hatiye gotin ku Kurd bi eslên xwe Ereb an jî Tirk in.[137] Şerefxan di vî warî de diyar kiriye ku gelek rîwayetên cuda cuda li ser esl û civaka Kurdan hene. Ew, ji van rîwayetan behsa peywendiya Kurdan a bi Dehhaq re çawa encam daye kiriye. Digel vê li gor rîwayeteke din sedemê bi navkirina Kurdan a bi vî navî cesareta wan a bêhed û bêhesab e.  Rîwayeteke din a Kurd ew civaka cinan e ku Xwedê perde ji ser wan rakiriye jî daye.

Ji ber girîngiya weziyeta jeostratejîk a Kurdistanê gelê Kurd, bi sedsalan merûzî dagirkeriyên bêdawî hatine. Li hemberî dagirkeriyên biyanî mecbûr mane ku şer bikin. Şerefxanê Bedlîsî, sînorên Kurdistanê wisa rave kiriye:

---

136Kendal Nezan, “Bi Awayekî Giştî Dîroka Kurdan”,https://www.institukurde.org

137 Jemal Nebez, **Kurd (Dîrok û Kultura Wan)** Ergîn Opengîn (wer.), Avesta, Stenbol, 2008, r.22.

“Sînorên Kurdistanê ji ser qeraxên Behra Hurmuzê -ku dikeve ser Okyanusa Hîndî- dest pê dike û ji wir xeteke rast dikêşe û tê heta digihîje herêma Melatye û Mereşê. Welatê Faris, Iraqa ‘Ecem, Azerbaycan, Ermenîstana Biçûk û Ermenîstana Mezin dikevin milê bakurê vê xeta han. Iraqa ‘Ereb, Mûsil û Diyarbekir dibin başûrê vî sînorê han. Ji derveyî vê jî, gelek eşîret û qebîleyên Kurd ber bi aliyê herêmên rojhilatê ve belav bûne û serên wan çûye gihîştiye herêmên rojavayê.”[138] Tê dîtin ku du sedsal berî Şoreşa Frensî herçiqas xwesteka wî ya netewe-dewletbûnê tune be jî Şerefxanî, sînorên netewî yên Kurdistanê bi nivîskî xêz kirine.

Berî her tiştî û pêşiya hemû sebeban, ruh û hîsa Kurdayetiyê teşwîq kiriye ku Şerefxan *Şerefname*yê binivîse. Belgeyên vê rastiyê gelek caran di nav *Şerefname*yê bi xwe tên dîtin. Wek mîsal, ji serî heta binî di *Şerefname*yê de bi awayekî eşkere bêyî ku unwanê Siltan hilde, wiha gotiye: “Kurdistan, welatek e ne ji aliyê kesekî de tê îşgalkirin û ne ji bo kesekî sernizmiyê dike.” Ji xeynî vê, Şerefxanê Bedlîsî sînorên Kurdistanê dane nîşan ku berê Şerefxan, di dema Selçûkiyan de tabîra Kurdistan hatiye bikaranîn. Bi taybetî di dema Selçûkiyan de Kurdistan, ji wan herêman re hatiye gotin ku ketine navbera Azerbaycan, Loristan û rojavayê zincîrên çiyayê Zagrosê. Lê di *Şerefname*yê de, sînorên Kurdistanê ji Melatyê dest pê kiriye û qeraxên Xelîcê bi dawî bûye.[139]

Desthilatdarên Kurdistanê yên bi cengaweriyên xwe bi nav û deng bûne, bi navên eşîretên xwe hatine naskirin. Wek; Hekkarî, Soranî, Babanî û Erdelanî û hwd. Ew mîrektiyên ku kele û bajar di bin destê wan de hebûne bi navê wan kele û bajaran hatine naskirin. Wek Mîrektiyên Hesenkêfê, Bedlîsê, Cezîrê, Hezzoyê, Egilê û yên din…[140]

Dewletên Tirkmenan ên li Asya Rojava, ku reqîb û dijminê Moxolan bûne, piştî ji holêrabûna Îlhaniyan, gav bi gav Kurdistan kirine bin hukmê xwe. Dewleta Qereqoyunî heta nîvê Kurdistanê hatiye û eşîretên Kurdan rastî şer û pevçûnên siyasî kirine. Ev rewş jî ji bo gelê herêmê bûye sebebê cih guhertineke mezin. Bi rastî di vê dewrê de bûye ku Kurdên Mukrî, başurê Behra Ûrmiyeyê, ango welatê Seblaxê dagir kirine. Piştî pêlên musîbeta Moxolan û beriya ku welatên Îslamê bikaribin zayîata mal û canên xwe hinek jî be telafî bikin, belaya Tîmûrleng bi ser wan de hatiye. Ev

[138] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.62-63.
[139] Kemal Mezher Ehmed, “Şerefname di Kurdnasiya Sovyetê de”, r.47.
[140] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.66.

serdarê zalim, ji bo fetha Qefqesyayê di ser Kurdistanê re derbas bûye. Diyarbekir û Cizîra Botan zebt û tehrîb kiriye. Dehşeteke mezin kiriye wê herêmê û welatê Kurdistanê xistiye nav tengasiyeke bêsînor. Piştî mirina Tîmûr (1405ê z.) Qere Yûsifê emîrê Qereqoyunî, ku ji tirsa Tîmûr çûbû, vegeriyaye Kurdistanê û xwe avêtiye bal Emîr Şemseddînê Bedlîsî. Keça wî li xwe mehr kiriye û bi alîkariya wî ji nû ve dewletek damezirandiye.[141]

Di vê sedsalê de Kurd cîranê dewletên Osmanî û Sefewiyan bûne, siyasetên van dewletan li ser rewşa Kurdistanê bandoreke mezin kiriye. Mirov dikare şerê Çaldiranê yê 1514an di dîroka Kurdî ya nuh de ji bûyerên dîrokî yên herî giring bihesibîne. Ji ber ku di encama vî şerî de, Osmanî û Sefewiyên bi hev re şer kirine bûne yek û welatê Kurdan li hev par vekirine û wan di bin destên xwe de lewaz û bêhêz hiştine.[142] Di vî şerî de piraniya Kurdan li aliyên Osmaniyan cih girtine. Lê hin ji wan jî aliyê Sefewiyan girtine ku di encama vî şerî de Osmanî bi ser ketine.[143]

Herçiqas Osmanî, hêza Sefewiyan a her diçû zêde dibû qontrol kiribe jî ev hêz bi temamî ji holê ranekirine. Sefewîyan bi vê têkçûnê, piraniya herêmên Kurdistanê ên di destê xwe de jî winda kirine. Şerê di navbera Osmanî û Îraniyan dem bi dem sekinîbe jî sê sed salî berdewam kiriye. Di encamê de Kurdan, bedêla vê berberîbûnê zêde zêde dane. Tenê welatê wan perîşan nebûye, mecbûr mane ji her du hêzan re jî leşkeriyê bikin.[144]

Bêguman Şerê Çaldiranê, bandoreke kûr û dûr di guherîna halê Kurdan de kiriye. Ji wan guherînan 25 qebîleyên Kurd bûne hevalbendên Dewleta Osmanî. Li gor peymaneke ku di navbera wan û Yawuz Siltan Selîm de hatiye girêdan,[145] û bi vê yekê ji sisiyan du parên herêmên Kurdan ketine bin desthilatdariya (hukmê) Osmaniyan. Ji aliyê din ve, qebîleyên ku li bakurê rojhilata Çiyayên Zagrosan dijîn- ku ew îro heman herêmên Kurdî yên li Îranê ne- ketine bin desthilatdariya Sefewîyan. Peywendiyên di navbera Kurd, Osmanî û Sefewiyan, hem li gor berjewendiyên hikumetên Osmanî û Sefewiyan hem jî li gor berjewendiyên mîrektiyên Kurdan kêm û zêde bûne. Nemaze di meseleyên bacstendin û leşkeriya

---

[141] Mihemed Emin Zekî Beg, **Dîroka Kurd û Kurdistanê**, Avesta, Stenbol, 2012, r.118.
[142] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.139.
[143] AbdurrahmanAdak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk,** r.196.
[144] Wadie Jwaideh, **Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi**, İsmail Çeken-Allper Duman (wer.), İletişim , İstanbul, 2014, r. 44.
[145] Peymana di navbera Yawuz Siltan Selîm û Mîrektiyên Kurdan de di 1514an de hatiye îmzekirin wek Peymana Emasyayê hatiye nasîn.

mecbûrî û hin karên din de.[146] Di vî warî de *Şerefname* ji bo diyarkirina rewşa mîrên Kurd çavkaniyeke hêja ye û gelek agahiyên li ser pevçûna herdu dewletan di xwe de dihewîne. Dema Şerefxan behsa Zeynel Begê kurê Melik Beg ê mîrê Hekkarî kiriye gotiye ku:“Zeynel Beg ji aliyê Osmaniyan ve ji bo asayîşa sînorê Îranê hatiye wezîfedarkirin. Dema ku Zeynel Beg gihîştiye Salmasê, rastî birayê xwe Bayindir Beg hatiye ku birayê wî jî bi heman peywirê ji aliyê Qizilbaşan ve hatiye wezîfedarkirin. Herdu bira rabûne hev û di vî şerî de Bayindir Beg têk çûye.”[147]

Di *Şerefname*yê de peywendiyên bi vî rengî bi gelek bûyeran hatine destnîşankirin. Wek mînak di Mîrektiya Egilê de Qasim Begê kurê Şah Mihemed Beg; bi mêrxasî, zanatî û exlaqxweşî bi nav û deng bûye. Ew, ewqas pêşveçûye ku Aqqoyuniyan ew kirine fermandar û lalayê zarokên xwe û ew wek Lala Qasim hatiye binavkirin. Dema ku Şah Îsmaîl, di sala 913yê k./1508ê z. de Diyarbekir girtiye Lala Qasim bi tu awayî îta’eta wî nekîriye û li hemberî wî sekiniye. Şah Îsmaîl bi vê helwestê gelek êşiyaye, leşkerekî giran şandiye ser wî û Kela Egilê jê stendiye. Piştî Şerê Çaldiranê bi alîkarî û piştgiriya Yawuz Siltan Selîm, Lala Qasim Egil girtiye û çûye ser wezîfeya xwe.[148] Bi heman awayî Mîrên Sasonê di nav Mîrên Kurdan de bi mêrxasî, merdî û serkeftîbûna xwe hatine naskirin. Wan her wext bi mîrektiyên mezin û siltanên payebilind re têkiliyên di cî de danîne. Ji ber vê yekê dema êrîşên dewletên Aqqoyunî, Sefewî û Osmanîyên li pey hev Kurdistan kirine bin bandora xwe, ew her tim girêdayî vê siyaseta xwe ya aqilane mane.[149] Vê rewşê xuya kiriye ku mîrektiyên Kurdan ji bo welatê xwe ji êrîşan biparêzin di nav dewletên mezin ên cîran de polîtîqayên hevsengiyê şopandine. Carinan di nav heman mîrektiyê de ji aliyê têkiliyên siyasî ve mîrekî bi Sefewiyan re, mîrê pişt wî bi Osmaniyan re têkiliyên baş ên siyasî saz kirine.

Şerefxan, dema behsa Tîmûr Xanê Kurê Siltan Elî yê Mîrektiya Erdelanê kiriye, ji ber polîtîkayên wî yên çewt ên bi Sefewî û Osmaniyan re bi zimanekî îronîk di derheqê wî de wisa gotiye:“Bi ber bayê şeytên ket, ji rê derket û xeyala hikumdartî û serbixwetiyê kir serê xwe. Carina dibû meyldarê Rûmiyan û carina jî dibû tagirê Qizilbaşan. Her roj li ser têlekî dileyist û dengên cure cure ji têlên saza wî

---

146 Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.141-142.
147 Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.149.
148 Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.229.
149 Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.240.

dihatin.”[150] Tîmûr Xan ji bo berjewendiyên xwe bîne cih xwestiye ku ji rikberiya di navbera Sefewî û Osmaniyan îstifade bike.

### 2.1.2. Helwesta Sefewiyan li Hemberî Kurdan

Malbata Sefewiyan ji aliyê dîrokê ve digihîjin şêxekî mutesewif ê bi navê Şêx Sefiyudînê Erdebîlî. Şêx Sefiyudîn, di sedsala XVI. de li bajarê Erdebîlê ku îro li Îranê li rojhilatê Tebrîzê nêzî deryaya Xezerê ye, xwediyê tekyayeke tesewifî bûye. Terîqeta Sefewiye piştre li Azerbeycanê bi taybetî di dewra Şêx Cuneyd û Şêx Heyder de di nav Tirkmenên li Îranê bûye hêzeke siyasî. Herî dawî mumessilê vê terîqetê yê bi navê Şah Îsmaîlê Sefewî di sala 1502yan de bi dagirkirina Tebrîza paytexta Aqqoyuniyan Dewleta Sefewiyan ava kiriye[151].

Şah Îsmaîl, piştî damezrandina dewletê dest bi tekûzkirin û xurtkirina hîmên pergala dewletê kiriye (1501-1524). Şah Îsmaîl wek karê yekemîn xwe ji malbata Aqqoyuniyên Turkmen ên li Îranê xelaskiriye. Karê wî yê duyem ew bûye ku mezhebê Şî'î di Îranê de ferz kiriye. Karê sêyem jî berê xwe daye aliyê Kurdistanê.[152] Heft sedsal piştî dagirkeriya Ereb-Misilmanan û pênc sedsal piştî dagirkeriya Moxol-Tirkan, Sefewiyan li dijî Kurdan dest bi polîtîkaya hêzê ya bi rengekî dînî kirine û bi helkefta vê polîtîkayê qetla Kurdan anîne.[153]

Gelê Kurdistanê Sunnî bûye û di navbera dewletên dijberên hev ên Osmanî û Sefewiyan de cih girtine. Li ser warê Kurdan, di bernameyên van herdu dewletan de siyaseteke taybet hebûye. Ew dewlet, ji mêrxasiya Kurdan agahdarbûne û girîngiya cihê Kurdistanê yê stratejîk ku ketiye ser riyên bazirganiyê hatiye zanîn. Lewma bala mezinên Kurdan bi awayî curbicur bi aliyên xwe ve kişandine.

Dewleta Osmanî ku agahdariya wê ji êrîşa Şah Îsmaîl a ber bi welatên xwe ve hebûye û piştgiriya Îranê ya ji bo Elewiyên Şiî yên Anatoliyê dîtiye. Lewma bi navê hevbeşiya dînî û şer’î li dijî rafiziyan siyaseta dostîtiyê bi Kurdan re daniye. Di heman demê de Osmanî, çil hezar Elewiyên Şiî ku piraniya wan Kurd bûne bi tawanbarkirina alîgiriya Îranê kuştine.[154]

---

[150] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.137.
[151] AbdurrahmanAdak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r.195.
[152] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.138.
[153] Jemal Nebez, **Kurd (Dîrok û Kultura Wan),** r.41.
[154] Ebdula Merdux, “Şerefname û Şerefxanê Bedlîsî”, http: // www. bitlisname. com/2015/11/19/serefname-u-serexane-bedlisi/

Di wê demê de em li rewşa Kurdan a gelemperî binêrin; mîrektiyên Kurdan, di serê sedsala XVI. de ji aliyê siyasî ve ji ber ku yekîtiya wan tune bûye, ji bo xwe ji êrîşên ji der ve bên biparêzin pişta xwe dane herdu dewletên cîran ên Îran û Osmanî. Gelek mîrên Kurd ên Sunnî meyla xwe dane ser Osmaniyan. Lê ji ber dostiya dîrokî û hevkariya di navbera gelê Kurd û Azerbaycanê pirraniya Kurdan nêzî Sefewiyan bûne. Siyaseta Şah Îsmaîlê Sefewî ya çewt a li berpêbûna Kurd û Kurdistanê, ev hêviya Kurdan vala derxistiye. Êrîşa yekem a Şah li ser Kurdistanê bi dagirkirina Saucbulaqê dest pê kiriye.[155] Li nêzîkî Elbîstanê Elaû'd-Dewleyê Zulqediriye şikandiye û vegeriyaye ser Diyarbekrê û Diyarbekir girtiye.

Mueamelaya Şah Îsmaîl a di derheqê Kurdan de eynî wek a Aqqoyuniyan gelek bi zalimane bûye. Ew, xebitîne ku di her firsetê de eziyetê li Kurdan bikin û wan ji holê rakin. Ji ber vê yekê dema ku hatine Xoyê dozde mîrên Kurd çûne ba Şah Îsmaîl û îta'eta xwe pêşkêşî wî kirine. Lê Şah ew dane girtine û hepiskirine, li ciyê wan waliyên Qizilbaş tayîn kirine. Yek ji van mîrên bêguneh, Melik Xelîlê hakimê Hesenkêfê bûye ku di heman demê de zavayê Şah Îsmaîl jî bûye. Ew sê sal li hepisxaneya Tebrîzê maye û piştî şikestina Şah Îsmaîl a li Çaldiranê rizgar bûye.[156] Ji mîrên çûne cem Şah Îsmaîl, Mîr Şah Mihemed û Êlî Begê Sasonî ji ber nêzîkahiya siyaseta wan a bi Şah re nehatine girtin.[157] Li gor M.İ. Şemsi diyar kiriye, di heman salê de heyeteke ji yazdeh mîrên Kurd pêk hatiye ji bo bi Şah Îsmaîl re hevdîtinek çêkin çûne Tebrîzê. Qedera wan jî ji dozde hebê pêşiya wan cudatir nebûye. Ji van mîran hinek dema Şerê Çaldiranê derfet dîtine û vegeriyane Kurdistanê. Şah Îsmaîlê Sefewî ji xeynî mîrektiyên dagirkiriye, erdên mîrên binçav kiriye jî daye fermandarên Qizilbaş. Li gor Şerefxanê Bedlîsî nivîsandiye, "Şah, wilayeta Cizîrê daye Ulaş Begê birayê Xan Mihemmed Ustaclu. Mîrektiya Egilê daye Mensûr Beg û wilayeta Bedlîsê berê daye Gurd Beg, dawiyê jî bi Ewrez Beg ve girêdaye.[158]

Şah Îsmaîl xwestiye ku mîrên Kurdan ji desthilatê dûr bixe û waliyên xwe di şûna wan de wezîfedar bike. Lê ji aliyekî din ve ji bêgavî jî be, Şah Îsmaîl hinek mîrektiyên Kurd ên wek Hekkarî û Şêrwanê bi siyaset nas kiriye.[159] Herçiqas

[155] M. İ.Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, r.73.
[156] Mihemed Emin Zekî Beg, **Dîroka Kurd û Kurdistanê**, r.120.
[157] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.240, 276.
[158] M. İ.Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, .77-78.
[159] AbdurrahmanAdak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r.196.

armanca Şah Îsmaîl, ew bûye ku mîrektiyên Kurd ji holê rake û waliyên Qizilbaş bîne cihê wan, piştî Şerê Çaldiranê nikaribûye vê xwesteka xwe bîne cih.

Şikestina Şah Îsmaîl li Çaldiranê (920ê k./1514yê z.), nifûz û firehbûna Dewleta Sefewî gelek kêm kiriye. Hinek şaşiyên hikumdarên li pey Şah Îsmaîl hatine ser text jî bûne sebebê Sefewî nikaribin wê nifûza xwe ya şikestî tamîr bikin û derbasî rojavayê Çiyayên Zagrosê bibin.[160]

### 2.1.3.Peywendiya di Navbera Kurd û Osmaniyan de

Siyaseta Şah Îsmaîl bandoreke neyinî li ser Kurdan çêkiriye. Binçavkirina mîrên Kurdan ên bi hev re çûne Tebrîzê, dayina desthilatdarî û axa Kurdistanê ji fermandarên Qizilbaş re û polîtîqayên zordestiyê yên li hemberî Kurdan, di derheqê hikumeta Sefewiyan de nerehetiyek çêkiriye. Bi vê pêvajoyê re di navbera Kurd û Sefewiyan de îxtilafa olî zêde bûye.

Di rewşeke werê de li Kurdistanê meyla siyasetê ya giştî bi kêrî hikumeta Osmanî hatiye. Hinek mîrên Kurdan berê xwe dane Seraya Osmanî. Di vir de mezhebê Sunnîbûnê di navbera Kurd û Osmaniyan de roleke girîng leyistiye.[161] Li gor lêkolînê hatiye dîtin ku sedema herî mezin a nêzîkahiya Kurdan bi Osmaniyan re dînî ye. Ji ber ku Osmanî jî Sunnî bûne ji bo ji zilm û zora Qizilbaşan xelas bibin û bi baweriya xwe ya dînî azad bijîn Kurdan, Osmanî tercîh kirine.

Yawuz Siltan Selîmê Osmanî jî berê xwe daye rojhilatê û xwestiye ku hêza Şah Îsmaîl lewaz bike. Ji bo vê jî Siltan Selîm mihtacê piştgiriya mîrektiyên Kurdan bûye û ji bo ku vê piştgiriyê bi dest bixe têkiliyên siyasî bi siyasetmedarê Kurd Îdrîsê Bedlîsî re daniye. Îdrîsê Bedlîsî ji malbateke mutesewif bûye û li qesra Aqqoyuniyan wek sekreter xebitiye. Herwiha bi navê *Heşt Behişt*ê û *Selîmname*yê bi zimanê Farisî di derheqê Osmaniyan de du berhem jî nivîsandine. Di encama vê dîplomasiya Îdrîsê Bedlîsî de mîrên Kurdan, Osmanî tercîhî Sefewiyan kirine. Mirov dikare bêje ku di vê tercîhê de du sedem roleke sereke leyistine:

1.Şah Îsmaîl xiyanet li mîrên Kurdan kiriye û xwestiye desthilatdariya wan ji holê rake.2.Osmanî jî wekî Kurdan Sunnî bûne, lê Şah Îsmaîl Şi’î bûye û di şî’îtiyê de zêde tund bûye.[162]

---

[160] Mihemed Emin Zekî Beg, **Dîroka Kurd û Kurdistanê**, r.120.
[161]M. İ.Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, r.78.
[162] AbdurrahmanAdak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r.196.

Yawuz Siltan Selîm, di Sefera Çaldiranê de, ji leşkergeha Amasyayê ji bo xatirê ku eşîret û mezinên Kurdan teşwîqê dijî Şi'iyan û Şah Îsmaîl bike, çend car Îdrîsê Bedlîsî şandiye Kurdistanê. Bi rastî tesîra rênîşanderî û tehrîka Îdrîsê Bedlîsî gelek mezin bûye. Ji ber vê piştî Şerê Çaldiranê di nav Kurdistanê de ji milekî ve serhildanan dest pê kirine.[163] Di pêkhatina nasnameya çandî de faktora herî bi hêz dîn e. Dîn tenê ne li ser baweriya dînî, li ser teşedana jiyana sosyokulturel jî bandor kiriye. Dîn, ji malbatê dest pê kiriye heta hiqûq, siyaset, huner û feraseta aborî, di gelek qadan de şikl daye mirov.[164]

Bi vî awayî piştî şer bi dîplomasiya Îdrîsê Bedlîsî di navbera mîrên Kurdan de yekîtiyekî gelek bîhêz çêbûye û mîrên Kurdan bi piştgiriya hêzên Osmaniyan jî hêzên Sefewiyan ji Diyarbekir û Mêrdînê derxistine. Sefewî bi temamî ji Kurdistanê hatine derxistin. Piştre dîsa bi navincîtiya Îdrîsê Bedlîsî di navbera mîrên Kurdan û Osmaniyan de peymannameyek hatibû îmzekirin ku li gor vê peymannameyê bi şertê Kurd li hemberî Sefewiyan alîkariya Osmaniyan bikin, ew dê di welatê xwe de serbixwe hereket bikin.[165] Di vir de hêja ye bê gotin ku peymana di navbera Kurd û Osmaniyan de encama mecbûrî ya konjonktura wê demê ye. Ji ber ku Kurd ji bo ji zilm û zora Şah Îsmaîl xelas bibin mecbûr mane nêzî Osmaniyan bibin. Bi heman awayî Osmanî jî ji bo ji hêza Kurdan îstifade bikin û xetereya Sefewiyan ji xwe dûr bixin têkiliyên baş bi Kurdan re danîne.

Belê, di vî warî de Osmanîyan ji bo Kurdan polîtîkayeke taybet sepandiye. Sedema sereke ya vê polîtîkayê ev e ku herêmên Kurdan di navbera Osmanî-Safewiyan de herêmeke tampon e. Lê Kurdistan di navbera van dewletan de ne tenê sînorekî polîtîk bûye. Di heman demê de di navbera Sunnîtiya Osmanî û Şi'îtiya Sefewiyan de jî wek sînorê dînî/mezhebî bûye. Lê hakimiyeta Osmanî ya li ser hinek mîrektiyan tenê bi bac stendinê ve maye. Mîrektiyên Botan, Baban, û Hekkariyê otorîteya xwe ji nû ve ava kirine. Van mîrektiyan dikaribûne ji xelkê bacê bistînin heta bi dîplomatên biyanî re têkiliyê deynin.[166]

Peywediyên dostane yên di dema Siltan Selîm de çêbibûn her ku çûye xera bûye. Dewleta Osmanî êdî ji hêza Persan fikar nekirine û xwestine Kurd qedera xwe

---

163 Mihemed Emin Zekî Beg, **Dîroka Kurd û Kurdistanê**, r.121.
164Muhittin Aşkın, "Kimlik ve Giydirilmiş Kimlikler", **Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü**, b.10, ( j.2), 2007, r.217.
165 AbdurrahmanAdak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r.196.
166Nihat Karademir, **Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler**, Nûbihar, Stenbol, 2017, r.106-115.

bi Osmaniyan ve girêdin. Hevkariya Kurdan girîng nedidîtine. Ji 1650an heta 1730yî piraniya mîrektiyên serbixwe yên di navbera Diyarbekir-Wanê de ji aliyê Osmaniyan ve hatine rûxandin. Ev pêvajoya rûxandina mîrektiyên Kurdan heta nîvê sedsala XIX. temam bûye.[167]

Mîrektiyên Kurdan li hemberî Osmanî serî hildane ku di nav van serhildanan de ya herî zor serhildana Bedirxaniyan bûye. Piştî Bedîrxan Beg hatiye girtin wî tevî malabata wî di 1848an de sirgûnî Girîtê kirine. Di 1863an de destûr dane ku were Stenbolê, di 1868an de ew şandine Şamê ku wî li wir wefat kiriye. Di 1847an de teslîmbûna Bedirxan Beg, di rojnameya fermî ya dewletê ya Takvim-i Vekayi de wek ji nû ve fetha Kurdistanê hatiye îlankirin û Siltan Ebdulmecîd ji aliyê Meclis-i Valayê ve nîşana Fatihê Kurdistanê girtiye. Serhildana mezin a din, serhildana xanedana Baban a hakimê Silêmaniyê bûye. Bi dawî anîna mîrektiya Baban a di 1850î de li Kurdistanê serdema mîrektiyan bi dawî bûye. Hinek serokê Kurdan ê serhildêr wek Bedirxan Beg û Mîr Mihemmedê Rewandûzî berî serhildanan ji sembolên desthilatdariya serbixwe li ser navê xwe dirav çap kirine.[168] Sedema herî girîng a têkçûna van serhildanan binyada wan a civakî û eşîretî ye. Rikberiya di navbera mîrektiyan de û kêmasiya fikra serxwebûna neteweyî pêşiya yekitiya Kurdan girtiye. Di nav Kurdan de ciyawaziya dînî/mezhebî jî li ser têkçûna serhildanan bandorekî nebaş çêkiriye.[169]Di vir de hêja ye ku bê gotin herçiqas van serhildanan ji rihê yekîtiyê dûr bin jî di hafizeya kolektîf a civaka Kurdan de cihekî girîng girtine û li ser fikra netewetiyê bandorekî mezin kirine.

Bi rûxandina mîrektiyan pergala civakî xera bûye û rewşeke kaotîk derketiye holê. Waliyên ji navendê hatine tayinkirin nikaribûne wek mîran li ser eşîretan tesîr bikin û otoriteya xwe deynin. Lewma di nav eşîretan de mêrkuştin û talan zêde bûye. Ev rewşa kaosê encax wek saziyeke siyasî bi derketina şêxitiyê hinek derbas bûye. Şêxan ji berê de di nav Kurdan de hurmetê dîtine. Lê wesfên wan ên siyasî piştî rûxandina mîrektiyan çêbûye.[170] Belê, piştî serdema mîrektiyan di serokatiya Kurdan de ji xeynî şêxitiyê axatî jî wek rêveberî derketiye pêş. Li gor Edmonds, axatî unwanekî Tirkî ye û mihtemelan piştî Sefera Bexdayê ya Mûradê IV. ê Osmanî li

---

167 Wadie Jwaideh, **Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi**, r.44.
168 Nihat Karademir, **Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler**, r.282-298.
169 Nihat Karademir, **Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler** , r.304-309.
170 Çakır Ceyhan Suvari, "Şerefname'den Günümüze Aşîret Kimliği", **VII. Uluslar Arası Van Gölü Havzası Sempozyumu**, 04-07 Ekim 2014, r.315.

Kurdistana Başûr belav bûye (1637). Lewma di *Şerefname*yê de nîşanên wek xan û mîr derbas bûne lê behsa axayan[171] nehatiye kirin.[172]

Polîtîkayek girîng a Osmaniyan di derheqê Kurdan de jî polîtîkaya îskanê ye. Dewlet bi armanca hêza hin eşîretên mezin bişikîne ji dema Yawuz Siltan Selîm vir ve Kurd îskanî ber bi Anatoliya Navîn kirine. Bi demê re li hin cihên Anatoliya Navîn nufûsa Kurdan zêde bûye. Geştyarên biyanî wek di mînaka Haymanayê de tê dîtin ji hin herêman wek herêmên Kurdan hatiye behskirin.[173]

### 2.1.4.Di Nav Mîrektiyên Kurdan ên Serdema Osmaniyan de Mîrektiya Bedlîsê

Di *Şerefnameyê* de, ji bo Mîrektiya Bedlîsê navê 24 eşîretan hatiye jimartin. Eşîreta Rojkî[174] ji yekîtiya 24 eşîretên Kurd pêk hatiye. Ev civaka han a ji qebîleyan pêk hatiye, piştre bi ser du şaxên girîng ve belav bûye. Ji van şaxan re Bîlbasî û Qewalîsî hatiye gotin. Gotinên Bîlbas û Qewalîs navên du gundên Mîrektiya Hekkariyê ne. Li gor rîwayeteke din navên Bîlbas û Qewalîs ji navên du qebîleyên eşîretên Baban in. Di hin dîrokan de koka mîrên Bedlîsê digihîje silaleya şahên Sasanî/Kîsra(Nûşîrewan an jî Camasb). Li gor vê, mîrên Bedlîsê kurapên qralên Rustemdarê û yên Şêrwanê bûne. Ji aliyê din ve hejmara mîrên Bedlîsê yên Şerefxan ji kitêbên dîrokê tespît kirine gihaştiye 18an. Şerefxan, rêveberiya wan a li ser desthilatdariya welat ku heta dema *Şerefname* hatiye nivîsandin bê navber wek 450 salan zêdetir destnîşan kiriye.[175]

Mihemmed Emîn Zekî Beg[176] jî di pirtûka xwe ya *Dîroka Kurd û Kurdistanê* de ji bo vê nêrînê bal kişandiye ser hin xalên din. Mihemed Emîn Zekî Beg, wisa gotiye:

---

[171] Di *Şerefname*yê de navê axa wek rêveber derbas nebûye; di wergerên Abdullah Yegin û İbrahim Sunkur de ev îbare tune ye, Ziya Avci di nav gotinê de vê peyvê bi kar aniye. Wek mînak; dema behsa mîrê Lora Mezin Ebû Tahir kiriye gotiye ku; "piştî gihîşt desthilatdariyeke mezin dev ji atabegiya axayê xwe berda (r.79)." Bi heman awayî di wergera Ziya Avcî (r.151), Abdullah Yegin(r.151) û İbrahim Sunkur (r.161), de ji bo temsîlkarê Zekeriya Begê mîrê Hekkarî tabîra "Ebûbekîr Axa" derbas bûye.

[172]C.J.Edmonds, **Kürtler, Türkler ve Araplar; Kuzey-doğu Irak'ta Siyaset, Seyahat ve İnceleme (1919-1925)**, Serdar Şengül-Serap Ruken Şengül (wer.), Avesta, İstanbul, 2003, r.294.

[173]Nihat Karademir, **Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler**, r.162.

[174] Li gor *Şerefname*yê hinekan nivîsandina vê peyvê bi tîpa "c"yê (Rockî) û hinekên din jî tîpa "ş"yê (Roşkî) bi kar anîne. Rojkî, tê me'neya "yekroj" ango" rojek" (r.413).

[175] Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.413-421.

[176] Piştî sêsed û sî sal nivîsandina *Şerefname*yê ji aliyê Mihemed Emîn Zekî Beg ve, cara duduyan ji aliyê Kurdekî ve bi perspektîfeke nû, dîroka Kurdistanê hatiye nivîsîn.

“Şerefxan eslê vê xanedana han digihîne Xanedana Sasanî; lê Dr. Frech bi tefsîlat û îddiayên *Şerefname*yê bawer nake, mimkune heqê wî hebe. Çunkî hinek bûyer û nav tê de hene ku bi dîroka rastî re bi hev nakin. Eynî rojhilatnas dibêje, li gorî agahdariya dîroka rastî yekem mîrê Bedlîsê yê ku tê zanîn Melîk Eşref e û beriya ku bibe mîrê Bedlîsê li mintiqeya Eyyûbiyan a Sûriyê serdar bû. Dema ku Celaleddîn Xwarzemşah hat wê navçeyê, ew ji aliyê vî Melîk Eşref han ve hat parastin û piştre li ser teklîfa Moxolan ji nav sînorê xwe derxist devre.”[177]

Ji aliyê din ve Şerefxanê Bedlîsî, dema behsa şah, hikumdar û mîrên Kurdan kiriye, piraniya kokên wan gihandiye Ereban. Ev angaşta nivîskar ji taybetmendiyên serdema tê de jiyaye hatiye. Zadeganên Kurdan berî dagirkirina Ereban xwe gihandine Şahên Îranê, dawiyê jî xwestine xwe bigihînin fermandarên Ereban.[178]

Bruinessen dema di nav pergala Osmaniyan de cihê Mîrektiya Bedlîsê gotiye, bawer kiriye ku pergala Osmaniyan ji feodalîzma Ewropayê ye. Li ser rêveberiya hiqûqê kontroleke xurt a Osmaniyan hebûye. Xwediyê erd ne derebeg bûne. Xwediyê erd dewlet bixwe bûye û di Osmaniyan de konsepta “ked”ê tunebûye. Ji ber ku mîrê Bedlîsê otorîteya xwe ya hiqûqî (qadî), bixwe hilbijartiye û ji Stenbolê azad bûye, divê ew mîrektî wek awarte bê qebûlkirin ku ji eyaleteka împaratoriyê zêdetir bi rengê dewleteke derebegî bûye.[179] Bruinessen, lêkolînê li ser eşîretên Kurdan kiriye û wan bi vî awayî pênase kiriye: “Eşîreta Kurd, rast an jî wek sawekî tê gotin ku ji bavekî hevpar û bi bingeha rêxistina merivatiyê, xwediyê erd û taybetmendiyên binyadeke navîn a komekî sosyopolîtîk e.”[180]

Ev eşîretên Mîrektiya Bedlîsê yên navên wan di *Şerefname*yê de derbas bûne ev in: “Qeysanî, Bayekî, Mudkî, Zoqeysî, Zeydanî, Keleçîrî, Xerbîlî, Balekî, Xiyartî, Korî, Birêşî, Sekrî, Garîsî, Bêdorî, Belagerdî, Zerduzî, Endakî, Pertavî, Girdikî, Suhrewêrdî, Kaşaxî, Xalidî, Wastudkî û Ezîzan in.“[181] Ji demên kevn ên dîrokê bigirin heta îro nasnameya eşîretê li herêmê winda nebûye û li hin deveran hêjî hêza eşîretan xurt e. Di *Şerefname*yê de bi gelemperî begên eşîretan ên navên wan derbas bûne bi şerên kirine û bi aliyên xwe yên leşkerî cih girtine.

177 Mihemed Emin Zekî Beg, **Dîroka Kurd û Kurdistanê**, r.515-516.
178 M.İ. Şemsi, **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, r.122.
179 Amir Hassanpour, “Şeref-name: Dewlet-Avakirin, Derebegîtî û Desthilatî” r.109.
180 Martin van Bruinessen, **Ağa, Şeyh, Devlet**, Banu Yalkut (wer.), İletişim, İstanbul, 2015, r. 82.
181 Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r.418.

Yek ji wan bûyerên girîng ên vê mîrektiyê, îlticaya bavê Şerefxan a Îranê ye. Piştî mayina demekê li wir, Şerefxan vegeriya Bedlîsê û ji aliyê Dewleta Osmanî ve wek mîrê Bedlîsê hatîye naskirin. Vê mîrektiyê bi navbirên kêm û zêde heta nîvê sedsala XIX. dewam kiriye.[182]

### 2.1.5. Bandora Vê Serdemê li ser Nivîsandina Şerefnameyê

Dema nivîsandina *Şerefname*yê, li herêmên wek Kurdistan hatiye nasîn, nêzî çil mîrektiyên biçûk û mezin ên Kurd hebûna xwe parastine. Herçiqas Osmanî û Sefewî li Kurdistanê polîtîkayeke aktîf a navendîbûnê meşandine jî, wan du hêzan hêjî nikaribûne mîrektiyan hilweşînin. Herçiqas dijminahiya herdu dewletan nexasim jî berî 1639an li ber navendîbûnê astengiyek bûye; faktoreke sereke, sînorkirinên hilberîna feodal bûye, hêz û berxwedanên mîrektiyan bûne. Herwiha wan du împaratoriyan nikarîbûne di seranserê herêmê de hebûna xwe ya leşkerî bi rêz û bi tesîr pêk bînin. Lewma ew pirî caran mecbûr bûne rêveberiya mîrasî ya mîr qebûl bikin. Ew dilxweş bûne ku bac ji wan hatine berhevkirin û piştgiriya leşkerî ji mîran hatiye girtin.[183]

Şerefxanê Bedlîsî, hûrgiliyên Şerê Îran-Osmanî yê ji bo axa Kurdistanê nedaye, heta şer kengî bi dawî bûne li ser nesekiniye. Digel vê, di sedsala XVI. de agahiyên berfireh û dewlemend ên li tu çavkaniyan de cih negirtine daye. Gelemperî aliyê Osmaniyan jî bigire siyasetên siltanan, sergirtî rave kiriye.[184] Şerefxan di berga duyem de dema behsa bûyera xeniqandina Mistefayê kurê Qanûnî Siltan Silêman (1520-1566) kiriye ku vê bûyerê di gelek çavkaniyan de cih girtiye. [185] Lê belê wek Kemal Mezher Ehmed diyar kiriye heke berga duyem a *Şerefname*yê tunebûna kesî nizanibû ku destê Seyid Mihemedê mîrê Hekkariyan di rêkxistina vê planê de heye. Li gor *Şerefname*yê, gava Qanûnî Siltan Silêman di sala 960ê k./1553yê z. de ji bo Sefera Îranê ji Stenbolê derketiye, li ser rê gava li Ergîlî (Eregliya Konya ye) daniye kurê wî yê mezin Şehzade Mistefa ji bo dîtina bavê xwe ji Emasyayê hatiye cem wî. Wezîrê Azam Rustem Paşa ku gellek tirsa wî ji Şehzade Mistefa hebûye bi alîkariya Seyid Mihemedê mîrê Hekkariyan nameyeke sexte ku qaşo ji bal Şah Tehmasb ji şehzade re hatiye şandin, pêşkêşî Qanûnî kiriye. Dema Qanûnî vê nameyê dîtiye

[182] Mihemed Emin Zekî Beg, **Dîroka Kurd û Kurdistanê**, r.516.
[183] Amir Hassanpour, "Şerefname: Dewlet-Avakirin, Derebegîtî û Desthilatî" r.101.
[184] M.İ., **Şerefname ve Şerefxanê** Bedlîsî ,r.82.
[185] Şerefhan Bitlisi, **Şerefname**, b.2, r.183.

gellek hêrs bûye û kurê xwe Şehzade Mistefayî daye girtin û bi dizî wî daye xeniqandin.[186]

Şerefxan, herçiqas bi awayekî veşartî behsa siyaseta siltanên Osmanî kiribe jî polîtîkayên wan ên li ser Kurdan rexne nekirine. Ji ber siyaseta Şah Îsmaîlê II. a çewt bandoreke mezin li ser wî kiriye wî berê xwe daye Osmaniyan û vegeriyaye ser axa mîrektiya xwe. Piştî ku ew ji bo Nahciwanê peywirdar kirine nêrîna wî ya der barê Osmaniyan de bi awayekî erênî rûdaye. Şerefxan berga duyem a *Şerefname*yê ji bo siltanên Osmanî nivîsandiye. Jixwe ji aliyê baweriya dînî ve Şerefxan xwe nêzîkî Osmaniyan dîtiye û tevlîbûna şerên Osmanî yên li hemberî Qizilbaşan wek şerên yekîtiya Îslamê bi nav kiriye. Ji aliyê din ve, ji ber ku Şerefxan di Seraya Şah Tehmasp de maye, di *Şerefname*yê de jî gelek behsa wî kiriye û pesnê wî daye.

Di *Şerefname*yê de armanca danasîna neteweya Kurd û ji bîrnekirina bav û bapîrên Kurdan hebe jî bi hestên neteweperwerî nehatiye nivîsîn. Ji ber vê yekê, em dikarin bibêjin ku *Şerefname* bi awayekî prîmordîalîst hatiye nivîsîn. Li gor vê yekê Kurd, hêmana prosesa dîrokê ne û di cografyaya tê de jiyane xwedî hefizeyeke hevpar in. Tu daxwaza Şerefxan a ji nû ve avakirina rabirdûyê yan jî avakirina dewletekî Kurd tune ye. Lê bi agahiyên bi dest xistiye berhema xwe nivîsandiye. Wî xwestiye ku agahiyên bi dest xistine neyên windakirin û dîroka Kurdan a bav û bapîran neyê jibîrkirin.

## 2.2. ŞEREFNAMEYA MENZÛM

### 2.2.1. Di Destpêka Sedsala XX. de Rewşa Kurdan

Fikra dewleta netewî û neteweperweriyê bermayeke Şoreşa Frensî ye. Vê fikrê bi taybetî jî li Elmanya û Îtalya ji xwere zemîn dîtiye. Ramangîrê Elmanî yên wek Goerres, Brentano û Grimm tesbît kirine ku pêwîst e sînorên siyasî, cografî û zimanî li hev bikin. Wan xwestine Elmanyayeke ku hemû dewletên otonom ên biçûk hembêz bike derkeve holê, bi vî awayî dewletekî navendî ava bûye. Paşê Pan-Slavîzm û Pan-Tirkîzmê jî îlhama xwe ji fikra Pan-Germanizmê girtine. Ev fikir hinekî bi derengî, nêzîkî salên 1830î, gihiştiye Kurdistanê. Mîrê Rewanduzê Mîr

[186] Murad Ciwan, "Şerefname; Pencereya Kurdan a Ber li Mejûyê" htpp://muradciwan.com

Mihemed, ji sala 1830î heta 1839an bi van bîr û baweriyan ji bo Kurdistaneke yekgirtî ava bike şer kiriye.[187]

Gelek dîroknas di warê koka neteweperweriya Kurd de çapkirina rojnameya Kurdistanê ya di 1898an de li Qahîreyê çap bibû û damezrandina komelayên Kurd ên di dewra Meşrûtiyeta II. de girîng dîtine. Ew komele ji bo akademîsyen û lêkolînerên Kurd, wek nîşanekî yekem a neteweperweriya modern a Kurd hatine dîtin. Di nav van komelayan de Komelayên Kurd Teavûn ve Terakkî û Komelaya Hêvî cihekî girîng girtine. Neteweperwerên di nav Komelayên Kurd Teavûn ve Terakkî û Komelaya Hêvî de navên li pêş ên wek Seyid Abdulqadîr, Emîn Elî Bedirxan û Dr. Abdullah Cevdet piştre di 1918an de Komelaya Kurd Tealî ya armancên wê yên neteweperwer hebûne damezrandine. Ew komele beriya Şerê Cîhanê yê Yekem hatine damezrandin.[188]

Komelaya Kurd Tealî, kovara *Jîn*ê derxistiye ku ev kovar weşaneke polîtîk û çandî bûye. Ev komela hem di nav Dewleta Osmanî de hem jî li derveyî wê gelek çalak bûye. Dîplomatê kevn ê endamê Komelaya Kurt Tealî Şerîf Paşa, neteweperweriya Kurdan parastiye. Wî li Konferansa Parîsê bi sernavê "Xwestekên Neteweya Kurd" metnek pêşkêş kiriye. Şerîf Paşa, piştre bi delegeyên Ermenî H. Ohadinian ve Bogos Nubar Paşe re ji bo li herêmên rojhilata împaretoriyê Dewleta Kurd û Dewleta Ermenî bên damezrandin peymanek çêkiriye. Lê ji ber fikra biratiya Îslamê hin serokên komelayê yên wek Seyîd Ebdulqadîr[189] xweseriya sînordarkirî xwestine.[190] Cegerxwîn di malikek xwe de li ser Seyîd Ebdulqadir wisa gotiye:

Tu Evdilqadirê şêxê li Nehrî
Di alem de tu menşûr û bi fexr î
(Şehnama Şehîdan, Agir û Pirûsk, r.92)

[187] Kendal Nezan, "Bi Awayekî Giştî Dîroka Kurdan",https://www.institukurde.org
[188]Dijene Rhys Bajalan, **Jön Kürtler, Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)**, r.40-43.
[189] Seyîd Ebdulqadir, siyasetmedarê Kurd e kurê Şêx Ubeydullahê Nehrî ye. Di burokrasiya Dewleta Osmanî de karên girîng ên wek endamtiya Meclîsa Ayan, Şûray-i Dewlet de cih girtiye. Piştî Serhildana Şêx Seîd bi îddiaya piştgirî daye serhildanê hatiye xeniqandin.
[190]Hamit Bozarslan, "Türkiyede Kürt Milliyetçiliği: Zimni Sözleşmeden İsyana (1919-1925)", **Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri**, Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç (wer.), Avesta, Stenbol, 2005, r.204-206.

Piştî sala 1789an di siyaseta Osmanî ya li hemberî Kurdan de tu guherîn çênebûye. Wan, ji ber ku xwestine sûdê ji Kurdan bigirin, bi siyaseta ku bi kar anîne xwestine wan ji hev dûr bixin. Ev siyaset li gor rewşa demê carinan bi tundî carinan jî nermtir hatiye meşandin.

Li Îranê piştî hukmê malbata Zendî ya Kurd a Şi'î (1751-1794) lewaz bûye û Qecerî (1794-1925) lewaziya wan ji bo berjewendiya xwe wek firsetek dîtine. Bi vî awayî li cihê Zendiyan hatine ser desthilatiyê. Lê belê Qecerî di destpêkê de bi tundî hukim kiribin jî, ew jî bi demê re lewaz bûne û ev yek bûye sedemê destpêkirina tevgerên çaksazî yê.[191]

Di sala 1800î de ji peywendiya Osmanî-Îranê yeka din zêde bûye. Rûsya bi rêya Qafqasya tevlî cîrantî û pirsgirêkan bûye. Şerên Rûs-Osmanî û Rûs-Îranê Kurd eleqeder kirine. Faktorên feodal, Îslamî, teokratîk faktorên girîng ên vê pêvajoyê bûne. Şikestinên çandî û aborî bivê nevê derketine. Sedemê ewqas paşvemayina Kurdan wek şert û mercên vê serdemê hatiye dîtin. Pergala siyasî û civakî ya Kurdan, struktura mîrektiyan a perçebûyî li ber pêşveketinê asteng bûye.[192] Çarîtiya Rûsyayê, di serê sedsala XIX. de Ermenîstana Rojhilat îlheq kiriye. Hem ji ber herêmên îlheq kiriye hinek Kurd lê dijîn hem jî ji ber cihên bi peymanên Gulîstan (1813) û Tirkmençay (1828) girtine nêzî herêmên Osmanî û Îranê yên Kurd lê dijîn bûne, Rûsyayê bi Kurdan re peywendî daniye. Bi taybet piştî Şerê Osmanî-Rûs ê 1828-1829an konsolosên Rûs ên hatine navendên wek Erzirûm û Wanê bi Kurdan re têkilî danîne û di derheqê civaka Kurdan de xebatên girîng kirine.

Di peywendiya Osmanî-Elmanan de merheleya herî jor ku Kurdan gelek eleqeder dike projeya Rêhesina Bexdayê bûye. Qismekî Rêhesina Bexdayê ji Kurdistanê derbas bûye û ev yek bûye sedema dewletên mezin ji bo berjewendiyên xwe li herêmê têkevin nav rikberiyeke dijwar.[193]

Osmanî ji bo otorîteya xwe xurt bike hewl daye ku navendparêziya xwe zêde bike. Di 1847an de ji aliyê Mistafa Reşit Paşa ve ji hîjdeh wîlayetên Anatoliyê yek jê bi navê Wîlayeta Kurdistanê ava bûye.[194] Di sedsala XIX. de, piştî ku di nav sînorên siyasî yên Dewleta Osmanî de, bi taybetî li herêma Balkanan serhildanên neteweyî rû

---

[191] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.147.
[192] Naci Kutlay, **Osmanlı'dan Günümüze Kürtler,** Dipnot, Ankara, 2014, r.29.
[193] Nihat Karademir, **Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler**, r.31-55.
[194]Nihat Karademir, **Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler**, r.185.

dane Kurd jî ketine nav liv û tevgerê. Cara yekem Hacî Qadirê Koyî bûye berdevkê vê serdema nû û dengê pêşwext.[195]

Di dewra Siltan Abdulhamîd de ji Kurdan yekîneya leşkerî ya bi navê Alayên Hamîdiye hatiye saz kirin. Peywira Alayên Hemîdiye ev bûye ku sînoran li dijî Ermenî û Rûsan biparêzin.[196] Siltan Abdulhamîd bi vî awayî xwestiye parêzgerên herêmî (tampon) bi kar bîne. Wan ji bo xurtkirina hikumeta Osmanî ya navendî bişuxilîne, van yekîneyan di bin kontrola xwe de wek hêzên alîkar bi kar bîne.

Di navbera 1908-1909an de qlûbên Kurdan cihên Kurd lê niştecîh bûne vebûne. Di bihara 1909an de dema Abdulhemîd ji aliyê Komelaya Îttihat ve Terakiyê ve ji ser text hatiye daxistin ev qlûbên Kurdan jî hatine girtin. Di navbera salên 1908-1909 de rojnameya Kurd Teavûn ve Terakkî hatiye çapkirin. Bi dawî lêanîna Komelaya Teavûn ve Terakkî di 1910-1911an de ji endamên berê yên Kurd wek Seîdê Nûrsî, Emîn Elî Bedirxan Komelaya Kurd Neşrî Maarîf damezrandine. Di bernameya komelayê de xala duyem li ser perwerdehiya Kurdan bûye. Komelayê li Stenbolê bi navê Mekteba Meşrûtiyetê ya Kurdan bi rêveberina Abdurrahman Bedirxan dibistanek vekiriye. Hêvî di nav komelayên berî 1914an de komelaya herî serkeftî bûye. Di navbera Tebexa 1912an heta Îlona 1914an sê rojname hatine weşandin: "Rojî Kurd, Hetawî Kurd û Yekbûn." Hêvî ji bo Kurd wek komeke etnîk a cuda bên naskirin zêdetir xebitiye.[197]

Serhildanên Kurdan, berî serdema selteneta Ebdulhemîd dest pê kirine û di dema wî de jî berdewam kirine. Di 1877an û destpêka 1878an de serkeftinên Rûsan, Kurdan bêhtir dehfdane ku li Mêrdîn, Hekkarî, Behdînan û Dêrsimê, bi serhildan û raperînan li dijî Osmaniyan rabin. Lê ev serhildan ji aliyê leşkerên Osmanî ve hatine pêlîkirin. Şoreşekê jî li Cizîrê ji aliyê Bedirxaniyan ve dest pê kiriye, lê di encamê de Osmanîyan ev serhildandane sekinandine. Ji xeynî vê yekê Şêx Ubeydullahê Nehrî bi serhildana sala 1880ê bandoreke mezin li hiş û ramanên gelê Kurd kiriye. Herçiqas ev serhildan hatiye sekinandin jî Siltan Ebdulhemîd siyaseta xwe ya li hemberî

[195] Zülküf Ergün, "Gotara Dijkolonyal û Wêneyê Serdestiya Tirkan di Kovara Hawarê de" **Tîr û Armanc**, Peywend, Stenbol, 2014, r.23.
[196]Dijene Rhys Bajalan, **Jön Kürtler, Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)**, r.77.
[197]Djene Rhys Bajalan, **Jön Kürtler, Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914),** r.103-131.

Kurdan bi temamî guherandiye.[198] Şêx Ubeydullah li hemberî Peymana Berlînê ya di sala 1878an de hatiye destnîşankirin sekiniye. Ji ber ku ev peyman ji bo Ermeniyan soza xweseriyê daye wî sond xwariye ku wê heta dawiyê ji bo mafên xwe di berxwe bide.[199] Lewma gelek lêkolîner Serhildana Şêx Ubeydullah ji yên din cudatir girtine.[200] Şêx Ubeydullah wek şêxê yekem ê rola serokatiya siyasî ya girîng girtiye tê dîtin.[201]

Ji 1847an heta 1881ê, di bin birêvebiriya serokên gelerî de, ku gelek caran kesê oldar bûne, ji bo avakirina dewleteke Kurd serhildanên nû derxistine. Ew rêze serîhildanên ji hev bela û herêmî yên li dijî desthilatdariya navendî heta Şerê Cîhanê yê Yekem dewam kiriye. Sedemên têkçûna van tevgeran gellek bûne: tunebûna otorîteyeke yekgirtî, perçebûna feodalî, şerê desthilatê yê di navbera mîr û serokeşîrên Kurdan de.[202]

Rûsya, nerazîbûna xwe ya ji bo rûxandina mîrektiyên Kurdan rê daye, heta dema ji holêrakirina mîrektiyan di nav Kurdan de ji xwe re muttefîkan geriyaye. Di nav vê polîtîkayê de serokê eşîreta Şikakiyan Cafer Axa, Ebdurrezzaq Bedîrxan û Seyyîd Tahayê neviyê Şêx Ubeydullah di 1889an de li ser gazîkirina Çar çûne Rûsyayê û Çar bi awayekî xweş ew vexwendine.[203]

Di vir de pêwîst e bê gotin ku neteweperweriya Kurd li gor qada siyasetê şekil girtiye. Di bin bandora struktura civakî û nasnameya dînî de maye. Lewma bi polîtikayên dewletên serdest, tevgerên Kurd hatine lewazkirin. Neteweperweriya Kurd bi giştî negihîştiye armanca xwe. Tê dîtin ku piştî Meşrûtiyeta Duyem, rewşenbîr û çalakgerên Kurd ên li Stenbôlê bi riya komele, kovar û rojnameyên xwe xwestine vîneke siyasî û civakî çêbikin û rêberiya gel bikin. Ev hewldan negihîştine armanca xwe û di encama Şerê Cihanê yê Yekem de welatê Kurdan di nav çar dewletên neteweyî de hatiye parvekirin. Di wateya modern de Kurdistan bûye welateke kolonî û navûnîşanên wê yên dîrokî, civakî û çandî ketine ber pêla qedexe û asîmîlasyona çar dewletên neteweyî yên serdest.[204]

[198] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.153-154.
[199] Wadie Jwaideh, **Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi**, r.297-300.
[200] Naci Kutlay, **Osmanlı'dan Günümüze Kürtler**, r.72.
[201] Çakır Ceyhan Suvari, Suvari, "Şerefname'den Günümüze Aşîret Kimliği", ,r.315.
[202] Kendal Nezan, "Bi Awayekî Giştî Dîroka Kurdan",https://www.institukurde.org
[203] Nihat Karademir, **Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler**, r.33.
[204] Zülküf Ergün, "Gotara Dijkolonyal û Wêneyê Serdestiya Tirkan di Kovara Hawarê de" r.23.

### 2.2.2. Bandora Şerê Cihanê yê Yekem Li Ser Kurdan

Di erefeya Şerê Cîhanê yê Yekem hê heqên Kurdan ên wek bi zimanê dayikê peyivîn, bicîhanîna kevneşopiyên Kurd, xwe wek civakeke cuda dîtin hebûne. Lewma digel dijminiyên di nav serokên Kurdan û Bab-i Aliya Osmanî peywendiyeke erênî dewam kiriye. Wek mînak; Îsmaîl Heqqî Baban xwe wek neteweperwerekî Kurd dîtiye, ji endamên pêşî yên Îttehat û Terakiyê bûye, di Parlementoya Bexdayê de nûner bûye û di rojnameya neteweperwer a Tirk Tanîn de xwedî peywir bûye.[205]

Şerê Cîhanê yê Yekem, ji hemû civakên Rojhilata Navîn re felaket aniye. Herî zêde jî ji Kurdan re… Xwende û zanayên wan kêm bûne, yên hebûne jî pirî wan di nav şer de têk çûne. Tesîra van ji piştî şer hatiye dîtin.[206]

### 2.2.3. Piştî Şerê Cihanê yê Yekem Kurd û Neteweyetiya Kurdan

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, Brîtanyayê li Iraqê di bin serokatiya Haşimiyan de teşwîq kiriye ku dewletekî Ereb bê avakirin. Lê ji ber ku tevgera neteweyî ya Kurdan lewaz bûye û seroktiyek bi qabiliyeta bilind a temsîlkirinê di nav wan de kêm bûye Brîtanya ji bo Kurdan projeyeke bi vî awayî çênekiriye.[207] Brîtanî, di nav dewleta nû ya Iraqê de ji bo Kurdan bidin rawestan hewldanek taybet nîşan dane. Çimkî eyaleta Mûsilê ya ji aliyê petrolê ve dewlemend di destê Kurdan de bûye. Di makeqanûna Iraqê ya 1921an a demdar de qanûnên wek makeqanûna Iraqê ji du komên etnîk -Ereb û Kurd- pêk hatiye. Li gor makeqanûna Iraqê zimanên Kurd û Ereban di statuya wekhev e, cih girtiye. Hinek Kurd di bin bandora çardeh xalên serokê Emerîkayê W. Wîlson û xala “Her netew dikare qedera xwe tayîn bike.” de mane. Ji bo nasnameya Kurd a neteweyî ji vê qada siyasetê ya vekirî sûd wergirtine. Şêx Mehmûdê Berzencî, bi Brîtanyayê re gelek car pirsgirêk jiyaye û ji van lihevnekirinan yekî de xwe qralê Kurdistanê îlan kiriye û daxwaza Kurdistaneke serbixwe kiriye. Di wê demê de neteweperweriya Kurd, berbiçav bûbe jî di tevahiya Kurdistana Iraqê de nehatiye temsîlkirin. Serokeşîrên neteweperwerên Kurd ên wek Ehmed Muxtar Begê Caf û Mele Mistefa Berzanî piştgirî dane monarşiyê. Di dema

---

[205] Denise Natalî, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran’da Ulusal Kimliğin Gelişmesi**, İbrahim Bingöl (wer.), Avesta, İstanbul, 2009, r.53.
[206] Naci Kutlay, **Osmanlı’dan Günümüze Kürtler**, r.127.
[207] Nihat Karademir, **Osmanlı’nın Son Yüzyılında Kürtler**, r.399.

hilbijartina ji bo Qral Feysel piraniya Kurdên deşta Mûsilê ji dêvla piştgiriya hikumeta Silêmaniyê ya Berzencî, tevî Ereban eşîretên Misilman ên Tirk an jî bi hêzên biyanî re tevgeriyane. Kurdên Kerkûkê jî rêveberiya Şêx Mehmûdê Berzencî red kirine.[208]

Mistefa Kemal wek serdema împeratoriyê ya dereng û serdema Iraqê ya ewil de di pêvajoya tevgera serxwebûnê de Tirk û Kurdan wek birayên hevudu rave kirine. Lê piştî 1919an neteweperwerên Kurd xistine hepsê ku ji 1908an heta 1920an di Meclîsa Osmanî de Şêx Ebdulqadir jî têde 29 mebûsên Kurd hebûne.[209]

Di 24ê Tîrmeha sala 1920an de, li bajarê Îtalyayê Sanremo, Kongreya Sanremo hatiye lidarxistin. Di kongreyê de biryara mandeteriya Brîtanî ya li ser Iraq û Filîstînê û mandeteriya Frensî ya li ser Libnan û Sûriyê hatiye pejirandin. Ev yek di 10ê Tebaxa 1920an de bi peymana Sewr rê de hatiye imzakirin. Di vê peymanê de ji bo doza Kurdan cihekî taybet hatiye girtin.[210] Xalên Sewrê yên 62 û 64 di derheqê damezrandina dewletekî Kurdan de bûye. Lê ev peyman nehatiye sepandin, ji aliyê Tirkiyê ve nehatiye pejirandin û wek peymanekî mirî maye.[211]

Di 31ê Berfanbara 1922yan de li bajarê Lozana Swîsreyê konferanseke nû dest pê kiriye. Di dawiya vê konferansê de ji aliyê Tirkiye û dewletên Rojava de Peymana Lozanê hatiye îmzekirin. Di vê peymanê de li ser mafên Kurdan tu xal cih negirtine. Muzakereyên Lozanê demeke hatine birîn lê dîsa dest pê kirine. Pirsgirêka Kurdan li gor xwesteka Tirkiyê bi encam bûye.[212] Cegerxwîn li ser vê muzakereyê wisa gotiye:

Ew sûc û xetayên ko di Lozan de te dîne
Îmzayê me nîne
Îmzayê Liwid Corc û Kilemenso, û Wilson
Pey weqeyê Verdon
(Êrîş, Agir û Pirûsk, r.215)

[208] Denise Natali, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran'da Ulusal Kimliğin Gelişmesi,** r.68-76.
[209] Denise Natali, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran'da Ulusal Kimliğin Gelişmesi**, r.124-125.
[210] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.162.
[211] Wadie Jwaideh, **Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi**, r.264.
[212] Naci Kutlay, **Osmanlı'dan Günümüze Kürtler**, r.182.

Di navbera salên 1925-1940an de li Kurdistana Tirkiyê gelê Kurd zordestî û eziyetên gelek mezin dîtine. Ji cih û warên xwe ew bi darê zorê hatine dûr xistin û jê re riya sirgûnê hatiye xuyakirin. Bi hezaran malbatên Kurd ber bi Rojavayê Anatoliyê ve hatine sirgûnkirin. Di navbera van salan de sê serhildanên Kurd ên mezin pêk hatine ku ev serhildan; Serhildana Şêx Seîd (1925), Serhildana Araratê (1930) û Serhildana Dersimê ye (1937). Di van salan de medya Tirk ji bo reşkirina Kurdan roleke mezin leyistiye û li hemberî Kurdan nêrîneke nêzî hêzên fermî bûye.[213] Malmisanîj vê tevgera Tirkan wek antî-Kurdolojî bi nav kiriye ku di vê siyaseta bişavtinê de Aşaîr û Muhacîrîn Müdriyet-i Umumiyesi (Mudiriyeta Giştî ya Eşîr û Muhaciran) ji sala 1916an û pê ve li ser Kurdan hin xebatên girîng pêk aniye. Bi sed hezaran Kurd li Anatoliya Navîn û Rojava hatine bicî kirin.[214]

Armanca Sehildana Şêx Seîd, avakirina dewleteke Kurd a serbixwe bûye ku ev dewlet wê li ser prensîbên Îslamî yên ji aliyê Dewleta Tirk a modern ve hatine îhlalkirin wê bihata damezrandin. Ev serhildan ji hêla rêxistina Azadîyê ve hatîye plankirin. Ji bo ku xelk tevlî serhildanê bibe ji hêza şêxan sûd wergirtine. Bi têkiliyên di navbera Şêx Seîd û damezrînerê rêxistina Azadî de 1925an Şêx Seîd bûye serokê vê. Serhildana Şêx Seîd ku di sala 1925an de hatiye destpêkirin û li gelek herêmên Kurdistanê belav bûye. Di encamê de bi hezaran Kurd hatine kuştin û bi hezaran bi aliyê Anatoliyê ve hatine sirgûnkirin. Bi sedan kes penaberî Sûriye, Iraq û İranê bûne. Dewleta Tirk, piştî mudaxeleya leşkerî Qanûna Takrîr-î Sukûn derxistiye û Şêx Seîd tevî 47 serokên Kurd li Diyarbekir di 4ê Îlona 1925an de hatine dardekirin. [215] Cegerxwîn li ser vê bûyerê van malikan saz kiriye:

Wan Şêx Seîd Efendî girtin di cejne-rojî
Gelek mezin digel wî xistin şerîtê, yaro

Mela û şêx û begler, kuştin, serê di wana
Li ber tiving û topan manendî gog û kaşo
(Tarîxa Şêx Seîdê Rehmetî, Agir û Pirûsk, r.52-53)

---

[213]Rohat Alakom, "Di medya tirkî de karîkaturîzekirina serhildana (1930î) " **Çira**, (j.14), Havîn 1998, r.78.
[214]M.Malmisanîj, "Riya ku ji antîkurdolojiyê ber bi kurdolojiyê ve diçe û Îsmaîl Beşîkçî" **Le Monde diplomatique kurdî**, (j.13), Çileya pêşîn 2010, r.14.
[215]Martin van Bruinessen, **Ağa, Şeyh, Devlet**, r.387-429.

Piştî Serhildana Şêx Seîd serhildaneke Kurd a din jî, Serhildana Agiriyê ye. Ew serhildan ji aliyê rêxistina bi navê Xoybûnê ve hatiye birêxistinkirin. Xoybûnê Dr. Şukru Sekban ji xwe re wek serok hilbijartiye û biryar girtiye ku di bin serokatiya serleşkerekî Kurd ê Îhsan Nûrî Paşa de li Kurdistana Tirkiyeyê şerê çekdarî bidomînin. Îhsan Nûrî Paşa hem nûnerekî Xoybûnê, hem jî endamê Komeleya Kurdistan Azadî bûye. Îhsan Nûrî, beriya serhildanê di 1924an de tevî 400 leşkerên Kurd ji Artêşa Tirkiyeyê reviyaye û çûye Îranê. Piştre Şerê Agirî di bin desthilatdariya Îhsan Nûrî Paşa de dest pê kiriye.[216] Cegerxwîn rewşa Kurdan a piştî Şerê Agirî bi vî awayî aniye zimên:

Piştî şerê Erarat
Bi ser Kurd de bela hat

Zar û zêç û mêr û jin
Ketin nav lepê dijmin
(Hovîtiya Dijmin, Ronak, r.19)

Xoybûn herçiqas bi piştgiriya hêmanên îdeolojîk tevgerekî bajarî be jî armanca wê ya yekem di nav eşîretan de belavkirina fikra neteweperweriyê bûye. Lê ev stratejiya Xoybûnê bi giştî neçûye serî. Têkçûna Serhildana Agirî li ser Kurdên Sûriyê ji aliyê neteweperweriya Kurd û pêşveçûna nasnameya neteweyî ya Kurd ve bandoreke mezin kiriye. Ji ber ku têkoşîna bi çekan negihîştiye armanca xwe gelek çalakîsazên di nav siyaseta aktîf de cih girtibûn dev ji têkoşîna bi çekan berdane û berê xwe dan xebatên çandî.[217] Ji ber ku Îranê piştgirî daye vê serhildanê di havîna 1930an de Enqere, ji bo piştgiriyê nede serhildêran Îran hişyar kiriye. Ev serhildan di navbera Îran û Tirkiyê de di 23 Çile 1932yan de bûye sedema destnîşankirina peymana sînor.[218] Ev bûyer û serhildan tenê ji aliyê siyasî ve Kurdan negirtiye nav

[216] Yusuf Kaynak, **Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî**, r.25.
[217]Nelida Fuccaro, "Manda Yönetimi Suriye'sinda Kürtler ve Kürt Milliyetçiliği:Siyaset, Kültür ve Kimlik", **Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri**, Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç (wer.), Avesta, Stenbol, 2005, r.242-247.
[218]Robert Olson, **Kürt Meselesi ve Türkiye-İran İlişkileri**, Hikmet İlhan (wer.), Avesta, 2010, r.47.

pencê xwe. Di encamê de ji aliyê aborî, çandî û civakî ve jî bandoreke neyinî li ser Kurdan çêkiriye. Zimanê Kurdî wek zimanê axaftinê li her cihî hatiye qedexekirin.[219]

Ji aliyê din ve Îranê jî ji pirsgirêka Kurdan fikar kirine. Nûnerê Îranê yê Komeleya Neteweyan, ji rêveberiya Tehranê re di derheqê Kurdan de polîtîkayên asîmîlasyona çandî pêşniyar kiriye. Di 1927an de Îran li hemberî bizavên Simko yên biqasî Serhildana Şêx Seîd bibandor bûye hejiyaye. Ev yek bûye sedema Îran û Tirkiye bi hev re hereket bikin. Rıza Şah piştî serhildana Simko li ser serokên eşîretên Kurdan ewqas zilmeke tund kiriye ku Kurd di 1944-1945an de dîsa serî hildane. Serhildan îcar ji herêmên gundewarî zêdetir li bajaran xwe rê daye. Ev neteweperweriya Kurdan di damezrandina Komeleya Mahabad de roleke mezin leyistiye.[220]

Li Îranê avabûna netewedewletê ji aliyên wesf û demê ve ne wek projeyên Iraq û Tirkiyê bûye. Îran, di nav Fars û Kurdan de bi pêkanîna mîtên hevpar ên xwedî heman dîrokê, bi sînor be jî etnîsîteya Kurd ji aliyê çandî ve nas kiriye. Ev yek Îranê ji Iraqa mêtinger a pêşwext û ji Tirkiya Kemalîst cudatir kiriye û ji bo geşkirina neteweperweriya Kurd zêde firset nedaye. Di 1921an de piştî darbeya leşkerî, wezîrê parêzvaniyê General Rıza Xan bûye serokdewletê Îranê û di derheqê Kurdan de polîtîkayeke tund diyar kiriye. Kurdan wek civakekî eşîretî dîtiye û hikumetên biyanî ji ber di nav eşîretên Kurd ên Iraqê de hevrikiyê zêde dikin rexne kiriye. Rıza Şah xwestiye rêxistina siyasî û leşkeriya eşîretên Kurdan birûxîne. Serokên Kurdan di bin bandora tevgerên Kurdan ên derveyî sînor de mane. Wan di bin parêzvaniya Brîtanyayê de ji bo avakirina dewleteke Kurd bi rayedarên Brîtanyayê re hevdîtinek pêk anîne. Li gor van hewldanan neteweperweriya Kurd ne xurt bûye. Kurdên Îranê xwe mensûbê eşîretên wek Senendicî, Kermanşahî, Mehabadî, Hemedanî, Sunnî, Şiî û Şikak, Mameş, Pîşder, Caf, Kelhûr û Şemdînanî pênase kirine.[221] Binyada eşîretî û perçebûna Kurdan li ber hewldanên neteweperweriyê astengiya herî mezin teşkîl kiriye.

Li Yekîtiya Sovyetê di dema Lenîn de heta dawiya salên 1920î herêma Kurdnişîn xwedî statuya otonom bûye û wek Kurdistana Sor hatiye zanîn. Piştre ji

---

219 Abdullah Keskin, "Kürtçe Araştırmaların Seyri", **İnatçı Bir Bahar**, Vecdi Erbay (amd.), Ayrıntı, İstanbul, 2012, r.388.
220Robert Olson, **Kürt Meselesi ve Türkiye-İran İlişkileri**, r.45-46.
221Denise Natali, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran'da Ulusal Kimliğin Gelişmesi**, r.177-181.

aliyê Stalîn ve statuya otonom a Kurdistana Sor hatiye betalkirin û bi Azerbaycanê ve hatiye girêdan. Rejîma Stalîn zilm li Kurdan kiriye û zimanê Kurdî li Azerbaycanê hatiye qedexekirin.[222]

Serhildana li Dersimê di sala 1937an de dest pê kiriye. Bi awayekî ewqas tund hatiye sekinandin ku ji aliyê zanyaran ve wek komkujî yan paqijiya etnîk hatiye pênasekirin. Ji bo vê serhildanê balafirên şer jî hatine bikaranîn. Di 1930yan de sêsed balafirên şer ên Tirkiyê hebûne. Berî Şerê Cîhanê yê Duyem van her sê serhildanên Kurdan ji aliyê hêzên Dewleta Tirk ve bi dijwarî hatiye sekinandin.[223]

### 2.2.4. Bandora Şerê Cîhanê yê Duyem Li Ser Kurdan

Bi derketina Şerê Cîhanê yê Duyem li seranserê cîhanê gelek ziyanên mirovî û aborî çêbûne. Digel vê li ser asta Kurdan jî gelek ziyan derketine holê ku bandora vana li her çar dewletên piştî Şerê Cîhanê yê Yekem Kurdistan li wan hatiye parvekirin berbiçav bûye.[224] Cegerxwîn bi van risteyên li jêr wêranbûna welatê Kurdan û belengaziya xelkê daye berçav:

Nayên bîra we ew cengên mezin
Şêst milyon însan tev dane kuştin
Di ber piyan çûn keç û mêr û jin
Tev de hilweşîn bajar û kelat
(Xortên Demuqrat Keçên Demuqrat, Sewra Azadî**,** r.89)

Bi Şerê Cîhanê yê Duyem re li Iraq û Îranê tevgerên Kurd ji nû ve geş bûne. Partiyên nepenî hatine sazkirin û di 1943-1945an de bi serkêşiya Mele Mistefayê Berzanî serhildana çekdarî ya biçûk, li Iraqê heta Îranê di nav xelkên bajarî de olan daye û piştgiriyeke manewî dîtiye.[225] Li Îranê bi hatina îqtidarên biyanî li hin eyaletan astengiyên li ser siyaseta Kurdan wek demdar rakiriye. Bi piştgiriya Sovyetê neteweperwerên Kurd, metbeayên nû bi dest xistine û di 1942yan de bi navê Komeley-î Jînewey-î Kurdistan partiya neteweyî ya Kurdistan damezrandine. Ji bilî

[222] Jemal Nebez, **Kurd (Dîrok û Kultura Wan),**r.76-79.
[223]Robert Olson, **Kürt Meselesi ve Türkiye-İran İlişkileri,** r.27-40.
[224] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.175.
[225] Martin van Bruinessen, **Ağa, Şeyh, Devlet**, r.48.

vê serokekî wan ê wek Qadî Mihemmed hebûye ku wî dikaribûye li eyaletên dûr nufûsa Kurdan bide tevgerandin. Qadî Mihemmed, perwerdekirî, esilzade, dadger û di heman demê de alimê olî bûye. Di vê demê de hestên neteweperweriya Kurd zêde bûye.[226]

Di 1946an de piştî cîranên xwe yên Azerbaycanî bi piştgiriya Yekîtiya Sovyetê Kurdên Mehabadê jî serxwebûna xwe îlan kirine. Wan, ji Kurdên Iraqê yên hezar-du hezar çekdarên eşîretê yên di bin emrê Mistefa Berzanî de jî piştgirî dîtine. Komar hîn saleke wê tijî nebûbû bi dawî bûye. Yekîneyên Sovyetê Îranê terk kirine ku bi piştgiriya artêşeke bihêz nebûya ne mumkin bûye ku Komara Kurd a ciwan bi artêşa Îranê re serî derkeve. Mela Berzanî û yên pê re vegeriyan Iraqê, yên din jî teslîm bûne. Serokwezîr Qadî Mihemed, birayê wî Sedr û biraziyê wî Seyfî Qadî hatine xeniqandin.[227] Cegerxwîn hestên xwe yên li ser kuştina Qadî Mihemmed bi vî awayî destnîşan kiriye:

Ev ne şerm e têne kuştin em di rêça pêşketin
Da Tirûman zanibî em xweş nijad û millet in
Dê bikin em tim bi wî re dijminahî, berberî

Aferî, aferî
Qadî Mihemed aferî
(Di Bîranîna Qadî Mihemed, Sewra Azadî, r.200)

Îranê carinan ji Kurdan re mafên wek vekirina komeleyên Kurd û îstasyona radyoya Kurdî dabin jî di dawiya 1970an de li Îranê dibistaneke ku perwerdehiya Kurdî bide tune bûye. Piştî şoreşa 1978-1979an, Ayetullah Humeynî siyaseta Pan-Îslamîst pejirandiye û qada neteweperwerên Kurd fireh kiriye. Ji ber referanduma di 1979an de pêwîst bûye ku bi vî awayî tevbigere. Li Îranê behsa şirîktiya Sunnî-Şiî hatiye kirin lê çepgirên Kurd ên Sunnî wek Komunîst hatine yaftakirin. Piştî 1979an qada siyasî ji bo neteweperwerên Kurd, teng û bi xetere bûye. Polîtîkayên hikumetê yên di derheqê Kurdan de her çûye wek serdema Partiya Beasê ya Îranê, piştî 1980an

[226] Denise Natali, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran'da Ulusal Kimliğin Gelişmesi**, r.188.
[227] Martin van Bruinessen, **Ağa, Şeyh, Devlet**, r.48.

Dewleta Tirkan a leşkerî û polîs dewleta Pehlewî rewşeke nebaş girtiye. Humeynî piştî referandûm qezenc kiriye muzakereyên bi serokên Kurdan re biriye. Nîqaşên li ser xweseriya Kurdan qedexe kiriye û Kurd ji Qonseya Pisporan qewirandine. Di dema Rafsancanî û Hatemî de jî heman polîtîka hatine dîtin. Heta îqtidarên xwe zexm kirine hin maf dane Kurdan. Piştre neteweperweriya Kurdan asteng kirine û mafên dane wan ji wan stendine.[228] Li ser vê yekê Cegerxwîn di helbesta xwe de cih daye rexnekirina Humeynî (Xumênî):

Xum… Xumênî, Xumênî
Xwîna Kurdan dirjênî

Ey îmamê derewçîn
Te Îran kirye çînçîn
(Ya Kurdistan Ya Neman, Aşîtî, r.16)

Tevgera neteweperwerên Kurdên li Tirkiyê jî di bin bandora Komara Mehabadê de maye. Digel vê yekê pirsgirêka Kurdan ji Peymana Sewrê vir ve cara yekem bi tevahî bûye pirsgirêkeke navneteweyî.[229]

Li Iraqê bi çûyina Brîtanyayê û bi ketina monarşiyê ya ji îqtidarê re neteweperwerî ji rojeva siyasetê derketiye. Ebdulkerîm Kasım dema di 1958an de bi derbeya leşkerî hatiye serî, xwestiye ku fikra xweseriya Kurdan saz bike. Ebdulkerîm Kasım, yekitiya Ereban a mezin li Iraqê bi cih kiriye. Ligel vê yekê makeqanûnek demdara şirîkatiya Kurd-Ereb di xwe de dihewîne pêk aniye. Lê Kasım, ji bo projeya netewe-dewleta xwe ava bike piştî 1959an li ser Kurdan polîtîkayên asîmîlasyonê bi kar aniye. Navên herêmên Kurdan bi Erebî hatiye guherandin, rêxistinên Kurdan hatine girtin, mezinên Kurdan û Komunîst hatine girtin. Piştî ketina îqtidara Kasım jî ji bo Kurdan heman polîtika hatiye ajotin. Di dawiya salên 1970an de qada siyasî ewqas guheriye ku hemwelatîbûna Iraqê wek endamtiya Beasê hatiye dîtin. Lê dewlet ji ber ku di nav Kurdan de nikaribûye hestên Iraqîbûnê biafirîne ji bo civakên

[228]Denise Natali, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran'da Ulusal Kimliğin Gelişmesi**, r.198-226.
[229] Robert Olson, **Kürt Meselesi ve Türkiye-İran İlişkileri,** r.49.

Kurd bikişînin navenda siyasî dest bi xebatên din kirine.[230] Îqtidar ji bo hêza xwe xurt bike soza xweseriyê daye Kurdan û Kurdan kişandine cem xwe. Piştî serweriya xwe xurt kirine mafên dane ji wan stendine. Vê serdema ku ji bo Kurdan hin maf hatine dayin di helbesta Cegerxwîn de wisa reng vedaye:

Ey Ebdilkerîm, ey Ebdilselam
Ji Kurdên Sûrî, li we sed selam
Win herdu gernas, win herdu şepal
Bijî payedar, serok Şêr Cemal
Bijî leşkerê xurt û qareman
Her bijî Iraq, bijî Kurdistan
(Zencîr Ji Gerdenim Şikest, Kî Me Ez, r.94)

Dema li rewşa Kurdên li Sûriyê binêrin di vê pêvajoyê de hemî karên regezperestî li dijî neteweya Kurd hatine berdewam kirin, wek bêparkirina zarokên Kurdan ji xwendinê. Xwendevanên Kurd ji dibistan û ji zaningehên Sûriyê hatine derxistin. Memûrên Kurd ji karên xwe bi tohmeta ku ew ji bo selametiya welat xetere ne hatine derxistin an jî wan mecbûr kirine ku bikevin nav refên partîya Beasê. Ji aliyê din ve, Beasiyan bi rengekî berdewamî dest bi hewldanên Erebkirina Kurdan kirine. Lewma nehiştine ku tu navên Kurdî yên zarokên Kurdan werin nivîsandin. Hemû navên gund û bajarên Kurd guherandine û navên Erebî li wan kirine.[231]

Li Tirkiyeyê di hilbijartina 1946an de Partiya Cumhuriyet Halk sîstema siyasî girtiye bin qontrola xwe û rê li ber siyaset û îdeolojiya neteweperweriya Kurdan girtiye. Kurdan li derveyî sînorên Tirkiyê xwestine tevbigerin. Li Suriyeyê bi fikrên neteweperwer *Ronahî* û *Roja Nû* jî tê de bi weşandina kovarên Kurd dewam kiriye. Lê ev xebat ji bo rêxistina neteweperweriya etnîk têr nekiriye.[232]

### 2.2.5. Di Helbesta Kurdî de Perspektîfên Neteweyî

Wek berê jî me diyar kiribû, fikra neteweyî yek ji encamên herî girîng ên Şoreşa Frensayê bûye. Rewşenbîrên Frensî di vê serdemê de li hemberî sîstema

[230] Denise Natali, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran'da Ulusal Kimliğin Gelişmesi**, r.95-109.
[231] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.176-188.
[232] Denise Natali, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran'da Ulusal Kimliğin Gelişmesi**, r.145-146.

monarşiya şahitiyê, fikra dewleta neteweyî derxistine pêş û bûne danerên fikra dewleta neteweyî. Jixwe dewletên neteweyî yên Rojava jî di encama van hewldanan de hatine damezirandin. Di nav neteweyên bêdewlet ên mîna Kurdan de fikra neteweyî û vîna giştî ya neteweyê li hemberî vîn û desthilata dewletên serdest hatiye pênasekirin.

Ji ber vê yekê di helbestên romantîk ên Kurdî de fikra neteweyî, ne bi danîna sîstema “komar” e, ne jî bi avakirina “meşrûtiyet”ê hatiye îfade kirin. Lewma ji bo derketina “vîna neteweyê” pêwîstiya romantîkên Kurd bi “serxwebûn”ê hebûye. Hacî Qadirê Koyî ku serxwebûna hin neteweyên Balkan ên ku berê di nav sînorên Dewleta Osmanî de bûne wek nimûne nîşanî Kurdan daye û wan ji bo serxwebûnê teşwîq kiriye. Cegerxwîn jî çareseriya hemû êş û janên Kurdan di serxwebûnê de ditîye û gelê xwe ji bo vîna neteweyî bisêwirîne wek ku di malikên li jêr de tê dîtin risteyên xwe rêz kiriye:[233]

Eger rast e, dixwazî xurtemêr bî
Divê rabî, wekî gernas û şêr bî
….
Li ser destûreka nûjen herin pêş
Ji hawîr ve ku av bê tim li ser êş
(Di Nav Koma Diza Me, Hêvî, r.20-21)

Li Iraqê herçiqas neteweperweriya Kurd lewaz û perçebûyî be jî bi fikrên neteweperwerî li hemberî zilma dewletê Pîremêrd, Faîk Abdulla Bêkes û Ebdulla Goran neteweperweriya Kurd teşwîq kirine û bal kişandine ser pirsgirêka Kurdan.[234]

Dema ku rewşenbîriya Kurd a beriya şerê Cîhanê yê Yekem bi nasnameya Kurd a resen ji bo înşakirina rêvebiriya Osmanî ya nû wek stûnekî hatiye dîtin, piştî şer îcar ev nasname li ser zemîna rêvebirineke netewetî ya Kurdan ji bo avakirina yekîtiyeke siyasî ya cuda hatiye tesewirkirin.[235] Ev yek di heman demê de xisûsiyata edebiyata berxwêder e jî ku edebiyata Kurdî ya nûjen, ji gelek aliyan ve bi vî rengî

233 Zülküf Ergün,“Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn”, r.19.
234 Denise Natali, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran’da Ulusal Kimliğin Gelişmesi,** r.81-82.
235 Azad Aslan, “Folklor û Netewetiya Kurd a Ewil /Guherînên Girîng ji Osmanîtiyê ber bi Netewetiya Kurd ve” r.113.

ye. Ji ber ku rengê siyaseta wan li ser berxwedanê ava bûye, edebiyata ku pêwend bûye jî ev reng stendiye. Lewma ji ber ku îqtîdaran ew tune hesibandine û xwestine wan û nasnameya wan tune bikin, berxwedan pêk hatiye û ev kiras li siyasetê û herwiha li edebiyatê jî bûye.[236] Cegerxwîn gelek rûmetê daye xwendin û zanyariyê, di helbestê xwe de girîngiya xwendinê diyar kiriye:

Bizane xwendin ji bo me derman
Da ko bizanin qanûn û ferman
Derxin ji bo me van tirs û şerman
De rabe
Ser xwe
Kurê mi
Rabe!
(Em Azadîxwaz in, Hêvî, r.44)

Di vir de hêja ye ku mirov behsa di helbestê de girîngiya fikra neteweyî bike ku di gelek helbestan de kirasê bûyerên dîrokî bi perspektîfeke neteweyî hatiye fesilandin. Remezan Alan di gotara xwe ya li ser vê mijarê ya “Em di Eyna Dîrokê de” bi neqlkirina fikrên Edward W. Said wisa gotiye:

“Bi qewlê Edward W. Said, trajediyeke qismî ya rewşenbîr, helbestkar û pêşewayên berxwedanê heye. Ji ber ku ev kes, wek Said jî dibêje mecburî kar û emelekî ne ku li ser “bixebitin” û ji bo hevgirtiyeke berfireh, hesteke civakî ya hevpar biafirînin; li pey ol, leheng û mitosên nû bikevin.”[237]

Eşqa welat di helbestên Cegerxwîn de bi şêwazeke cuda hatiye bikaranîn ku ew bi awayekî ruxsarî nêzî wêjeya klasîk be jî bi naverokî ji wêjeya klasîk veqetiyaye. Cegerxwîn ji ber serdema tê de jiyaye û şikestinên pêk hatine wek modernîstekî tevgeriyaye.

Belê; netewe, encama bilêvkirina neteweperweriyê ye, îcatekî siyasî ye û ji ber vê yekê bûyereke modern e. Modernîteya netewe û nasnameya neteweyî, hemû nêzîkbûna avaker ên di nêrîna wan a neteweperwerî de xisûseke diyarker e.[238]

---

[236] Mîkaîl Bilbil, **Helbesta Cegerxwîn û Îqtidar**, r.32.
[237] Ramazan Alan, “Em di Eyna Dîrokê de” r.218-220.
[238] Abbas Vali, **Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri**, Avesta, İstanbul, 2005, r.20.

Li Komara Tirkiyê ji bo Kurdan qada siyasetê tune bûye, zimanên wan û çalakiyên çandî yên Kurdî hatine qedexekirin. Kurd di welat de herçiqas ji aliyê mezinî ve civaka etnîk a duyem bin jî miameleya kêmnetewe dîtine. Wê rewşê ber pêşveçûna neteweperweriya Kurd girtiye. Neteweperweriya Kurd a etnîk hatiye sekinandin.[239] Wê rewşê bandoreke mezin li ser helbesta Kurdî kiriye. Gelek helbestvanên Kurd, ji ber van qedexeyan temayên helbestên xwe bi awayekî epîk li ser axa welat û neteweperweriyê hûnandine. Ev fikr, di helbestên Cegerxwîn de cihekî girîng girtiye:

Çiman her dem li jêr î?
Gelo ji kê newêrî?

Min go: Belkî tu şêr î
Lê xuya ye pisîk î
(Êlperestî Nexweşiyeke Dijwar e, Hêvî, r.16)

Ji ber polîtikayên asîmîlasyonê yên li ser xelkê, barekî giran ketiye ser milên rewşenbîrên Kurd. Tirsa windabûna nirxên wek ziman, çand, folklor û dîrokê bûye sedema nivîsandina helbestên helbestvanên wek Cegerxwîn. Mînak:

………

Koledar, xwedîmal, tev dilşad, tev dilxweş
Em tenê perîşan, belengaz, ser bi reş
Bê rêber, bê rêzan, bê dewlet, bê serdar
Bê xwendin, bê ziman, bê rûmet, tev hejar

Berdan ser pişta me, dijmin pir lat û hîm
Newêrin, em bêjin, li ber wan lam û cîm

……….

(Sersala Sala 1959,  Kî Me Ez, r.71)

---

[239]Denise Natali, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran'da Ulusal Kimliğin Gelişmesi**, r.135-140.

Di helbestên li ser neteweperweriya Kurdan de li hemberî nêrînên nebaş ên li ser Kurdan, nêrînên “ yekîtî, zanîn û hişmendî” wek çareserî hatiye dîtin. Di vî warî de di gelek helbestên Cegerxwîn de li hemberî nêrînên wek biçûkdîtin û nemedenîbûna Kurdan“îbareya ne hirç û hovin”derbas bûye:

Xurtiya me ye, yekîtî û zanîn
Koka xebatê pê tête danîn
Destên we bişkin, çi ton mirov in?
Kengî şiyar bin ne hirç û hov in?
(Dîlber Gelek Ciwan e, Şefaq, r.50)

Di heman demê de nasnameya tund, zêde heqqê axaftinê nedaye endamên civakê. Nasnameyên şovenîst nasnameyên din biçûk û kêmî xwe dîtine. Heta serî li darê zorê daye ku ev yek di pêvajoya dîkekirinê de peywendiya nasnameyên tund bi yê din re diyar kiriye. Lê nasnameya kolektîf, ji pêvajoyekî piralî pêk hatiye.[240] Ji bo nasnameyeke kolektîf a bi hêz bê avakirin, di helbesta Kurdî de qaîdeya yekem yekîtî ye. Di nav temayên sereke yên helbesta Cegerxwîn de “ yekbûn”a Kurdan jî heye:

Ma qey tu nizanî tu kurê miletê Kurd î
Hemxakê birayê Ereb û Tirkî û Firs î…
Em tev de kurê Kurd û divê Kurd bibî yekdil
Lorî kî ye, Gorî kî ye, Zazî kî ye, Xursî?!
(Şandiyê Millet, Sewra Azadî, r.61)

### 2.2.5.1. Helbesta Kurdî û Avakirina Nasnameya Kollektîf

Têgeha “îqtîdarê” beramberî têgeha “dewlet”ê tê ku ew jî organîzasyona encama wan tevgerên kolektîfkirinê ne. Elbet ew tevger ji bo pêkanîna îqtidarê divê bi ser kevin. Dema behsa tevgerên neteweyî yên Kurdan bê kirin ji ber ku welatê Kurdan cografyayeke perçebûyî ye û zimanê wan pirdiyalektîk e. Hem meseleya tevgera neteweperweriyê hem jî bi vê ve girêdayî meseleya edebiyata neteweyî, di her herêm û civakê de xisûsiyêtên dîrokî yên cuda girtine. Ji ber ku bûyerên cuda

[240]Muhittin Aşkın “Kimlik ve Giydirilmiş Kimliler”, r.215.

qewimîne û îqtîdarên cuda ava bûne, gelekî girîft û giran bûye. Cegerxwîn jî di hewldana pêvajoya avakirina nasnameyeke kolektîf û di nava kolajeke neteweyî de cih girtiye. Ev kolaj ji kesên wek Pîremêrd, Goran, Bêkes, Dildar, Osman Sebrî, Qedrîcan û Hejar pêk hatiye. Ji ber vê, hewldana Cegerxwîn a gihîştina îqtîdarekê ye ku rengvedana têkiliyên îqtîdarî di helbesta wî de gelek peyda bûne.[241] Wek mînak:

Çi Xerza û Bota û Zaza û Tor
Çi Kurmanc û Kelhor, çi Goran û Lor

Hemî qey ne Kurd in çima perçe bûn?
Bi destê neyaran ve berdan hebûn
(Êlperestî, Zend-Avista, r.94)

Nasname hem bi awayekî hebûnî û hem jî bi awayekî civakî û psîkolojiya civakî derketiye holê. Lê, aliyê nasnameyê yê civakî, di nav van kategorîzasyonan de xala herî girîng e. Ji bo vê jî nasname; avakirina kesayetiyê ya bi civakî ye. Mirov dikare ji vê yeke re bibêje nasnameya kolektîf. Wekî Wheelîs jî gotiye, nasname; hîsa yekitî û hevgirtinê ye. Eger ev yek, zirarên yekitî û hevgirtinê bîne pê, talûke û pirsgirêkên civakî derdikevin holê.[242] Helbest jî di nav psîkolojiya civakê de derketiye holê û ji civakê re hatiye pêşkêşkirin. Helbestvan bi peywendiya kesayetiyê ya bi civakê re bal kişandine ser avakirina nasnameya kolektîf. Cegerxwîn wek helbestvanê neteweya Kurd, tunebûna nasnameya kolektîf bi vî awayî aniye zimên:

Bi hev re me Kurdan dikir berberî
Hezar perçe bûn, nebûn yek kerî
(Êlperestî, Zend-Avista, r.93)

Benedict Anderson di vî warî de gotiye ku:"Diyardeyên wek neteweperwerî ne lîberalîzm an jî faşîzm e. Diyardeyên wek merivatî û ol bi hev re bên fikirîn her tişt wê hêsantir bibe." Anderson bi rihekî antropolojîk vê pênaseyê pêşniyar kiriye:

---

[241] Mîkaîl Bilbil, **Helbesta Cegerxwîn û Îqtidar**, r.30.
[242] Zeki Gürür, "Polîtîkayên Dewleta Tirk ya Çandkujî û Zimankujiya Kurd û Dengbêjî", **Toplum ve Kuram**, (j.2), Güz 2009, r.136-137.

“Netew civakeke siyasî ya hatiye xeyalkirinê ye. Di heman demê de cemaet bi şiklekî wisa hatiye xeyalkirin ku di xwe de hem sînorkirinê hem jî serweriyê dihewîne û endamên neteweya herî biçûk jî endamên din nas nakin.”[243] Li gor neteweperwerî argumanên yekîtiya netewî ava kiriye ne şênber e. Ji vir de tê dîtin ku neteweperwerî ji bo nasnameyeke kolektîf îdeolojiyeke xeyalkirî ye. Cegerxwîn jî rêyeke bi vî rengî bi kar aniye ku wek ji dîwanên wî xuya ye di gotina merşan de yekîtiya gelekî teheyûl kiriye. Îqtidara ku wê vê fikrê bi xwe re bîne fikiriye.[244]

Ev xwesteka Cegerxwîn a avakirina nasnameya kolektîf ji ber ku telebdariya serxwebûnê û kişfkirina nasnameyeke netewî, ji rewşa kolonyal muzderîb bûye, rastî astengiyan hatiye. Ji ber ku dûrbûna ji welêt, kêmbûna jimara girseyeke xwende, tunebûna îmkanên belavkirineke ji rêzê, qedexebûna avakirina saziyên xwe, tesîra rojname û kovarên temenkin -ên wek Kurdistan, Rojnameya Kurt Teavûn ve Terakkî, Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Jîn- kêm kirine. Digel vê muessîra mekan-teng, hişyariya netewî û parastina zimanê Kurdî, li ser rûpelên wê îradeyê baqî mane.[245] Xwesteka yekbûna gelê Kurd di helbesta Cegerxwîn de wisa hatiye diyarkirin:

Kurdno hemî bibne yek
Dest bavêjin gurz û çek

Werin şerê hirç û dêw
Biparêzin mal û mêw
(Keko Ez Bilûrvanim, Şefaq, r.22)

Ji bo çêkirina fikra neteweyî û gihîştina serxwebûnê Cegerxwîn, dawa homojenkirina komelê kiriye. Cegerxwîn, her wekî neteweperwerên serdema xwe ji bo avakirina nasnameya neteweyî, pêwîstiya yekîtiya ziman, çand û îdealên paşerojê dizanibûye. Ji ber vê yekê Cegerxwîn dawa homojenkirina komeleya Kurdî kiriye û her tim vê xwesteka xwe dubare kiriye.[246] Cegerxwîn gotiye ku:

---

[243] Benedict Anderson, **Hayali Cemaatler “Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması”**, İskender Savaşır (wer.), Metis, İstanbul, 1995, r.20.
[244] Mîkaîl Bilbil, **Helbesta Cegerxwîn û Îqtidar**, r.39.
[245] Ramazan Alan, **Zanista Edebiyata Modern**, Peywend, Stenbol, 2015, r.53-54.
[246] Zülküf Ergün, “Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn”, r.21.

Yekîtî divê berî her tiştî bo Kurdî
Çi Zaz û Kurmanc çi Kelhor û Lor e
(Xwediyê Miriyan Kor e, Agir û Pirûsk, r.33)

Dema Cegerxwîn ji bo avakirina nasnameyeke kolektîf xebitiye ango helbest nivîsîne, tim ji kokên arkaîk îstifade kiriye û ji bo "îro"ya xwe rabirdûyeke ku tê de mûqtedîr bûne, teheyûl kiriye.[247] Bi gelemperî di helbestên xwe de ji bo nasnameyeke kolektîf ava bibe ji dîrokê îstifade kiriye û gazî lehengên dîrokî kiriye. Wek mînak:

Kurê Kardox û Mîtan!
Di tarîxê pehlewan
Menêre ko bindest im
Kevnare û ji mêj im
(Keko Zimandirêj im, Şefaq, r.44)

## 2.2.6. Bandora Vê Serdemê Li Ser Nivîsandina Şerefnameya Menzûm

Nêrîna wî ya modernîst û sekuler diyar kiriye ku Cegerxwîn herçiqas perwerdehiya olî girtibe jî di bin bandora bûyerên siyasî û civakî yên gelê Kurd de maye. Pirsgirêka gelê Kurd bûye pirsgirêka wî ya takekesî. Wî alîgiriya fikrên neteweperериya Kurd kiriye û bi tu awayî bindestiya Kurdan nepejirandiye. Ji bo hişyarkirina bîra neteweyî di *Şerefnameya Menzûm* de ji rûhaniyeta mîrên Kurdan alîkarî xwestiye ku hiş û bîra xwendekaran fireh bike. Bi vî awayî xwestiye ku xwendekarên wî cudahiya jiyana Kurdan a serbixwe û ya do û jiyana bindest a îro bibînin. Bi vejandina lehengên kevn, peyama hişyarbûn û di berxwedayinê daye xwendevanan. Wer xuya ye ku ji bo vê dîwanê wek çavkanî hilbijartina kitêba *Şerefname*yê jî ne tesadufî ye. Cegerxwîn ji ber ku *Şerefname* yekem kitêba li ser dîroka Kurdan a ji aliyê Kurdekî ve hatiye nivîsandin. *Şerefname* kiriye bingeha *Şerefnameya Menzûm* ku *Şerefnameya Menzûm* jî wek belgeyeke dîrokî derketiye holê.

[247] Mîkaîl Bilbil, **Helbesta Cegerxwîn û Îqtidar**, r.37.

Di helbestên Cegerxwîn de peywendiya do, îro û paşerojê di çarçoveya romantîzma neteweyî de baştir derketiye holê. Di *Şerefnameya Menzûm* de ji bo rizgariya Kurdan gazî û hawara xwe biriye ber padîşah, mîr û begên Kurdan. Rasterast dewlet û hikûmetên berê kiriye hêza manewî ya damezrandina paşerojeke geş. Cegerxwîn li ser bingeha *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî di vê berhema xwe de navê çil û pênc xanedanên Kurdan jimartiye û ji mîr û padîşahên van xanedanan hêvî kiriye ku bi hawariya Kurdan ve bên û wan ji vî halê nebaş rizgar bikin. Ev ji nîşan dide ku di helbestên Cegerxwîn de dîrok wek rûhekî neteweyî hatiye nîşandan û ji bo vejandina neteweya Kurd hatiye bikaranîn.[248]

Cegerxwîn ji mîran xwestiye ku ji nû ve bijîn û bi çavê xwe bibînin xirabî û wêraniya bi ser şûnwarên wan de hatiye. Li gor vê nêrînê êdî tiştek nema dişibe berê, nasname li ber windabûnê ye, lê tevî vê jî ew ji vê cografyayê derneketiye. Ev jî destnîşan dike ku Cegerxwîn bi xaka xwe ve girêdayî ye.[249]

Cegerxwîn çawa ku ji jinenîgariya wî jî diyar e, di demekê û erdnîgariyekê de jiyaye ku tê de gelek serûbinbûnên civakî û şikestinên dîrokî pêk hatine ku Şerê Cihanê yê Yekemîn, Şoreşa Oktobirê ya li Rûsyayê, avabûna netewe-dewleta Tirkan, serhildana Şêx Seîd, dagirkirina Frensayê ya Sûrî, perçebûna erdnîgariya Kurdan, Şerê Duyem ê Cîhanê, avabûn û hilweşîna Komara Kurdistanê li Îranê, Şoreşa 1958an a li Iraqê ji wan serûbinbûn û şikestinên sereke ne. Van bûyeran tesîr li wî kirine, şikestin pêk anîne û ji bo krîstalîzakirina êşên wî bûne dînamîkên xurt. Ew li pêvajoya avabûna netewe-dewletan rast hatiye ku Kurd ji vê yekê bêpar mane û hewldanên wan şikestine. Enteljensiya Kurdan a wê demê jî ketiye nav liv û tevgeran ku saziyên siyasî, çandî pêk anîne û kovar, kitêb û hwd.çap kirine.[250] Cegerxwîn jî di nav van xebatan de cih girtiye ku vê yekê li ser nivîsandina helbestên wî bandoreke mezin kiriye. Van xebatan paşxaneya teorîk a helbesta wî tije kirine. Helbestên Cegerxwîn bingeha xwe ji bûyerên dîrokî, siyasî û civakî yên gelê Kurd girtine. Helbesta Cegerxwîn xwestiye ku rasterast mudaxeleyê hafizeya Kurdan bike û hafizeya Kurdan ji nû ve bi fikrên neteweperwerî, azadî û serfirazî saz bike. Di vî warî de menzûmeyên *Şerefnameya Menzûm,* ji ber neteweya ji nav derketiye antî-

[248] Zülküf Ergün, "Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn", r.23.
[249] Ibrahim Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî di Helbestên Cegerxwîn de**, r.121.
[250] Mîkaîl Bilbil, **Helbesta Cegerxwîn û Îqtidar**, r.20.

kolonyalîst e û propagandîst e. Ev behrem ji bo armancê dengek e, bi qîrîn û hawara gelê xwe olan daye. Hem berê xwe daye kolonyalîzmê hem jî wek mudaxeleya hafizeyê berê xwe daye Kurdan. Ew, ji dêvla parametreyên dîrokê rasterast bide sûd ji parametreyên helbest û vebêjê girtiye. Bi hişmendiyeke diyalektîk riya gîhandina dîrokê ji nezmê re vekiriye.

## 2.3.JI ALIYÊ POZÎSYONA NETEWEYÎ VE ŞEREFNAME Û ŞEREFNAMEYA MENZÛM

### 2.3.1. Ji Aliyê Fikra Neteweyî ve

Şerefxan, di sedsala XVI. de di berga yekem a *Şerefname*yê de behsa eslê Kurdan, rewşa wan a siyasî û civakî, mîrektî û eşîretên Kurdan kiriye. Di naveroka *Şerefname*yê de bi tevahî tê dîtin ku civakekî bi nasnameya xwe ya desthilatdar heye. Vê civakê ji aliyê ziman, lehce, dîn, eşîret û mîrekiyan ve ji civakên din cudatir e û ji vê civakê re Kurd hatiye gotin. Nasnameya Kurdbûnê gelek bi nirx û bi rûmet e û wek millet perçeyekî dînê Îslamê ye. Şerefxanî di warê dînî de xwe nêzî Osmaniyan dîtiye lê bi awayekî zelal behsa bav û kalên xwe û behsa dîroka Kurdistanê kiriye. Kurdistan war û welatên Kurd li ser dijîn be jî, ne di çarçoveya dewletekî unîter de bûye. Ji aliyê din ve Kurd bi qasî baweriya dînî ji ber rewşa xwe ya civakî ya eşîretî û astengiyên qada siyasetê jî nebûne yek. Ew, di bin serweriya dewletên serdest de li gor polîtîkayên demê tevgeriyane.

Cegerxwîn jî di sedsala XX. de piştî welatê Kurdan hatiye rûxandin û perçekirin li ser hîmê *Şerefname*yê *Şerefnameya Menzûm* nivîsiye ku di menzûmeyên vê dîwanê de bi raweya fermanî gazî mîrên Kurdan ên ku di *Şerefname*yê de derbas bûne kiriye. Cegerxwîn ji dema niha bangî dema borî kiriye ku menzûmeyên dîwanê ji bûyerên serdema mîrektiyan zêdetir bi bûyerên dema niha ve têkildar bûne. Bi vî awayî di navbera serdema mîrektiyan û serdema xwe de pirrek çêkiriye û dîroka têkoşîna neteweya Kurd diyar kiriye. Armanca wî ev e ku gelê xwe ji xewa nezaniyê hişyar bike û ji bo azadî û serbestiyê riya têkoşînê diyar bike. Ji ber ku piştî Şoreşa Frensa ji dêvla feraseta sîstema millet a girêdayî dîn, sîstema netewedewletî derketiye pêş, împaratorî belav bûne û netewedewlet ava bûne.

Cegerxwîn jî doza vê yekê kiriye ku dîwana xwe ya *Şerefnameya Menzûm* jî bi vê fikrê saz kiriye.

Cegerxwîn, piştî netewedewlet ava bûne Kurd nebûne yek û ji aliyê dewletên serdest ve hatine perçekirin. Ew di gelek risteyên xwe de daxwaza stendina axa welat kiriye. Di menzûmeyên Cegerxwîn de bandora kolonyalizmê tê dîtin ku ev yek ji ber derûniya bindestiyê ye. Cegerxwîn ji bo şêx, axa û begên roja xwe rexne bike; ji mêr û mêrxasiya begên serdema mîrektiyan sûd wergirtiye. Ew rewşa Kurdan a nebaş bi bêserokbûna Kurdan ve girê daye. Wî bi vî awayî xwestiye ku esl û koka Kurdan destnîşan bike. Ji bo xelasiya ji mêtingeriyê, paşxaneya dîrokê daye berçavan û koka Kurdan gîhandine lehengên dîrokî. Di *Şerefname*yê de hin eşîretên Kurdan bi eslê xwe gihîştine Îraniyan û Ereban. Lê Cegerxwîn tenê berê xwe daye fikra Aryaniya Kurdan.

Şerefxanê Bedlîsî sînorên Kurdistanê daye berçavan ku berê Şerefxan, bi taybetî di dema Selçûkiyan de îfadeya Kurdistan hatiye bikaranîn. Li gor *Şerefname*yê, sînorên Kurdistanê ji Melatyê dest pê kiriye û heta qeraxên Xelîcê hatiye. Cegerxwîn jî di helbesta xwe ya "Kurdewarî"de nexşeya Kurdistanê diyar kiriye. Şerefxan, ji bo xaka Kurd li ser dijîn tabîra Kurdistanê bi kar aniye lê tu xwesteka wî ya dewleteke unîter a serbixwe tune bûye. Lê Cegerxwîn, bi daxwaza dewletekî serbixwe yê unîter îfadeya Kurdistan bi kar aniye.

Herdu nivîskar jî di bin bandora rewşa siyasî û civakî ya serdema tê de dijîn mane. Hêza mîrektiyên Kurd di sedsalên XV-XVI. de zêde bûye ku di *Şerefname*yê de danasîna mîrektiyan û taybetiyên Kurdan ên ji Tirk, Faris, û Ereban nîşan daye. Serdema Cegerxwîn têde jiyaye jî Kurd dûçarî polîtîkayên dewletên serdest mane. Lewma di menzûmeyên Cegerxwîn de neteweperweriya Kurd, hesreta serdemên kevn ên serfiraz xuya ne.

### 2.3.2. Ji Aliyê Teoriyên Neteweperweriyê ve

Teoriyên li ser kokên netewe û neteweperweriyê bi gelemperî wek sê cure ji hev qetiyane: Ev yek; Prîmordîalîzm, modernîzm û etno-sembolîzm e.

Li gor nêrîna prîmordîalîzmê netewe di nav çêbûna xwe ya xwezayî de derketine holê. Herçiqas di derketina neteweyan de "demên zêrîn" yan jî "ketin" çêbibin jî netewe her tim hêmaneke pêvajoya dîrokê ye. Ev teorî ji aliyê sosyobiyolog û akademisyenên wek Pierre van der Berghe hatiye berfirehkirin.

Nêrîna prîmordîalîzmê bandoreke mezin li ser têgiha neteweyê ya hafizeya hevpar kiriye. Lê di xebatên akademîk de cihê prîmordîalîzmê teoriyên modernîzmê girtiye. Li gor modernîstan neteweperwerî û netewe di dused salên dawî de derketiye holê. Ew vê yekê wek bera pêvajoya modernbûnê (endustrîbûn, sekulerîbûn, kapîtalîzm, bajarîbûn û dewleta burokratîk) îfade kirine. Teoriya etno-sembolîst jî diyardeyeke di navbera prîmordîalîzm û modernîzma radîkal de cih girtiye. Etno-sembolîst ji aliyekî ve peywendiya modernîzmê ya doktrîna civakî ya girêdayî hêmanên hemwelatîtî û serweriya gel pejirandine, ji aliyê din ve xwestine neteweyên modern û têgîhiştina neteweperweriyê bide.[251]

Di *Şerefname*yê de armanca danasîna neteweya Kurd û ji bîrnekirina bav û bapîrên Kurdan hebe jî bi hestên neteweperwerî nehatiye nivîsîn. Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku *Şerefname* bi awayekî prîmordîalîst hatiye nivîsîn. Kurd, hêmana prosesa dîrokê ne û di cografyaya tê de jiyane xwedî hafizeyeke hevpar in. Tu daxwaza Şerefxan a ji nû ve avakirina rabirdûyê, yan jî avakirina dewletekî Kurd tune ye. Gelek çavkaniyên dîroka Kurdan ku li ser Kurd û Kurdistanê hatine nivîsîn prîmordîalîst in. Abbas Valî, îddia kiriye ku "bingeha neteweperwerên Kurd ku Diyarbekir, Mahabad an jî li Hewlêrê çêbûye, prîmordîalîst" e. Lewma neteweya Kurd hebûna yekem e, di tevahiya dîrokê de bi pênaseya nasnameya gel û civakê pêkhatineke xwezayî ye û di xwezaya hemû Kurdan de bicî bûye.[252]

Bi vî awayî, netewe ne berhema modernîteyê ye, hebûneke dîrokî ye. Netewe bi sedsalan e heye û koka wê di nav mija demê de ye. Netewetî jî navgîna neteweyê ye ku ji bo rewşeke neteweyî rastiyên wê yên dîrokî pêk bîne. Ji aliyê din ve, li gor modernîstan jî netewe û netewetî jixwe di nav xwezaya cîhan, modern û şoreşgeriya modernîteyê de ye. Li dijberî prîmordîalîzmê, di paradîgmaya modernîst a netewe û netewetiyê de, netewetî raserî neteweyê ye. Bi gotineke din, netewe encamek an jî bandoreke polîtîkaya netewetiyê ye, polîtîkaya ku bixwe jî fenomeneke modern e. [253]

Li gor modernîstan netew û neteweperwerî tevî pêvajoyên modern ên wek kapîtalîzm, endustrîbûn, avabûna dewletên merkezî, bajarîbûn, laîkî yan jî wek

---

[251]Dijene Rhys Bajalan, **Jön Kürtler, Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)**, r.24-26.

[252]Azad Aslan, "Folklor û Netewetiya Kurd a Ewil /Guherînên Girîng ji Osmanîtiyê ber bi Netewetiya Kurd ve" **Edebiyata Kurdî ya Gelêrî (Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî)-I**, Ramamzan Pertev (ed.), Avesta, Stembol, 2015, r.115.

[253] Azad Aslan, "Folklor û Netewetiya Kurd a Ewil /Guherînên Girîng ji Osmanîtiyê ber bi Netewetiya Kurd ve" , r.113-114.

hilberînên wan derketiye holê. Neteweperwerî bêyî van pêvajoyan nayê fikirandin. Jixwe di serdemên berê de şertên civakî, siyasî û abori yên neteweperweriyê derxin holê tune bûne. Ev şert di serdema modern de çêbûne. Neteweperwerî neteweyan afirandiye, ne ku netewe neteweperweriyê.[254]

Modernîst di vê fikrê de ne ku girêdana bi civakên etnîk ên kevn re tenê şaşîtiye. Ji xeynî vê yekê modernîst fikirîne ku kevneşopiyên neteweyî bi rabirdûyê re girêdayî nîne. Ev tenê bûyerên rabirdû yên hevşibên hev, an jî bûyerên nû yên rabirdûya xwe qaşo ji nû ve ava kiriye. Li gor fikra etno-sembolîst, modernîst xwe li hikayatên berê, sembol û kevneşopiyên etnîk nekirine xwedî. Ew, li ser karakterîstîkên demdirêj ên neteweyên modern û taybetiyên wan rawestine. Wan fikra, di navbera serdemên kevneşopî û modern de berdewamiyek heye parastine. Nêrîna etno-sembolîzm, di nav civakên wek Kurdan ên kevneşopiyên wan ên etnîk berî heyama neteweperweriyê derketiye holê. Vê nêrînê ji bo fehmkirina neteweperwerî çawa pêşve çûye gelek wan cezb kiriye.[255]

Em dikarin bêjin ku Cegerxwîn ji ber civaka çandî bi helbestên xwe xistiye nav civaka polîtîk a li ser mafên Kurdan û nasnameya axekî diyar, ew etno-sembolîst e. Cegerxwîn di helbesta xwe de hem cih daye dîrok û mîtên Kurdan hem jî daxwaza dewleta Kurdan aniye zimên. Di etno-sembolîzmê de nasnameya etnîk li hemberî tim kemînên dîrokî yên wek koçbûn, îstila, zewacên nav komên etnîk de xwe bi sedsalan parastiye. Neteweyên modern di bin siya çanda etnîk a berê de teşe girtine. Mît, sembol û kevneşopiyên berê naveroka neteweperweriyên niha diyar kiriye.[256] Cegerxwîn jî di nav van xebatan de cih girtiye ku vê yekê li ser nivîsandina helbestên wî bandoreke mezin kiriye. Van xebatan paşxaneya teorîk a helbesta wî tije kirine. Helbestên Cegerxwîn bingeha xwe ji bûyerên dîrokî, siyasî û civakî yên gelê Kurd girtine.

[254] Umut Özkırımlı, **Milliyetçilik Kuramları**, Doğu Batı, Ankara, 2016, r.103.
[255]Djene Rhys Bajalan, **Jön Kürtler, Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)**, r.25-27.
[256]Umut Özkırımlı, **Milliyetçilik Kuramları**, r.204.

# BEŞA SÊYEM

# BERAWIRDKIRINA HÊMANÊN ŞEREFNAME Û ŞEREFNAMEYA MENZÛM

## 3.1.BIKARANÎNA ZIMAN

*Şerefname* bi awayekî nesîr, *Şerefnameya Menzûm* bi teşeya menzûm hatiye nivîsandin. *Şerefname* bi Farisî û li gor qaîdeyên zimanê Farisî, *Şerefnameya Menzûm* bi Kurmanciya zimanê Kurdî hatiye nivîsandin. Lewma ji aliyê ziman ve rasterast berawirdkirina van çavkaniyan zehmet e. Lê vegotin bi têşeyên cuda hatibin nivîsîn jî bingeha van berheman hevpar e. *Şerefnameya Menzûm* li ser bingeha *Şerefname*yê ji aliyê Cegerxwîn ve bi kêş û rist hatiye hûnandin. Em ê bi hin xalan li ser paraleliya di navbera zimanê *Şerefname* û *Şerefnameya Menzûm* rawestin.

### 3.1.1.Ji aliyê Binyada Derekî û Ruxsariyê ve

Şerefxan di sedsala XVI. de dema berhema xwe nivîsandiyê ji bo nivîsandina berheman zimanên Erebî û Farisî di rewacê de bûne. Ji ber ku Şerefxan li Îranê hatiye dinê û li wir mezin bûye di bin bandora nivîskarê Faris de maye. Lewma di berhema xwe de çavkaniyên bi kar anine bi gelemperî ji nivîskarên Faris pêk hatine. Cegerxwîn di sedsala XX. de *Şerefnameya Menzûm* nivîsandiye ku di vê serdemê de êdî nivîskarên Kurd ji dêvla zimanên biyanî zimanê Kurdî tercîh kirine.

Destxeta *Şerefnameya Menzûm* a bi tîpên Erebî li Amûdê ji aliyê Dilawerê Zengî ve di sala 1989an de hatiye latînîzekirin. Ew li ber *Şerefname*ya Şerefxan, di derheqê bûyer, jînenîgariya mîr, fermandar, beg, şah û paşayan hatiye şîrovekirin. Li gor Dilawerê Zengî behs kiriye destxet bixwe bi tîpên Erebî ji 41 rûpelî û 724 malikan pêk hatiye. Dîroka nivîsandina destxetê ne zelal e, tenê di dawiya destnivîsê de bi Erebî “Roja Înê 20ê Adarê 1942” saet pênc hatiye nivîsandin. Lewma baş nediyar e ku ev yek dîroka nivîsandina destxetê ye yan na ji aliyê Mele Hadiyê Dêrikî ve dîroka ji nû ve nivîsîna wê ye. Lê ji ber ku di sala 1945an de di dawiya dîwana yekem a Cegerxwîn de navê *Şerefnameya Menzûm* di nav berhemên Cegerxwîn ên neçapkirî de cih girtiye. Dibe ku destnivîs di 1942an de hatibe

nivîsandin. Ji aliyê din ve destxet, ji 730 malikan pêk hatiye, lê di beşa Şahanên Erdelan de ji ber şeş malik dubare bûne ji destxetê hatine avêtin û di destxetê de 724 malik mane.[257]

Wergera Kurmancî ya *Şerefname*yê ji aliyê Ziya Avci ve ji ber wergera Soranî ya Hejar Mukriyanî hatiye girtin. Ziya Avci ev werger di sala 1997an de temam kiriye û werger ji aliyê weşanxaneyên cihê ve çend caran hatiye çapkirin. Ziya Avci di wergera xwe de piştî pêşgotina xwe cih daye pêşgotina Hejar Mukriyanî ya wergera Soranî, pêşgotina Mihemed ‘Elî Ewnî ya bi Erebî, peşgotina Kemal Mezher û pêşgotina Frensî ya Zernov ku berê hatine nivîsandin. Kitêb bi tevahî ji 639an rûpelan pêk hatiye. Di çapa ji weşanxaneya Azad derketiye de beşên ku Şerefxan nivîsandine di navbera rûpelên 47-508an de cih girtiye. Piştre di rûplên 509-591an de di derheqê kitêbê de 513 jêrenot hatine dayin. Di dawiya kitêbê de 20 tabloyên minyaturên *Şerefname*yê yên ji kitêba Ebdurreqîb Yusif a bi navê *Hunerê Tabloyên Şerefnameyê* cih girtine. Piştre ji xebata Enwer Sultanî ya bi zaravayê Soranî *39 Destnivîsên Şerefnameya Şeref Xanê Bedlîsî di Kitêbxaneyên Cîhanê de* hatiye dayin.

*Şerefnameya Menzûm* di nav dîwanên Cegerxwîn de wek dîwana dehan hatiye çapkirin. Avesta ji bo sedsaliya Cegerxwîn, di sala 2003an de hemû helbestên wî di deh bergan de kom kirine. *Şerefnameya Menzûm* a vê weşanxaneyê çap kiriye bi tevahî ji 127 rûpelan pêk tê. Piştî bi sernavê *Gotinek Pêdivî* ya Dilawerê Zengî 45 menzûmeyên Cegerxwîn ên di derheqê 45 mîrektiyên Kurd de cih girtine. Di dawiya vê dîwanê de jî *Ferhenga Kesan* a ji aliyê Dilawerê Zengî ve hatiye amadekirin heye.

Di *Şerefname*yê de ji ber ku kitêba dîrokê ye bûyer, mekan û şexsiyetên dîrokî bi hevokên dirêj û bi taybetiyên wan ên diyar, bi tesewwirên berfireh hatine dayin. Di *Şerefname*yê de şexsiyetên dîrokî, dem û cih diyar e. Lê *Şerefnameya Menzûm* bi teşeya nezmê hatiye nivîsandin lewma tê de bûyer, mekan û şexsiyetên dîrokî bi awayekî kurtasî, di çaçoveyeke teng de derbas bûne. Di *Şerefnameya Menzûm* de temaya menzûmeyan bi îfadeyên gelemperî û zimanekî bi coş cih girtine. Di vê berhemê de şexsiyetên dîrokî û mekan hebe jî li ser bûyer û demê nehatiye

[257]Cegerxwîn, **Şerefnameya Menzûm**, Avesta, Stenbol, 2014, r.9-10.

sekinandin. *Şerefnameya Menzûm* ji aliyê termînolojiya edebiyata klasîk ve mesnewiyekî dîrokî ye.

Helbestvan bi bikaranîna kêşe û serwayê helbestên xwe nêzî nesrê dikin ku *Şerefnameya Menzûm* bi kêşeya erûzê hatiye nivîsandin û qaliba mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun hatiye bikaranîn. Di dawiya malikan de serwa (qafiye) û paşserwa (redîf) tê dîtin. Serwa di piraniya risteyan de heye ku di hin malikan de serwaya bêpaşserwa hatiye bikaranîn:

Li alîkî me Turk û yek Qizilb**aş**
Li pêş ceng e weha reng e serûp**aş**
**(**Beganê Çemîşgizk, r.75)

Di vê malika li jor de peyvên "Qizilbaş" û "serûpaş"ê di dawiya herdu risteyan de cih girtine ku serwa ji dengê "aş"ê pêk hatiye. Paşserwa jî di gelek malikan de ber bi çav in û wek serwaya bi paşserwa hatine bikaranîn:

Silêman beg binêre em li k**arin**
Ji Baban ta bi Loran em ne y**arin**
(Beganê Palo, r.53)

Di vê malika li jor de di navbera peyvê "kar" û "yar" de dubarekirina peyvan heye. Peyvên "kar" û "yar" ji ber ku kok in, ew hevbeşiya nav wan a "ar"ê bûye serwa. Kîteya "in"a dawiya risteyan jî bûye paşserwa.

### 3.1.2.Ji Aliyê Şêwazê ve

Di *Şerefname*yê de vegotin ji hevokên birist, di *Şerefnameya Menzûm* de ji hevokên bêrist pêk hatiye. *Şerefnameya Menzûm*, ji aliyê naverokê ve *Şerefname*yê temam kiriye. Ew, wek dîroknasekî tevgeriyaye û di 45 menzûmeyan de hestên xwe bi raweya fermanî û bi hevokên baneşanî diyar kirine. Cegerxwîn ji dema niha bangî dema borî kiriye:

Muhemmed beg **tu rabe ser** xwe îro

Li derdê me binêre **ey** tu mîro

(Beganê Kurdikan, r.70)

Di seranserê *Şerefnameya Menzûm* de Cegerxwîn bi şêwaza rêberekî gazî mîrên Kurdan kiriye ku werin xelkê xwe ji bindestiyê xelas bikin. Li gor *Şerefnameya Menzûm* her mîrekî Kurd xelaskerê gelê xwe ye. Cegerxwîn ji bo mîrên Kurd xelkê ji xewa bêdengiyê hişyar bikin peyvên wek "rabe" "were" "bigre" "binêre" bi kar aniye:

Qeran Xazî tu **rabe** ey cihangîr
Serifraz û egîd û fihris û jîr
(Beganê Biradost, r.84)

**Were** Mehmûd binêre kanî Merwan?
Belê kanî Cizîr e, birc û eywan?
(Beganê Mehmûdî, r.86)

Cegerxwîn ji bo vegotinê zindî bigire di gelek risteyan de heyfa xwe bi wêranbûna welatê xwe aniye: Wî ji bo bikaranîna vê yekê herî zêde ji gihaneka "ne….ne" yê îstifade kiriye:

**Ne** pez mane **ne** rez maye **ne** xanî
**Ne** cot maye **ne** cobar û kanî
(Beganê Çêrmûk, r.54).

**Ne** Banokî xuya ye **ne** Hiweydî
**Ne** Dilxeyran xuya ye **ne** Yezidî
(Beganê Silêmanî û Qulp û Batman, r.76)

Cegerxwîn, ji bo girêdana peyvan, di dîwanê de gihaneka “û” yê jî di gelek cihan de bi kar aniye. Ji xeynî vê hin gîhanekên wek “weyaxod, welakin” ên bi etîmolojî Farisî û Erebî ne jî bi kar aniye:

Bi gurz **û** xencer **û** tîran **û** daran
Ji Kurdistanê derxin van neyaran
(Şahanê Lorê Biçûk, r.22)

Şerefxanê Bedlîsî, di *Şerefname*yê de tenê behsa berhemên dîrokî nekiriye. ji ber hêmaya dînî ji gelek mînakên ayet û hedîsan jî dane. Di destpêkê de dema behsa pesnê Xwedê, Pêxember, siltan, dîrok û di derheqê xwe û kitêbê de nivîsiye ji sûreyên Yûnis, Îsra, Meryem, Hûcûrat, Enbiya û Beqere ayetan girtiye. Hedîsekî Hz. Mihemmed jî îqtibas kiriye.[258] Hedîsên ku hatine dayin naveroka berhemê ji aliyê çavdêriya dînî ve dewlemend kirine. Ev ayetên ku hatine dayin bi awayî dersên ehlaqî di şîroveyên ser bûyeran de cih girtine. Ji xeynî vana di naveroka kitêbê de jî Şerefxan ji Qur’anê ayet neql kirine. Herdu behrem jî bi perspektîfekî dîdaktîk hatine nivîsîn. Di nav *Şerefnameyê* de ji aliyê edebî ve pêşniyarên pragmatîk û karakterên dînî hene. Lê di *Şerefnameya Menzûm* de hêmanên pragmatîk hebin jî karakterên dînî kêm in. Tenê Cegerxwîn dema behsa *Beganê Mirdasê* kiriye di navbera Emîr Îsayê mîr û Hz. Îsa de bi şibandina nav girêdanek çêkiriye. Di heman demê de Cegerxwîn di gelek malikan de îfadeya felekê bi kar aniye û ji felekê lome kirine. Felekê bi wateya qeder/şens/bext di malikan de cih girtiye. Di vî warî de di malika “Selîbî û Misilman tev de bûn yek /Belê Kurdên te mane jar û bê çek”(Padîşahanê Eyyûbî, r.25) de jî Cegerxwîn neteweya xwe negirtiye nav yekîtiya Îslamê. Lê Şerefxan şer û cengên Osmanî yên li hemberî Qizilbaşan de mîrên Kurdan girtiye nav yekîtiya Îslamê. Cegerxwîn bi van menzûmeyan ji bo hişmendiya gelê xwe zêde bike deriyê şîretan li wan vekiriye:

---

[258] Di wergera Ziya Avci de ev ayet bi jêrenotan ne diyar in. Ziya Avci di nav metnê de “wek di ayeta Qur’anê de hatiye emirkirin” gotiye, lê ayet di kîjan sûreyê de cih girtiye destnîşan nekiriye. Di wergera Abdullah Yegin (r.47-52) û İbrahim Sunkur (54-59) de bi jêrenotan navê sûreyên ayetan hatine diyarkirin. Ev rewş di hersê nusxeyan de jî ji bo beşên *Şerefname*yê yên din jî bi vî awayî ye.

Bira ne em bi carek yek nîjad in
Seraser em bi qîr û ah û dad in
(Beganê Bedlîsê, r.99)

Wek ku li vê malika li jor tê dîtin Cegerxwîn şîret li xelkê xwe kirine ku tev birayên hev in û yek nîjad in. Lewma pêwîst e bi hev re bibin yek, nekevin nav şer û qirênan. Helbestên ku di *Şerefname*yê de hatine neqlkirin jî bi gelemperî şîretan di xwe de dihewînin ku diyar e ji aliyê Şerefxan ve hilbijartina van helbestan ne tesadufî ye. Ji şêwaza van helbestan xuya ye ku ew li ser parametreyên ehlaqî ava bûne:

Ey dil, megere li pey wefayê di zarokên zemane de
Çunkî, di afirandina van hevalan de merdîtî tune
(Şerefname, r.287)

Şerefxan di vî warî de, ji bo kirpandinê heman malik dubare kiriye. Ev malika "Hemû dewlet ji îttifaqê dizên/Bêdewletî jî ji bêtifaqiyê" (Şerefname, r.214) cara duyem bi şiklê "Hemû dewlet ji îttifaqê ava dibe/ Lê bêdewletî jî ji bêîttifaqî" (Şerefname, r.301) hatiye bikaranîn. Şerefxan ji bo perwerdekirin û şîretdayinê ji gelek helbestan sûd wergirtiye ku wek di vê malika "Dema ku welat bimîne bê mîr/ Her muxtarê gundekî dibe wekî mîr"(Şerefname, r.440) de tê dîtin fikrên wî yên di derheqê welat de, bêserok wê qaosekî çawa çêbibe hatiye diyarkirin.

Hem Şerefxan hem jî Cegerxwîn ji bo wesfên navan diyar bikin ji rengdêrên çawaniyê îstifade kirine. Bi taybetî jî ji bo teswîrkirina şerên giran ev cure rengdêr hatiye bikaranîn. Di *Şerefname*yê de amurên şer bi awayî "rimên cewherdêr, mertalên xwînrij" derbas bûne. Bi heman awayî di *Şerefnameya Menzûm* de jî rengdêrên çawaniyê yên wek "şûrê tûj û xwînxwar, şûrê tûj û tazî, tîrê zerveşan, gurzê dilsûj" balê dikişînin.

Di *Şerefnameya Menzûm* de di hin peyvan de dengdêr an jî dengdar ketiye. Peyv wek di "çi'bkim (çi bikim), l'kelatê (li kelatê), şa (şah), deynakî (deng nakî), nanî (neanî)" de hatiye bikaranîn. Peyva serfiraz jî li gor herikbariya vegotinê veguheztiye. Ev peyv carinan bi şiklê serfiraz carinan jî wek serifraz hatiye dayin. Bi

heman awayî peyva zerveşan bi zerfeşanê veguheztiye û çend peyvên din ên hatine veguheztin jî di malikan de tên dîtin. Herwiha ji peyvên hemwate, nêzwate û dijwate yên wek feryad û gazî, dost û heval, nêz û dûr jî sûd wergirtiye.

*Şerefname* ji aliyê gotinên pêşiyan û biwêjan ve gelek dewlemend e. Şerefxan ji bo darazî, nesîhet û xurtkirina vegotinê serî li gotinên pêşiyan û biwêjên wek "bi tiliyan dihat nîşandan, zimanê xwe dirêjî wî kirin, guhê gayî de raketin, ji ber bayê felekê, felek jê re nebûye yar, gur û mî bi hev re av vedixwarin, şerên siban ji xêrên êvaran çêtirin, destdirêjî, çavtêrî û hwd."daye. Bi gelemperî gotinên pêşiyan ên hatine bikaranîn gotinê pêşiyên Ereban in. Lê di *Şerefnameya Menzûm* de gotinên pêşiyan û biwêj pir derbas nabin. Tenê di çend risteyan de ev yek tê dîtin: "Spî bext (bextê spî)-(Xondekaranê Kurd, r.13), Nehên xwe jî tu deyne ser dehê min (ya dehan jî li ser a nehan be)-( Şahanê Erdelan, r.31), Binêre tu li bextê me siyah e (bextê me reş e)-(Beganê Çêrmûk, r.55),[259] Tu peydake ji bo derdê me derman (ji derdê me re derman e)-(Beganê Palo, r.53) Zimanê van neyaran zû te jê kir (zimanê wan jê kirin)-(Beganê Bedlîsê, r.100)" û hwd.

Şerefxan di gelek beşên *Şerefname*yê de wek me li jor jî diyar kir, cih daye helbestan. Ev helbest bi gelemperî ji aliyê şîret, gotinên pêşiyan, hêmanên ehlaqî ve xurt in. Di metna *Şerefname*yê de ji bo her jêgerek çavkaniyêk hatibe diyarkirin jî Şerefxan carinan navê nivîskar û berhemê bi hev re daye, carinan tenê navê nivîskar carinan jî tenê navê berhemê daye ku gelek agahî jî bi şêwaza riwayetê hatine dayin. Bi heman awayî di helbestên nav metnê de jî carinan navê nivîskar hatibe dayin jî bi gelemperî bêyî çavkanî ji helbestan sûd wergirtiye. Di berga yekem a *Şerefname*yê de navê helbestvanên Fîrdewsî, Mewlana Hetîfî[260]Kemal Îsmaîlê Îsfehanî cih girtine.

Ew dema behsa xweşikî û paqijiya Bedlîsê kiriye ji Şêxu'l-Îslam Mewlana Ebdulxellaqê kurê Şêx Hesenê Xîzanî çend malikan pêşkêş kiriye. Di berhemê de ji malikek Qanûnî Siltan Silêman[261] a bi zimanê Tirkî jî cih girtiye. Ji xeynî vê malikek xezela bi Tirkî ya ji aliyê helbestvan Mehmedoxluyê pesindarê Silêman Begê Bîjenoxlu yê fermandarê Aqqoyuniyan jî derbas bûye. Şerefxan di dawiya berhemê

[259] Di *Şerefnameya Menzûm* de di rûpela 38an de jî heman biwêj wek "Siya bext in hemî manendê zaxa"derbas bûye. Cegerxwîn di vê biwêjê de ji dêvla peyva reş, peyva siyah a Farisî tercîh kiriye.
[260] Mewlana Hetîfî kurê xwişka Mewlana Camî ye. Hetîfî bi muxemmesên xwe navdar bûye û piştî Camî di edebiyata Farisî de bi helbestên xwe cihekî girîng girtiye.
[261]Qanûnî Siltan Silêman, bi nasnavê Muhîbbî helbesta nivîsiye ku yek bi Farisî du dîwanên wî hene.

de ji bo ji zarokên xwe re şîretan bike ji Xîrednameya Ebdirrehman Camî îqtibas kiriye (Şerefname, r.506-508).

Cihên ku jêgerê helbestê diyar nekiriye, ew îfadeyên wek; helbest (nezm), yek ji wan kesên bi fezîlet gotiye, zanayekî wê çaxê û hwd. bi kar aniye. Di kitêbê de di çend cihan de jî ji devê rêvebirên wek Silêman Şah, Emîr Bîlbas, Şerefxan helbest hatine dayin lê çavkaniya helbestê nehatiye diyarkirin. Şerefxan dema di derheqê Cimşîd Begê Kurê Rustem Begê ji Mîrên Paloyê de agahî daye li ser zîrektiya wî gotiye ku; van malikên Farisî gelek li qabîliyet û mîzaca Cimşîd Beg tên (Şerefname, r.232). Ji aliyê ziman ve materyalên ziman ên ji bo *Şerefname*yê hatine bikaranîn, ji xulaseyên zimanê Farisî yê wê çaxê hatine hilbijartin. Mînakên edebiyata Farisî ya wê serdemê di berhemê de li ber çav e.

Ji aliyê din ve bikaranîna helbestan a di dîplomasiyê de gelek balkêş e. Di *Şerefname*yê de gelek malikên di nameyên siyasî de hatine bikaranîn derbas bûne. Ji van helbestan dema Şerefxan, behsa Melik Efdalê kurê Selaheddîn kiriye û malikeke wî girtiye. Şerefxan, bi jêgera Tarîxa Yafî'i gotiye ku ew kesekî zana bûye û di helbest û nivîsandinê de gelek li pêş bûye. Ji ber ku birayê wî û apê wî bi îttifaqa kirine seltanata Şamê ji destên wî stendine, wî ji Xelîfe Nasir Dînullah re ev malik şandiye (Şerefname, r.120). Şerefxan cih daye malikên di nameya Mewlana Îdrîs a ji Şah Îsmaîl re şandiye jî (Şerefname, r.401).

Di heman demê de di *Şerefname*yê de mesnewiyek biçûk a bi qîmet ji dîwanek baş nayê zanîn hatiye wergirtin ku tenê destxeteke wê li Qahîrê heye. Şerefxan ji helbestên helbestvanên klasîk ên navdar ên edebiyata Farisî ji Fîrdewsî (411ê k./1020ê z.), Nîzamî (575-613ê k./1180-1217ê z.), Se'dî (27ê Zîlhîcce 691ê k./Berfanbar 1292yê z.), Hafizê Şîrazî (792ê k./1390ê z.-791ê k./1389ê z.) îqtibas kirine. Di nav van çavkaniyan de bi taybet helbestên Nîzamî Gencewî yên ji aliyê diya xwe ve Kurd e, di gelek beşên *Şerefname*yê de cih girtine. Van helbestên Nîzamî, herçiqas ji aliyê kêşe, serwa, paşserwayê ve lewaz bin jî ji ber ku parametreyên ehlaqî xurt in ji aliyê Şerefxan ve hatine tercîhkirin. Şerefxan ji Leyla û Mecnûn, Heft Peykar û Xusrew û Şîrîna wî malik girtine. Gelek teferruatên van helbestên hatine bikaranîn hê baş nayên zanîn. Wî, ji Bostan û Gulîstana Sadî jî îqtibas kirine. Wer diyar e ku Şerefxan hemû jêgerên xwe ji çavkaniyên resen

negirtine. Wî ji gelek çavkaniyên hatine tercûmekirin jî îstifade kirine. Çavkaniyek din a Şerefxan bi kar aniye helbestên dîwana Îbn Yemînu'd-Dîn e.[262]

### 3.1.3. Ji Aliyê Hunerên Edebî ve

Ji bo ji aliyê ahengê ve menzûmeyên xwe xurt bike ji xeynî kêşe û serwayê Cegerxwîn ji asonans, alîterasyon û ji tekrîrê jî sûd wergirtiye. Wek di mînakên: "B**e**l**e**ngazin şik**e**stî d**e**st û g**e**rd**e**n/ Di zîndanê dinalin r**e**ngê Bêj**e**n" (Beganê I'taq, r.71) de bi dubarekirina tîpa "e"yê asonans hatiyebikaranîn. Di malika "Emi**r** Me**r**wan tu **r**abe ey dilawe**r**/Ji bo Ku**r**dan tu **r**êzan û tu **r**êbe**r**" (Beganê Silêmanî û Qulp û Batman, r.76) de bi dubarekirina dengdara "r"yê alîterasyon tê dîtin. Di risteyên "Bes e yan dê bijîn yan dê bibin ax/**Hezar axû hezar ax û hezar ax**" (Melekanê Hesenkêf, r.44) de tekrîr bi kar aniye.

Metnên nesîr jî bi bikaranîna asonans, alîterasyon, sec' û tekrîran nêzî nezmê dibin ku di zimanê *Şerefname*yê de di gelek hevokan de mirov rastî van huneran dibe. Herçiqas zimanê berhemê yê resen bi Farisî be jî ji wergera Kurdî wek di van mînakên di hevoka "K**e**la H**e**l**e**b**ê** b**ê** ş**e**r, b**ê** xwînr**ê**tin, b**ê** z**e**hm**e**tî û di riya aştiy**ê** r**e** k**e**t d**e**st**ê** S**e**lahaddîn*"*(Şerefname, r.113) de tê dîtin bi dengdêrên"e" û "ê" yê asonans hatiye bikaranîn.Di hevoka "Şeref Beg muameleye**k** **k**u bi babê re di**k**e, pê re **k**ir." (Şerefname, r.240) de bi dengdara "k"yê alîterasyon pêk hatiye. Wek bihevokên "Çav**ên** xwe y**ên** sor û ter dikirin asîman, dest**ên** xwe y**ên** kêmhêz û situy**ên** xwe y**ên** lerzokî pan dikirin" (Şerefname, r.55) /"Ew digirt**in**, ew talan diki**rin**, dikuşt**in** û bi mirovên beredayî û tune ve ciyên wan tijî diki**rin.**"(Şerefname, r.82) de tê dîtin Şerefxan hunera sec'ê ji bo herikbariya metnê bi kar aniye. Bi heman awayî di gelek hevokên *Şerefname*yê de tekrîra peyvan tê dêtin: "**Roj bi roj**, **saet bi saet** arhanê daye dilê wî." (Şerefname, r.62) **/** "**Qefîle bi qefîle û qebîle bi qebîle** ji wir bar kirin." (Şerefname, r.87) de peyvên "roj bi roj", "saet bi saet", "qefîle bi qefîle" û "qebîle bi qebîle" tekrîr in.

Di herdu berheman de jî hîcw hatiye bikaranîn ku jixwe *Şerefnameya Menzûm* bi tevahî hêmanên satirîk di xwe de dihewîne. Cegerxwîn, bi gazîkirina mîrên Kurdan, beg û axayên roja xwe bi awayekî veşartî rexne kiriye. Di heman

[262] MustafaDehqan, "Literary Citations in The Sharaf-name", **Nûbihar Akademî**, (j.2), sal 1, 2014, r.15-27.

demê de di hin malikan de bi awayekî eşkere hîcw tê dîtin. Wî di wan malikan de, bêtifaqî û pêşveneçûna Kurdan, bi bêserokiyê ve girê daye û rexne kiriye:“Ji bo hevdî binêre em çi fîl in/Di bin destê neyaran jar û dîl in” (Beganê Palo, r.54). Şerefxan jî di hin mijaran de bi şêwazekî rexneyî tevgeriyaye û ji helbestên di nav metnê de jî ji bo hîcwê bi kar anîne. Wek mînak dema behsa sedemê derengmayina nivîsandina *Şerefname*yê kiriye bi zimanekî edebî gotiye ku “bûka di nav armanca min poşî li ser çavên xwe neda alîkî” û di helbesta ji bo vê yekê daye de jî astengî û bûyerên neyinî bi vî awayî diyar kirine:“Dinya wekî pirçê yar şerpeze bû/Dêmen li hemû milê dêw û efrût bû/Têkiliyên cîhanê ewqas asê û berî û hêminî genî bû/Hewandina şer û ger rezîl bû/Çepel cîgir û abro hilo bû” (Şerefname, r.55).

Zimanê nezmê zimanekî hêmayî (îmge) û sembolîk e ku di *Şerefnameya Menzûm* de bi hunerên edebî hêma û sembol hatine bikaranîn. Di menzûmeya “Şahanê Erdelan” de Cegerxwîn welatê xwe bi alegoriya bûka cihanê daye û gotiye: “Welatê me xweş e bûka cihan e/ Belê çibkim nehin jê re xwedan e”(Şahanê Erdelan, r.29). Şerefxanî jî ji bo welat alegoriya bûkê bi kar aniye. Wî dema behsa serpêhatiyên siltanên Misir û Şamê kiriye ev îfade derbas bûne:“Melik Nasir, zanîbû ku êdî gelek dereng e û ji vir şûn de tu tam û me’nayek di mana wî ya Misrê de nemaye. Li ser vê, bi naçarî hersê kevirên telaqê bûka xwe (welatê xwe) bi tac û text ve avêt” (Şerefname, r.128). Ji xeynî van mînakan hem di *Şerefname*yê de hem jî di *Şerefnameya Menzûm* de di çend cihên din de jî welat bi şibandina “bûk”ê hatiye dayin.

Di herdu berheman de jî ziman sade û bi belaxet e. Şerefxan, di neqlkirina bûyeran de ji dêvla zimanekî hişk ê siyasî, zimanekî edebî bi kar aniye. Ji bo herikbariya vegotinê pêk bîne, ji peyvên hemwate, nêzwate û dijwate yên wek; kêf û zewq, urf û adet, dilxweşî û dilşadî, nizm û bilind, çep û rast, biçûk û mezin, sûd wergirtine. Ji hunerên edebî, ji xeynî sec’û hîcwê ji hunerên wek mubalexe, kînaye, mecaz, teşbîh û teşxîsê jî bi kar aniye. Di *Şerefnameya Menzûm* de jî ev huner hatine bikaranîn. Bi çend mînakan em dikarin bikaranîna van huneran destnîşan bikin:

-Dengê ax û zarîna wan **kevir nerm dikir (**mubalexe)-(Şerefname, r.181).

-Dikim feryad û ah û qîr û gazî/**Di çavan de av nemaye xwîn dibarî** (mubalexe)-(Beganê Gurgîl, r.41).

-Sulêman Beg qet îstifa xwe xera nekir, **mûyên wî jî nehejiyan** (kînaye)-(Şerefname, r.243).

-Bide pey xwe hezar **Kurmancê devxwûn**/Bi destê xwe tu bigre çerxê gerdûn (kînaye)-(Şahanê Lora Mezin, r.19).

-Ew bexçeyên welat ku **tijî gul bûn, ji sitriyên biyanî û xerîban** hatin paqijkirin.(mecaz)-(Şerefname, r.455).

-Binêre ev Fireng û Ingilîz in/Li ser **pişta me Kurda** tev dilîzin (mecaz)-(Beganê Suhran, r.80)

-**Wekî kilê subhan** ê bikêşin çavên xwe yên ji ber derd û kulên jihevdûrketinê ketine hev.(teşbîh)-(Şerefname, r.453).

-Were ey Seroxan Beg ey begê mêr/Ji Sasonê tu rabe her **wekî şêr** (teşbîh)-(Beganê Sason, r.58).

-**Deşt** û **çiyan** ji tirsa wî serên xwe kirin ber xwe, **stêrkên asîmanan** ecêbmayî man (teşxîs)-(Şerefname, r.243).

-Hesenkêf e welê **bêkêf** e îro/ Di destê dijminan de maye îro (teşxîs)-(Melekanê Hesenkêf, r.43).

-Dengê şêr û şerkeran, gurmîna mencenîq û berqenîkan **nizm û bilind** dibûn …(tezat)-(Şerefname, r.446).

-Xidir Beg rabe ser xwe ey tu **serbest**/Erê sûcê we ye em bûne **bindest** (tezat)- (Beganê Sason, r.57)

Di *Şerefname*yê de mirin bi awayî xweşnavî hatiye dayin. Ji bo wateya mirinê ya tehl û neyinî rasterast neyê dayin Şerefxan ji xweşnaviyê sûd wergirtiye. Çend mînakên di vî warî de ev in:

-Barê xwe ber bi cennetê ve bar kir (Şerefname, r.156).

-Dema hîva jiyana wî di asoya nemanê de ava bû (Şerefname, r.174).

-Ket ber zerdeperîna jiyanê û ruhê wê yê dilovanî ber bi bihuştê ve firiye (Şerefname, r.177).

- Vê dinêya ji qêr û gêjiyan tijî li cih hişt (Şerefname, r.216).

Cegerxwîn, ji bo herikbariya vegotinê di malikên xwe de gelek hunerên edebî bi kar anine. *Şerefnameya Menzûm* ji serî heta dawiyê bi hunera telmîh û nîdayê hatiye hûnandin. Dîsa ji hunerên edebî, hunera tenasub jî di gelek malikan de hatiye bikaranîn. Hunerên edebî yên di *Şerefnameya Menzûm* de ji xeynî yên ku em

li jor li ser bikaranîna wan sekinîn, hunerên edebî yên wek cînas, îrsala mesel, muqabele, iştîqaq, tecahula ‘arif, teviye, tecrîd û tewşîha mehcûb û hwd. jî di malikên vê dîwanê de tê dîtin.

## 3.2. JI ALIYÊ CUDAHÎ Û WEKHEVIYÊN NAVEROKÊ VE

### 3.2.1. Mîrên[263] Diyarbekir û Cezîrê

Cegerxwîn, menzûmeya xwe ya yekem a ji bîst û çar malikan pêk hatiye, bi beşa yekem a *Şerefname*yê ya li ser fermanrewayên serbixwe dest pê kiriye. Cegerxwîn sernavê “Xondekaranê Kurd” li vê menzûmeyê kiriye. Cegerxwîn ji dêvla mîrên (fermanrewa/hikumdar) Diyarbekir û Cezîrê, peyva “xondekar” tercîh kiriye ku ev peyv bi etîmolojî ji peyva honkar (hunkar) tê. Di vê menzûmeyê de malika yekem bi Rustemê kurê Zalê Kurê Sam dest pê kiriye û piştre behsa şexsiyetên dîrokî yên Îranê yên din kiriye ku bi qehremaniyên xwe bûne lehengên mîtolojîk. Di *Şerefname*yê de ew leheng di beşa Mîrên Diyarbekir û Cezîrê de derbas nabe, Şerefxan beriya wê di destpêkê de behsa Rustemê kurê Zal, Guhderzê kurê Keyo, Behramê Çopîn, Gorgîn, Bêjen û Ferhad kiriye û wan bi Kurdîtiya wan daye nasîn. Lewma Cegerxwîn jî hem ji bo di destpêka *Şerefname*yê de cih girtine hem jî ji bo realîteya Kurdan ji nû ve vejîne ev şexsiyetên dîrokî bi bîr anîne. Cegerxwîn, ne tenê di *Şerefnameya Menzûm* de di dîwanên xwe yên din de jî gelek caran navên van lehengan aniye zimên.

1/1 Were Rustem kurê Zalê kurê Sam
1 Bi destê xwe tu bigre gurzê hengam

1/2 Digel tîr û kevan û şûr û mertal
2 Bikuj dijmin ji bo me ey kurê Zal

Li gor *Şerefname*yê pêhlewanê mêrxas û bihêz Rustemê kurê Zal, ku di dema Keykubad Şah de jiyaye û lawekî Kurd bûye. Ew li Sîstanê (Sicîstan) hatiye dinê û bi navê Rustemê Zablî bi nav û deng bûye. Fîrdewsî di kitêba xwe ya *Şahname*yê de wî bi navê Rustemê Kurd daye nasîn (Şerefname, r.64). Şerefxan dema di derheqê

[263] Ziya Avcî di wergera xwe de ji bo mîran peyva “fermanrewa” bi kar aniye.

begên Silêmaniyê de agahiyan dide mêr û mêrxasiya eşîreta Silêmaniyê bi mêr û mêrxasiya Rustem re berawird dike û ji bo qabîliyeta wan a şer dibêje ku: "Mêr û mêrxasiyekî wisa nîşan dan ku efsaneya mêranî û mêrxasiya Rustem a di şerê "Heftxanê Mazenderan" de qet qet û tar û mar kirin; serpêhatiya dêwgoriya Sam Nerîman jî li ber tînî û germiya vî şerî wek çîrokek bê bingeh ma"(Şerefname, r.310). Bi heman awayî di *Şerefname*yê de di gelek bûyeran de Şerefxan cesareta mîrên Kurd dişibîne ya Rustem û dibêje: "Di mêr û mêrxasiyê de wek Rustem, di merdî û qenciyan de wek Hatem bû."[264]

Rustem, di helbesta klasîk a Îranê de bi qehremanî û têkneçûyina xwe tê naskirin. Di navê Rustem de "tem" ji peyva taxma ya ji Avesta hatiye. Bavê wî ji binemala Cemşîd neviyê Nerîman û Zalê kurê Sam bûye. Diya wî keça Şahê Kabîlê Rûdabe ye. Rustem hê di ciwaniya xwe de bi hikumdarê Tûran û Efrâsiyab re şer kiriye, piştî Heftxana derbas bûye bi dêwê spî re şer kiriye û Bêjen ji bîra Efrâsiyab xelas kiriye. Li gor rîwayeteke Rustem di serdema Eşkaniyan de wek fermandar û emîrekî jiyaye. Bi qehremanî û mêrxasiya xwe bi demê re wek qehremanekî mîtolojîk derketiye holê. Ew, di çîrokên qehremaniyê de taybetiyên qehremanan tevan di xwe de hewandiye.[265]

1/3 Were Guhderz kurê Keyo bi merdî
3 Binêre tu li jan û derdê Kurdî

1/4 Bi tîr û gurz û şûrê tûj û xwînxwar
4 Bi serbestî berê xwe bidne neyar

Guhderz, Serokê xanedana Guhderziyan e, di Seraya Keyhusrew de ji qehremanên pêş e û di heman demê de xezûrê Rustem e. Di *Şerefnamey*ê de navê Guhderz di beşa agahiyên di derheqê Begên Mehmûdî de bi wateya teşbîhê hatiye dayin:"Her yekî ji wan xwe yek ji wan mêrxasên Îranê yên kevin, Guhderz, Gîw û Sam Nerîman dihesibandin."(Şerefname, r.358). Di heman demê de navê Guhderz, bi Begên Kelhurê re derbas dibe ku li gor *Şerefname*yê nesla begên Kelhurê digihîje

[264] Hatem, reîsê qebîleya Tay a li Erebîstanê bûye, Hatem di serdema cahiliyyê de jiyaye . Bi comertî û destvekirîbûna xwe bi nav û deng bûye.
[265] Nimet Yıldırım, **Fars Mitolojisi Sözlüğü**, Kabalcı, İstanbul, 2017, r.658-660.

Guhderzê kurê Keyo (Şerefname, r.365). Navê Guhderz di *Şerefnameya Menzûm* de sê caran derbas bûye. Ji xeynî vê di risteyekê de jî îfadeya “kurê Guhderz” tê dîtin.

1/5 Reham rabe spî bext î tu şah î
5 Ji bo Kurdan belê pişt î û penah î

1/6 Cîhan dîsa bike wêran bi carek
6 Ji Kurdan re nemaye hêç mişarek

Li gor hin çavkaniyan Reham, kurê Guhderz e û piştî hikumdariya Keyhusrew di serdema Lohrasp de rêvebirî kiriye. Di şerê Keyhusrew ê li hemberî Efrasiyab de cih girtiye û di Şerê Duwazde Rih de qehremaniyek mezin nîşan daye.[266] Di *Şerefname*yê de navê wî di beşa Begên Kelhurê de derbas bûye ku Rehamê kurê Keyo û birayê Guhderz e û ji aliyê qralê Keyanî Behmen ve wezîfeya meşa ser Şam, Quds û Misrê jê re hatiye sipartin. Wî jî ew der stendiye, şewitandiye û wêran kiriye. Piştre bûye hikumdarê seranserê welat û eşîreta Goran ji nesla wî hatine (Şerefname, r.365). Di *Şerefnameya Menzûm* de navê vî lehengî du caran derbas bûye.

1/7 Bi ço bigre were Behramê Çopîn
7 Binêre vî welatê jar û xemgîn

1/8 Tu leşkerekî çê ke ji Kurdan
8 Cihan zêr û zeber ke rengê Merwan

Li gor agahiyên *Şerefname*yê Behramê Çûpîn (Çopîn) Kurd bûye û di dema desthilata Hirmizê kurê Nûşîrewan ê Fermanrewayê Ecemîstanê de fermandartiya artêşê kiriye. Li Tirkîstan û Xorasanê hatiye perwerdekirin û di şerê di van deran de nav û dengê wî belav bûye. Kurtî û siltanên Gûrî ji nesla wî ne (Şerefname, r.64). Ji ber ku di serdema tê de jiyaye fermandarekî jêhatî û zîrek bûye, Cegerxwîn bangî wî kiriye ku ji Kurdan re artêşeke amade bike. Ji aliyê din ve Cegerxwîn bi daxwaza

[266] Nimet Yıldırım, **Fars Mitolojisi Sözlüğü**, r.653.

dilşadiya serdema kevn a serdema Merwan wê serdemê wek zêr û zeber rave kiriye. Behram, di nav gel de zêde qiymet dîtiye ku ev yek bûye sedemê dexesiya Hirmiz û Hirmiz ew ji karê wî dûr xistiye. Wî jî li hemberî vê helwestê serî hildaye û bi piştgiriya xelkê Hirmiz ji ser text daxistiye piştre hikumdariya xwe îlan kiriye. Lê wê rewşê zêde dewam nekiriye, kurê Hirmiz dawî li desthilatdariya wî aniye. Navê Behramê Çûpîn di *Şerefnameya Menzûm* de sê caran derbas bûye.

1/9 Were Gorgîn bi serbestî tu Mîlad
9 Binêre ka çilo ye tûzê Ekrad

Gurgîn Mîlad (Gorgîn), di *Şerefname*yê de bi cengawerî û çavnetirsiya xwe hatiye pênasekirin. Gorgîn Kurd e û di dema *Şerefname* hatiye nivîsîn nêzîkî 4000 sal bûye neviyên wî di wîlayeta Larê ya Fars de mîrên serbixwe bûne (Şerefname, r.64).Cegerxwîn, Gorgîn Mîladê di meydana şer û cengan de tekemêr e bi vê malika jor bi bîr aniye ku navê Gorgîn tenê di vê malikê de derbas bûye.

1/10 Belê dîl û şikestî, dest û gerden
10 Di çalê de dinalin rengê Bêjen

Navê Bîjen (Bêjen) di *Şerefname*yê de derbas nebûye. Bêjen, kurê Gîw û neviyê Guhderz e. Bêjen, kurê xwişka Rustem û qehremanê navdar ê serdema Keyhusrew e. Efsaneya evîndariya Bêjen û Menîje di edebiyata Faris de gelek tê ecibandin. Ji ber ku Bêjen bûye evîndarê keça Efrasiyab Menîje, Efrasiyab ew avêtiye bîrê ku wek me li jor jî behs kir ew bi alîkariya Rustem ji bîrê xelas bûye. Cegerxwîn êş û jana Kurd dikişînin şibandiye êş û jana Bêjen a di binê bîrê de kişandiye û navê Bêjen di pênc risteyan de bi bîr aniye.

1/11 Were êdî bes e rabe tu Ferhad
11 Li Kurdistanê qîr û deng û feryad

1/12 Bi tîrê zerveşan û şûrê devtûj
12 Bikuj dijmin bikutî gurzê dilsûj

Ferhad[267] evîndarê Şêrîn û reqîbê Husrewê Perwîz e. Li gor *Şerefname*yê ji Kurdên Kelhurê ye (Şerefname, r.64).Wek sembola namûs û eşqê di edebiyata Faris de nemir bûye. Şerefxan li cem lehengên qehremaniyê cih daye vî lehengê evîndariyê jî. Mîtên neteweyî rihên neteweya jê derketine dikişînin. Ew wek mufteya hefizeya kolektîf a gelê xwe ne. Mît di heman demê de dîroka îdeal a gelê xwe ne. Cegerxwîn di van malikên vê menzûmeya xwe de bi mêr û mêrxasiya van mîtên neteweyî di navbera do û îro de girêdanek pragmatîk çêkiriye ku di paşerojê de ji bo pêkhatina nasnameya neteweyî ev mît bibin sedema serbilindî û şanaziyê. Navê Ferhad tenê di vê malikê de hatiye bibîranîn.

1/13 Ebû Muslîm binêre lawê Qehtan[268]
13 Dixwazin xwîn û doza lawê Merwan

1/14 Belê Tirk, Ereb, Rûm û Ecem şûr
14 Dikêşin ew li ser me rengê Mensûr

Ebû Muslîmê Xorasanî fermandarê bi nav û deng ê serdema Emewî û Ebbasî ye, ji ber cengawerî û zîrektiya xwe ji aliyê gel ve pir hatiye hezkirin. Tirk, Ereb, Ecem û Kurd her yek Ebû Muslîm ji nesla xwe hesibandine. Cegerxwîn jî di kitêba xwe ya Tarîxa Kurdistan de gotiye ku Ebû Muslîm Xorasanî ji Kurdên Rewadiyê ye. Di vir de Cegerxwîn bi kuştina Ebû Muslîm a ji aliyê Xelîfe Mensûrê Ebbasî, îşaret kiriye ku lawê Qehtan ango Ereb dijminatiya Kurdan dikin û herwiha ne tenê ew helwesta Tirk, Rûm û Ecem jî li hemberî Kurdan wek helwesta Mensûr e. Çimkî di çavkaniyan de sedemê kuştina Ebû Muslîm ji çavnebarî û bêtehemuliya Xelîfe Mensûr tê dîtin. Navê Ebû Muslîm di destpêka *Şerefname*yê de derbas nebûye, lê Şerefxan dema behsa Emîr Seyfeddînê kurê Mîr Huseynê kurê Pîr Budak kiriye bi wateya teşbîhê wisa gotiye: "Piştre rojekê, Emîr Seyfeddîn, wekî ku Ebû Muslîm di

[267] Di wergera Ziya Avci (r.64) de piştî çend hevok di derheqê evîndariya wî de wek evîndarê Şêrînê hatiye dayin ji mesnewiyek bê çavkanî de navê Ferhad diyar bûye. Di wergera Abdullah Yegin (r.65) de ji mesnewiyê perçeyek nehatiye girtin, rasterast navê Ferhad di metnê de derbas bûye. Di wergera İbrahim Sunkur (r.79) de berê ji mesnewiyê perçeyek hatiye girtin ku perçeya di vê wergerê de û ya di wergera Ziya Avci de ne yek e, dawiyê di derheqê Fehad de agahî hatiye dayin û bi pexşan jî navê Ferhad derbas bûye.

[268] Gelek alim, Ereban wek Ednanî û Qehtanî dikin du beş. Li gor çavkaniyên Îslamî û Tewratê nesla ceddê wan Qehtan ji Samê kurê Hz. Nuh hatiye.

demekê de ji bo defkirina Merwaniyan bi şîarên Ebbasiyan dixebitî, bi wî awayî jî ji bo defkirina Yezîdiyan dixebitî”(Şerefname, r.322). Di *Şerefnameya Menzûm* navê wî tenê di vê malika jor de cih girtiye.

1/15 Were Deysem binêre Tirk û Eyran
15 Ezirbêcan bi carek kirne wêran

1/16 Binêre em bi carek tev dibazin
16 Welatê xwe bi azadî dixwazin

Deysemê kurê Îbrahîm ê Kurd, di sedsala X.de li ser axa Ezerbaycan û Ermenîstanê hikumetek Kurdan ava kiriye, Cegerxwîn lewma ji bo windakirina vê axê bangî Deysem kiriye, yan jî navê Deysem di *Şerefname*yê de derbas nabe. Di *Şerefnameya Menzûm*de tenê bi vê malikê hatiye bibîranîn.

1/17 Were Ehmed tu rabe lawê Merwan
17 Diyarbekr û Cizîr e mane wêran

1/18 Cihê textê te Amed bû li gerdûn
18 Belê wêran e îro, jar û zer-gûn

Di *Şerefname*yê de kesê yekem ê ji Kurdan li ser textê serbixwe yê mîrektiya Diyarbekir û Cezîrê rûniştiye Ehmedê lawê Merwan[269] e. Dema Xelîfeyê Ebbasî el-Muktedîr Bîllah Ce’fer de desthilatdariya wî gihiştiye dereceya herî bilind ku xelîfeyê Bexdayê nasnavê Nesru’l-Dewle dayê. Têkiliyên siyasî bi Tuxrul Begê Selçukî re danîne. Ew pêncî û du salan li ser textê Diyarbekir û Cezîrê maye û di heştê saliya xwe de bi ecelê xwe miriye (Şerefname, r.71). Cegerxwîn di menzûmeya li ser vê xanedanê de piştî qehremanên dîrokî yên kevn, dest bi vegotina serokên Merwaniyan kiriye. Cegerxwîn bi awayekî sembolîk bangî Ehmedê kurê Merwan kiriye ku were halê cih û warên xwe yên perîşan bibîne.

[269] Di wergera Abdullah Yegin (r.71) de bi şêwaza Erebî Ehmed b. Merwan derbas bûye. İbrahim Sunkur (r.82) jî di wergera xwe de wek Ehmedê lawê Merwan (Mervan Oğlu Ahmet) wergerandiye ku di temamê kitêbê de ev şêwaz hatiye bikaranîn.

1/19 Nesîr rabe kurê Ehmed ji Farqîn
19 Erê Farqîn e îro, jar û xemgîn

1/20 Sera û xan û man û birc û eywan
20 Bi carek kirne wêran lawê Toran

Nasrê (Nesîrê) kurê Nasru’l-Dewle Ehmed e, li cihê bavê xwe hatiye ser textê mîrektiyê. Bîst û yek salan desthilatdarî kiriye. Di navbera Nasr û birayê wî Se’îd de têkelhevî qewimîne. Nasr li Meyafarqînê bi awayekî serbixwe fermana xwe meşandiye. Se’îd jî li cihê bavê xwe serbixwetiya xwe îlan kiriye. Vê rewşê heta mirina Nasr a di 472yê k./1080ê z. dewam kiriye (Şerefname, r.72). Ji ber ku Nasr (Nesîr), bi awayekî serbixwe li Meyafarqînê (Farqînê) desthilardarî kiriye, Cegerxwîn ji bo ji destderketin û wêranbûna Meyafarqînê bangî wî kiriye ku were jar û xemgîniya Meyafarqînê bibîne. Cegerxwîn xemgîniya xelkê ya ji vê rewşê li Meyafarqînê bar kiriye.

1/21 Se’îd rabe were ey lawê Ehmed
21 Li ser textê xwe rûnê tu li Amed

1/22 Li ser qafê xwe deyne tacê Dara
22 Bisoje tu dil û cergê neyara

Se’îdê kurê Nasru’l-Dewle Ehmed e, wî demeke dirêj walîtiya Amedê kiriye. Ew ji bo feqîr û bêçareyan gelek bi şefqet û merhemet bûye û alîkarî daye wan. Xelk û esker di dema fermanrewatiya wî de di nav hebûn û aramiyê de bûne. Di sala 465ê k./1073yê z. de miriye (Şerefname, r.72). Ji ber ku Se’îd li cihê bavê xwe serbixwetiya xwe îlan kiriye û bûye waliyê Amedê Cegerxwîn navê wî bi desthilatdariya Amedê bi bîr aniye. Ji bo bihêzbûna desthilatdariya wî bîne zimên Cegerxwîn peywendî ji hikumdarên Îranî bi Dara re daniye ku Dara wek sembolê ezamet û mezinahiyê hatiye dîtin.

1/23 Ji Amed rabe ser xwe ey tu Mensûr
23 Ji xwîna me çemê Amed hemî sûr

Mensûrê kurê Nasrê kurê Nasru'l-Dewle Ehmed e, li cihê bavê xwe li ser textê hikumdariyê rûniştiye. Di navbera wî û wezîrê wî de şer derketiye û di şer de Mensûr têk çûye. Piştre jî di navbera wî û Cîgermijê xwediyê leşkergeha Mûsilê de şer derketiye. Ew ji aliyê Cegermij ve esîr hatiye girtin û li Cezîrê di mala cihuyekî de hatiye hepskirin. Di sala 489ê k./1057ê z. de çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.72). Mensûr kurê Nasr e û ji dêvla bavê xwe bûye rêvebir. Lewma Cegerxwîn navê Mensûr jî wek ê bavê wî bi Amedê re yad kiriye. Cegerxwîn di vê malika li jorê risteya "Ji xwîna me çemê Amed hemî sûr" bi awayekî mubalexe kuştina Kurdan aniye zimên.

1/24 Wê her çaran biwartin not û yek sal
24 Bi şahanî weke Rustem kurê Zal

Şerefxan di derheqê vê fermanrewayên Diyarbekir û Cezîrê de gotiye ku: "Ji vê binemalê çar kesan not û yek salan mîrektî kirin û piştî mirina Mensûr ev binemala han têk çû". Cegerxwîn di malika ewil û ya dawî de navê Rustemê Zal bi bîr aniye ku di vê dîwanê de di heft malikan de navê Rustemê Zal derbas bûye û di dawiyê de hikumdariya Merwaniyan şibandiye ya wî. Cegerxwîn bi saya vî lehengê bêtirs, xwestiye peyama bide xwendekarên xwe xurttir bike. Ew, hem ji ber di *Şerefname*yê de cih girtine hem jî ji bo navbera do-îro-paşerojê de girêdanekê çêke û qehremaniyên serdema zêrîn ên van lehengan, ji neteweya Kurd re bibe hêvî, *Şerefnameya Menzûm* bi mîtên qehremaniyê daye destpêkirin.

**Tablo 3.2.1.**Mîrên Diyarbekir û Cezîrê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Ehmedê kurê Merwan, Nasrê kurê Nasru'l-Dewle Ehmed, Se'îdê kurê Nasru'l-Dewle Ehmed, Mensûrê kurê Nasrê kurê Nasru'l-Dewle Ehmed | Rustemê kurê Zalê kurê Sam, Guhderzê kurê Keyo, Reham, Behramê Çopîn,Merwan, Gorgîn, Bêjen, Ferhad, Ebû Muslîm, Mensûr (Xelîfeyê Ebbasiyan), Deysem, Ehmedê lawê Merwan, Nesir kurê Ehmed, Se'îd lawê Ehmed, Dara, Mensûr (Mensûrê kurê Nesir birayê Se'îd e) |
| Dem | Sedsala XI-XII. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Diyarbekir,Cezîre,Amed, Meyafariqîn. | Diyarbekir, Cizîr, Amed, Farqîn,Eyran(Îran), Azirbêcan. |

### 3.2.2.Mîrên Dînewer û Şehrezorê ( Hesnewiyye)

Cegerxwîn vê menzûmeya xwe bi sernavê Şahanê Deynûr daye, menzûme ji bîst û çar malikan pêk hatiye. Di van malikan de Cegerxwîn behsa dozdeh mîrên vê mîrektiyê kiriye. Ji bilî vê ji ber têkiliyên siyasî yên bi Selçûkiyan re navê Îbrahîm Yenal jî di malikekê de derbas bûye.

2/1 Bes e rabe Hesen Weyhî ji Deynûr
25 Bi carek em dinalin nêz û hem dûr

2/2 Kurên te tev bi carek bûn belengaz
26 Di nav wan de nema ye yek serifraz

Karên Hesnewiyye gelek baş meşiyaye û nav û dengê wî belavî hemû cihanê bûye. Li hemberî Ruknu'l-Dewleyê kurê Bûyê (Bûweyh) serî hildaye, Ruknu'l-Dewle di sala 359ê k./971ê z. leşkerekî mezin şandiye ser wî. Lê wî bi zanyariya xwe

ya polîtîk[270] mezin û rîspî kirine navberê, şer bi aşitî hatiye guherandin. Ew mirovekî destvekirî û birehm bûye. Di sala 369ê k./980ê z. çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.73). Bi vê malika jor Cegerxwîn, bangî Hesnewiyye kurê Huseyîn (Hesen Weyhî) ê mîrê Dînewer û Şehrezorê yê yekem kiriye.

2/3 Bedir rabe ji Deynûr ta Nehawend
27 Birûcerd û Esedabad û Elwend

2/4 Çi Şehrezor û Ehwaz û Xozistan
28 Li wan vegre durefş û alê Kurdan

Bedirê kurê Hesnewiyye (Bedirê kurê Hesen Weyhî), li cihê bavê xwe hatiye ser textê mîrektiyê. Di sala 388ê k./999ê z. de ewqas nav û dengê wî belav bûye ku Dîwana Bexdayê wek xelat nasnavê Nasru'l-Dewle dane wî. Ji Dînewerê bigire heta bê bigihîje Ehwaz, Xozîstan, Berucerd, Esedabad, Nehawendê hemû di bin destê wî de bûne (Şerefname, r.74). Cegerxwîn jî di vir de balê kişandiye ser berfirehbûna cih û warên di bin hikumdariya Kurdan. Û ew dixwaze dîsa ew cihên ji dest derketine têkevin bin destê Kurdan.

2/5 Hîlal lawê Bedir rabe tu xweş mêr
29 Digel dijmin bike cengê wekî şêr

2/6 Bi serbestî bixwaze doza Kurdan
30 Tu bistîne ji bo me nav û nîşan

Hîlalê kurê Bedirê kurê Hesnewiyye her dem bi bavê xwe re di nav şer de bûye. Di sala 405ê k./1015yê z. de şerekî di navbera wî û Fexrû'l-Mulukê wezîrê Bexdayê de hatiye girtin û ew kirine zindanê. Celalu'l-Dewleyê kurê Behau'l-Dewle ew ji zindanê derxistiye. Di sala 405ê k./1015ê z. de di şerekî navbera wî û Şems de Hîlal çûye heqiya Xwedê (Şerefname, r.74). Cegerxwîn, her tim mêr û mêrxasiya

[270] Di nusxeyên wegerên Abdullah Yegin (r.72-73) û İbrahim Sunkur (r.84)de behsa zîrektî û zanabûna Hesnewiyye nehatiye kirin.

mîrên Kurdan daye berçavan. Wek ku tê dîtin behsa lihevnekirina di navbera Hîlal û bavê wî, yan jî têkçûna wî ya şer nehatiye kirin. Hîlal tenê bi mêrxasî û cengaweriya xwe di malikên Cegerxwîn de cih girtiye.

2/7 Were lawê Hîlal, rabe tu Tahir
31 Bisoje tu dilê dijmin bi agir

2/8 Perîşan bûne Lor û Zaz û Kurmanc
32 Li ber tîrên neyaran bûne armanc

Tahirê kurê Hîlal ji ber dijayetiya di navbera bav û kalê xwe hatiye Şehrezorê û li wir bi cih bûye. Piştî demekê êriş biriye ser bapîrê xwe û di şer de hatiye girtin (406ê k./1016ê z.). Piştre ji zindanê xelas dibe û di şerekî ligel Ebû Şewk de hatiye kuştin. Li pey wî kurê wî Bedir bi emirnameya Îbrahîm Yenal bûye fermanrewayê Qumş û Dînewerê (Şerefname, r.74-75). Cegerxwîn ji ber cengawerî, mêr û mêrxasiya wî, Tahirê kurê Hîlal wek xelasker dîtîye û bangî wî kiriye ku were heyf û tola gelê xwe bistîne. Ji vê bangkirinê mebest destnîşankirina bindestiya Kurdan e.

2/9 Bedir rabe kurê Tahir serifraz
33 Li te mizgîn gelek nêzîk e daxwaz

2/10 Li ser tiştê xwe rûnê şahê Deynûr
34 Bike ferman li Kurdan nêz û hem dûr

Bedirê kurê Tahirê kurê Hîlal e. Di sala 408ê k. de li ser emîrnameya Îbrahîm Yenal bûye desthilatdarê Qumş û Dînewerê (Şerefname, r.75). Cegerxwîn bi van malikên li jor mizgîn daye ku pêkhatina hêvî û daxwaza ne dûr e. Lê ji bo vê armancê pêwist e li mal û mulkên xwe xwedî derkevin. Cegerxwînî bi van hestan bangî Bedirê kurê Tahir kiriye ku xwedî li mal û mulkên xwe derkeve û li Kurdan bike ferman. Ev ferman ji serdema Bedirê kurê Tahir bigihîje heta paşerojê.

2/11 Mihemmedê lawê Eyyar tu ji Hîlwan
35 Were rabe bike qîrîn li Kurdan

2/12 Ji Xerpûtê seraser ta bi Tebrîz
36 Bike leşker, werin ser lawê Cengîz[271]

Ebu'l-Feth Mihemmedê kurê 'Iyar (Mihemmedê lawê Eyyar), bîst salan mîrektiya Hîlwanê[272] kiriye û di sala 401ê k./1011ê z. de çûye rehma Xwedê. Ew ji nesla Hesnewiyan nebûye, lê hin dîroknasan ew ji vê binemalê hesibandine (Şerefname, r.75).[273]Cegerxwîn ji ber Mihemmedê lawê 'Iyar (Eyyar) fermandarekî bihêz û jêhatî ye jê xwestiye ku ji Xerpûtê ta Tebrîz axa Kurdan a hatiye dagirkirin ji destê dijmin xelas bike. Cegerxwîn, wek dijmin, lawê Cengîz daye ku di serdema vê mîrektiyê de İmperatoriya Cengîz Xan hê ava nebûye. Di sedsala XIII. de Cengîz Xan bi xwînrijî û dagirkerî împeratoriyek mezin ava kiriye ku pirî civakên Asyayê ji zilma wî nesîbên xwe girtine. Piştre neviyê wî Hulagu Xan (1217-1265) Îran girtiye, ketiye Bexdayê û dawî li Xelîfetiya Ebbasiyan a Bexdayê aniye ku xaka Kurdan jî ketiye bin hikumdariya wî. Cegerxwîn lewma di gelek malikan de lawê Cengiz wek dijmin rê daye.

2/13 Husam rabe Ebû Şewkî cîhangîr
37 Belê zanim tu şah û hem beg û mîr

2/14 Ji ser me zû tu rake destê dijmin
38 Tu şah î em ji bo te tev de Kurd in

Ebû'l-Şewkê (Şûk) kurê Mihemmedê kurê 'Iyar e, nasnavê wî "Husamu'l-Dewle" bûye. Di sala 421ê k./1031ê z. de, wilayeta Qumayê îşgal kiriye. Her dem ligel birayê xwe di nav şer de bûye. Vê rewşê heta mirina wî ya sala 437ê k./1046ê z.

[271] Navê wî yê ewil Temûçîn e, ji aliyê qûrûltaya (meclîs) Tirk-Moxol di sala 1206an navê Cengîz Xan jê re hatiye dayin. Ew damezrênerê İmparatoriya Mezin a Moxolan e (m.1227).
[272] Hîlwan bajarekî kevn ê li ser Çemê Diyalayê ye. Ji bakurê rojhilatê Bexdayê 190 km. dûr e û li ser riya Mûsil-Kermanşahê ye.
[273] Ebu'l-Feth Mihemmedê kurê 'Iyar, serokê eşîreta Şazincanê bûye, ew bûbû fermandarê leşkerê Bedirê Hesnewiyye ku Şarezol, Qumş û Kirmanşan di destê wî de bûne. Li gor Huseyîn Huznî gotiye binemala 'Iyar û Hesnewiyye pismamên hev bûne. bnr. Şerefxanê Bedlîsî, **Şerefname**, r. 550.

dewam kiriye (Şerefname, r.75). Ji ber nasnavê Ebû Şewk "Husamu'l-Dewle" bûye Cegerxwîn bi nasnavê wî "Husam" dest bi malika xwe kiriye û ji bo xelaskirina Kurdan jê alîkarî xwestiye.

2/15 Ebûlmacid Muhelhel rabe ser xwe
39 Tu dîwana Cegerxwîn deyne ber xwe

2/16 Me reş kirye bi jan û êş û derda
40 Kenûsra ye bi xwîna Zaz û Kurda

Muhelhel birayê Ebû'l-Şewk e û bi nasnavê "Ebû Macid (Ebûlmacid)" bi nav û deng bûye. Di sala 442yê k./1051ê z. de, çûye cem Siltan Ertuxrulê Selçûkî û rica jê kiriye ku Surxabê birayê wî ji zindanê rizgar bike. Siltan ricaya wî qebûl kiriye û Surxabê birayê wî berdaye (Şerefname, r.75). Cegerxwîn bi nasnavê Muhelhel ê Ebûlmacid dest bi malika xwe kiriye û behsa dîwana xwe ango behsa *Şerefnameya Menzûm* bi çi awayî hatiye nivîsîn kiriye. Cegerxwîn di vir de bi hunera tecrîdê xwe xistiye şûna kesekî sêyem û xîtabî wî kiriye. Ji ber ku wî, di vê dîwanê de behsa êş û derdên Kurdan kiriye bi awayekî mubalexeyî ew hewldana xwe aniye zimên. Li gor gotina wî ji dêvla hubrê bi kar bîne bi xwîna Zaz û Kurdan ev risteyên xwe nivîsandine.

2/17 Were Serxab tu rabe ey dîlawer
41 Ji Kurdan re tu rêzan û tu rêber

2/18 Kurên Kurdan bi carek Rustemê Zal
42 Belê dijmin Brahîm lawê Neyyal

Surxabê (Serxabê) kurê Mihemmed, piştî bi ricaya birayê xwe Ebû Macid Muhelhel a ji Siltan Tuxrilê Selçûkî ji zindanê hatiye berdan rêvebirina hikumeta Mahekî dane wî. Lê di nav civakê de têkelhevî derketiye, ew di sala 429ê k./1047ê z.

de dane destê Îbrahîm Yenal[274] ku wî, herdu çavên Surxab qewirandine û rijandine (Şerefname, r.75). Cegerxwîn ji ber Îbrahîm Yenal çavên Surxab rijandine ew wek dijminê Kurdan rave kiriye ku di vê malikê de ji bo cesaret û bêtirsiya Kurdan a li hemberî dijmin rê bide Rustemê Zal carek din daye berçavan.

2/19 Were Se'dî kurê Husam Ebûşşewk
43 Siwar be tu li hespê çak û xweş lewk
2/20 Bi dengê xwey birûskî rake gazî
44 Were dijmin bi şûrê tûj û tazî

Se'diyê kurê Ebû'l-Şewk (Şûk), ji aliyê Surxabê apê xwe ve hatiye girtin. Ebû'l-Eskerê kurê Surxab, piştî korbûna bavê wî, ew ji zindanê derxistiye û azad kiriye. Di sala 444ê k./1052yê z. de, ji aliyê Tuxrul Beg ve wezîfeya serfermandariya tevgera eskerî dane wî û ew bi ser Iraqa Ereb ve şandine. Wî ev wezîfe qebûl kiriye û Muhelhelê apê xwe girtiye û xistiye zindanê (Şerefname, r.76). Wek ku tê dîtin Cegerxwîn behsa şerê di navbera van mîran de nekiriye, wî berê xwe daye dijmin û ji bo dijmin ji xaka welat bê derxistin bangî serok û rêberan kiriye.

2/21 Were Serxabê lawê Bedrê xwînxwar
45 Binêre em bi carek bûn giriftar

2/22 Bi şûrkêşî bi xeşm û kotek û zor
46 Ji destê dijminan zû derxe Deynûr

Surxabê (Serxabê) kurê Bedir, bi nasnavê Ebû'l-Fewarîs û Ebû'l-Şewk bi nav û deng e. Demekê fermanrewatiya Eyaleta Şehrezor û Qumayê kiriye û Kela Çiqindkanê ya ji destê wan derketibû stendiye (495ê k./1102yê z.). Ew mirovekî dewlemend bûye. Di sala 500ê k./1107ê z. de miriye (Şerefname, r.75). Cegerxwîn ji bo ji nû ve bi destxistina Dînewer (Deynûr) gaziya şer û cengê kiriye û ji Surxabê kurê Bedir xwestiye ku welatê xwe ji destê dijmin derxe.

[274] Îbrahîm Yenal, birayê biçûk ê Tuxril Begê Selçûkî ye. Cegerxwîn wî wek Brahîm Neyyal bi nav kiriye.

2/23 Ebûlmensûr tu rabe ey tu dilşîn
47 Ji bo şahanê Deynûr î tu paşîn

2/24 Sed û sîh salî kesratî we kir pak
48 Belê çibkim ku hûn çûne binê xak

Wek di malikên di jor de jî diyar e Ebû'l-Mensûrê kurê Surxab mîrê dawî yê vê xanedanê ye. Desthilatdariya vê xanedanê nêzîkî sed û sîh salan dewam kiriye (Şerefname, r.76).[275]

**Tabloya 3.2.2:**Mîrên Dînewer û Şehrezorê ( Hesnewiyye)

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Hesnewiyye kurê Huseyîn, Bedirê kurê Hesnewiyye, Hîlalê kurê Bedir, Tahirê kurê Hîlal, Bedirê kurê Tahirê kurê Hîlal, Ebu'l-Feth Mihemmedê kurê 'Iyar, Ebû'l-Şewkê kurê Mihemmedê kurê 'Iyar, Muhelhel, Surxabê kurê Mihemmed, Se'diyê kurê Ebû'l-Şewk, Surxabê kurê Bedirê kurê Muhelhel, Ebû'l-Mensûrê kurê Surxab | Hesen Weyhî<br>Bedir<br>Hîlal lawê Bedir<br>Tahir lawê Hîlal<br>Bedir kurê Tahir<br>Mihemmed lawê Eyyar Husam(Ebû Şewk)<br>Ebûlmacid Muhelhel<br>Serxab<br>Rustemê Zal<br>Brahîm lawê Neyyal(Yenal)<br>Seîd kurê Husam Ebû Şewk<br>Serxabê lawê Bedir<br>Ebûlmensûr |
| Dem | Sedsalên X-XI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Dînewer, Ehwaz, Xozîstan, Berecerd, Esedabad, Nehawend, Şehrezor, Hîlwan, Qumş, Quma | Deynûr (Dînewer), Nehawend, Birûcerd, Esedabad, Elwend, Şehrezor, Ehwaz, Xozîstan, Hîlwan, Xerpût, Tebrîz |

[275] Di wergera İbrahim Sunkur (r.88) de ji bo desthilatdariya vê xanedanê dibêje ku sed û sê sal dewam kiriye; lê dibe ku ev yek -130/103- xeletiya çapê be.

### 3.2.3. Mîrên Lora Mezin (Buzurk)

Cegerxwîn bi menzûmeya Şahanê Lora Mezinbi bîst û heşt malikan mîrên vê binemalê rêz kirine. Di *Şerefname*yê de ev binemal bi sernavê "Fermanrewayên Fedlewiyye ku bi Navê Lora Mezin (Buzurk) bi Nav û Deng in" derbas bûye. Li gor agahiyên *Şerefname*yê herêma Loristanê dibe du beş: Lora Mezin û Lora Biçûk. Navê fermanrewayê Loristana Mezin Bedir û birayê din ê bi navê Ebû Mensûr jî kar û barên Loristana Biçûk meşandiye. Piştî mirina Bedir Nesireddîn Mihemmedê kurê Hîlalê kurê Bedirê neviyê wî cihê bapîrê xwe girtiye. Wî, Mihemmed Xurşîd aniye ser kar û barên wezîrtiyê. Di dema wî de ji welatê Şamê ji Kurdên Çiyayê Simaqê 400 malî barkirine û hatine Loristanê (500ê k./1107ê z.). Serokê wan Kurdên muhacir Ebû'l-Hesenê Fedlewî bûye. Mihemmedê Ebû'l-Hesenê Fedlewî piştî mirina bavê xwe Elî, çûye cem Xanedana Salxur (Salgur) ku wê çaxê hukmê Eyaleta Faris meşandine. Ebû Tahirê kurê Mihemmed wek bavê xwe bi mêr û mêrxasiya xwe hatiye naskirin. Ew, piştî mirina bavê xwe ketiye bin xizmeta Etabeg Sungur (Şerefname, r.78).

3/1 Ebû Tahir tu rabe ey serifraz
49 Xwedawendê Loran û Kurdê şûrbaz

3/2 Li ser textê Loran rûnê bi şahî
50 Bike pirsê li Kurdê bê gunahî

Ebû Tahirê kurê Mihemmedê kurê 'Eliyê kurê Ebû'l-Hesenê Fedlewî ye. Ji ber bi zîrekî û bêtirsiya xwe di artêşa Etabeg Sungur de bûye fermandarekî serkeftî. Etabeg, daxwaza wî ya desthilatdariya Loristanê qebûl kiriye û bi leşkerekî giran ew şandiye ji bo îstilaya Loristanê. Ebû Tahir piştî desthilatdariya Loristanê bi dest xistiye, serxwebûna xwe îlan kiriye. Êdî ji vir şûn de kur û neviyên wî jî dane ser şopa wî û bi darê zorê bûne etabeg (Şerefname, r.79). Cegerxwîn ji ber ku Ebû Tahir yekem etabegê serbixwe yê vê binemalê ye bi Ebû Tahir dest bi menzûmeya xwe kiriye, lê behsa mîrên destpêkê nekiriye.

3/3 Hezar Asif tu rabe mîrê çalak
51 Me derxe zû ji destê Tirkê napak

3/4 Erê Tirk e belê bermayê Rom e
52 Xeşimkar e setemkar e ji bo me

Hezar Esp (Hezar Asif), li ser wesiyeta bavê xwe û bi razîbûna binemala xwe hatiye ser hakimtiya serbixwe ya hemû herêma Loristanê. Di dema desthilatdariya Hezar Esp de herêma Loristanê bi ser xwe ve hatiye û bûye wek Cenneta Fîrdewsî. Ew axa welatê xwe ya bi kêrî kêlanê hatiye daye ajotin û tovên curbicur lê reşandiye. Rewşa Hezar Esp heta sala 655ê k./1258ê z. ku çûye rehma Xwedê bi vî awayî dewam kiriye (Şerefname, r.80). Cegerxwîn bi hesreta wan rojên geş bangî Hezar Espkiriye û xwestiye ew welatê xwe ji destê dijmin xelas bike ku welat di bin dagirkeriyê de ye.

3/5 Etabek Tigle rabe ey ciwanmêr
53 Tu deyne ser serê xwe tacê tev zêr

3/6 Bide pey xwe hezar Kurmancê devxûn
54 Bi destê xwe tu bigre çerxê gerdûn

Etabeg Tekleyê kurê Hezar Esp (Etabeg Tigle), piştî mirina bavê xwe li ser textê mîrektiya Loristanê rûniştiye. Bi mirina bavê wî re Etabeg Se’d ê Salgur sê caran êrîş aniye ser wî, lê nikaribûye serî li Etabeg Tekle bitewîne. Herçiqas di êrîşa Hulagû Xan a li ser Bexdayê de Tekle çûye cem wî û ketiye xizmeta wî jî ji ber agahiyên di derheqê Tekle de yên ku Tekle bi girtina Bexdayê û Kuştina xelîfeyê Ebbasiyan nerazî ye, Hulagû fermana girtina wî daye. Ji ber leşkerên Moxolan Tekle xwe davêje Kela Manxestê, lê ji bo teslîmbûna wî Hulagû hungustîla xwe jê re dişîne. Ew jî pê baweriya xwe aniye û teslîm bûye. Wî birine Tebrîzê û li wir wî kuştine (Şerefname, r.81). Cegerxwîn behsa bêtirsî û jêhatîbûna wî dike lê balê nakişîne peywendiya di navbera wî û Hulagû Xan.

3/7 Elib Erxûn tu rabe ey Etabek
55 Ji me kuştin neyaran sed hezar lek

3/8 Beg û axa û mîr û şah û paşa
56 Bi carek ketne rengê gornebaşa

Piştî kuştina Etabeg Tekle, Hulagu ferman daye ku birayê Tekle, Etabeg Şemseddîn Alp Ergun (Elib Erxûn) were ser desthilatdariya Loristanê. Wî pazde salan kar û barên welat bi xweşî îdare kiriye. Dema çûye rehmetê du kurên bi navên Yûsif Şah û Imadeddîn Pehlewan li pey xwe hiştine (Şerefname, r.81). Carek din bi vê malikê jî tê dîtin ku Cegerxwîn ji dêvla behsa zilm û zora Hulagû Xan a li ser vê mîrektiyê bike, ji bo balê bikişîne ser tevlîhevî û bêaramiya dema xwe bangî Elib Erxûn kiriye.

3/9 Were Yûsif Etabek şahê pir çak
57 Egîd û fihris û şûrkêş û çalak

3/10 Belê zanim ku fermana te çi doj e
58 Were cergê neyaran pê bisoje

Etabeg Yûsif Şahê kurê Alp Ergun, piştî mirina bavê xwe li ser fermana Abaqa Xanê kurê Hulagu Xan bûye desthilatdarê Loristanê. Wî di şer û cengan de xizmetek gelek hêja ji Abaqa Xan re kiriye. Lewma Abaqa Xan, desthilatdariya kar û barên Eyaletên Xuzîstan, Kuhgîlweyh û yên bajarên Fîruzan û Cerbadqan jî sipartiye Yûsif Şah. Peywendiyên wî yên baş bi Moxolan re heta dema împeratoriya Ergun Xanê biraziyê Abaqa Xan jî dewam kiriye. Yûsif Şah, di dawiya jiyana xwe de musa’ede ji Ergun Xan xwestiye û çûye Loristanê. Di sala 684ê k./1286ê z. de wefat kiriye (Şerefname, r.83). Di vê malika jor a di derheqê Etabeg Yûsif Şah de Cegerxwîn behsa bûyerên dema wî yan jî cihên di bin desthilatdariya wî de nekiriye, egîdî û mêrxasiya wî ya bi nav û deng aniye zimên.

3/11 Were Efrasiyab rabe bi çakî
59 Belê tenê tu şahê rûyê xak î

3/12 Tu taca Kesrewan î zû di ber ke
60 Cihan pêk ve heman zêr û zeber ke

Etabeg Efrasiyabê kurê Yûsif Şah, li gor *Şerefname*yê mirovekî dilreş, zordar, bê merhemet û xwînrêj bûye. Wî, hemû waliyên kevn û alîkar ji ser kar dane alî û ew talan kirine, kuştine û cihên wan bi mirovên beradayî ve tijî kirine. Piştî mirina Egun Xanê Moxolî, Efrasiyab serxwebûna xwe îlan kiriye û xwestiye hêza Moxolan bişkîne. Di serî de serkeftî be jî li hemberî berxwedana Moxolan leşkerên ku şandine têk çûne. Di dema Xazan Xanê Moxolî de fermana kuştina wî derketiye (Şerefname, r.83-84). Cegerxwîn ew bi aliyê cengawerî û netirsiya wî ber bi çav kiriye û bi teheyyula rojên xweş bi bîr aniye.

3/13 Tu wî Ehmed Etabek mîrê mîran
61 Şehinşahê cihan û lawê şêran

3/14 Bi destê xwe tu bigre şûrê Lahûr[276]
62 Li ser textê xwe rûnê şahê Deynûr

Piştî kuştina Efrasiyab Xazan Xan, Nesretu'l-Dînê Ehmedê kurê Yûsif Şah ê birayê Efrasiyab kiriye mîrê Loristanê. Nesretu'l-Dîn mirovekî dilpak, dadmend û dostê xelkê bûye. Wî nêzîkî sî û heşt salan mîrektî kiriye û di sala 733yê k./1333yê z. de bi ecelê xwe miriye (Şerefname, r.84).Ehmed Şahê Lora Mezin e, lê di malika li jor wek Şahê Deynûr derbas bûye. Ev yek dibe ku ji bo ahenga qafiyê hatibe bikaranîn.

3/15 Were Yûsif kurê Ehmed Etabek
63 Li ser şêran siwar in rovî, weşek

[276] Lahûr (Lahor) herêmek e ku îro di nav sînorên Pakîstanê de cih digire. Şûrê Lahûr cureyek şûrê Hindî yê qîmetdar e.

3/16 Loristan maye îro jar û kambax
64 Kelat û gund û bajar tev de bûn ax

Etabeg Rukneddîn Yûsif Şahê kurê Ehmed li cihê bavê xwe rûniştiye. Şeş salan bi dadmendî û dilsozî kar û barên Loristanê meşandiye. Di sala 740ê k./1340ê z. de çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.84). Di van malikên li jor de Cegerxwîn serdema Etabeg Yûsifê kurê Ehmed û roja xwe daye ber hev û heyfa xwe li wêranbûna kele, gund û bajaran aniye ku ev wêranbûn bi rasteqînî ne hilweşîna kele, gund û bajaran e, ev wêranbûn ji dest derketina desthilatdariya Loristanê tê. Jixwe Cegerxwîn bi risteya“Li ser şêran siwar in rovî, weşek”de ji destderketina desthilatdariyê destnîşan kiriye ku di vê risteyê de şêr Kurdên bi cesaret, rovî û weşek jî temsîla dijminê Kurdan e.

3/17 Were Efrasiyab Ehmed tu rabe
65 Welatê te seraser tev xerab e

3/18 Tu deyne serserê xwe tacê Kesra
66 Bi destê xwe tu bigre şûrê Dara

Muzafferu’l-Dîn Efrasiyab Ehmedê kurê Yûsif Şah e. Piştî mirina bavê xwe derketiye ser textê mîrektiya Loristanê. Di dema wî de nav û dengê Emîr Tîmûrê Kurganî li cîhanê belav bûye. Tîmur welat ser û bin kirine, şewitandine û îstila kirine. Loristan a perçeyek ji axa Îranê jî yek ji wan bûye ku ketiye bin mîrektiya Tîmur. Lê Tîmur di sala 795ê k./1393yê z. fermana Mîrektiya Loristanê ji bo Muzafferu’l-Dîn muhr kiriye. Piştî vê fermanê zêde neçûye Muzaffer wefat kiriye (Şerefname, r.85). Wek di şêwaza malikên berê de jî tê dîtin, Cegerxwîn bi raweya fermanî bangî Efrasiyab Ehmedê kurê Yûsif Şah kiriye lê peywendiya wî û Tîmurleng destnîşan nekiriye. Ev yek diyar dike ku Cegerxwînî pirsgirêkên roja xwe li pêş girtine.

3/19 Were rabe Etabek, ey pêşengî
67 Digel dijmin bikin sed barê cengî

3/20 Welatê xwe ji destê wan derînin
68 Ji wan tola xwe îro em hilînin

Etabeg Pêşengê kurê Yûsif Şah, piştî mirina apê xwe bûye fermanrewayê Loristanê. Ew demeke gelek dirêj li ser textê mîrektiyê maye. Piştre ewladekî sadiq li pey xwe hiştiye û wefat kiriye (Şerefname, r.85). Cegerxwîn di malika navê Etabeg Pêşeng bi bîr aniye de hunera cînasê bi kar aniye. Pêşeng navê etabeg e, Cegerxwîn bi wateya pêşewa, serok û rêber bi kar aniye. Cegerxwîn ji bo bi dijmin re şer bike û welat bi vî rengî xelas bike bangî Etabeg Pêşeng kiriye.

3/21 Were Ehmed Etabek ey tu dilxûn
69 Tu bişkîne bi gurzan çerxê gerdûn

3/22 Felek bigre, bike sed pare pare
70 Ji Kurda re gera wê çep li kar e

Etabeg Ehmedê kurê Pêşeng, li ser fermanrewatiya text û tacê bavê xwe rûniştiye. Lê di dema wî de rewşa welat ber bi xerabûnê ve çûye. Kurê wî Ebû Se'îd li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.85). Cegerxwîn ji ber hem di serdema Etabeg Ehmed de hem jî di dema wî de şensê Kurdan li hev nahatiye û Kurd ketine nav rewşên nebaş. Lewma Cegerxwîn bi bangkirina Etabeg Ehmed xwestiye ku ew felekê (şens/bext/sûd) perçe perçe bike.

3/23 Were bavê Se'îd, rabe tu comerd
71 Dilê Kurdan binêre tev de bûn derd

3/22 Bi destê xwe tu bigre şûrê Hindî
72 Tu paşayê Loran û serbilind î

Etabeg Ebû Se'îdê kurê Ehmed, piştî bavê xwe çend salan li Loristanê desthilatdarî kiriye. Di sala 827ê k./1423yê z. de miriye (Şerefnme, r.85). Agahiyên di *Şerefnameyê* de yên li ser Etabeg Ebû Se'îd tenê bi desthilatdariya wî bisînor in. Cegerxwîn dema behsa wî kiriye desthilatdariya wî bi serbilindî daye û ji ber seroktiya Kurdan kiriye wî wek bavê Se'îd bi nav kiriye.

3/25 Etabek Şah Husên zû rabe ser xwe
73 Ji nav Kurdan neyaran zû biderxe

3/26 Binêre em di nava Tirk û Qehtan
74 Belengaz û pepûk û xanî wêran

Etabeg Şah Huseyîn (Şah Husên), kurê Ebû Se'îdê kurê Ehmedê kurê Pêşengê kurê Yûsif Şah e. Serweriya Etabeg Şah Husên zêde dewam nekiriye, di sala 827ê k./1423ê z. de ji aliyê Xiyaseddînê kurê Kawisê kurê Hoşengê kurê Peşeng ve hatiye kuştin (Şerefname, r.85). Cegerxwîn wek di gelek malikên din de xuya ye, ne pirsgirêkên serdema kevn, pirsgirêkên roja xwe aniye zimên. Behsa rêvebirî û kuştina Etabeg Husên nekiriye, bal kişandiye ser di navbera Tirk û Qehtanan de pepûk û belengaziya Kurdan.

3/27 Xiyaseddîn kurê Kawûs heleste
75 Tu şûr û xencer û tîran vebeste

3/28 Li gerdûn xe tu carek gurzê Guhderz
76 Cihan pêk ve ji ber gurzê te bî lerz

Bi kuştina Etabek Şah Husên, Mîrza Siltan Îbrahîmê kurê Mîrza Şahruh leşkerekî giran şandiye ser Xiyaseddîn û ew ji welat derxistiye. Bi vî awayî dawî li desthilatdariya vê binemala mezin a Kurd hatiye (Şerefname, r.85). Di her sê nusxeyên li ber destên me de ne jî ji bo Xiyaseddîn kurê Kawus sernavekî cuda nehatiye veqetandin. Navê wî bi kuştina Etabeg Şah Husên re hatiye yadkirin. Lê Cegerxwîn navê wî bi bûyera kuştina Şah Husên neaniye zimên, navê wî jî wek

mîrên din bi malikek cuda daye. Ji xeynî vê behsa dawîlêhatina vê mîrektiyê jî nekiriye.

**Tablo 3.2.3.** Mîrên Lora Mezin (Buzurk)

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Nasireddîn Mihemmed kurê Hîlalê Kurê Bedir, Ebû Tahir, Hezar Esp, Etabeg Tekleyê kurê Hezar Esp, Etabeg Şemseddîn Alp Ergun, Atabeg Yûsif Şahê kurê Alp Ergun, Atabeg Efrasiyabê kurê Yûsif Şah, Atabeg Nesretu'l-Dînê Ehmedê kurê Yûsif Şah, Atabeg Rukneddîn Yûsif Şahê kurê Ehmed, Muzaferu'l-Dîn Efrasyab Ehmedê kurê Yûsif Şah, Atabeg Ehmedê kurê Peşeng, Atabeg Ebû Se'îdê kurê Ehmed, Atabeg Şah Huseyin | Ebû Tahir<br>Hezar Asif<br>Etabek Tigle<br>Elib Erxûn<br>Yûsif Etabeg<br>Efrasiyab<br>Ehmed Etabeg<br>Yûsif kurê Ehmed Etabeg<br>Efrasiyab Ehmed<br>Etabeg Peşeng<br>Ehmed Etabeg(kurê Pêşeng), Bavê Se'îd (kurê Ehmed), Etabeg Şah Husên,<br>Xiyaseddîn kurê Kawus |
| Dem | Sedsalên XII-XV. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Manrud,[277]herêma Loristan, Eyaleta Şolistan, Xuzîstan, Kuhgîlweyh, Cerbadqan, Fîrûzan | Loristan |

### 3.2.4.Mîrên Lora Biçûk

Ev menzûmeya li ser mîrên Lora Biçûk ji bîst û çar malikan pêk hatiye ûtê de Cegerxwîn dozdeh mîrên Lora Biçûk rêz kiriye. Cegerxwîn vê menzûmeyê bi sernavê Şahanê Lora Biçûk daye. Lê di vê menzûmeyê de ji aliyê kronolojiyê ve tevlîheviyek derdikeve holê kudi Ş*erefname*yê de navê bîst û sê(di hin nusxeyan de

[277] Manrud di wergera İbrahim Sunkur de derbas nebûye.

navên Felekuddîn Hesen û Izeddîn Huseyin jî wek sernavek hatiye dayin)[278] mîrên Lora Biçûk bi sernavên cihê hatiye dayin. Diyar e kudi vir de tevlîheviyek çêbûye; çimkî mîrên vê binemalê di dawiya menzûmeya “Şahanê Erdelan” de bi bîst û çar malikan hatine dayin û tê de navê dozdeh mîrên Lora Biçûk derbas bûne. Em ê li gor kronolojiya *Şerefname*yê herin û wan malikên bi menzûmeya Şahanê Erdelan ve wek pêvek hatine dayin em ê di bin vê sernavê de rêz bikin. Dîlawerê Zengî jî di “Ferhenga Kesan” a dîwanê de bal kişandiyeser vê xalê û gotiye ku piştî bi dawîbûna Şahanê Erdelan Cegerxwîn berdewam kiriye û çend navên din rêz kirine. Lê Dîlawerê Zengî di derheqê vê tevlîheviyê de tu agahî nedaye yan jî negihîştiye tu encamî.

Ji ber serokekî Loran ê serbixwe tunebûye, ew rasterast girêdayî Xelîfeyên Bexdayê bûne. Di dawiyê de Loristan kirine destê Husameddîn Şuhluyê girêdayî Selçûkiyan. Piştî demekê Husameddîn Şuhlu, mihafiziya hinek cihên Loristanê daye Şuca’eddînê kurê Xurşîd û mihafiziya hinek cihên Loristanê jî daye destê Surxabê kurê ‘Iyar. Bi demê re Şuca’eddîn cihên di bin destê Surxab de jî girtine bin desthilatdariya xwe û welatê Lora Biçûk hemû ketiye bin desthilatdariya wî (Şerefname, r.88).

4/1 Şuca’eddîn kurê Xorşîd tu şah î
77 Belê zanim xwedî text û kulah î

4/2 Erê textê te bû gerdûnê esman
78 Sîpah û leşkerê te tev ji Kurdan

Şuca’eddîn kurê Xurşîd, kurê Ebûbekirê kurê Mihammedê kurê Xurşîd e. Şuca’eddîn kar û bar, waridat û serweta Loristana Biçûk bi rêk û pêk kiriye. Wî herdu kurên xwe ji bo şerê Eşîreta Cengrûyê şandine ser wilayeta Simhayê. Di vî şerî de kurê wî Heyder hatiye kuştin. Şuca’eddîn li ser kuştina kurê xwe ji bo heyfa wî bigire xelkê navçeyê daye zorê ku xelk neçar mane û ji welatê xwe Manrûdê bar kirine û çûne. Piştî demeke dirêj Dîwana Xelîfe ya Bexdayê bangî Şuca’eddîn û

278 Di wergera Abdullah Yegin de mîrên Lora Biçûk di bin bîst û çar sernavan de hatiye komkirin. Ji bo kurên Bedreddîn Mes’ûd Felekuddîn Hesen û Izzeddîn Huseyîn jî sernavên cihê hatiye dayin (r.93).

birayê wî kirine û xwestine Keleya Mangreyê teslîmî mirovên xelîfe bikin. Ew ji ber vê daxwazê qebûl nekirine wan ew xistine zindanê. Birayê wî di zindanê de miriye. Şuca'eddîn piştî demeke dirêj a di zindanê de mecbûr maye keleyê teslîm bike. Lê ji dêvla keleyê wîlayeta Tirazkê dane wî. Dema ku Şuca'eddîn rizgar kirine, ew hatiye Loristanê û sî salên din hikumdartî kiriye. Ew di dawiya jiyana xwe de ji ber pîrbûnê nikaribûye qencî û xirabiyê ji hev derxe. Seyfeddîn Rustemê biraziyê wî bêbextî li kurê wî Bedir kiriye ku qaşo Bedir dixwaze bavê xwe ji ser text daxe. Şuca'eddîn, ji vê yekê bawer kiriye û ji bo kuştina Bedir ferman daye. Li gor tê gotin, Şuca'eddîn ji sedsalî zêdetir jiyaye û di sala 621'e k./1225'e z. de wefat kiriye (Şerefname, 88). Cegerxwîn ji ber yekem mîrê serbixwe yê Lora Biçûk Şuca'eddîn e, di malika yekem de navê wî yad kiriye, xweşî û dewlemendiya wê serdemê diyar kiriye.

4/3 Were Rustem şehê eywanê Kurda
79 Bi şûrkêşî bigêrin kom û cerdan

4/4 Bi gurz û xencer û tîran û daran
80 Ji Kurdistanê derxin van neyaran

Seyfeddîn Rustem, kurê Nureddîn Mihemmedê kurê Ebûbekirê kurê Mihemmedê kurê Xurşîd e. Piştî mirina Şuca'eddîn bûye mîrê serbixwe yê hemû Lora Biçûk. Serdema wî bi edalet, bereket û xweşî derbas bûye. Şêst kesên ku şêlandin û dizîkirine karê xwe, avêtine zindanê û ew îdam kirine. Kes û nasên wan mirovan bi birayê Seyfeddîn Rustem ê bi navê Şerefeddîn Ebûbekir re bi hev kirine û ew kuştine. Şerefeddîn Ebûbekir, piştre bangî Eliyê kurê Bedir[279] kiriye û jê re gotiye were di şûna tola bavê xwe de serê wî jêke (Şerefname, r.90). Seyfettîn Rustem, bi zîrektî û jîrîtiya xwe di van malikan de ber bi çav bûye.

4/5 Şeref mîrê ciwan û çak û serbest
81 Ji bo Kurdan şehinşah û kemerbest

[279] Di wergera İbrahim Sunkur (r.102) de di îfadekirina vê bûyerê de hin cudahî hene. Li gor vê wergerê dema Şerefeddîn Ebûbekir tîrekê davêje Seyfeddîn Rustem û wî dikuje, ji Eliyê kurê Bedir re gotiye ku "ev qisseya Bedir e" û serê wî jêkiriye.

4/6 Serfirazê Loran û şêrê xwînxwar
82 Egîd û pehlewan û mîr û serdar

Piştî ku li Çiyayê Kuh Kulahê birayê xwe daye kuştin û vegeriyaye, jina Bedir ku dayîka Husameddîn Xelîl bû ew jî bi pêşwazîgeran re çûye pêşiya Şerefeddîn û qedehek tijî şerbeta[280] jehrkirî pêşkêşî wî kiriye. Ew bi vê şerbetê nexweş ketiye lê piştre hinek baş bûye. Piştî mirina wî birayê wî Izzeddîn Kirşasef li ser textê mîrektiyê rûnştiye (Şerefname, r.92). Serdema Şerefeddîn Ebûbekir ji şerên derve zêdetir bi şerê navxweyî û îqtidarê re derbas bûye. Lê Cegerxwîn aliyê wî yê serfirazî û egîdiyê aniye zimên ku Cegerxwîn serdema hikumdariya Kurdan bi nêrînek erênî girtiye dest.

4/7 Erê Gerşasifê nazdar û xweş rû
83 Were rûnê li textepayê Xusro

4/8 Tu deyne ser serê xwe tacê Behmen
84 Ji ber dijmin me derxe rengê Bêjen

Izzeddîn Kirşasefê (Gerşasifê) kurê Nureddîn Mihemmed e. Li cihê birayê xwe bûye hikumdar. Bi jinbira xwe ya jinebî Melîke Xatûnê re zewiciye. Dema Husameddîn Xelîlê kurê Şuca'eddîn Xelîl[281] bi desthilatdariya wî hesiyaye ji bo desthilatdariyê ji destê wî derxe bi leşkerekî giran çûye ser Loristanê. Di şer de Kirşasef têk çûye û xwestiye xwe bigihîne Kela Kerbetê cem jina xwe Melîke Xatûn. Lê Husameddîn Xelîl li pey wî hatiye û ew êsîr girtiye. Bi ser gotina Izeddîn jina wî Melîke Xatûn deriyê keleyê vekiriye û kele ketiye destê Husameddîn Xelîl. Bi vî awayî mîrektiya Loristanê bi tevahî ketiye destê Husameddîn Xelîl (Şerefname, r.92). Kirşasef (Gerşasef), bi kesayetî mirovekî nazdar û xweşrû bûye. Heke xwişkên wî zorê nedana ser, wî yê bi Husameddîn Xelîl re şer nekira û bê şer Loristan teslîmî wî bikira. Herwiha Cegerxwîn kesayetiya wî ya letîf destnîşan kiriye, bi mîsala rengê Bêjen a ji xelasbûna bîrê, xelasbûna ji bin destê dijmin hêvî kiriye.

[280] Di wergerên İbrahim Sunkur (r.103) û Abdullah Yegin (r.88) de peyva şerbetê derbas bûye. Ziya Avci (r.91) ji dêvla peyva şerbetê, peyva şerabê bi kar aniye.
[281] Piştî mirina bavê xwe çûye navenda Xelîfetiyê ya Bexdayê û li wir bicî bûye.

4/9 Husameddîn Xelîl rabe were xoş
85 Bike carek kela cengê bidî coş

4/10 Bikuj dijmin bi wan tîrên zerfeşan
86 Ji wan bigre tu îro xwîna Kurdan

Husameddîn Xelîlê kurê Şuca’eddîn Xelîl, piştî bûye hikumdarê Lora Biçûk Izzeddîn Kirşasef ji bo cînişîniya xwe diyar kiriye. Lê Husameddîn Xelîl dawiyê ew di mala xwe de kuştiye. Melîke Xatûna jina Kirşasef hersê kurên xwe bi dizî şandiye Bexdayê cem birayê xwe Silêman Paşa Ebûh. Di navbera Husameddîn Xelîl û Silêman Paşa Ebûh de şerekî mezin dest pê kiriye ku tenê di nav mehekê de sî û yek caran leşkerên wan li dijî hevudu rabûne. Di dawiyê de Husameddîn Xelîl leşkerên Silêman Paşa gelek şerperze kiriye. Silêman Paşa ji xelîfe alîkarî xwestiye û bi vê alîkariyê şêst hezar kesên çekdar şandiye ser Husameddîn Xelîl. Wan, Husameddîn kuştine û serê wî ji Silêman Paşa re birine (Şerefname, r.92-93). Cegerxwîn di navbera kuştina dijminê serdema Husameddîn Xelîl û ji holêrakirina dijminê roja xwe de girêdanek çêkiriye. Bi cengawerî û tîrkêşiya Husameddîn, riya xelasiyê li ber çavên xwendekarên xwe raxistiye. Çimkî Cegerxwîn, têkoşîna Kurdan a roja xwe wek helqeyekî ji zencîra pêvajoya dîrokê dîtiye.

4/11 Erê Mes’ûd bike carek temaşa
87 Li Kurdistan binêre tu li laşa

4/12 Ji Loran ta bi Zazan tev de bûn jar
88 Di bin destê neyaran qîr û hewar

Bedreddîn Mes’ûd kurê Bedirê kurê Şuca’eddîn Xurşîd e. Ew, mirovekî dadmend dilnerm û xwendewarekî hunermend bûye. Tê gotin; çar hezar meselên fiqhê yên Mezhebê Şafi’î jiber kiriye. Bedreddîn Mes’ûd şanzdeh salan mîrektî kiriye û di sala 658ê k./1261ê z.de çûye rehma Xwedê. Ji bo desthilatdariyê di navbera herdu kurên wî û kurê Husameddîn Xelîl de dubendî derketiye. Çareserkirina vî karî gihîştiye Abaqa Xanê Moxolî ku bi sedemên siyasî fermana

kuştina herdu kurên Bedreddîn Mes'ûd daye (Şerefname, r.95). Malikên Cegerxwîn di navbera do û îro de pirek in û nêzîkahiya Cegerxwîn a ji serdemên mîran re rasterast ji şert û mercên bûyerên serdema mîrektiyan zêdetir bi bûyerên îro re têkildar in.

4/13 Tu Taceddîn î tacî zîv û zêr î
89 Bi navê Ehreman kî tê binêrî

4/14 Ku Kurdên te hemî bûne belengaz
90 Li her alî hawar û qîr û awaz

Taceddîn Şah kurê Husameddîn Xelîlê kurê Bedirê kurê Şuca'eddîn Xurşîd e. Ji aliyê Abaqa Xanê Moxolî hatiye ser textê Loristanê û hivdeh salan rêveberiya Lora Biçûk kiriye. Di sala 677ê k. de cardin bi fermana Abaqa Xan hatiye kuştin û biryar hatiye dayin ku rêvebirina kar û barên Loristanê bidin destê herdu kurên Bedreddîn Mes'ûd ên bi navên Felekeddîn Hesen û Izzeddîn Huseyîn (Şerefname, r.95). Cegerxwîn hezkirina welatû neteweya xwe, ji dil di van malikan de daye xuyakirin û awaza wî bûye hawar û qîrîna belengaziya neteweya xwe. Cegerxwîn di van malikên di jor de navê Ehreman daye û ew wek hêmayekî dijminahiyê diyar kiriye. Ji ber Cegerxwîn hezkiriyê gelê xwe ye bi riya behskirina Ehreman zilm û zordariya, qîrîn û hawara gelê xwe daye berçav.

4/15 Hesen rabe felek çerxa xwe bada
91 Bêşa Kurdan bi serbestî nema da

4/16 Belê kûra cîhanê tev de agir
92 Pêtek rakir bi ser çavê me dakir

Felekeddîn Hesen û Izzeddîn Huseyînê kurên Taceddînê kurê Husameddîn Xelîl, pazdeh salan bi hev re rêvebirina Mîrektiya Loristanê meşandine û Loristan gelek bi pêş de birine. Herdu jî di sala 692yê k./1294ê z. de di dema Keyxatû Xan de mirine (Şerefname, r.95). Cegerxwîn navên van herdu birayan bi hev re nedaye, tenê

navê Hesen (Felekeddîn Hesen) derbas bûye û bi van malikan bindestiya Kurdan diyar kiriye. Ji ber navê wî Felekeddîn Hesen e Cegerxwîn di risteyê de bi awayekî mecazî îbareya “felek çerxa xwe bada” bi kar aniye û bêşensî û bêsiûdiya Kurdan aniye zimên.

4/17 Cemaleddîn Xidir Paşa tu şah î
93 Xwedanê leşker û kom û sipahî

4/18 Digel xwe zû werîne komê Kurdan
94 Bike dengê tivingan biçe ezman

Cemaleddîn Xidir, kurê Taceddîn Şahê kurê Husameddîn Xelîlê kurê Bedirê kurê Şucaêddîn Xurşîd e. Li ser fermana Keyxatu Xan bûye mîrê Loristanê. Lê ji aliyê Husameddîn Omer Beg û Şemseddîn Lenbekiyê desthilatdariya wî nepejirandine Cemaleddîn hatiye kuştin. Bi kuştina wî nesla Husameddîn Xelîl qir bûye (Şerefname, r.96).Cegerxwîn bi vê malikê bangî Cemaleddîn Xidir kiriye, jê xwestiye Kurdan kom bike û were şerê çekdarî. Heta vê malikê amûrên şer ên wek şûr, xencer, gurz û hwd. hatine bikaranîn lê di vê malikê de behsa tivingê kiriye ku tiving amûrek şer ê wê serdemê nîne. Lewma em dikarin bibêjin ku Cegerxwîn di vir de anakronîzm bi kar aniye.

4/19 Emer Beg rabe ser xwe ey cîhangîr
95 Li ser textê Loran rûnê tu ey mîr

4/20 Bi destê xwe tu bigre şûrê tazî
96 Digel dijmin bikêşin cegerbazî

Husameddîn Omer Beg (Emer Beg), piştî ku Fermanrewatiya Loristanê bi zorê bi dest xistiye, Mîrên Loristanê Semsameddîn Mehmûd û Izzeddîn Mihemmed pey re dest bi şer kirine. Çend mîr û mezinên din jî li hemberî Husameddîn Omer rabune. Semsameddîn Mehmûd, xortekî gelek hişyar, zana û mêrxas bûye. Semsameddîn bi leşkerekî giran hatiye ser sînorê Xurremabadê. Li ser vê rîsipî û

ricakar ketine navbera wan û nehiştine di navbera wan de şer biqewime. Husameddîn Omer, di lehê Emîr Semsameddîn Mehmûd de dev ji desthilatdariya Loristanê berdaye. Bi vî awayî Semsameddîn Mehmûd hakimiyet girtiye destê xwe (Şerefname, r.96). Cegerxwîn qet neketiye nav bûyerên serdema Husameddîn Omer (Emer), tenê seroktiya wî aniye zimên û jê xwestiye ku bi dijmin re şer bike, welatê xwe xelas bike û wek serokek Kurd li ser textê rêvebiriyê rûnê.

4/21 Erê Semsam tu Mehmûd pehlewan î
97 Şehinşah î li ser textê Loran î

4/22 Herê zanim ji forta re seza yî
98 Mixabin ta bi çaxê min nemayî

Semsameddîn Mehmûdê kurê Nureddîn Mihemmed e, piştî ezilkirina Omer Beg kar û barê welat girtiye destê xwe. Di demek kurt de Loristan bi tevahî pêş xistiye. Rojekî Semsameddîn tenê ji bo kuştina Şehabeddîn Lenbikî û birayên wî yên li Loristanê bûne sedemê tevliheviyê çûye û êrîşî wan kiriye. Wan jî li hemberî wî berevaniya xwe kirine û Semsameddîn bi awayekî giran birîndar kirine. Semsameddîn ji ber wan nereviyaye, piştre ew dane girtin û kuştin. Li ser vê bûyerê neviyê Şêx Kahweyh çûye xêveta Xazan Xanê Moxolî û ji bo kuştina Cemaleddîn Xidir û Şehabeddîn Ilyas, şikayeta Omer Beg û Semsameddîn Mehmûd kiriye. Xazan Xan, ji bo tola Cemaleddîn Xidir Omer Beg daye destê kes û nasên Cemaleddîn Xidir ku ew kuştine. Semsameddîn Mehmûd jî di şûna tola Şehabeddîn Ilyas de hatiye kuştin. Ev bûyer sala 695ê k./1295, 1297ê z. de qewimiye (Şerefname, r.97). Cegerxwîn bi hikumdartiya Semsameddîn serbilind bûye û ji ber di dema wî de tunebûna hikumdarên bi vî awayî wek kêmasiyek mezin dîtiye. Jixwe Cegerxwîn di vê dîwanê de ji xalên herî zêde destnîşan kiriye yek jî kêmasiya hikumdarên Kurd ên serkeftî ne. Wek di malikên din de jî tê dîtin Cegerxwîn bûyerên serdema Semsameddîn diyar nekiriye.

4/23 Bes e dîsa tu rabe ey Mihemmed
99 Ji Loran bigre carek ta bi Amed

4/24 Hemî Kurd in ji forta re seza ne
100 Heye sed sal li bin destê geda ne

Izzeddîn Mihemmed, kurê Emîr Izzedîn Huseyinê kurê Bedreddîn Mes'ûd e. Piştî kuştina Omer Beg û Semsameddîn Mehmûd, Izzeddîn Mihemmed hê di salên xwe yên di zaroktiyê de derketiye ser textê mîrektiyê. Lê Bedreddîn Mesûdê kurapê wî, ji ber ku bi temen jê mezintir bûye li ser desthilatdariyê li pêşiya wî bûye asteng. Demekê desthilatdariya Loristanê ji Bedreddîn Mes'ûd re, meşandina kar û barên xezîneyê yên gelemperî û lênêrîna kar û barên Inco Xan jî ji Izzeddîn Mihemmed re hatiye dayin. Lê piştre desthilatdariyê dane destê Izzeddîn Mihemmed. Ew jî heta sax bûye kar û barên wilayetê di destê wî de maye. Di sala 716yê k./1316-1317yê z. de bi ecelê xwe miriye (Şerefname, r.97). Cegerxwîn navê wî wek Mihemmed bi kar aniye lê di *Şerefname*yê de bi awayî Izzeddîn Mihemmed derbas bûye. Cegerxwîn ji bo bi destxistina axa welat bangî Izzedîn Mihemmed kiriye ku ji Şoran heta Amedê bigire. Wek me li jor jî diyar kir navê dozdeh mîrên Lora Biçûk ên mayî li pişt mîrên Erdelanê hatiye rêzkirin ku îhtimaleke mezin di rêzkirina Cegerxwîn de xeletî tune ye, piştre di tertîpkirina destxetê de ev xeletî derketiye holê. Jixwe wek berê jî me got destxet, ji 730 malikan pêk hatiye, lê di beşa Şahanên Erdelan de ji ber şeş malik dubare bûne ji destxetê hatine avêtin û di destxetê de 724 malik mane ku diyar e di vir de şaşiyek pêk hatiye.

4/25 Tu Dewlet Xanim î xatûn tu heste
101 Heyasa zêr li pişta xwe vebeste

4/26 Erê jin kêmtirin her dem ji mêran
102 Keçê tu çêtir î îro ji şêran

Dewlet Xatûn jina Izzeddîn Mihemmed e. Piştî mirina Izzeddîn bûye şahbanûya Loristanê û li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Lê di dema wê de kar û barên rêvebirina welat ber bi nebaşiyê ve çûye. Piraniya kar ji aliyê memûrên Dîwana Moxoliyan ve hatine meşandin. Lewma Dewlet Xatûnê neçar maye û kar û barê hikumdariyê daye destê birayê xwe Izzeddîn (Şerefname, r.97-98).

Di *Şerefname*yê de tenê Dewlet Xatûnê wek jin rêveberiya mîrektiyekê kiriye. Ji bilî wê di vî warî de ji ber kurê wê bi temen gelek biçûk bûye dayika Sultan Mihemmedê mîrê Botanê siyasetek baş pêk anîbe jî rasterast hikumdarî ne di destê wê de bûye. Ev jin keça Melik Mihemmedê kurê Melik Xelîlê Mîrê Hesenkêfê bûye. Jixwe navê jinan zêde derbas nabe. Ji xeynî navê Dewlet Xatûnê di *Şerefname*yê berga yekem de navê Melîke Xatûna jina Izzeddîn Kirşasef û xwişka Silêman Şah Ebûh, Şah Perwera xwişka Şah Uxur û jina Şah Rustem, Şahim Xatûna jina Emir Şeref ku dawiyê bi Mîr Seydî Ehmed re zewiciye, Menteşa jina Siltan ‘Eliyê kurê Surxab û xwişka Siltan Ustaclû, Bêkesî (Bêkes) Xanima keça Mîr Diyaeddîn û jina Xan Mihemmed Ûstaclû û Şahbengî Xatûn a jina Şeref Xan û keça Elî Begê Sasonî derbas bûye. Ji bilî vê, keça Yustinyusê Fermanrewayê Xelatê ya bi navê Taron jî divê neyê jibîrkirin. Jin bi navên bavê xwe yan jî bi navê mêrê xwe hatine yadkirin. Di dawiyê de dema Şerefxan behsa jiyana xwe kiriye jî ne navê diya xwe ne jî navê jina xwe nivîsandiye. Wî ew jinên malbata xwe tevî navê bavê wan daye nasîn. Wek tê dîtin serdema Dewlet Xatûnê ji aliyê rewşa siyasî ve serdemeke baş nîne, kar û barên mîrektiyê ketine destê Moxolan û ji ber Dewlet Xatûn ji heq derneketiye desthilatdariyê teslîmî birayê xwe kiriye. Lê Cegerxwîn wek helbestvanê sedsala XX. vê serdemê ji aliyê erênî ve nirxandiye û bi hikumdariya jinekê kêfxweş bûye. Cegerwîn piştî analîza civakî ya marksîst hîn bûye û bi nêzîkahiya sosyalîzmê xwestiye jin di her qadên jiyanê de cih bigirin. Ji ber ku di qada siyasetê de her dem jin ji mêran kêmtirin, wî ew desthilatdariya Dewlet Xatûnê gelek bi rûmet dîtiye.

4/27 Hisên rabe li te şahî rewa ye
103 Ji bo te kunbeda gerdûn sera ye

4/28 Bigir dîsa bi qefda şûrê tazî
104 Li nav Kurdan tu rake deng û gazî

Izzeddîn Huseyinê (Hisênê) birayê Dewlet Xatûn e. Ji dêvla xwişka xwe mîrektî girtiye dest û bi qasî çardeh salan bi dadmendî hikumdarî kiriye. Piştî wî kurê wî Şuca’eddîn Mehmûd hatiye ser textê Lora Biçûk (Şerefname, r.98). Navê Izzeddîn Huseyîn di malika Cegerxwîn de wek Hisên hatiye bi kar anîn. Cegerxwîn

ji ber pêdivî bi hikumdarên Kurd re heye bangî Izzeddîn Huseyîn kiriye ku xwesteka wan rojên berê yên xweş û geş di malikên Cegerxwîn de hatiye dîtin.

4/29 Şuca’eddîn tu rabe zû binêre
105 Tu guh îro li dengê me bidêre

4/30 Hemî bûne wekî pûşên beyaran
106 Ter û hişk in li ber arê neyaran

Piştî mirina Izzeddîn, Şuca’eddîn Mehmûdê kurê wî li cihê wî bûye hikumdar. Şuca’eddîn ji ber mirovekî necamêr û zordar bûye xelkê li hemberî wî serî hildane û ew di sala 750yê k./1349-1350yê z. de hatiye kuştine (Şerefname, r.98). Cegerxwîn bi heman şêwaza behsa mîrên din kiriye dema behsa Şuca’eddîn kiriye jî xwestiye ew guh bide deng û perişaniya Kurdan.

4/31 Melek Ezdîn şehînşahê cihanî
107 Belê çibkim ji min îro nihanî

4/32 Kemerbest e bi destê xwe bigir şûr
108 Bike wêran welatê lawê Teymûr

Melik Izzeddînê kurê Şuca’eddîn Mehmûd (Melek Ezdîn) e. Piştî kuştina bavê xwe li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Di demawî de bi siltan û waliyên Iraqê re peywendiyên baş hatine danîn. Lê di sala 790ê k./1389ê z. de Tîmûrê Kurganî ew girtiye û şandiye Semerkendê. Seydî Ehmedê kurê wî jî şandiye Endîkanê. Piştî sê salan ew şandiye ser mîrektiya Loristanê; lê ji ber helwestên xerab ên kurê wî ji aliyê Moxolan ve hatiye tawanbarkirin û di sala 804ê k./1402yê z. de li bajarê Siltaniyyeyê bi zindî hatiye gurandin û laşê wî heft rojan daliqandî maye (Şerefname, r.98). Cegerxwîn cara yekem e di vê malikê de behsa lawê Teymûr dike ku Melik Izzeddîn bi destê wan hatiye kuştin. Cegerxwîn dixwaze balê bikişîne vê bûyerê û daxwaz dike ku Melik Izzeddîn heyfa xwe ji dijminê xwe bistîne, ango heyfa wî ji dijmin bê

stendin. Cegerxwîn di navbera do û îro de pirek çêkiriye û bi malikên xwe ji îro bangî do dike. Dijmin tenê dijminê roja do nîne, dijmin dijminê heman demê ye.

4/33 Were Ehmed tu rabe ey dilawer
109 Digel xwe zû tu rake kom û leşker

4/34 Bi dengê def û sed awazê xerçeng
110 Digel dijmin bikin cengê hezar reng

Seydî Ehmed, heta Emîr Tîmûr li ser dinyayê bûye newêribûye derkeve derve û xwe veşartiye. Piştî bûyera Tîmûrleng û êrîşa wî ya li ser wilayetê heta sala 815yê k./1403yê z. rêvebirina kar û barên Loristanê di destên wî de maye û piştre wefat kiriye (Şerefname, r.98). Wek gelek malikên din di malika derheqê Seydî Ehmed de jî Cegerxwîn berê xwe daye pirsgirêkên roja xwe. Ji kronolojiya *Şerefname*yê qut nebûye lê di gelek malikan de girêdana wî ya bi *Şerefname*yê tenê bi navê mîran bi sînor maye.

4/35 Were ey Şah Hisên rabe bi qencî
111 Binêre tu li xeşma vî Ferencî

4/36 Erê goştê di laşê me dikojîn
112 Dil û cerg û hinavê me disojin

Şah Huseyînê (Hisênê) kurê Melik Izzeddîn e. Piştî mirina Seydî Ehmed, Şah Huseyînê kurê Izzeddîn bûye Fermanrewayê Loristanê. Şah Huseyîn mirovekî bê sebr û hişk bûye. Dema ku Siltan Ebû Se'îd Kurganî desthilatî girtiye destê xwe, ji vê îstifade kiriye û Hemedan girtiye. Ji ber êrîş biriye ser Eşîreta Baharlû, serokê eşîretê riya çûnê lê girtiye û di sala 873yê k./1468-1469ê z. de ew kuştiye (Şerefname, r.99). Di van malikên li jor de Cegerxwîn behsa dijminahiya Frengan kiriye. Lê peywendiyên vê mîrektiyê bi Frengan re tunebûye. Cegerxwîn ji ber helwesta Frengan a roja xwe bi vî awayî tevgeriyaye.

4/37 Were Şah Rustemêçalak û serdest
113 Binêr Kurdên te tev de bûne bindest

4/38 Kelat û xan û man û birc û bajar
114 Hemî kavil xuya ne berze dîwar

Şah Rustemê kurê Şah Huseyîn, demek gelek dirêj mezintiya Loran kiriye. Dawiyê ketiye bin xizmeta Şah Îsmaîlê Sefewî. Şah gelek hurmetê daye wî û rêz lê hatiye girtin. Lê vê xweşiyê zêde dewam nekiriye, piştî demeke kurt wefat kiriye (Şerefname, r.99). Cegerxwîn bal kişandiye ser wêranbûna welat û bindestiya Kurdan.

4/39 Were Axûr kurê Rustem ciwan î
115 Şehînşah î li ser textê cihan î

4/40 Belê zanim tu îro mêrê çak î
116 Çiman pirsê ji Kurmancê xwe nakî?

Uxurê kurê Rustem (Axurê kurê Rustem), piştî bavê xwe bûye mîrê Loristanê. Dema Ubeyd Xanê Ozbekî êrîş aniye ser Îranê, Axur ji bo berterefkirina vê êrîşê çûye cem Şah Tehmasb û birayê xwe yê biçûk Cîhangîr di cihê xwe de hiştiye (940ê k./1534ê z). Cîhangîr ji vê firsetê îstifade kiriye û xwe wek Mîrê Loristanê îlan kiriye. Emîr Uxur di vegera seferê de bi vê bûyerê hesiyaye û berê xwe daye Loristanê. Di rê de hinek serseriyên rût û birçî derûdora wî girtine û wî kuştine. Piştî kuştina birayê xwe Cîhangîr bûye mîrê serbixwe yê Lorsitanê û neh salan mîrektî kiriye. Di sala 949'e k./1542-1543yê z. de li ser fermana Şah Tehmasb hatiye kuştin (Şerefname, r.99). Cegerxwîn rewşa Kurdan a nebaş zanibe jî xwestiye bi riya pirsê bi Uxurê kurê Rustem bide pirsandin û bi vê rê yê bi xwendekarên xwe bide fikirandin. Ji ber ku tiştên dizane ji nezanî hatiye û pirsiye Cegerxwîn di vir de hunera tecahulî 'arif bi kar aniye.

4/41 Cihangîro tu rabe ey şehê min
117 Nehê xwe jî tu deyne ser dehê min

4/42 Seraser em bi hev re dest bidin kar
118 Hemî pêk ve bibib heval û hemyar

Cîhangîrê kurê Şah Rustem e, piştî kuştina birayê xwe li Loristanê bûye fermanrewayê serbixwe. Nêzîkî neh salan bi serbestî hikudarî kiriye û di sala 949ê k./1542-1543yê z. de, li ser fermana Şah Tehmasb hatiye kuştin (Şerefname, r.99). Cegerxwîn bi risteyên; “Seraser em bi hev re dest bidin kar/ Hemî pêk ve bibin heval û hemyar”de ji bo hestên nasnameya neteweyî bê avakirin li ser yekîtî û tevgera bihevrebûnê sekiniye. Cegerxwîn helbestvanê gelê xwe ye û girêdayî jiyana civakê ye.

4/43 Were Şah Rustemê lawê Cîhangîr
119 Li ser textê cîhan rûne tu xweş mîr

4/44 Tu deyne ser serê xwe tacê gewher
120 Li pişta xwe girêde şûr û xencer

Piştî Cîhangîr ji aliyê Şah Tehmasb ve hatiye kuştin Ebû Muslimê Guhderzî ku lalayê zarokên Cîhangîr bûye, Şah Rustem biriye cem Şah Tehmasb û bi vî awayî sedeqeta xwe nîşanî şah daye. Bi fermana Şah, Rustem qeyd û zincîr kirine û avêtine Kela Elemûtê. Bi navê Mihemmedî kurekî din ê Cîhangîr hebûye lê hê zarok bûye. Lewma demeke ew eşîret û qebîle bê mîr û hikumdar mane. Şah li ser xebera yekî bi ser û sîma dişibe Şah Rustem derketiye holê û di nav gel de gotiye ez Rustem im. Li ser vê agahiyê Şah bi lez Rustem ji girtîxaneyê hatiye derxistiye û bi fermana Şah, serdartiya Loristanê û rêvebirina hikumeta Xuremabadê carek din ji nû ve dane wî û ew şandine Loristanê. Bi hatina wî Şah Rustemê derewîn hatiye kuştin. Di navbera Şah Rustem û birayê wî Mihemmedî de ji bo desthilatdariyê şer derketiye lê mezin û rîspî ketine navbera wan û ji şeş eyaletên Loristanê çar dane wî û dudujî dane rêveberiya Mihemmedî (Şerefname, r.100-101). Cegerxwîn, Şah Rustem bi

cengawerî û şûrkêşiya wî dide nasîn ku mirovên dixwaze biafirîne mirovên bi cesaret, rast û dirust, ji welatê xwe û zimanê xwe hez dike û ji bo ji bindestiyê xelas bibe serî hildide û di vî warî de serfiraz dibe ye.

4/45 Were ey Şah Muhemmed mîr û serdar
121 Binêre ka çilo ne Kurdê xwînxwar

4/46 Ji Orfa bigre carek ta bi Deynûr
122 Perîşan in bi carek nêz û hem dûr

Mihemmedî, ji aliyê Emîr Xan el-Mûsilî ve yê li ser fermana Tehmasb bac berhev dikir tevî sed kesên mezin û serokên Loristanê di Kela Elemûtê de hatiye girtin. Mihemmedî deh salan di vê keleyê de girtî maye. Her çar kurên wî di vê heyamê de hem êrîşî apê xwe Rustem kirine hem jî êrîşî ser welatên di bin destê Şah Tehmasb de kirine û Şah şaş û perîşan kirine. Li ser nêrîna rawêjkerên mîran û erkanê dewletê Şah, ji bo belaya kurên wî xelas bibe Mihemmedî ji Kela Elemûtê azad kiriyeû wek rehîne şandiye Qezwînê û li hemberî vê yekê jî ji kurên wî sî hezar hesp, pez û dewar xwestine. Kurên wî tevî sî hezar heywan hatine nêzî Qezwînê. Ew dema bavê xwe dîtine ji tariya şevê îstifade kirine û kehêlên xwe ber bi Loristanê ve ajotine. Şah Rustem bi hatina birayê xwe ya Loristanê dev ji desthilatdariyê berdaye û çûye Qezwînê û bi awayekî perîşanî li wir wefat kiriye. Mihemmedî li seranserê axa Loristanê bûye hakimê serbixwe. Ew siyasetek gelek baş a aqilane hem li hemberî Sefewiyan hem jî li hemberî Mûradê III. ê Osmanî meşandiye. Lê di navbera wî û mîrêmîran û fermandarên Osmanî yên Bexdayê dubendî derketiye ku rêvebirên Bexdayê ji bo girtina wî fermana padîşah bi dest xistine. Mihemmedî firset nedaye ku wî bigirin û dema ji bo Mîrza Hemze qîza wî xwestine ew keça xwe kiriye bûka Şahê Îranê û carek din dostî bi Qizilbaşan re daniye, heta mirina xwe bi serbilindî jiyaye (Şerefname, r.101-104). Cegerxwîn wî bi cengawerî û mêrxasiya wî aniye zimên û ji bo girtina axa Kurdistan a bindest, hêviya şer û cengê jê kiriye ku Cegerxwîn diyar kiriye riya xelasiyê di cengê re derbas dibe. Ew bi vî awayî xwestiyebi xwendekarên xwe re hestên hezkirina dîrokê, hezkirina welat, hestên yekîtî û azadiyê vejîne.

4/47 Were Şah Werdî şahê serbilind î
123 Xwedan text û sera û şehr û gund î

4/48 Belê nav û nîşan û tac û ala
124 Ji gerdûş ta bi gerdûn çûne bala

Şahwêrdîyê (Şah Werdiyê) kurê Mihemmedî, piştî mirina bavê xwe li ser textê mîrektiya Loristanê rûniştiye. Dema Şah Ebbas, ji bo dostiya wan zêdetir bibe Şah Ebbas bi xwişka mezin a Şahwêrdî ya mezin ku berê jina Hemze Mîrza ya birayê wî bûye re zewiciye. Ew neviya Behram Mîrza jî li Şahwêrdî mehir kiriye. Di navbera Şahwêrdî û Uxur Begê Beyatî de li ser nahiya Berucerdê nîqaş derketine û di şer de Uxur Beg û piraniya mirovên bi nav û deng ên Beyatî hatine kuştin. Leşkerên Loriyan ketine nav mal û zarokên Beyatiyan û dest bi talanê kirine. Li ser vê Şah Ebbas bi leşkerên xwe hatiye ser Loristanê. Şahwêrdî bi xebera hatina Şah Ebbas tevî mal û xêzanê xwe çûye Çiyayê Kulahê. Şah Ebbas, Mehdî Qulî Sultan Şamlu daniye ser paytexta Xuremabadê û vegeriyaye Qezwînê. Şahwêrdî ji bo desthilatdariyê bigire bi destê xwe, hatiye ser Mehdî Qulî lê têk çûye. Ew mecbûr maye berê xwe bide Bexdayê. Wî xwe avêtiye Seraya Osmanî, ji wan re îta’eta xwe pêşkêş kiriye. Şah Ebbas ji bo vê peywendiya wî ya Osmaniyan asteng bike fermana şahitiya wî derxistiye ku di sala 1005ê k./1597ê z. de hê jî mîrê Loristanê bûye (Şerefname, r.105-106). Cegerxwîn di risteyên ji bo Şahwêrdî rêz kiriye de behsa îhtişam, dewlemendî û mezinahiya hikumdariya wî kiriye.

**Tablo 3.2.4.** Mîrên Lora Biçûk

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| | Şuca’eddînê kurê Xurşîd, Seyfeddîn Rustem, Şerefeddîn Ebûbekirê kurê Nureddîn Mihemmed, Izeddîn Kirşasefê kurê Nureddîn Mihemmed, Husameddîn Xelîl, Bedreddîn Mes’ûd, Taceddîn Şah, Cemaleddîn Xidir, Husameddîn Omer Beg, Semsameddîn Mehmûd kurê Nureddîn Mihemmed, Izzeddîn | Şuca’eddinkurêXorşîd,<br>Rustem,<br>Şeref,<br>Gerşasif,<br>HusameddînXelîl,<br>Mesûd,<br>Taceddîn, |

| | | |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Mihemmed, Dewlet Xatûn a Jina Izzeddîn Mihemmed, Izzeddîn Huseyinê Birayê Dewlet Xatûn, Şuca'eddîn Mehmûd, Melik Izzeddînê kurê Şuca'eddîn Mehmûd, Seydî Ehmed, Şah Huseyinê kurê Melik Izzeddîn, Şah Rustemê kurê Şah Huseyin, Uxurê kurê Şah Rustem, Cîhangîrê kurê Şah Rustem, Şah Rustemê kurê Cîhangîr, Mihemmedê kurê Cîhangîr, Şahwerdiyê kurê Mihemmed | Hesen,<br>Cemaleddîn Xidir,<br>Emer Beg,<br>Semsam Mehmûd,<br>Mihemmed<br>**Mîrên di Berdewamiya Menzûmeya Şahanê Erdelan de Hatine Dayin:**<br>Dewlet Xanim,<br>Hisên,<br>Şuca'eddîn,<br>Melek Ezdîn,<br>Ehmed,<br>Şah Hisên,<br>Şah Rustem,<br>Axur kurê Rustem,<br>Cîhangîr,<br>Şah Rustemê kurê Cîhangîr,<br>Mihemmed,<br>ŞahWerdî |
| Dem | Sedsalên XII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Manrûd,Loristan,Wilayeta Tirazkê,WilayetaBeyat, Xurremabad,Xuzîstan, Dehlîz | Loran |

### 3.2.5. Siltanên Misir û Şamê

Ev menzûmeya Cegerxwîn ku li ser siltanên Eyyûbiyan nivîsandiye ji şazdeh malikan pêk hatiye. Di *Şerefname*yê de ev mijar bi sernavê "Serpêhatiyên Siltanên Misir û Şamê" derbas dibe, Cegerxwîn sernavê "Padîşahanê Eyyûbî" li menzûmeya xwe kiriye. Li gor dîroknas dibêjin hîmê siltanên Misir û Şamê, Şadiyê kurê Merwan e. Ew bi eslê xwe ji Kurdên Rewandê ye. Di dema Siltan Mes'ûdê Selçûkî de ji bo parastina Kela Tikrîtê hatiye wezîfedarkirin. Piştî mirina Şadî, parastina keleyê ketiye destê kurê wî yê mezin Necmeddîn Eyyûb. Ji ber qewimîna bûyerekê tevî

birayê xwe Esededdîn Şêrgoh çûye Mûsilê, cem Imadeddîn Zengî. Li pey mirina Zengî, ew ketine bin xizmeta Nureddîn Mehmûd. Esededdîn Şêrgoh bûye wezîrê Misrê; lê li şêst û pênc roj şûnde miriye û Selaheddînê biraziyê wî li cihê wî rûniştiye (Şerefname, 107-108).

5/1 Selaheddîn were, rabe tu serdar
125 Li meydanê siwar e Misyu Rîşar

5/2 Selîbî û Misilman tev de bûn yek
126 Belê Kurdên te mane jar û bê çek

Selaheddîn Yûsifê kurê Necmeddîn Eyyûb, mirovekî gelek jîr, zana û serwext bûye, Dema li Misrê wezîfeya wezîrtiyê kiriye erkanê dewletê yê Xelîfe el-Adid û mirovên wî meşandiye û ji aliyê xelîfe ve nasnavê Melik Nasir girtiye. Piştî mirina Xelîfe Adid, Selaheddîn dest daniye ser xezîneya Îsmaîliyan û desthilatdarî girtiye destê xwe. Di navbera wî û Nureddîn Mehmûd de hin pirsgirêk derketibin jî ev yek bê şer çareser bûye. Di sala 569ê k./1174ê z. de bi mirina Nureddîn Mehmûd, Siltaniya Misrê ya serbixweji Selaheddîn re maye. Di demeke kurt de Şam girtiye û Quds û Xelîlûrehman ji destê Frengên Xrîstiyan xelas kirine. Gelek hereketên fethê kirine, kelehên asê ku rê pê nakeve girtine, nav û dengê wî li cîhanê belav bûye (Şerefname, r.108-118).

Cegerxwîn xizmeta Selaheddîn a ji bo Îslamê ya mezin ber bi çav kiriye. Li meydana şer cengawerî û serdariya wî ya bêhempa di riya Îslamê de ye. Lewma Cegerxwîn tîne zimên ku Misilman tev bûne yek, lê Kurd perîşan û bê çek mane. Di *Şerefname*yê de behsa girtina Qudsê ya ji Xaçperestan dike lê navê Misyu Rişar derbas nebûye. Qralê Ingilîzan Richard (Rişarê Dilşêr), ji ber Quds ketiye destê Misilmanan tevî Qralê Frenseyê Philippe Auguste û Qralê Elman Friedrich Barbarossa derketine seferê û di vê seferê de têk çûne ku ev sefer wek Sefera III. a Xaçî tê zanîn (1189-1192).

5/3 Were rabe Ezîzê Misrê Kurdan
127 Brîndar bûne îro em ji derdan

5/4 Were îro binêre em bin lingan

128 Xelas nabin ji ber destê Firengan

Ebû'l-Feth Osmanê kurê Selaheddîn Yûsif e, bi nasnav wek Melik Ezîz tê naskirin. Selaheddîn hê di saxiya xwe de kar û barên Misrê daye destê vî kurê xwe yê mezin. Ew mirovekî jîr, hişyar, nefstenik û bexşkar bûye. Melik Ezîz, bi apê xwe Melik Adil re îttifaqek çêkiriye û leşkerên xwe ajotine ser Şamê. Bi birayê xwe Melik Efdal re tevî apê xwe dest bi şer kiriye. Melik Efdal neçar maye û Şamji wan re hiştiye (592ê k./1196ê z.). Melik Ezîz, desthilata Dimeşqê daye destê apê xwe Melik Adil û vegeriyaye Misrê. Wî di sala 595ê k./1199ê z. de wefat kiriye (Şerefname, 108-119). Cegerxwîn, bûye rêberê vegotina derd û kulên Kurdan û rewşa wan a xirab diyar kiriye. Fireng do jî dijmin bûne îro jî dijmin in, Cegerxwîn bi nêrînek retrospektîf dixwaze bi xwendekarên xwe re hişmendiya dîrokê ava bike û bi vî awayî nasnameya neteweyî bide parastin. Di *Şerefname*yê de behsa şerê Melik Ezîz ê bi Firengan re nayê kirin. Têkiliyên wî zêdetir ji bo zexmkirina îqtidara xwe ye.

5/5 Elî Heyder, Melek Efdal tu rabe

129 Li tûzê me binêre çûn xerab e

5/6 Tu leşkerekî giran çêke ji Kurdan

130 Bi şûrkêşî li dijmin rake ferman

Melik Efdal[282] kurê Selaheddîn e. Di saxiya Selaheddîn de Efdal waliyê Şamê bûye. Piştî mirina bavê xwe ji aliyê îttifaqa birayê xwe Melîk Ezîz Osman û apê xwe Melik Adil ve ji Şamê hatiye derxistin û ew Kela Serhedê dane destê wî. Dema ku Melik Ezîz miriye, wî berê xwe daye Misrê û li wir demeke kurt siltaniya Misrê kiriye. Lê apê wî Melik Adil bi leşkerekî mezin hatiye ser Misrê û bi darê zorê Melik Efdal ji ser textê siltaniyê rakiriye. Melik Efdal, mirovekî gelek bi fezîlet û bi edeb bûye, gelek parêzgeriya zana û zanistiyê kiriye. İbnu'l-Esîrê wezîrê wî, serokê kesên

[282] Di wergera İbrahim Sunkur (r.129) de navê wî wek Melik Efzal derbas bûye.

xwedî fezîlet û pêşengê zanayên dewra xwe bûye. Melik Efdal, di sala 622ê k./1226ê z. de koça dawiyê kiriye (Şerefname, r.119).

Cegerxwîn bi navê Eli Heyder dest bi malika xwe kiriye; lê di *Şerefname*yê de agahiyên di derheqê Melik Efdal de bi vî nav/nasnavî derbas nebûye. Wek ku tê zanîn "Heyder" leqeba Hz. Elî ye û ji ber di qehremanî û cengaweriya şer de jê re ev leqeb hatiye dayin. Wateya vê peyva "Heyder"a lugatî şêr e, bi taybetî şêrê di nav şêran de ango wek qralên di nav mirovan de disekine ye. Melik Efdal ji bo rewşa xwe ji xelîfe re bide fehmkirin çend malik ji Xelîfe Nasir Dînullah re şandiye ku di van malikan de rewşa xwe ya îqtidarê şibandiye rewşa Hz. Elî: "Ez benî! Ebûbekir û hevalê wî Osman/ Mafê 'Êlî jê stendin bi zora şûran/Lê 'Êlî, ji aliyê bavê xwe ve hikumdar hatibû tayinkirin…" Cegerxîn jî ji bo diyarkirina vê rewşa îqtidarê ku desthilatdariya Efdal a bi darê zorê ji destê wî hatiye girtin bi leqeba "Elî Heyder" dest bi malikê kiriye.

5/7 Melek Adil tu rûne Misr û Şamê
131 Bibarîne tu edla xwe li amê

5/8 Erê zanim tu şahê serfiraz î
132 Cîhan bigre bi şûrê tûj û tazî

Melik Adil kurê Necmeddîn Eyyûb e. Di dema hikumdariya Siltan Selaheddîn de rêvebiriya eyaletên Ekka û Kerekê meşandiye. Piştî mirina biraziyê xwe Melik Ezîz dest daniye ser kar û barên Misir û Şamê. Kurê Melik Ezîz, Eliyê bi leqeba Mensûr şandiye Ruhayê. Kar û barên Misir, Şam, Cezîre û Exlatê jî di nav her çar kurên xwe de parvekirine. Di sala 615ê k./1219ê z. de Melik Adil wefat kiriye. Li pey xwe panzdeh kur hiştine ku pênc ji wan li ser textê hikumdariyê rûniştine (Şerefname, r.121-122). Ji ber di serdema xwe de Melik Adil, Misr û Şam xistiye bin destên xwe Cegerxwîn jî wî bi vê wesfê daye nasîn, behsa fatîhiya wî kiriye.

5/9 Melik Eşref tu rabe ey cîhangîr
133 Egîd û pehlewan û fihris û jîr

5/10 Yemen, Misr û Hicaz û Şam û Exla
134 Binêre ka çewan bûne hezar qat

Melik Eşref Mûsayê kurê Melik Adil e. Di saxiya bavê xwe de rêvebiriya bajarê Ruhayê kiriye. Piştre Eyaleta Herranê û Exlat jî ketiye bin desthilatdariya wî. Ew ji bo îşgalkirina Dîmeşqê bi birayê xwe re bûye yek û Dîmeşqê ji biraziyê xwe Nasir Dawudê kurê Mu'ezzem Şerefeddîn Îsa bê şer girtiye. Nasir Dawud, li hemberî apên xwe ranebûye û bajar teslîmî wan kiriye. Piştre Melik Kamil vegeriyaye Misrê û Melik Eşref li Dîmeşqê li ser textê hikumdariyê bi dadmendî rûniştiye. Ji xeynî textê Şamê, Ruha û Herran, Reqqa û Rasil'eyn jî ketiye bin destên wî. Di sala 635ê k./1239ê z. de wefat kiriye (Şerefname, r.122-123). Cegerxwîn bi serwerî û hikumdariya wî ya li cografyayekî berfireh daye û xwe bi vê yekê serbilind kiriye. Herçiqas desthilatdariya wî negihiştiye Misir û Hicazê jî Cegerxwîn ji bo karzanî û bihêzbûna wî bîne zimên di risteya xwe de Yêmen, Misr, Hîcaz, Şam û Exla rêz kiriye. Lê herçiqas Melik Eşref li van cihan rêvebirî nekiribe jî hikumdariya Eyyûbiyan li Misrê dest pê kiriye û gihîştiye Hîcaz û Yemen ê.

5/11 Melek Kamil tu rabe ey şehinşah
135 Cihan bigre bi carek ey xwedan cah

5/12 Bi destê xwe tu bigre şûrê Şêrgoh
136 Ji dijmin zû tu bigre dozê mey doh

Melik Kamil Mihemmedê kurê Melik Adil e. Ew kesekî qedirbilind, serbilind û bi nav û deng bûye. Piştî mirina bavê xwe Melik Kamil di meşandina kar û baran de bi serê xwe maye, di demek gelek kurt de desthilata xwe gîhandiye Hîcaz, Yêmen û Şamê, di mizgeftên wan welatan de li ser navê wî xutbe hatiye xwendin. Ew di sala 635ê k./1239ê z. de di temenê xwe yê çil salî de miriye (Şerefname, r.123-124). Cegerxwîn xwestiye her tim mîrên Kurd li hemberî dijmin di nav têkoşînek de bibîne. Lê dema ku em li binemala Eyyûbiyan binêrin li pey serdema Selaheddîn herçiqas şerên li hemberî Frengan bê kirin jî ji şerê derve yên bi dijminan re zêdetir şerê îqtidarê yê di nav melikên vê xanedanê de tê dîtin. Jixwe piştî serdema Melik

Kamil di *Şerefnameyê* de bi awayekî girîft li ser mirina siltanên Misr, Şam û Yêmenê hatiye sekinandin, piştre Şerefxan, siltanên din ên vê xanedanê û dawîlêhatina hikumdariya wan di nav şerê navxweyî de daye. Cegerxwîn jî ji ber şerê îqtidarê yê di navbera melikan û bûyerên tevlîhev behsa gelek melikên vê xanedanê ên bûne desthilatdar nekiriye. Ew tenê wek siltanên dawî Melik Adilê kurê Melik Kamil û Melik Muxîş Omerê (Emer Muxîsuddîn) kurê Melik Adil bi bîr aniye.

5/13 Melek Adil dizanim xweş ciwan î
137 Egîd û mêr û şêr û pehlewan î

5/14 Tu fermo rabe ser xwe ey serifraz
138 Li van Kurdan binêre ey tu dilxwaz

Melik Adilê kurê Melik Kamil e, li gor Şerefxan ji Dîroka Yafi'î neqil kiriye piştî mirina Melik Kamil Melik Adilê kurê wî li Misrê bûye cîgirê wî û Melik Cewadê biraziyê Melik Kamil jî li Dimeşqê bûye sipartedarê Melik Adil. Lê ji ber ku Melik Adil bi temen biçûk bûye mezinên Misrê kar û barên hikumdariyê dane destê Melik Salih Eyyûbê apê wî û Melik Adil xistine zindanê. Melik Nasir ê waliyê Kerekê, êrîşî Melik Salih kiriye û ew girtine di Kela Kerekê de xistine zindanê. Melik Adil ji tunebûna birayê xwe îstifade kiriye û li Misrê bûye siltanê serbixwe. Ji bo teslîmkirina Melik Salih sed dînar teklîfî Melik Kamil kiriye. Lê Melik Kamil eksê wî Melik Salih ji zindanê derxistiye û piştgirî dayê ku desthilatdariya Misrê bigire destê xwe. Li ser agahiya hatina Melik Salih fermandarên meyldariya wan ji selteneta Melik Salih re hebûne, Melik Adil girtine û carek din xistine zindanê. Melik Salih hatiye ser desthilatdariya welat. Melik Adil di zindanê de miriye û kurekî bi navê Melik Muxîş Omer li pey wî maye (Şerefname, r.126-127). Cegerxwîn bi bangkirina Melik Adil de pesnên mêr û mêrxasiya wî daye û xwestiye carek din rewşa Kurdan a xirab bide ber çavan û bîne zimên.

5/15 Emer rabe Muxîsuddîn tu kanî?
139 Li ser textê te mane Turkumanî

5/16 Xulamên te, li pey te bûne paşa
140 Çilo em bûne rengê gornebaşa?

Melik Muxîş Omerê kurê Melik Adilê kurê Melik Kamil e. Dema Melik Adilê bavê wî ji ber şerê îqtidarê yê li hemberî apê wî Melik Salih ketiye zîndanê û di wir de miriye, Melik Muxîş jî di zîndanê de bûye. Di sala 649ê k./1252yê z. de Tawaşî yê waliyê Kerekê yê Melik Nasir serî hildaye û Melîk Muxîş Omer ji zîndanê derxistiye û kiriye hikumdarê Kerekê. Di sala 622yê k./1226ê z.[283] de leşkeran ji Misrê êrîş anine ser Melik Muxîş û dora wî pêçane. Ew mecbûr maye û teslîm bûye. Melik Muxîş ji hikumdarê Misrê re şandine ku ew li wir bi dizî hatiye kuştin.[284] Di sala 652yê k./1255ê z. de mezin û fermandarên Misrê Izzeddîn Turkmenî yê yek ji koleyên Melik Salih Eyyûbî kirine Siltanê Misrê. Ji wê rojê şûn de seltenata Misrê ketiye destê Memlûkiyan û nifûza binemala Eyyûbiyan nemaye (Şerefname, r.126-129). Cegerxwîn ev bûyer bi zimanekî xweş, bi hestên ji dil aniye zimên û nerazîbûna xwe ya ji vê rewşê destnîşan kiriye ku ji holêrakirina Melik Muxîş (Emer Muxîsuddîn) Turkmen li ser textê wan rûniştine, ango desthilatdarî ji destê Kurdan derketiye.

**Tablo 3.2.5.** Siltanên Misir û Şamê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Şadiyê kurê Merwan, Necmeddîn Eyyûb, Esededdîn Şêrgoh, Selaheddîn Yûsifê kurê Necmeddîn Eyyûb, Ebû'l-Feth Osmanê kurê Selaheddînê Yûsif, Melik Efdalê kurê Selaheddîn, Melik Adilê kurê Necmeddîn Eyyûb, Melik Eşrefê kurê Melik Adil, Melik Kamil Mihemmedê kurê Melik Adil, Melik Mes'ûd Yûsifê kurê Melik Kamil, Ebû Mensûr Eliyê kurê | Selaheddîn,<br>Ezîzê Misrê,<br>Melek Efdal,<br>Melek 'Adil,<br>Melik Eşref,<br>MelekKamil,<br>Emer Muxîsuddîn |

283 Ev dîrok di wergerên İbrahim Sunkur (r.140) û Abdullah Yegin (r.127) de derbas bûye. Li gor wergera Ziya Avci (r.129) di sala 662yê k./1265ê z. de ji Misrê leşker şandine ser Melik Muxîş Omer.

284 Li gor wergera İbrahim Sunkur (r.140), Melik Muxîş di ber xwe daye lê ji ber dorpêçkirina leşkeran demek dirêj girtiye ew ji bo piştgirî bigire çûye cem siltanê Misrê û ji sedemekî nayê zanîn ji ortê winda bûye.

| | | |
|---|---|---|
| | Ezîz, Melik Zahirê kurê Siltan Selaheddîn Yûsif, Melik Ezîzê kurê Melik Zahir, Melik Muhsînê kurê Selaheddîn,Melîk Giyaseddîn Mihemmedê kurê Zahir, Melik Salih Îsmaîlê kurê Melik Adil, Muzaffereddîn Melik Cewad Yûsif, Melik Mu'ezzem, Melik Nasir Dawudê kurê Mu'ezzemê kurê Adil, Melik Selaheddînê kurê Melik Zahir, Melik Muxiş Omerê kurê Melik Adil | |
| Dem | Sedsalên XII-XIII. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Misir, Şam, Yêmen, Hîcaz, Exlat (Qahîre, Esqelan, Hema, Ekka, Nablûs, Heyfa, Qeyseriyye, Cebele, Safed, Kerek, Kewkeb, Dîmeşq, Ruha, Cezîre, Tarsûs, Herran, Reqqa, Rasil'eyn, Mekke, Îskenderiye, Xûre, Be'elbak, Dimyat Humus). | Yemen, Misir, Hicaz, Şam, Exla(t) |

### 3.2.6.Mîrên Erdelan

Li gor rîwayetan ew ji nesla mîrên Diyarbekrê yên neviyên Ehmedê kurê Merwan in. Baba Erdelan ji vê binemalê demekî di nav eşîretên Goran de maye, di dawiya dewra Dewleta Cengîz de dest daniye ser wilayeta Şehrezorê. Piştre wî navê xwe guherandiye û kiriye Qubadê kurê Feyruz ê Sasanî. Dema miriye kurê wî hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.133). Menzûmeya Cegerxwîn a bi sernavê "Şahanê Erdelan", ji sî û çar malikan pêk hatiye. Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Fermanrewayên Erdelan de ye" cih girtiye.

6/1 Were Baba tu rabe Erdelan bek
141 Binêre Şehrezorê bûye gevzek

6/2 Li alîkî dixun jê lawê Qehtan
142 Li alîkî dixun jê Tirk û Eyran

Baba Erdelan damezrênerê vê mîrektiyê ye ku ev mîrektî bi girtina wilayeta Şehrezor a îro di nav Kurdistana Başûr de cih digire de hatiye avakirin. Cegerxwîn, ji ber Baba Erdelan damezrînerê vê mîrektiyê ye bi navê Baba Erdelan dest bi vê menzûmeya xwe kiriye.

6/3 Kulûl rabe binêre Şehrezorê
143 Wekî sersotê agir tim dikûre

6/4 Biziştin tev ji ber êşan û derdan
144 Ji Loran ta bi Zazan, Bext û Gerdan

Kelulê (Kulûlê) kurê Baba Erdelan piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Lê desthilatdariya wî zêde dewam nekiriye û Kelul wefat kiriye. Piştî wî bi dorê ev mîr hatine ser desthilatdariyê:
**(1)**Xidirê kurê Kelul, **(2)**Ilyasê kurê Xidir, **(3)** Xidirê kurê Ilyas,
**(4)**Hesenê kurê Xidir, **(5)**Babloyê kurê Hesen, **(6)**Munzirê kurê Bablo.

Şerefxan ji ber di derheqê van mîran de agahiyên zelal li ber destên wî tune bûne tenê navên wan rêz kiriye[285] û di derheqê mîrên li pişt wan hatine agahiyên baweriya xwe pê aniye nivîsandiye (Şerefname, r.134). Cegerxwîn herçiqas di derheqê wan hikumdaran de agahî tune be jî li gor rêza di *Şerefname*yê de hatiye bikaranîn wî malikên xwe saz kirine. Cegerxwîn bi heman nêrîna mîrên din bangî van mîran jî kiriye, pesnên mêr û mêrxasiya wan daye û xwestiye ku werin wêranbûna welat bibînin. Malikên li ser van mîran ev in:

6/5 **(1)Xidir** rabe li Kurmanca binêre
145 Li deng û ah û zaran guh bidêre

[285] Ziya Avci di derheqê sedema van mîran de hin agahiyên bi dest xistine bi jêrenotan daye. Di wergerên İbrahim Sunkur û Abdullah Yegin de ji bo vê demê tu agahî nehatiye dayin.

6/6 Hemî pêkve dikin qîrîn û hawar
146 Ji ber destê neyarên pîs û dijwar

6/7 (**2)**Were padîşahê min ey tu **Ilyas**
147 Egîd û pehlewan û mêr û mêrxas

6/8 Ji bo te em hemî kuram û pismam
148 Belê nîn e ji bo me çoyê Behram

6/9 **(3)Xidir** rabe, were ey mîrê Kurdan
149 Temaşeke li rengê Kurdê Baban

6/10 Nemane tûz û reng û çehr û gwîne
150 Dilên Kurdan bi carek bûne xwîne

6/11 **(4)Hesen** rabe temaşeke li deştê
151 Binêr dengê tematêkan çi xweş tê

6/12 Binêr xweş li zozan û diyara
152 Li wan tê deng û halanê neyara

6/13 **(5)**Were **Bablo** binêre xan û mana
153 Hemî îro ketin destê nezana

6/14 Nizanin ev çi bajar û kelat in
154 Dibên gawir berê jê rahilatin

6/15 (**6)**Were **Munzir** binêre ev çi beng e
155 Li me Kurdan nemaye tûz û reng e

6/16 Kelaşên me li van çolan mirar in
156 Pepûk û bûm û kunda tev de xwarin

Cegerxwîn bi awayekî anakronîk ji dema xwe, bangî dema borî ya van mîran kiriye ku werin wêranbûna welatên xwe bibînin. Cegerxwîn, dema bangî Hesenê kurê Xidir kiriye behsa dengê çekên otomatîk ên roja xwe daye ku bi vî awayî şer û qirêna demê destnîşan kiriye.

6/17 Were Mamûn binêre van zinaran
157 Binê dar û ber û şax û diyaran

6/18 Ji derdên me hemî jar û perîşan
158 Ziwa bûn çav û avên deşt û zozan

Memûnê kurê Munzir (Mamûn), piştî mirina bavê xwe bûye hakimê welatê xwe û bi awayekî serbixwe welatê xwe bi rê ve biriye. Sê kurên wî yên bi navên Beyke Beg, Surxab Beg û Mihemmed Beg li pey xwe hiştine (Şerefname, r.134). Cegerxwîn ji bo balê bikişîne ser rewşa Kurdan; dar û berên, deşt û zozanên welat bi riya hunera teşxîsê hestyar kirine, ew ji derdên Kurdan tev xemgîn û perîşan in.

6/19 Were Beyge Begê comerd û zana
159 Temaşeke li çehrê me xizana

6/20 Ji Zaza ta bi Lor û Şehrezorê
160 Ji destê me neyaran bir bi zorê

Beyke Begê kurê Memûn Beg, piştî mirina bavê xwe li ser textê desthilatdariyê rûniştiye. Memûn Beg hê di saxiya xwe de welatê xwe di navbera kurên xwe de parve kiriye. Beyke Beg çil û du salan li ser nahiyên parawî ketine desthilatdarî kiriye, du kurên bi navê Îsmaîl û Memûn li pey xwe hiştine (Şerefname, r.134). Cegerxwîn, wek ku tê dîtin Beyke Beg bi meziyetên baş diyar kiriye, lê di

*Şerefname*yê de di derheqê wî de zêde agahî tune ne. Ji xeynî vê Cegerxwîn bi van malikan ji dest derketina axa welat carek din daye berçavan.

6/21 Were Mamûn kurê Beyge binêre
161 Welatê me bi carek zîv û zêr e

6/22 Welatê me xweş e bûka cîhan e
162 Belê çibkim nehin jê re xwedan e

Memûn Begê kurê Beyke (Beyge) Beg piştî mirina bavê xwe bi awayekî serfirazî li cihê bavê xwe rûniştiye. Ji ber ku Qanûnî Siltan Silêmanê Osmanî xwestiye bi destê begê Imadiyeyê û bi destê hinek emîrên Kurdistanê yên din ve Şehrezorê îstila bike, di kela Delamê de derûdora Memûn hatiye girtin. Wan began, bi riya şer nikarîbûne biserkevin lê bi riya aşîtiyê Memûn Beg ji kelê derxistine û şandine Seraya Siltan Silêman. Surxabê apê wî ji vê firsetê îstifade kiriye û para biraziyê xwe jî xistiye nav sînorên eyaleta xwe, çûye cem Şah Tehmasb û îta'eta xwe jê re îlan kiriye. Ji aliyê din ve dema ku Siltan Silêman dîtiye ku Memûn Beg bêsûc e rêvebirina kar û barên Senceqa Hîlleyê sipartiye wî (Şerefname, r.135). Ji ber cihên di bin desthilatdariya Memûn Beg ji destê wî hatiye derxistin Cegerxwîn, xemgîniya xwe bi risteya "Belê çibkim nehin jê re xwedan e"aniye zimên ku welat bê xwedî maye. Cegerxwîn qîmeta welatê xwe bi zîv û zêr rê daye û xweşikiya welat şibandiye bûka cîhan ê.

6/23 Were Surxab tu rabe rengê Merwan
163 Tu leşkerekî giran çêke ji Kurdan

6/24 Cîhan pêk ve bike wêran seraser
164 Tu deyne ser serê xwe tac û gewher

Surxab Beg, piştî girtina biraziyê xwe Memûn Beg kar û barên hikumeta Şehrezor û Dalamê bi rê ve biriye. Beşa Mihemmed Beg ê birayê xwe yê din jî kiriye ser wilayeta xwe. Dema Elqas Begê birayê Şah Tehmasb bi daxwaza textê Îranê serî

hildaye û xwe avêtiye cem Siltan Silêman Xan. Lê ew ji tevgera Siltan aciz bûye, bi SurxabBeg re peywendî daniye. Ew xwestiye ku Surxab rica ji birayê wî bike ku Şah Tehmasb lê bibore. Surxab ev daxwaza wî gîhandiye Şah Tehmasb. Şah Tehmasb, birayê xwe Elqas girtiye û avêtiye zindanê. Li hemberî vê qenciya wî Şah gelekî jê hez kiriye. Şah, biryar daye ku her sal ji xezîneyê hezar tumen bidine wî. Mîrektiya Surxab şêst û heft sal ajotiye (Şerefname, r.135-136). Cegerxwîn bi hesreta wê dema dirêj ku desthiltdarî di destê mîrên Kurd de bûye bangî Surxab kiriye, çimkî Surxab jî demeke dirêj (şêst û heft sal) rêvebiriya mîrektiya xwe kiriye. Cegerxwîn bi daxwaza desthilatdariya welat dîsa bikeve destê Kurdan hewl daye û wek çareserî jî şerê çekdarî nîşan daye.

6/25 Were rabe Muhammed lawê Mamûn
165 Direfş û tac û textê me hemî çûn

6/26 Ne Dara ma ne Şehrezor û eywan
166 Hemî îro neyaran kirne wêran

Mihemmedê kurê Memûnê kurê Beyke beg e. Piştî mirina bavê xwe bûye desthilatdarê kar û barên herêmên. Lê piştre ji bo desthilata hemû eyaleta ku jê re mabû bigire destê xwe, çûye Seraya Siltan Silêman Xan û jê alîkarî xwestiye. Bi fermana Siltan Silêman, mîrêmîranê Bexdayê Kela Dalamê kiriye bin eblûqayê ku ev ebluqe du salan domandiye. Di vê navberê de Mihemmed Beg bi gulleyeke tivingê hatiye kuştin. Di sala 969ê k./1562ê z. de Mihemmed Paşayê Baltacî ji bo bidestxistina herêmê dest bi dagirkirina hemû bajar û keleyên vê wilayetê kiriye. Şehrezorbi vî awayî ketiye bin desthilatdariya Osmanî (Şerefname, r.136). Cegerxwîn windakirina Şehrezorê rasterast diyar nekiribe jî bi awayekî diyalektîk ji vê bi rê ketiye û heyfa xwe ji destderketin û wêranbûna welat aniye.

6/27 Were Sultan Elî, rabe ji gorê
167 Temaşeke welatê Şehrezorê

6/28 Bera cîkî binefş û naz û sorgul
168 Belê îro bi carek bûye kavil

Siltan Elî Begê kurê Surxab Beg e. Piştî mirina bavê xwe kar û barên rêvebirina wilayeta Erdelanê ketiye destê wî. Ew sê salan rêvebirî kiriye û du zarokên biçûk li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.136). Cegerxwîn li ser cengawerî yan jî hikumdariya Siltan Elî nesekiniye, tenê bangî gora wî kiriye û kerba dilê xwe jê re vegotiye.

6/29 Bisat Beg rabe ser xwe ey şahê pak
169 Siwar be tu li hespê çak û çalak

6/30 Tu deyne ser serê xwe tacê zêrîn
170 Tu bistîne welatê jêr û jorîn

Besat (Bisat) Begê kurê Surxab Beg e, piştî mirina birayê xwe Siltan Elî hatiye ser rêvebiriya Erdelanê. Lê kurên Siltan Elî ji bo desthilatdariya bavê xwe bigirin xwe avêtine bal Şah Îsmaîlê duyem ê Sefewî. Piştî mirina Şah Îsmaîl, Tîmûr Xanê kurê Siltan Elî li hemberî apê xwe rabûye û dest bi talanê kiriye. Wê rewşê heta mirina Besat Beg dewam kiriye (Şerefname, r.137). Serdema Besat Beg bi gelemperî bi şerê îqtidarê derbas bûye. Lê Cegerxwîn bi heman şêwaza di malikên din de jî tê dîtin, heta balê bikişîne ser şer û lihevnekirina navxweyî, bal kişandiye ser ji destderketina axa welat.

6/31 Were, rabe tu Teymûr Xanê bengî
171 Egîd û mêr û şêr û xweş piling î

6/32 Belê zanim tu şah î ey begê baş
172 Li alîkî te Tirk û yek Qizilbaş

Tîmûr Begê kurê Siltan Elî ye, piştî mirina apê xwe bûye rêvebirê hikumeta Erdelanê. Di sala 986ê k./1581ê z. de sedaqeta xwe ji Seraya Siltan Murad Xan re

pêşkêş kiriye. Ew ketiye nav mîrêmîranê mezin ê Dewleta Osmanî û leqeba "Tîmûr Xan Paşa" girtiye. Ji ber xeyala hikumdartî û serbixwetiyê carinan bûye meyildarê Osmaniyan carinan jî bûye tagirê Qizilbaşan. Tîmûr Xan, dema êrîşî ser welatê kurê Omer Begê Kelhûrî kiriye, ew girtine lê dawiyê serbest maye. Tîmûr Xan piştî azad bûye di sala 998ê k./1590ê z.de êrîş biriye ser eyaleta Zêrrînkemerê û herêmên bi wê ve girêdayî. Vê carê hatiye kuştin û birayê wî Helo Xan li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.138). Tîmûr Xan di rêvebiriya xwe de siyasetek aqilane neajotiye; lê Cegerxwîn wî bi wesfên bêtirsiyê yên wek egîd, mêr, şêr û xweş pilîng ber bi çav kiriye. Di vir de peywendiyên wî yên bi Tirk û Qizilbaşan re jî ji bîr nekiriye. Herçiqas Şerefxan polîtikayên wî yên li hemberî Tirk û Qizilbaşan rexne kiriye jî Cegerxwîn têkoşîna Tîmûr a hebûnê ya li hemberî Tirk û Qizilbaşan teqdîr kiriye.

6/33 Hilo Xan rabe ser xwe rûnê ser text
173 Belê îro ne text maye ne jî bext

6/34 Erê textê te kefte destê Qehtan
174 Belê bextê me kefte şûrê Tirkan

Helo (Hilo) Xanê kurê Siltan Eliyê kurê Surxab Beg e. Piştî kuştina birayê xwe Tîmûr Xan hatiye ser rêvebiriya Erdelanê. Îta'eta xwe ji Seraya Siltan Murad Xan re diyar kiriye. Wî dilê rêvebirên Qizilbaş jî nehîştine bi wan re riya lihevkirinê hilbijartiye û siyasetek aqilane meşandiye. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin jî ev mîr bi serbilindî li ser desthilatdariya Erdelanê bûye (Şerefname, r.138). Cegerxwîn carekê din ji destderketina axa welat bi gotina "ne text maye nejî bext" diyar kiriye. Îta'eta Helo Xan a ji Seraya Siltan Murad re jî bi gotina "bextê me ketiye şûrê Tirkan" rave kiriye ku Cegerxwîn hem ji bo demên kevn hem jî ji bo roja xwe ji vê rewşê aciziya xwe diyar kiriye.

**Tablo 3.2.6.** Mîrên Erdelan

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Baba Erdelan, Kelulê kurê Baba Erdelan, Xidirê kurê Kelul, Ilyasê kurê Xidir, Xidirê kurê Ilyas,Hesenê kurê Xidir, Babloyê kurê Hesen, Munzirê kurê Bablo, Memûnê kurê Munzir, Beyke Begê kurê Memûn Beg, Memûn Begê kurê Beyke Beg, Surxabê kurê Memûn Beg, Mihemmed Begê kurê Memûn Beg, Siltan Elî Begê kurê Surxab Beg, Besat Begê kurê Surxab Beg, Tîmûr Xanê kurê Siltan Elî, Helo Xanê kurê Siltan Eliyê kurê Surxab Beg | Baba Erdelan<br>Kulûl<br>Xidir<br>Ilyas<br>Xidir<br>Hesen<br>Bablo<br>Munzir<br>Mamûn<br>Beyge<br>Mamûn kurê Beyge<br>Surxab<br>Muhammed lawê Mamûn<br>Siltan Elî<br>Bîsat<br>Teymûr<br>Hilo Xan |
| Dem | Sedsalên XIII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Şehrezor, Dalam, Tagsu, Şemîran, Hawar, Sîman, Rawdan, Gul’enber, Lewî, Meşîle, Mehrewan, Tenûre, Kelos, Neşkaş, Siruçik, Qeredax, Şehrbazar, Alan, Dumehran. | Şehrezor, Dara |

### 3.2.7.Mîrên Hekkariyê

Cegerxwîn di menzûmeya xwe ya li ser Begên Hekkariyê de bi şazdeh malikan heşt mîrên Hekkariyê yad kirine. Di *Şerefname*yê de bi sernavê “Di Derheqê

Fermanrewayên Hekkariyê de ne ku bi Navê Şenbû jî Hatine Naskirin”[286]derbas bûye. Cegerxwîn ji bo vê menzûmeyê sernavê “Beganê Hekkarê” bi kar aniye.

7/1 Were rabe tu Izdîn şêrê xwînxwar
175 Erê rûnê li textepayê Hekkar

7/2 Eman îro li me pir teng e meydan
176 Ji bin destê me derket Wan û Westan

Emîr Tîmûrê Kurganî di sala 787ê k./1386ê z. de berê xwe daye Kela Wanê û Westanê. Wê çaxê Izzeddînşêr (Izdîn şêr) mîrê Hekkariyê bûye, wî biryara berxwedanê daye. Izzeddînşêr, piştî berxwedana du rojan mecbûr maye ji keleyê derkeve û serê xwe li ber Emir Tîmûr bitewîne. Lê Nasireddînê xizmê Izzeddînşêr, piştî çûyina wî deriyê keleyê asê kiriye û bîst û heft rojan bi dijmin re şer kiriye. Piştî dagirkirina keleyê Emir Tîmûr fermana wêrankirina keleyê daye. Ji ber kele gelek zexm bûye, nikaribûne keleyê bi temamî hilweşînin. Emîr Tîmûr destûr daye ku Izzeddînşêr were dîwana wî. Li gor esasên berê û bi riya temlîkî welatê Izzeddînşêr ê ji bav û bapîran jê re maye dîsa daye wî (Şerefname, r.139-141). Ji ber Izzeddînşêr desthilatdarê Wan û Westanê ye ji bo ji destderketina van cihan, Cegerxwîn berê xwe daye Izzeddînşêr ku di *Şerefname*yê de wek mîrê yekem ê vê mîrektiyê derbas bûye. Cegerxwîn di derheqê vê mîrektiyê de bi şazdeh malikan navê hikumdarên vê mîrektiyê rêz kiriye.

7/3 Esed rabe xwedanê çengê zêrîn
177 Welatê te li ser te jar û dilşîn

7/4 Binêre tu l’kelatê Wan û Westan
178 Di destê dijminan de mane wêran

[286]Ji ber damezrandina Dewleta Hekkariyê ya cara duyem ji aliyê Esededdînê kurê Kulabî ve roja şenbeyê çêbûye mîrên vê binemalê bi navê “şenbû” hatine naskirin.

Esededdînê kurê Kulabiyê kurê Imadeddîn e. Wî ji ber hin bûyeran ji Hekkariyê koçî Misrê kiriye û çûye cem Siltanên Çerkezan. Bi cengewariya xwe di erkê leşkerî de nav daye. Dibêjin ji ber çengekî xwe di şer de winda kiriye siltanê wê demê çengekî zêr jê re çêkiriye û navê wî kiriye Esededdînê Çengzêr. Bûyera wî ji welatê wî derxistiye ev e ku; Hesen Begê Aqqoyunî bi daxwaza Kurdistanê têxe bin destê xwe, ji fermandarên Tirkmenên Aqqoyunî Sofî Xelîl û Ereb Şah Beg, şandiye ser wilayeta Hekkariyê. Wan di netîceyê de Hekkarî ji destê Esededdîn girtine û kar û barên ewlekariyê xistine bin destê Eşîreta Dinbiliyan. Dema hinek Asûriyên nahiya Dizê ji bo bazirganiyê çûne Şam û Misrê ji bo Esededdîn vegere welatê xwe pê re ketine nav peywendiyê. Eseddedîn li ser vê vegeriyaye Hekkariyê û bi piştgiriya Asûriyên Dizê welatê xwe ji destê dijmin xelas kiriye û cara duyem mîrektiya xwe damezrandiye. Esededdîn heta çûye rehmetê gelek salên dirêj desthilatdariya welat di destê xwe de girtiye (Şerefname, r.141-144). Cegerxwîn Esededdîn (Esed) bi leqeba wî ya "çengzêr" bi bîr aniye. Têkoşîna wî ya ji bo axa welatê xwe ji Cegerxwîn re bûye mînaka serxwebûnê. Çimkî îro axa welat ketiye destê dijmin û hatiye wêrankirin.

7/5 Were Izdîn tu şêr û pehlewan î
179 Li ser textê xwe rûne tu li Wan î

7/6 Temaşake li bostan û gulistan
180 Hemî zer bûne rengî jar û mestan

Melik Izzeddînşêrê kurê Esededdînê Çengzêr e. Piştî mirina bavê xwe li cihê wî rûniştiye. Kar û barên mîrektiyê bi awayekî baş meşandine û piştre wefat kiriye (Şerefname, r.44). Cegerxwîn dema bangî Melik Izzeddînşêr kiriye, xwestiye ku bostan û gulistanê ango heşinahiya welatê xwe binêre ku tev zer bûne. Cegerxwîn di vir de bi awayekî mecazî diyar kiriye ku ji ber ji destderketina welat bostan û gulistanan geşbûna xwe winda kirine.

7/7 Were Zahid tu rabe ey beg û mêr
181 Tu deyne ser serê xwe tacê tev zêr

7/8 Bi carek em dibazin qîr û hawar
182 Bi nalîn û bi zarîn ta bi êvar

Zahid Begê kurê Izzeddînşêr e, piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Zahid Beg nêzîkî şêst salan bi siyaseteke aqilane welatê xwe bi rê ve biriye. Şah Îsmaîlê Sefewî, gelek rûmet daye wî û peywendiyên di navbera wan de ewqas pêşve çûye ku Şah Îsmaîl jê re gotiye "mamo" . Di dawiya jiyana xwe de wî, welat di navbera herdu kurên xwe de parvekiriye (Şerefname, r.141-144). Cegerxwîn malikên ji bo Zahid Beg de ji ber tunebûna desthilatdariyê hawar û qîrîna gelê xwe aniye zimên.

7/9 Were rabe binêre ey Melik Beg
183 Beg û axa hemî bûn hacîlegleg

7/10 Li ser şax û çiyan pêk ve dibazin
184 Bi serbestî welatê xwe dixwazin

Melik Begê kurê Zahid Beg e, piştî mirina bavê xwe desthilatdariya Kela Bayê girtiye destê xwe. Ew, welat bi dadmendî bi rê ve biriye. Dema çûye rehma Xwedê heft kur li pey xwe hiştine. Kurê wî yê mezin Zeynel Beg li hemberî wî rabûye û xwestiye bavê xwe bikuje lê kurê wî Huseyîn Beg li hewara bavê xwe hatiye û bavê xwe rizgar kiriye. Zeynel Beg di nav birayên xwe de yê herî biaqil û jêhatî bûye û piştî apê wî Seyîd Mihemmed, hatiye kuştin bûye mîrê Hekkariyê (Şerefname, r.141-145). Cegerxwîn dadmendî û serkeftîbûna Melik Beg bi rêvebiriya beg û axayên roja xwe re berawird kiriye. Wî beg û rêvebirên Kurdan ên roja xwe ji ber bêqabiliyet û axaftina wan vala ditiye û ew bi îbareya hacîlegleg rexne kirine. Cegerxwîn hesreta welatê serbixwe û azad aniye zimên.

7/11 Were rabe Muhemed mîrê Wanê
185 Temaşake tu carek vê cîhanê

7/12 Neyarên me cîhan girtin bi carek
186 Ji bo me hîç nemaye tê de parek

Seyîd Mihemmed Begê kurê Zahid Beg e. Ew û biraziyê wî Zeynel Beg her tim li hemberî hev di nav şer de bûne. Seyîd Mihemmed li dijî biraziyê xwe bi Eşîreta Pinyanişî re bûye yek. Ew êrîşî ser Zeynel Beg kirine û wî ji Hekkariyê derxistine. Lê piştre navbera wî û Îskender Paşa yê Mîrêmîranê Wanê xera bûye. Îskender Paşa di netîceyê de ji bo kuştina Seyîd Mihemmed fermana Siltan bi dest xistiye. Îskender Paşa şandiye pey Seyîd Mihemmed ku bê Dîwana Wanê. Ji ber pê bawer nebûye, ew hin bahane rê daye û neçûye. Hevdîtina wan li derveyî bajêr çêbûye. Mihemmed Beg piştî vegeriyaye Westanê bawer kiriye ku pirsgirêk di navbera wan de nemaye. Carek din xeber ji Seyîd Mihemmed re şandine ku here Dîwana Wanê. Herçiqas wî nexwestiye here jî merivên xeber anîne wî bi zor birine Wanê. Wan li wir Îskender Paşa xistiye zindanê. Di vê tevlîheviyê de Yaqûb Begê kurê Seyîd Mihemmed, rêvebiriya mîrektiyê girtiye destê xwe. Lê di dawiyê de Îskender Paşa, Seyîd Mihemmed û kurê wî Yaqûb Beg daye kuştin û mîrektiya Hekkarî teslîmî Zeynel Beg kiriye (Şerefname, r.147-148). Cegerxwîn bi awayekî diyalektîk behsa neyaran kiriye ku axa welat dagir kirine. Seyîd Mihemmed (Muhamed) jî cî û warê xwe ji ber entrîkayên neyaran winda kiriye û hatiye kuştin. Cegerxwîn herçiqas eşkere nebêje jî ji ber desthilatdariya Kurdan ketiye destê Osmaniyan û Osmanî li ser mîrên Kurdan bûne xwedî biryar, aciz bûye. Wî xwestiye bê zanîn ku ji ber dagirkirina axa welat ji Kurdan re cî û war nemaye.

7/13 Were Zeynil tu rabe ey begê baş
187 Ji bona te bidin em pesn û şabaş

7/14 Belê ew çax û gavên te hemî çûn
188 Kelat û birc û eywan ker bi ker bûn

Seyîd Mihemmedê apê Zeynel (Zeynil) Beg, êrîşî ser wî kiriye û ew ji Hekkariyê derxistiye. Zeynel Beg ji neçarî çûye cem Siltan Huseyinê Imadiyyeyê. Siltan Huseyîn ji bo serlêdana Seraya Siltan Silêman Xan alîkariya wî kiriye. Rustem

Paşayê wezîrê Osmanî ji Zeynel Beg xwestiye ku ji bo baweriya siltan pê bê mal û xizanên xwe ji Îranê bîne welatê Osmanî. Zeynel Beg, bi vê mebestê ber bi Hekkariyê ve çûye lê di rê de Bedir Begê Boxtan li ber wî kêmin daniye. Ew di vê bûyerê de bi awayekî gelek giran birîndar bûye. Bi saya xatûna jina Bedir Beg tedawiya wî hatiye kirin û bi rê ketiye. Lê ji ber Rustem Paşa ji wezîrtiyê hatiye girtin, Zeynel Beg dev ji fikra çûyina Stenbolê berdaye. Ew berê xwe daye Seraya Şah Tehmasb. Lê ne li wir xatir dîtiye ne jî piştî vegera Rustem Paşa ya ser kar ji Rustem Paşa xatir dîtiye. Heta bi alîkariya Îskender Paşa hatiye Wanê û piştre bûye mîrê Hekkarî li Bosnayê cihek wek zeamet dane wî. Bi fermana padîşah Zeynel Beg hatiye ser desthilatdariya bav û bapîrên xwe.  Çil sal kar û barên vê mîrektiyê di destê wî de mane (Şerefname, r.148-150). Cegerxwîn di van malikan de behsa zîrektiya Zeynel Beg kiriye ku Zeynel Beg di nav birayên xwe de biaqil û bi qabiliyeta rêveberiyê li pêş bûye. Lê êdî ew serdema wî çûye û desthilatdarî ketiye destê neyaran.

7/15 Zekerriyya tu rabe ey begê qenc
189 Binêre em hemî bûne xwedan renc

7/16 Temaşake li me'dê Wan û Westan
190 Bi carek Çolemêrgê bûye wêran

Zekeriya Begê kurê Zeynel Beg, piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Ji ber hin agahiyên fitne û fesadiyê Seraya Osmanî desthilatî ji destê wî derxistine û dane Zahid Beg. Lê xelkê welat desthilatdariya Zahid Beg nexwestine. Di telîheviya derketiye de Zahid Beg û kure wî di şer de hatine kuştin. Dema ku waliyê eyaleta Wanê bi vê yekê hesiyaye desthilatdariya Hekkariyê xistiye destê Melik Begê kurê Zahid Beg. Ew ji bo vê rewşê ji siltan fermanek girtiye. Zekeriya Beg li ser vê, ji xeynî terkkirina eyaleta xwe û çûyina cem Seydî Xanê Mîrê Imadiyê pê ve riyek din nedîtiye. Ew bi alîkariya Sînan Paşayê Wezîrê Mezin ê Osmanî, eyaleta Hekkarî dane destê Zekeriya Beg. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin di sala 1005ê k./1596ê z. de Zekeriya Beg li Colemêrgê li ser desthilatdariya vê mîrektiyê bûye (Şerefname, r.150-151). Ji ber di *Şerefname*yê de

mîrê dawî yê vê binemalê Zekeriya Beg e, Cegerxwîn destnîşan kiriye ku piştî çûyina wî Wan, Westan, Colemêrg ji dest derketiye, ango Mîrektiya Hekkarî hatiye rûxandin.

**Tablo 3.2.7.** Mîrên Hekkariyê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Izzeddînşêr, Esededdînê kurê Kulabiyê kurê Imadeddîn, Melik Izzeddînşêrê kurê Esededdînê Çengzêr, Zahid Begê kurê Izzeddînşêr, Melik Begê kurê Zahid Beg, Seyîd Mihemmed Begê kurê Zahid Beg, Zeynel Begê kurê Melik Beg, Zekeriya Begê kurê Zeynel Beg | Izdîn Şêr<br>Esed<br>Izdîn Şêr<br>Zahid<br>Melik Beg<br>Muhemed<br>Zeynil<br>Zekerriyya |
| Dem | (Koka wan mîran digihîje serdema Xelîfetiya Ebbasiyan) Sedsalên ?-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Hekkarî, Wan, Westan,Kawaş, Colemêrg, Dizê(Gewer),Extemar, Elbak(Başkele) | Hekkar, Wan, Westan, Çolemêrg |

### 3.2.8.Mîrên Behdînan[287]( Imadiyyê)

Li gor rîwayetan koka mîrên Imadiyyê digihîje binemala Xelîfeyên Ebbasiyan. Lê hinek dîroknasên kevn neql kirine ku nesla wan digihîje yekî navê wî Ebbas ê giregirekî bi nav û deng. Navê temamê mîrên vê binemalê nayê zanîn. Mîrên ku navên wan hatiye zanîn Şerefxan, navên wan li pey hev nivîsandine (Şerefname, r.153-154). Cegerxwîn jî bi heman kronolojiyê li ser mîren Behdînan menzûmeya xwe ya bi sernavê “Beganê Behdînan”ji çardeh malikan pêk tê saz kiriye. Ev mîrektî

[287] Mîrên Imadiyyê li Şemîzdanê rêvebirê Kela Taronê bûne. Ji ber ew kesê ku pêşiyê mala xwe ji wir aniye Imadiyyê navê wî Behdînan (Bahadînan) bûye, mîrên Imadiyyê bi navê Behdînan hatine naskirin (r.153-Z.A.).

di *Şerefname*yê ye bi sernavê "Di Derheqê Fermanrewayên Imadiyyeyê de ne ku bi Navê Bahadînan bi Nav û Deng in" derbas bûye.

8/1 Emîr Zeyneddîn ji Behdînan tu rabe
191 Temaşeke, binêre tev xerab e

8/2 Erê zanim xwedan text û sera ye
192 Belê îro ji bo me kes nemaye

Emîr Zeyneddîn di dema Emîr Tîmûrê Kurganî û dewra Şahrux Siltanê kurê wî de mîrê Imadiyyê bûye. Wî bi serbilindî û şanazî mîrektiya xwe meşandiye (Şerefname, r.155). Emîr Zeyneddîn mîrê ewil ê Behdînan e ku Şerefxan di derheqê wî de xwedî agahî bûye. Cegerxwîn jî bi daxwaza serbilindî û şanaziya wê demê, bangî Emîr Zeyneddîn kiriye.

8/3 Tu Seyfeddîn î şûrê dîn û millet
193 Temaşake welat tev de li hev ket

8/4 Çi Loran û çi Goran û çi Zazî
194 Hemî îro dikin feryad û gazî

Emîr Seyfeddînê kurê Emîr Zeyneddîn, piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Dadmendî û qenciyên wî gihîştine hemû cih û warên mîrektiyê. Dema wefat kiriye du kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.155). Serdema Seyfeddîn gelek bi xweşî û aramî derbas bûye; lewma Cegerxwîn wê serdemê û roja xwe daye berhev û diyar kiriye ku ji dêvla xweşî û aramiya wê demê îro feryad û gaziya Lor, Gor û Zazan bilind dibe. Ji ber navê Seyfeddîn tê wateya şûrê dîn û miletê Cegerxwîn bi wateya navê wî, ew destnîşan kiriye.

8/5 Hesen rabe welat tev bûye wêran
195 Tu nabînî di nav wan de du mêran

8/6 Berê tev de xwedanê gurz û şûran
196 Belê îro xwedanê kesk û tûran

Hesenê kurê Seyfeddîn, piştî mirina bavê xwe bûye cihnişînê wî. Di serdema mîrektiya wî de Aqqoyuniyan xwestine Imadiyyê têxin bin desthilatdariya xwe; lê ev tevgera wan neçûye serî. Piştî Aqqoyuniyan li Îranê Sefewî hatine ser desthilatdariyê. Emîr Hesen çûye Seraya Şah Îsmaîl û Şah gelek hurmetê nîşanî wî daye. Şah, ji bo girtina Kela Dihokê alîkarî daye wî. Ji xeynî vê nahiyê Sindî jî xistiye ser wilayeta Imadiyyê. Heft zarokên kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, 155). Cegerxwîn di van malikên jor de jî serdema Hesen Beg û roja xwe berawird kiriye û xemgîniya xwe ya tunebûna serok û rêberên Kurdan bi risteya “Tu nabînî di nav wan de du mêran”daye berçavan.

8/7 Were Sultan Hisên îro tu rabe
197 Li sînga me neyaran dan kulabe

8/8 Hemî şêx û mela û pîs û parsek
198 Tu nabînî di nav wan de yekî bek

Siltan Huseyîn (Sultan Husên), piştî mirina bavê xwe li ser fermana Siltan Selîm Xan û li gor wesiyeta bavê xwe li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Siltan Huseyîn gelek zana, dîndar û qencîxwaz bûye. Ew rêz û hurmeta ji aliyê Siltanên Osmanî ve ji wî re hatiye kirin ji tu karbidestên Kurdistanê re nehatine kirin. Sî salan bi serbilindî desthilatdariya mîrektiyê kiriye. Di sala 900ê k. de wefat kiriye û pênc kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.156). Cegerxwîn şêwaza malikên berê domandiye û bi hesreta wan rojên xweş şêx û melayên roja xwe rexne kirine. Ji ber ku di nav wan de beg û rêberekî bihêz derneketiye ew li ber destê neyaran mane, ji neyaran zilm û zorê dîtine.

8/9 Qubad Beg rabe ser xwe mîrê zana
199 Binêre tu li rengê me xizana

8/10 Beg û Paşa di nav Kurdan nemane
200 Hemî îro belengaz û geda ne

Qubad Begê kurê Siltan Huseyîn Beg e. Piştî mirina bavê xwe bi fermana Siltan Selîm Xan, li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Mirovekî sofî, qeneetkar û dilnerm bûye. Ji ber ku nizanîbûye ji tawanan re cezayên di cî de bide xelk jê aciz bûye û xwestine ku ji dêvla wî Bayram Begê birayê wî were ser textê mîrektiyê. Eşîreta Mizûrî jî li hemberî wî serî hildaye û ji bin fermana wî derketine. Di cihê wî de Silêmanê kurê Bayrikê kurê Seyfeddîn ê kurapê Qubad Beg kirine mezinê xwe. Qubad Beg, Imadiyyê terk kiriye û ber bi Mûsil û Sencarê ve çûye. Ferhad Paşayê Wezîrê Osmanî dema evagahî bihîstiye nahiya Zaxoyê wek senceq sipartiye Bayram Beg. Qubad Beg xwe avêtiye Stenbolê û ji nû ve fermana desthilatdariya Imadiyyê bi dest xistiye. Lê dema hatiye Kela Dihokê Silêmanê kurê Bayrik û Mîr Melekê Mizurî derûdora keleyê girtine, Qubad Beg tevî kurekî wî kuştine (Şerefname, r.157). Cegerxwîn bi zanabûna Qubad Beg wesfê wî daye û sebebê xizanî û nebaşiya Kurdan bi tunebûna beg û paşayên Kurd ve girêdaye.

8/11 Were şêrê me Kurdan tu Bîram
201 Bi destê xwe tu bigre şûrê Behram

8/12 Begên Goran û Lor û Bext û Zazan
202 Civata xwe ji wan çêke li Barzan

Bayram (Bîram) Begê kurê Siltan Huseyîn Beg e. Bayram Beg ji tirsa Qubad Begê birayê xwe nikaribûye li Imadiyyê bimîne. Lewma ew çûye Seraya Şah Îsmaîl û li wir gelek rêz û hurmet dîtiye, lê piştî mirina Şah Îsmaîl, li serayê xatirê wî nemaye. Ew girtine û di Kela Elemûtê de xistine zîndanê. Ew bi alîkariya Zeynel Begê Hekkarî ji zindanê xelas bûye. Piştî kuştina birayê xwe Qubad Beg, hatiye ser desthilatdariya Imadiyyê. Bayram Beg di nav xelkê û eşîretan de rêvebiriyek gelek bi dadmendî û bi merhemet meşandiye. Ji aliyê din ve Seydî Xan Begê kurê Qubad Beg, xebera kuştin û serpêhatiyên bavê xwe gihandiye Siltan Murad Xan. Siltan Murad, dilê wî xweş kiriye û fermana mîrektiya Imadiyyê jê re şandiye. Di derheqê

Bayram Beg de emrê vekolînê hatiye dayin (Şerefname, r.158-159). Cegerxwîn pesnê cengawerî û zîrektiya wî daye. Wek di malikên wî yên din de jî tê dîtin wî şerê îqtidarê yê wê serdemê destnîşan nekiriye. Her tim dadmendî, xweşî û serkeftîbûna demên berê daye berçav û roja xwe rexne kiriye. Ji ber ku Cegerxwîn tenê berê xwe daye serbixwebûnê; lewazî, kêmasiyên wan di menzûmeyên vê dîwanê de neaniye zimên. Lê di hin cihan de ji ber Kurd nabin yek û tifaqa wan tune ye, ew xwe hêrs kiriye û wek sedema paşdemayinê rê daye.

8/13 Were Seydî tu xan û mîr û paşa
203 Li zozan temaşake li laşa

8/14 Temaşake li zozan û li gerdan
204 Hemî sor in ji ber xwîna me Kurdan

Seydî Xan kurê Qubad Beg e, bi fermana Siltan Murad Xan hatiye ser desthilatdariya mîrektiyê. Dema ku Seydî Xan gihîştiye Mûsilê Bayram Beg serî li ber fermana Siltan tewandiye û wilayetê terk kiriye. Seydî Xan di sala 993yê k./1585ê z. de Kela Imadiyyê girtiye destê xwe. Serdar Ferhad Paşa di vegera Sefera Gurcîstanê de Bayram Beg li Erzirûmê xistiye zindanê. Serdar Ferhad Paşa, piştî pereyekî gelek zêde ji biraziyê wî Seydî Xan girtiye, Bayram Beg teslîmî wî kiriye. Wî jî di sala 994ê k./1586ê z. de ji bo xwîna bavê xwe apê xwe kuştiye. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin yazdeh salên Seydî Beg bûye ku li ser mîrektiya Imadiyyê rûniştiye. Seydî Beg bi kesayetî mirovekî gelek nazik, zîrek û xwediyê mêr û mêrxasiyek nedîtî bûye (Şerefname, r.159-160). Cegerxwîn pesnê Seydî Xan bi hikumdariya wî daye û rewşa Kurdan a nebaş bi laşên li zozana û herikîna xwîna Kurdan diyar kiriye.

**Tablo 3.2.8.** Mîrên Behdînan ( Imadiyyê)

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Emîr Zeyneddîn, Emîr Seyfeddîn, Hesenê kurê Seyfeddîn, Siltan Huseyîn, Qubad Begê kurê Huseyîn Beg, Bayram Begê kurê Siltan Huseyîn Beg, Seydî Xanê kurê Qubad Beg | Emir Zeyneddîn<br>Seyfeddîn<br>Hesen<br>Hisên<br>Qubad Beg<br>Bîram<br>Seydî |
| Dem | Sedsalên XII-XVI.[288] | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Imadiyye, Zaxo, Dihok, Akre, Dirê, Sindî, Beşriyê, Şûşê, 'Umraniyê,Bazîran (mihtemelen Barzan e) | Behdînan, Barzan |

## 3.2.9.Mîrên Cezîrê

Şerefxan mîrektiya Cezîrê kiriye sê beş. Beşa yekem mîrên Cezîrê yên bi navê Ezîzan tên naskirin, beşa duyem di derheqê mîrên Gurgilê de ye, beşa sêyem jî li ser mîrên Finikê ye. Cegerxwîn li gor vê dabeşkirinê neçûye. Piştî menzûmeya bi navê "Beganê Botan" menzûmeya "Beganê Gurgîl" nivîsiye; lê li ser mîrên Finikê nesekiniye. Begên Finikê ji nesla Emîr Ebdalê kurê Silêmanê Xalid in. Dema ku Silêmanê kurê Xalid çûye rehma Xwedê kurên wî welatê bavê xwe di nav xwe de parve kirine. Nahiya Finikê para Emîr Ebdal ketiye. Piştî mirina wî zarok û neviyên wî rêveberî girtine destên xwe.

Bingeh û koka mîrên Cezîrê digihîjin Xalidê kurê Welîd.[289] Yekem bav û bapîrê wan ê li ser textê mîrektiyê rûniştiye Silêmanê kurê Xalid e (Şerefname, r.161). Lewma Cegerxwîn menzûmeya xwe ya bi navê Beganê Botan bi navê

---

[288] Li gor *Şerefnameyê*, dema *Şerefname* hatiye nivîsandin bi ser desthilatdariya vê mîrektiyê ya zarokên Behdînan a li Imadiyyê çar sed sal derbas bûye ku ev jî teqabûlî sedsala XII. dike. Ev binemal ji Şemîzdînanê (Şemzînan) hatine Imadiyyê (r.153).

[289] Di wergera Abdullah Yegin (r.160-161) de Xalidê kurê Welîd wek xelîfeyê Emewî hatiye nivîsandin . Wer diyar e ku ev agahî şaş e. İbrahim Sunkur (r.170) jî ji bo Xalidê kurê Welîd gotiye; ji eshab-i kîram e û bi jêrenotê balê kişandiye ser şaşbûna vê agahiyê ku di çapa ji aliyê Viladimir Zernov ve hatiye weşandin de Xalidê kurê Welîd wek xelîfeyê Emewî hatiye nivîsandin.

Silêmanê lawê Xalid daye destpêkirin. Di vê menzûmeya Cegerxwîn a ji çil û du malikan pêk hatiye de navê bîst û du mîrên Botanê cih girtine. Mîrên Cezîrê di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Fermanrewayên Cezîrê ku ji Wan re "Boxto" jî Tê Gotin" derbas bûye.

9/1 Silêman lawê Xalid her tu mîr î
205 Tu bapîrê Şehînşahê Cizîr î

9/2 Cîhangîro tu rabe ser xwe ey şa
206 Li Kurmanca bike carek temaşa

Silêmanê kurê Xalid yekem kesê ji xanedana xwe mîrektiya Cezîrê kiriye. Desthilatdariya xwe bi serbilindî û di xweşiyê de derbas kiriye. Dema çûye rehmetê sê kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.163). Cegerxwîn diyar kiriye ku Silêmanê kurê Xalid, bapîrê mîrên Cezîrê ye ango Silêmanê kurê Xalid mîrê yekem ê ji vê xanedanê ye.

9/3 Ezîz rabe ji nav Buxtan tu şah î
207 Belê zanim xwedan text û kulah î

9/4 Li te pîroz e tac û text û eywan
208 Li dijmin rake îro deng û ferman

Ebdulezîzê kurê Silêmanê kurê Xalid e. Piştî mirina bavê xwe kar û barê mîrektiyê bi rê ve biriye. Ew bi mezinahî û zîrektiya xwe hatiye nasîn. Wî bi alîkariya herdu birayên xwe welatê xwe bi xweşî û dadmendî bi rê ve biriye. Ev hersê bira di tu warî de neketine nav dijîtî û nelihevhatinê (Şerefname, r.161). Cegerxwîn hikumdariya wî bi nîşaneyên hikumdariyê yên "text, kulah, tac û eywan (dîwan)" destnîşan kiriye û ji bo roja xwe jî pêdiviya bi hikumdarekî bi vî awayî diyar kiriye.

Di *Şerefname*yê de di derheqê Ebdulezîz de di bin sernavekî cuda de agahî nehatiye dayin, di bin sernavê Silêmanê kurê Xalid, ango bavê wî de Şerefxan behsa

wî û herdu birayên wî jî kiriye. Cegerxwîn jî ji ber ku mîrê duyem Ebdulezîz e, piştî bavê wî navê wî rêz kiriye. Cegerxwîn piştî navê Emîr Seyfeddînê kurê Ebdulezîz, ji kronolojiya *Şerefname*yê qetiyaye û cih nedaye mîrê bi navê Emîr Mecdeddînê kurê Ebdulezîz. Lê mîrê pey Emîr Mecdeddîn şûnde li gor rêza *Şerefname*yê çûye.

9/5 Tu Seyfeddîn î bigre şûrê tazî
209 Li Kurmanca tu carek rake gazî

9/6 Tu leşkerkî giran çêke bi baran
210 Bisojin em dil û cergê neyaran

Emîr Seyfeddînê kurê Ebdulezîz e, piştî bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Ew bi tevahî li ser şopa bavê xwe meşiyaye. Emîr Seyfeddîn dilê kesên hevwelatî nehiştiye û bawermendiya qebîle û eşîretan qezenç kiriye. Dema wefat kiriye birayê wî li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.165). Cegerxwîn di navbera navê Emîr Seyfeddîn û wateya navê wî de girêdanek çêkiriye. Ji ber Seyfeddîn tê wateya "şûrê dîn", dema behsa wî kiriye, xwestiye şûrê tazî bigre destê xwe û li hemberî dijmin têkoşînê bike.

9/7 Emîr Îsa tu rabe ey serifraz
211 Binêre em çilo bûne belengaz

9/8 Kenarên me li çar alî neyar in
212 Ji wan xeşm û birûsk û tîr dibarin

Emîr Îsayê kurê Mecdeddîn cihê bavê xwe girtiye. Di temamê jiyana xwe de wî dilê tu kesekî bê sebeb ji xwe nehiştiye û tu car bêtewan û bêgunehan bend û zîndan nekiriye. Bi vî awayî ew jiyana xwe di nav hevwelatiyên xwe û destûpêwendên xwe de bi bawermendî û memnûniyeta wan derbas kiriye. Piştî mirina wî kurê wî li cihê wî rûniştiye ( Şerefname, r.166). Cegerxwîn di van malikê ji bo Emîr Îsa nivîsiye de behsa rewşa roja xwe kiriye ku çawa di nav zilm û zora neyaran de mane.

9/9 Tu Bedreddînî mîrê Buxt û Torê
213 Hemî îro ketin bin darê zorê

9/10 Temaşake tu carek van neyaran
214 Belengazên me kuştin tev bi daran

Emîr Bedreddîn kurê Emîr Îsa ye, wî wezîfeya hikumdartî û desthilatdariyê bi awayekî herî baş bi rê ve biriye. Mirovek bi dadmendî û bi qenciyên xwe hatiye naskirin. Şerefxan di *Şerefname*yê de bi zimanekî hunerî behsa wesfên wî yên baş kiriye. Wî her wext xwestiye ku erbabên tesewwifê di meclîsa wî de amade bin. Dema ku çûye rehma Xwedê kurê wî li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.166). Cegerxwîn di malikên ji bo Bedreddîn de behsa ji destderketina axa welat û kuştina xelkê ya ji aliyê dijminan kiriye. Cegerxwîn li ser xweşî û aramiya serdema Emîr Bedreddîn nesekiniye. Ji bo perîşanî û belengaziya roja xwe destnîşan bike, bangî wî kiriye.

9/11 Emîr Ebdal tu mîrê çak û şîrgoş
215 Belê îro serayê te li gerdûş

9/12 Cihan pêk ve firîn e çûne banî
216 Belê ê me xizanî û şivanî

Emîr Ebdal kurê Emîr Bedreddîn e, piştî bavê xwe bûye rêvebirê mîrektiyê. Dema li ser textê mîrektiyê rûniştiye heta dawiya jiyana xwe wî jî daye ser şopa bav û bapîrên xwe. Wî bi dadmendî û başîtî desthilatdariya xwe meşandiye. Piştî wefat kiriye, kurê wî hatiye ser textê mîrektiyê (Şerefname, r.166). Cegerxwîn jî herdu malikên ji bo Emîr Ebdal rêz kirine de pesnên desthilatdariya wî daye. Wî, piştre bal kişandiye ser pêşveçûnê cîhanê ku Kurd negihiştine van pêşveçûna, lewma kêm û paşde mane.

9/13 Emîr Izdîn tu rabe ey ciwanmêr
217 Şehînşah î egîd û fihris û şêr

9/14 Erê tac û sera û textê Botan
218 Erê îro neyaran tev de sotan

Emîr Izzeddînê (Emîr Izdîn) kurê Emîr Ebdal e. Dema ku ev emîr hatiye ser desthilardariyê behsa fethên Emîr Tîmûrê Kurganî li hemû cîhanê belav bûne. Tîmûr piştî Bexda stendiye û Kela Tikrîtê kavil kiriye ber bi Mêrdînê ve hereket kiriye (769ê k./1393-94ê z.). Emîr Izzeddîn çûye dîtina Tîmûr û erzaqê jê hatine xwestin ji leşkerên Tîmûr re şandiye. Lê dawiyê ji ber Izzeddîn guh nedaye peyama Tîmûr û Kurdê bi navê Şêx ê Eşîreta Boxtî teslîmî Tîmûr nekiriye, navbera Emîr Izzeddîn û Tîmûr xera bûye. Tîmûr êrîşî ser Cezîrê kiriye, kel û bajar wêran û talan kirine. Emîr Izzeddîn ketiye destê leşkerekî Tîmûr lê ji ber leşker ku ew nasnekiriye lê xistiye, pere û çekên wî jê girtine û ew serbest hiştiye. Wî jiyana xwe ya mayî di nav Eşîreta Eruxî de bi veşartinê derbas kiriye (Şerefname, r.167-168).Cegerxwîn piştî navê Emîr Izzeddîn yad kiriye û pesnê mêr û mêrxasiya wî daye, ji destderketina desthilatdariyê ( tac, sera, text) gazin kiriye.

9/15 Emîr Ebdal tu rabe lawê Izdîn
219 Temaşake li zozanê me rengîn

9/16 Hemî îro kulîlk û bax û bistan
220 Belê çibkim li wan bûye zivistan

Mîr Ebdal kurê Emîr Izzeddîn e, piştî mirina bavê xwe desthilatdariya Cezîrê girtiye destê xwe. Wî, kar û barên qebîle û eşîretan bi awayekî gelek baş bi rê ve biriye. Lê wan rojan zêde dewam nekiriye, Emîr Ebdal çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.168). Cegerxwîn Mîr Ebdal tevî navê bavê wî bi bîr aniye. Cegerxwîn di vir de behsa xweşikiya welat kiriye ku zozanê rengîn, li kulîlk, bax û bistanan bûye zivistan ango ji ber ji dest derketine û ketine destê dijminan tu wateya xweşikiya wan nemaye.

9/17 Birahîm Beg tu rabe lawê Ebdal
221 Binêre ka çilo ne dost û heval

9/18 Hemî dîl û belengaz in hemî jar
222 Ker û gêj in ji destê Tirk û Tatar

Emîr Îbrahîmê (Birahîmê) kurê Emîr Ebdal e, piştî mirina bavê xwe li ser textê Mîrektiya Cezîrê rûniştiye. Demek kar û barên welat meşandiye. Sê zarokên kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.168). Cegerxwîn di malikên li jor de bi bangkirina Emîr Îbrahîm; dîl û belengazî, ker û gêjiya ji destê Tirk û Tataran li ber çavan raxistiye.

9/19 Şeref rabe cihan doj e bi carek
223 Dilên Kurdan disojit her bi arek

9/20 Beg û paşa û mîr û şêx û axa
224 Siya bext in hemî manendê zaxa

Emîr Şerefê kurê Emîr Îbrahîm e, ew li cihê bavê xwe li ser text rûniştiye. Emîr Şeref, demekê kar û barên welat bir ê ve birine. Piştre ew, desthilatdarî ji birayê xwe re hiştiye û miriye (Şerefname, r.168). Di *Şerefname*yê de derheqê Emîr Şeref de zêde agahî nehatiye dayin. Tenê hatiye beskirin ku desthilatdarî kiriye. Cegerxwîn jî navê wî yad kiriye, lê pirsgirêkên roja xwe di malikên ji bo wî nivîsandiye de diyar kiriye. Ji ber Kurd di war û welatên xwe de ji serok û rêberên bihêz bêpar mane, cîhan ji bo wan bûye dojeh û dilê wan sûtandiye. Ew; bi teşbîhê rewşa beg, paşa, mîr, şêx û axayên dema niha diyar kiriye û wan bêşens û bêsiûd dîtiye. Çimkî tu hêza wan nemaye, tev bûne wek qijakan (zaxan).

9/ 21 Bedir rabe emîrê textê Botan
225 Bike qêrîn li kal û mêr û xortan

9/22 Hemî rabin bidin gurz û bidin dar
226 Li her alî berê xwe bidne neyar

Emîr Bedirê kurê Mîr Îbrahîm e, piştî birayê xwe kar û barên mîrektiyê demekê meşandiye. Piştre sê zarokên kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, 68). Cegerxwîn ji Emîr Bedir xwestiye ku rabe û rêbertiya Kurdan bike. Bi vî awayî pêdiviya serok û rêberên Kurdan ên bihêz carek din aniye zimên.

9/23 Were ey Kek Muhemed xweş ciwan î
227 Li ser me bûne paşa Tirkumanî

9/24 Heçî Kurd in hemî îro xizan in
228 Hemî mêr in belê çibkim nezan in

Kek Mihemmed (Muhemed) kurê Emîr Îbrahîm e. Piştî birayê xwe Emîr Bedir hatiye ser textê Boxtanê. Di dema wî de Hesen Begê Aqqoyunî êrîş biriye ser welatê wî û ew dagir kiriye. Di vê êrîşê de piraniya mezinên Boxtan hatine kuştin. Tirkmenan Kek Mihemmed û herdu biraziyên wî girtine û bi xwe re birine Iraqê. Bi vî awayî seranserê welatê wan ketiye destê Tirkmenên Aqqoyuniyan. Piştre Emîr Şerefê kurê Emîr Bedir ev welat ji bin destê Aqqoyuniyan rizgar kirine (Şerefname, 168-169). Cegerxwîn vê rewşa han bi risteya "Li ser me bûne paşa Tirkumanî" îfade kiriye. Lê ev îfade tenê ne ji bo serdema Kek Mihemmed e, ev îfade ji bo roja Cegerxwîn jî derbasdar e, dijmin dijminê herdem e. Cegerxwîn di vir de bal kişandiye ser nezanî û nebîreweriya Kurdan. Herçiqas Kurd mêr û mêrxas bin jî ji ber nezaniya xwe di rewşeke nebaşdane.

9/25 Şeref rabe cîhan bigre bi carek
229 Di nav Kurdan, mehêle hîç neyarek

9/26 Bibin yekdest, digel dijmin bikin ceng
230 Bi yekqîr û bi yekzar û bi yekdeng

Emîr Şeref kurê Emîr Bedir e. Dema apê wî Kek Mihemmed û birayên wî yên bi navê Mîr Mihemmed û Şah Elîyê ji aliyê Aqqoyuniyan ve esîr hatine girtin, Emîr Şeref çûye li cihekî ji aliyê tu kesî ve nedihat zanîn jiyaye. Piştî sî salên bêhêvîtî, bi

bêhêzbûna Aqqoyuniyan re firset ketiye destê wî. Wî, êrîş biriye ser Aqqoyuniyan û welatê bav û bapîrên xwe rizgar kiriye. Piştre li ser textê Mîrektiya Cezîrê rûniştiye. Apê wî Kek Mihemmed û herdu birayên wî ji zindanên Tirkmenan hatine rizgarkirin û bûne piştevanên wî.  Ji aliyê din ve Şah Îsmaîl li Îranê hakimtiya xwe ava kiriye û leşkerek ji Qizilbaşan pêk hatîji bo girtina Cezîrê şandiye. Emîr Şeref, derbeyekî mezin li leşkerên Qizilbaşan xistiye û xetereya wan ji holê rakiriye. Emîr Şeref heta çûye rehmetê bi serbilindî û azayetî jiyaye (Şerefname, r.170-171). Cegerxwîn bi şêwazeke diyalektîk bangî Emîr Şeref kiriye ku Emîr Şeref dijmin ji welatê xwe derxistiye û welatê xwe rizgar kiriye. Lewma wî, ew wek xelasker destnîşan kiriye. Ji ber Emîr Şeref, apê wî Kek Mihemmed û herdu birayên wî bûne yek û hêza wan zêde bûye, Cegerxwîn li hemberî dijmin girîngiya yekîtîyê destnîşan kiriye.

9/27 Elî Beg rabe ey şahê dilawer
231 Direfşê Kawe rake kom û leşker

9/28 Bike dengê tiving û top û Buxtan
232 Herin bala di her kêlîk û wextan

Şah Elî Begê kurê Mîr Bedir e, piştî mirina Mîr Şeref bilayiqdîtina qebîle û eşîretên Boxtan Şah Elî Beg bûye mîrê wan. Dema ku giregirên Kurdistanê li hev kirine ku biçin Tebrîz û Xoyê û sedaqeta xwe ji Şah Îsmaîl re diyar bikin, Şah Elî Beg jî tevî dozdeh mîrên Kurdistanê ber bi baregaha Şah ve bi rê ketiye. Lê têkçûna Qizilbaşan a li ser axa Boxtanê hê ji bîra Şah Îsmaîl neçûye û Şah Îsmaîl mîrên Kurdan avêtine zindanê. Piştî demekê di mayina zindanê de her yek bi awayekî ji zindanê hatiye berdan. Şah Elî dema di zindanê de bûye, Şah Îsmaîl Cezîr daye destê Ulan Beg[290]ê birayê waliyê Diyarbekrê. Elî Beg bi alîkariya eşîreta xwe êrîş biriye ser Cezîrê û Cezîr stendiye. Li pey vê bûyerê Şah Elî demek mîrektiya Boxtan kiriye. Ew, çar kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, 171-172).

Di van herdu malikên li jor de sê dem hene: Dema Kawayê Hesinkar, dema Şah Elî û dema niha ya Cegerxwîn tê de dijî. Cegerxwîn bangî Elî Beg kiriye ku wek Kawayê Hesinkar di bin direfşekê (senceqekê) de leşker kom bike û bi şerekî giran

[290] Di wergera Abdullah Yegin ( r.171) û İbrahîm Sunkur (r.180) de Ulaş Beg e.

çawa di serdema xwe de welat ji destê dijmin derxistiye di dema niha de jî welat rizgar bike. Cegerxwîn bi vî awayî dîroka têkoşîna neteweya Kurd a ji bo azadiyê diyar kiriye. Kawayê Hesinkar, wek ku tê zanîn di dîroka Kurdan de mîta damezrîner e û di çarçoveya efsaneya Kawa û Dehaq de têkoşîna rizgariya neteweya Kurd tê destnîşankirin. Cegerxwîn di *Şerefnameya Menzûm* de du caran navê Kawa bi bîr aniye.

9/29 Bedir Beg rabe îro ev çi roj e
233 Bi destê xwe cîhan tev de bisoje

9/30 Ji wan doza me bistîne de îro
234 Ji wan xwîna me bistîne tu mîro

Bedir Begê kurê Şah Elî piştî mirina bavê xwe li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Ew hikumdartiyek gelek baş meşandiye û desthilatdariya wî nêzî heftê salan ajotiye. Di seranserê dewra padîşahtiya Siltan Silêman Xanê Osmanî de girêdayî Siltan maye. Lê helwestên wî yên wek; piştî şerê Îranê ji bo di rêza teşrîfatê de mîrê Imadiyyê xistine pêşiya wî bêyî maçîkirina destê siltanê Osmanî ji Dîwana Humayûn derketiye û ji ber dema Zeynel Begê Mîrê Hekkarî ji Stenbolê ji cem siltan vegeriyaye, Bedir Beg kêmin li ber wî daye vekirin; Siltan Silêman û Wezîrê Mezin Rustem Paşa jê acizbûne. Bi teşwîqkirina Rustem Paşa birayê wî Nasir doza mîrektiya Cezîrê kiriye. Ji Nasir re fermana mîrektiya Cezîrê derketiye. Dema ku Nasir Beg bi fermana ji bo mîrektiyê hatiye, Bedir Beg desthilat ji birayê xwe re hiştiye. Lê piştî du salan Bedir Beg, femana mîrektiyê bi dest xistiye. Bedir Beg nêzî sed salan jiyaye û kurekî bi navê Mîr Mihemmed li pey xwe hiştiye (Şerefname, r.172-174). Cegerxwîn, Bedir Beg bi mêr û mêrxasiya wî yad kiriye û ji bo rizgariya welat jê alîkarî xwestiye.

9/31 Were ey Mîr Muhemed mîrê Botan
235 Ji dijmin zû tu bigre text û eywan

9/32 Tu deyne ser serê xwe tacê Perwîz
236 Bikin cengê digel lawanê Cengîz

Mîr Mihemmedê kurê Bedir (Mîr Muhemed), di jiyana bavê xwe de kar û barên bavê xwe meşandine. Piştî bavê xwe heft salan bi awayekî serbixwe desthilatdarî kiriye. Ew ji ber di maldaneheviyê de gelek bi hêrs bûye serwetek mezin berhev kiriye. Di sala 986ê k./1577[291]ê z. de bi fermana Siltan Murad Xan wezîfeya îstilaya Şêrwan û Gurcîstanê jê re hatiye dayin. Mîr Mihemmed li Gurcistanê di şerê li hemberî Qizilbaşan de tevî hin mîrên Kurd ên din hatiye kuştin. Çar keç û kurekî bi navê Siltan Mihemmed ê pênc salî li pey xwe hiştine (Şerefname, r175-176). Wek ku tê dîtin Mîr Mihemmed, li Gurcistanê di şerê li hemberî Qizilbaşan de hatiye kuştin; lê Cegerxwîn wek dijmin lawê Cengîz rê daye.

9/33 Were Sultan Muhemed şahê serdar
237 Binêre ka çilo ne Kurdên xwînxwar

9/34 Weke mêş in welê nîn e şivanek
238 Hemî jar in me nîn e kêxwedanek

Siltan Mihemmedê (Sultan Muhemed) kurê Emîr Mihemmed e. Dema bavê wî hatiye kuştin ew gelek biçûk bûye. Dayika wî keça Melik Mihemmedê Mîrê Hesenkêfê bûye. Dayika wî ji ber jinekî gelek zana û bi tedbîr bûye bi riya belavkirina hil'atên bi qîmet, serokên eşîreta Boxtanê dilxweş kirine. Piştre wê kurê xwe hilgirtiye û çûye Seraya Murad Xan a Stenbolê. Siltan, fermana desthilatdariya Cezîrê ji Siltan Mihemmedê kurê wê re nû kiriye. Piştî pênc sal desthilatdariya Siltan Mihemmed diya wî çûye rehmetê. Siltan Mihemmed jî li pey diya xwe zêde nejiyaye û di sala 991ê k./1582yê z. de wefat kiriye (Şerefname, r.177-178). Cegerxwîn bi van malikên li ser Siltan Mihemmed; bêserokbûn, bêxwedîbûn û jarbûna Kurdan daye berçavan.

[291] Me ev dîrok ji wergera İbrahim Sunkur (r.183) girt. Di wergera Ziya Avci (r.175) de wek 986ê k./1758ê z. derbas bûye ku diyar e ev dîrok şaş e. Jixwe ew jî bi jêrenotê, vê şaşiyê diyar kiriye. Di wergera Abdullah Yegin de ev dîrok nehatiye dayin.

9/35 Were Nasir binêre em çi jar in
239 Pepûk û bê xwedan û arîkar in

9/36 Li alikî Ereb tê me digel Rom
240 Li alikî Ecem tê me digel kom

Nasir Begê kurê Şah Elî ye. Rustem Paşayê Wezîrê Mezin ê Osmanî li hemberî birayê wî Nasir Beg teşwîqî daxwaza hikumdariyê kiriye. Li ser vê Nasir Beg çûye Stenbolê û bi fermana Siltan Silêman, hikumeta Cezîrê bi dest xistiye. Piştî du sal bi ser vê bûyerê Bedir Begê birayê wî jî çûye Stenbolê. Bi fermana Siltan nahiyên Tor û Heytemê wek senceq ji Nasir Beg re, hikumeta Cezîrê jî ji Bedir Beg re hatiye dayin. Dema Nasir Beg miriye ev wilayet jî kirine ser eyaleta Cezîrê, Ebdalê kurê Nasir bi hêviya fermana rêvebiriyê çûye Stenbolê. Lê ew bi ser neketiye û ji ber dema çawişbaşiyên Bab-i Alî li Mizgefta Edirnê hatine wî bibin dîwanê, mirovekî Ebdal Xan ji vê rewşê ketiye şikê û çawişbaşî kuştiye, Ebdal Xan nêzîkî tevî sed kesên serokên Boxtanê, bi fermana Siltan hatine kuştin (Şerefname, r.178-179). Cegerxwîn aciziya xwe ya ji van bûyeran bi pepûkbûn û bêxwedîbûna Kurdan aniye zimên. Li gor wî Kurd di nav dijminahiya Ereb, Rom û Eceman de bêçare û bêxwedî mane.

9/37 Emîr Izdîn tu rabe şêrê xwînxwar
241 Binêre em ji bo çi mane bê kar

9/38 Cîhan tev de xwedan mêr û mirov in
242 Belê Kurdên me tev de hirç û hov in

Di *Şerefname*yê de bi navê Mîr Ezîzê kurê Kek Mihemmed (Emîr Izdîn), derbas bûye. Bi piştgirî û alîkariya Ferhad Paşayê Wezîr, kar û barên Mîrektiya Cezîrê girtiye destê xwe. Wî salek û çar meh mîrektiya Cezîrê kiriye. Osman Paşayê Wezîrê Mezin ew ji ser kar hildaye û Mîrektiya Cezîrê daye destê Mîr Mihemmedê kurê Xan Ebdal. Jiyana wî di nav şerê îqtidarê de derbas bûye. Di dawîyê de ji aliyê Emîr Şeref ve hatiye kuştin (Şerefname, r.181-183). Cegerxwîn mihtemelen ji ber ku

şerê îqtidarê yê di navbera van mîran de tesvîb nekiriye û şerê navxweyî li ber pêşveçûna Kurdan wek astengî ditiye bi zimanekî rexneyî nêzî serdema Emîr Ezîz (Emîr Izdîn) bûye. Cegerxwîn bi tabîra “hirç û hov” aciziya xwe ya ji lihevnekirina Kurdan aniye zimên.

9/39 Muhemed rabe ser xwe zû binêre
243 Li deng û zar û ahan guh bidêre

9/40 Dikin qîr û hawar û ah û feryad
244 Li her alî pepûk û jar û bê dad

Emîr Mihemmedê kurê Xan Ebdal e. Piştî Ferhad Paşayê Wezîrê Mezin di sala 991ê k./1583yê z. de Emîr Nasirê birayê wî kuştiye, Mîrektiya Cezîrê xistiye destê Emîr Ebdulezîz. Di navbera zarokên Xan Ebdal û Emîr Ebdulezîz de şerê îqtidarê hatiye wê raddeyê ku Emîr Ebdulezîz li hemberî birayê xwe Emîr Şeref ketiye Cezîrê, lê bi ser neketiye. Dema ku deng û behsên vê bûyerê gihîştiye Seraya Siltan, eyaleta Cezîrê dane destê Emîr Mihemmed û ew şandine Cezîrê. Birayê wî Emîr Şeref bê şer wilayet jê re hiştiye. Qasekî şûn de mezin û rîspiyên Boxtan ew li hev anîne. Ji ber piraniya serokên Boxtan meyldarê mîrektiya Emîr Şeref bûne, Emîr Mihemmed Cezîr terk kiriye (Şerefname, r.184-186). Cegerxwîn belengazî, bêhizûrî û bêaramiya heyama xwe bi qîr û hawar û ah û feryad vegotiye.

9/41 Şeref îro temaşake Cegerxwîn
245 Bi xweşxwanan gihaye textê gerdûn

9/42 Bi qîrîn û bi ah û nal û zar e
246 Belengaz e di bin pencê neyar e

Emîr Şerefê kurê Xan Ebdal, ji mîrên hilbijartî yên xanedana mezin a Mîrektiya Cezîrê yê herî mezin e. Bi mêr û mêrxasiya xwe bi nav û deng bûye. Emîr Şeref kar û barên rêvebiriyê bi awayekî herî baş meşandine. Emîr Izzeddînê birayê wî ji bo desthilatdariyê têkelhevî derxistibe jî negihîştiye armanca xwe. Ew ji aliyê

mirovên Emîr Şeref ve hatiye kuştin. Ji wê rojê şûn de Emîr Şeref bûye mîrê serbixwe yê Cezîrê. Wer diyar e ku dema *Şerefname* hatiye nivîsandin bi awayekî serkeftî hê li ser textê mîrektiyê bûye (Şerefname, r.186-187). Cegerxwîn êş û jana serdema xwe, bindestiya neteweya xwe bi qîrîn û ah û nal û zar nîşan daye. Cegerxwîn bi gelek xweşxwanan (xwendinan) gihîştibe astekî bilind jî ji bo rizgariyê tişt ji destê wî nehatiye, ew xwe belengaz û bindest hîs kiriye.

**Tablo 3.2.9.** Mîrên Cezîrê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Suleymanê kurê Xalid, Mîr Ebdul'ezîz, Emîr Seyfeddînê kurê Ebdul'ezîz, Emîr Mecdeddînê kurê Ebdul'ezîz, Emîr Îsayê kurê Mecdeddîn, Emîr Bedreddînê kurê Emîr Îsa, Emîr Ebdalê kurê Emîr Bedreddîn, Emîr Izzeddînê kurê Emîr Ebdal, Emîr Ebdalê kurê Emîr Izzeddîn, Emîr Îbrahîmê kurê Emîr Ebdal, Emîr Şeref, Emîr Bedir, Kek Mihemmedê kurê Emîr Îbrahîm, Emîr Şerefê kurê Emîr Bedir, Şah Elî Begê kurê kurê Mîr Bedir, Bedir Begê kurê Şah Elî, Mîr Mihemmedê kurê Bedir Beg, Siltan Mihemmedê kurê Emîr Mihemmed, Nasir Begê kurê Şah Elî Beg, Mîr Ezîzê kurê Kek Mihemmed, Emîr Mihemmedê kurê Xan Ebdal, Emîr Şerefê kurê Xan Ebdal | Silêman lawê Xalid<br>Ezîz<br>Seyfeddîn<br>Emîr Îsa<br>Bedreddîn<br>Emîr Ebdal<br>Emîr Izdîn<br>Emîr Ebdal lawê Izdîn<br>Brahîm Beg lawê Ebdal<br>Şeref<br>Bedir<br>Muhemed<br>Şeref<br>Elî Beg<br>Bedir Beg<br>Muhemed<br>Mehemed<br>Nasir<br>Emir Izdîn<br>Muhemed<br>Şeref |
| Dem | Sedsalên VII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Boxtan, Cezîre, Gurgîl, Finik, Bereke, Arûx, Pîrûzê, Badanê, Tor, Tenzê, Heytem, Şaxê | Botan, Cizîr, Tor |

## 3.2.10. Begên Gurgilê[292]

Dema ku zarokên Silêmanê kurê Xalid wilayeta Cezîrê li hev parve kirine. Nahiya Gurgilê para Mîr Hacî Bedir ketiye. Hemû mîrên Gurgilê ji nesla vî mîrî ne. Piştî wî ji neviyên wî Hacî Mihemmedê kurê Şemseddîn hatiye ser desthilatdariyê. Li pey wî Şemseddînê kurê wî bûye mîr. Şemseddîn sê zarokên kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê. Hersê bira bi pey hev desthilatdariya Gurgilê girtine destê xwe (Şerefname, r.188). Ji ber di derheqê herdu birayên ewil de Şerefxan xwediyê zanyariyekî nebûye, bi agahiyên di derheqê birayê sêyem ê bi navê Seyid Ehmed dest pê kiriye. Cegerxwîn behsa van mîrên destpêkê nekiriye û menzûmeya "Beganê Gurgîl"ê bi Seyid Ehmed daye destpêkirin û di dozdeh malikan de serdema şeş mîrên Gurgilê bi bîr aniye. Di *Şerefname*yê de jî agahiyên derheqê vê binemalê bi sernavê "Di Derheqê Begên Gurgilê de ye" derbas bûye.

10/1 Seyid Ehmed tu rabe mîrê Gurgîl
247 Temaşake welatê te hemî dîl

10/2 Belengazên me dest û pê di bendan
248 Nexweş mane di kuncê xan û zindan

Emîr Seyid Ehmedê kurê Mîr Şemseddîn e. Ew bi gelek meziyetên baş hatiye nasîn, xwediyê qedir û qîmetê bûye. Ji ber di sohbet û axaftinên xwe de xweşbêj bûye di meclîsên taybetî de bûye nêzîkê hogirê Siltan Selîmê Osmanî. Peywendiya wî ya bi Siltan re bûye wesîleya Mûsil û Sencarê jî bidin bin rêvebiriya wî. Di jiyana wî ya dirêj de hemû siltan jê memnûn mane, rêz û eleqeyek baş nîşanî wî dane. Piştî mirina wî biraziyê wî li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.188-189). Cegerxwîn bindestî û bêseroktiya Kurdan bi dîlgirtina welat îfade kiriye ku belengazên wî ango neteweya wî dest û pê bendkirî û zindanan de mane.

10/3 Were rabe tu Şemseddînê Botî
249 Neyarên me dil û cergê me sotî

[292] Navê Gurgil berê Curdqil bûye, bi demê re guheriye û di nav xelkê de wek Gurgil hatiye bikaranîn.

10/4 Bike îro li me carek temaşa
250 Tu zozanê xwe nabînî ji laşa

Emîr Şemseddînê kurê Emîr Bedir e. Piştî mirina apê xwe hatiye ser rêvebiriya mîrektiya Gurgilê (Gurgîlê). Ji xeynî wî sê birayên wî yên din jî hebûne. Ew dema çûye rehma Xwedê, birayê wî Emîr Îbrahîm hatiye ser text (Şerefname, r.189). Şerefxan di derheqê serdema wî de zêde agahî nedaye. Hêmana Cegerxwîn eleqederkiriye mîrektiya Emîr Şemseddîn e. Xuya ye ku hêmana girîng diyarkirina pêdiviya bi mîr û hikumdarên Kurdan re heye.

10/5 Birahîm Beg tu serdarê cîhan î
251 Belê îro bi derdê me nizanî

10/6 Welatê te çi nêçîr e bi yek car
252 Belê kundê şikêran ew hemî xwar

Emîr Îbrahîmê (Birahîmê) kurê Mîr Bedir, piştî birayê xwe Emîr Şemseddîn desthilatdariya Gurgilê girtiye destê xwe. Ji ber dostiya nêzîk a Emîr Îbrahîm bi Emîr Nasir re hebûye, çûye Wanê ku ji bo wî teyidnamekê bistîne û biçe Seraya Siltan Silêman Xan. Di heman demê de Şah Tahmasb jî bi leşkerekî gelek giran êrîşê Wanê kiriye. Emîr Îbrahîm ji wir dûr ketiye, lê di navbera Bergêrî û Ercîşê de rastî grûba Qizilbaşan hatiye. Şerekî giran di navbera wan de qewimiye. Emîr bi ser ketiye û xwe avêtiye Kela Ercîşê. Kele nêzîkî çar mehan di bin ebluqeya Şah Tahmasb de maye, Emîr Îbrahîm û mirovên wî dest ji berxwedanê bernedane. Lê ji ber rûniştiyên keleyê bi dizî bi Qizilbaşan re bi hev kirine û deriyê keleyê ji wan re vekirine. Emîr Îbrahîm û Boxtiyên pê re di vê êrîşê de hatine kuştin (Şerefname, r. 190). Cegerxwîn di bangkirina Emîr Îbrahîm de dijminê serdema wî yê pê re şer kirine qest nekiriye. Ew dijminê roja xwe yê welat dagir kirine bi metafora kundê şikêran daye berçavan.

10/7 Emîr Ehmed tu şah û pehlewan î
253 Ji bona me divêtin jîndeganî

10/8 Erê Kurdên me îro tev de tat in
254 Belengaz in bi carek bê xebat in

Emîr Ehmedê kurê Emîr Îbrahîm, piştî kuştina bavê xwe li ser fermana Siltan Silêman Xan, li ser textê Mîrektiya Gurgilê rûniştiye û sî salan mîrektî kiriye. Kurekî wî yê bi navê Mîr Mihemmed hebûye. Kurê wî li hemberî bavê xwe bi piştevaniya Emîr Ezîz serî hildaye û li cihê bavê xwe rêvebiriya mîrektiyê girtiye destê xwe. Li ser vê yekê Emîr Ehmed xwestiye rewşa xwe pêşkêşî Siltan Murad Xan bike, lê di rê de çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.190-191). Cegerxwîn diyar kiriye ku Kurd di nav serdema bi pehlewaniya do û belengazî û tatî (xêvekî/bûdeletî) ya îro de jîndeganin.

10/9 Muhemmed rabe mîr û kêxwedayî
255 Temaşake li dengê min gedayî

10/10 Dikim feryad û ah û qîr û zarî
256 Di çavan av nemaye xwîn dibarî

Emîr Mihemmedê kurê Emîr Ehmed, piştî bavê xwe ji ser text rakiriye demek rêvebiriya Mîrektiya Gurgilê kiriye. Bi alîkariya Emîr Ezîz wezîfeya xwe meşandibe jî ji qabîliyeta meşandina kar û barên rêvebiriya welat dûr bûye. Ji aliyê kurên apê xwe ve hatiye kuştin (Şerefname, r.191). Serdema Emîr Mihemmed ne pir serdemek baş be jî ji bo Cegerxwîn a girîng hikumdariya wî ye. Cegerxwîn peywendî bi mîr û xwedîtiya wî ve daniye û rewşa Kurdan a bêxwedî, xulam û xizmetkar (geda) bi feryad û ah û qîrîn dane xuyakirin. Bi awayekî mubalexe xemgîniya xwe ya ji vê rewşê bi risteya “Di çavan av nemaye xwîn dibarî” destnîşan kiriye.

10/11 Emîr Ehmed tu mîr û serfiraz î
257 Temaşake li Kurdên rût û tazî

10/12 Di piştî we bi carek bûne xemgîn
258 Ne ez tenha hemî bûne Cegerxwîn

Emîr Ehmedê kurê Emîr Mihemmed, dema bavê wî hatiye kuştin gelek zarok bûye. Lê ew, wextê *Şerefname* hatiye nivîsandin di sala 1006ê k./1597ê z.bi alîkariya Emîr Şerefê kurê Xan Ebdal, kar û barên hikumeta Gurgilê bi awayekî gelek baş meşandiye (Şerefname, r.191). Di *Şerefname*yê de ji ber mîrê Gurgilê yê dawî Emîr Ehmed e Cegerxwîn, bi îfadeya "piştî we" piştî serdema mîrektiyan rewşa Kurdan a xemgîn kiriye behsa van malikên li jor.

**Tablo 3.2.10.**Begên Gurgilê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Mîr Hacî Bedir, Hacî Mihemmedê kurê Şemseddîn, Mîr Şemseddîn, Emîr Bedir, Emîr Hacî Mihemmed, Emîr Seyîd Ehmedê kurê Mîr Şemseddîn, Emîr Şemseddînê kurê Emîr Bedir, Emîr Îbrahîmê kurê Mîr Bedir, Emîr Ehmedê kurê Emîr Îbrahîm, Emîr Mihemmedê kurê Emîr Ehmed, Emîr Ehmedê kurê Emîr Mihemmed | Seyid Ehmed<br>Şemseddînê Botî<br>Brahîm Beg<br>Emîr Ehmed<br>Muhemmed<br>Emîr Ehmed |
| Dem | Sedsalên VII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Gurgil, Mûsil, Sencar(Şengal) | Gurgîl |

## 3.2.11. Mîrên Hesenkêfê

Li gor rîwayetan, piştî di sala 662yê k./1264ê z. de li Misrê û Şamê dawî li desthilatdariya Eyyûbiyan hatiye yekî ji vê xanedanê ber bi Mêrdînê ve çûye. Rêvebirê Mêrdînê ew xistiye nav fermandar û giregirên nêzî xwe. Lê ev xort, zêde li wir nemaye û çûye Re's el-Qulê ku niha bi navê Hesenkêf bi nav û deng e. Xelkê wê herêmê jê re îta'et kiriye û bi hev re ew keleya li wir restore kirine. Siltanê Mêrdînê bi armanca girtina Keleya Hesenkêfê leşker şandibe ser wan jî li hemberî wan têk

çûye. Bi vî awayî otorîteya wan cî girtiye û xurt bûye (Şerefname, r.194). Cegerxwîn ji ber navê wî kesê ji binemala Eyyûbiyan nayê zanîn wek rêvebirê yekem ê vê mîrektiyê Melik Silêmanê kurê wî daye û di bîst û du malikan de li ser dozdeh mîrên Hesenkêfê rawestiye. Cegerxwîn sernavê "Melekanê Hesenkêf" bi kar aniye ku di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Fermanrewayên Hisnkeyfê de ne ku bi Navê Melikan bi Nav û Deng in" derbas bûye.

11/1 Silêman rabe ser xwe, birc û eywan
259 Di bajarê Hesenkêf bûne wêran

11/2 Hesenkêf e welê bêkêf e îro
260 Di destê dijminan de maye, mîro

Melik Silêmanê kurê wî emîrê Eyyûbî ye. Desthilata Melik Silêman, heta dema dawiya Dewleta Cengîz a sala 736ê k./1337ê z. dewam kiriye. Piştî wî kurê wî Melik Mihemmed li ser textê mîrektiyê rûniştiye (Şerefname, r.196). Cegerxwîn di van herdu malikên li jor de ji bo ji destderketina Hesenkêfê bangî Melik Silêman kiriye ku were wêranbûna welatê xwe bibîne. Ew, xemgîniya xwe ya ji destderketina Hesenkêfê bi hestên Hesenkêfê (bêkêfî) daye ku di vir de hunera teşxîsê bi kar aniye.

11/3 Muhemmed rabe ser xwe zû binêre
261 Welatê te bi carek zîv û zêr e

11/4 Temaşake li Hesar û Kefircoz
262 Di destê dijminan de mane bê doz

Melik Mihemmedê (Muhemmedê) kurê Melik Silêman li cihê bavê xwe li ser textê fermanrewatiyê rûniştiye. Kar û barên dewletê bi awayekî baş meşandine. Karên welat ewqas baş bi rê ve birine ku bûye yek ji wan mezinê fermanrewayê berpirsiyar û siyasetmedarê bi nav û deng. Ew, heta çûye rehma Xwedê bi siltan û haqanên Îranî yên Tirk û Tatar re siyasetek xweşiyê borandiye (Şerefname, r.196). Cegerxwîn di van malikên li jor de ji bo qîmeta welat bide xuyakirin welat şibandiye

zîv û zêr. Ji ber ku Hesar û Kefircoz (Kercews) di bin hikumdariya Mîrektiya Hesenkêfê de bûye, Cegerxwîn ji Melik Mihemmed xwestiye halê di Hesar û Kefircozê yê di bin destê dijmin de temaşe bike. Bi vî awayî wî, rewşa van herêman a îro ber bi çav kiriye.

11/5 Gelek şerm e heleste ey tu Adil
263 Welatê te bi carek bûye kavil

11/6 Ji Sêrtê ta biçî Tor û Bişêrî
264 Nema karî li wan îro binêrî

Melik Adilê kurê Melik Mihemmed e, li ser wesiyeta bavê xwe li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Di nav hevwelatiyên xwe de hîmên dadmendî û wekheviyê avêtiye. Ew di payebilindî, şan û şohretê de ji emsalên xwe û ji hikumdar û mîrên malbata xwe borandiye. Di sala 781ê k./1380yê z. de çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.196). Cegerxwîn li ber kavilbûna welat bêdengmayinê şerm dîtiye. Bi vê helwestê Cegerxwîn ji Melik Adl re gotiye ku rabe (heleste), halê wêran ê welat binêre.

11/7 Melek Eşref nizanim bê tu kanî?
265 Ez im ew xortê Kurdê Gurdelanî

11/8 Tu bapîrê min î ey mîrê Zengîn
266 Ji derdê we niha bûme Cegerxwîn

Melik Eşrefê kurê Melik Adil e, piştî mirina bavê xwe li ser textê fermanrewatiyê rûniştiye. Ew hevdemê Emîr Kurganî bûye. Li gor Şerefxan ji Alî el-Yezdî neql kiriye di sala 796ê k./1394ê z. de Emîr Tîmûr dema Bexdayê girtiye û ji wir hatiye Ruhayê berpirsiyarê Hesenkêfê çûye cem wî û îta’eta xwe jê re pêşkêş kiriye û bi musa’eda wî vegeriyaye welatê xwe. Heta çûye rehma Xwedê rewşa wî bi vî awayî bûye (Şerefname, r.196-197). Cegerxwîn derbasbûna serdema mîrektiyan û bêseroktiyê bi xemgînî aniye zimên. Ew li Melik Eşref pirsiye ku Melik Eşref li ku

ye? Bi rastî dizanibe ku serdema Melik Eşref derbas bûye û Melik Eşref miriye jî bi riya tecahula ‘arif lê bipirse û wî bi bîr aniye. Cegerxwîn sedemê xemgîniya xwe (Cegerxwîniya xwe) bi xelasbûna serdema mîrektiyan ve girêdaye.

11/9 Xelîl rabe Melek Kamil bi nav î
267 Xwedanê zêr û zîv û pir derav î

11/10 Welatê me kete bin destê dijmin
268 Belê dîsa ji me dijmin ditirsim

Melik Xelîlê kurê Melik Eşref, piştî mirina bavê xwe bi hilbijartina eşîret û qebîleyan li cihê bavê xwe rûniştiye. Leqeba wî Melik Kamil e. Dema ku di sala 824ê k./1422yê z. de Mîrza Şahrûxê kurê Emîr Tîmûrê Kurganî, ji bo êrîşên Qere Yûsif berteref bike hatiye Wan û Westanê, Melik Xelîl çûye pêşwaziya wî. Dema Mîrza Şahrûx destûra vegerê daye mîrên Kurdistanê ew jî vegeriyaye wilayeta xwe. Serdema wî bi serbilindî û serfirazî derbas bûye. Ew di sala 862yê k./1458ê z. de wefat kiriye (Şerefname, r.197). Cegerxwîn, Melik Xelîl bi nasnava wî Melik Kamil bi bîr aniye. Wî behsa dewlemendiya Melik Xelîl kiriye, lê di *Şerefname*yê de di derheqê dewlemendiya wî de agahî nehatiye dayin. Cegerxwîn bi vê şêwazê xwestiye dewlemendiya desthilatdariya Kurdan rê bide. Kurd dewlemend û xwedî desthilat bûne lê îro ketine bin destê dijmin. Li gor nêrîna Cegerxwîn; ji rihê têkoşînê û şoreşê ne bêpar in, lê tiştê ne li rê dijminên hevudu ne.

11/11 Xelef rabe tu mîrê çak û çavsor
269 Bike qîrîn li Kurdê jêr û hem jor

11/12 Bi şûrê xwe tu bişkîn çerxê etles
270 Cîhan tev de bike wêran û bêkes

Melik Xelefê kurê Silêman, biraziyê Melik Xelîl e û piştî mirina apê xwe li ser textê Mîrektiya Hesenkêfê rûniştiye. Di nav Kurdan de bi navê “Çavsor Xelef” hatiye naskirin. Serokatiya eşîret û qebîleyan bi awayekî baş bi rê ve biriye. Ji ber

şervaniya di şerê di navbera wan û Bohtiyan de xelkê navê “Xelefê Bavê Cûtê Şûran” lê danîne. Tirkmemên Aqqoyunî ji bo Kela Hesenkêfê bigirin derûdora kelê girtine lê negihiştine armanca xwe. Li ser vê Tirkmenan biraziyê Melik Xelef di bin re xapandine û ji bo mîrektiya Hesenkêfê soz dane wî. Wî jî apê xwe kuştiye, herwiha rêvebiriya Hesenkêfê ketiye destê Tirkmenan (Şerefname, r.198). Wek Cegerxwîn jî diyar kiriye Xelef mîrekî çak e û bi nasnavê “çavsor” hatiye naskirin. Cegerxwîn ji ber mêr û mêrxasiya vî mîrî bi awayekî sembolîk daxwaza hişyarkirina Kurdan jê kiriye. Cegerxwî di wê baweriyê de bûye ku ew ê dikaribe nexşeya siyasî bi şer û cengê, bi şûrê xwe biguherîne. Jixwe li gor Cegerxwîn ji du riyên xelasiyê yek şer û ceng e, ya din jî zanyarî û xwendine.

11/13 Xelîl rabe cîhan rengîn e îro
271 Li nav Kurdan tenê dengîn e îro

11/14 Gur û berx û beran tev de dirazin
272 Belê Kurdên me îro tev dibazin

Melik Xelîlê kurê Melik Silêman e. Dema Tirkmenan Kurdistan îstila kirine wî xwe li bajarê Hemayê veşartiye. Bi lewazbûna otorîteya Aqqoyuniyan Melik Xelîl bi alîkariya Mîr Şah Mihemmedê Şêrwanî û eşîretên Hesenkêfê welatê xwe ji bin destê Aqqoyuniyan rizgar kiriye. Di wê demê de di nav Mîrektiyên Kurdistanê de bi şan û şohret tu kes negihîştiye serweriya wî. Di nav mîrên Kurdan ên ji aliyê Şah Îsmaîl ve hatine girtine de Melik Xelîl jî hebûye. Melik Xelîl ji ber bi xwişka Şah Îsmaîl re zewicî bûye, jina wî û zarokên wî jî anîne Tebrîzê. Melik Xelîl bi vî awayî sê salan li Tebrîzê maye. Di vê muddetê de desthilatdariya Hesenkêfê di destê Qizilbaşan de bûye. Dema Şerê Çaldiranê firset ketiye destê Melik Xelîl, ew gihîştiye Hesenkêfê. Wî welatê xwe ji bin desthilatdariya Qizilbaşan derxistiye, kurê wî yê dema ku ew di zindanê de bûye ji aliyê eşîretan ve wek desthilatdar hatiye hilbijartin jî jê re îta’et kiriye. Melik Xelîl çar kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.198-201). Cegerxwîn, hêvî kiriye ku cesaret û serfiraziya Melik Xelîl ji bo Kurdan bibe mînak. Melik Xelîl tu car têkoşîn ji dest bernedaye. Wî hem bi lewazbûna Aqqoyuniyan welatê xwe ji bin destê wan derxistiye, hem jî dema

firset dîtiye desthilatdariya Qizilbaşan a li ser axa welatê xwe şikandiye. Cegerxwîn ji bo dema xwe îttifaqên dijmin bi metafora “yekîtiya gur, berx û Beran” daye berçavan. Ji ber îttifaqa Kurdan tune ye, Kurd dûrî hev diçin û dibazin Cegerxwînî ew rexne kirine.

11/15 Hisên rabeli çolan e gerra me
273 Gelek xweştir ji çola Misr û Şam e

11/16 Hemî naz û binefş û xunc û beybûn
274 Demek ew bûn, demek ev bûn hemî çûn

Melik Huseyînê (Hisênê) kurê Melik Xelîl, xortekî serbilind û qencîxwaz bûye. Lê çawa hatiye ser desthilatdariyê herdu birayên xwe daye girtin. Birayê wî yê din Melik Silêman bi daxwaza paşde stendina hikumeta bavê xwe, ji Xusrev Paşayê Mîrêmîranê Amedê alîkarî xwestiye. Li ser vê Melik Huseyîn û herdu birayên wî yên girtî anîne Dîwana Osmanî ya Diyarbekrê û emrê kuştina Melik Huseyîn dane (Şerefname, r.200-201). Ji ber nesla Hisên ji Misr û Şamê hatiye Cegerxwîn çola gerra xwe bi çola Misr û Şamê re daye berhev. Wî xweşikiya welat bi “naz, xunc û beybûn” bi bîr aniye. Ji aliyê din ve guhertina desthilatdariyê bi gotina “demek ew bûn demek ev bûn” îfade kiriye.

11/17 Silêman rabe ser xwe mîrê mîran
275 Welatê te bi carek bûye wêran

11/18 Li alîkî me hawar û girîn e
276 Li alîkî me zar û ah û şîn e

Melik Silêmanê kurê Melik Xelîl, bi alîkariya Xusrev Paşayê Mîrêmîranê Amedê û bi fermana Siltan Silêman Xan hatiye ser desthilatdariya Hesenkêfê. Lê herdu birayên wî li hemberî wî ketine nav şerê îqtidarê. Eşîret û qebîleyên welat jî ji ber kuştina Melik Huseyîn aciz bûne û li hemberî wî serî hildane. Melik Silêman li ser vê, dev ji rêveberiyê berdaye. Wî bi fermana Siltan Silêman Xan, di cihê

Hesenkêfê de rêvebirina desthilata Ruhayê girtiye. Melik Silêman piştî demekê di ser desthilatdariya Ruhayê de derbas bûye wefat kiriye (Şerefname, r.203). Cegerxwîn bal nekişandiye ser dema Melik Silêman, Cegerxwîn bal kişandiye ser roja xwe ku ji ber wêranbûna welat di nav xemgîniyekî çawa de ye.

11/19 Muhemmed rabe ser xwe ey şehê min
277 Hawar û ah û zarîn tê guhê min

11/20 Li jorî me binêre deng û halan
278 Li jêrî me binêre terş û talan

Melik Mihemmedê kurê Melik Xelîl e, piştî mirina birayê wî Ruha jê hatiye stendin, Erebgîr û piştre Bedlîs jê re hatiye dayin. Lê ji ber bacgirtina dîwanê bêzar bûye û ji ber dostiya wî bi Bedir Begê Mîrê Cezîrê re hebûye, jiyana xwe ya mayî li Cezîrê derbas kiriye. Dema çûye rehmetê yanzdeh kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.203). Cegerxwîn, di malikên di jor de tevlîheviya ketiye nav welat diyar kiriye û bi îfadeya "li jorê me-li jêrê me" perçebûna welat daye ber çavan.

11/21 Were Sultan Hisên bê kotek û zor
279 Ji Sîwasê tu bigre ta bi Deynûr

11/22 Bes e yan dê bijîn yan dê bibin ax
280 Hezar ax û hezar ax û hezar ax

Melik Siltan Huseyinê (Sultan Hisênê) kurê Melik Mihemmed e, sencaqa bavê wî jê re hatiye dayin. Wî çend caran ev kar guherandiye û ew jî wek bavê xwe bêzar bûye, destê xwe ji wê erka giran kişandiye. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin, Melik Siltan Huseyîn jiyana xwe li Kurdistanê domandiye û behra weqfên ji bav û bapîrên xwe sûdê wergirtiye (Şerefname, r.203). Cegerxwîn bi van herdu malikên dawî hêviya xwe ya girtina axa Kurdistanê carek din nivîsandiye ku yan wê bi awayekî serfiraz bijîn yan jî bimirin û bibin ax. Wî xemgîniya xwe ya ji dil di risteya dawî de bi "hezar ax"î dubare kiriye.

**Tablo 3.2.11.**Mîrên Hesenkêfê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Melîk Silêman, Melik Mihemmed, Melik Adilê kurê Melik Mihemmed, Melik Eşrefê, kurê Melik Adil,Melik Xelîlê kurê Melik Şeref(Melik Kamil), Melik Xelef,Melik Xelîlê kurê Melik Silêman, Melîk Huseyinê kurê Melik Xelîl, Melik Silêmanê kurê Melik Xelîl, Melik Mihemmedê kurê Melik Xelîl, Melik Sultan Huseyinê kurê Melik Mihemmed | Silêman<br>Mihemmed<br>Adil<br>Melek Eşref<br>Xelîl(Melek Kamil)<br>Xelef<br>Xelîl<br>Hisên<br>Silêman<br>Muhemmed<br>Sultan Hisên |
| Dem | Sedsalên XIII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Misir, Şam, Mêrdîn, Hesenkêf, Sêrt, Bişêrî, Tor, Erzen | Hesenkêf, Heser, Kefircoz Sêrt,Tor,Bişêrî,Gurdelanî, Misir, Şam |

### 3.2.12. Mîrên Çemîşgezekê

Mîrektiya Çemîşgezekê tevî Mîrektiyên Micengerd, Pertek û Seqmanê bûye sê şax. Cegerxwîn li ser her şaxekî menzûmeyek nivîsandiye. Wî di menzûmeya "Beganê Çemişgizk" de bi deh malikan behsa pênc mîrên Çemişgezekê (Çemişgizkê) kiriye. Di *Şerefname*yê de agahiyên di derheqê vê mîrektiyê bi sernavê "Di Derheqê Fermanrewayên Çemîşgezekê de ye" cih girtiye.

12/1 Were rabe ji Çemişgizk tu Milkêş
281 Direfşa Kaweyanî zû bide pêş

12/2 Li alîkî me Turk û yek Qizilbaş
282 Li pêş ceng e weha reng e serûpaş

Li gor dîrokzanan Mîrektiya Çemîşgezekê digihîje yekî bi navê Melkiş (Milkêş) ê yek ji zarokên Xelîfeyên Ebbasiyan. Lê li gor hin rîwayetên din Melik Şah, kurê Mihemmedê neviyê Emîr Salîqê rêveberî Erzen-i Rûm[293]bûye û ew ji nesla şaxekî Selçûkiyan e. Wer xuya ye ku Mîrên Çemîşgezekê ji nesla Melik Şah hatine. Îhtimal e ku gotina Melik Şah di zimanê Kurdî de guheriye û bûye Melkiş. Melkiş, sî û du kele û şanzdeh nahiye kirine bin desthilatdariya xwe. Ev cih piştre ketine destê kur û neviyên wî (Şerefname, r.210). Di hersê nusxeyên *Şerefname*yê yên li ber destê me ne navê wî wek Melkiş derbas bûye. Lê Cegerxwîn ev nav wek Milkêş nivîsandiye. Herwiha Cegerxwîn Tirk û Qizilbaşan wek dijminên herdu serdeman (dema borî û dema niha) rê daye ku ev milletên cîranê Kurdan in. Cegerxwîn xelasiya ji bin zilm û zora wan di têkoşîna şer û cengê de dîtiye. Wî behsa direfşa (senceq) Kaweyanî kiriye. Wek me li jor jî gotiye, Kawa temsîla mîta ji destê dijmin rizgarbûnê ye.

12/3 Hesen rabe tu şêx û hem tu mîr î
283 Egîd û mêr û saha qubd û jîr î

12/4 Bi destê xwe tu bigre şûrê devtûj
284 Digel dijmin bikin cengê şev û roj

Li Çemîşgezekê heta dema Şêx Hesenê kurê Emîr Yalîman rewş baş bûye. Di wextê wî de li Îranê seltenat ketiye destê Hesen Begê Bayenderî. Ew ji bo ji holêrakirina Mîrektiya Çemîşgezekê eşîreta Xerbendelû ya ji şaxek Aqqoyunî[294] ajotiye ser wilayeta Çemîşgezekê. Xerbendelûyan wilayet ji Emîr Şêx Hesen stendine. Şêx Hesen xortekî mêr, mêrxas, camêr û gelek nefsbiçûk bûye. Ew li hemberî Eşîreta Xerbendelû derketiye, ew ji welatê xwe derxistine û welat bi

[293] Erzen-i Rûm, niha bi navê Erzirûmê tê zanîn.
[294] Di wegera Ziya Avcî (r.210) de Xerbendelû wek Qereqoyunî derbas bûye; lê di ya İbrahim Sunkur (r.215) û Abdullah Yegin (r.211) de wek Aqqoyunî hatiye nivîsandin ku diyar e di nusxeya wergera Ziya Avci de tevlîheviyek pêk hatiye.

dadmendî bi rê ve biriye (Şerefname, r.211). Cegerxwîn wesfên Şêx Hesen li gor *Şerefname*yê rêz kirine. Şêx Hesen welatê xwe ji îstîlaya Aqqoyuniyan xelas kiriye, ji bo xelasiyê di dema niha de jî pêdivî bi cengeke wisa dîtiye.

12/5 Were Sehrab tu rabe ey begê çê
285 Ew e ê çê ku her dem qencî jê tê

12/6 Ji bo Kurdan bigêre her civatê
286 Belê îro dema kar û xebatê

Sohrab (Sehrab), piştî mirina bavê xwe rêvebirî girtiye destê xwe û qasekê hikumdarî kiriye. Li pey wî jî kurê wî Hacî Rustem Beg rûniştiye (Şerefname, r.211). Di derheqê wesfên Sohrab de di *Şerefname*yê de tu agahî tune bin jî Cegerxwîn mîrên Kurdan her tim bi wesfên baş rêz kirine. Ji bo Sohrab jî wesfên çak û qencîxwazî layiq dîtine.

12/7 Were Ristem begê min ey tu Hacî
287 Tu deyne ser serê xwe tac û gacî

12/8 Bi destê xwe tu bigre şûrê Ristem
288 Digel dijmin bikin cengê di her dem

Di dema Hacî Rustem (Ristem) Begê kurê Sohrab de, Şah Îsmaîlê Sefewî derketiye ser text. Şah Îsmaîl ji begên Qizilbaşan Nur Elî Xelîfe ji bo îstilaya Çemîşgezekê şandiye. Hacî Rustem bê şer welatê xwe teslîmê Nur Elî Xelîfe kiriye. Ew çûye cem Şah Îsmaîl û îta'eta xwe jê re pêşkêş kiriye. Lewma Şah, wek xelat ji dêvla Çemîşgezekê li Iraqê perçeyek erd daye wî. Nur Elî Xelîfe, gelek kesên ji malbata Melkişiyan kuştine, zilm û zordarî kiriye. Di Şerê Çaldiranê de Hacî Rustem bi şikandina hêzên Şah Îsmaîl çûye cem Siltan Selîm Xan. Lê Siltan di heman rojê de ji ber di sala 878ê k./1474ê z. de Hacî Rustem nehiştiye Kela Kemaxê têkeve destê Osmaniyan û dawiyê bê şer teslîmê mirovên Şah Îsmaîl kiriye ji bo tolstendinê fermana kuştina wî û neviyê wî, çil kesên serok û giregirên Eşîreta Melkişî daye

(Şerefname, r.211-212). Cegerxwîn ji dêvla têkçûna Hacî Rustem behsa rêvebiriya wî kiriye. Wî, di navbera navê wî û Rustemê Zal de peywendî daniye û wek şîret li hemberî dijmin di her demê de pêwistiya şerê çekdarî daye.

12/9 Were, rabe tu îro Pîr Hisên Beg
289 Jime kuştin neyaran sed hezar lek

12/10 Temaşake Ferat û Zab û Ceyhûn
290 Ji ber xwîna me Kurda tev de zer bûn

Pîr Huseyîn (Hisên) Begê kurê Hacî Rustem, mirovekî gelek baş bûye. Dema kuştina bavê xwe bihîstiye, li Iraqê bûye. Ji bo here cem Siltanên Çerkezên Misrê Iraq terk kiriye. Li Melatyeyê bûye mêvanê Memay Begê rêvebirê Siltanên Çerkezan û ev rewşê bi wî şêwiriye. Memay Beg çûyina wî ya ber bi Seraya Osmanî pêşniyar kiriye. Li ser vê biryar daye ku here cem Siltan Selîm Xan. Siltan li cesareta wî ecêbmayî maye, qedir û qîmetek gelek zêde daye wî. Bi fermana padîşah wezîfeya Mîrektiya Çemîşgezekê girtiye destê xwe. Pîr Huseyîn piştî şerek bi şîddet, Qizilbaş ji welatê xwe derxistine û bûye mîrê serbixwe yê welat. Sî salên temam bi serbilindî welat bi rê ve biriye û piştre çûye rehma Xwedê. Ew şazdeh zarokên kur li pey xwe hiştine. Piştî mirina wî kurên wî li ser xerabûn û bêdewletiyê îttifaq kirine. Ji bo vê yekê çûne cem Siltan Silêman Xan, Siltan jî li gor daxwaza wan Çemîşgezekê, mulkê Siltan ên taybet ne tê de bi ser du senceq û çardeh tîmar û zeametan de parve kiriye (Şerefname, r.213-215). Cegerxwîn bangî Pîr Huseyîn Beg kiriye ku were rewşa Kurdan a nebaş bibîne. Ji ber Kurd bindest in û hatine kuştin, Cegerxwîn kuştina Kurdan a ji aliyê neyaran ve, bi zerbûna çemên Ferat, Zab û Ceyhûnê yê ji xwîna Kurdan daye berçavan.

**Tablo 3.2.12.** Mîrên Çemîşgezekê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
| --- | --- | --- |
| Şexsiyetên Dîrokî | Melkiş, Şêx Hesenê kurê Emîr Yaliman, Sohrab Begê kurê Hesen Beg, Hacî Rustem Begê kurê Sohrab, Pîr Huseyîn Begê kurê Hacî Rustem | Milkêş<br>Hesen<br>Sehrab<br>Ristem<br>Pîr Hisên Beg |
| Dem | Sedsalên XII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Çemîşgezek | Çemişgizk |

### 3.2.13. Begên Micengerdê

Menzûmeya Cegerxwîn a di derheqê begên Micengerd (Mecenkurd)[295] de ji dozdeh malikan pêk hatiye ku di vir de Cegerxwîn li ser her şeş mîrên wê binemalê sekiniye. Menzûme bi sernavê "Beganê Mecenkurd" derbas bûye. Di *Şerefname*yê de Micengerd wek şaxê yekem ê Mîrektiya Çemîşgezekê derbas bûye. Nahiya Micengerdê li ser fermana Siltan Silêman Xan, bi riya senceqê ji Mihemmedî Begê kurê Pîr Huseyîn Beg re hatiye dayin (Şerefname, r.216). Cegerxwîn ji bo vê mîrektiyê gotina Mecenkurd tercîh kiriye ku di hin peyvên din ên tê de "gerd/gird" derbas dibin jî wek Kurd diyar kiriye.

13/1 Muhemmed ey egîd û pak û mêrxas
291 Li ser textê Mecenkurd rûne gernas

13/2 Binêre ka welatê me çilo ye?
292 Hemî îro dibin destê 'Elo ye

Mihemmedî (Muhemmed) Begê kurê Pîr Huseyîn Beg, tenê salekê rêvebirî kiriye û piştre miriye. Çar zarokên kur ên ji bo rêvebiriyê temenên wan gelek biçûk li pey wî mane. Lewma bi fermana Siltan Silêman Xan, birayê wî Feruxşad Beg hatiye

[295] Di wergera Abdullah Yegin (r.216) de bi navê Micingirt, di wergera İbrahim Sunkur (r.220) de bi navê Mecengert(Melezgirt) derbas bûye.

ser desthilatdariyê (Şerefname, r.216). Mihemmedî Beg li gor rêza *Şerefname*yê di Beganê Mecenkurd de hikumdarê yekem ê vê mîrektiyê ye. Cegerxwîn piştî wesfên Mihemmedî Beg ên cengawerî daye carek din bal kişandiye ser rewşa welat a roja xwe. Dijmin di vir de “Elo” ye, mihtemel e ku ji Elo qest Dewleta Elî Osman be navê Elî Osman hatiye biçûk dîtin û xerakirin. Di serî de îhtimala Nur Elî Xelîfe yê Qizilbaş bê hişê mirov jî di wê serdemê de Nur Elî Xelîfe têk çûye û welat ji destê wî hatiye derxistin. Lê Cegerxwîn dibêje hemû welat îro di bin destê ‘Elo de ye. Berî Peymana Lozanê perçeyê di bin destê Îranê ne tê de hemû welat di bin destê Osmaniyan de bûye. Herwiha îhtimal heye ku ji aliyê hunerên edebî ve telmîha vê gotina pêşiyan be: Desthilatdarê me Elo be, xwarina me çilo ye. Di vir de di navbera peyva çilo (kewş) û çilo (çawa) de cînasek heye.

13/3 Ferxşad Beg tu rabe mîrê zana
293 Welatê te kete destê nezana

13/4 Hemî zozan û deşt û kanî û çirk
294 Mecenkurd bû neha bûye Mecentirk

Feruxşad (Ferxşad) Begê kurê Pîr Huseyîn Beg, piştî çend salan rêvebirî kiriye di navbera wî û birayên wî de dubendî derketine. Birayên wî ew bi îxanetî malê Siltan sucdar kirine û di vî warî de ji dergaha Siltan re raporek pêşkêş kirine. Li ser vê fermana kuştina wî hatiye dayin. Li pey wî du zarokên kur mane ku ji bo herdu kurên wî ji senceqa Micengerdê zeametek hatiye cihêkirin (Şerefname, 216).Cegerxwîn ji ber welat ketiye bin destê Tirkan û Tirk rêvebirê Kurdan tayin kirine bangî Feruxşad kiriye û vê rewşê bi risteya “Mecenkurd bû neha bûye Mecentirk”îfade kiriye.

13/5 Were Pêlten Begê mêr û serifraz
295 Welatê te niho bêdeng û awaz

13/6 Herê ew çol û deşt û av û kanî
296 Hemî îro ji bo me bûn xizanî

Pîleten (Pêlten) Begê kurê Mihemmedî Beg, li ser ricaya Rustem Begê Pertekî ya ji Siltan Silêman Xan re hatiye ser desthilatdariya mîrektiyê. Piştî kuştina Feruxşad Beg Siltan senceqê daye destê Qasim Begê birayê mîrêmîranê Erzirûmê. Dema ferman ji bo desthilatdariya wî derketiye, Pîleten Beg bi Serdar Mistefa Paşa re li sefera Şêrwanê bûye. Li ser vê xeberê bi rê ketiye, lê li Tercanê wefat kiriye û negihîştiye mirazê mîrektiyê. Li pey xwe çar kur hiştine (Şerefname, r.216). Cegerxwîn gotiye ku "çol û deşt û av û kanî ji bo Kurdan bûne xizanî" ango ji destê wan derketiye, êdî ne mal û milkên wan e. Ji ber vê rewşê welat bêdeng maye.

13/7 Alî Beg rabe ser xwe ey dîlawer
297 Welatê te bi carek zêr û gewher

13/8 Welatê me ne bes tenha Mecenkord
298 Ji bo Kurdan hemî jan û hemî derd

Elî (Alî) Begê kurê Pîleten Beg e. Piştî mirina bavê xwe bi fermana Siltan Murad Xan bûye desthilatdarê Micengerdê. Elî Beg çend rojan kar û barên Micengerdê meşandiye. Ew sê kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.216-217). Cegerxwîn xweşikiya welat û xemgîniya xwe ya ji destderketina welat carek din bi van malikên li jorê dubare kirine.

13/9 Were Heyder Begê, rabe bi nazî
299 Li Kurmanca seraser rake gazî

13/10 Bi şûr bigre, were pêşî neyara
300 Bikin cengê digel wan rengê cara

Heyder Begê kurê Elî Beg, ji aliyê Dîwana Siltan Murad Xan ve bûye rêvebirê senceqê. Lê berî ku bibe şah ew wefat kiriye (Şerefname, r.217). Cegerxwîn ew jî bi bîr aniye û xistiye nav rêvebir û cengawerên Kurd.

13/11 Elah-wêrdî tu rabe ey Xwedê da
301 Bi serbestî tu carek bêje Kurda

13/12 Binêre ew sera û birc û eywan
302 Hemî xan in ji bo bergîlê Tirkan

Allahwêrdîyê (Elah-wêrdiyê) kurê Elî Beg, piştî mirina birayê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin di sala 1005ê k./1597ê z.[296] de Allahwêrdî, li ser desthilatdariya Micengerdê bûye (Şerefname, r.217). Ji ber navê Allahwêrdî bi Tirkî ye Cegerxwîn di bangkirina wî de wateya navê wîya bi Kurdî jî dubare kiriye. Di vir de bi taybetî bal kişandiye ser ji destderketina desthilatdariyê. Seray, birc û eywanên welat bûne xan û ketine ber lingên bergîlê Tirkan ango serwerî û hikumdarî ketiye destê Tirkan.

**Tablo 3.2.13.** Begên Micengerdê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Mihemmed Begê kurê Pîr Huseyîn Beg, Feruxşad Begê kurê Pîr Huseyîn Beg, Pîletenê kurê Mihemmedî Beg, Elî Begê kurê Pîleten Beg, Heyder Begê kurê Elî Beg, Allahwêrdiyê kurê Elî Beg | Muhemmed<br>Feruxşad<br>Pêlten<br>Alî Beg<br>Heyder<br>Elah-werdî |
| Dem | Sedsala XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Micengerd | Mecenkurd |

### 3.2.14. Mîrên Pertekê

Wek li jor jî me behs kiribû wilayeta Çemîşgezekê piştî mirina Pîr Huseyîn Beg, wek du senceq û çend zeamet hatiye parvekirin. Nahiya Pertekê bi fermana

[296] Di wergera Ziya Avci (r.217) de tenê sala 1005ê k. yê roja duşemba 18ê meha Remezanê hatiye nivîsandin. Di wergera İbrahim Sunkur (r.222) de tevî dîroka koçî ya zayinî jî di nav kevanekê de (1597) cih girtiye. Di wergera Abdullah Yegin (r.217) de jî tevî dîroka koçî di nav kevanekê de ya zayinî jî (5ê Gulanê 1597) hatiye nivîsandin.

Dîwana Siltan Silêman Xan, ji Rustem (Ristem) Begê kurê Pîr Huseyîn re hatiye dayin (Şerefname, r.218). Cegerxwîn jî li ser vî hîmî menzûmeya“Beganê Pertek” nivîsandiye û bi çar malikan behsa vê mîrektiyê kiriye. Di *Şerefname*yê de bi sernavê “Di Derheqê Fermanrewayên Pertekê de ye” derbas bûye.

14/1 Binê Ristem li Pertek rengê gulşen
303 Belê Kurd in şikestî tê de Bêjen

14/2 Kemer bavê milê xwe lawê Zalê
304 Tu me derxe wekî Bêjen ji çalê

Rustem (Ristem) Begê kurê Pîr Huseyîn, kar û barên welat demek dirêj bi rê ve birine. Dema çûye rehma Xwedê sê zarokên kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.218). Cegerxwîn bi şibandina nav, di navbera wî û Rustemê Zal de peywendiyek daniye û çawa Rustemê Zal Bêjen ji çalê ango ji bîrê xelas kiriye, pêwîst e Rustemê kurê Pîr Huseyîn jî li hawara Kurdan were.

14/3 Were Paysenqerê qêrîn birûskî
305 Were ey fihrisê awir çirûskî

14/4 Bike qêrîn li xwînxwar û neyara
306 Weke awazê tavanê bihara

Baysungurê (Baysenqur/Paysenqer) kurê Rustem Beg, piştî mirina bavê xwe bûye desthilatdar. Baysungur mirovekî biaqil, zîrek û zana, siyasetmedarekî baş û bifehm bûye. Wesfên wî yên baş, ew di nav mîrên Kurdistanê de aniye payeyek bêemsal. Ew di warê edebiyatê de xwediyê karakterek nazik bûye, di warê zanistî û hunera musîqî de jî xwediyê zanyariyek mezin bûye. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin wî li Pertekê bi awayekî serbixwe kar û barên mîrektiyê bi rê ve birine (Şerefname, r.218). Cegerxwîn behsa wesfên wî yên egîdî û mêrxasiyê kiriye; lê behsa zanyariya wî ya di warê din de neaniye zimên. Ji bo Cegerxwîn zanyarî

hêmanekî gelek girîng e, lê behskirina bindestiya axa welat û mayina li ber destê neyaran girîngtir e û hêmana behskirinê ya yekem e.

**Tablo 3.2.14.** Mîrên Pertekê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Rustem Begê kurê Pîr Huseyîn<br>Baysungurê kurê Rustem Beg | Ristem<br>Paysenqer |
| Dem | Sedsala XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Pertek | Pertek |

## 3.2.15. Begên Seqmanê

Dema li ser daxwaza zarokên Pîr Huseyîn wilayeta Çemîşgezekê hatiye parvekirin, Seqmanê bi qesebeya Çemîşgezekê ve kirine nav mulkên taybet yên padîşah. Ji ber hersê kurên Pîr Huseyîn ên bi navê Keyxusrev, Keykawis û Perwîz ên ji dayikek hê zarok bûne bi zeamet û tîmaran qeneet anine. Lê dema mezin bûne bi daxwaza mafên xwe çûne Asîtaneyê. Siltan ferman derxistiye ku Nahiya Seqmanê wek senceq bidin Keyxusrev, ji her du birayên wî re jî zeametên nû bên dayin (Şerefname, r.219). Cegerxwîn bi menzûmeya xwe ya "Beganê Seqman" di deh malikan de behsa pênc mîrên vê senceqê kirine. Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Begên Seqemanê de ne" derbas bûye.

15/1 Tu Keyxusroy egîd û mêr û segvan
307 Bi gernasî tu rûnê textê Seqman

15/2 Welatê me binêre çendî jar e
308 Belê jar e ji ber xeşma neyar e

Keyxusrev (Keyxusroy) Begê kurê Pîr Huseyîn e, demeke dirêj di nav aramiyê de hikum kiriye, sê kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.219). Cegerxwîn hatina wî ya ser text ango hikumdariya wî daye berçav û pesnê

Keyxusrev ê xweşmêriyê bi peyvên "egîd, mêr, segvan û gernas" diyar kirine. Ew bi bangkirina Keyxusrev, xwestiye ji ber xweşma neyar welat çawa perîşan, rezîl û riswa bûye bîne zimên.

15/3 Were Salih Begê rabe bi merdî
309 Temaşake li êş û derdê Kurdî

15/4 Tu jîndar î meger şah î li Seqman
310 Ji Kurdan re nehin îro çi derman

Salih Begê kurê Keyxusrev Beg, piştî mirina bavê xwe hatiye ser text. Birayê wî Omer Beg desthilatdariya wî qebûl kiribe jî li hemberî wî bi kîn û nefret bûye, rojekê firset dîtiye û Salih Beg kuştiye. Bi vî awayî bi riya xesb û zilmê rêvebirî ketiye destê Omer Beg û wî xwe mîrê welat îlan kiriye (Şerefname, r.220). Di van malikên di jor de Cegerxwîn Salih Beg wek jîndarekî fikiriye ku di temamê *Şerefnameya Menzûm* de ev şêwaz hatiye dîtin. Cegerxwîn êş û derdên Kurdan ên mezin bi bîr anîne.

15/5 Umer Beg rabe ser xwe zû di îro
311 Li qilqê me binêre ey tu mîro

15/6 Binêre em bi carek bûne parsek
312 Belengaz in nehin palas û doşek

Omer (Umer) Begê kurê Keyxusrev Beg, piştî hatiye ser desthilatdariyê xwestiye bi jinbira xwe ya jinebî ya jina Salih Beg re bizewice. Jina Salih Beg ji bo heyfa mêrê xwe jê bigire planek çêkiriye. Wê çend mirovên mêrê xwe yên sadiq ji bo kuştina Omer Beg amade kirine. Roja zewacêwan mirovan êrîşî Omer Beg kiriye û ew kuştine. Piştre jina Salih Beg, ji sê kurên xwe yên ji Salih Beg, bi kurê xwe yê mezin Keyxusrev re çûye Asîtaneyê cem Siltan Murad Xan. Li ser vê fermana desthilatdariyê ji Keyxusrev re derketiye. Dema nivîsandina *Şerefname*yê Keyxusrev Beg li ser îdareya hikumeta Seqemanê bûye (Şerefname, r.220). Di *Şerefname*yê de

Omer Beg ji ber îxaneta li birayê xwe kiriye bi wesfên nebaş hatiye nivîsîn. Lê Cegerxwîn ji wê demê qutkirî, tenê ji bo pirsgirêkên roja xwe yên belengazî, jar û perîşaniya Kurdan bîne zimên bangî Omer Beg kiriye.

15/7 Tu Keyxusro ye, Keyxusroyê Kurdan
313 Li Kurmanca tu rake deng û halan

15/8 Bike qîrîn li Keykawus li Perwîz
314 Bikin cengê digel lawanê Cengîz

Wek me li jor jî diyar kir; Keyxusrev (Keyxusro), Keykawis û Perwîz hersê kurên Pîr Huseyîn bûne ku dema parvekirina welat ji ber hê zarok bûne zeamet û tîmar ji wan re hatiye dayin. Piştî mezin bûne doza mafên xwe kirine. Li ser vê Keyxusrev bûye rêvebirê Seqemanê. Keykawus û Perwîz jî bi zeametan jiyana xwe berdewam kirine (Şername, r.221). Cegerxwîn di bîranîna van hersê birayan de li hemberî dijmin riya cengê pêşniyar kiriye.

15/9 Qubad û Yûsif û Ye’qûb û Mihsin
315 Kolabî Beg û Yelman Beg çi merd in

15/10 Digel Behlol hemî mîranê Seqman
316 Hemî mêr in xwedanê nav û nîşan

Keyqubad (Qubad),Yûsif,Yaqûb (Ye’qûb),Muhsin (Mihsin),Gulabî (Kolabî), Yalman (Yelman), Behlol (Behlûl) kurên Pîr Huseyîn ên ji parvekirina welat, zeamet para wan ketiye ne û wan ew zeamet,bi rê ve birine (Şerefname, r.221). Cegerxwîn di vir de ji kronolojiya *Şerefname*yê dûr ketiye û ev mîr li gor rêza *Şerefname*yê nedane. Di *Şerefname*yê de ji xeynî herdu birayên Keyxusrev ên ji dayikek ku me behsa wan kir; yên din ên bûne xwediyê zeametê wek Yûsif, Muhsin, Yaqûb, Keyqubad, Behlûl, Gulabî, Yalman (Yaman) hatine rêzkirin.

**Tablo 3.2.15.**Begên Seqmanê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Keyxusrev Begê kurê Pîr Huseyîn Beg, Salih Begê kurê Keyxusrev, Omer Begê kurê Keyxusrev, Keyxusrev Begê kurê Salih Beg, Yûsif Begê kurê Pîr Huseyîn, Muhsin Begê kurê Pîr Huseyîn, Yaqûb Begê kurê Pîr Huseyîn, Keyqubad Begê kurê Pîr Huseyîn, Keykawîs Begê kurê Pîr Huseyîn, Perwîz Begê kurê Pîr Huseyîn,Behlûl Begê kurê Pîr Huseyîn,Gulabî Begê kurê Pîr Huseyîn,Yalman(Yaman) Begê kurê Pîr Huseyîn. | Keyxusroy<br>Salih Beg<br>Umer Beg<br>Keyxusro<br>Keykawus<br>Perwîz<br>Qubad<br>Yûsif,<br>Ye'qûb<br>Mihsin<br>Kolabî Beg<br>Yelman Beg |
| Dem | Sedsala XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Seqeman | Seqman |

### 3.2.16. Mîrên Misdasî[297]

Mîrên Mirdasî di nav xwe de wek Mîrên Egil (Buldukanî), Mîrên Palo û Mîrên Çermokê bûne sê şax. Di *Şerefname*yê de bi sernavê"Di Derheqê Fermanrewayên Mirdasî de ye" derbas bûye. Li gor mirovên berê yên pispor nesla mîrên Mirdasî digihîje Hz. Ebbasê apê Hz. Pêxember. Yekem kesê ji wan, Pîr Mensûrê kurê Seyîd Huseyîn ê el-Arac e. Ew mirovekî dîndar û sofî bûye. Pîr Mensûr ji Hekkariyê bar kiriye çûye nêzî Kela Egilê bi cî bûye. Li wir îbadetxaneyek vekiriye û hemû dema xwe li wir derbas kiriye. Piştî mirina wî Pîr Mûsayê kurê wî

[297] Eşîreta Mirdasî di kele û wilayeta Egilê de rûniştiye, Benîkilabanê (kurên Kilaban), ji pêşiyên wan di bin pêşengiya Mirdasê kurê Idrîsê kurê Nusayrê kurê Nasrê kurê Cemîl de bûye. Mirdasî berê li derûdorê Helebê ya di bin desthilatdariya Fatimiyan de bûne. Di serê sedsala XI. de hatine aliyê Egilê û derûdora wê bi cih bûne (r.224).

cihê wî girtiye. Nav û dengê Mûsa di nav eşîret û qebîleyên Kurdan de belav bûye (Şerefname, r.224).

Cegerxwîn bi menzûmeya “Beganê Mirdas” de behsa van mirovên pêşî yên vê binemalê nekiriye. Ew bi deh malikan behsa serdemên şeş mîrên Mirdasî aniye zimên. Lê di vir de li ser kronolojiya *Şerefname*yê tevlîheviyek heye ku di *Şerefname*yê de di serî de behsa nesla vê binemalê hatiye kirin. Piştî Pîr Mûsa hatiye cihê bavê xwe û Kela Egilê girtiye bûne hikumdarên Mirdasî. Emîr Bulduk û mîrên li pey wî hatine, di nav Mîrên Egilê de cih girtine. Cegerxwîn Emîr Bulduk, Emîr Îbrahîm, Emîr Mihemmed û Emîr Îsa jî di nav mîrên destpêkê yên Mirdasî de daye. Ji ber heman binemalê em jî li gor menzûmeya Cegerxwîn çûn û me ew begên di şaxê Egilê de, di nav menzûmeya “Beganê Mirdasî” de bi bîr anîn.

16/1 Bedir rabe tu pîrê mîrê Mirdas
317 Tu şûrkêş û tu şerbaz û tu gernas

16/2 Were rabe binêre zar û zêrçan
318 Hemî bûne kelaş û xurdê hirçan

Pîr Bedirê kurê Pîr Mûsa, piştî mirina bavê xwe li cihê wî rûniştiye. Wî di nav murîd û terefdaran de ji bav û bapirên xwe derbas kiriye. Ew ji bo li ser selteneta xwe ya me’newî seltenetek maddî jî zêde bike û desthilatek serbixwe ava bike êrîşek giran biriye ser Kela Egilê û kelê bi darê zorê girtiye. Herwiha Pîr Bedir eksê bav û bapîrên xwe yên tenê bi îrşadê re mijûl bûne, rêveberiya desthilata welat jî girtiye destê xwe. Piştî Siltanên Selçûkiyan çav berdane welatê wî, Pîr Bedir naçar maye ku ji welatê xwe derkeve (Şerefname, r.224). Di vir de Cegerxwîn, Pîr Bedir bi wesfên wî yên cengawerî daye nasîn û ji bo welat ketiye bin destê dijmin gazinên xwe kirine. Zar û zêrç bûne xwarina hirçan ku ji hirçan qest dijminê xwînxwar e.

16/3 Eman Bûldeq tu rabe zû şiyar be
319 Tu seglawê derîne lê siwar be

16/4 Bi destê xwe tu bigre gurzê Arî

320 Bike agir bi carek jê bibarî

Emîr Buldukê (Bûldeq) kurê Pîr Bedir e. Dema Pîr Bedir ji ber Selçûkiyan ji welatê xwe derketiye, çûye û xwe avêtiye bin desthilatdariya hikumdarê vî bajarî. Emîr Artûqê fermandarê Alp Arslanê Selçûkî, Kela Meyafariqînê muhasere kiriye û êrîşek tund û giran biriye ser keleyê. Dema Selçûkî ketine keleyê tu kesekî li hemberî wan berewanî kiribin nehiştine. Pîr Bedir jî di vî şerî de hatiye kuştin. Bi vî awayî kesek ji mîrên Egilê nemaye. Jina Bedir wê çaxê bi hemle bûye, kurek aniye dinyayê û navê wî kirine Bulduk (Bûldeq).[298] Bulduk dema mezin bûye Mirdasî bi riza dilê xwe ew anîne ser textê mîrektiyê. Wî demeke gelek dirêj bi dadmendî hikumdarî kiriye. Dema çûye rehma Xwedê kurê wî yê mezin Îbrahîm li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.226-227). Cegerxwîn bi raweya fermanî bangî Emîr Bûldeq kiriye ku şiyar be û li hemberî dijmin têkeve nav şerê çekdarî. Cegerxwîn jê xwestiye ku bi gurzê Arî êrîşî dijmin bike. Ew, her tim xwestiye fikra koka Kurdan ku digihîje Ariyan bi bîr bîne.

16/5 Birahîm Beg tu rabe ey begê çak

321 Seraya te çi gerdûş e li bin xak

16/6 Ji pêşî ve we em xistin binê dest

322 Heta îro hemî jar û hemî mest

Emîr Îbrahîmê (Birahîmê) kurê Emîr Bulduk, bûye cînişînê bavê xwe. Ew di dadmendî û qenciyê de gelek kesên berî xwe borandiye. Lê dema wî zêde dewam nekiriye û ew çûye rehma Xwedê (Şerefname, 227). Cegerxwîn di van malikên li jor de bangî Emîr Îbrahîm kiriye û ji ber xelasbûna hikumdariya mîrektiyan gazin kirine. Wî bindestî, jar û perîşaniya xwe bi xelasbûna serdema mîrektiyan ve girêdaye. Ji ber vê yekê jî mîrên Kurd tewanbar kiriye ku xwedî li welatê xwe derneketine.

[298] Li gor *Şerefname*yê Emîr Bulduk ji ber beriya were dinyayê Eşîreta Mirdasî xwe dane bende zayina wî û gava çêbûye yek ji vê eşîretê gotiye "Çok şükür Hudaya kî îstedîğîmîzî bulduk." navê wî wek Bulduk danîne û ji mîrên Egilê re jî Buldukanî hatiye gotin (r.226-227).

16/7 Muhemmed rabe ser xwe ta bi Serhad
323 Heçî Kurd ehemî jar û hemî bed

16/8 Dibin dijmin ji hev re mil dimalin
324 Mehê sed car di ceng û qîl û qal in

Emîr Mihemmedê (Muhemmedê) kurê Emîr Îbrahîm e, li cihê bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Lê dewra wî jî dirêj nekêşaye û bi ecelê xwe miriye. Sê kurên bi navê Emîr Îsa, Emîr Teymûrtaş û Emîr Huseyîn hiştine (Şerefname, r.228). Cegerxwîn bangî Emîr Mihemmed kiribe jî armanca wî ne behskirina dewra Emîr Mihemmed e. Ew li gor dema niha ango dema xwe li ser pirgirêkên gelê Kurd sekiniye. Li gor nêrîna van malikan Kurd dibin destê dijmin de ne. Îttifaqa wan tune ye, li hemberî hevûdu radibin û bi hev re şer dikin.

16/9 Emîr Îsa tu rabe zû ji bin xak
325 Weyaxod wek nebî Îsa ji eflak

16/10 Çiman îro ji ezman nayê xwar e
326 Ji bo derdê me nabînî tu çare

Emîr Îsayê kurê Emîr Mihemmed e, piştî bavê xwe desthilatdarî girtiye destê xwe. Bi bira û pismamên xwe re yekdil û lihevhatî bûye. Heta mirina xwe jî bi dadmendî hereket kiriye (Şerefname, r.228). Cegerxwîn ji ber şibandina nav peywendî bi navê Hz. Îsa re daniye û xwestiye ew jî wek Nebî Îsa ji ezman were jêr û ji derdê Kurdan re çareyekê bibîne. Çimkî Cegerxwîn helbestvanê gelê Kurd e, feraseta wî ya helbestê bi aliyên realîst dîrokek e. Bingeha helbestên wî li ser derd û kulên neteweya Kurd hatine sazkirin.

**Tablo 3.2.16.**Mîrên Misdasî

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Pîr Mensûrê kurê Seyîd Huseyînê el Arac, Pîr Mûsayê kurê Pîr Mensûr, Pîr Bedirê kurê Pîr Mûsa, **-Mîrên ji şaxê Egilê:** Emîr Buldukê kurê Pîr Bedir, Emîr Îbrahîmê kurê Emîr Bulduk, Emîr Mihemmedê kurê Emîr Îbrahîm, Emîr Îsayê kurê Emîr Mihemmed | Bedir<br>Buldeq<br>Birahîm Beg<br>Muhemmed<br>Emîr Îsa |
| Dem | Sedsalên XI-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Hekkarî, Mirdas, Egil | Mirdas |

### 3.2.17. Mîrên Egilê (Buldukanî)

Cegerxwîn di menzûmeya "Beganê Egîl" de bi dozdeh malikan behsa şeş mîrên Egilê kiriye. Mîrên Egilê di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Fermanrewayên Egilê Yên bi Leqeba 'Buldukanî' Tên Naskirin" derbas bûye. Wek me li jor jî diyar kir di *Şerefname*yê de Mîrên Egilê bi Emîr Bulduk dest pê kiriye, di menzûmeya Cegerxwîn de Begê yekem ê vê mîrektiyê Dewletşah Beg e.

17/1 Tu Dewlet Şah î ey şehê ciwanmîr
327 Egîl bûye pepûk û jar û dilgîr

17/2 Çiya û deşt û zozan tev de xemgîn
328 Çem û gol û newalên te hemî xwîn

Dewletşah (Dewlet Şah) Begê kurê Emîr Îsa ye. Ew li gor wesiyeta bavê xwe û bi alîkariya Eşîreta Mirdasî li ser textê Mîrektiya Egilê (Egîlê) rûniştiye. Demekê bi dadmendî welat bi rê ve biriye. Dema çûye rehma Xwedê kurê wî li cihê wî

rûniştiye (Şerefname, r.228). Cegerxwîn ji destderketina axa welat bi teşxîskirina Egilê îfade kiriye. Egil bûye pepûk û jar û dilgîr; çiya, deşt û zozanê wê xemgîn in. Çem, gol û newalên wê jî bi awayekî mubalexeyî hatiye destnîşankirin ku ji ber ji dest derketiye birîndar in û tev de bûne xwîn.

17/3 Emîr Îsa çeleng û çak û çalak
329 Egîd û pehlewan û fihris û pak

17/4 Welatê me seraser deşt û zozan
330 Hemî sotaye dûkel çûye ezman

Emîr Îsa kurê Dewletşah Beg e, piştî mirina bavê xwe rêvebirina Mîrektiya Egilê girtiye destê xwe. Dewra wî bi dadmendî û xweşiyê derbas bûye, piştre du zarokên kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.228). Cegerxwîn piştî pesnê egîdî, mêr û mêrxasiya Emîr Îsa daye, deşt û zozanê welatê xwe îşaret kiriye ku îro tev şewitîne û dûkela wan çûye ezmanî. Cegerxwîn bi îfadeya şewitandina deşt û zozanan xwestiye ku wêranbûna welat bide berçavan.

17/5 Were ey Şah Mihemmed lawê Îsa
331 Li ser textê Egîl rûne tu dîsa

17/6 Binêre Lor û Gor û Buxt û Zazan
332 Hemî îro bi carek bûne nazan

Şah Mihemmedê kurê Emîr Îsa ye, ew bi jêhatî û kêrhatiya xwe bûye cînişînê bavê xwe. Lê dewra wî zêde dewam nekiriye, pênc zarokên kur li pey xwe hiştine û wefat kiriye (Şerefname, 228). Cegerxwîn daxwaza xwe ya desthilatdariya mîrên Kurd dubare kiriye. Ji ber di rewşa tê de bûne Lor, Gor, Buxt û Zaz bindest û nezan mane. Wî xwestiye bîne zimên ku pêwîst e Kurd dîsa li ser axa xwe bibin hikumdar.

17/7 Lele Qasim tu rabe xortê bengîn
333 Binêre vî welatê pak û rengîn

17/8 Hemî zer bûye rengê mahê payîz
334 Ji Sîwasê tu bigre ta bi Tebrîz

Qasim Begê kurê Şah Mihemmed Beg, di mêrxasî, zanyarî, rêvebirî û edebiyatê de yekane û bi rêz bûye. Di nav mîrên Kurdistanê de yekî bi emsalê wî tune bûye. Ji ber nav û dengê wî belav bûye Aqqoyunî ew kirine fermandar û lalayê zarokên xwe. Lewma di nav xelkê de bi leqeba Lala Qasim[299] hatiye naskirin. Li gor hatiye gotin dema Şah Îsmaîl, di sala 913yê k./1508ê z. de Diyarbekir girtiye Lala Qasim bi tu awayî îta'et jê re nekiriye. Şah Îsmaîl leşkerekî giran şandiye ser wî, Kela Egilê jê stendiye. Kele heft salan di bin zilma Qizilbaşan de maye. Piştî Şerê Çaldiranê bi alîkariya Siltan Selîm Xan, Lala Qasim Egil paş de stendiye û vegeriyaye ser wezîfeya xwe. Ew bêyî tu zarokên kur li pey xwe bihêle çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.228-229). Cegerxwîn bangî Lala Qasim kiriye ku axa welat a ji dest derketiye were bigre. Bi bangkirina Lala Qasim, ew xwestiye bi xwendekaran re hişmendiya têkoşînê pêk bîne.

17/9 Were rabe Mirad Beg mîrê xwînxwar
335 Welatê te bi carek maye bê zar

17/10 Li ser birc û sera û xan û mana
336 Dixwînin bûm û kund û çikçikana

Murad (Mirad) Begê kurê Îsa Beg e.Ew li ser wesiyeta apê xwe Lala Qasim û bi fermana Dîwana Siltan Silêman Xan bûye rêvebirê hikumeta Egilê. Murad Beg, hikumdarekî gelek dîndar bûye û hemû kes jê razî bûne. Du kurên bi navên Elîxan û Qasim Beg li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê. Herdu kurên wî jî bûne mîr lê di temenê ciwan de wefat kirine (Şerefname, r.229). Cegerxwîn ji destderketina rêveberiyê bi metafora bûm û kund û çikçikan diyar kiriye ku bûm (kund) û çikçikan bi temsîla dijmin hatine bikaranîn û ji dêvla mîrên Kurdan li ser Kurdan bûne xwedî gotin.

[299] Li gor nusxeya wergera İbrahim Sunkur (r.232) ji ber ji zarokên xwe yekî re gotiye Lîlleh di nav xelkê de wek Lîlleh Qasim hatiye naskirin.

17/11 Were Cafer tu rabe lawê Qasim
337 Egîl bigre bi carek ta bi Dêrsim

17/12 Hemî îro li ber destê neyar in
338 Bi carek xwîn ji çavên wan dibarin

Cehfer (Cafer) Begê kurê Qasimê kurê Murad Beg e. Di temenê xwe yê biçûk de li ser fermana Siltan Selîm Xan bûye mîrê Egilê. Di sala 1005ê k.[300]/1597ê z. de dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Cehfer Beg bîst û pênc sal bûye ku li ser textê mîrektiyê derbas kiriye (Şerefname, r.230). Cegerxwîn di vê menzûmeyê de Egil bi wesfên mirovekî xemgîn daye, Egil ji ber ketiye bin destê dijmin jar û perîşan e, xwîn ji çavên wê dibarin. Lewma pêwîst e serokên Kurd rabin û welatê xwe rizgar bikin. Bi vê perspektîfê Cegerxwîn bangî Cehfer Beg jî kiriye û bal kişandiye ser rewşa welat.

**Tablo 3.2.17.**Mîrên Egilê (Buldukanî)

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | (Emîr Bulduk, Emîr Îbrahîm, Emîr Mihemmed û Emîr Îsa yê di *Şerefname*yê de di nav vê şaxê de ne di tabloya jor de li gor menzûmeya Beganê Mirdas hat dayin.)<br>Dewletşah Begê kurê Emîr Îsa, Emîr Îsayê kurê Dewletşah, Şah Mihemmedê kurê Emîr Îsa, Qasim Begê kurê Şah Mihemmed Beg, Murad Begê kurê Îsa Beg, Cehfer Begê kurê Qasim Begê kurê Murad Beg. | Dewletşah<br>Emîr Îsa<br>Şah Mihemmed lawê Îsa<br>Lele Qasim<br>Mirad Beg<br>Cafer lawê Qasim |
| Dem | Sedsalên XII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Egil | Egîl |

### 3.2.18. Mîrên Paloyê

Nesla Mîrên Paloyê digihîjin Emîr Teymûrtaşê kurê Emîr Mihemmedê kurê Emîr Îbrahîmê kurê Emîr Bulduk (Şerefname, r.231). Cegerxwîn di menzûmeya xwe

[300] Di wergera Ziya Avci (r.230) de tenê dîroka koçî hatiye dayin.

ya bi sernavê “Beganê Palo” de di çardeh malikan de behsa heft mîran kiriye. Di *Şerefname*yê de bi sernavê “Di Derheqê Fermanrewayên Paloyê de ye” derbas bûye.

18/1 Were Teymûr ji Palo rabe carek
339 Ji bo Kurdan bike îro tu karek

18/2 Di Palo de hemî Kurdên birîndar
340 Ne lê lê ye, ne lo lo ye hemî jar

Emîr Teymûrtaş (Teymûr), bi merdî, mêrxasî û sergiraniya xwe bi nav û deng bûye. Ji dema bavê wî miriye heta roja jiyana xwe ji dest daye rêvebiriyek baş û bi dadmendî meşandiye. Ew, dema çûye rehma Xwedê zarokek tenê li pey xwe hiştiye (Şerefname, r.231).Cegerxwîn dewra Emîr Teymûrtaş û dewra xwe daye berhev û rewşa Palo ya niha çiqas xerab e bi van malikên li jor diyar kiriye.

18/3 Emîr Hemze ji Palo rabe ey Zal
341 Hemî deşt û newal û kaş û berpal

18/4 Li wan îro temaşake tu rehber
342 Newal û gol, ziwa ne tev de çol zer

Mîr Hemze kurê Emîr Teymûrtaş e, li ser muwafeqeta serokên qewmê xwe û giregirên eşîretan, di cihê bavê xwe de hatiye ser textê mîrektiyê. Wî çar zarokên kur li pey xwe hiştine û miriye (Şerefname, r.231). Cegerxwîn ji dersderketina hikumdariya welat, bi ziwabûna newal û golan, bi zerbûna çolan daye berçavan. Gelê wî êdî ne serbixwe ye; lewma deşt, newal, kaş û berpal êdî ne wek berê ne.

18/5 Hesen Beg rabe ser xwe şahê Palo
343 Di Palo de ne lê lê ye ne lo lo

18/6 Hemî jar û belengaz in hemî rût
344 Di bin destê neyaran mane serqût

Huseyîn (Hesen) Beg kurê Mîr Hemze ye, bi serfirazî û serbilindî ji bavê xwe mîrata fermanrewatiyê stendiye. Dema otorîteya Dewleta Aqqoyunî lewaz bûye Huseyîn Beg, ji vê firsetê îstifade kiriye û xwestiye Kela Erxeniyê ji Tirkmenan bistîne. Ew di şer de hatiye kuştin, lewma tu nesl li pey wî nemane. Biraziyê wî Cimşîd ji dêvla wî hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.231). Di *Şerefname*yê de navê wî Huseyîn e (Hisên e), lê Cegerxwîn wî bi navê Hesen yad kiriye. Cegerxwîn ji bo hejarî û belengaziya xelkê dewra xwe bîne zimên bangî Huseyîn (Hesen) Beg kiriye ku rabe rewşa Palo ya di bin destê neyaran de bibîne.

18/7 Were Cemşîd kurê Ristem tu şah î
345 Ji Kurda re belê pişt û penah î

18/8 Tu deyne ser serê xwe tacê Cemşîd
346 Bi destê xwe tu bigre şûrê Xorşîd

Cimşîd Begê kurê Rustem Beg e, piştî apê xwe bûye desthilatdarê Paloyê. Cimşîd Beg mirovekî dinyadîtî, di meşandina kar û baran de xwedî tecrûbe û siyasetek baş bûye. Dema mîr û fermanrewayên Kurdistanê ji bo îta'eta xwe ji Siltan Selîm Xan re pêşkêş bikin çûne cem wî Cimşîd Beg jî di nav wan de bûye. Wê çaxê berpirsiyarê Paloyê yekî navê wî Erebşah bûye. Cimşîd Beg bi piştgiriya Siltan Selîm Xan, mîrata bav û bapîrên xwe stendiye. Dema Siltan Silêman ji bo îstîla û fetha Îranê ji Kurdistanê re derbas bûye, ji bo ji tecrubeyên Cimşîd Beg îstifade bike, ji nav hikumdar û mîrên Kurdistanê ew ji xwe re wek mişawir hilbijartiye. Siltan bi saya fikrên wî li Îranê gelek cî stendine. Wê çaxê di Kurdistanê de, bi hejmara zêde yên xizmetkarên xwe, di xwediyîbûna serweta giran de kesekî nikaribûye bigîhîje wî. Di Paloyê de, avahiyên wek kele, medrese û kerwanserayek avakirine. Ji mesafeyên gelek dûr ji kelê û qesebeyê re av aniye. Şêst salên Cimşîd Beg, bi fermanrewatiya serbixwe ya Paloyê de derbas bûye. Cimşîd Beg, di saxiya xwe de kurê xwe yê mezin Huseyîn Xan kiriye cînişînê xwe. Penc zarokên kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.231-234). Cegerxwîn, pesnê hikumdariya wî ya birûmet daye û ji bo Kurdan girîngiya hebûna wî diyar kiriye. Cegerxwîn, serweriya Cimşîd Beg, bi tacê Cimşîd û şûrê Xorşîd xemilandiye. Di navbera Cimşîd Beg û

hikumdarên Îranî yên kevn de peywendiyek daniye. Wî xwestiye ku Cimşîd Beg wek dewamê hikumdariya wan nîşan bide.

18/9 Ji Palo rabe ser xwe ey Hisêncan
347 Tu peydake ji bo derdê me derman

18/10 Birîndar in ji ber şûrê neyaran
348 Qeçax in em li ser şax û diyaran

Huseyîn (Hisêncan)[301] Xan Begê kurê Cimşîd Beg, hê di saxiya bavê xwe de kar û barên mîrektiyê bi rê ve birine. Piştî mirina bavê wî ji Dîwana Siltan Silêman Xan, di derheqê mîrektiya wî de ferman derketiye. Huseyîn Xan ji aliyê dadmendî û evîndariya ji xelkê xwe re bi nav û deng bûye. Di merdîtî û qencîxwaziyê de li ser rêça bavê xwe meşiya ye. Piştî mirina wî ji ber kurê wî yê Mehmûd bi kêrî karê mîrektiyê nehatiye, serokeşîrên Eyaleta Paloyê xwestine birayê wî Hesen bê ser desthilatdariyê (Şerefname, r.235). Cegerxwîn ji bo ji rewşa Kurdan a nebaş re çareyek bibîne bangî Hisêncan kiriye û di van risteyan de qaçaxtî û mişextiya Kurdan aniye zimên.

18/11 Hesen Beg rabe ser xwe ey ciwan merd
349 Belengaz û pepûk in em hemî Kurd

18/12 Ji Palo ta biçî Mazenderanê
350 Temaşake li vê ceng û dixanê

Hesen Begê kurê Cimşîd Beg, piştî mirina birayê xwe li gor fermana Dîwana Siltan Murad Xan, li ser textê Mîrektiya Eyaleta Palo rûniştiye. Ew sê salên mîrektiya wî bi dadmendî û memnûniyeta xelkê derbas bûne. Dema miriye du zarokên kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.235). Cegerxwîn bi van malikên jor diyar kiriye ku seranserê welat ji Palo heta Mazenderanê di nav rewşeke xerab de ye.

[301]Di wergera Ziya Avci (r.235) û Abdullah Yegin (r.233) de Huseyîn Xan e, di wergera İbrahim Sunkur (r.238) de wek Huseyîncan (Hisêncan) derbas bûye. Mihtemelen di nusxeya Cegerxwîn ji ber girtiye jî ev nav wek Hisêncan hatiye nivîsandin.

Divê ji bo ji vê belengaziyê xelas bibin rabin ser xwe. Lewma Cegerxwîn bangî mîrê Kurd kiriye ku rabin ser xwe.

18/13 Silêman Beg binêre em li kar in
351 Ji Baban ta bi Loran em neyar in

18/14 Ji bo hevdî binêre em çi fîl in
352 Di bin destê neyaran jar û dîl in

Silêman Begê kurê Hesen Beg e. Piştî mirina bavê wî, Mistefa Paşayê Serdar, Mîrektiya Paloyê daye destê Silêman Beg. Lê ji Dîwana Siltan Murad Xan fermana mîrektiyê ji bo Yûsif Begê kurê Dewletşah Begê kurê Cimşîd Beg re derketiye. Ev rewş, di navbera Silêman Beg û Yûsif Beg de bûye sedema şer û çend salan xwîn birije. Herçiqas Yûsif Beg xortekî gelek biaqil, zîrek, zana û biedeb be jî xelk li pişta Silêman Beg rabûye û di dîwanê de cih nedane Yûsif Beg. Li ser mirina Yûsif Beg wezîfeya mîrektiyê ji birayê wî Ehmed Beg re hatiye dayin. Wî ji bo bidestxistina hikumetê dijminatiya Silêman Beg kiriye ku di vî şerê îqtidarê de gelek mirov hatine kuştin. Di dawiyê de di sala 1001ê k./1593yê z. de çûye Asîtaneyê û li wir bi cih bûye. Ji nexweşîna webayê çûye rehma Xwedê. Hikumeta Paloyê jî di destê Silêman Beg de maye (Şerefname, r.235-236).

Cegerxwîn bi van malikên ji bo serdema Silêman Beg nivîsandiye, rexneyên tund li Kurdan kiriye. Çimkî ev serdem bi şerê îqtidarê derbas bûye û di vî şerî de ji herdu aliyan jî gelek terefdar mirine. Lewma Cegerxwîn bal kişandiye ser vê dijminatiya navxweyî û gotiye ji Baban heta Loran em neyarê hev in. Wî bi şibandina fîlan xwestiye bide xuyakirin ku Kurd ji hev re jêhatî ne, hevudu dipelçiqînin. Di risteya dewama wê de jî tê dîtin ku Kurd çiqas li hemberî hev rabin jî li hemberî dijmin bêhêz û perîşan in, ji yekîtîyê dûr in.

**Tablo 3.2.18.**Mîrên Paloyê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Emîr Teymûrtaş, Emîr Hemze Begê kurê Teymûrtaş, Huseyîn Begê kurê Mîr Hemze, Cimşîd Begê kurê Rustem Beg, Huseyîn Xan Begê kurê Cimşîd Beg, Hesen Begê kurê Cimşîd Beg, Silêman Begê kurê Hesen Beg | Teymûr<br>Emîr Hemze<br>Hesen Beg<br>Cemşîdê kurê Ristem<br>Hisêncan<br>Hesen<br>Silêman Beg |
| Dem | Sedsalên XV-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Palo | Palo |

## 3.2.19. Mîrên Çermûkê

Cegerxwîn di menzûmeya "Beganê Çermûk" de bi şanzdeh malikan behsa heşt mîrên Çermûkê kiriye. Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Fermanrewayên Çermokê de ye" derbas bûye.

19/1 Hesen Beg rabe ser xwe zû ji Çermûk
353 Welatê me xweş e îro wekî bûk

19/2 Me ew xwest û xwedî kir, lê neyara
354 Ji me girtin bi şûr û gurd û dara

Di *Şerefname*yê de bi navê Emîr Huseyîn derbas dibe lê Cegerxwîn navê wî wek Hesen nivîsandiye. Li gor riwayetekê Emîr Huseyîn kurê Mîr Mihemmed e, li gor riwayeteke din kurapê wî ye. Mîr Mihemmed Kela Baxînê daye destê kurê xwe Emîr Teymûrtaş û Kela Berdencê jî daye destê Emîr Huseyîn. Wî demek ev kele parastiye û zarokek kur li pey xwe hiştiye û miriye (Şerefname, r.237).Cegerxwîn van malikên ji bo Emîr Huseyîn (Hesen) xweşikiya welat bi şibandiye xweşikiya "bûk"ê. Zayenda welat jin e, bûka ciwan e, welat dayik e û namûs e. Lê dijmin welat bi darê zorê ji destê wan derxistiye.

19/3 Tu Seyfeddîn î şûrê tûj û tazî
355 Ji kalanê wî derxe rake gazî

19/4 Seraser Lor û Gor û Bot û Zaza
356 Werin cenga neyar û dil beraza

Emîr Seyfeddînê kurê Emîr Huseyîn piştî bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Wî rêvebiriyek baş damezrandiye û piştî Emîr Seyfeddîn kurê wî Şah Yûsif li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.237). Cegerxwîn di navbera Seyfeddîn û wateya navê wî peywendiyek daniye ku wateya seyf bi Erebî şûr e, seyfeddîn jî tê wateya şûrê dîn. Cegerxwîn tevî Seyfeddîn bangî eşîrên mezin ên Kurdan jî kiriye, ji bo rabin li hemberî neyaran bikevin nav şer û cengê.

19/5 Were Yûsif tu şah î serbilind î
357 Xwedanê text û bext û şehr û gund î

19/6 Binêre tu li bextê me siyah e
358 Di nav Kurda ne mîr maye ne şah e

Şah Yûsifê kurê Emîr Seyfeddîn, piştî mirina bavê xwe bûye rêvebir. Ew bi serfirazî û liyaqet desthilata xwe bi rê ve biriye. Piştî mirina wî kurê wî hatiye cihê wî (Şerefname, r.237). Cegerxwîn bêxwedîbûn û bêserokbûna Kurdan wek bê şensî û bêtalihî dîtiye û bi bangkirina Yûsif Beg re xemgîniya xwe ya ji destderketina rêvebiriyê aniye zimên.

19/7 Welat Beg rabe ser xwe ey xwedî nam
359 Belengaz bûne îro xezm û pismam

19/8 Heçî xurt e xwedanê xwar û xurd e
360 Neyar û dijmin e, eya ne Kurd e

Welat Begê kurê Şah Yûsif li cihê bavê xwe rêvebiriya welat girtiye destê xwe. Piştî wî jî Şah Elî Beg hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.237). Cegerxwîn bangî Welat Begê mîrê berê kiriye, çimkî serokên niha ango yên heçî xurt (axa, beg, şêx û hwd.) wezîfeya xwe nayinin cih, tu dibêjî qey ne Kurd in. Ji riyê lewaziya wan xezm û pismam belengaz û perîşan bûne. Lewma pêdivî bi xelaskerekî re heye.

19/9 Were ey Şah Elî Beg ey serifraz
361 Mirovên te hemî bûne belengaz

19/10 Ne key mane li meydanê ne Sasan
362 Ne Eyyûbî ne Deynûrî ne Merwan

Şah Elî Beg, bûye serokê eşîret û qebîleyan. Piştî mirina wî kar û barên desthilatê ketine destê Isfendiyar Beg. Piştî Isfendiyar Beg jî desthilat ketiye destê Bayindir Beg.[302] Piştî ew jî miriye rêvebiriya welat ketiye destê Mihemmed Beg (Şerefname, r.237). Cegerxwîn di vir de heyfa xwe ji holêrakirina mîrektiyan aniye.

19/11 Were Esfendiyar Beg ey begê çak
363 Li Çermûkê binêre tev de bû xak

19/12 Sera kanî li kû ne text û eywan?
364 Ne ew bircên bilind mane ne eywan

Wek me li jor jî got, piştî mirina Şah Elî Beg kar û barên desthilatê ketine destê Isfendiyar (Esfendiyar) Beg (Şerefname, r.237). Di derheqê Îsfendiyar Beg de di *Şerefname*yê de tenê behsa derketina wî ya ser text hatiye kirin. Cegerxwîn li gor kronolojiya *Şerefname*yê navê vî mîrî jî bi bîr aniye. Ji nîşaneyên hikumdariyê sera, text û eywanê bi riya tecahula 'arif pirsiye ku li ku ne. Li pey jî wêranbûna bircên

[302] Di derheqê Isfendiyar Beg û Bayindir Beg de tenê tê zanîn ku bûne rêvebirê Çermûkê. Di wegera Ziya Avci (r.237) de di bin sernavê Şah Elî Beg de behsa van herdu mîran hatiye kirin. Di wergera İbrahim Sunkur (r.241) de ji bo her du mîran jî sernavên cuda hatiye bikaranîn. Di wergera Abdullah Yegin (r.235) de Isfendiyar Beg di bin sernavê Şah Elî Beg de hatiye dayin, ji bo Bayindir Beg sernavekî cuda hatiye nivîsandin.

bilind û eywanê bi bîr aniye. Cegerxwîn bi vê şêwazê xwestiye ji destderketina hikumdariyê bi xwendekaran re bide fikirandin.

19/13 Tu Bayendûr Beg î ey mîrê serbest
365 Egîd û fihris û çalak û serbest

19/14 We ser berda me jî talî qe nanî
366 Çi man nanî ji ber xeşm û nezanî

Piştî Isfendiyar Beg jî desthilatê ketiye destê Bayindir (Bayendûr) Beg (Şerefname, r.237). Ji xeynî vê agahiyê di *Şerefname*yê de di derheqê Bayindir Beg de tu agahî nehatiye dayin. Cegerxwîn piştî pesnê mêr û mêrxasiya Bayindir Beg kiriye, hem dewra mîrektiyan hem jî dewra ku tê de jiyaye rexne kiriye. Cegerxwîn bi van malikan îşaret kiriye ku mîrên Kurdan serê xwe li ber dijmin tewandine. Nesla piştî wan jî ji ber xeşma dijmin û nezaniya xwe serê xwe ranekirine û di bin destê dijmin de mane.

19/15 Begê min ey Muhemmed ey begê baş
367 Ji me çêtir xuyane ev Qizilbaş

19/16 Ne pez maye ne rez maye ne xanî
368 Ne cot maye ne cobar û kanî

Mihemmed Beg dema wezifeya mîrektiyê bi dest xistiye navçeya Çermûkê (Çermokê) ji Qizilbaşan rizgar kiriye. Ji Siltanê Osmanî fermana desthilatdariyê bi dest xistiye. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin ev mîrê han li ser rêvebiriya Çermûkê bûye. Lê xeraca Xiristiyanên li wan deran aîdê Dîwana Mal (Darayî) a Diyarbekirê bûye (Şerefname, r.237). Ji ber di wê serdemê de Mihemmed Beg, welatê xwe ji Qizilbaşan rizgar kiriye, Cegerxwîn bal kişandiye ser vê bûyerê. Mixabin rewşa Qizilbaşan a wê demê ji rewşa Kurdan a niha çêtir xuya ye; çimkî îro welat wêran bûye, ketiye destê dijmin, ne pez maye ne rez maye ne xanî.

**Tablo 3.2.19.** Mîrên Çermûkê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Emîr Huseyîn, Emîr Seyfeddînê kurê Emîr Huseyîn, Şah Yûsifê kurê Emîr Seyfeddîn, Welat Begê kurê Şah Yûsif, Şah Elî Beg, Isfendiyar Beg, Bayindir Beg, Mihemmed Beg | Hesen Beg<br>Seyfeddîn<br>Yûsif<br>Welat Beg<br>Şah Elî Beg<br>Esfendiyar Beg<br>Bayendûr Beg<br>Muhemmed Beg |
| Dem | Sedsalên XV-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Çermok (Çermûk) | Çermûk (Çêrmok) |

### 3.2.20. Begên Sasonê (Hezzoyê)

Li gor riwayetekê, eslê Mîrên Sasonê digihîje mîrên Kisrayê. Lê riwayeta herî rast ew e ku ew kurapên Mîrên Bedlîsê ne. Du birayên bi navên Izzeddîn û Diyaeddîn ji Xelatê hatine, Bedlîsê û Sason ji yekî Gurcî stendine. Kar û barên Sasonê Izzeddîn girtiye destê xwe. Mîrên Sasonê, di nav mîrên Kurdistanê de bi mêr û mêrxasî bi nav û deng bûne. Ew her tim bi mîrên mezin û bi siltanên payebilind re riya siyasetê dane pêşiya xwe û siyasetek aqilane meşandine (Şerefname, r.239). Menzûmeya Cegerxwîn a bi sernavê "Beganê Sason" ji bîst û du malikan pêkhatiye. Cegerxwîn li gor rêza *Şerefnameyê* serdemên yazdeh mîrên Sasonê bi bîr anîne. Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Fermanrewayên Sasonê de ye ku Van Dawiyan bi Navê 'Fermanrewayên Hezzoyê' Hatine Naskirin" derbas bûye.

20/1 Ebû Bekir ji Sasonê tu rabe
369 Welatê te bi carek tev xerabe

20/2 Di nav Kurdan ne Sason e ne Sasan
370 Ne key mane ne kesra ye ne eywan

Mîr Ebûbekir (Ebû Bekir), di nav xelkê de û di nav hikumdaran de bi nav û deng bûye. Du kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefnme, 240). Mîrê yekem ê hatiye naskirin Mîr Ebûbekir e, Cegerxwîn lewma berê bangî Ebûbekir kiriye ku rabe wêranbûna welat bibîne ku di nav Kurdan de ne hikumdar ne jî diwan maye.

20/3 Xidir Beg rabe ser xwe Şahê Sasûn
371 Bi carek ew binefş û naz û beybûn

20/4 Hemî bel bûne payîz û bihar e
372 Belê çibkim li ber pozê neyar e

Xidir Begê kurê Mîr Ebûbekir, piştî mirina bavê xwe bûye desthilatdarê Sasonê. Di ser hikumdariya wî de demek dirêj derbas nebûye wî wefat kiriye. Ji ber ku zarokên wî tune bûne birayê wî hatiye ser textê mîrektiyê (Şerefname, r.240). Cegerxwîn bi bangkirina Xidir Beg, diyar kiriye ku welat xweş e lê ji dest derketiye, li ber destê neyar e.

20/5 Elî Beg rabe ser xwe ev çi wext e?
373 Di nav Kurda ne mîr mane ne text e

20/6 Ji Baba ta bi Zaza tev de Kurd in
374 Erê Kurd in welakin rengê qird in

Elî Begê kurê Mîr Ebûbekir, piştî mirina birayê xwe Xidir Beg bi rizaya serokeşîret û serokqebîleyan desthilat girtiye destê xwe. Dema mîrên Kurdistanê berê xwe dane Seraya Şah Îsmaîl, Elî Beg jî bi wan re bûye. Şah fermana girtina wan mîran daye û welatên wan xistiye bin desthilatdariya xwe. Lê ji ber meyla Elî Beg bi zewq û sefayê re hebûye, teqdîra Şah qezenc kiriye û bûye hogirê wî yê herî nêz, di meclîsa wî de rûniştiye. Ji xeynî vê Elî Beg dostaniya di navbera xwe û Şeref Begê Mîrê Belîsê jî xurt kiriye, keça xwe daye wî. Elî Beg sê zarokên kur li pey xwe hiştine û li Tebrîzê Seraya Şah Îsmaîl wefat kiriye. Piştî Elî Beg serokeşîran kurê wî

Xidir Beg anîne ser rêvebiriyê. Lê li ser fermana Şah Îsmaîl wezîfeya Mîrektiya Sasonê dane Mihemmed Beg (Şerefname, r.240). Cegerxwîn bi malikên jor ên li ser dema Elî Beg, bêkêrbûna Kurdan rexne kiriye. Kurd ji ber ku li hemberî bûyerên bi serê wan de hatine bêdeng dimînin qird in/qirdik in.

20/7 Xidir Beg rabe ser xwe ey tu serbest
375 Erê sûcê we ye em bûne bindest

20/8 Hemî ev Lor û Gor û Bot û ev Zaz
376 Di bin destê neyaran de belengaz

Xidir Begê kurê Elî Beg e, Elî Beg dema ku bi kurê xwe Mihemmed Beg re li Tebrîzê li Seraya Şah Îsmaîl bûye, çûye rehma Xwedê. Şah Îsmaîl, wezîfeya Mîrektiya Sasonê daye Mihemmed Begê kurê wî û di vî warî de fermanek jî derxistiye. Lê serokeşîret û giregirên qebîleyan kurê wî Xidir Beg ji bo serokatiya xwe hilbijartine. Xidir Beg, piştî wezîfeya desthilatdariyê ji aliyê Siltan Selîm Xan ve ji birayê wî Mihemmed Beg re hatiye dayin, ew bi rizaya dilê xwe dev ji fermanrewatiyê berdaye. Xidir Beg, bi wezîfeyeka li wilayeta Hezzoyê razî bûye. Çar zarokên kur li pey xwe hiştine û wefat kiriye (Şerefname, r.241). Cegerxwîn, ji ber bindestî û belengaziya Kurdan mîrê Kurd sûcdar kirine. Lewma dema bangî Xidir Beg kiriye, serbestiya serdema mîrektiyan aniye zimên û gotiye ku “Xidir Beg rabe ser xwe ey tu serbest”. Lê niha serbestî û azadî ji dest derketiye, sedema vê yekê jî ji ber mîrên Kurdan li war û welatê xwe xwedî derneketine. Cegerxwîn ji hunerên edebî bi tezatê bal kişandiye peywendiya di navbera serbestî û bindestiyê.

20/9 Muhemmed Beg di bin jêrî zemîn î
377 Were tûzê me Kurmanca bibînî

20/10 Hemî serqot û rûx û xwas û tazî
378 Li ser şax û diyaran qîr û gazî

Mihemmed (Muhemmed) Begê kurê Elî Begê Sasonî ye. Piştî mirina bavê wî dema ku birayê wî Xidir Beg ji aliyê serokeşîretan ve ji bo desthilatdariyê hatiye hilbijartin, Mihemmed Beg naçar maye, çûye cem Siltan Selîm Xan. Mihemmed Beg tevlî Sefera Misrê ya Siltan Selîm Xan bûye. Di şerê ji bo fetha Misrê de mêr û mêrxasiyên nedîtî rê daye, lê bi awayekî giran birîndar bûye. Li ser vê, xwestekên wî yên ji siltan hatine pirsîn. Wî jî daxwaza Eyaleta Sasonê kiriye û nahiya Erzenê ya di navbera mîrên Sason û Hesenkêfê de bûye sedema şer jî xwestiye ku têxin ser eyaleta wî. Ji bo temamê daxwazên wî ferman hatiye derxistin û xwestekên wî hatine qebûlkirin. Li ser vê, Xidir Beg, bi rizaya dilê xwe dev ji fermanrewatiyê berdaye. Ew bi wezîfeyek a li wilayeta Hezzoyê razî bûye. Mihemmed Beg ji ber Melik Xelîlê hikumdarê Hesenkêfê di dayina Erzenê de sistî kiriye, çûye ser Kela Erzenê û ew xera kiriye, ji destê mirovên Melîk Xelîl stendiye. Piştî ku Mihemmed Beg hivdeh salan hikum kiriye, şeş zarokên kur li pey xwe hiştine û miriye (Şerefname, r.242). Cegerxwîn ji Mihemmed Beg xwestiye ku halê Kurmanca bibîne ku çawa bê war û welat mane, li ser şax û diyaran hewar û qîrîna wan e. Cegerxwîn bi van malikên li jor perîşaniya xelkê xwe yê bê cih û war îşaret kiriye.

20/11 Silêman Beg li Sasonê binêre
379 Seraser ew çiya ye zîv û zêr e

20/12 Belê dijmin dixwî, lê em newêrin
380 Di bin çavan de carek lê binêrin

Suleyman (Silêman) Begê kurê Mihemmed Begê kurê Elî Beg e. Piştî mirina bavê xwe bi fermana Siltan Selîm Xan a sala 927ê k./1521ê z. de li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Silêman Beg, mirovekî gelek bikêrhatî, sergiran, merd û mêr bûye. Dema Siltan Silêman Xan Bexdad û Bedlîs girtiye û hatiye Deşta Erzenê, Silêman Beg xwarin û pêwîstiyên leşkerên wî ji Sasonê şandiye. Bi riya raspardan xêrhatin lê daye, lê neçûye serderê bilind maçî nekiriye. Silêman Beg ji ber hez ji kêf û zewqê kiriye ketiye nav kûrahiya sefahetê. Piştre sorik derxistine û çûye rehma Xwedê. Tu zarokên kur li pey wî nemane (Şerefname, r.243). Cegerxwîn carek din xwestiye rê bide ku welatê rengîn û xweşik ji dest derketiye. Wî xweşikiya Sasonê

şibandiye zîv û zêran. Dijmin ji axa wê ya dewlemend sûdê werdigire lê Kurd newêrin dengê xwe bikin. Armanca wî hişyarkirina gelê Kurd ê bindest e.

20/13 Bihaeddîn ji destê xwe we berda
381 Dilên me tev bi xwîn mane ji derda

20/14 Ji Tirkan re xwe kirbû dilodîn
382 Li pey we em hemî bûne Cegerxwîn

Bahaeddîn (Bihaeddîn) Begê kurê Mihemmed Begê kurê Elî Beg e. Piştî mirina birayê xwe Silêman, bi fermana Siltan Silêman Xan hatiye ser rêvebiriyê. Bi Bahaeddîn Beg re digel mêrxasî û merdîtiya wî ya bêemsal, nîşanên tesewwufê jî hakim bûne. Ji ber Osmaniyan baca ji bo Eyaleta Hezzoyê girtine gelek zêde bûye, Bahaeddîn welatê xwe terk kiriye û panzdeh salan li cem Siltan maye. Siltan Silêman navê wî daniye "Delî Bahaeddîn". Ji ber ku ew mirovekî gelek destvekirî bûye, derûdora wî bi kesên çavbirçî tijî bûne. Wî temamê warîdata wilayeta Hezzoyê xerc kiriye. Dema pênc zarokên kur li pey xwe hiştine û miriye li pey wî sî hezar florî deyn maye. Ji ber zarokên wî ne xwediyê qebîliyeta rêvebiriyê bûne piştî Bahaeddîn birayê wî Saruxan Beg hatiye ser dethilatdariyê (Şerefname,r.243-244). Cegerxwîn aciziya xwe ya ji rewşa Bahaeddîn (Bihaeddîn) aniye zimên û gotiye ji derdan hemû Kurd bûne Cegerxwîn. Ji ber Bahaeddîn welatê xwe terk kiriye û çûye cem Siltanê Osmanî Cegerxwîn ew rexne kiriye. Di heman demê de ji ber Siltan Silêman Xan leqeba Delî Bahaeddîn lê kiriye Cegerxwîn ji vê yekê aciz bûye û gotiye "Ji Tirkan re xwe kirbû dilodîn".

20/15 Were ey Seroxan Beg ey begê mêr
383 Ji Sasonê tu rabe her wekî şêr

20/16 Digel xwe zû tu rake kom û cerda
384 Bike qîrîn li zozanê me Kurda

Saruxan (Seroxan) Begê kurê Mihemmed Beg e. Saruxan Beg di dema fermanrewatiya Bahaeddîn Beg de welatê xwe Hezzo terk kiriye û çûye xerîbiyê.

Carinan ji aliyê Dîwana Siltan ve wezîfeya Senceqtiya Bergêrî, Şêrwan, Kesan, Mûş û Swerekê jê re hatiye dayin. Carinan jî dev ji hemû wezîfeya berdaye û li welatan serberedayî geriyaye. Hijdeh salên xwe bi vî awayî derbas kiriye. Dema bi xebera mirina Bahaeddîn Beg hisiyaye çûye cem Siltan Selîm Xan û daxwaza hikumeta Hezzoyê kiriye. Piştre çûye Hezzoyê û bi giregir û eşrafên li wir re ketiye nav yekîtiyê. Wî pênc salan bi dadmendî û bi xweşî rêbebiriya welat kiriye. Lê ji ber kişandina esrarê çend nexweşiyên giran lê peyda bûne. Leşkerên Osmanî ji bo stendina Şêrwan û Gurcistan, wezîfeya pêşengiya leşkerê Îslamê dane Saruxan Beg. Ji Qizilbaşan grûbek di şer de êrîşê Saruxan Beg kirine. Di vî şerî de Saruxan Beg miriye (Şerefname, 244-245). Cegerxwîn di malikên ji bo Saruxan (Seroxan) Beg nivîsandinede ji bo xelasiyê hawara şer li Saruxan Beg kiriye. Cegerxwîn riya têkoşînê di şerê çekdarî de dîtiye.

20/17 Were rabe Mihemmed Beg tu hacî
385 Di Sasonê xwedanê text û tac î

20/18 Binê bextê me rengê zaxê baxa
386 Di nav Kurda ne şah mane ne axa

Mihemmed Begê kurê Saruxan Beg e. Dema ku bavê wî di sala 986ê k./1578ê z. de di Şerê Şêrwan û Gurcistanê de bi êrîşa Qizilbaşan hatiye kuştin, Mihemmed Beg hijdeh salî bûye. Ew xortekî serbilind, pak û exlaqxweş bûye. Lê di pratîkê de pir tişt nekirine. Tiştê herî baş dizanibûye teqlîtkirina xwarin û lixwekirina kincên Rûmiyan bûye. Piştre dev ji vana jî berdaye û di sala 1001ê k./1593yê z. de çûye hecê. Lê xwe zêde bi kar û barên hikumetê aciz nekiriye û Şemseddînê kurê Ferîdûn Axa ji xwe re kiriye alîkar. Di karên mîrektiyê de Şemseddîn bûye xwedî gotin û Mihemmed Beg di bin siya wî de maye. Piştî rêvebiriya hîjdeh salan ew di sala 1004ê k./1595-96ê z. de wefat kiriye. Tu zarokên wî tune bûne (Şerefname, r.245-246). Cegerxwîn bi wesfên Mihemmed Beg ên hacîtiyê û rêvebiriyê dest pê kiriye. Piştre bi tunebûna serok û rêberên Kurdan çawa rûmeta Kurdan nemaye, Kurd bûne wek qijikê (zaxê) baxan daye berçavan.

20/19 Tu wî Ehmed Begê mêr û dilawer
387 Xwedanê tac û text û kom û leşker

20/20 Ne tac maye ne bext û leşker û kom
388 Erê Kurdên welê bûne hemî Rom

20/21 Muhemmed Beg ne hûn çê bûn ne em çê
389 Ji bona me we rê kir ne şiverê

20/22 Belê sûcê we ye em tev di ar in
390 Seraser em digel hevdî neyar in

Ehmed Begû Mihemmed Beg kurên Xidir Beg in. Dema ku Mihemmed Begê kurê Saruxan Beg miriye, Şemseddînê alîkarê wî, Ehmed Beg aniye ser textê rêvebiriyê. Mihemmed Begê kurê Xidir Beg di dema desthilatdariya Mihemmed Beg de ji ber Şemseddîn welat terk kiriye û çûye cem mîrê Boxtanê. Li ser agahiya mirina Mihemmed Beg û desthilatdariya birayê xwe Ehmed Beg, tevî begên eşîretê yên ji aliyê Şemseddîn ve ji welat hatine derxistin îttifaq kirine û ber bi Hezzoyê ve bi rê ketine. Şemseddîn ji vê îttifaqê ketiye tirsê û Ehmed Beg teşwîq kiriye ku ji bo birayê xwe Mihemmed Beg bikuje. Ji vir û pê ve di navbera herdu birayan de şerê îqtidarê dest pê kiriye. Piştî Ehmed Beg li Hezzoyê hatiye kuştin Mihemmed Beg kar û barên Hezzoyê bi awayekî serbixwe bi rê ve birine. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Mihemmed Beg li ser textê desthilatdariyê bûye(Şerefname, r.252).

Serdema birayên Ehmed û Mihemmed di *Şerefname*yê de bi hev re hatiye dayin, lê Cegerxwîn ji bo her yekî malikên cuda nivîsandine. Cegerxwîn bal kişandiye ser kom û leşkerên wan. Herdu birayan bi leşkerên giran ên ku ji eşîretên Kurdan pêk dihatin li hemberî hevudu şer kirine. Ji ber bêîttifaqî û nebaşiya wan welatê wan ketine bin destê Romîyan. Bi van helwestên ne li rê, riyên berfireh li ber Kurdan teng bûne û bûne şiverê. Cegerxwîn wan mîran sûcdar kiriye ku herçiqas mêr û mêrxas bin jî bi şerê navxweyî re mijûl bûne û li welatê xwe xwedî derneketine.

**Tablo 3.2.20.**Begên Sasonê (Hezzoyê)

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Izzeddîn, Mîr Ebûbekir, Xidir Begê Mîr Ebûbekir, Elî Begê kurê Mîr Ebûbekir, Xidir Begê kurê Elî Beg, Mihemmed Begê kurê Elî Begê Sasonî, Silêman Begê kurêMihemmed Begê kurê Elî Beg,Bahaeddîn Begê kurê Mihemmed Begê kurê Elî Beg,Sarûxan Begê kurê Mihemmed Beg, Mihemmed Begê kurê Sarûxan Beg, Ehmed Begê kurê Xidir Beg û Mihemmed Begê birayê wî | Ebû Bekir<br>Xidir Beg<br>Elî Beg<br>Xidir Beg<br>Muhemmed<br>Silêman Beg<br>Bihaeddîn<br>Seroxan Beg<br>Muhemmed Beg<br>Ehmed Beg<br>Muhemmed Beg |
| Dem | Sedsalên XV-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Sason, Hezzo, Erzen | Sason |

### 3.2.21. Mîrên Xîzanê

Li gor riwayetan eslê Mîrên Xîzanê ji nahiya Bilêcan a girêdayî Xinisê ye. Ji wê neslê sê birayên gelek mêr û zîrek ên bi navên Dil, Bil û Bilêc peyda bûne. WanXîzan[303] bi darê zorê girtine û kirine sê beş. Birayê mezin Xîzan, birayê navîn nahiya Miksê û birayê biçûk jî nahiya Isbayerdê girtiye. Mîrên wan her wext bi mîrên mezin û siltanan re riya siyasetê dane ber xwe. Di nav wan mîran de Emîr Silêman û piştî wî kurê wî Emîr Melek tê zanîn (Şerefname, r. 255-258). Menzûmeya Cegerxwîn a li ser vê binemalê ji dozdeh malikan pêk hatiye. Di vê

303 Li gor riwayetek navê Xîzanê berê Seherxîzan bûye ku tê me'neya kesên sehra sibê radibin. Çimkî xelkê vî welatî ji bo nimêja serê sibê bi tevahî li ser piyan bûne, bi demê re ew nav kurt bûye û tenê Xîzan maye. Hinek jî gotine ku ji ber damezrînerê keleyê çûye hecê û vegera wî de dîzdarên keleyê derî lê venekirine hêrs bûye û ji wan re bi Farisî gotiye "xizan-ê bêitibar û ev nav jî ji wir maye.

menzûmeya bi sernavê Beganê Hîzan de behsa şeş Mîrên Xizanê (Hîzanê) hatiye kirin. Ev mîr di *Şerefname*yê de wek Fermanrewayên Xîzanê derbas dibe.

21/1 Emîr Dawûd binêre tu li Hîzan
391 Di bin lingê neyaran bû derîzan

21/2 Herê ew bax û mêrg û av û kanî
392 Di Hîzan de hemî bûne xizanî

Emîr Dawûdê kurê Emîr Melek, sî û neh salan bi awayekî serbixwe li Xîzanê (Hîzanê) hikumdartî kiriye. Meyla wî li ser kêf û sefahatê hebûye, li hemberî kesên zana û xwedî fezîlet hurmetkar bûye. Li Xîzanê Medreseya Dawûdiye ava kiriye. Dema wefat kiriye sê zarokên kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.258). Cegerxwîn di van malikan de ku ji bo Emîr Dawûd rêzkirine diyar dike ku xweşikiya Xîzanê ya berê nemaye, Xîzan di bin lingên neyaran de bûye derîzank.

21/3 Herê Ehmed tu sultanê Nerîman
393 Temaşake li rengê me esîran

21/4 Ji ber xeşma neyar û Tirk û Tazî
394 Birayên te dikin feryad û gazî

Siltan Ehmedê kurê Mîr Dawud, piştî mirina bavê xwe Mîrektiya Xîzanê girtiye destê xwe û bi awayekî serkeftî bi rê ve biriye. Dema mîrên Kurdistanê ji bo sefera Bexdayê bi Siltan Silêman Xan re çûne, Siltan Ehmed jî ji ber xizmetên gelek girîng jê re kiriye Siltan Silêman mulkiyeta Eyaleta Xîzanê bi hinek şert û sondan daye wî. Dostaniya di navbera Siltan Ehmed û Şeref Xanê Bedlîsî xera bûye û di navbera wan de şer derketiye. Di şerê duyem de Şeref Xan hatiye kuştin, Siltan Ehmed jî piştî demekê pênc zarokên kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê. Piştî Siltan Ehmed bi rêzê Mîr Mihemmed û Melik Xelîlê kurên wî hatine ser desthilatdariyê (Şerefname, r.258-260). Cegerxwîn ji bo hêsîrî û belengaziya Kurdan rê bide bangî Siltan Ehmed kiriye û ew bi Siltan Nerîmanê Îranî re kiriye yek. Cegerxwîn dixwaze etnogenizeya Kurdan a Arî ango Kurdo-Îranîk bi diyarkirina

Siltan Nerîman carek din diyar bike. Cegerxwîn di *Şerefnameya Menzûm* de tenê di vê malikê de navê Nerîman yad kiriye.

21/5 Were ey Mîr Muhemmed ey hinermend
395 Binêre dest û payê me di merbend

21/6 Binêre em seraser fihris û jîr
396 Ser û pa dest û gerden, bend û zincîr

Mîr Mihemmedê kurê Siltan Ehmed e. Piştî mirina Siltan Ehmed, bi fermana Siltan Silêman Xan wilayeta Xîzanê bûye du beş. Beşek ji Mîr Mihemmed re, beşa din ji birayê wî Melîk Xelîl re hatiye dayin. Mîr Mihemmed, tenê salek fermanrewatî kiriye û piştre sê zarokên kur li pey xwe hiştine û miriye. Piştî mirina wî, birayê wî Melik Xelîl cardin wek berê wilayet kiriye yek. Lê Siltan Mistefayê kurê Mîr Mihemmed berê xwe daye Asîtaneyê û beşa bavê xwe ji xwe re stendiye. Şeş salan desthilatdarî kiriye. Rojekî çûye nêçîrê û di nav daristanekê de mirî hatiye dîtin (Şerefname, r.260). Dema Şerefxan behsa Mîr Mihemmed kiriye di derheqê hunermendiya wî de tu agahî nedane. Lê Cegerxwîn wî wek hunerm**end** wesifandiye. Mihtemelen Cegerxwîn ji bo ahenga qafiyê ev peyv hilbijartiye û ji bo “dest û payê me di merb**end**” ve girêde bi kar aniye. Bi heman awayî xwestiye diyar bike ku herçiqas Kurd fihris û jîr bin jî bindest in, bend û zincîrkirîne.

21/7 Xelîl Beg rabe serxwe ey tu rêzan
397 Li Hîzanê binêre deşt û zozan

21/8 Xerabûne ji ber xeşma Mexolan
398 Hemî jar û belengaz in li çolan

Melik Xelîlê kurê Siltan Ehmed e, wek li jor jî hatiye behskirin Xîzan di navbera Melik Xelîl û birayê wî de bûye du beş. Heta bira û biraziyên wî sax bûne carinan nîvê Xîzanê bi rê ve biriye, carinan jî hemû Xîzan di bin destê wî de bûye. Piştî mirina biraziyên wî di dema Siltan Selîm Xan de herdu hîsseyên din Xîzanê yên

din jî jê re hatine dayin. Bîst û du salan bi awayekî serbixwe welat bi rê ve biriye. Lê ji ber ku ew di kar û barên desthilatdariyê de mirovekî terkexwem bûye, karên rêvebiriyê daye destê Ebdal Axa yê ji Eşîreta Bilêlanî. Melîk Xelîl di piraniya kar û barên xwe de bi ser ketiye û qezenc kiriye. Di sala 991ê k./1583yê z. de ji ber nexweşiya atiyê (sara) çûye rehma Xwedê. Zarokekî biçûk ê temenê wî biçûk li pey wî maye (Şerefname, r.260). Cegerxwîn bangî Melik Xelîl kiriye ku rabe deşt û zozanên Xîzanê yên ji ber xeşma Moxolan (Mexolan) xerabûne binêre. Herçiqas di *Şerefname*yê de agahiyên li ser vê binemalê zêdetir bi Osmaniyan re heye. Lê di agahiyên li ser navê Xîzanê de navê Hulagu Xanê Moxolî û Emîr Tîmûrê Kurganî jî derbas bûye. Cegerxwîn di vir de Moxolan wek dijmin rê daye û ji xerabûn û wêranbûna mîrektiyê berpirsiyar dîtine.

21/9 Emîr Mehmûd tu rabe ey serifraz
399 Temaşake li Kurdên mêr û şûrbaz

21/10 Herê ew fihris û ew mêr û xwînxwar
400 Di bin destê neyaran bûne keftar

Mîr Mihemmedê kurê Siltan Ehmed, piştî mirina birayê xwe Melik Xelîl bi îttifaqa eşîretê û bi fermana Siltan Murad Xan, rêvebiriya Mîrektiya Xîzanê girtiye destê xwe. Ew desthilat û hikumdartiyek xurt damezirandiye. Di sala 992yê k./1584ê z. de bi leşkerên Osmanî re di şerê ji bo girtina Tebrîzê de du zarokên kur li pey xwe hiştine û miriye (Şerefname, r.260-261). Cegerxwîn bi van malikên li jor xwestiye ber bi çav bike ku Kurdên mêr û mêrxas îro di bin destê neyaran de bûne wek keftaran, jar û perîşan in.

21/11 Hesen rabe, bike carek temaşa
401 Di nav Kurdan ne mîr mane ne paşa

21/12 Binêre tev ji Orfa ta bi Hîzan
402 Hemî tev de ketin bin destê Hîzan

Emîr Hesenê kurê Melik Xelîl e. Piştî mirina apê xwe bi xwesteka eşîretê û bi fermana Siltan Murad Xan hatiye ser textê mîrektiyê. Apê wî Yûsif Begê kurê Ehmed ji bo Mîrektiya Xîzanê jê re bê dayin çûbe Asîtanê û fermana rêvebiriyê bi dest xistibe jî eşîret û qebîleyên Nemiran desthilatdariya wî nexwestine, di şerê îqtidarê de Yûsif Beg hatiye kuştin. Li ser vê karbidestên Dewleta Osmanî bahane geriyane ku Emîr Hesen têxin rewşeke nebaş. Emîr Hesen ji bo bikaribe li hemberî wan bisekine, hemû hebûn û waridata xwe daye bertîlan. Hacî Begê kurapê wî jî li dijî wî derketiye. Lewma waridata nahiya Merwan wek maaş dane Hacî Beg. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin hê Emîr Hesen li ser kar û barên rêvebiriyê bûye (Şerefname, r.261-262).Wek ku tê dîtin hemû rêvebiriya Emîr Hesen bi şerê îqtidarê derbas bûye, lê Cegerxwîn ji bo jidestderketina axa welat û tunebûna mîr û paşayên Kurdan dengê xwe bilind kiriye. Ji aliyê din ve tê dîtin ku di peyva Hîzanê de cînas heye. Hîzan wek herêm û wek navê desthilatdariyê ango mîrektiyê hatiye bikaranîn.

**Tablo 3.2.21.**Mîrên Xîzanê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Emîr Silêman, Emîr Melek, Emîr Dawûdê kurê Emîr Melek, Siltan Ehmedê kurê Mîr Dawûd, Mîr Mihemmedê kurê Siltan Ehmed, Melik Xelîlê kurê Siltan Ehmed, Mîr Mehmûdê kurê Siltan Ehmed, Emîr Hesenê kurê Melîk Xelîl | Emîr Dawûd<br>Ehmed<br>Mîr Muhemmed<br>Xelîl Beg<br>Emîr Mehmûd<br>Hesen |
| Dem | Sedsalên XV-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Xîzan, Navçeya Nemiran, Nahiya Merwan | Hîzan |

### 3.2.22. Begên Miksê

Li gor riwayeteke di *Şerefname*yê de Xîzan, Miks (Muks) û Sipayêrtê di navbera sê birayan de, hatiye parvekirin. Li gor riwayetek din jî ew kurapên hev

bûne û ew wilayetê ji Selçûkiyan stendine (Şerefname, r.263). Menzûmeya "Beganê Muksê" ji deh malikan pêk hatiye û tê de pênc mîrên Miksê (Muksê) derbas bûne. Di *Şerefname*yê de Begên Miksê bi sernavê "Di Derheqê Begên Miksê de ye" cih girtiye.

22/1 Ji Muksê rabe ser xwe ey tu Ebdal
403 Bike cengê wekî Ristem kurê Zal

22/2 Bi mêranî bi şûrkêşî tu gernas
404 Di Muksê de egîd û şêr û mêrxas

Emîr Ebdal yekem kesê li Miksê bûye mîr û navê wî di bîra xelkê de maye. Du kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.263). Di *Şerefname*yê de di derheqê Emîr Ebdal de zêde agahî tune ne, tenê wek mîrê yekem hatiye zanîn. Cegerxwîn ji ber mîrên Kurd ên berê wek xelasker îfade kirine, wesfên şervaniyê dane Emîr Ebdal û xwestiye di cengaweriyê de wek Ristemê kurê Zal be.

22/3 Emîr Ehmed serê xwe zû hilîne
405 Temaşake welatê me bibîne

22/4 Hemî deşt û çiya û av û hem dar
406 Di nav wan de dibazin Kurdên xwînxwar

Ehmed Begê kurê Mîr Ebdal, piştî mirina bavê xwe hatiye ser textê desthilatdariyê û bûye rêvebirekî baş. Lê bi alîkariya Zeynel Begê Hekkarî birayê wî Hesen ferman daye derxistin û nahiye û Kela Karkarê wek senceq ji Hesen Beg re hatiye dayin. Herdu bira sî salan desthilat bi hev re derbas kirine, Ehmed Beg du kur li pey xwe hiştine û wefat kiriye (Şerefname, r.263). Cegerxwîn behsa Ehmed Beg kiriye, lê navê Hesen Beg bi bîr neaniye. Cegerxwîn, rewşa Kurdan a nebaş, tirsonekî û bêkêriya wan bi van malikên li jor destnîşan kiriye.

22/5 Were Ebdal tu rabe ey begê mêr
407 Egîd û pehlewan û fihris û şêr

22/6 Temaşake li rengê Muks û Karkar
408 Di bin destê neyaran mane bêzar

Ebdal Begê kurê Emîr Ehmed Beg, piştî mirina bavê xwe bi fermana Dîwana Siltan Silêman Xan, Mîrektiya Miksê girtiye dest. Bi mirina apê xwe Hesen Beg Senceqa Karkarê bi alîkariya xezûrê xwe Zeynel Begê Hekkarî girtibe jî kurê apê wî Rustem Beg, Karkarê ji destê wî derxistiye. Di destpêka sala 1005ê k./1597ê z. de Ebdal Beg ji bircên keleyê ketiye xwarê û wefat kiriye. Du kurên bi navê Mîr Ehmed û Mihemmed li pey wî mane. Li ser xwestina eşîret û qebîleyan Mîr Ehmed bûye cînişînê bavê xwe (Şerefname, r.264). Cegerxwîn di serdema Ehmed Beg û serdema xwe de rewşa Miks û Karkarê çawa guheriye aniye zimên. Berê di bin desthilatdariya Kurdan de bûye lê niha ketiye bin destê neyaran.

22/7 Were Ristem tu rabe mîrê zana
409 Temaşake li çehrê me xizana

22/8 Bi carek bê emîr û xwendekar in
410 Perîşan in di bin destê neyar in

22/9 Emîr Ehmed tu xweş xort û lewend î
411 Egîd û şehsiwar û serbilind î

22/10 Temaşake li van şax û diyara
412 Li wan tê deng û halanê neyara

Rustem (Ristem) Begê kurê Hesen Beg, bi kurê apê xwe Ebdal Beg re ketiye nav têkoşînê. Wî bi alîkariya xezûrê xwe Hesen Begê Mehmûdî ev nahiyeya Karkarê girtiye destê xwe. Piştî demekê miriye û kurê wî Hesen Beg cihê wî girtiye. Hesen Beg bi mebesta îstilakirina Miksê ber bi Miksê ve çûye. Şerê di navbera Hesen Beg û Ehmed Begde Hesen Beg hatiye kuştin. Bi vî awayî Ehmed Beg li Miksê bûye mîrê serbixwe. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Ehmed Beg li ser rêvebiriye Miksê bûye (Şerefname, r.264). Cegerxwîn bi bangkirina rêvebirekî bihêz ê wek Rustem

Beg, tunebûna rêveberiya Kurdan a roja xwe daye xuyakirin. Piştre Ehmed Begê ku wek mîrê dawî di *Şerefname*yê de cih girtiye bi du malikan bi bîr aniye. Di *Şerefname*yê de agahiyên di derheqê van mîran de di bin sernavekî de hatine dayin. Cegerxwîn ji bo navê wan malikên cuda saz kirine.

**Tablo 3.2.22.**Begên Miksê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Emîr Ebdal, Ehmed Begê kurê Mîr Ebdal, Ebdal Begê kurê Emîr Ehmed, Rustem Begê kurê Hesen Beg, Hesen Begê kurê Rustem Beg, Mîr Ehmedê kurê Ebdal Beg, | Ebdal<br>Emîr Ehmed<br>Ebdal Beg<br>Ristem<br>Emîr Ehmed |
| Dem | Sedsalên XV-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Miks, Karkar | Muks, Karkar |

### 3.2.23.Mîrên Esbayêrdê

Navê vê mîrektiyê di *Şerefname*yê de wek Esbayêrd (Îsbayird/Îspayirt) derbas bûye, lê Cegerxwîn menzûmeya xwe wek "Beganê Esyaperd" bi nav kiriye. Wî bi deh malikan behsa pênc mîrên vê binemalê kiriye. Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Fermanrewayên Esbayerdê de ye" debas bûye.

23/1 Ji Esyaperd tu rabe ey Muhammed
413 Temaşake ji Loran ta bi Amed

23/2 Hemî jar û belengaz û xizan in
414 Belê çibkim bi derdê xwe nizanin

Dema ku mîrên Kurdan serî li ber siltanê Dewleta Osmanî tewandine berpirsiyarê Esbayêrdê Mihemmed Beg bûye. Du kur li pey xwe hiştine û miriye (Şerefname, r.265). Cegerxwîn bi bangkirina Mihemmed Beg, hem jar û belengaziya seranserê welat hem jî nezanî û bêhişmendiya Kurdan diyar kiriye.

23/3 Tu Ibrahîm î hîmê Dewleta Kurd
415 Belê Kurd maye îro jar û bê gurd

23/4 Ne bext maye ne text û tac û efser
416 Ne key maye ne mîr maye ne serwer

Siltan Îbrahîmê (Ibrahîmê) kurê Mihemmed Beg e, piştî mirina bavê xwe, li ser fermana Siltan Selîm Xan derketiye ser textê mîrektiyê. Dema ku Qizilbaşan êrîş anîne ser Wanê Siltan Îbrahîm di şerê li hemberî Qizilbaşan de hatiye kuştin û du kur li pey wî mane (Şerefname, r.265). Cegerxwîn Siltan Îbrahîm wek hîmê Dewleta Kurd dîtiye, çimkî ji bo dewletê pêdivî bi key, mîr û serwerên hêja hene. Lê îro bextê Kurdan nebaş e, text, tac û efserên wan ji holê rabûne, lewma Kurd jar û perîşan mane.

23/5 Muhemmed Beg tu rabe ey tu jîrek
417 Di nav Kurdan ne şah maye ne mîrek

23/6 Hemî jar û belengaz û xizan in
418 Gelek mêr in welakin bê xwedan in

Mihemmed (Muhemmed) Begê kurê Îbrahîm e. Piştî kuştina bavê xwe bûye mîrê Esbayêrdê. Piştre wî jî çar zarokên kur li pey xwe hiştine û miriye (Şerefname, r.265). Cegerxwîn bi van malikên li jor carek din ji bêxwedîbûna Kurdan gazin kiriye.

23/7 Li Kurmanca temaşake tu Eyyûb
419 Di bin destê neyaran de bi lûblûb

23/8 Seraser Lor û Gor û Bot û Zazan
420 Hemî Kurd in ji destê hev digazin

Eyyûbê kurê Mihemmed Beg, piştî mirina bavê xwe bûye cînişînê wî. Bavê wî hê di saxiya xwe de Eyyûb wek cînişînê xwe nîşan daye. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin desthilatdariya Eyyûb Beg a li ser textê mîrektiyê nêzîkî bîst sal bûye. Wî, bi serbilindî û dewlemendî welatê xwe bi rê ve biriye (Şerefname, r.265). Cegerxwîn ji alîkî ji kul û derdên bindestiya neyaran gazin kirine ji aliyê din jî ji bêtifaqiya Kurdan aciziya xwe aniye zimên. Ji bo Eyyûb di *Şerefname*yê de sernavekî cuda tune ye, agahiyên di derheqê wî de di bin sernava bavê wî de hatine dayin.

23/9 Were îro tu rabe ey Şeref Beg
421 Li Kurmanca binêre mane bê çek

23/10 Hemî serqot û jar û xwas û tazî
422 Seraser tev dikin feryad û gazî

Mîr Şerefê kurê Mihemmed Beg e. Dema birayê wî bûye rêvebirê mîrektiyê, Mîr Şeref çûye cem Sultan Silêman. Siltan bi fermana ku derxistiye nahiyeya Axakîsê ji mîrektiyê veqetandiye û wek senceq daye wî. Piştî demekê birêvebirina vê senceqê du kur li pey xwe hiştine û miriye. Ji ber herdu kurên wî hê zarok bûne ev senceq dane destê waliyekî Osmanî (Şerefname, r.265-266). Cegerxwîn di malikên ji bo Şeref Beg nivîsandine de jî rewşa Kurdan a perîşan li ber çavan raxistiye. Bi nêrîna Cegerxwîn a ji bo roja xwe îfade bike de Kurd mane bê çek; ango nikarin xwe biparêzin. Ji ber tiştekî ji destê wan nayê feryad û gazî dikin.

**Tablo 3.2.23.** Mîrên Esbayêrdê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Mihemmed Beg, Sultan Îbrahîmê kurêMihemmed Beg, Mihemmed Begê kurê Sultan Îbrahîm, Eyyûbê kurê Mihemmed Beg, Mîr Şerefê kurê Mihemmed Beg, | Muhemmed<br>Ibrahîm<br>Muhemmed Beg<br>Eyyûb<br>Şeref Beg |
| Dem | Sedsalên XV-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Esbayêrd, Axakîs | Esyaperd |

### 3.2.24. Mîrên Kilîsê

Nesla Mîrên Kilîsê, li gor îddiaya wan digihîje Hz. Ebbas. Li gor riwayetên herî baş ew kurapên Mîrên Hekkarî û Imadiyyê ne. Mîrên Kilîsê ji nesla Menteşa ne û ji wan re Mend hatiye gotin (Şerefname, r.267). Menzûmeya Cegerxwîn a bi sernavê “Beganê Kilîs” ji bîst malikan pêk hatiye û tê de navê deh mîrên Kilîsê derbas bûne. Di *Şerefname*yê de bi sernavê “Di Derheqê Fermanrewayên Kilîsê de ye” cih girtiye.

24/1 Were ey Menteşa rabe binêre
423 Welatê te bi carek zîv û zêr e

24/2 Kilîs maye di bin destê namerda
424 Gelek jar û belengaz e ji derda

Menteşa (Mend), dikaribûye eşîreteke Kurdan li derûdora xwe kom bike û piştre bi wan re biçe Misir û Şamê û bikeve bin xizmeta mîrên Eyyûbiyan. Wan jî nahiya Quseyrê ya nêzîkî wilayeta Antakyayê dane Menteşa. Mîrên mezin ên Al-i Eyyûb eleqeyek zêde nîşanî wî dane û ew kirine mîrêmîranê hemû Kurdên li Şam û Helebê. Dema ku Mend miriye kurê wî Ereb Beg li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.268). Cegerxwîn ji destderketina Kilîsê gazin kirine. Wî bi hunera teşbîhê wesfên mirovan li Kilîsê bar kirine ku xemgîniya ji destderketinê bi hîssiyata Kilîsê bixwe daye.

24/3 Ereb Beg rabe ser xwe ev çi wext e
425 Ji bo Kurda ne bext maye ne text e

24/4 Hemî mîr û egîd û qubd û jîr in
426 Welakîn bê xwedan û şah û mîr in

Ereb Beg kurê Mendêye, piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê (Şerefnme, r.268). Ji xeynî vê agahiyê di derheqê wî de di *Şerefname*yê de tu agahî nehatine dayin. Cegerxwîn di malikên ji bo Ereb Beg rêz kirine de bêşensî û

bêhikumdariya Kurdan îşaret kiriye. Li gor nêrîna wî, Kurd herçiqas mîr, egîd, qubd û jîr bin jî bêxwedî ne, bê şah û mîr in.

24/5 Were carek binêre ey Cemal Beg
427 Heta îro bi hev re em ne bûn yek

24/6 Ji bo hev em çi fîl û kerkedan in
428 Di bin destê neyaran em şivan in

Cemal Begê kurê Ereb Beg, piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Ji xeynî vê agahiyê di derheqê wî de di *Şerefname*yê de tu agahî nehatine dayin. Li pey wî jî kurê wî Ehmed Beg hatiye cihê wî (Şerefname, r.268). Cegerxwîn di malikên ji Cemal Beg re nivîsandiye de ji ber yekîtî û bihevrebûna Kurdan tune ye, xemgîn e. Bi metaforên fîl û kerkedan ew, peyama Kurd li hemberî hev çawa bihêz in, bi hev re dikevin nav pevçûnê, lê di bin destê neyaran de wek şivanan belengaz in daye xwendekaran.

24/7 Were Ehmed Begê nazdar û pir xob
429 Li meydanê ne mane alê Eyûb

24/8 Li pê wan bûne para Tirk û Çerkes
430 Temaşake l'Kilîsê maye bê kes

Ehmed Begê kurê Cemal Beg e, di dema wî de Dewleta Al-i Eyyûb bi dawî bûye û welatê wan ketiye destê Çerkezên Memlûkî. Lê Ehmed Beg serî li ber Dewleta Çerkezan netewandiye û hikumdariyek serbixwe derbas kiriye. Wî du kur li pey xwe hiştine û miriye (Şerefname, r.268). Cegerxwîn bal kişandiye ser xerabûna Dewleta Eyûbî ya Kurd û li pey wan damezrandina Dewleta Çerkezan a Memlûkî. Ev bûyer di serdema Ehmed Beg de derketiye holê. Ji aliyê din ve Cegerxwîn hatiye roja xwe û bêkesiya Kilîsê aniye zimên ku ev yek ji ber xerabûna Mîrektiya Kilîsê ye.

24/9 Hebîb Beg rabe ser xwe ey sirfiraz
431 Li ser te şîn û qîr û deng û awaz

24/10 Temaşake li çolan em dibazin
432 Welatê xwe bi serbestî dixwazin

Hebîb Begê kurê Ehmed Beg e, piştî bavê xwe hatiye ser textê mîrektiyê. Siltanên Çerkez ew xapandine û birine li Helebê ewkuştine (Şerefname, r.268). Ji ber Hebîb Beg ji aliyê Siltanên Çerkez hatiye xapandin û kuştin, Cegerxwîn behsa şîna wî kiriye. Ji aliyê din ve bê welatî û perîşaniya Kurdan jî ji bîr nekiriye.

24/11 Were Qasim bike carek temaşa
433 Li ser me Tirk û Tacik bûne paşa

24/12 Reha kirne bi carek mîr û begler
434 Ji bona me nemane kom û leşker

Li pey Hebîb Beg, birayê wî Qasim Begê kurê Ehmed Beg hatiye ser desthilatdariyê. Lê Siltanên Çerkezan, hikumeta Kurd xistine destê Şêx Izzeddînê neviyekî şêxên Êzidî. Qasim Beg ev rewş nepejirandiye, ew û kurê xwe yê dozdeh salî yê bi navê Canpolat ketine maiyeta Siltan Selîm Xan. Piştî Sefera Siltan Selîm Xan a Misrê ku ji bo vê seferê Qasim Beg û kurê xwe yê dozdeh salî tevlî seferê bûne di rê de ji ber fitne û fesadiyan hatiye kuştin (Şerefname, r.268-269). Cegerxwîn, di malikên ji bo Qasim Beg nivîsandiye de ji serdestiya Tirk û Tacikan gazin kirine. Ji ber Tirk û Tacik li ser wan bûne paşa hêza Kurdan nemaye, bindest û bê parastin mane.

24/13 Tu Canpolad î mêr û pehlewan î
435 Gelo îro bi derdê me nizanî?

24/14 Leristanê tu bigre ta bi Xerpût
436 Hemî jar û perîşan mane pêrût

Canpolat Begê kurê Qasim Begê kurê Ehmed Beg e. Piştî kuştina bavê wî ew birine Stenbolê li Enderûna koşka Siltan. Di dema Siltan Silêman Xan de Canpolat Beg ji Enderûnê derxistine û kirine nav Leşkerên Muteferrîqayê. Di şerên ji aliyê siltan ve hatine kirin de ji ber Canpolat bi mêrxasî û bêtirsiyên mezin nîşan dane, ji aliyê Siltan ve hatiye teqdîrkirin. Canpolat daxwaza wezîfeya bav û bapîrên xwe ji siltan kiriye. Di netîceyê de bi fermana siltan Eyaleta Kilîsê û derûdora wê dane Canpolat Beg. Canpolat Beg nêzî sed salî jiyaye û tê gotin ku heftê kurên xwe yên temenê wan zaroktiyê derbasbûyî dîtine (Şerefname, r.269-270). Ji ber Canpolat Beg di mêr û mêrxasiyê de bi nav û deng bûye Cegerxwîn jî wî bi wesfên mêr û pehlewaniyê daye nasîn. Canpolat di Seraya Osmaniyan de mezin bûbe jî ji bo welatê bav û bapîran bi dest bixe ketiye nav têkoşînek. Ewdi dawiyê de vegeriyaye welatê xwe. Lewma Cegerxwîn xwestiye bi wesfên vî mîrî pêkanbûna rizgariya welat a ji Lorîstanê ta Xerpûtê diyar bike.

24/15 Were Ce’fer binêre tu li Kurda
437 Ji Zazan bigre carek ta bi Gurda

24/16 Hemî îro li çolan hacîleklek
438 Hemî derwêş û kêm û jar û parsek

Cehfer (Ce’fer) Begê kurê Canpolat e. Li ser wesiyeta bavê xwe û bi fermana Siltan Murad Xan li ser Mîrektiya Kilîsê rûniştiye. Piştî çar sal di ser hikumdariya wî de derbas bûne di şerê Osmanî yê ji bo girtina Şêrwanê ketiye rê. Di rê de ji hespê ketiye û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.271). Di van malikên li jor de di yê ku Cegerxwîn bangî Cehfer Beg kiriye de jiyana Kurdan a dijwar bi peyvên “derwêş, kêm, jar û parsek” li ber çavan raxistiye.  Kurd bi şêwazeke îronîk şibandine leglegan ku ne xwedî tu hêzê ne, bê war û welat wek leglegan koçber in. Ji aliyê din ve malika şazdehan a vê menzûmeyê biwêja “xelk bû beg, ez bûm legleg” tîne bîra mîrov. Ev biwêj tê wateya xelk bû beg, lê ez nebûm tiştekî, bi pêş de neçûm dide.

24/17 Tu meyzeke Hebîb Beg ev çi jan e
439 Erê jan e ji destê me nezan e

24/18 Beg û axa bi carek hev dikuştin
440 Çilon şêx û melayên me bi xiştin

Hebîb Beg kurê Canpolat Beg e. Piştî mirina bavê wî birayê wî Huseyîn Beg gelek tehdayî û heqaret lê kirine. Ji ber vê yekê çûye ser Kilîsê û dest daniye ser hinek malên bavê xwe. Çend girtiyên di gelek sal bûye ku di zindanê de bendkirî bûne ew dane berdan û bi wan piştstûr bûye. Wî gilî û gazinên xwe yên di derheqê birayê xwe de şandine Dîwana Siltan. Li ser vê, ji aliyê Dîwana Siltan ve Senceqa Nablûsê ya girêdayî Şamê dane wî. Lê ew bi vê senceqê razî nebûye, daxwaza Senceqa Balîsê ya girêdayî Helebê ku di bin desthilatdariya birayê wî Huseyîn Beg de bûye, kiriye. Ev daxwaz ji aliyê Dîwana Siltan ve hatiye qebûlkirin. Lê ji ber Huseyîn Beg berpirsiyarek şandiye Asîtaneyê, senceq ji Hebîb Beg hatiye girtin. Vê bûyerê tesîrek mezin li Hebîb Beg kiriye û ew çûye cem Siltan Murad Xan û daxwaza fermanrewatiya Kilîsê kiriye. Senceqa Kilîsê di navbera wî û birayê wî Huseyîn Beg de bûye sedemê dubendiyê. Carinan bi fermana hatiye derxistin rêvebiriya Kilîsê ketiye destê Hebîb Beg, carinan jî ji birayê wî Huseyîn Beg re hatiye dayin. Vê rewşê heta dawiya jiyana wî dewam kiriye (Şerefname, r.271-273). Cegerxwîn bi risteya "Beg û axa bi carek hev dikuştin" bal kişandiye ser şerê îqtidarê yê di navbera herdu birayan. Herwiha ev rewş tenê bi van herdu birayan ve ne girêdayiye, di heman demê de bi zimanekî îronîk şêx û melayên roja xwe jî rexne kirine.

24/19 Hisên Beg rabe ser xwe ey ciwanmêr
441 Binêre tu li Kurmanca wekî şêr

24/20 Hemî mêr û egîd in tev de şûrkêş
442 Li paş namînî her kes, tev diçin pêş

Huseyîn (Hisên) Begê kurê Canpolat Beg, piştî mirina birayê xwe Cehfer Beg bûye mîrê welat. Birayê wî Hebîb Beg li hemberî wî ketiye nav şerê îqtidarê û çend salan Kilîs jê stendiye. Lê wî di dawiyê de rêvebiriya welat dîsa girtiye destê xwe. Huseyîn Beg piştî çend salan bêastengî hikumdartiya Kilîsê kiriye sewdaya Mîrêmîrantiya Trablusşamê ketiye serê wî û xwestiye Kilîsê jî bi vê mîrêmîrantiyê

ve girêbidin. Di sala 1001ê k./1592-93yê z. de bi fermana siltan xwesteka wî hatiye cih û leqeba "paşa" girtiye. Lê bi sûcdariya kuştina giregirekî Ereban ê bi navê Qemîze ji vê wezîfê hatiye avêtin. Piştî vekolînê bêsûcdariya wî hatiye dîtin. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin hê bê kar û bar li welatê dûr ê Osmaniyan bûye (Şerefname, r.274). Cegerxwîn ji bo li ser rewşa Kurdan hişmendiyê zêde bike, behsa paşdemayina Kurdan kiriye. Belê, Kurd; mêr, egîd û şûrkêş in lê ji pêşveçûnê bêpar in.

**Tablo 3.2.24**. Mîrên Kilîsê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Menteşa (Mend), Ereb Begê kurê Menteşa, Emîr Cemalê kurê Ereb Beg, Ehmed Begê kurê Emîr Cemal, Hebîb Begê kurê Ehmed Beg, Qasim Begê kurê Ehmed Beg, Canpolat Begê kurê Qasim Begê kurê Ehmed Beg, Cehfer Begê kurê Canpolat Beg, Hebîb Begê kurê Canpolat Beg, Huseyîn Begê kurê Canpolat Beg | Menteşa<br>Ereb Beg<br>Cemal Beg<br>Ehmed Beg<br>Hebîb Beg<br>Qasim<br>Canpolad<br>Ce'fer<br>Hebîb Beg<br>Hisên Beg |
| Dem | Sedsalên XIII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Misir, Şam, Heleb, Nahiya Quseyr (Antakya), Kilîs | Kilîs |

### 3.2.25. Begên Şêrwanê

Detshilatdariya begên Şêrwanê ji hikumetek û du zeametan (Kurnê, Êrûnê) pêk hatiye. Li gor riwayetê nesla Mîrên Şêrwanê ji wezîrekî mala Eyyûbiyan hatiye. Dema Dewleta Eyyûbî di sala 662yê k./1264ê z. de ber bi rûxandinê ve çûye, yek ji zarokên wan hatiye vî welatî û hakîmiyeta wê girtiye destê xwe. Li gor riwayetek din jî nesla van mîran digihîje mîrên Şêrwanê. Ew sê bira bûne û hatine li wilayeta Kifrê bicî bûne. Yekem kesê ku li Kifrê mîrektî kiriye Mîr Huseyîn (Hisên)[304]ê kurê Emîr Îbrahîm bûye (Şerefname, r.276). Menzûmeya "Beganê Şêrwan"ê ji hijdeh malikan

[304] Di wergera Abdullah Yegin (r.273) de bi navê Hesen derbas bûye. Di wergera İbrahim Sunkur (r.277-278) û Ziya Avci (r.275-276) de bi navê Huseyîn dest pê kiriye, dawiyê navê Hesen hatiye bi bîr anîn.

pêk hatiye û Cegerxwîn tê de behsa neh mîrên Şêrwanêkiriye. Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Begên Şêrwanê de ye" derbas bûye.

25/1 Were ey Mîr Hisên ey mîrê Şêrwan
443 Di Şêrwan de ne mêr mane ne şêr man

25/2 Temaşake li Awîl û li Eyrûn
444 Nehin wek we ji gerdûş ta bi gerdûn

Mîr Huseyîn (Hisên) bavê pênc zarokên kur bûye. Dema ew kal bûye welatê xwe di nav kurên xwe de parve kiriye û li ser vê wesiyetnameyek amade kiriye. Li gor vê parvekirinê Kela Şebistanê û erdên bi wê ve girêdayî daye Emîr Mihemmed. Kela Kifrê û cihên bi wê ve girêdayî para Mîrza ketine. Kela Êrûnê bi cihên pê ve girêdayî bûye para Şemseddîn. Kela Awêlê bi erdên pê ve girêdayî, para Mecdeddîn ketine. Wî Mîr Şah Mihemmed jî kiriye cîgirê xwe. Piştî mirina Mîr Huseyîn kurê wî yê Mîr Şah Mihemmed hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.276). Cegerxwîn bi van malikên li ser Mîr Huseyîn nivîsandiye, rewşa Şêrwanê ya bindest û wêran daye berçavan. Ji holêrabûna mîran bi risteya "Di Şêrwan de ne mêr mane ne şêr man" îfade kiriye.

25/3 Were ey Şah Muhemmed şahê serbest
445 Eşîr û êl û bajar bûne bindest

25/4 Di nav wan de ne mîr maye ne şahek
446 Ji bo wan re ne rê maye ne rahek

Mîr Şah Mihemmedê (Muhemmedê) kurê Mîr Huseyîn e, piştî mirina bavê xwe hatiye ser fermanrewatiya Kifrê. Dema birayê wî yê biçûk Mecdeddîn çûye rehma Xwedê, Mîr Şah Mihemmed, Kela Awêlê jî kiriye ser Kifrê û bûye hikumdarekî serbixwe. Piştre çar zarokên kur li pey xwe hiştine û wefat kiriye (Şerefname, r.276). Cegerxwîn dema bangî Şah Mihemmed kiriye serbestiya dewra

wî û bindestiya dewra xwe bi peyvên tezat ên serbest û bindest daye berçavan. Ji ber ku hikumdar û rêberên Kurdan nemane ew bêçar e ne, rê li ber wan hatine girtin.

25/5 Emîr Ebdal tu meyzake li Kufra
447 Ne Kufra ye belê eywanê Kesra

25/6 Gelek xweş e wekî bûka cihan e
448 Belê îro di rengê çillexan e

Mîr Ebdalê kurê Şah Mihemmed e, piştî mirina bavê xwe bûye fermanrewayê Kifrê. Piştî çend salan rêvebiriya welat kiriye çûye rehma Xwedê. Mîr Şah Mihemmedê kurê wî li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.276). Cegerxwîn di van malikên jor de berê li ser meziyetên baş ên Kifrê (Kufra) sekiniye. Kifr wek navenda rêvebiriyê bi eywana (dîwana) Kisra re kiriye yek û şibandiye bûka cihanê. Lê îro tu qîmet û xweşiya wê nemaye, bûye wek çîlexanê.

25/7 Were rabe Emîr Şah ey Muhemmed
449 Welatê te xweş e zozan û Serhed

25/8 Bi av û mêwe ye xweş nazenîn e
450 Belê çibkim he ro lê ah û şîn e

Mîr Şah Mihemmedê (Muhemmedê) kurê Mîr Ebdal e. Piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Dema mîrên Kurd ji bo îta'eta xwe pêşkêşî Şah Îsmaîl bikin çûne Seraya wî, Mîr Şah Mihemmed jî bi wan re bûye. Şah Îsmaîl, Mîr Şah Mihemmed û Elî Begê Sasonî ne tê de mîrên din girtine û xistine zindanê. Navbera Mîr Şah Mihemmed û Şah Îsmaîl gelek baş bûye. Şah Îsmaîl, baweriya xwe pê aniye û mulkiyeta wilayeta Kifrê paş de dayê. Demeke dirêj di nav xweşî û firehiyê de rêvebiriya welatê xwe kiriye. Bi rizaya dilê xwe di lehê kurê xwe yê mezin Mihemmed Beg de dev ji mîrektiyê berdaye. Piştî deh salan di înzîvayê de maye çûye rehma Xwedê. Dema ku miriye çar zarokên kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.276-277). Cegerxwîn wek di gelek malikên din de jî tê dîtin ne li ser bûyerên

*Şerefname*yê çûye. Bangî Mîr Şah Mihemmed kiribe jî dewra wî nehatiye destnîşankirin. Cegerxwîn berê xweşikiya welat daye ber çavan. Welat xweş e, zozan û Serhed e, av û mêwe tê de hene û nazenîn e. Lê ji ber îro serweriya welat ji dest derketiye lê ah û şîne.

25/9 Muhemmed Beg tu xweş mêr û ciwan î
451 Erê ka ew sera û birc û xanî

25/10 Li alîkî Qizilbaş û yekîtî Rûm
452 Kirin wêran ji bo kund û ji bo bûm

Mihemmed Begê kurê Şah Mihemmed e. Li gor wesiyeta bavê xwe Mîrektiya Kifrê û yên derûdora wê girtine destê xwe. Piştî sî salê mîrektiyê, Ebdal Begê birayê wî li ser hikumeta Kifrê li dijî wî rabûye û doza mîrektiyê kiriye. Li ser vê, Mihemmed Beg bi xwesteka xwe kar û barên hikumetê ji birayê xwe re hiştine. Ew çûye Kela Bergêriyê[305] û rêvebiriya wê kiriye. Dema Şah Tehmasbê Sefewî êrîşî ser kelê kiriye û xwestiye wê îstîla bike zivistaneke gelek hişk, sar û serma hebûye. Kela Bergêriyê sê mehan di bin muhaserayê de maye. Mihemmed Beg, li ser agahiya ji aliyê Dîwana Siltan Silêman Xan ve Mîrektiya Kifrê ji birayê wî Ebdal Beg re hatiye dayin, kelê teslîmî mirovên Şah kiriye û berê xwe daye Asîtaneyê. Lê ji ber dilnexwazan ji Siltan Silêman re gotine bi qestî kelê teslîm kiriye, fermana îdama wî derketiye û ew îdam kiriye (Şerefname, r.278). Cegerxwîn xwestiye bîne zimên ku Mihemmed Beg, mîrekî bihêz û rêvebirekî baş bûye; lê ji aliyekî Qizilbaş, ji aliyê din ve Rûm (Osmanî) qada jiyana wî teng kirine. Bi rûxandina mîrektiyan desthilatdarî ketiye destê rêvebirê biyanî ku ew jî wek kundê (bûm) bê yewm li ser serê Kurdan dixwînin.

25/11 Were Ebdal binêre Tirk û Tacik
453 Ji me kuştin gerda û kal axçîk

[305] Di wergera İbrahim Sunkur de hatiye gotin ku ji ber rêveberiya Eyaleta Kifrê ji Dîwana Siltan Silêman Xan ve jê re derneketiye, çûye Kela Bergêriyê ya li ser sînorê Qizilbaşan û peywira parêzeriya keleyê girtiye (r.279).

25/12 Li çar aliyî pakê me dikuştin
454 Di nav me kerkeden û fîl nehiştin

Ebdal Begê kurê Mîr Şah Mihemmed e. Piştî kuştina birayê xwe Mihemmed Beg, desthilatdariya Kifrê girtiye destê xwe. Piştî sêzdeh salên wî yên li ser desthilatê, di navbera wî û mîrê Xizanê de dubendî derketiye û Ebdal Beg Kela Xîzanê muhasere kiriye. Li ser vê, şerekî giran derketiye. Sultan Silêman Xan ji bo vekolîna vê bûyerê ferman daye Mîrêmîranê Wanê. Wî jî piştî vê vekolînê ji ber Ebdal Beg êrîş biriye ser Xîzanê ew girtine û avêtine zindanê. Fermana îdamkirina Ebdal Beg derketiye û ew li Wanê kuştine. Piştî wî hikumeta Kifrê çend salan di destê biyaniyan de maye. Dema kurê wî Mehmûd mezin bûye doza melbenda bav û bapîrên xwe kiriye. Bi fermana Siltan Selîm Xan, bi usûla berê desthilat girtiye destê xwe (Şerefname, 278-279).

Cegerxwîn bi van malikên xwe diyarkirina herdu deman jî kiriye. Di Dema Ebdal Beg de piştî kuştina birayê wî Mîhemmed Beg, ew jî kuştin. Herwiha serokên Kurdan ên bihêz ji holê hatine rakirin. Cegerxwîn vê rewşê bi risteya“Di nav me kerkeden û fîl nehiştin”destnîşan kiriye. Ji aliyê din ve heman dijmin niha jî gerda (geda), kal û axçîk (keça xama ya berzewac) kuştine.

25/13 Were Mehmûd binêre gule’zara
455 Hemî sor in li ber pozê neyara

25/14 Ciwan in surperî ne dot û xanim
456 Ney û mey deng û hêstir ez dizanim

Mehmûd Begê kurê Ebdal Beg e. Piştî kuştina Ebdal Beg hikumeta Kifrê çend salan di destê biyaniyan de maye. Dema kurê wî Mehmûd mezin bûye doza melbenda bav û bapîrên xwe kiriye. Bi fermana Siltan Selîm Xan, desthilatdarî girtiye destê xwe. Mehmûd Beg bi dadmendî û xweşî hikmê xwe meşandiye. Bi saya wî rûniştiyên welatê wî ketine nav xweşiyê û kul û derdên çend salan ji bîr kirine. Koşk, seray û şaneşîna wî hertim bi hevl û dostên wî yên ciwan tijî bûne. Heta jiyaye tu wextê dengê şirrîniya meyê, nalîna neyê, lorîna bilûrê û awaza saz û santurê ji ber

guhên wî kêm nebûne. Bi vî awayî sê salan li ser desthilatdariya wî re derbas bûye. Şevekî di nav nivînên xwe de bi derbeyek şûrê kuştî hatiye dîtin (Şerefname, r.279-280). Cegerxwîn bi van malikên bangî Mehmûd Beg kiriye de bal kişandiye ser xweşikiya welat ku îro tu wateya xweşikiya welat nemaye. Çimkî welat ketiye destê neyaran. Ji aliyê din ve Cegerxwîn şahî û xweşiyên serdema Mehmûd Beg bi bi bîr aniye. Di *Şerefname*yê de jî ji bo şahiyên dewra Mehmûd Beg îfadeyên wek "meygerên xweşik û ciwan, nazdarên şox û şeng, rûgeş û gerdenzer" derbas bûne. Di wê dewrê de amurên muzîkê jî gelek hatine bikaranîn ku Cegerxwîn ji wan cih daye "ney"ê. Lê di heman demê de behsa deng û hêsirên çavan (hêstir) jî kiriye. Di vir de tê dîtin ku xweşî û şahiya serdemên berê cihê xwe daye deng û hêsirê niha.

25/15 Were Zînil temaşake li Kurdan
457 Gelek mêr in belê jar in ji derdan

25/16 Egîd in tev wekî Ristem kurê Zal
458 Dikin cengê bi şûr û gurz û mertal

Zeynel (Zînil) Begê kurê Ebdal Beg e. Dema ku Mehmûd Beg di nav cihên xwe de kuştî hatiye dîtin ji ber birayên wî gelek biçûk bûne Mîr Hesenê Kurneyî çend salan Mîrektiya Şêrwanê kiriye. Dema Zeynel Begê birayê Mehmûd Beg mezin bûye, bi doza rêvebiriya hikumeta Kifrê berê xwe daye Asîtaneyê. Bi leşkerê Osmanî re çûye fetha Kela Aklabandê û ji vê seferê serkeftî vegeriyane. Li ser vê fermana Mîrektiya Kifrê ji wî re derketiye. Kar û barên rêvebiriyê bi awayekî sergiran û bi haydarî girtine dest xwe. Piştî desthilatdariya sî salî bi nexweşînek giran ketiye. Ew, di sala 1005ê k./1597ê z. de çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.280). Cegerxwîn behsa egîdî, mêr û mêrxasiya Kurdan kiriye ku ew gelek cengawer û bêtirs in; lê ji derd û kulên bêwelatiyê diêşin.

25/17 Erê Ebdal tu xurt û pir ciwan î
459 Belê çibkim bi derdê me nizanî

25/18 Weke we em bi carek tev diarin
460 Ker û gêj û li bin destê neyaran

Ebdal Begê kurê Zeynel Beg, xortekî gelek ciwan û baş bûye. Piştî mirina bavê xwe li ser wesiyeta wî û bi fermana Siltan Mihemmed Xan hatiye ser rêvebiriya mîrektiyê. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin hê hikumdarê mîrektiyê bûye (Şerefname, r.280). Cegerxwîn Ebdal Beg bi wesfên wî yê di *Şerefname*yê de derbas dibe daye. Ji bilî vê belengazî û bindestiya Kurdan a roja xwe carek din aniye zimên.

**Tablo 3.2.25.**Begên Şêrwanê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Mîr Huseyînê kurê Emîr Îbrahîm, Mîr Şah Mihemmedê kurê Mîr Hesen, Mîr Ebdalê kurê Şah Mihemmed, Mîr Şah Mihemmedê kurê Ebdal, Mihemmed Begê kurê Mîr Şah Mihemmed, Mehmûd Begê kurê Ebdal Beg, Zeynel Begê kurê Ebdal Beg, Ebdal Begê kurê Zeynel Beg | Mîr Hisên<br>Şah Muhemmed<br>Emîr Ebdal<br>EmîrŞahMuhemmed<br>Muhemmed Beg<br>Ebdal<br>Mehmûd<br>Zînil<br>Ebdal |
| Dem | Sedsalên XIII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Şêrwan, Kifre, Awêl | Şêrwan, Kufra, Awîl, Eyrûn, Serhed |

### 3.2.26. Mîrên Kurnê (Şebistan)

Mîrên vê binemalê di *Şerefname*yê de bi navê Kurnê (Kurnî/Gernî) derbas bûne. Cegerxwîn wan wek "Beganê Şebistan"[306] bi nav kirine. Wî, di vê menzûmeyê de bi çar malikan behsa du mîrên Şebistanê kiriye.

26/1 Were ey Mîr Muhemmed ev Şebistan
461 Reben maye ji destê gorperistan

[306] Keleha Şebistanê girêdayî Şêrwanê bûye ku Şêrwan dikeve navbera Sêrt, Berwarî, Xîzan û Baykanê.

26/2 Bi talan û bi lêdan û bi kuştin
462 Ji me Kurda yekî serbest nehiştin

Mîrên Kurnê, ji zarok û neviyên Mîr Mihemmedê Gewrê[307] kurê Emîr Hesen in. Dema ku bavê Emîr Hesen wilayeta xwe di nav kurên xwe de parve kiriye, Kela Şebistanê daye destê Mîr Mihemmedê Gewrê (Şerefname, r.280). Cegerxwîn bi bangkirina Mîr Mihemmedê Gewrê, diyar kiriye ku bi talan, lêdan û kuştin Şebistan ji dest derketiye. Wî lewma wesfên mirovekî reben li Şebistanê bar kirine.

26/3 Were Zînil Begê lawê Suleyman
463 Temaşake li bajarê Şebistan

26/4 Hemî wêran û jar in birc û xan
464 Dinalin ew ji ber jana xizanî

Zeynel (Zînil) Begê kurê Silêman Beg e, ew xortekî dûrbîn û zîrek bûye. dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Zeynel Beg, li ser desthilatdariyê bûye. Rêvebiriya Şebistanê ji aliyê Dîwana Siltan ve bi zeametî ji bo wî hatiye dayin. Ji xeynî vê Senceqa Axakîsê jî bi zeametî jê re derketiye (Şerefname, r.281). Cegerxwîn dîsa ji bo êş û jana ji destderketina welat, wesfên mirovan li birc û xanê kiriye ku ji ber wêranbûna Şebistanê dinalin.

**Tablo 3.2.26.** Mîrên Kurnê(Şebistan)

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Mîr Mihemmedê Gewrê kurê Emîr Hesen, Zeynel Begê kurê Suleyman Beg, Mîr Hesenê kurê Melik Suleyman | Mîr Muhemmed<br>Zînil Begê lawê Suleyman |
| Dem | Sedsalên XIII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Şebistan, Axakîs | Şebistan |

[307] Ev nav di wergera İbrahim Sunkur de wek Mîr Mihemmedê Kor derbas bûye (r.283).

### 3.2.27. Mîrên Êrûnê

Li gor *Şerefname*yê Kela Êrûnê bi zeametî di destê Mîr Melikê kurê Mîr Hesenê kurê Şemseddînê kurê Mîr Hesen de bûye. Mîr Melik di nav mîrên Kurdistanê de bi mêrxasî û merdîtiya xwe hatiye naskirin. Ew gelek dîndar û girêdayî esasê Îslamê bûye (Şerefname, r.282). Menzûmeya Cegerxwîn a bi sernavê "Beganê Eyrûn" ji du malikan pêk hatiye. Tu mîrên Eyrûnê yê bi navê Mihemmed tune ye; lê Cegerxwîn ji bo mîrê Êrûnê (Eyrûnê) navê Mîr Mihemmed bi kar aniye. Lê dibe ku ji "Mîr Muhemmed" qesta wî ji ber merivatiya navbera herdu zeametan Mîr Mihemmedê Gewrê be. Li gor Dîlawerê Zengî diyar kiriye, di destnivîsê de bi awayî "Were ey Mîr Muhemmed **ey** şahê Eyrûn/ Ne Şêrwan ma ne Eyrûn ma hemî çûn"derbas bûye ku ji ber "ey" zêde hatiye nivîsandin kêşa vê malikê şikestî ye.

27/1 Were ey Mîr Muhemmed şahê Eyrûn
465 Ne Şêrwan ma ne Eyrûn ma hemî çûn

27/2 Bi carek em ji Loran ta bi Zazan
466 Di bin destê neyaran tev de razan

**Tablo 3.2.27.**Mîrên Êrûnê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Mîr Melikê kurê Mîr Hesenê kurê Şemseddînê kurê Mîr Hesen | Mîr Muhemmed |
| Dem | Sedsalên XIII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Êrûn | Eyrûn, Şêrwan |

### 3.2.28. Mîrên Dêrzînê

Şêx Hesenê Zirkî,[308]demaji dêvla hikumdarê Mêrdînê rêvebirîgirtiye destê xwe, welat (Dêrzîn, Girdikan, Etaq, Tercil) di navbera zarokên xwe de parve kiriye. Kurê wî yê bi navê Habîl hatiye Dêrzînê.[309]Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Mîrên Dêrziniyê de ye" derbas bûye. Cegerxwîn di menzûmeya xwe ya "Beganê Dêrzîn" de bi deh malikan behsa pênc mîrên Dêrzînê kiriye. Di nav van mîran de mîrê ewil ê di derheqê wî de agahî hene Emîr Hemze ye.

28/1 Emîr Hemze were rabe ji Dêrzîn
467 Ne Dêrzîn e welakin bûye dêrşîn

28/2 Di nav wan de he ro şîn û girîn e
468 Heye sed sal xweşî carek nedîne

Emîr Hemzeyê kurê Emîr Xelîlê kurê Emîr Gazî ye. Demek dirêj li ser fermana Şah Îsmaîlê Sefewî kar û barên Dêrzînê meşandine. Dema çûye rehma Xwedê Mihemmed Begê kurê wî îta'eta xwe ji Siltan Selîm Xan re pêşkêş kiriye. Mîr Mihemmed, heta miriye kar û barên Dêrzînê bi awayekî serfiraz meşandine. Çar zarokên kur li pey xwe hiştine û wefat kiriye. Piştî mirina wî Elî Begê kurê wî hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.285). Ji ber dêrek gelek mezin li Dêrzînê hebûye Cegerxwîn peywendî pê re daniye û gotiye ku Dêrzîn bûye dêrşîn. Ango rojên xweş ên Serdema Mîrektiyan li paş maye. Keder û kovan li ser Dêrzînê girtiye, şîn û hawar e. Cegerxwîn behsa Mihemmed Begê kurê Emîr Hemze nekiriye. Piştî Emîr Hemze, Elî Begê kurê Mihemmed Beg bi bîr aniye.

---

[308] Li gor riwayetê koka mîrên Zirkiyan digihîje Erebên Şamê. Şêx Hesenê kurê Seyîd Ebdurrehman, welatê xwe terk kiriye û hatiye li Mêrdînê bicî bûye ku li wir wek Şêxê Ezraqî hatiye naskirin. Bi demê re herfa "E"yê ketiye û navê Ezraq di zimanê xelkê de halê Zirkî/Zirqî girtiye. Şêx Hesen ewqas dîndar û Xwedêtirs bûye, giregirên Mêrdînê li derûdora wî berhev bûne. Lewma Siltanê Mêrdînê yê wê çaxê Emîr Artûq jê tirsiyaye û ew di Kela Mêrdînê de xistiye zindanê. Piştî demekê ji ber kerametê Şêx Hesen hatine dîtin, Şêx ji zindanê derxistine, Siltan jî bûye murîdê wî. Di *Şerefname*yê de di agahiyên derheqê mîrên Zirkan de tê gotin ku: Siltan keça xwe li Şêx Hesen mehr kiriye lê di agahiyên ser mîrên Tercîlê de hatiye gotin ku keça Siltan bi kurê Şêx Hesen, Seyîd Hesen re zewiciye. Lê navê Şêx bixwe Hesen e.

[309] Dêrzîn keleyek bûye û di hindurê wê de dêrek gelek mezin jî hebû ye. Navê keleyê yê berê Dêrzîr bûye ku li gor wergera İbrahim Sunkur Dêrzîr tê wateya "Dêra Jêrê"(r.285).

28/3 Elî Beg rabe ser xwe ey begê rind
469 Li nav Kurda ne bajar e ne jî gund

28/4 Ne rez mane ne bistan û gulistan
470 Temaşake bi carek bûne wêran

Elî Begê kurê Mihemmed Beg e. Elî Beg, ji bo desthilatdariyê bi birayên xwe re ketiye nav şerê îqtidarê. Di netîceyê de Elî Beg zora tevan biriye û wilayet ji destê wan stendiye. Heft salan bê astengî bi awayekî serbixwe rêvebirî kiriye. Piştî mirina wî birayê wî Şah Qulî Beg li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.285). Tu agahiyên serdema Elî Beg bîne bîra mirov di malikên li jor de nayê dîtin. Cegerxwîn li ser wêranbûna welat sekiniye. Ne bajar mane ne gund, ne rez mane ne bistan û gulistan…

28/5 Were ey Şah Qulî Beg ey begê qenc
471 Tu şahmatê me Kurda ye di setrenc

28/6 Ku şah kuştin peyak mane perîşan
472 Di piştî we hemî bûn xanî wêran

Şah Qulî Begê kurê Mihemmed Beg e. Piştî mirina birayê xwe Elî Beg, di sala 941ê k./1535ê z. de bi fermana Siltan Silêman Xan li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Heşt salan karû barên welat bi rê ve birine. Carekê di vegera Stenbolê de li Boluyê rastî Nasir Begê Zirkî yê Begê Gurdikan hatiye. Ji berê ve di navbera wan de dijminatî hebûye. Di şerê derketiye de Şah Qulî Beg hatiye kuştin (Şerefname, r.286). Cegerxwîn behsa kuştina Şah Qulî Beg kiriye û ew şibandiye şahmatê setrencê. Şahmat di leyistina setrencê de tê wateya xelasbûna leyistinê. Bi kuştina Şah Qulî maîyeta wî wêran û perîşan mane. Cegerxwîn rûxandina mîrektiyan jî diyar kiriye ku piştî vê heyamê welat hatiye wêrankirin.

28/7 Were Ye’qûb Begê zana û xweş vîn
473 Bixwîne zarê Kurdî zarê şêrîn

28/8 Te dîwanek ji bo Kurda re çêkir
474 Nizanim bê te navê wê çi lê kir

Yaqûb (Ye’qûb) Begê kurê Mihemmed Beg e. Piştî kuştina birayê xwe Şah Qulî Beg bi fermana Siltan Silêman Xan hatiye ser rêvebiriya Dîwana Zirkan. Yaqûb Beg, mirovekî têgihîştî, xwediyê exlaqekî baş û sofî bûye. Gelek şi’irên li ser yekîtiya Xwedê û heqîqetan li pey xwe hiştine. Piraniya şi’irên wî bi Kurdî bûne û dîwanek wî ya şi’iran hebûye. Piştî bîst û pênc salan rêvebirî kiriye bi riza dilê xwe dev ji rêvebiriyê berdaye. Wî kurê xwe Dûman Beg li cihê xwe daniye. Dûman Beg du sal şûn de di Şerê Şêrwanê de tevî hin mîrên Kurdan ên din ji aliyê Qizilbaşan ve hatiye kuştin. Du zarokên kur li pey wî mane. Salekê piştî mirina Dûman Beg, bavê wî Yaqûb Beg jî miriye (Şerefname, r.286). Cegerxwîn aliyê Yaqûb Beg ê edibî, zanyarî bi bîr aniye. Dîwana wî ya ji şi’irên Kurdî pêk hatiye daye berçav û pê serbilind û şerefnak bûye. Lê di menzûmeya xwe de cih nedaye Dûman Begê kurê Yaqûb Beg.

28/9 Muhemmed Beg bike carek temaşa
475 Di nav Kurdan tu nabînî du paşa

28/10 Hemî pêk ve belengaz û şivan in
476 Gelek mêr in welakin pir nezan in

Mihemmed Begê kurê Dûman Beg e. Piştî mirina bavê xwe di sala 986ê k./1579ê z. de bi alîkariya kalê xwe di pazdeh saliya xwe de hatiye ser desthilatdariyê. Wezîfeya seroktî ûkar û barên mîrektiyê gelek baş meşandiye. Ev rewşa wî di nav emsalê wî de bûye sedemê dexesiyê. Mihemmed Begê Girdikanî bi dijminahiya kevin a di navbera wan de bi Mihemmed Beg re dest bi şer kiriye. Di netîceyê de Mihemmed Begê Girdikanî hatiye kuştin. Mihemmed Begê kurê Dûman Beg, bi awayekî serbixwe kar û barên rêvebiriyê meşandiye. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Mihemmed Beg, li ser desthilatdariya mîrektiyê bûye (Şerefname, r.288). Cegerxwîn di malikên ku ji bo Mihemmed Beg nivîsandiye de ji bêserokî û nezaniya Kurdan gazin kirine.

**Tablo 3.2.28.** Mîrên Dêrzînê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Habîl kurê Şêx Hesenê Zirkî, Emîr Hemzeyê kurê Emîr Xelîlê kurê Emîr Gazî, Mihemmed Begê kurê Emîr Hemze, Elî Begê kurê Mihemmed Beg, Şah Qulî Begê kurê Mihemmed, Yaqûb Begê kurê Mihemmed Beg, Dûman Begê kurê Yaqûb Beg, Mihemmed Begê kurê Dûman Beg | Emîr Hemze<br>Elî Beg<br>Şah Qulî Beg<br>Ye'qûb Beg<br>Muhemmed Beg |
| Dem | Sedsala XII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Dêrzînî | Dêrzîn |

### 3.2.29. Mîrên Girdikanê

Qabîlê kurê Habîlê neviyê Şêx Hesenê Ezreqî, bi keçekî Qabîlî re rabûye û rûniştiye û jê zarokek çêbûye. Qabîl, ji tirsa bavê xwe û ji şerma ev zarok şandiye Kela Girdikan. Mîrên Girdikan ji nesla wî zarokî hatine û li gor vê kurapê Mîrên Dêrziniyê ne.[310]Navê vê Mîrektiyê di hersê nusxeyên di destê me de wek "Girdikan/Gûrdikan" derbas bûye. Cegerxwîn di menzûmeya xwe de mîrektiyê wek "Beganê Kurdikan" bi nav kiriye. Ev menzumeya Cegerxwîn ji heşt malikan pêk hatiye ku tê de navê çar mîrên vê binemalê cih girtine.

29/1 Emîr Nasir tu mîrê Kurdikan î
477 Belê çibkim di bin axê nihan î

[310] Me vê agahiyê li gor wergera Abdullah Yegîn (r.283) û İbrahim Sunkur (r.288) nivîsand. Ji ber ku di wergera Ziya Avci (r.288) de gotiye ku; "Qabîlê kurê Habîl, bi keça Qabîl re rabû û rûnişt û jê zarokek çêbû." mihtemelen di çapê de şaşiyek hatiye meydanê. Ji dêvla Qabîlî Qabîl hatiye nivîsandin.

29/2 Kemerbesto bide gurz û kilinga
478 Were Tirkan weke şêr û pilinga

Di navbera Mîr Nasirê Girdikanî û Mîrên Dêrzînê de li ser gundê Minarê ya di navbera Girdikan û Dêrzînê de tevlîhevî hasil bûye. Şah Qulî Begê mîrê Dêrzînê ji bo girtina gundê Minarê çûye Asîtaneyê û fermanek bi dest xistiye. Li ser vê Mîr Nasir, hêrs bûye û ber bi Stenbolê ve bi rê ketiye. Li Boluyê rastî hev hatine û di navbera wan de şer qewimiye. Wek me li jor jî diyar kir Şah Qulî Beg di vî şerî de miriye. Mîrlîwayê Boluyê Nasir Beg û sî heb mirovê wî girtine û bi fermana Siltan ew bi dar ve kirine (Şerefname, r.288). Cegerxwîn bangî Emîr Nasir kiriye ku wek şêr û pilingan bi Tirkan re cengê bike.

29/3 Muhemmed Beg tu rabe ser xwe îro
479 Li derdê me binêre ey tu mîro

29/4 We hev kuşt û we em kuştin bi carek
480 Di nav xwe de we dananî qe darek

Mihemmed (Muhemmed) Begê kurê Nasir Beg e. Piştî kuştina bavê xwe hatiye ser rêvebiriyê. Ji ber ew li hemberî Mihemmed Begê kurê Dûman Beg rabûye, ji aliyê mirovên Mihemmed Begê kurê Dûman Beg ve hatiye kuştin (Şerefname, r.289). Cegerxwîn vê bûyerê rexne kiriye û bi risteya “We hev kuşt û we em kuştin bi carek” de kuştina serok û rêberên Kurdan di warê bêserokî û bêxwedîtî de wek kuştina hemû Kurdan dîtiye. Ew ji bêtifaqiya Kurdan gazin kirine.

29/5 Were Nasir Begî ey şahê Gulgûn
481 Dem û dewranê bûrî tev neman çûn

29/6 Ne ew beg û ne ew deng û ne nîşan
482 Ne ew tac û sera û birc û eywan

Nasir Begê kurê Mihemmed Beg, di temenê zarokî de bi alîkariya Şemseddînê Kedxudayê Hezzoyê rêvebiriya mîrektiyê girtiye dest xwe. Mihemmed Begê Derzinî gundê Minarê û hinek mal, erzaq û xizmetkaran ji dêvla xwîna bavê wî dayê. Nasir Beg ji ber hê zarok bûye wextê xwe bi henek û şahiyan derbas kiriye. Xizmetkarekî wî yê bi navê Hesenê bi leqeba Çenber hebûye. Çenber hevalê Nasir ê gelek nêzîk bûye. Rojekî li nêçîrê Çenber heşîşê kêşaye û bi tesîra heşîşê mîrê xwe kuştiye. Mirovên Nasir Beg ên din jî Çenber kuştine. Du zarokên kur ên temenê wan biçûk li pey Nasir Beg mane (Şerefname, r.289). Cegerxwîn bi konjuktura dema xwe li serdema Nasir Beg mêze kiriye. Wî xwestiye bi bangkirina Nasir Beg, tunebûna bêseroktiya Kurdan a roja xwe bîne zimên.

29/7 Muhemmed Beg tu rabe ev çi beng e
483 Li nav Kurda hawar û qîr û ceng e

29/8 Li her alî dibazin dil birîndar
484 Ji bo xeşma neyaran qîr û hawar

Mihemmed (Muhemmed) Begê kurê Nasir Beg e. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Mîr Mihemmed di cihê bavê xwe de li ser textê mîrektiyê bûye (Şerefname, r.290). Cegerxwîn bi van malikên li ser Mihemmed Beg, hawara Kurdan a ji destê dijmin bi hestên ji dil kiriye qîrîn û hawar.

**Tablo 3.2.29.** Mîrên Girdikanê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Mîr Nasirê Girdikanî, Mihemmed Begê kurê Nasir Beg, Nasir Begê kurê Mihemmed Beg, Mîr Mihemmedê kurê Nasir Beg | Emîr Nasir<br>Muhemmed Beg<br>Nasir Beg<br>Muhemmed Beg |
| Dem | Sedsala XII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Girdikan, Gundê Minarê | Kurdikan, Gulgûn |

### 3.2.30. Mîrên Etaqê

Xanedana Ehmed Begê kurê Mîr Mihemmedê Zirkî ye. Ehmed Beg, ji binemaleke bi nav û deng a Kurdistanê ye. Cegerxwîn menzûmeya xwe ya bi sernavê "Beganê I'taq" ji deh malikan saz kiriye û tê de navê çar mîrên Etaqê (I'taq) derbas bûne. Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Fermanrewayên Ataqê de ye" derbas bûye.

30/1 Were ey xanedan û mîrê xwînxwar
485 Welatê te I'taq e maye bê dar

30/2 Mirovên te hemî bê çare xemgîn
486 Ne ew tenha belê em tev Cegerxwîn

Dema Şah Îsmaîl Diyarbekir û Kurdistanê îstila kiriye, Etaq (I'taq) ji destê Ehmed Beg stendiye û daye destê Eşîreta Qaçar. Vê rewşê heta Şerê Çaldiranê dewam kiriye. Bi şikestina hêzên Şah Îsmaîl, eşîretên Kurdan ji bo mulk û hikumetên xwe yên windakirî paş de bistînin, dest bi hereketê kirine. Kurdên Etaqê jî, Kela Etaqê ji destê Qaçarên Qizilbaş derxistine û Ehmed Beg kirine mîrê xwe. Ehmed Beg bi fermana Siltan Selîm Xan, demekê di welatê xwe de hikum kiriye. Sê zarokên kur li pey xwe hiştine û wefat kiriye. Lê hersê kurên wî li ser mîrektiyê bi hev nekirine. Ew çûne cem Siltan Silêman Xan. Dîwana Siltan biryar daye ku wilayeta wan di nav wan de bê parve kirin û beşek jê jî bikeve bin mulkiyeta Siltan (Şerefname, r.292). Cegerxwîn behsa Ehmed Begê mîrê destpêkê nekiriye. Ji ber mîrektî hatiye perçekirin hêrs û kerba wî di peyvên"xanedan û mîrê xwînxwar" de tê dîtin.

30/3 Erê Şahim I'taq e bûye kevnar
487 Birayê te hemî bûne birîndar

30/4 Belengaz in şikestî dest û gerden
488 Di zindanê dinalin rengê Bêjen

Şahim Beg kurê Ehmed Beg e. Ji parvekirina wilayetê mîktarek bihayê wê 200 hezar aqçeyê Osmanî wek senceq para wî ketiye. Di dema wezîrtiya Rustem Paşa de, Şahim Beg bi îxanetî û dizîtî hatiye tawanbarkirin. Li gor fermana Siltan Silêman ew kuştine. Piştî vê bûyerê wilayeta Etaqê nêzîkî bîst salan di destê memûrên Osmaniyan de maye (Şerefname, r.292). Cegerxwîn behsa tengasî û tevlîheviya roja xwe kiriye. Wî derd û kulên xwe bi diyaloga Şahim Beg re dane xuyakirin.

30/5 Were Yûsif tu rabe ev I'taq e
489 Di bin destê neyaran qaqeqaq e

30/6 Ne mîr mane ne paşa û ne begler
490 Di nav Kurdan ne rê mane ne rêber

Yûsif Begê kurê Ehmed Beg e. Dema li ser bûyerên Elqas Mîrza, Siltan Silêman ber bi Azerbaycanê ve çûye, Senceqa Etaqê bi şertê kela wê xera bike û zeameta xwe jî têxe ser senceqê daye Yûsif Beg. Yûsif Beg bi vî awayî çend salan kar û barên senceqê meşandine. Piştî mirina wî Senceqa Etaqê wek berê dane destê rêvebirekî Osmanî. Ji Yûsif Beg kurekî bi navê Hesen maye (Şerefname, r.292). Cegerxwîn bi malikên ji bo Yûsif Beg nivîsandine ji bêserokî û bêrêberiya Kurdan gazin kirine.

30/7 Hesen Beg wer binêre vî zemanî
491 Li ser me bûne paşa tev biyanî

30/8 Ji ber destê neyaran em dibazin
492 Li ser şaxa hemî hirç û beraz in

Hesen Begê kurê Yûsif Beg e. Piştî mirina bavê wî rêvebiriya welat du salan destê peywirdarê Osmanî de maye. Dema Siltan Selîm Xan derketiye ser text, Hesen Beg ji bo bi destxistina welatê xwe çûye Asîtaneyê. Bi fermana Siltan Senceqa Etaqê

wek Ocax jê re hatiye dayin. Wî bi serfirazî bîst salan mîrektiya Etaqê kiriye. Dema çûye rehma Xwedê du kurên wî hebûne. Bi fermana Siltan Mûrad Xan Mîrektiya Etaqê ji kurê wî Yûsif Beg re hatiye dayin. Lê Yûsif Beg, gelek di ser re derbas nebûye wefat kiriye (Şerefname, r.282). Cegerxwîn aciziya xwe ya tunebûna desthilateke Kurdan a serbixwe aniye zimên. Wî ji ber nezanî û bêdengiyê Kurd bi şiklê hirç û berazan îfade kirine.

30/9 Welî Beg rabe ser xwe ev çi gav e
493 Belengaz e heçî ku bê dirav e

30/10 Heçî zana û mîr in serneşêv in
494 Xwedî rûmet xwedanê zîv û zêr in

Welî Begê kurê Hesen Beg e. Piştî mirina birayê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Cîhanşah Begê pismamê wî yê ji dûr ve xwestiye mîrektiyê ji destê wî derxe. Lewma ew mecbûr maye ji bo Senceqa Etaqê 20 hezar filoriyê wê Cîhanşah bidana Xezîneya Diyarbekir, bide. Piştre İbrahîm Paşa, di berdêla salê 40 hezar filorî senceq daye Zûlfiqar Begê kurê Şahîm Beg. Ev rewş heta İbrahîm Paşa ji ser karê xwe yê wilayeta Diyarbekir hatiye ezilkirin dewam kiriye. Desthilatdariya senceqê carekê din ketiye destê Welî Beg. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin jî hikumdartiya mîrektiyê di destê wî de bûye (Şerefname, r.293). Cegerxwîn bal kişandiye ser vê rewşa han ku serok û rêberên Kurdan hatine serdemekî wisa ku kî xwedî dirav zîv û zêr bê, sûdê li Xezineya Diyarbekir a Osmanî bike dikare bibe desthilatdar. Hikumdartî ji wesfên rêberiyê yên berz dûr ketiye. Di vir de rexneyek giran li Osmaniyan hatiye kirin ku kîjan mîrê Kurd bi kêrî wan hatiye Osmanîyan ew derxistine ser textê mîrektiyê.

**Tablo 3.2.30.** Mîrên Etaqê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Ehmed Begê Mîr Mihemmedê Zirkî, Şahim Begê kurê Ehmed Beg, Mehmûd Begê kurê Ehmed Beg, Yûsif Begê kurê Ehmed Beg, Hesen Begê kurê Yûsif Beg, Yûsif Begê kurê Hesen Beg, Welî Begê kurê Hesen Beg, Zûlfiqar Begê kurê Şahim Beg | Şahim<br>Yûsif<br>Hesen Beg<br>Welî Beg |
| Dem | Sedsala XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Ataq, Nahiya Rabit, Meyafariqîn, Gundê Ciqsê | I'taq |

### 3.2.31. Begên Tercîlê

Li gor *Şerefname*yê di eslê xwe de koka Zirkiyan, Tercîl û Etaq e, Dêrzîn û Girdikan jî du şaxên Tercîlê û Etaqê ne. Demekê Seyîd Hesen, kurê wî Ehmedê kurê Seyîd Hesen, Silêmanê kurê Qasim, Yûsif û Huseyîn li Tercîl û Etaqê hikum kirine. Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Begên Tercîlê de ye" cih girtiye. Menzûmeya "Beganê Tercîl"ji çardeh malikan pêk hatiye û tê de navên heft mîrên Tercîlê derbas bûne.

31/1 Emer Beg rabe ser xwe şahê Tercîl
495 Birayên te bi carek tev de bûn dîl

32/2 Belav bûne li şax û deşt û çola
496 Perîşan in li ber destê Mexola

Omer (Emer) Begê kurê Hesen Beg, hevçerxê Hesenê Dirêj ê Bayêndirî bûye. Hesenê Dirêj gelek rêz lê girtiye û bi keça wî re zewiciye. Wî ji xeynî Tercîl û Etaqê nahiya Mihranî û Nûşdê jî dayê. Dema hin bajarên Kurdistanê ji aliyê Hesenê Dirêj

ve hatine îstilakirin Hesenê Dirêj, Mîrektiya Tercîl û Etaqê daye destê kurê xwe yê neviyê Omer Beg. Kar û barên wilayeta Bedlîsê jî dane destê Omer Beg (Şerefname, 295). Di agahiyên li ser vê mîrektiyê de mîrê yekem ê di derheqê wî de agahî hatiye dayin Omer Beg e. Cegerxwîn jî wek Şahê Tercîlê bi navê Omer Beg dest bi menzûmeya xwe kiriye. Ew bi van malikên xwe perîşaniya ji destê dijmin tê kişandin daye berçavan.

32/3 Erê Bûdaq nemane nav û nîşan
497 Li ber destê neyaran bûn perîşan

32/4 Bi carek jar û mest in dil birîndar
498 Seraser em dikin qêrîn û hawar

Budak (Bûdaq) Begê kurê Omer Beg, piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariya Bedlîsê. Dema ku Yaqûb Begê kurê Hesenê Dirêj hatiye ser textê hikumdariyê di sala 888ê k./1484ê z. de wek berê Tercîl û Etaq daye destê Bûdaq Beg. Wî demeke dirêj rêvebiriya mîrektiyê kiriye. Di sala 911yê k./1506ê z. de çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.295). Qêrîn û hawara Cegerxwîn ji ber nav û nîşanên ji holêrakirina seroktiyê ye.

32/5 Erê Ehmed tu zanî em çi mêr in
499 Ji bona hev seraser tev de şêr in

32/6 Di bin destê neyaran jar û gêj in
500 Perîşan in nezan in em çi bêjin

Ehmed Begê kurê Budak Beg e. Piştî mirina bavê xwe li cihê wî rûniştiye û du salan mîrektî kiriye. Dema Şah Îsmaîl Diyarbekir îstila kiriye ji aliyê Qizilbaşan ve hatiye kuştin (913ê k./1508ê z.). Piştî mirina Ehmed Beg kurê wî Elî Begê kurê Budak Beg, bûye rêvebir (Şerefname, r.295). Cegerxwîn di van malikên ji bo Ehmed Beg rêz kiriye de wek pê re di sohbetê de be, ji ber Kurd li hemberî hev wek şêr şerdikin û ji hev belav dibin Kurdan rexne kiriye. Yekîtiya wan tune ye, di bin destê

neyaran jar, gêj û nezan in. Bi gelemperî dema mîrên Kurd di nav xwe de ketine şerê îqtidarê Cegerxwîn van rexneya li wan kiriye ku îttifaqa wan tune ye.

32/7 Elî Beg rabe ser xwe tev de Kurmanc
501 Li ber tîrên neyaran bûne armanc

32/8 Bi carek dil şikestî pîr û kal in
502 Şev û rojan li çolan em dinalin

Elî Beg kurê Budak Beg e, piştî mirina birayê xwe li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Heta çûye rehma Xwedê bîst salan[311] desthilatdarî kiriye (Şerefname, r.295). Cegerxwîn bi malikên ji bo Elî Beg nivîsandiye de behsa bêaramî û dilnerehetiya Kurdan kiriye. Kurd (Kurmanc) tev ji neyaran re bûne hedef. Neyarên wan ji bo armancên xwe wan dane ber tîran. Li wan xistine û ew ji welatî derxistine ku şev û roj xemgîn in û ji derd û kulên welat dinalin.

32/9 Were Şemsî binêre gund û bajar
503 Li bin destê neyaran tev de bûn jar

32/10 Ne eywan û sera mane ne ew xan
504 Di nav Kurda ne mîr mane ne mêr man

Mîr û fermanrewayên Kurdistanê, ji ber zilm û zora Qizilbaşan bêzar bûne. Ew çûne Seraya Osmanî û îta'eta xwe pêşkêşî Siltan Selîm Xan kirine. Mîraktiya Tercîlê[312] ji Şemsî Beg re hatiye dayin. Ji bo wilayeta Diyarbekirê ji destê Qizilbaşan bê rizgarkirin fermana siltan derketiye. Wê demê wilayeta Tercîlê jî ji bin bandora wan hatiye rizgarkirin. Piştî mirina Şemsî Beg, kurê wî Heyder Beg li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.295). Cegerxwîn di malikên li ser Şemsî Beg de bal kişandiye ser sê hêmanên girîng: 1.Wêrankirina gund û bajarên welat. 2.Jar û perîşaniya xelkê welat. 3.Ji destderketina hikumdariya mîrektiyan.

---

311 Li gor nusxeya wergera Abdullah Yegin bîst û du sal li ser textê mîrektiyê maye (r.291).
312 Li gor nusxeya wergera İbrahim Sunkur Tercîl û Etaqê dane destê Şemsî Beg (r.296).

32/11 Were rabe binêre ey tu Heyder
505 Di nav Kurda ne şah mane ne serwer

32/12 Li ser şaxan dibazin wek qulinga
506 Neyaran ew didane ber tivinga

Heyder Begê kurê Şemsî Beg, bi fermana Siltan Silêman Xan wezifeya mîrektiyê ya bavê xwe girtiye dest. Piştî ku demek dirêj wezîfeya mîrektiyê kiriye bi leşkerên Osmanî re di sefera ji bo stendina Gurcîstan û Şêrwanê de cih girtiye. Ji aliyê leşkerên Qizilbaş tevî grûbêk mîrên Kurdistanê yên din hatine kuştin (Şerefname, r.296). Cegerxwîn bi wasiteya bangkirina Heyder Beg gotiye ku Kurd bê serok û rêber in. Ew ji ber neyaran wek qulingan ditirsin û dibazin.

Piştî kuştina Heyder Beg wezîfeya mîrektiyê derbasî kurê wî Budak Begê kurê Heyder Beg bûye. Li pey Budak Beg, bi rêzê Huseyîn Begê kurê Budak Beg û Îsmaîl Begê kurê Budak Beg hatine ser rêvebiriya mîrektiyê. Lê Cegerxwîn di menzûmeya xwe de cih nedaye navên van hersê mîrên Tercîlê.

32/13 Umer Beg rabe ser xwe ev çi çax e
507 Di Kurdistan nemane şên û bax e

32/14 Ji ber xeşma neyaran tev biriştin
508 Kurên Cengîz bi carek ew nehiştin

Omer (Umer) Begê kurê Heyder Beg e. Bi fermana Siltan Murad Xan ve li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Omer Beg xortekî merd û exlaqxweş bûye. Piraniya wextê xwe di xizmeta Mîrêmîranê Diyarbekrê de derbas kiriye. Di Dîwana Amedê de bi kar û barên mîrên Kurdan ên girêdayî Diyarbekrê re mijûl bûye (Şerefname, r.296). Cegerxwîn bal kişandiye ser wêranbûn û talankirina welat. Di vê menzûmeyê de talankerê welat Moxol (Mexol) /kurên Cengîz in.

**Tablo 3.2.31.** Begên Tercîlê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Omer Begê kurê Hesen Beg, Budak Begê kurê Omer Beg, Ehmed Begê kurê Budak Beg, Elî Begê kurê Budak Beg, Şemsî Beg, Heyder Begê kurê Şemsî Beg, Budak Begê kurê Heyder Beg, Huseyîn Begê kurê Budak Beg, Îsmaîl Begê kurê Budak Beg, Omer Begê kurê Heyder Beg | Emer Beg<br>Bûdeq<br>Ehmed<br>Elî Beg<br>Şemsî<br>Heyder<br>Umer Beg |
| Dem | Sedsalên XII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Tercîl, Nahiya Mihranî, Nûşadê, Bedlîs | Tercîl |

### 3.2.32.Begên Suweydî

Li gor hin agahiyan koka Mîrên Suwêdî (Siweydî), digihîje Bermekiyan. Eslê eşîreta wan jî digihîje yekî bi navê Eswed ku di wextê xwe de kolê eshabekî bûye. Li gor riwayetek din eşîreta Suweydî ji gundê Suwêdê ne.[313] Lê nesla kurê Bermek (Al-i Bermek) digihîje melîken Farisan ên berê li wilayeta Belhê jiyane û agirperest bûne. Piştî Îslamiyetê qebûl kirine Cehferê bavê Xalid[314] di serdema Merwaniyan de çûye Şamê. Xalidê kurê Cehfer û Cehferê kurê Xalid[315] wezîrtiya Ebbasiyan kirine. Di dema xelîfetiya Harûn Reşîd de Yehyayê kurê Cehfer bûye xwediyê qudret û nifûzek mezin. Hersê kurên wî jî gihîştîne mertebeyên mezin. Lê hin çavnebaran Harûn Reşîd li hemberî wan tijî kirine. Ev yek bûye sedema kuştina Cehferê kurê

[313] Gundê Suwêdê, du qonax ji Medîneya Munewwere dûr û ber bi Şamê ve ye.
[314]Li gor riwayetê dema ketiye meclîsa Silêmanê kurê Ebdulmelîk, Xelîfe bi saya herdu moriyên destê xwe ferq kiriye ku pê re jehr heye. Xelîfe emîr daye ku wî ji meclîsê derxin. Cehfer gotiye ku jehra di nav qaşê hingustîla xwe de ji bo dema têkeve tengasiyê jehrê bimije û ji şiddetê rizgar bibe bi xwe re digerîne. Li ser vê di nav xelkê de wek Bermekî hatiye binavkirin (r.297-298). Di wegera İbrahim Sunkur (r.299) de peyva" bermek" tevî wateya wê "mijandin" hatiye dayin.
[315] Wek tevlîheviyek di rêzkirina navan de xuya bike jî mirov dikare bi vî awayî bêje: Cehferê kurê Xalid, Xalid û Cehferê kurê Xalid, Yehyayê kurê Cehfer. Ango Cehfer navê bavê xwe "Xalid" li kurê de daniye.

Yehya. Yehya û Fedl jî heta dawiya jiyana wan avêtine zîndanê (Şerefname, r.297-299). Cegerxwîn menzûmeya xwe ya "Beganê Siweydî" ji bîst malikan pêk hatiye û tê de behsa sêzde mîrên Suweydî hatiye kirin. Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Begên Suwêdiyê de ye" derbas bûye.

32/1 Tu fermo rabe ser xwe ey Celal Beg
509 Xuya nakin ji bo me alê Bermek

32/2 Ne Xalid ma ne Yihya ma ne Ce'fer
510 Erê kuştin neyaran ew seraser

Li gor riwayetê di dema Ebbasiyan de sê kurên Al-i Bermek ji Bexdayê hatine Hançûka girêdayî Gencê bicî bûne. Birayê mezin bi dîndarî nav û deng daye û di nav xelkê de wek şêx hatiye qebûlkirin. Ew li ser daxwaza eşîret û qebîleyên Suwêdî çûye cem wan, hem wezîfeya seroktî hem jî ya îrşadê bi hev re meşandiye. Ji ber zarokên kur ên Şêx tune bûne, piştî mirina wî birayê wî Şahab li cihê wî rûniştiye. Piştî mirina Emîr Şahab jî Emîr Celalê kurê wî wezîfeya mîrektiyê meşandiye (Şerefname, r.299-300). Cegerxwîn ji roja xwe bangî serdema Celal Beg kiriye. Ji bo ji bûyerên hatine serê Xalid, Yehya (Yihya) û Cehfer (Ce'fer) ên ji bapîrên Celal Beg ders bê girtin û ew bûyer bên zanîn çûye serdema Ebbasiyan.

32/3 Mihemmed Beg tu rabe ser xwe mîro
511 Li me Kurda temaşake de îro

32/4 Bi carek em perîşan û belengaz
512 Li her alî dibazin qîr û awaz

Emîr Mihemmedê kurê Emîr Celal e. Li cihê bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Demek dirêj rêvebiriya welat kiriye. Piştî mirina wî kurê wî Fexreddîn hatiye cihê wî (Şerefname, r.300). Cegerxwîn di risteyên ji bo Mihemmed Beg rêz kirine de bê war û welatiya Kurdan bi qîrîn û awaz aniye zimên.

32/5 Tu Fexreddîn î şahê serbilind î
513 Xwedan birc û sera û êl û gund î

32/6 Ne êl mane ne gund mane ne eywan
514 Li her alî binêre qîr û eman

Emîr Fexreddînê kurê Emîr Mihemmed e. Piştî mirina bavê xwe li cihê wî rûniştiye. Mirovekî gelek dadger û qenc bûye. Welatê xwe gelek bi pêş de biriye. Dema çûye rehma Xwedê kurê wî Emîr Hesen hatiye ser rêvebiriyê (Şerefname, r.300). Cegerxwîn serdema Emîr Fexreddîn û roja xwe dane berhev. Di serdema Emîr Fexreddîn de hikumdarî di destê Kurdan de bûye. Emîr Fexreddîn ji ber xwedî birc, sera (y), êl û gundan bûye bi serbilindî li ser axa xwe jiyana xwe borandiye. Lê îro rewş guheriye, ne êl mane ne gund mane ne eywan; tev ketine destê dijminan. Lewma Kurd di nav qîrîn û emanê de mane.

32/7 Hisên Beg rabe ser xwe ey tu xwînrêz
515 Ji bona me ne rez mane ne parêz

32/8 Hemî zer bûne îro jar û xemgîn
516 Binêre em hemî bûne Cegerxwîn

Emîr Hesenê kurê Emîr Fexreddîn e; lê Cegerxwîn ji dêvla Hesen navê wî wek Hisên bi kar aniye. Emîr Hesen, piştî mirina bavê xwe kar û barên mîrektiyê girtine destê xwe. Ew mirovekî xwînrij, mirovkuj û ceberut bûye. Ji ber di dawiya jiyana wî de herdu çavên wî kor bûne rêvebirî ketiye destê kurê wî Emîr Fexreddîn. Kurê wî yê din Mîr Mihemmed xwediyê wesfên gelek baş bûye. Wî welatê xwe terk kiriye û çûye cem Hesenê Dirêj. Mîrektiya Hançûk û Çebakçûrê ji aliyê Hesenê Dirêj ve ji wî re hatiye dayin. Lê di navbera wî û birayê wî de dubendî derketiye. Di şerên derketiye de Mîr Mihemmed hatiye kuştin. Emîr Fexreddîn heta mirinê li ser textê mîrektiyê maye (Şerefname, r.301). Cegerxwîn, Hesen bi wesfê wî yê xwînrêzî bi bîr aniye. Lê di derheqê kurên wî de tu nîşan di menzûmeyê de tune ye. Navê kurê wî di

menzûmeyê de derbas nebûye. Cegerxwîn, xemgîniya xwe ya ji ber wêranbûna welat carekê din bi cegerxwînî destnîşan kiriye.

32/9 Were rabe binêre ey tu Ebdal
517 Di nav Kurda nemane xort û hem kal

32/10 Bi carek pîrebî ne tev keç û bûk
518 Hemî wêran e îro şehrê Xançûk

Ebdal Begê kurê Mîr Mihemmed, piştî mirina apê xwe Fexreddîn li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Di dema mîrektiya wî de leşkerên Qizilbaş êrîş anîne ser Hançûkê (Xarçûkê). Şerekî giran derketiye û di vî şerî de leşkerên Qizilbaş mexlûbiyeteke gelek mezin xwarine. Ebdal Beg dema çûye rehma Xwedê du zarokên kur li pey mane (Şerefname, r.301). Ebdal Beg dema Qizilbaşan êrîş anîne ser Hançûkê (Xançûkê) bi serfirazî welatê xwe parastiye û dijmin têk biriye. Lê îro bajarê Hançûk wêran e, xelkê welat xemgîn, bedbext û bêxwedî ne.

32/11 Were Sibhan binêre ev Çebeqçûr
519 Kirin kavil ji destê lawê Teymûr

32/12 Ji bona çi tu deynakî di îro
520 Li me carek temaşake tu mîro

Subhan (Sibhan) Begê kurê Ebdal Beg e. Piştî mirina bavê xwe bi alîkariya birayê xwe Ehmed, hatiye ser rêvebiriyê. Hevkariya di navbera herdu birayan de hêza wan zêde kiriye. Subhan Beg, Kêxiyê (Keyx) xistiye ser erdê xwe. Piştî Şerê Çaldiranê jî Çebakçûr, Axçeqele, Zak û Meneşkurdê ji destê Qizilbaşan stendiye. Peyre herdu birayan wilayet di navbera xwe de parve kirine. Dostiya di navbera herdu birayan de xera bûye, ji ber fesadiyên ku gihiştine Dîwana Siltan Silêman ên di derheqê Subhan Beg de fermana kuştina wî derketiye. Kela Çebakçurê jî dane destê memûrekî Osmanî (Şerefname, r.302). Ji bo wêranbûna Çebakçura (Çebeqçûr) erdê

Subhan Beg, Cegerxwîn bangî wî kiriye. Bi awayekî sembolik ji bo xelasiyê jê alîkarî xwestiye.

32/13 Were Ehmed siltanê me Kurda
521 Binêre em biriştin tev ji derda

32/14 Ne şah mane ji bona me ne siltan
522 Ne mîr man, ji bona me ne ew xan

Siltan Ehmedê kurê Ebdal Beg e. Piştî kuştina birayê xwe Subhan Beg, demeke gelek dirêj mîrektî kiriye. Ji pêncî salî zêdetir rêvebirî kiriye. Dema çûye rehma Xwedê du zarokên kur li pey xwe hiştine. Li pey desthilata wî Meqsûd Begê kurê Subhan Beg li ser textê mîrektiyê rûniştine (Şerefname, r.302). Ji bo neteweyek bibe dewlet ji hêmanên bingehîn ên herî girîng yek jî rêvebirî ye. Lewma Cegerxwîn wek di gelek malikan de tunebûna vê yekê daye ber çavan. Di van malikên jor de jî xemgîniya xwe ya ji holêrakirina şah, siltan û mîrên Kurdan aniye zimên.

32/15 Erê Meqsûd Begê navdar û zana
523 Binêre tu li çehrê me xizana

32/16 Hemî serqot û rût û xwas û tazî
524 Ji derdan em dinalin qîr û gazî

Meqsûd Begê kurê Subhan Beg e. Ew piştî kuştina bavê xwe di sefer û şerê Nahciwanê de di bin ferman û maiyeta Siltan Silêman Xan bûye. Di vî şerî de mêr û mêrxasiyek ewqas nedîtî nîşan daye ku ji aliyê siltan ve hatiye teqdîrkirin. Li ser vê siltan fermanek derxistiye ku li ser esasê berê Senceqa Çebakçûrê jê re bê dayin. Ji ber navbera wî û Îskender Paşayê Mîrêmîranê Diyarbekir Çebakçûrê ji destê wî girtiye û daye memûrekî Osmanî. Ji bo zilm û neheqiya Îskender Paşa bigihîne siltan, çûye Stenbolê. Lê wezîr û giregirên dewletê firset nedane wî ku derkeve hizûra siltan. Piştî heft salan bi vî awayî derbas bûye, Meqsûd Beg çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.303). Cegerxwîn pesnê Meqsûd Beg daye ku di *Şerefname*yê de jî ew

bi heman awayî hatiye bi bîr anîn. Piştre bi qîrîn û gazî derdê bêwelatî û bêxwedîtiyê vegotiye.

32/17 Mirad Beg wer binêre tu li Kurdan
525 Li me Kurdan binêre bûye ferman

32/18 Hemî bûne perîşan bê heval in
526 Di zindanê bi carek tev dinalin

Murad (Mirad) Beg kurê Siltan Ehmed Beg e. Piştî mirina Ehmed Beg, Îskender Paşayê Mîrêmîranê Diyarbekirê wilayeta wî di navbera herdu kurên wî de parve kirine. Çebakçûr di bin rêvebiriya memûrên Osmaniyan de maye. Vê rewşê şazdeh salan dewam kiriye. Piştre Mûrad Beg bi riza dilê xwe kar û barên rêvebiriyê daye destê kurê xwe Silêman Beg. Çend sal şûn de jî wefat kiriye. Ji xeynî Mûrad Beg, sê kurên wî yên din jî hebûne (Şerefname, r.303). Cegerxwîn carek din rewşa Kurdan a roja xwe bi hestên xemgînî bi bîr aniye. Bûyer ne bûyerên serdema Mûrad Beg in, bûyer li ser perîşanê, bêkesî û hepskirina Kurdan a dema niha ne.

32/19 Silêman Beg binêre ev Meneşkurd
527 Ji Tirka re bi carek bûye Noşxurd

32/20 Were rabe tu îro serbilind î
528 Xwedanê êl û koç û şehr û gund î

Silêman Begê kurê Mûrad Beg, bi wesfên wek mêr û mêrxasî, merdî, destvekirîtî, fikrên orîjînal û durbîniyê de bi nav û deng bûye. Bi zanyariyek baş a eskerî û siwariya Rûmê hatiye naskirin. Lê van zanînan pê re pozbilindî û ji xwe razîtî peyda kiriye. Wî di Deşta Meneşkurdê de bajarekî mezin ava kiriye. Di heman demê de dest bi avakirina mizgeftekî mezin kiriye. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Silêman Beg li ser desthilatdariyê bûye (Şerefname, r.304). Bajarê Meneşkurda ji aliyê Silêman Beg hatiye avakirin bi rûxandina mîrektiyê ketiye destê Tirkan. Lewma Cegerxwîn dibêje ku ev Meneşkurd bûye Noşxurd ango ketiye destê

dijmin û dijmin bi afiyet xwariye. Ji ber Silêman Beg di serdema xwe de xwedî desthilatdariyê, êl, koç, şehr û gundan kiriye. Cegerxwîn serdema wî ji bo Kurdan wek serdemek serbilindî û serfirazî dîtiye.

**Tablo 3.2.32.**Begên Suweydî

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Cehferê bavê Xalid, Xalidê kurê Cehfer, Cehferê kurê Xalid, Yehyayê kurê Cehfer, Fedl, Mûsa, Emîr Şahab, Emîr Celalê kurê Emîr Şahab, Emîr Mihemmedê kurê Emîr Celal, Emîr Fexreddînê kurê Emîr Mihemmed, Emîr Hesenê kurê Emîr Fexreddîn, Mîr Mihemmedê kurê Emîr Hesen, Emîr Fexreddînê kurê Emîr Hesen, Ebdal Begê kurê Mîr Mihemmed, Subhan Begê kurê Ebdal Beg, Sultan Ehmedê kurê Ebdal Beg, Meqsûd Begê kurê Subhan Beg, Murad Begê kurê Sultan Ehmed Beg, Suleyman Begê kurê Murad Beg | Celal Beg<br>Xalid, Yihya, Ce'fer<br>Mihemmed Beg<br>Fexreddîn<br>Hisên Beg<br>Ebdal<br>Sibhan<br>Ehmed<br>Meqsûd Beg<br>Mirad Beg<br>Silêman Beg |
| Dem | Sedsalên XII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Gundê Suwêdê, Belh, Çebakçûr, Hançûk(Xarçûk),Kêxiyê (Keyxê), Axçeqalê, Zak, Meneşkurd | Xançûk, Çebeqçûr, Meneşkurd |

### 3.2.33. Begên Silêmaniyê -Begên Qulp û Batmanê-Begên Meyafariqînê

Di *Şerefname*yê de mîrên Silêmaniyê bûne du şax. Şaxa yekem di derheqê mîrên Qulp û Batmanê de ye. Şaxa duyem jî di derheqê mîrên Meyafariqînê de ye. Cegerxwîn ev şax kirine yek û menzûmeya bi sernavê "Beganê Silêmanî û Qulp û Batman"nivîsandiye. Herçiqas di sernavê de cih nedabe mîrên Meyafariqînê jî di naveroka menzûmeyê de mîrên Meyafariqînê jî cih girtine. Ev menzûmeya

Cegerxwîn ji bîst û heşt malikan pêk hatiye û navê çardeh mîrên vê binemalê tê de derbas bûne.

33/1 Emîr Merwan tu rabe ey dilawer
529 Ji bo Kurdan tu rêzan û tu rêber

33/2 Nemane ew eşîr û koç û ew êl
530 Li me hûndane îro ew dem û pêl

Li gor riwayetek di *Şerefname*yê de nesla Mîrên Silêmaniyê digihîje Ker Merwan ku xelîfeyê dawî yê Emewiyan bûye. Dema Merwanî ji ber êrîşên Ebbasiyan belav bûne û Ker Merwan li Misrê hatiye kuştin (132yê k./750yê z.), sê kurên wî bi hejmarek gelek zêde yên bi mirovên xwe Filîstîn terk kirine û hatine wilayeta Qulpê. Li Geliyê Dere-i Xewx ê girêdayî nahiya Xezaliyê bicî bûne. Merwan di saya ku Eşîretên Silêmanî yên li derûdora wî berhev bûne, demekê serokatiya van eşîretan meşandiye. Piştî wî Bahaeddînê kurê wî li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.308). Ev Merwanê koka wî digihîje Emewiyan, wek mîrê Silêmaniyê yê yekem di *Şerefname* û *Şerefnameya Menzûm* de cih girtiye. Dema gihiştine Qulpê ji eşîretê grûbek koçer bûne li deşt, newal û çiyayan belav bûne û heywan xwedî kirine. Lewma Cegerxwîn behsa eşîr, koç (koçer) û êlê kiriye ku ew îro ji holê rabûne.

33/3 Bihaeddîn tu rabe ey tu serwer
531 Di piştî te ne êl mane ne Koçer

33/4 Silêmanî bi carek bûne talan
532 Ji bona we nemane nav û nîşan

Bahaeddînê (Bihaeddînê) kurê Emîr Merwan e, piştî mirina bavê xwe li cihê wî rûniştiye. Gelek bi ser de derbas nebûye wî jî du zarokên kur ên bi navên Mîr Izzeddîn û Mîr Celaleddîn li pey xwe hiştine û wefat kiriye (Şerefname, r.309).

Cegerxwîn piştî diyarkirina serweriya Bahaeddîn (Bihaeddîn), bi xelasbûna mîrektiyê talanbûna welat, windakirina serweriyê daye berçavan.

33/5 Emîr I'zdîn were carek tu rabe
533 Welatê te bi carek tev xerab e

33/6 Ne Banokî xuya ye ne Hiweydî
534 Ne Dilxeyran xuya ye ne Yezîdî

Emîr Izzeddînê (I'zdînê) kurê Emîr Bahaeddîn e. Piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Dema çûye rehma Xwedê kurêkî bi navê Îbrahîm ê temenbiçûk li pey xwe hiştiye. Ji ber vê, serokên eşîretan Emîr Celaleddîn anîne ser hikumdariyê (Şerefname, r.309). Cegerxwîn di van malikên li ser Emîr Izzeddîn nivîsandiye de heyfa xwe ji navê rabûna eşîretên Banûkî (Banokî), Hiwêdî (Hiweydî), Dilxêran (Dilxeyran) û Êzidîyan (Yezîdî) aniye. Van eşîretên han ew in ku; piştî sê kurên Merwan hatine Qulpê kesên ji nesla wan ji Misir û Şamê hatine û li derûdora wan berhev bûne. Di dawiyê de ev tayîfe bûne heşt grûbên bingehîn: Banûkî, Hêwedî, Dilxêran, Baciyan, Zîlan, Besyan, Zikziyan û Berazan. Ji van grûban Banûkî dema Merwanî hatine Qulpê ji qebîle û eşîretên li vê herêmê yên herî bihêz bûne û ketine bin maiyeta wan. Hinek ji vê tayîfeyê bûne ehlê sunnet û qismek ji wan jî bawerî bi Êzîdîtiyê anîne.

33/7 Celaleddîn temaşake binêr rind
535 Hemî jar in çi êl û koçer û gund

33/8 Nexweş bûne ji bo me deşt û zozan
536 Xerab bûne li ser me birc û eywan

Emîr Celaleddînê kurê Emîr Bahaeddîn e. Dema Emîr Izzeddîn çûye rehma Xwedê, ji ber kurê wî Îbrahîm hê di salên xwe yên zaroktîyê de bûye, serokên eşîret û qebîleyan birayê wî Celaleddîn anîne ser desthilatdariyê. Piştî mirina wî Emîr Îbrahîm hatiye ser textê mîrektiyê (Şerefname, r.309). Cegerxwîn, di van malikên li

jor de ji ber rûxandina mîrektiyê jar û perîşaniya êl û koçeran û xemgîniya ji vê rewşê aniye zimên.

33/9 Birahîm Beg tu rabe kurê I'zdîn
537 Bi carek êl û koçer bûne xemgîn

33/10 Ne gul mane di baxan de ne beybûn
538 Di bin lingê neyaran çilmisîn, çûn

Emîr Îbrahîmê (Birahîmê) kurê Emîr Izzeddîn e. Piştî mirina Emîr Celaleddîn, Emîr Îbrahîm jî gihîştiye salên xwe yên kemilînê û mezin bûye. Ew li ser xwestina eşîret û qebîleyan bûye mîrê welat. Demeke dirêj li ser desthilatdariyê maye. Du zarokên kur ên bi navên Diyaeddîn û Mîr Şêx Ehmed li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.309). Cegerxwîn ji bo xemgîniya êl û koçeran bîne zimên bangî Îbrahîm Beg kiriye. Bi awayekî mecazî behsa gul û çîçekên welat kiriye ku di bin lingên neyaran de çilmisîne. Ango ji ber dijmin li ser bûye xwedî hikm, tu wateya xweşikiya welat nemaye.

33/11 Ji xew rabe were ey Mîr Diyadîn
539 Binêre ka çilo ne Qulp û Farqîn

33/12 Nemane şahnişîn û birc û ew xan
540 Kel û bajar bi carek bûne wêran

Mîr Diyaeddînê (Diyadînê) kurê Emîr Izzeddîne. Li ser wesiyeta bavê xwe cihê wî girtiye. Ew heştê salan jiyaye û welatê xwe bi serbilindî û xweşî bi rê ve biriye. Dema Şah Îsmaîl Diyarbekir îstila kiriye, Xan Mihemmed Ûstaclû wek rêvebir şandiye Diyarbekirê. Mir Diyaeddîn peywendiyên gelek baş û siyasetek aqilane bi Ûstaclû re daniye. Ûstaclû bi keça wî re zewiciye. Mîr Diyaeddîn wexta ku miriye ji ber tu zarokên wî yên kur tunebûne hikumdartî derbasî behra biraziyên wî yên kurên Şêx Ehmed bûye (Şerefname, r.310). Cegerxwîn ji bo tunebûna desthilatdariyê û wêranbûna Qulp û Farqînê bîne zimên bangî Mîr Diyaeddîn kiriye.

33/13 De zû rabe tu îro Şah Welîd Beg
541 Li ser şêran siwar in rovî û şek

33/14 Ne beg mane ne axa û ne keyzad
542 Bi carek tev bi ah û qîr û feryad

Şah Weled Begê kurê Şêx Hesen e. Ji ber zarokên kur ên apê wî Mîr Diyaeddîn tune bûne tevî birayên xwe li hemberî wî rabûne û ketine nav şerê îqtidarê. Mîr Diyaeddîn ji zavayê xwe Xan Mihemmed Ûstaclû alîkarî xwestiye. Di şer de sê birayên Şah Weled hatine kuştin. Şah Weled bi zorê canê xwe xelas kiriye û çûye cem Siltanên Çerkezan. Piştî Şerê Çaldiranê ji ber desthilata Qizilbaşan li Kurdistanê sist bûye, vegeriyaye û bi alîkariya eşîret û qebîleyan textê mîrektiyê girtiye destê xwe. Dema Osmaniyan wilayeta Diyarbekir û Kurdistanê îstila kirine, di navbera mîrên Silêmaniyê û mîrên Sasonê de dijminatî hebûye. Li ser bêbextiyek mîrên Sasonê fermana kuştina Şah Weled derketibe jî ew ji vê rewşê xeberdar bûye û xwe xelas kiriye. Li ser vê, Osmaniyan wilayeta wî dane destê memûrên xwe. Şah Weled çûye Kela Qulpê û bi rêvebiriya keleyê razî bûye. Piştî sêzdeh salan, şeş zarok li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê. Li pey wî Elî Begê kurê Weled hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.310). Cegerxwîn bi van malikên li jor, ji destderketina rêvebiriyê bi metaforên şêr, rovî û şek (weşek) daye xuyakirin. Şêr temsîla; rêvebirên Kurd ên bi mêr û mêrxasîyê tên zanîn, rovî û şek jî temsîla dijminên ku bi fen û fûtan rêvebiriyên Kurd ji destê wan derxistine ne.

33/15 Elî Beg rabe ser xwe Qulp û Batman
543 Ji destê van neyaran bûne wêran

33/16 Seraser mîr û axa tev digazin
544 Belengaz in li çola tim dibazin

Elî Begê kurê Weled Beg e, piştî mirina bavê xwe mîrektiya wilayeta Qulpê girtiye destê xwe. Desthilatdariya wî çil salan ajotiye. Van salên xwe bi dadmendî û qencî derbas kiriye. Du zarokên kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.312). Cegerxwîn bangî Elî Beg kiriye ku rabe halê Qulp û Batmanê yê di bin destê neyaran binêre. Rêvebirî êdî ne di destê wan de ye, mîr û axayên vê rojê ne serbixwe ne. Lewma bêçare û belengaz in.

33/17 Were Siltan Hisên Beg rabe îro
545 Li çehrê me binêre ey tu mîro

33/18 Hemî Kurd in bi carek bûn belengaz
546 Di nav wan de tu nîn e beg serifraz

Siltan Huseyîn (Hisên) Begê kurê Elî Beg e. Piştî mirina bavê xwe di sala 980yê k./1573ê z. de, li ser fermana Siltan Selîm Xan bûye cîgirê bavê xwe. Di sala 993yê k./1585ê z. de dema ku Siltan Murad Xan, leşkerekî Osmanî şandiye îstilakirina Azerbaycanê, Siltan Huseyîn ji aliyê Qizilbaşan ve hatiye kuştin. Şeş zarokên kur li pey wî mane (Şerefname, r.312). Cegerxwîn rasterast îşaretî dema niha kiriye ku Kurd niha belengaz in, beg û hikumdar bindest û perîşan in.

33/19 Were Ehmed tu rabe ey begê baş
547 Li ser me bûne paşa ev Qizilbaş

33/20 Ji hev re em mêr û şêr û fîl in
548 Li bin destê neyaran bend û dîl in

Seyîd Ehmed Begê kurê Huseyîn Beg e. Dema bavê wî ji aliyê Qizilbaşan ve hatiye kuştin, ew êsîr ketiye û du salan di zindanê de maye. Di vê demê de Dîwana Siltan Murad Xan desthilatdariya hikumetê daye destê birayê wî Zeynel Beg. Piştî ji esaretê rizgar bûye ji ber xizmetên wî yên serkeftî Dewleta Osmanî, fermana rêvebiriya hikumeta Qulp û Batmanê dane wî. Lê piştî çend salan li ser kar û barên mîrektiyê maye, ji aliyê Mîrêmîranê Diyarbekir desthilatdarî jê hatiye stendin.

Desthilatdarî ketiye destê mirovekî Osmanî. Seyîd Ehmed, ji bo mafê xwe yê mîrektiyê bigre berê xwe daye Stenbolê, lê li wir çûye rehma Xwedê (1003yê k./1595ê z.). Li ser vê, wek berê hikumeta Qulpê ji Zeynel Begê birayê wî re hatiye dayin. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Zeynel Beg li ser rêvebiriyê bûye (Şerefname, r.313).

Ji ber bavê Seyîd Ehmed ji aliyê Qizilbaşan ve bi leşkerên Osmanî re di îstilakirina Azerbaycanê de hatiye kuştin û Seyîd Ehmed di Keleya Kahkahayê de du salan êsîr maye Cegerxwîn aciziya xwe ya vê bûyerê bi risteya"Li ser me bûne paşa ev Qizilbaş" diyar kiriye. Piştî vê bûyerê jî di navbera Seyîd Ehmed û birayên wî de şerê îqtidarê derketiye. Di dawiyê de birayê wî Qiliç Beg hatiye kuştin. Li ser vê Cegerxwîn gotiye ku"Ji hev re em mêr û şêr û fîl in"ango li ber hev radibin, lê li hemberî neyaran bêhêz û êsîr in. Çimkî Seyîd Ehmed, di bin destê dijminan de êsîr maye. Lê dewsa ku birayên wî bibin yek û çareyên xelasiya wî bigerin bi hev re ketine nav şerê îqtidarê.

33/21 Were carek temaşake tu Zînel
549 Di Qulpê de nemane birc û heykel

33/22 Temaşake li rengê me xizana
550 Xwezî piştî we re em qet nemana

Zeynel (Zînel) Beg kurê Siltan Huseyîn e. Dema bavê wî ji aliyê Qizilbaşan ve hatiye kuştin, Dîwana Siltan Murad Xan desthilatdariya hikumetê daye destê wî. Lê wextê birayê wî Seyîd Ehmed Beg ji zindanê rizgar bûye, Dîwana Siltan desthilatdariyê teslîmî Seyîd Ehmed kiriye. Piştî mirina birayê wî Seyîd Ehmed, Zeynel Beg carek din hatiye ser rêvebiriya Qulpê. Di sala 1005ê k./1597ê z. de dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Zeynel Beg li ser rêvebiriyê bûye (Şerefname, r.313). Cegerxwîn ji bo ji destderketina Qulpê rê bide, wek rêvebirê Qulpê bangî Zeynel Beg kiriye. Cegerxwîn ewqas ji rewşa tê de ye nerazî bûye, bi risteya "Xwezî piştî we re em qet nemana" aciziya xwe diyar kiriye.

33/23 Were Behlûl Begê rabe ji Farqîn
551 Belê Farqîn îro jar û xemgîn

33/24 Di birca de ne xan mane ne xatûn
552 Di bexça de ne gul mane ne beybûn

Behlûl Begê kurê Elwend Begê kurê Mîr Şêx Ehmed e. Ew; mirovekî mêrxas, destvekirî û mert bûye. Behlûl Begî, gelek xizmetên mezin ji dewletê re kirine. Wî bi daxwaza rêvebiriyê berê xwe daye Stenbolê. Li ser vê, bi fermana Siltan, Meyafariqîn ji hikumeta Qulpê hatiye veqetandin û wek "îkta" ji Behlûl Beg re hatiye dayin. Dema seferên li ser welatê Eceman dest pê kiriye, ji ber zilma hikumdaran eşîretên Silêmanî mecbûr mane welatê xwe terk bikin. Van eşîretan dana baca xwe ya salane red kirine. Ew li dora yekî bi navê Şahsiwar Beg kom bûne. Behlûl Beg ji bo berhevkirina bacê û anîna wan eşîretan a Meyafariqînê ber bi wan ve çûye. Di navbera wan de şer derketiye û di şer de Behlûl Beg hatiye kuştin, pênc kur li pey wî mane. Li pey wî Emîr Xanê kurê wî hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.315). Behlûl Beg di *Şerefname*yê de wek mîrê yekem ê Meyafariqînê (Farqîn) yê ji vê binemalê hatiye dayin. Lewma Cegerxwîn jî ji ber destderketin û wêranbûna Meyafariqînê bangî Behlûl Beg kiriye û ji hunerên edebî bi teşxîsê hestên mirovan ên xemgînî li Farqînê bar kirine.

33/25 Emîr Xan Beg binêre tu li Kurda
553 Hemî dîl û belengaz in ji derda

33/26 Wekî kunda li ser şaxa dikalin
554 Ji ber xeşma neyaran tev dinalin

Emîr Xan Begê kurê Behlûl Beg e. Piştî kuştina bavê wî rêvebiriya mîrektiyê dane destê wî. Wî çend salan welat bi rê ve biriye. Di serdema wî de li her aliyê welat, eşîret û qebîleyan karên nelirê kirine. Xelkê ji ber zilm û zordariya wan berê xwe dane baregeha siltan. Li ser vê ji Mîrêmîranê Amedê re, fermana kuştina Emîr Xan û ji holêrakirina Eşîreta Besyan û Bociyan derketiye. Mîrêmîranê Amedê Emîr

Xan biriye Dîwana Amedê û li wir daye îdamkirin (Şerefname, r.315). Cegerxwîn, di malikên ji bo Emîr Xan Beg rêz kiriye de ji bo belengaziya Kurdan bide berçavan, Kurdan dişibîne kundan. Wek kundên li ser şaxê daran dixwînin. Kund herçiqas di hin civakan de wek sembola zanyarî, mîstîsîzm, nepenî û hwd. hatibe dîtin jî di mîtolojiya Rojhilat de wateyên neyinî di xwe de dihewîne. Kund ji ber ku wek peyamnêrê mirinê hatiye dîtin sembola bêyewmiyê ye.

33/27 Umer Beg rabe ser xwe ev çi beng e
555 Li nav Kurda hawar û qîr û deng e

33/28 Weke te em li çolan tev dibazin
556 Ne Farqînê bi tenha em dixwazin

Omer (Umer) Begê kurê Behlûl Beg e. Piştî kuştina birayê xwe hatiye ser rêvebiriya hikumeta Meyafariqînê. Lê wî nikaribûye rêvebiriyek baş damezrîne. Lewma rêvebiriya kar û barên Meyafariqînê ji aliyê Dîwana Siltan Mihemmed Xan ve ji Îbrahîm Begê Aqsaqê kurê Cihangîr Beg re hatiye dayin. Omer Beg gihîştiye hin kesên beredayî, dest bi şêlandina xelkê û êrîşa ser karwanan kiriye. Herçiqas navê mîr pê re be jî zêdetir helwestên wî yên diz û rêbiran hebûne (Şerefname, r.316). Cegerxwîn di vir de bêkesî û bêxwedîtiya Kurdan di şexsê Omer (Umer) Beg de daye xuyakirin. Ji ber desthilatdariya wî ji destê wî hatiye derxistin Omer Beg ketiye çolan û gihîştiye nebaşan. Îro Kurd tev di rewşa Omer Beg de ne. Lê dev ji têkoşînê bernedane, ne tenê Farqînê ji bo temamê welat di ber xwe didin.

**Tablo 3.2.33.**Begên Silêmaniyê -Begên Qulp û Batmanê-Begên Meyafariqînê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | **Begên Silêmaniyê:** Merwan, Bahaeddînê kurê Merwan, Izzeddînê kurê Bahaeddîn, Celaleddînê kurê Bahaeddîn, Emîr Îbrahîmê kurê Izzeddîn, Mîr Diyaeddînê kurê Îbrahîm | Emîr Merwan<br>Bihaeddîn<br>Emîr I'zdîn<br>Celaleddîn<br>Brahîn Beg kurê I'zdîn<br>Mîr Diyadîn |

| | | |
|---|---|---|
| | **Begên Qulp û Batmanê:** Şah Weled Beg, Elî Begê kurê Weled, Sultan Ehmed Begê kurê Sultan Huseyîn Beg, Seyîd Ehmed Begê kurê Sultan Huseyîn Beg<br>**Begên Meyafariqînê:** Behlûl Begê kurê Elwend Begê kurê Mîr Şêx Ehmed, Emîr Xan Begê kurê Behlûl Beg, Omer Begê kurê Behlûl Beg | Şah Welîd Beg<br>Elî Beg<br>Sultan Hisên Beg<br>Ehmed<br>Zînel<br>Behlûl Beg<br>Emîr Xan Beg<br>Umer Beg |
| Dem | XIII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Silêmanî, Qulp, Dere-i Xewx ê girêdayî nahiya Xezalî, Batman, Meyafariqîn | Silêmanî, Qulp, Farqîn, Batman |

### 3.2.34. Mîrên Sohran

Eslê Mîrên Sohran (Suhran) digihîje mirovekî ji zarokê giregirên Erebên Bedewî yên Bexdayê, yê bi navê Kelos.[316] Kelos, çûye gundê Hewdeyanê yê girêdayê nahiya Ewanê ya di nav sînorên Sohran de bicî bûye û şivantiya gund kiriye.[317] Sê kurên Kelos ên bi navê Îsa, Îbrahîm û Şêx Weys (Uweys) hebûne (Şerefname, r.319). Cegerxwîn menzûmeya xwe ya di derheqê vê binemalê de bi Emîr Îsayê kurê Kelos daye destpêkirin. Menzûmeya “Beganê Suhran”ji bîst û du malikan pêk hatiye û tê de serdemên yazdeh Mîrên Sohranê hatine destnîşankirin. Di *Şerefname*yê de bi sernavê “Fermanrewayên Sohran” derbas bûye.

[316]Ji ber diranên wî yên pêşiyê tunebûne û di devoka vî qewmî de jî ji mirovên bê diran re gotine “kelos”, navê wî wisa maye (r.319).
[317] Li gor wergera İbrahim Sunkur li gund bi karê kulehên gundiyan ve mijûl bûye. Kurê wî Îsa jî berî bibe rêvebir heman karî kiriye (r.317).

34/1 Emîr Îsa were rabe ji Suhran
557 Binêre ka sera û birc û eywan

34/2 Li her alî dikin feryad û gazî
558 Ji dest Eyran û Tirk û Rom û Tazî

Îsayê kurê Kelos, mirovekî hêja, zimanxweş û bi xîret bûye. Wî malên di destê xwe de û hatiniya xwe ya ji şivantiyê daye feqîr û birçiyan. Lewma gundiyanjê re îta'et kirine, li derûdora wî kom bûne û ew ji bona mîrektiya xwe hilbijartine. Piştî şerekî giran Kela Ewanê girtine. Seranserê herêma Sohranê ji aliyê wî ve hatiye fetihkirin. Wî rêvebiriyeke bi serbilindî û serkeftî meşandiye, piştre çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.320). Ji ber peywendiyên siyasî yên wê demê bi dewletên cîran ên Îran û Osmaniyan re hebûye Cegerxwîn li ser Eyran û Tirkan rawestiye. Û ji ber serdema Emîr Îsa de rêvebirî hatiye avakirin, bangî wî kiriye ku were ji destderketina Sohranê binêre. Desthilatdarî ji dest derketiye û sedema ji holêrakirina desthilatdariyê Îran û Tirk in.

34/3 Were ey Şah Elî Beg ey cîhangîr
559 Di nav Kurdan nemane begler û mîr

34/4 Herîr kanî li kû ye, kanî Batas
560 Di nav wan de nemane mêr û gernas

Şah Elî Begê kurê Îsa, piştî bavê xwe li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Şah Elî di saxiya xwe de wilayeta xwe di nav her çar kurên xwe de parve kiriye ku piştî mirina wî nekevin nav şerê îqtidarê. Nahiya Herîrê ya navenda rêvebiriya hikumetê daye destê kurê xwe yê mezin Mîr Îsa. Îsa, demek dirêj hikumdartiya welêt kiriye. Piştre di şerekî dinavbera wî û mîrê Baban de miriye. Piştî mirina Şah Elî, Pîr Budakê kurê wî rêvebirî girtiye dest xwe(Şerefname, r.320). Di vir de Cegerxwîn behsa Herîr û Batasê kiriye ku Herîr wek navend ji Elî Beg re hatiye dayin. Lewma Elî Beg bi windakirina Herîrê û rûxandina rêvebiriyê re hatiye bi bîr anîn.

34/5 Were rabe tu Bodaq û begê pîr
561 Di Suhran de hene sed begler û mîr

34/6 Birîndar in ji wan re nîn in derman
562 Di destê wan nemane şûr û ferman

Pîr Budak (Bodaqê) kurê Şah Elî Beg e, piştî mirina bavê xwe rêveberî girtiye destê xwe. Nahiya Sumaqliq ji Eşîreta Nîlxas a girêdayî Qizilbaşan stendiye. Piştî demek kar û barên rêvebiriya welat meşandiye, çûye rehma Xwedê. Du zarokên kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.321). Cegerxwîn, bi van malikan ji bo beg û mîrên Sohranê yên roja xwe gotiye ku ketine derdê bê derman. Sedema vê yekê, bêhêzbûna berxwedanê (şûr) û tunebûna hikumdariyê (ferman) ye.

34/7 Tu Seyfeddîn î şûrê Şam û Hind î
563 Li ser textê Herîrê serbilind î

34/8 Were rabe binêre ev çi roj e
564 Li me şehrê Herîrê bûye doj e

Seyfeddînê kurê Pîr Budak Beg, bûye cînişînê bavê xwe. Lê gelek di ser de neçûye miriye û birayê wî li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.32). Di *Şerefname*yê de di derheqê Seyfeddin de tenê behsa hatina wî ya ser desthilatê hatiye kirin. Cegerxwîn wek di malikên din de di navbera navê Seyfeddîn û şûr de peywendî daniye, di vê malikê de jî bi heman awayî Seyfeddîn şibandiye şûrê Şam û Hindê. Ji ber îro bajarê Herîrê ji bin desthilatdariya Kurdan derketiye ji bo Kurdan êdî ne qada jiyanê ye, ew bûye wek dojehê.

34/9 Erê ev Mîr Hisên ew tac û ala
565 Di nav Kurdan nemane çûne bala

34/10 Sera û birc û eywan tev heriftin
566 Di bin destê neyaran em geriftin

Mîr Huseyînê (Hisênê) kurê Pîr Budak Beg, di cihê birayê xwe de bûye mîr. Lê desthilatdariya wî demek kurt girtiye. Heft kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê. Cegerxwîn bi van malikan dubare bindestiya Kurdan û tunebûna hakimiyetek wan a serbixwe aniye zimên (Şerefnme, r.321). Cegerxwîn bi bangkirina Mîr Huseyîn, ji destderketina rêvebiriyê û bindestiya gelê xwe aniye zimên.

34/11 Were Seydî tu şahê ser bi zêr î
567 Li Hewlêr û li Mûsil tê binêrî

34/12 Erê, tê de hemî şah û emîr in
568 Di bin destê neyaran em esîr in

Mîr Seydî kurê Şah Elî Beg e. Piştî mirina bavê xwe Mîr Seydî li cihê wî rûniştiye. Di nav fermanrewayên Kurdistanê de bi mêrxasî û merdîtiya xwe bi nav û deng bûye. Ew li Şeqabadê bicî bûye û ji bo daxwaza xwîna birayê xwe Emîr Îsa, bi Pîr Budakê mîrê Baban re ketiye nav şer. Di dawiyê de Pîr Budak kuştiye û welatê birayê xwe kiriye ser mîrektiya xwe. Bi Qizilbaşan re şerekî gelek giran kiriye. Û Senceqên Mûsil, Kerkûk û Hewlêrê ji destê memûrên Qizilbaşan rizgar kiriye û xistiye ser welatê xwe. Welatê Sohran demeke dirêj bi awayekî serbixwe bi rê ve biriye. Sê zarokên kur li pey xwe hiştine û miriye (Şerefname, r.321). Cegerxwîn dema bangî Mîr Seydî kiriye ji ber Hewlêr û Mûsil ji aliyê wî ve hatine girtin, jê xwestiye rabe halê wan ê niha binêre. Emîr Seydî şahê ser bi zêr e, ango mîrekî biqîmet û serbixwe ye. Niha jî gelek şah û emîr li Sohranê hene, lê di bin destê neyaran de êsîr in, qudumşikestî ne, ne xwedî îqtidar in.

34/13 Tu Seyfeddîn î şûrê destê Kurd î
569 Xwedan nav û nîşan û kom û cerd î

34/14 Xwedê zanî tu pir mêr û egîd î
570 Perîşan in Huseyniy û Yezîdî

Emîr Seyfeddînê kurê Mîr Huseynê kurê Pîr Budak e. Emîr Seyfeddîn, Senceqa Sumaqliqê bi dest xistiye. Lê Siltan Silêman Xan, rêvebiriya wilayeta Sohranê daye destê Huseyîn Begê Dasnî. Di navbera Huseyîn Begê Dasnî û Emîr Seyfeddîn de çend şer qewimîne. Emîr Seyfeddîn dîtiye ku tenê bi serê xwe nikare li hemberî Eşîreta Yezîdiyan bisekine. Lewma çûye cem Beyke Begê mîrê Erdelanê. Lê Beyke Beg ji ber tirsa xezeba Siltan Silêman Xan alîkarî nedaye wî. Ji xelkên Sohranê li der û dora xwe komek mirov berhev kiriye û çûye ser Erbîlê. Bi stendina Erbîlê îtibara wî zêde bûye. Li ser vê di navbera Huseyîn Begê Dasnî û Seyfeddîn Beg de şerên xwînavî qewimîne. Şer bi serkeftina Emîr Seyfeddîn bi dawî bûye. Bi destxistina mîrata bav û bapîrên xwe Emîr Seyfeddîn bi ser ketiye û bûye fermanrewayê serbixwe yê welatê xwe. Dema xebera têkçûna Huseyîn Begê Dasnî û Eşîreta Yezîdiyan, gihîştiye Stenbolê, ji aliyê siltan ve fermana kuştina Huseyîn Beg derketiye. Siltan ji bo hemû mîrên Kurdistanê berhev bike û biçe ser Emîr Seyfeddîn ferman daye mîrê Imadiyyê. Lê ew bi ser neketine û nikaribûne wilayeta Sohran ji destê Emîr Seyfeddîn derxin. Di dawiyê de ew ji aliyê Yûsif Begê Biradostî ve hatiye xapandin. Bi hêviya efûkirinê çûye Seraya Siltan Silêman Xan. Dema gihîştiye Asîtaneyê, bê sekin ew dane destê celladan (Şerefname, r.322-323). Cegerxwîn, ji ber wateya navê Emîr Seyfeddîn ya "şûrê dîn" e ew şibandiye şûrê destê Kurdan. Çimkî Emîr Seyfeddîn, xwediyê gelek meziyetên baş bûye û ji bo war û welatê bav û bapîrên xwe gelek di ber xwe daye. Bi mêr û mêrxasiya xwe hatiye naskirin. Herçiqas çend caran bi Eşîretên Êzidî re şer kiribe jî Cegerxwîn perîşaniya Huseynî ango Kurdên ne Êzidî û Êzidî (Yezidî) yên piştî rûxandina mîrektiyan daye berçavan.

34/15 Qelî Beg rabe ser xwe ey şehê Kurd
571 Binêrê Kurd ji hirça re hemî xurd

34/16 Li jorê me Ridaxan Şahê Eyran
572 Li jêrê me ku Xazî Şahê Qehtan

Qulî (Qelî) Begê kurê Suleyman (Silêman) Begê kurê Mîr Seydî ye. Dema wilayeta Sohran ji aliyê Eşîreta Dasnî ve hatiye stendin, Qulî Beg gelek caran li

hemberî wan şer kiriye. Lê ji ber ku têk çûye xwe avêtiye Seraya Şah Tehmasb. Li ser vê Eşîreta Dasnî, li hemberî Misilmanan û Sohraniyan ji ber dijîtiya kevin a di navbera Huseynî[318] û Êzidiyan de dest bi zilm û tolhildanê kirine. Berî serdema Qulî Beg, Emîr Seyfeddîn û Huseyîn Begê Dasnî hatine kuştin. Li ser ricaya Mîrê Imadiyyê nahiya Herîrê ya Sohranê ji Qulî Begre hatiye dayin. Wî nêzîkî bîst salî kar û barên rêvebiriyê kirine. Du zarokên kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê. Piştî mirina wî kurê wî Budak Beg hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, 323-324). Cegerxwîn bi wasiteya bangkirina Qulî Beg, Kurd çawa bûne xwarina dijminê xwe û ketine bin destê wan bi gotina "ji hirça re hemî xurd" diyar kiriye. Hirç di vir de dijminê ku bi darê zorê Kurd xistine bin destên xwe sembolîze kiriye ku dijmin, serokên Faris û Ereban in.

34/17 Were Budaq tu rabe ser xwe serbest
573 Li Şeqlawe binêre, maye bindest

34/18 Hemî birc û sera û xan û man in
574 Li ber destê neyaran dergevan in

Budak (Budaq) Begê kurê Qulî Begê kurê Silêman Beg e. Piştî mirina bavê xwe, ala seroktiya serbixwe li ser nahiya Şeqlawê çikandiye. Di navbera wî û birayê wî Silêman Beg de dubendî derketiye. Silêman Beg ji ber nikaribûye bi Budak Beg re serî derkeve, berê xwe daye ba Siltan Huseyîn Begê fermanrewayê Imadiyeyê. Wî xwestiye ku bi alîkariya Siltan Huseyîn Beg cardin vegere ser war û welatê xwe. Lê li bajarê Aqrê yê girêdayî Imadiyyê çûyê rehma Xwedê (Şerefname, r.324). Ji ber Budak Beg, Şeqlawê girtiye û ala xwe ya serbixwe lê çikandiye, Cegerxwîn Budak Beg bi vê çalakiya wî ew bi bîr aniye. Lê îro Şeqlaw maye bindest û bêserok û rêber.

34/19 Silêman Beg tu rabe ey şehinşa
575 Kurên Qehtan û Tûran bûne paşa

[318] Li gor Ziya Avci di jêrenotê de diyar kiriye peyva Huseynî bi mebesta Misilman (Eşîreta Sohran) hatiye bikaranîn û yên li hemberî wan Êzidî (Eşîreta Dasnî) ne ku Huseyîn bi şibandina Hz. Huseyîn û tagirên wî, Êzidî (Yezîdî) bi Yezid û tagirên wî ne (r.562).

34/20 Ewan destê xwe dane hev hejandin
576 Welatê me kirin perçe şikandin

Silêman Begê kurê Qulî Beg e. Di nav Mîrên Kurdistanê de bi dadmendî, aqilmendî û zîrektiya xwe bi nav û deng bûye. Piştî mirina bav û birayê xwe bûye mîrê serbixwe yê Mîrektiya Sohranê. Ji ber dijminatiya di navbera binemala mîrên Sohran û Eşîreta Zerzayê, Suleyman Beg êrîş biriye ser wilayeta Zerzayê. Derbeyek gelek giran li wan xistiye. Zerzayî ji bo gilî û gazinên xwe bikin çûne cem Siltan Mûrad Xan. Siltan, bi şîddet cezakirina wî xwestibe jî ji ber Silêman Beg di wê navberê de êrîş biriye ser Qizilbaşan. Wî xenîmetek gelek mezin ji bo siltan bi dest xistiye û hatiye bexişandin. Pismamekî wî ji bo rêvebiriyê, li hemberî wî rabûye lê tevî çardeh pismam û alîkarekî xwe ji holê hatine rakirin. Bi vî awayî Silêman Beg bihêztir bûye. Kurek li pey xwe hiştiye û wefat kiriye (Şerefname, r.324-325). Cegerxwîn îşaret kiriye ku dijminên Kurdan dest dane hev û bi hevkariyê welatê Kurdan perçe kirine û li ser bûne rêvebir. Wekî ku tê dîtin ev malik li ser agahiyên *Şerefname*yê ya di derheqê Silêman Beg de nîne, li ser rewşa Kurdan a serdema dawîn e.

34/21 Elî Beg rabe ser xwe ev çi roj e
577 Ji Kurda re gelek dijwar û doj e

34/22 Binêre ev Fireng û Ingilîz in
578 Li ser pişta me Kurda tev dilîzin

Elî Begê kurê Silêman Beg e. Piştî mirina bavê xwe li ser fermana Siltan Mûrad Xan li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Dema nivîsandina *Şerefname*yê hikumdariya serbixwe ya mîrektiyê di destê wî de bûye (Şerefname, r.325). Cegerxwîn di vê malika dawîyê de cara ewil e ku wek dijmin Fireng û Ingilîzan rê daye. Dijminên heta niha derbas dibûn, bi gelemperî dewlet û neteweyên bi Kurdan re hemsînor bûn. Navê Firengan berê jî di menzûmeya Padîşahanê Eyûbî de derbas bûbû. Ji bilî vê, risteyên ji bo Hisên Begê “Şahanê Lora Biçûk” de jî îfadeya “Binêre tu li xeşma vî Ferencî” derbas bûye. Lê navê Ingilîzan heta niha di malikan de tune

bû. Li vir Cegerxwîn diyar kiriye ku dijminê Kurdan ne tenê dewletên cîran in, di heman demê de Fireng û Ingilîzên Ewropî ne jî. Wan ji bo berjewendiyên xwe dek û dolban anîne serê Kurdan ku ev dijmin dijminê sedsala XX. in.

**Tablo 3.2.34.**Mîrên Sohranê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Îsayê kurê Kelos, Şah Elî Beg, Îsayê kurê Şah Elî, Pîr Budakê kurê Şah Elî Beg, Mîr Seyfeddînê kurê Pîr Budak, Mîr Huseyînê kurê Pîr Budak, Seyfeddînê kurê Mîr Huseyîn, Mîr Seydiyê kurê Şah Elî Beg, Emîr Seyfeddînê kurê Mîr Huseyînê kurê Pîr Budak, Qulî Begê kurê Suleyman (Silêman) Begê kurê Mîr Seydî, Budak Begê kurê Qulî Begê Silêman Beg, Silêman Begê kurê Qulî Begê kurê Silêman Beg, Elî Begê kurê Silêman Beg | Emîr Îsa<br>Şah Elî Beg<br>Bodaq Beg<br>Seyfeddîn Beg<br>Mîr Hesen<br>Seydî Şah<br>Seyfeddîn<br>Qelî Beg<br>Bûdaq<br>Silêman Beg<br>Elî Beg |
| Dem | Sedsalên ?-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Gundê Hewdeyanê yê girêdayî Nahiya Ewanê, Gundê Balekan, Nahiya Herîrê, Sumaqlîd, Şeqabad, Hewlêr/Erbîl, Mûsil, Kerkûk, | Suhran, Mûsil, Hewlêr, Herîr, Batas, Şeqlaw |

### 3.2.35. Mîrên Baban

Mîrên Baban di nav Mîrên Kurdistanê de bi hêz û qudreta xwe bi nav û deng bûne. Lê piştî Mîr Budakê kurê Pîr Ebdal û Budakê kurê Rustemê biraziyê wî dawî bi nesla mîrektiya wan hatiye û desthilatdarî ketiye destê xulamên wan. Cegerxwîn di menzûmeya “Beganê Baban” de ji Pîr Budak dest pê kiriye û bi çardeh malikan mîrên Baban li gor kronolojiya *Şerefname*yê rêz kirine. Di *Şerefname*yê de bi senavê “Di Derheqê Fermanrewayên Baban de ye” derbas bûye.

35/1 Were Bodaq Begê, zanim tu pîr î
579 Di nav Baban de îro şah û mîr î

35/2 Te yek ala ji bo Kurda re rakir
580 Ji Eyranê heta Bexda dû takir

Mîr Budak (Bodaq) Begê kurê Mîr Ebdal e. Bi merdîtî û mêrxasiya xwe hatiye nasîn. Ew wilayeta Larcanê ji Eşîreta Zerzayê, Sêwî[319] ji Sohranê, wilayeta Sendosê ji Qizilbaşan, wilayeta Şehrbajarê ji destê mîrê Erdelanê girtiye. Keleha Maran ji nû ve ava kiriye. Piştre Kerkûka girêdayî Bexdayê stendiye. Pîr Budak, usûl û qaîdeyên heta wê çaxê di nav mîrên Kurdistanê de nehatine dîtin aniye. Birayê wî yê bi navê Rustem xwestiye Pîr Budak bide kuştinê. Lê Pîr Budak ew û alîkarê wî daye girtin û kuştin. Di dawiyê de Pîr Budak ji aliyê Mîr Seydiyê Mîrê Sohranê di kemînek de hatiye kuştin. Li pey wî kurê birayê wî Budakê kurê Rustem hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.328). Cegerxwîn ji taybetiyên Budak (Bodaq) Beg, firehkirina sînorên mîrektiyê aniye zimên ku di serdema Budak Beg de gelek hereketên fethê pêk hatine.

35/3 Were Bodaq tu şahê ser bi zêr î
581 Di Baban de tu gernas û tu şêr î

35/4 Tu Bodaq î belê bavê te Ristem
582 Xwedan nav û nîşan î bo me her dem

Budak (Bodaq) kurê Rustem (Ristem) e. Ji ber kurê Mîr Budak Beg tune bûye, kurê birayê wî Budakê kurê Rustem li cihê wî rûniştiye. Wî du salan rêvebiriya mîrektiyê kiriye. Di serdema wî de ji ber xizmetkar û giregirên leşkerî guhên xwe nedane fermana wî, vê rewşê gelek ew aciz kiriye. Ji ber vê nerehetiyê çûye rehma Xwedê. Ji ber ku li pey mirina wî kesek ji binemala wan nemaye kar û barên mîrektiyê ketine destê xulamên wan (Şerefname, r.329). Cegerxwîn pesnên Budak Beg daye ku ew xwediyê nav û nîşan e û wê tu car neyê jibîrkirin. Ew bi mêrxasî û

[319] Di wergera Abdullah Yegin de wek Sêwî (Siyewî) û Meşyagird derbas bûye (r.318).

cesareta xwe wek şêr e. Lê Cegerxwîn behsa pirsgirêkên wê serdemê yan jî xelasbûna vê binemalê nekiriye.

35/5 Li me carek binêre ey Nezer Beg
583 Li ser me Tirk û Eyran tev de bûn beg

35/6 Ji me kuştin egîd û mêr û serwer
584 Di Kurda de nemane mîr û begler

Piştî binemala Baban yekem kesê ku rêvebirî kiriye Pîr Nezerê kurê Bayram e. Ew bi mêrxasî û merdîtiya xwe hatiye naskirin. Bi exlaqxweşî û dadmendiya xwe hem di nav xelkê de hem jî di nav leşkerên xwe de gelek hatiye hezkirin. Bi darê zorê nahiya Kufrê ya girêdayî Bexdayê girtiye. Piştî wî wilayeta Baban bûye du perçe (Şerefname, r.328). Cegerxwîn bi bangkirina Nezer Beg, rûxandina rêvebiriya Kurdan a ji aliyê Tirk û Îranê ve destnîşan kiriye.

35/7 Silêman Beg, Birahîm Beg werin hûn
585 Binêrin em bi carek bûne dijmin

35/8 Hemî jar û pepûk û dîl û bindest
586 Ji derda em bi carek mane sermest

Silêman Beg û Mîr Îbrahîm (Birahîm) du mirovên ber destê Mîr Budak bûne. Piştî mirina Pîr Nezer herdu bi hev re hatine ser kar û barên Mîrektiya Baban. Wan wilayeta Baban di nav xwe de parve kirine. Demek dirêj di nav îttifaqê de rêvebirî kirine. Lê piştre dostiya wan cihê xwe ji dijminatiyê re hiştiye. Di şerê navxweyî de Silêman, Îbrahîmê ku neh salan nîvê wilayeta Baban bi rê ve biribû kuştiye. Silêman, beşa wilayeta wî jî xistiye serperçê wilayeta xwe. Wî panzdeh salan[320] mezintiya wilayeta Baban kiriye. Ew çar kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname,r.329). Cegerxwîn, dijminatiya di navbera mîrên Kurdan wek dijminatiya

[320] Li gor wergera Abdullah Yegin Silêman Beg, piştî yazdeh salan rêvebirî kiriye çûye rehma Xwedê (r.321).

di navbera temamê Kurdan hesibandiye. Çimkî bêîttifaqî bûye sedema êsîrî û bindestiya Kurdan.

35/9 Hacî Şêx Beg binêre tu li Baban
587 Di bin destê neyaran qîr û eman

35/10 Li her alî dinalin tev dibazin
588 Bi serbestî welatê xwe dixwazin

Hacî Şêxê kurê Mîr Îbrahîm e. Dema bavê wî ji aliyê Silêman Beg ve hatiye kuştin welatê xwe terk kiriye û çûye Seraya Şah Tehmasb. Lê ji ber şah eleqe rê nedaye bi awayekî bêhêvî vegeriyaye welatê xwe. Piştî mirina Mîr Silêman temamê wilayeta Baban girtiye dest xwe. Ji ber navbera Hacî Şêx û Şah Tehmasb nebaş bûye, şah sê caran leşkerên Qizilbaş şandine ser wî. Tu mîr û fermanrewayên Kurdistanê alîkariya wî nekiribin jî Hacî Şêx ji şer serkeftî derketiye. Di sala 941ê k./1535ê z. de dema ku Siltan Silêman Xan Bexdayê stendiye, Hacî Şêx bi armanca îta'eta xwe riya wî bide ber bi siltan ve çûye. Dema ku gihîştiye nahiya Merge, hinek Kurdên serkêş ên li wan navçeyan riya wî girtine û ew kuştine (Şerefname, r.330). Cegerxwîn ji bo têkoşîna wî ya welat, bangî Hacî Şêx kiriye. Cegerxwîn jê xwestiye ku bindestiya Baban a îro bibîne. Bi vî awayî bal kişandiye ser rewşa welêt a nebaş. Wî, Hacî Şêxê kurê Îbrahîm bi qîrîn û emana Kurdan yad kiriye.

35/11 Were rabe tu Bûdaq lawê Hacî
589 Ji destê me welat çûye nema cî

35/12 Ne Baban man, ne Soran man ne Belbas
590 Ne Zaza man ne Botan man ne gernas

Budakê (Bûdaqê) kurê Hacî Şêx e. Dema bavê wî ji aliyê Mergeyiyan ve hatiye kuştin, bi fermana Siltan Silêman hatiye ser desthilatdariyê. Wî şazdeh salan bi awayekî herî baş wezîfeya mîrektiyê meşandiye. Piştre Huseyîn Begê kurê Mîr Silêman ji bo rêvebiriya Mîrektiya Baban li hemberî wî derketiye. Budak Beg dev ji

welatê xwe berdaye û çûye cem Şah Tehmasb. Piştî şeş mehan li Îranê maye, wezîrê mezin ê Osmanî ew aniye Stenbolê. Di navbera Budak Beg û Huseyîn Beg de şerê îqtidarê dest pê kiriye. Di dawiyê de Huseyîn Beg di şer de hatiye kuştin. Siltan fermana ji holêrakirina Budak Beg daye, lê bi navincîtiya mîrê Imadiyyê siltan ew bexişandiye. Di cihê wilayeta Baban de Senceqa Ayintabê daye wî. Siltan wilayeta Baban jî daye destê mirovekî bi navê Bolî Beg.[321] Dema di navbera herdu şehzadeyên Siltan Selîm û Siltan Beyazidê kurê Siltan Silêman Xan de şer derketiye Budak Beg bûye terefdarê Siltan Beyazid. Siltan Silêman, Budak Beg wek dijminê xanedana xwe dîtiye. Siltan ji kurê xwe Beyazid xwestiye ku serê Budak Beg bibire û bişîne serayê. Li ser vê Şehzade Beyazid li Kutahyayê Budak Beg daye kuştin û serê wî şandiye Stenbolê. Çar zarokên kur li pey wî mane (Şerefname, r.330-331). Cegerxwîn windakirina desthilatdariya welat, bi rûxandina desthilatdariya eşîretên mezin ên Kurdan diyar kiriye.

35/13 Were rabe Hisên Beg ev çi beng e
591 Li nav Kurda hawar û qîr û ceng e

35/14 Ne Mîl mane ne Zîl mane ne Goran
592 Ne Zîbar û ne Çav mane ne Loran

Mîr Huseyinê kurê Silêman e. Piştî mirina bavê xwe ji ber Hacî Şêxê kurê Îbrahîm wilayeta Baban dagir kiriye, ew çûye cem Şah Tehmasb. Mîr Huseyîn bi alîkariya wî sê caran bi leşkerên Qizilbaşan re ji bo stendina wilayeta Baban hatiye. Di dawiyê de di şerê Çiyayê Gilalayê de ji du hezarî zêdetir leşkerên Qizilbaşan hatine kuştin. Şah Tehmasb ji vê rewşê aciz bûye û Mîr Huseyîn û herdu birayên wî xistine zindanê. Mîr Huseyîn dema ji zindanê rizgar bûye çûye Stenbolê û xwe avêtiye Seraya Sultan Silêman Xan. Ew şeş salan li Rumeliyê li cihê hatiye wezîfedarkirin maye. Piştre bi alîkariya Mîrê Imadiyyê Eyaleta Baban dane destê wî. Mîr Huseyîn piştî van bûyeran ji aliyê Budak Begê kurê Hacî Şêx ve hatiye kuştin.

[321] Di wergera Abdullah Yegin (r.323) û İbrahim Sunkur (r.330) de ji dêvla navê Bolî Beg, Velî Beg hatiye bikaranîn.

Kurekî bi navê Xidir li pey wî maye (Şerefname, r.332-333). Cegerxwîn eşîretên Kurdan rêz kirine û tunekirina desthilatdariya Kurdan bi hawar û qîrîn bi bîr aniye.

Xidir Begê kurê Mîr Huseyîn, demek rêvebiriya nahiya Merge ya girêdayî Baban meşandiye. Di dema Siltan Murad Xan de karbidestên Osmaniyan Mergeyê ji destê wî stendine. Di vê rewşê de Xidir Beg çûye rehma Xwedê. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Eşîreta Baban bê hikumdar bûye. Lê nêzîkî çar hezar leşkerên wan hebûne û ne di bin desthilatdariya kesekî de bûne (Şerefname, r.332-333). Cegerxwîn menzûmeya xwe heta serdema Mîr Huseyîn aniye lê behsa kurê wî Xidir Beg nekiriye.

**Tablo 3.2.35.**Mîrên Baban

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Mîr Budakê kurê Mîr Ebdal, Budakê kurê Rustem, Nezer Begê kurê Bayram, Suleyman û Mîr Îbrahîm, Hacî Şêxê kurê Îbrahîm, Budak Begê kurê Hacî Şêx, Huseyîn Begê kurê Mîr Suleyman, Xidir Begê kurê Huseyîn Beg | Pîr Bodaq Beg<br>Şah Bodaq<br>Nezer Beg<br>Silêman Beg, Brahîm Beg<br>Hecî Şex Beg<br>Bûdaq lawê Hacî<br>Hisên Beg |
| Dem | Sedsalên XV- XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Baban,Larcan,Sêwî,Meşyagird(A.Y.), Sendos, Şehrbajêr, Kerkûk, Nahiya Kufrê, Nelîn, Diyala, Merge | Baban, Eyran, Bexda (Di dewra Bodaq Beg de sînor ji Eyran heta Bexda çûye) |

### 3.2.36. Mîrên Mukrî

Bi qasî tê zanîn koka mîrên Mukrî digihîje Eşîreta Mukrî ya nahiya Şehrezorê. Li gor riwayetekê ew ji nesla Baban in. Li gor hin riwayetên din, ji nesla yekî bi navê Seyfeddîn in. Seyfeddîn yekî gelek bi aqil, jîr û bi fêl û fend bûye. Ew her çûye hêza xwe zêde kiriye, eşîret li derûdora wî berhev bûne. Seyfeddîn demeke dirêj mîrektiya welêt kiriye. Du kur li pey xwe hiştine û wefat kiriye (Şerefname, r.335). Cegerxwîn di menzûmeya xwe ya “Beganê Mukrî” de cih nedaye vî mîrê

destpêkê. Menzûmeya “Beganê Mukrî” ji deh malikan pêk hatiye û tê de navê heft mîrên vê binemalê derbas bûne. Di *Şerefname*yê de bi sernavê “Di Derheqê Fermanrewayê Mekrî de ye” derbas bûye.

36/1 Were Sarim tu şahê Mukreyanî
593 Serfiraz û egîd û pehlewanî

36/2 Ji Mûsil bigre dîsa ta Meraxe
594 Di nav wan de ne beg mane ne axe

Sarimê kurê Seyfeddînê Mukrî ye, bûye cînişînê bavê xwe. Şah Îsmaîl ji bo welatê wan bi dest bixe arteşek mezin şandiye ser Mukriyan. Êrîşên Sefewiyan bi şikestina leşkerên Qizilbaş bi dawî bûne. Di dema Siltan Selîm Xan ku desthilatdarê kisrayê Îranê kiribû bindestê xwe, Sarim Beg xwe daye milê Osmaniyan. Bi vî awayî ji êrişên Qizilbaşan rizgar bûye. Dema ku Siltan Silêman Xanê warisê mulkê Qeyserê Rûmê[322] hatiye ser textê Osmanî, Sarim Beg çûye cem wî. Ji Sarim Beg re wezîfeya bavê wî bi riya mulkiyeta îkta derketiye. Lê çawa vegeriyaye ser wezîfeya xwe sê zarokên kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê. Hersê kurên wî jî di salên xortaniya xwe de mirine û nehatine ser rêvebiriya mîrektiyê (Şerefname, r.336). Cegerxwîn pesnên egîdî û pehlewaniya Sarim Beg daye. Wî ji Meraxe heta Mûsilê ku ketiye bin desthilatdariya wan bi bîr aniye. Lê mixabin ev cih ji dest derketine û pêwist e ji bo dîsa têkevin bin desthilatdariya Kurdan, Kurd di ber xwe bidin.

36/3 Were Heyder binêre em nebûn yek
595 Nezer Beg rake ser xwe ka Xidir Beg

36/4 Binêre ew sera û birc û eywan
596 Hemî îro bi carek bûne wêran

322 Di wergera Abdullah Yegin de wek Qeyserê Rûm û Îranê derbas bûye (r.326).

Şêx Heyder, Mîr Nezer û Mîr Xidir kurê Rustemê kurê Baba Omerê kurê Seyfeddîn in. Piştî mirina kurên Sarim Beg, wilayeta ji bav û bapîran mayî di navbera xwe de parve kirine. Hersê birayan ji Şah Tehmasb re îta’et kirine. Ev rewş heta sala 948ê k./1542yê z. ku têkelheviyên Elqas Mîrza qewimiye, dewam kiriye. Bi fermana Siltan Silêman Xan, mîrên Imadiyyê, Hekkarî û Biradostan êrîşî ser Mîrektiya Mukriyan kirine. Di şer de hersê bira jî hatine kuştin. Piştre bi fermana siltan, Emîre Begê kurê Hacî Omer hatiye ser desthilatdariya mîrektiyê (Şerefname, r.336-337). Cegerxwîn dixwaze ji vê bûyera ku hersê bira nebûne yek û di dawiyê de bi êrîşên neyaran hatine kuştin ders bê girtin. Lewma bal kişandiye ser fikra bêtifaqî, bêhêzbûnê bi xwe re tîne.

36/5 Temaşake li me Kurdan Emîre
597 Li her alî hawar û deng û qîr e

36/6 Bi mêranî meger em pehlewan in
598 Belê çibkim ku îro pir nezanin

Emîre Beg kurê Hacî Omerê kurê Sarîmê kurê Seyfeddîn e. Li ser xebera kuştina Şêx Heyder, ji aliyê Dîwana Siltan ve ferman Mîrektiya Mukriyan ji Emîre Beg re hatiye dayin. Emîre Beg, nêzîkî sî salan bi serfirazî rêvebiriya mîrektiyê kiriye. Heta roja miriye îta’eta xwe bi Siltan Silêman Xan re domandiye. Zarokek kur li pey xwe hiştiye û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.337). Cegerxwîn bangî Emîre Beg kiriye ku hawar û qîrîna Kurdan bibihîze, halê wan ê perîşan binêre. Cegerxwîn diyar kiriye ku herçiqas Kurd mêr û pehlîwan bin jî ne xwediyê hişmendiyê ne, nezan in. Wî bi van îfadeyan xwestiye ku xwendekarên xwe ji nezanî û nebîreweriyê hişyar bike.

36/7 Were paşa Emîre mîrê mîran
599 Binêre ev Meraxe bûye wêran

36/8 Ne Mukrî ma ne Mûsil ma ne Erbîl
600 Di bin destê neyaran de hemî dîl

Emîre Begê kurê Şêx Heyder e. Piştî mirina apê xwe îta'eta xwe pêşkêşî Şah Tehmasb kiriye. Li Îranê dema Şah Mihemmed hatiye ser desthilatdariyê ji ber jar û qels bûye, Emîre Beg tevî gelek mîrên Kurdistanê çûye cem Siltan Murad Xan. Bi fermana siltan, wilayeta Baban têxistine ser wilayeta Mukrî û Senceqa Mûsilê jî dane destê wî. Ji zarokên wî re jî Senceqa Erbîlê û hinek cihên girêdayî Meraxeyê hatiye dayin. Siltan wî bi qewlê wilayeta Meraxeyê ji destê Qizilbaşan rizgar bike, kiriye mîrêmîran û bi vî awayî ketiye nav paşayên Osmanî. Wî muxalîfên xwe ji holê rakirine û di vî warî de kurap û birayê xwe kuştine. Lê piştî bajarê Tebrîzê ketiye destê berpirsiyarê Dewleta Osmanî, wan xwestine Merax bi Tebrîzê ve bê girêdan. Emîre Beg ev yek qebûl nekiriye, lewma di navbera wan de dubendî derketiye. Di dawiyê de ew cihên kiribûn ser wilayeta wî, ji destê wî hatine girtin. Tenê wilayeta wî ya mîrate mayî di destê wî de maye (Şerefname, r.337-339). Cegerxwîn, Emîre Beg bi wesfên paşatî û mîrêmîrantiya wî aniye zimên ku navê Emîre Beg di hikum û fermanan de wek "Emîre Paşa" hatiye nivîsandin. Cihên ketine bin desthilatdariya Emîre Beg yad kiriye û xwestiye ji destderketina wan cihan ji aliyê xwendevanan ve bên zanîn.

36/9 Li me carek temaşake tu Heyder
601 Di nav Kurda ne mîr mane ne rêber

36/10 Bi carek em hemî bûne belengaz
602 Di destê me nemaye doz û daxwaz

Şêx Heyderê kurê Emîre Beg e. Bi fermana Siltan Murad Xan, Kela Sarikurganê ya girêdayî Meraxeyê ya ji aliyê Tîmûr ve hatiye xerakirin ji nû ve ava kiriye. Şêx Heyder heta sala 1002yê k./1594ê z. rêvebiriya vê keleyê kiriye. Piştre ji aliyê mîrêmîranê Bexdayê ve kele û nahiyeya pê ve ji Eşîreta Mehmûdî re hatiye dayin. Ev yek bûye sedemê tevlîheviyê. Di şer de kurekî serokê Eşîreta Mehmûdî tevî birek mirovên xwe hatine kuştin. Ji bo tolhildanê Eşîreta Mehmûdî tevî Îwaz Begê mîrlîwayê Makûyê êrîş birine ser Şêx Heyder. Di şer de Îwaz Beg hatiye kuştin. Emîre Paşa mudaxeleyî şer kiriye û nehiştiye ku kurên wî şer bidomînin. Çar

zarokên kur ên Emîre Paşa hebûne. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin ji kurên wî tenê Şêx Heyder maye (Şerefname, r.340-341). Bi bangkirina Şêx Heyder, Cegerxwîn ji tunebûna mîr û rêberên Kurdan gazin kirine. Ji ber mîrektiyên Kurdan ji jolê hatine rakirin, bi cihanîna doz û daxwaza Kurdan ne pêkan e.

**Tablo 3.2.36.** Mîrên Mukrî

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Seyfeddîn, Sarimê kurê Seyfeddîn Mekrî, Şêx Heyder, Mîr Nezer û Mîr Xidirê kurê Rustemê kurê Baba Omerê kurê Seyfeddîn, Emîre Begê kurê Hacî Omerê kurê Sarimê kurê Seyfeddîn, Emîre Begê kurê Şêx Heyder, Şêx Heyderê kurê Emîre Beg | Sarim<br>Heyder<br>Nezer Beg<br>Xidir Beg<br>Emîre<br>Emîre Paşa<br>Heyder |
| Dem | Sedsalên XV-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Mukrî (Mekrî), Deyase, Dulbarîk, Axtacî, Îltemur, Saldoz, Nahiya Mihemmed Şah, Meraxe, Mûsil, Erbîl,NahiyaAcrê,Duab,Leylan, Tereqe, Sariqurgan | Mûsil, Meraxe, Mukrî, Erbîl |

### 3.2.37. Mirên Biradostî

Bi awayî ku tê zanîn mîrên Biradostî ji Eşîreta Goran in. Li gor riwayeteke hê rasttir eslê wan digihîje Hîlalê kurê Bedirê kurê Hesnewiyye yê mîrê Dînewer û Şehrezorê. Di *Şerefname*yê de bi sernavê “Di Derheqê Fermanrewayên Biradostî de ye” cih girtiye. Mîrên Biradostî di *Şerefname*yê de bûne du şax. Ji şaxa Begên Somayê û şaxa Begên Tergewer û Kela Dawudê pêk hatine. Cegerxwîn van şaxan bi menzûmeya “Beganê Biradost” kiriye yek. Wî, menzûmeya xwe ya li ser vê binemalê ji çardeh malikan saz kiriye û tê de behsa heft mîrên Biradostî kiriye.

37/1 Qeran Xazî tu rabe ey cîhangîr
603 Serifraz û egîd û fihris û jîr

37/2 Welat kanî begê min, ka Biradost?
604 Belengaz in di bin wan de nema post

Gazî Qiranê (Qeran Xazî) kurê Siltan Ehmed e. Ew berî ku bi mîrê Kurdistanê re biçe cem Şah Îsmaîl, wî êrîşek biriye ser Qizilbaşên Urmiyê. Di vê êrîşê de nêzîkî hezar kes ji Qizilbaşan hatine kuştin. Dema bi mîr û fermanrewayên Kurdistanê re ji bo îta'eta xwe pêşkêş bike çûye cem Şah Îsmaîl, şah gelek qedr û qîmet dayê. Şah, tevî unwana Gazî Qiran nahiyên Terkor, Soma, Dewl û cihên girêdayî wan dane destê wî. Fermana şahîtiyê jî jê re derxistiye. Piştre Gazî Qiran, ji bo îta'eta xwe nîşan bide, bi mîr û fermanrewayên Kurdistanê re çûye Seraya Siltan Selîm Xan. Dema ku Siltan Silêman Xan[323] bi armanca girtina welatê Ecem derketiye seferê. Wî Gazî Qiran ji xwe re ji bo rawêjkariyê hilbijartiye. Piştre hin perçên mezin ên Hewlêr, Bexdad û Diyarbekrê xistiye ser warîdata senceqa wî. Ew, demek dirêj rêvebiriya welat kiriye. Wî du zarokên kur li pey xwe hiştine û ew çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.344). Cegerxwîn piştî pesnê mêr û mêrxasî û cengaweriya Gazî Qiran daye, ji destderketina erdê Biradost û desthilatdariya wê bi riya pirskirinê xwestiye xwendekarên xwe bifikirîne. Û di vî warî de hişmendiya wan zêde bike.

37/3 Were ey Şah Muhemmed şahê şahan
605 Ji bo Kurda re çêkin xwendegahan

37/4 Bera tê de bixwînin xort û axçîk
606 Ji bo çêkin tiving û hem tematîk

Şah Mihemmed (Muhemmed) Begê kurê Gazî Qiran e. Piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Heta wefat kiriye kar û barên mîrektiyê bi rê ve birine. Çar

[323] Di wergera Ziya Avci (r.344) û İbrahim Sunkur (r.340) de Siltan Silêman Xan e, di wergera Abdullah Yegin de (r.333) Siltan Selîm Xan e.

kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê. Piştî wî kurê wî yê mezin Budak Beg hatiye ser textê mîrektiyê (Şerefname, r.345). Di van malikên li jor ên ji bo Şah Mihemmed hatine nivîsandin de wi ji şah xwestiye ku ji bo perwerdekirina Kurdan xwendegehan çêke. Cegerxwîn diyar kiriye ku ji bo pêşketinê perwerdehî şert e. Perwerde xort, keç ferq nake ji bo temamê civakê pêwîst e. Heke Kurd ji aliyê zanyariyê ve bi pêşkevin wê dikaribin senayiya xwe damezrînin û çekên wek tiving û yên tematîk (otomatîk) çêkin. Di *Şerefname*yê de ji bo serdema Şah Mihemmed, agahiyen çêkirina xwendegehan an girîngiya perwerdebûnê tune ye. Lê Cegerxwîn bi mebesta girîngiya perwerdehiyê bîne zimên bi awayekî anakronîk bal kişandiye ser zanyarî, ilm û fenê. Wî, riya xelasiyê di şerê çekdariyê de dîtiye, encax bi zanyarî û şerê çekdarî têkoşîna rizgariyê bê dayin.

37/5 Çiman Bodaq tu deynakî di îro
607 Li Kurmanca tu napirsî tu mîro

37/6 Hemî jar û belengaz in bi carek
608 Welatê me ji bo me bû mişarek

Budak (Bodaq) Begê kurê Şah Mihemmed Beg e. Piştî mirina bavê xwe li ser fermana Siltan Silêman Xan li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Heta roja çûye rehma Xwedê kar û barên mîrektiyê bi rê ve biriye. Dame ku miriye çar kurên wî yên temenbiçûk hebûne. Lewma Mîrektiya Biradostê ketiye destê Hesen Begê birayê wî (Şerefname, r.345). Cegerxwîn ji ber Budak (Bodaq) Beg li halê Kurmancan (Kurdan) napirse jê gazin kirine. Cî û warê Kurmancan ji destê wan hatiye girtin û welat li wan teng bûye, bûye qasî mişarek. Ji bo çareserkirina vê rewşê pêdivî bi mîr û begên wek berê heye.

37/7 Hisên Beg rabe ser xwe ev çi gav e
609 Belê ceng e li ser zêr û dirav e

37/8 Di nav Kurdan nemane Beg û zengîn
610 Li ser şaxan dibazin tev Cegerxwîn

Di *Şerefname*yê de bi navê Hesen Begê kurê Şah Mihemmed Beg derbas bûye. Lê Cegerxwîn ew bi navê Hisen daye. Hesen Beg, piştî mirina birayê xwe Budak Beg bi fermana padîşah hatiye ser text. Wî li hemberî xelkê û serokeşîran xerabiyên mezin kirine. Mîr û mezinên welatên cîran jî ji xwe xeyidandine û hêrsa wan li xwe vekiriye. Mîrên cîran gilî û gazinên di derheqê wî de gihandine Asîtaneyê. Bi fermana padîşah ew anîne Dîwana Wanê û piştî vekolînê ew xeniqandine. Hikumeta Biradostî dane destê Elî Begê kurê Gazî Qiran (Şerefname, r.345). Cegerxwîn li ser serdema Hesen beg ranewestiye, ew rewşa Kurdan a roja xwe aniye zimên. Kurd hemû jar û perîşan in, hikumdarî û dewlemendiya wan nemaye. Lewma tev ji derd û kulan bûne Cegerxwîn ku tenê Cegerxwîn ne ew e, hemû Kurd di vî warî de Cegerxwîn in.

37/9 Elî Beg rabe ser xwe em piling in
611 Li destê me binêre tev tiving in

37/10 Bi carek em li çolan tev dibazin
612 Bi serbestî welatê xwe dixwazin

Elî Begê kurê Gazî Qiran e. Piştî kuştina Hesen Beg, bi fermana Siltan Selîm Xan li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Çend sal di ser rêvebiriya Elî Beg re derbas bûne, Eşîreta Biradostî ji serweriya wî aciz bûye. Wan xwestiye ku Ewliya Beg mezintiya wan bike û ji bo vê yekê çûne Stenbolê. Li ser daxwaza xelkê wezîfeya Elî Beg guherandine. Di dema Xusrev Paşa de derûdora Urmiyê hatiye bidestxistin û rêvebiriya wê kirine destê Îskender Begê kurê Şah Mihemmed. Ew der ji Îskender Beg hatiye stendin û dane destê Elî Beg. Elî Beg piştî salekê rêvebiriya Urmiyê kiriye, bêyî neslekê li pey xwe bihêle miriye (Şerefname, r.346). Cegerxwîn di malikên ji bo Elî Beg nivîsandiye de ji bo welatekî serbixwe bi coş û wêrekî doza şerê çekdarî kiriye, di vî warî de Kurdan dişibîne pilingan.

37/11 Were, rabe binêre Ewliya Beg
613 Welatê me bi carek bûye gevzek

37/12 Li alîkî me Tirkên qelsemêr in
614 Li alîkî Ereb tê de diçêrin

Ewliya Begê kurê Budak Begê kurê Şah Mihemmed Beg e. Ji ber dema bavê wî çûye rehmetê hê zarok bûye çend salan rêvebiriya mîrektiyê di destê kurapên wî de maye. Piştî ku mezin bûye eşîret û qebîleyên Biradostî li dora wî kom bûne. Li ser daxwaza wan di sala 985ê k./1597ê z. de fermana rêvebiriyê ji Ewliya Beg re derketiye. Desthilatdarî ji Elî Beg stendine û dane destê Ewliya Beg. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin Mîrektiya Somayê di destê wî de bûye (Şerefname, r.346). Cegerxwîn wêranbûna welat bi dijminatiya neteweyên hemsînor ên Tirk û Ereban ve girê daye. Wî Tirk ji aliyê mêr û mêrxasiyê ve kêm û lewaz dîtine.

37/13 Were Nasir, binêre rengê Têrkûr
615 Ji xwîna me seraser tev de bûn sor

37/14 Ji me kuştin piling û şêr û ejder
616 Di bin destê neyaran bûne rencber

Nasir Begê kurê Şêr Begê kurê Şêx Hesen Beg e. Ew bi mêr û mêrxasiya xwe hatiye naskirin. Temenê wî ji heştê salî derbas bûye ku hê li ser rêvebiriyê bûye. Di navbera wî û Eşîreta Dirî ya girêdayî Mîrê Hekkariyan Zeynel Beg de, li ser sînor dubendî derketiye. Di şerê navbera wan de ji sed kes zêdetir hatine kuştin. Li ser vê çend caran mecbûr maye xwe bavêje Seraya Şah Tehmasb. Zeynel Beg, kurê wî Şêr Beg perwerde kiriye û Mîrektiya Somayê ya berê di bin rêvebiriya Nasir Beg de hatibû veqetandin daye destê wî. Lê rewşa nebaş a bavê wî gelek tesîr li Şêr Beg kiriye û ew ji nexweşîna webayê miriye. Ji xeynî Şêr Beg heft kurên din ên Nasir Beg hebûne (Şerefname, r.347).

Bindestiya Kurdan, Cegerxwîn bi awayekî mubalexeyî aniye zimên. Têrkûr (Terkor) ji ber êrîşên dijminan ji xwîna Kurdan sor bûye. Kurd di bin destê neyaran de bûne kedkar û xebatkar. Cegerxwîn egîd û mêrxasiya Kurdan bi heywanên sembola cesaret û bêtirsiyê yên wek piling, şêr û ejder aniye zimên. Belê Kurd bêtirs in lê di bin zilm û zora dijmin de lewaz bûne. Di *Şerefnameya Menzûm* de bikaranîna

ejder li gor şêr û piling kêm e. Ejder, wek di mîtolojiya cihanê de, di mîtolojiya Kurdan de jî tê wateya marê mezin. Ejdeha marekî wisa ye ku rûyê wî dişibe hespê û ji devê wî agir derdikeve. Cegerxwîn tevî şêr û piling ejder (ejdeha) jî bi wateya Kurdên bêtirs û bi cesaret bi kar aniye.

Piştî mirina Şêr Beg, Mîrektiya Tergewerê ketiye destê kurapê wî Zeyneddîn Beg. Ew jî di şerekî bi Qizilbaşan re hatiye kuştin. Nasir Beg ev yek wek firset dîtiye û nahiya Tergewerê bi senceqa xwe ve girêdaye. Piştre ev nahiye bi rêzê ji Yûsif Beg re, ji Şah Mihemmed Beg re û ji Huseynî Begê kurê Şah Huseyîn[324] re hatiye dayin. Dema nivîsandina *Şerefname*yê Huseynî Beg li ser rêvebiriyê bûye (Şerefname, r.347). Cegerxwîn menzûmeya xwe heta serdema Nasir Beg aniye. Behsa Şêr Beg, Zeyneddîn Begê pismamê wî û yên piştî wan bûne rêvebirê nahiya Tergewerê nekiriye.

**Tablo 3.2.37.** Mirên Biradostî

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Gazî Qiranê kurê Sultan Ehmed<br>**Begên Somayê:** Şah Mihemmed Begê kurê Gazî Qiran, Budak Begê kurê Şah Mihemmed Beg, Hesen Begê kurê Şah Mihemmed Beg, Elî Begê kurê Gazî Qiran, İskender Begê kurê Şah Mihemmed, Ewliya Begê kurê Budak Begê kurê Şah Mihemmed Beg<br>**Begên Tergewer û Kela Dawud:** Nasir Begê kurê Şêr kurê Şêx Hesen Beg, Şêr Begê kurê Nasir Beg, Zeyneddîn Beg | Qeran Xazî<br>Şah Muhemmed<br>Bodaq<br>Hisên Beg<br>Elî Beg<br>Ewliya Beg<br>Nasir |
| Dem | Sedsalên XII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Biradost, Terkor, Soma, Dewl, Urmiye, Tergewer | Biradost, Têrkûr |

[324] Li gor wergera Ziya Avci (r.347) û Abdullah Yegin (r.336) nahiya Tergewer herî dawî di destê Şah Huseyîn de bûye, li gor wergera İbrahim Sunkur (r.343) di Şerefnameyê de rêvebirê herî dawî Şah Mihemmed e. Di vê nusxeyê de navê Huseyîn Şah wek rêvebir derbas nebûye.

### 3.2.38.Begên Mehmûdî

Li gor dîroknasan koka Mîrên Mehmûdî digihîje siltanên Hikumeta Merwaniyan. Li gor riwayetek din ew kurapên mîrên Cezîrê ne. Yekî bi navê Şêx Mehmûd tevî eşîreta xwe di dema Tirkmenên Qereqoyunî de ji Şamê yan jî ji Cezîra Omer çûye aliyê Azerbaycanê. Qere Yûsif, Kela Aşûtê daye wan û Şêx Mehmûd xistiye nav peywirdarên xwe (Şerefname, r.349). Cegerxwîn menzûmeya xwe ya "Beganê Mehmûdî" bi çardeh malikan nivîsandiye. Di vê menzûmeyê de cih daye navê heft mîrên Mehmûdî.

38/1 Were Mehmûd binêre kanî Merwan?
617 Belê kanî Cizîr e, birc û eywan?

38/2 Gelo Xoşab li ku ye kanî Aşût?
618 Ji paşa û ji mêran tev de bûn rût

Şêx Mehmûd mirovekî mêr û mêrxas bûye. Ji ber mêrxasiyên wî yên meydana şer gelek baweriya Qere Yûsif pê hatiye. Qere Yûsif mîrîtiya nahiya Aşûtê bi nahiya Xoşabê ve daye destê wî. Ji vê mîrektiyê re Mîrektiya Mehmûdî hatiye gotin (Şerefname, r.349). Cegerxwîn bi behsa vî mîrê destpêkê cihên di bin desthilatdariya wan de bûye û niha ji dest derketiye bi bîr aniye.

38/3 Hisên Beg kanî Elbaq, kanî Şinbo?
619 Hemî wêran û kavil bûne îro

38/4 We hev kuşt û we em kuştin li pê xwe
620 Di nav Kurdan nemane şah û keyxwe

Mîr Huseyîn Begê kurê Şêx Mehmûd e. Piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Di dema siltanên Aqqoyunî de nav û dengê wî belav bûye. Nahiya Elbakê ji Mîrektiya Hekkariyê veqetandine û kirine ser erdê hikumeta wî. Bi alîkariya Tirkmenan çend caran leşkerê Izzedînşêr têkbiriye û wilayeta Şembûyê girtiye. Li ser vê Izzeddînşêr ji Mîrektiya Bedlîsê alîkarî xwestiye û êrîşî ser Mîr

Huseyîn kiriye. Leşkerên herdu aliyan li qeraxa Çemê Xoşabê ya bi navê Mîr Ehmed,[325] şer kirine. Mîr Huseyîn di vî şerî de hatiye kuştin û kurek li pey xwe hiştiye. Piştî wî kurê wî Mîr Hamid hatiye ser textê mîrektiyê (Şerefname, r.350). Cegerxwîn, hem kul û derdê wêranbûn û kavilbûna welat aniye zimên hem jî ji bêtifaqiya Kurdan gazin kirine. Di serdema Mîr Huseyîn de mîrektî li hemberî hev şer kirine û di dawiyê de Mîr Huseyîn hatiye kuştin. Lewma Cegerxwîn bi xemgînî gotiye "We hev kuşt û we em kuştin li pey xwe". Serok û rêberên Kurdan bi hev nekirine û di netîceyê de lewaz bûne, ji holê rabûne îro Kurd bindest mane.

38/5 Erê Hamid ji bin axê tu rabe
621 Temaşake li bajarê Xoşab e

38/6 Welatê me bi carek bûye kavil
622 Ji xwe xurdê me Kurdan nanê gilgil

Mîr Hamîdê kurê Mîr Huseyîn e. Piştî kuştina bavê xwe hatiye ser textê mîrektiyê. Wî jî wek bavê xwe demek di nav sefê mîrên Qizilbaşan de cih girtiye. Sê zarokên kur li pey xwe hiştine û wefat kiriye (Şerefname, r.350). Cegerxwîn belengazî û feqîriya Kurdan, wêranbûna welatê wan bi van risteyan carek din daye berçavan. Ew, bangî Hamîd Beg kiriye ku ji bin axê rabe û halê Kurdan bibîne. Çimkî ew bêhikumdar û bêkes mane.

38/7 Ewed Beg rabe ser xwe ey begê baş
623 Bi carek bûne begler ev Qizilbaş

38/8 Sera û şehr û eywan bûne winda
624 Li ser wan em dinalin rengê kunda

Îwaz Begê kurê Mîr Hamîd, di menzûmeya Cegerxwîn de bi navê Ewed Beg hatiye nivîsandin. Îwaz Beg piştî mirina bavê xwe mîrlîwatiya Xoşabê girtiye dest xwe. Ew li dijî Orkmez Siltanê di maiyeta Şah Îsmaîl de walîtiya Wan û Westanê,

[325] Di wergera Abdullah Yegin de wek Çemê Mîr, hatiye nivîsandin (r.337).

rabûye. Orkmez Siltan ew girtiye û xistiye zindanê. Îwaz Beg firset bi dest xistiye ku ji Şeref Xanê Bedlîsî alîkarî bixwaze. Di dawiyê de bi alîkariya Şeref Xan ji zindanê hatiye berdan. Piştî demekê Îwaz Beg ketiye nav beg û fermandarên Şah Tehmasb. Bi vî awayî kar û barên mîrektiyê meşandine. Pênc kur li pey xwe hiştine û çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.350). Diyar eku Cegerxwîn ji girtina Îwaz Beg a ji aliyê Orkmez Beg aciz bûye û bi bangkirina Îwaz Beg vê aciziya xwe bi gotina "bûne begler ev Qizilbaş" aniye zimên. Wî gotiye ku li ser windabûna seray, şehr (bajar) û eywanan (dîwan) em wek kund dinalin. Wek me li jor jî behs kiriye; kund di mîtolojiya rojhilatê de sembola bêyewmî, mirin û tunebûnê ye. Di vê malika jor de jî bi heman wateyê hatiye bikaranîn.

Ji kurên Îwaz Beg; Huseyîn Qulî Beg, Şah Elî Beg û Hemze Beg li hin senceqan rêvebirî kirine. Hesen Begê kurê wî jî piştî Xan Mihemmedê kurê Şemseddînê kurê Mîr Hamîd kar û barên mîrektiyê girtiye dest xwe. Ji neviyên wî Xalid Begê kurê Şah Elî jî li nahiya Coresê desthilatdarî kiriye. Ji bilî vê Mîr Şemseddînê kurê Xan Mihemmed, piştî mirina bavê xwe rêvebiriya Axçeqeleyê girtiye dest xwe. Cegerxwîn ji van began tenê behsa Hesen Begê kurê Îwaz bi bîr aniye.

38/9 Emîre guh bidêre deng û halan
625 Welatê me bi carek kirne talan

38/10 Ji xwînê deşt û zozan tev de bûn sor
626 Li çolan em dibazin deng û qûrqûr

Emîre Begê kurê Mîr Hamîd e. Piştî mirina Îwaz Begê birayê wî ji aliyê Dîwana Qizilbaşan ve rêvebirî jê re hatiye dayin. Îwaz Beg di şerê navbera Şeref Xanê Bedlîsê û Ulame Tekelû de piştgirî daye Ulema Tekelû. Di wê demê de Siltan Silêman Xan, ji baregeha xwe ya Bexdayê ber bi Tebrîzê ve çûye. Emîre Beg ji bo îta'eta xwe ji siltan re pêşkêş bike, li wir amade bûye. Siltan, ji bo anîna wî ya baregeha Osmanî zabitek şandiye pey wî. Emîre Beg, ketiye nav dudiliyê û zabit kuştiye. Kurdên bi xwe re jî ji bo serhildanê amade kirine. Dema ev xeber gihîştiye guhê siltan, fermana kuştina Emîre Beg derketiye. Leşkerên Osmanî êrîş birine ser

wî û mirovên pê re kuştine. Ew û hinek mirovên pê re girtine û anîne dîwanê. Siltan di cî de ji bo îdama wan ferman derxistiye. Du zarokên kur li pey Emîre Beg mane (Şerefname, r.352-353). Cegerxwîn talankirin û wêranbûna welat bi awayekî mubalexeyî aniye zimên. Ji xwîna sor deşt û zozan xuya nabin, Kurd li çolan dibazin; deng, halan û qurqura wan e. Cegerxwîn bi van risteyan bêxwedîtî û bêseroktiya Kurdan daye ber çavan.

38/11 Hesen Beg rabe ser xwe wer binêre
627 Welatê me bi carek tev de zêr e

38/12 Belê îro di bin destê neyara
628 Eman em rût û tazî rengê mara

Hesen Begê kurê Îwaz Begê kurê Mîr Hemîd e. Parêzgeriya baweriya Êzîdîtiyê ji nav Eşîreta Mehmûdî rakiriye. Ferzên wek nimêj, rojî, hec û hwd. li ser cema'etê ferz kiriye. Wî li her gundî medrese û mizgeft ava kirine. Hesen Beg mirovekî siyasetzan û dadmend bûye. Dema hikumeta Mîrektiya Mehmûdî ji Xan Mihemmedê kurê Şemseddîn Beg re hatiye dayin, Hesen Beg naçar maye û berê xwe daye Seraya Şah Tehmasb. Şah qedr û siyaneta wî girtiye û piştre rêvebiriya mîrektiyê paş de daye Hesen Beg. Li ser vê, Xan Mihemmed dev ji rêvebiriya hikumetê berdaye û bi Axçeqeleyê razî bûye. Dema Siltan Suleyman Xan ji bo girtina Îranê derketiye seferê, Hesen Beg mecbûr maye xwe bavêje ber dergaha wî. Li ser xizmetên wî yên baş û kêrhatî siltan qenciyên gelek mezin bi wî kirine. Eşîreta Mehmûdî gelek rutbe û payeyên bilind ji Dîwana Osmanî wergirtine. Wan, xizmetên ku ji Dewleta Osmanî re kirine li defterekî daye qeydkirin û muhrkirin. Hesen Beg bi awayekî serbixwe pêncî sal mîrektî bi rê ve biriye. Ewdi sala 993yê k./1585ê z. de di riya stendina Tebrîzê de ji aliyê Qizilbaşan ve hatiye kuştin. Salek şûnde hestiyên wî derxistine û anîne li Xoşabê li Medreseya Îlmê[326] ya ji aliyê wî ve hatiye çêkirin veşartine (Şerefname, r.353-356). Ji ber welatê hêja û giranbiha ketiye destê neyaran, Cegerxwîn belengazî û xizaniya Kurdan şibandiye marê rût û tazî.

[326] Di wergera Abdullah Yegin (r.343) û İbrahim Sunkur (r.350) de hatiye gotin ku di medreseya bixwe dabû çêkirin de hatiye veşartin, lê navê medreseyê derbas nebûye.

38/13 Erê Şêr Beg bi carek rengê derwêş
629 Li paş mane neyarên me çûne pêş

38/14 Di destê şêx û axan em çi jîr in
630 Ji lewma bê xwedan û pişt û mîr in

Şêr Begê kurê Hesen Beg e. Bavê wî di saxiya xwe de senceqa Makûyê daye destê kurê xwe Îwaz Beg. Hesen Beg ji kar û barên mîrektiya Xoşabê feragat kiriye û mîrektî daye destê Şêr Beg. Ew, kesekî dilpak û sofî bûye. Wextê xwe bi kesên zana, xwedî fezîlet û ehlê tesewwufê re derbas kiriye, di dawiyê de çûye hecê. Hemû xelk ji rêvebiriya wî dilxweş bûne. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin dozdeh sal bûye ku di ser mîrektiya wî ya Xoşabê de derbas bûye (Şerefname, r.356). Cegerxwîn jiyana Şêr Beg a ehlê sofîtiyê rexne kiriye. Ew, paşde mayina Kurdan bi vê yekê re girê daye. Neyar çûne pêş lê Kurd ji ber mutesewwufî û derwêşiyê paş de mane. Bi heman awayî şêx û axayên roja xwe jî rexne kiriye. Bêseroktî û bêxwedîbûna Kurdan de rola wan a neyinî daye berçavan.

**Tablo 3.2.38.** Begên Mehmûdî

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Şêx Mehmûd, Mîr Huseyîn Begê kurê Şêx Mehmûd, Mîr Hamidê kurê Mîr Huseyîn, Îwaz Begê kurê Mîr Hamîd, Huseyîn Qulî Begê kurê Îwaz Beg, Şah Elî Begê kurê Îwaz Beg, Xalid Begê kurê Şah Elî Beg, Hemze Begê kurê Îwaz Beg, Xan Mihemmedê kurê Şemseddînê kurê Mîr Hamid, Mîr Şemseddînê kurê Xan Mihemmed, Emîre Begê kurê Mîr Hamid, Hesen Begê | Mehmûd<br>Hisên Beg<br>Hamid<br>Ewed Beg<br>Emîre<br>Hesen Beg<br>Şêr Beg |

| | | |
|---|---|---|
| | kurê Îwaz Beg, Îwaz Begê kurê Hesen Beg, Şêr Begê kurê Hesen Beg | |
| Dem | Sedsalên XII-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Merwan, Cezîr, Aşût, Xoşab, Elbak, Şembû, Qarçkan, Coresê, Axçeqele, Makû | Merwan, Cizîr, Xoşab, Aşût, Elbaq, Şinbo |

### 3.2.39. Begên Dinbilî

Li gor riwayetan eslê mîrên Dinbiliyan (Dumbiliyan), digihîje mirovekî bi navê Îsa ji Erebên Bedewî yên Şamê. Li gor riwayeteke din jî ew ji xelkê Cezîra Omer e û piştre koçî Azerbaycanê bûye. Lê riwayeta herî rast a di derheqê Dinbiliyan de xuya ye ku Eşîreta Dinbilî ji wilayeta Boxtan hatine. Di nav Kurdan de bi navê Dinbiliyên Boxtan hatine binavkirin. Di dema Tirkmenên Aqqoyuniyan de yekî bi navê Şêx Ehmed Begê ji zarokên Îsa Beg, gihiştiye rutbe û payeyên bilind. Rêvebiriya kar û barên hikumeta Bayê ketiye destê Eşîreta Dinbilîyan. Piştî mirina Şêx Ehmed, kurê wî Şêx Behlûl hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.357-358). Di *Şerename*yê de bi sernavê "Di Derheqê Begên Dinbiliyan de ye" derbas bûye. Cegerxwîn agahiyên heta vira di menzûmeya xwe de nedaye. Menzûmeya "Beganê Dumbilî" ji şazdeh malikan pêk hatiye û tê de navên neh mîrên vê binemalê derbas bûne.

39/1 Were Hacî binêre kanî Dumbil?
631 Sera û birc û eywan bûne kavil

39/2 Nemane bo me text û bext û ew tac
632 Berê Kurd bûn neha em bûne Kurmanc

Hacî Begê kurê Şêx Behlûl Beg e. Peywendiyek wî ya kevin bi Seraya Şah Tehmasb re hebûye. Şah, Xoy û Sekmenabadê kiriye eyaletek serbixwe û xistiye bin rêvebiriya wî û unwana Hacî Siltan jî dayê. Ev yek bûye sedemê pozbilindî û şanaziya Dinbiliyan. Demek kurt di ser rêvebiriya Hacî Beg de derbas bûye ji ber dijminatiya kevn Dinbilîyan çend caran êrîşî ser Mehmûdiyan kirine. Lê ew nikaribûne zirarek mezin bidin wan. Bi handana Mehmûdiyan Îskender Paşa êrîşek biriye ser Xoyê. Di vê êrîşê de Hacî Beg tevî komek Dinbilî hatiye kuştin. Kurekî temenê wî biçûk li pey Hacî Beg maye (Şerefname, r.358-359). Cegerxwîn wêranbûna Dinbiliyan bi riya pirsê aniye berçavan, desthilatdariya Kurdan ji holê rabûye û hêza wan nemaye. Ew ji bo lewazî û biçûkbûna Kurdan bîne zimên gotina “berê Kurd bûn niha bûne Kurmanc” bi kar aniye.

39/3 Erê Ehmed binêre kanî Ca’fer
633 Qizilbaşan ji me kuştin dilawer

39/4 Li ser me bûne paşa Tirk û ev Rûm
634 Li çolan em dinalin her wekî bûm

Ehmed Begê kurê Behlûl Beg e. Di destpêkê de ji aliyê Dîwana Şah Tehmasb ve hatiye ser rêvebiriya Sekmanabadê. Lê Eşîreta Dinbilîyan di navbera terefdariya Rûm û Qizilbaşan de ketine dudiliyê. Ev rewş Şah Tehmasb aciz kiriye û fermana kuştina wan daye. Şah Tehmasb, Ehmed Beg tevî herdu birayên wî İsmaîl û Ce’fer bi fermandarên Qizilbaş re şandine aliyê Erdehanê. Di heman rojê de hem Ehmed Beg û birayên wî tevî çarsed kesên Eşîreta Dinbilîyan hatine kuştin hem jî Şah, ji wê eşîretê bîst-sî kesên din dane kuştin. Mensûr Begê kurê Mihemmed Beg firset dîtiye û ji Erdehanê çûye Stenbolê (Şerefname,r.359-360). Cegerxwîn bi van malikên li jor bal kişandiye ser ji aliyê Qizilbaşan ve kuştina Ehmed Beg û birayên wî. Piştre aciziya xwe ya ji hikumdariya Tirkan a li ser Kurdan daye berçav. Kurd ji ber Tirkan perîşan bûne û li çolan wek bûman dinalin.

39/5 Were Mensûr binêre kanî Barkêr
635 Hemî wêran û jar in mane bêkêr

39/6 Berî me hûn çiman tev de nebûn yek
636 Li ber destê neyaran jar û bê çek

Mensûr Begê kurê Mihemmed Begê kurê Behlûl Beg e. Mensûr Beg dema mîr û mezinên Dinbiliyan ji aliyê Şah Tehmasb ve li Erdehanê hatine kuştin firset dîtiye û ji Erdehanê çûye Stenbolê. Siltan jê re ji welatî Osmanî nahiya Kotor Deresî (Geliyê Kotorê) û nahiya Bergêriyê wek senceq dayê. Ew kesên ji Eşîreta Dinbilî sax mane li derûdora wî berhev bûne. Wî jî di temamê jiyana xwe de desthilatdariya hikumetên li wan deran kiriye. Du zarokên kur li pey xwe hiştine û wefat kiriye (Şerefname, r.360). Ji ber Mensûr Beg rêvebiriya Bergêriyê (Barkêriyê) kiriye Cegerxwîn Bergêriyê ji wî pirsiye. Piştre jî bersiv daye ku bi vî awayî wêranbûna wê li ber çavan raxistiye. Cegerxwîn ji ber bêtifaqiya mîrên Kurd gazin kirine. Wan wek sedemê jar û perîşaniya Kurdan a dema xwe dîtiye. Ji risteyên wî tê derxistin ku heke mîrên Kurd li nirxên xwe xwedî derketana îro wê xelkê wan li ber destê neyaran jar û bê parastin, bê çek nemana.

39/7 Welî Beg hûn egîd û şêr û merd in
637 Di ber destê neyaran tev de nerd in

39/8 Bi kuştin geh bi talan geh bi lêdan
638 Ji xwîna we bi carek sor e meydan

Welî Begê kurê Mensûr Beg e. Piştî mirina bavê xwe li cihê wî rûniştiye. Welî Beg, kesekî hêja û bi qabîliyet bûye. Di mêr, mêrxasî û camêriyê de kesek bi emsalên wî tune bûne. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin, nahiya Geliyê Kotorê û nahiya Ebqayê (Ebexe) wek ocax di destê wî de bûye (1005ê k./1597ê z.). Cegerxwîn di van malikên li jor de gotiye ku “hûn egîd û şêr û merd in” ango pesnê Welî Beg tenê nedaye, temamê mîrên Kurd bi egîd û şêr û merdî wesifandiye. Herçiqas mêr û mêrxas bin jî li ber destê neyaran mane. Çimkî welatê wan bi darê zorê ji destê wan hatiye girtin.

39/9 Erê Hacî ji hev re em çi şêr in
639 Li bin destê neyaran qelsemêr in

39/10 Li çolan em dibazin şêr û kovî
640 Li ser me bûne paşa hirç û rovî

Hacî Begê kurê Hacî Beg, dema bavê wî hatiye kuştin hê du mehî bûye. Li gor urf û edetên Kurdan navê bavê wî dane wî. Şah Tehmasb ew kiriye nav parêzgerên xwe yên taybet. Di dema hedîseya şehzadeyê Osmanî Beyazid de, Şah ew wek beg tayinî nahiya Ebqayê kiriye. Hacî Beg bîst salan li ser rêvebiriya hikumetê maye. Wextê Serdar Mistefa Paşa ber bi Çemê Qanhê ve çûye grûbek leşkerên Qizilbaş êrîşî ser baregeha leşkerên Îslamê kirine. Di vê êrîşê de Hacî Beg û hinek fermandarên Qizilbaşan di çem de xeniqîne (Şerefname, r.361). Cegerxwîn bi van malikên ku ji bo Hacî Beg nivîsandine de gotiye ku; Kurd her tim li hemberî hevudu radibin û serî li ber hev natewînin. Ji hev rewek şêran bêtirs in; lê di bin destê neyaran de situyê xwe xwar dikin û desthilatdariya wan qebûl dikin. Erê Kurd mêr û mêrxas in şêr in, lê bindestê hirç û rovî ne. Ango Qizilbaş û Tirk li ser wan bi darê zorê û bi fen û fûtan bûne desthilatdar.

39/11 Elî Beg rabe ser xwe ey tu sultan
641 Binêre ka sera û birc û eywan

39/12 Hemî kavil li çolan em dimînin
642 Qirak û kund li ser wana dixwînin

Siltan Elî Begê kurê Cimşîd Begê kurê Behlûl Beg e. Dema ku Şah Tehmasb fermana kuştina Eşîreta Dinbilî daye, Siltan Elî Beg li Eyaleta Îsfehanê bi berhevkirina perên dewletê wezîfedar bûye. Li ser xebera qetlîama Eşîreta Dinbilî, peren berhev kiriye jî girtiye bal xwe û ber bi Wanê ve hatiye. Li wir demekê di nav Eşîreta Dinbilî de xwe veşartiye. Piştre Şah Tehmasb ji bo Eşîreta Dinbilî efû derxistiye. Li ser vê, Siltan Elî Beg tevî 100 tumen perên ji bo dewletê berhev

kiribûn jî girtiye cem xwe û çûye Seraya Îranê. Wî ji nû ve îta’eta xwe ji Şah re pêşkêş kiriye. Şah jî wek berê wî girtiye nav zabitên rutbe bilind. Dema xebera mirina Hacî Beg gihîştiye Şah Siltan Mihemmed, Şah Mîrektiya Dinbilî daye destê Siltan Elî Beg. Nahiya Suleymanserayê û nîvê Ebqayê jî xistiye bin rêvebiriya wî. Siltan Elî Beg, demek kurt li ser rêvebiriya mîrektiyê maye. Serdema wî ji ber şer û qirênên berê di nav tengasiyê de derbas bûye. Vê rewşê heta çûye rehma Xwedê jî dewam kiriye. Sê kur li pey xwe hiştine û wefat kiriye (Şerefname, r.361). Di malikên Cegerxwîn de li ser serdema Siltan Elî Beg, tu agahî nehatine dayin. Cegerxwîn ji bo ji destderketina desthilatdariyê û wêranbûna welat bangî Siltan Elî Beg kiriye. Kurd li ber desta ne, qirak û kund li ser wan dixwînin ku qirak û kund dijminê bûne desthilatdar temsîl kirine.

39/13 Nezer Beg rabe ser xwe ev çi wext e
643 Binêre ka direfş û tac û text e

39/14 Xwezî ku we berî me hev nekuşta
644 Welatê xwe ji dijmin re nehişta

Nezer Begê kurê Sultan Elî ye. Piştî mirina bavê xwe ji aliyê Şah Siltan Mihemmedê hikumdarê Îranê ve hatiye ser desthilatdariya Dinbiliyan. Wê rewşê heta ku Osmaniyan Êrîwan stendiye dewam kiriye. Piştre Nezer Beg, bi hinek fermandarên eşîretên din re çûye Erzirûmê cem Serdar Ferhad Paşa. Ew îta’eta xwe ji Dewleta Osmanî re pêşkêş kirine. Dewleta Osmanî jî li ser esasê berê herêma Çaldiran, Suleymanseray û Sekmenabadê dane destê Nezer Beg û birayê wî Qiliç Beg. Bi stendina van cihan dijminahiya navbera wan û eşîreta Mehmûdî ji nû ve dest pê kiriye. Di neticeya şerê di navbera herdu eşîretan de Nezer Beg, birayê wî Huseyîn Beg û heştê kes ji Dinbiliyan hatine kuştin (Şerefname, r.362). Cegerxwîn sedema bêdewletbûn û bêxwedîbûna Kurdan bi şerê navxweyî ya di nav eşîretên Kurdan ve girê daye. Heke Kurd bibûna yek û hevudu nekuştana niha welatê wan di bin destê dijminan de nedima.

39/15 Qiliç Beg rabe ser xwe wer binêre
645 Li deng û ah û zaran guh bidêre

39/16 Ji bin axê serê xwe zû bi derxe
646 Ne em digrîn li ser we lê li ser xwe

Qiliç Begê kurê Sultan Elî ye. Piştî kuştina birayê xwe bi mîr û giregirên Eşîreta Dinbilî re ji bo vekolîna vê bûyerê çûne Erzirûmê cem Serdar Ferhad Paşa. Li ser vê serdar, giregirên Eşîreta Mehmûdî yên bûne sedemê fitne û fesadiyê li meclîsê berhev kirine. Di netîceya vekolînê de hatiye dîtin ku sedemê nakokiya di navbera herdu eşîretan de fermanên ji aliyê serdar ve hatine derxistin bûne. Li ser vê Serdar Ferhad Paşa hewl daye ku wan li hev bîne. Eşîreta Dinbilî mecbûr maye aşitiyê qebûl bike û vegere cihê xwe yê berê (Şerefname, r.362-363). Cegerxwîn di van malikên dawî de bangî Qiliç Beg kiriye. Wî xwestiye rabe ser xwe û binêre ku Kurd di çi halî de ne. Xemgînî, qîrîn û hawar ji bo îro ye, ne ji bo serdemên kevin ên derbasbûyî ye. Di vir de dilşikestin, hêrs û kerba ji mîrên Kurdan tê dîtin. Mîrên Kurd, desthilatdariya xwe neparastine û ketine bin destê dijmin.

**Tablo 3.2.39.** Begên Dinbilî

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Îsa Beg, Ehmed Begê kurê Îsa Beg, Şêx Behlûl, Hacî Begê kurê Behlûl Beg, Ehmed Begê kurê Behlûl Beg, Mensûr Begê kurê Mihemmed Begê kurê Behlûl Beg, Welî Begê kurê Mensûr Beg, Hacî Begê kurê Hacî Beg, Siltan Elî Begê kurê Cimşîd Begê kurê Behlûl Beg, Nezer Begê kurê Sultan Elî, Qiliç Begê kurê Sultan Elî | Hacî<br>Ehmed<br>Ca’fer<br>Mensûr<br>Welî Beg<br>Hacî<br>Elî Beg<br>Nezer Beg<br>Qiliç Beg |

| | | |
|---|---|---|
| Dem | Sedsalên XV-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Bayê, Xoyê, Sekmenabad, Nahiyên Geliyê Kotorê, Bergêrî, Ebqayê, Uçoqê û Suleymanserayê, Çaldiran | Dumbil, Barkêr (Bergêrî) |

### 3.2.40. Begên Kelhurê[327] - Begên Pilingan

Di *Şerefname*yê de mîrên Kelhurê (Kelher) wek sê şaxan cih girtine. Piştî agahiyên di derheqê nesla wan de şaxa yekem li ser begên Pilingan e. Di şaxa duyem de begên Derteng û ya sêyem de begên Mahîdeştê cih girtine. Cegerxwîn jî menzûmeyên xwe yên li ser vê binemalê wek "Beganê Kelher û Pilingan", "Beganê Kelher û Derteng" diyar kirine; lê menzûmeya di derheqê Mahîdeştê tenê bi sernavê "Beganê Mahîdeşt" nivîsandiye. Menzûmeya Beganê Kelher û Pilngan ji şeş malikan, menzûmeya Beganê Kelher û Derteng ji şeş malikan û menzûmeya Beganê Mahîdeşt ji du malikan pêk hatiye.

Nesla mîrên Kelhurê digihîje Guhderzê kurê Keyo. Keyo di dema Qralên Keyaniyan de waliyê bajarê Babîlê[328] bûye. Kurekî Keyo yê bi navê Ruham hebûye. Ruham bûye fermandarekî mezin û ji aliyê Qralê Keyanî Behmen ve ji bo sefera ser Şam Quds û Misrê hatiye wezîfedarkirin. Wî jî ew der stendiye û wêran kiriye. Piştre bûye mîrê seranserê welat. Li pey wî zarok û neviyên wî li ser wê axê hikum kirine ku yên ji nesla wî re Goran hatiye gotin (Şerefname, r.365).

40/1 Tu Xeybullahî ey mîrê Pilingan
647 Egîd û pehlewan î wek pilingan

40/2 Riham kanî li ku ye kanî Guhderz?
648 Keyo kanî li ku ye kanî Nûdez?

[327] Di *Şerefname*yê de begên Kelhurê di qismê duduyan a sefheya sisiyan de wek beşa dehan cih girtiye. Piştî beşa şeşan a di derheqê begên Dinbiliyan de Şerefxan derbasî agahiyên di derheqê begên Kelhurê bûye. Di vê navberê de beşa heftan a li ser Begên Zerzayê, beşa heştan a li ser Begên Istunê, beşa nehan a li ser Begên Dasnî tenê bi sernav nivîsiye û derbas bûye (r.364).
[328] Bajarê Babîlê piştre bi navê Kufeyê hatiye nasîn.

Ji begên Pilingan çar hikumdar bi nav û deng bûne ku yê yekem Xeybullah Beg e. Ew, kesekî dîndar û sofî bûye. Xeybullah Beg, di destpêkê de ji Şah Îsmaîl re îta'et kiriye. Piştî mirina wî kurê wî li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.366). Cegerxwîn, Xeybulah Beg tevî bav û bapîrên wî Keyo û herdu kurên Keyo Riham û Guhderz destnîşan kiriye. Nûdez jî herêmekî di bin desthilatdariya Pilingan de bûye. Xeybullah mîrê yekem ê Pilingan bûye û bi cesaret wek pilingan bêtirs û bihêz bûye. Cegerxwîn bi hunera cînasê di navbera mîrê Pilingan û wek ajal, pilingên temsîla wêrekî û bêtirsiyê de peywendî daniye.Wek ku tê dîtin; li gor riwayetan koka vê binemalê digihîje lehengên efsaneyî û mîtolojîk ên Îranê.

40/3 Muhemmed kanî Dizman ka Kuwahkûr?
649 Li ku maye Kelane kanî ew Mûr?

40/4 Merawîd ka li ku ye ka Dêwedez?
650 Nişûr kanî bi carek tev de bûne berz

Mihemmed (Muhemmed) Begê kurê Xeybullah Beg e. Li cihê bavê xwe hatiye ser rêvebiriyê. Ji aliyê Dîwana Şah Tehmasb ve wilayeta bav û bapîrên wî jê re hatiye dayin. Ew kesekî bi fezîlet û dadmend bûye. Li Pilingan medreseyek û mizgeftek daye çêkirin. Mihemmed Beg bi xwişka Şah Tehmasb re zewiciye[329] û ketiye xizmeta wî. Çar zarokên wî yên kur hebûne û mîrektiya xwe di saxiya xwe de di navbera herçar kurên xwe de parve kiriye. Kurê xwe Mîr Îskender jî kiriye cînişînê xwe (Şerefname, r.366). Cegerxwîn bi bangkirina Mihemmed Beg daye xuyakirin ku cihên di bin rêvebiriya Pilingan de bûne niha ji dest derketine.

40/5 Çiman îro tu deynakî Sikender
651 Di nav Kurdan nemane mîr û rêber

40/6 Ne em qenc in di îro ne hûn baş
652 Gelek jar in di nav Tirk û Qizilbaş

[329] Li gor wergera Ziya Avci (r.366), Mihemmed Beg bi xwişka Şah Tehmasb re zewiciye. Di wergera İbrahim Sunkur (r.359) û Abdullah Yegin (r.352) de Mihemmed Beg keça xwe bi Şah Tehmasb re zewicandiye. Ew, bi vî awayî peywendiya merivatiyê pê re daniye.

Emîr Îskenderê (Sikenderê) kurê Mihemmed Beg e. Piştî mirina bavê xwe çûye Qezwînê û ketiye bin xizmeta Şah Tehmasb. Di dema Şah Îsmaîl de jî di bin xizmeta Şah Îsmaîl de maye û rêvebiriya kar û barên hikumeta Pilingan meşandiye. Bîst sal piştî rêvebiriya welat, wefat kiriye. Piştî mirina wî Tekelûyê waliyê Dînewerê ku ji aliyê Şah Îsmaîl ve hatiye tayinkirin, êrîşî ser Kela Pilingan kiriye û kela bi dest xistiye. Huseyîn Begê birayê Emîr Îskender ji mîrêmîranê Şehrezorê alîkarî xwestiye. Leşkerên Şehrezorê kela ji destê mirovên Tekelû stendine.[330] Lê ji ber ku warîsên vî welatî tune bûne, Dîwana Alî Osman, rêvebiriya wê wek senceq daye destê biyaniyan (Şerefname, r.366-367). Cegerxwîn bi nêrîneke satirîk ev malik saz kirine. Hem tunebûna mîr û rêberên Kurdan, hem jî tevgerên mîrên Kurdan ên di bin destê Tirk û Qizilbaşan de rexne kirine. Lê tenê yê bêkêr ne rêvebirê ketine nav helqeya navbera Tirk û Qizilbaşan in. Niha jî Kurd bi heman awayî bêkêr û bindest in.

**Tablo 3.2.40.** Begên Kelhurê- Begên Pilingan

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Xeybullah Beg, Mihemmed Begê kurê Xeybullah Beg, Emîr Îskenderê kurê Mihemmed Beg | Xeybullah<br>Muhemmed<br>Sikender |
| Dem | (Ji nesla Guhderzê kurê Keyo ne-b.z. sedsala III.)<br>Sedsala XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Pilingan, Dêwdiz, Nûdiz, Dizman,Kiwahê Kûr,Mûr, Kelane,Nişûr, Merawîdîmen | Pilingan,Nûdez,Dizman, Kuwahkûr,Kelane,Mûr,Merawîd, Dêwedez, Nîşûr |

[330] Di wergera İbrahim Sunkur de hatiye gotin ku; dema Kela Pilingan ji destê Tekelûyan hatiye stendin, ji warîsên keleyê du kesan wek rêvebir nîşan dane. Pilingan niha di statuya senceqê de ji aliyê Dîwana Osmanî ji biyaniyan re hatiye dayin (r.360).

### 3.2.41. Begên Dertengê[331]

41/1 Were Serxab binêre kanê Derteng?
653 Çi Helwan e çi Derteng mane bêreng

41/2 Ne Alanî ne Zermangî ne Zencîr
654 Dîwan kanî Rewanser mane bê mîr

Sohrab (Serxab) Beg, bi mêr û mêrxasiya xwe bi nav û deng bûye. Pawe, Baske, Alanî, Qel'ayê Zincîr, Riwanser, Diwan û Zirmanekî di bin desthilatdariya wî de bûne. Dema Sohrab çûye rehma Xwedê kurê wî li cihê wî rûniştiye (Şerefname, r.368). Cegerxwîn Sohrab bi cihên di bin desthilatdariya wî de bi bîr aniye. Wî bal kişandiye ku van cihan îro ji bin rêvebiriya Kurdan derketine.

41/3 Umer Beg rabe ser xwe kanî Bawe
655 Erê Baske li ku ye hîç nemawe

41/4 Li ku mane kelat û şehr û bajar
656 Di bin destê neyaran tev de bûn jar

Omer (Umer) Begê kurê Sohrab Beg e. Piştî mirina bavê xwe li cihê wî rûniştiye. Salên di destpêka desthilatdariya xwe de xwînrij û zordar bûye. Piştre hatiye ser riya rast, kar û barên qenc û bi kêrhatî kirine. Dema Siltan Silêman Xan, hatiye Bexdayê fetih kiriye Omer Beg îta'eta xwe pêşkêşî wî kiriye. Wê rewşê heta wefata wî berdewam kiriye (Şerefname, r.368). Cegerxwîn bi bangkirina Omer Beg, cihên di bin desthilatdariya wan de bûne lê îro di bin destê neyaran de jar û perîşan in carek din bi bîr aniye.

41/5 Qubad Beg rabe ser xwe ey cihangîr
657 Ji bo Kurda belê zanim tu xweş mîr

[331]Wilayeta Dertengê (Deretengê), di demên berê de bi navê Hilwanê hatiye naskirin (r.368).

41/6 Ji Bexdayê tu bigre ta bi Deynûr
658 Li te pîroz e ew tac rengê Şapûr

Qubad Begê kurê Omer Beg e. Piştî mirina bavê xwe li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Mirovekî merd û mêrxas bûye. Wî rêvebiriya xwe bi awayekî serbixwe, bi zîrekî û hunermendî meşandiye. Ji sînorên Dînewerê heta Bexdayê di bin desthilatdariya wî de bûne (Şerefname, r.369). Lewma Cegerxwîn xwestiye ku bi heman awayî ji Bexdayê heta Deynûrê (Dînewerê) bikeve bin destê Kurdan. Çimkî bav û bapîrên Kurdan desthilatdariya van cihan kirine.

**Tablo 3.2.41.** Begên Dertengê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Sohrab Beg, Omer Begê kurê Sohrab Beg, Qubad Begê kurê Omer Beg | Serxab<br>Umer Beg<br>Qubad Beg |
| Dem | (Ji nesla Guhderzê kurê Keyo ne-b.z. sedsala III.)<br>Sedsala XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Derteng/Hîlwan, Pawe, Baske, Alanî, Qel'ayê Zincîr, Riwanser, Diwan(Dodman-A.Y.), Zirmanekî | Derteng/Helwan,Alanî, Zermangî, Zencîr Dîwan, Rewanser, Bawe, Baske |

### 3.2.42. Begên Mahîdeştê

Zanyariyên di derheqê Mahîdeştê de kêm bûne. Tîlawer û eşîret û qebilêyên wan koçer bûne. Rêvebiriya kar û barên wan di navbera herdu birayên bi navên Şehbaz û Mensûr de bi şirîkatî hatiye meşandin (Şerefname, r.370).

42/1 Were Mensûr binêre kanî Şehbaz?
659 Li Kurmanca biqûr e deng û awaz

42/2 Te Şehbazê xwe kuşt û kanî Elqas?
660 Belê em jî wekî we mane pêxwas

Di sala 1002yê k./1594ê z. de Mensûr êrîşî ser Şehbaz kiriye û ew kuştiye. Serokatiya hemû eşîret û qebileyan girtiye dest xwe. Mensûr bi gelemperî bi memûrên Dewleta Osmanî û bi taybetî bi mîrêmîranê Bexdayê re peywendiyên baş danine. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin jî Mensûr bi awayekî serbixwe li ser kar û barên mîrektiyê bûye. Ji Şehbaz kurekî bi navê Elqas maye ku ew carinan bi apê xwe re ketiye nav şer (Şerefname, r.370). Cegerxwîn ji bo aciziya xwe ya ji şerê îqtidarê bîne zimên ji Mensûr birayê wî Şehbaz pirsiye û bi gotina “te Şehbazê xwe kuşt”, nebaşiya dijayetiya navxweyî daye. Bi heman awayî şerê di navbera Mensûr û biraziyê wî Elqas diyar kiriye. Çiqas ew rewşa han xerab û perîşanî bûye, niha jî Kurd pêxwas û lewaz in. Peywendî di navbera herdu serdeman de hatiye danîn ku sedema rewşa niha bêtifaqiyên berê hatiye dîtin.

**Tablo 3.2.42.** Begên Mahîdeştê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Şehbaz<br>Mensûr<br>Elqas | Mensûr<br>Şehbaz<br>Elqas |
| Dem | (Ji nesla Guhderzê kurê Keyo ne-b.z. sedsala III.)<br>Sedsala XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Mahîdeşt | Mahîdeşt |

### 3.2.43. Begên Banê

Li gor riwayetan Banê, navê wilayeta wan mîrên mensûbê eşîretên wî bajarî bûne. Di eslê xwe de wilayet ji Keleyên Bîrozê, Şîwe û ji nahiya Banê pêk hatiye. Begên Banê bi nasnavê "ixtiyareddîn" hatine naskirin. Biqasî ku tê zanîn ji ber Misilmantiyê bêyî darê zorê qebûl kirine ev nasnav girtine (Şerefname, r.371). Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Begên Baneyê de ye" cih girtiye. Menzûmeya "Beganê Banê" ji heşt malikan pêk hatiye û tê de navê çar begên vê mîrektiyê derbas bûne.

43/1 Erê Mîrza binêre kanî Pîroz?
661 Di bin destê neyaran maye bê doz

43/2 Belê Şêwe li ku ye kanî Bane?
662 Hemî wêran û kavil tev de mane

Mîrza Begê kurê Mîr Mihemmed, bi qasî tê zanîn mîrê yekem ê vê malbatê ye. Demekê li ser textê mîrektiyê maye. Ew bi xwişka Beyke Begê Mîrê Erdelanê re zewiciye. Li ser vê azadî û serbixwetî bi dest xistiye û nav û dengê wî belav bûye. Lê ji ber zewaca bi xwişka Beyke Beg re navbera wî û Elî Begê Xalîcî xera bûye. Elî Beg xwestiye ku ji dêvla wî birayê xwe bike waliyê Baneyê. Li ser vê Mîrza Beg ji Beyke Beg alîkarî xwestiye. Ew rewş heta roja mirina Mîrza Beg bi vî awayî maye. Dema ew çûye rehma Xwedê pênc kur li pey xwe hiştine (Şerefname, r.371-372). Cegerxwîn ji Mîrza Beg pirsiye ku kanî Pîroz, Şêwe û Baneya welatê wan. Niha cih û warên di bin destê mîrên Kurdan de ketiye destê neyaran, lewma wêran û kavil in.

43/3 Erê Bodaq tu bigre şûrê Lahor
663 Li ser te bûne paşa herdu Axor

43/4 Ji bo te bû ye pîroz xakî Qezwîn
664 Belê zanim tu jî wek min Cegerxwîn

Budak (Bodaq) Begê kurê Mîrza Beg e. Piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Wî bê şer û qirên demekê welat bi rê ve biriye. Piştî çend salan herdu birayên wî yên ji dayikek din, pê re ketine nav şer û qirênan û ew ji wilayetê dûr xistine. Li ser vê, Budak Beg bi daxwaza alîkariyê çûye cem Şah Tehmasb. Li Qezwînê çûye rehma Xwedê (Şerefname, r.372). Di van malikên li jor de hestyariya Cegerxwîn a ji bo rewşa Budak Beg tê dîtin. Êrîşa herdu birayên wî bi risteya “Li ser te bûne paşa herdu Axor”aniye zimên. Mihtemel e ku ji ber navê birayên wî Mîr Mihemmed û Uxurlu (Axor) bûye ew wek “herdu Axor”bi nav kirine. Cegerxwîn ji ber Budak Beg ji zilm û zora birayê xwe ji welatê xwe derketiye û li Qezwînê wefat kiriye, axa Qezwînê pîroz dîtiye. Wî peywendî bi jiyana xwe re daniye. Çimkî Cegerxwîn jî ji ber zilm û zorê ji axa welat dûr ketiye.

43/5 Erê dîsa tu rabe ey Sulêman
665 Welatê te bi carek bûye wêran

43/6 Ne ew bircên belek mane ne eywan
666 Bi carek bê xwedî ne ew keloxan

Silêman (Sulêman) Begê kurê Mîrza Beg e. Piştî mirina birayê xwe ji aliyê Dîwana Şah Tehmasb ve hatiye ser kar û barên mîrektiyê û bîst salan rêvebirî kiriye. Piştre dev ji fermantî û karên mîrektiyê berdaye. Wî rêvebirî xistiye destê Bedir Begê biraziyê xwe yê zavê wî bûye. Silêman Beg xwe spartiye îbadetê û du caran çûye hecê. Cara duduyan wî biryar daye ku li Medîneyê bimîne (Şerefname, r.372). Malikên li jor di derheqê serdema Silêman Beg zêdetir, li ser pirsgirêkên roja Cegerxwîn hatine sazkirin. Cegerxwîn ji ber Silêman Beg, dev ji rêvebiriyê berdaye û kar û barên mîrektiyê xistine destê biraziyê xwe. Cegerxwîn bangî wî kiriye ku “dîsa rabe” û were ser desthilatdariyê.

43/7 Hemî dîl in bi carek rût û tazî
667 Ne Lor mane ne Gor mane ne nazî

43/8 Bedir Beg wer binêre em çi jar in

668 Belengaz in li ber destê neyar in

Di *Şerefname*yê de di derheqê Bedir Beg de tenê tê zanîn ku; Bedir Beg hem birazî hem jî zavayê Silêman Beg e, ji dêvla apê xwe bûye rêvebirê kar û barên Mîrektiya Baneyê (Şerefname, 372). Cegerxwîn hem di malikên li ser Silêman Beg hem jî yên li ser Bedir Beg de behsa ji destderketin û wêranbûna axa welat kiriye.

**Tablo 3.2.43.**Begên Banê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Mîrza Begê kurê Mîr Mihemmed, Budaq Begê kurê Mîrza Beg, Suleyman Begê kurê Mîrza Beg, Bedir Beg | Mîrza<br>Bodaq<br>Suleyman<br>Bedir Beg |
| Dem | Sedsalên ?-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Keleyên Bîrozê û Şîwe, Nahiya Bane, Qezwîn | Pîroz, Bane, Şêwe, Qezwîn |

## 3.2.44. Begên Pazûkî

Di *Şerefname*yê de qismê duduyan ê sefheya sisiyan ji diwanzdeh beşan pêk hatiye. Beşa diwanzdehan li ser begên Gulbaxî[332] ne. Piştre qismê sisiyan ê sefheya sisiyan hatiye ku di vir de agahiyên di derheqên begên Îranê de hene û ev qisim di nav xwe de bûye çar şax. Ev şax li ser begên Siyamensûr, Çegnî, Zengîne û Pazûkî de ne. Cegerxwîn ji van began tenê behsa begên Pazûkî kiriye.[333]Di *Şerefname*yê de bi sernavê "Di Derheqê Begên Pazûkî de ye" derbas bûye.

Li gor hin riwayetan serdarên Pazûkî ji Eşîreta Swêdî ne. Hinek riwayetên din wan ji Kurdên Îranê hesibandine. Ew di dema Tirkmen û siltanên Qizilbaş de di bin

[332] Ev beş di nusxeya wergera Abdullah Yegin de tune ye.

[333] Wek ku Dilawerê Zengî ji Muhemmed Elî Ewnî Beg neql kiriye agahiyên di derheqê begên Gulbaxî û yên ji Îranê Siyamensûr, Çegnî û Zengîne di çapa Rûsî de tune ye; lê di çapa Qahîreyê ya bi zimanê Erebî de hebûye. İbrahim Sunkur jî li ser begên Gulbaxî di jêrenotê de gotiye ku; ev beş di paş nusxeya Rûsî de li gor nusxeyên naverokê wan hatine guherine cih girtiye. Beşa Gulbaxî ne di nav kitêbe de ye lê ji bo jê sûd bê girtin ew vê beşê jî dane (r.365).

serweriya hikumetên Kîxî, Ercîş, Adilcewaz, Eleşkerdê de bûne. Eşîreta Pazûkî xwediyê gelek heywanan bûye. Ji aliyê din ve mezhebekî wan ê kifş tunebûye.[334] Cegerxwîn, menzûmeya xwe ya "Beganê Pazokî" ji hîjdeh malikan saz kiriye û tê de behsa neh rêvebirên Pazûkî kiriye.

44/1 Hisên Beg rabe ser xwe ey ciwanmêr
669 Serifraz û egîd û ejder û şêr

44/2 Werin ser lawê Cengiz hûn bi êrîş
670 Ji destê wan derînin Kîf û Erdîş

Huseyîn (Hisên) Elî Beg[335], bi qasî tê zanîn di nav Pazûkiyan de yekem kesê bûye mîr e. Du zarokên wî hebûne (Şerefname, r.385). Bi lewazbûna Selçûkiyên Anatoliyê Moxol (lawê Cengiz) Anatolî dagir kirine. Di serdema Moxolan de herêmên Kurdan jî bi tevahî ketine bin destê wan. Lê li van herêman li hemberî rêvebiriya Moxolan bê aramî hebûye û serhildan qut nebûne. Ji ber axa welat ketiye bin destê dijminan, Cegerxwîn bangî Hisên Beg kiriye ku were welatê xwe rizgar bike.

44/3 Were ey Şahsiwar Beg ka Elişkurd
671 Di bin destê neyaran mane xweş kord

44/4 Binêre ev Xinûş û Elcewaz in
672 Kurê Guhderz bi carek lê dibazin

Şahsiwar Begê kurê Huseyîn Elî Beg e.piştî hilweşîna Dewleta Aqqoyuniyan çûye Bedlîsê û li cem Mîr Şeref bicî bûye. Kurê wî Xalid Beg jî xwe bi xizmeta Şah

[334] Di wergera Ziya Avci (r.385) de ev îfade derbas bûye: "Ri'ayeta fermanên dînî kirine, daîma xwediyê pêşniyarên qencî û başiyê bûne". Di wergerên Abdullah Yegin (r.362) û İbrahim Sunkur (r.375)de hatiye gotin ku: "Ji emr û qedexeyên Xwedê re eleqe nîşan nedane."

[335] Di wergera İbrahim Sunkur de ji bo Huseyîn Elî Beg hatiye gotin ku begê yekem Xalid Beglû ye. Di nav xelkê de wek Huseyîn Beg hatiye naskirin (r.375). Di heman demê de hem di wergera İbrahim Sunkur (r.375) de hem jî di wergera Abdullah Yegin (r.362) de mîrên Pazûkî bûne du grûp. Li gor di wergera Abdullah Yegin de hatiye diyarkirin ev herdu grûp Xalidbeglî û Şekerbeglî ne.

Îsmaîlê Sefewî serfiraz kiriye (Şerefname, r.385). Cegerxwîn bindestiya Kurdan û windakirina Eleşkêrd (Elişkurd), Xinîs (Xinûş) û Adilcewazê (Elcewazê) destnîşan kirine. Wî ji bêdengbûna hemberî dijmin, gazin kirine.  Kurdan wek kurê Guhderz ango ji nesla Ariyan bi bîr anîne.

44/5 Were Xalid xwedanê cengê zêrîn
673 Binêre em bi carek bûn Cegerxwîn

44/6 Hemî jar û belengaz û perîşan
674 Ji bo tîrên neyaran bûne nîşan

Xalid Begê kurê Şahsiwar Beg e, ji Şah Îsmaîl re îta'et kiriye. Ji ber di şerekî de destê wî jêbûye lê heta dawiya şer wek tiştek nebûbe bi mêrxasî şer kiriye gelek teqdîra Şah Îsmaîl qezenc kiriye. Lewma Şah, di şûna destê wî yê jêkirî de destek ji zêrê safî daye çêkirin. Ji wê rojê şûn de navê wî bûye Xalidê Çolax. Şah, ji bo wî û birayên wî nahiya Uçkarmûşê jî xistiye ser herêmên Xinis û Melazk(g)irdê. Ev cih, wek mîrektî û bi riya îkta daye destê wan. Xalid Beg, ketiye nav pozbilindî û çavsoriyê. Wî di neticeyê de neh begên Kurd û Tirkmen ên hatine dîtina wî di rojekê de kuştine. Wî serbixwetiya xwe îlan kiriye. Li ser navê xwe sikke lêdaye û xutbe daye xwendin. Piştre îta'êta xwe ji Siltan Selîm Xan re pêşkêş kiriye. Lê kerba siltan kişandiye ser xwe, siltan dema ku ji Şerê Çaldiranê wegeriyaye fermana kuştina wî derxistiye. Du zarokên kur li pey wî mane (Şerefname, r.385-386). Cegerxwîn, Xalid Beg bi destê wî yê zêr ê ji aliyê Şah Îsmaîl ve jê re hatiye çêkirin bi bîr aniye. Cegerxwîn xemgîniya xwe ya ji perîşanî, belengazî û bindestiya Kurdan di van malikên jor de rêz kiriye.

44/7 Uweys Beg rabe ser xwe ey serifraz
675 Binêre em dinalin deng û awaz

44/8 Seraser em bi carek bê xwedan in
676 Li ber destê neyaran dergevan in

Ûweys (Uweys) Begê kurê Xalid Beg e. Piştî kuştina bavê xwe çûye Seraya Şah Tehmasb û terefdariya wî kiriye. Li ser vê, Şah Tehmasb, mîrektiya Adicewazê daye destê wî. Piştî sê salan di ser rêvebiriya wî de derbas bûne, di navbera wî û Mûsa Siltan ê waliyê Tebrîzê de şer û dijminatiyek mezin dest pê kiriye. Li ser vê, Ûweys Beg çûye Welatê Rûmê û li bajarê Kîxiyê bicî bûye. Siltan Silêman Xan, li ser vê agahiyê ferman daye Dawudê Durzî ku Ûweys Beg û derûdora wî bikuje û serê wan bişîne. Dawudê Durzî li gor fermana hatiye dayin ji xeynî herdu kurên Ûweys Beg ên bi navê Qiliç Beg û Zulfîqar Beg ku di salên xwe yên zaroktiyê de bûne; Ûweys Beg, birayê wî Weled Beg, herdu kurên wî Xalid Beg û Elwend Beg hatine kuştin. Ew herdu kurên wî yên temenên wan biçûk xwe avêtine cem Ehmed Begê Zirkanî yê fermanrewayê Etaqê. Ehmed Beg, ew girtine bin parêzgeriya xwe. Ehmed Beg, rewşa wan bi daxwaznameyekê pêşkêşî Siltan Silêman Xan kiriye. Siltan li ser vê, kar û barên rêvebiriyê ji wan re derxistiye. Dema ku mezin bûne bi pismamê xwe re berê xwe dane Seraya Şah Tehmasb (Şerefname, r.386). Aciziya Cegerxwîn a ji rewşa Ûweys (Uweys) Beg û kurên wî di risteyên jor de tê hîskirin. Lê rasterast li ser serdema Ûweys Beg nesekiniye. Wî bindestî û hêsîriya roja xwe diyar kiriye. Gelê xwe li ber destê neyaran wek dergevan rê daye ku ew bêxwedî ne, bê hikumdar û xemgîn in.

44/9 Qiliç Beg rabe ser xwe ev çi roj e
677 Bi şûrê xwe dilê dijmin bisoje

44/10 Serifraz rabe ser xwe ey tu mîro
678 Ji wan tola me bistîne di îro

Qiliç Begê kurê Ûweys Beg e. Dema ku Qiliç Beg gihîştiye Seraya Şah Tehmasb, jê re wezîfeya hikumeta herêma Zekemê û mîrektiya Eşîreta Pazûkî hatiye dayin. Piştî neh sal di ser re derbas bûne, wefat kiriye. Kurekî temenê wî biçûk li pey xwe hiştine (Şerefname, r.387). Cegerxwîn bi awayekî sembolîk bangî Qiliç Beg kiriye ku were bi dijmin re bikeve nav şer û cengê. Dijmin ne dijminê serdema Qiliç Beg e; dijmin, dijminê îro ye. Ji bo tolhildanê pêwîstî bi serok û rêberên Kurdan re heye.

44/11 Erê îro tu rabe Zûlfeqar Beg
679 Bi destê xwe tu bigre rext û fîşek

44/12 Li her alî binêre Tirk û Eyran
680 Li me Kurdan bi carek kirine ferman

Zûlfiqar (Zûlfeqar) Begê kurê Ûweys Beg e. Piştî mirina birayê wî rêvebiriya Mîrektiya Pazûkiyan dane destê wî. Peywendiya di navbera wî û Şah Tehmasb de gelek baş bûye. Şah ew girtiye bin parêzgeriya xwe. Lê demeke kurt li ser desthilatdariyê maye û wefat kiriye (Şerefname, r.387). Ji ber Kurd hem di serdema mîrektiyan de hem jî di dema niha de di navbera Tirk û Îranê de mane, Cegerxwîn ji wan gazin kirine. Wî ji bo xelasiyê şerê çekdarî daye berçavan û di vî warî de bangî Zûlfiqar Beg kiriye.

44/13 Were, rabe begê min Yadigar î
681 Belê zanim bi dijmin tu nikarî

44/14 Di bin axê tu ma bêcan û bêten
682 Di gorê de dinalin rengê Bêjen

Yadîgar (Yadigar) Begê kurê Mensûrê kurê Zeynelê kurê Şukurê kurê Huseyîn Elî Beg e. Ji ber zarokên Zûlfiqar Beg ên kur tunebûne, rêvebiriya Eşîreta Pazûkî ji biraziyê wî Ûweys Beg re hatiye dayin. Yadîgar Beg jî bûye mîratgirê wî. Lê dayika Ûweys Beg ji şerê îqtidarê yê di navbera kurê xwe û Yadîgar Beg de tirsiyaye. Kurê xwe îkna kiriye ku dev ji mîrektiyê berde. Piştre ew û kurê wê çûne Seraya Şah Tehmasb. Li ser vê giregirên Pazûkî mîrektî dane destê Yadîgar Beg. Yadîgar Beg, mirovekî exlaqxweş, merd û mêrxas bûye. Lê ji ber ew, sofî bûye û giringî nedaye kar û barên dinê, ji çavên kesê zana de ketiye. Di serdema wî de Eşîreta Pazûkî gelek dewlemend bûne, bajar û gund hatine avakirin. Vê rewşê pazdeh salan ajotiye. Yadîgar Beg heta mirina xwe wezîfeya mîrektiyê meşandiye. Piştî mirina wî kurê wî Niyaz Beg Mîrektiya Pazûkî û Eleşkerdê bi rê ve biriye (Şerefname, r.387-388). Cegerxwîn bi malikên li jor destnîşan kiriye ku ji ber ji destê

Yadîgar Beg tiştek nayê, ew bêcan e, miriye. Ew nikare li hemberî dijmin bisekine û dijmin ji welat derxe. Lewma çawa Bêjen di bîra Efrasiyab de tengasiyên mezin kişandine, Yadîgar Beg jî di gorê de bi heman awayî nerehet e. Çimkî welatê wî di bin deste dijmin de ye.

44/15 Niyaz Beg wer binêre deşt û zozan
683 Hemî sor in ji xwîna gewr û bozan

44/16 Bi carek em li çolan tev dibazin
684 Ji ber xeşma neyaran em digazin

Niyaz Begê kurê Yadîgar Beg e. Piştî mirina bavê xwe bi fermana Şah Tehmasb, hatiye ser textê Mîrektiya Pazûkî û Eleşkerdê. Wî di ri'ayetnekirina fermanan de daye ser şopa bavê xwe, guh nedaye kar û barên mîrektiyê. Li ser şikayeta walî û wezîfedarên sînorên Osmaniyan Şah Tehmasb, mîrên li ser sînoran ji wezîfeyên wan dûr xistine. Piştre fermana kuştina hinek Pazûkiyan hatiye dayin, Mexsud Begê Xinislû di keleya Elamûdê de hatiye hepskirin. Niyaz Beg ji ser kar hatiye dûrxistin û mîrektiyê dane destê Ûweys Begê bi nasnavê Qiliç Beg. Heta mirina Şah Tehmasb rewşa Niyaz Beg bi vî awayî maye. Şah Siltan Mihemmedê li pey wî hatiye, Mîrektiya Pazûkî kiriye du qisim. Serokatiya Şekerbegiyan daye destê Niyaz Beg. Qismê din jî ketine bin rêvebiriya Qiliç Beg. Niyaz Beg piştre li ber nifûza Siltan Emîr Xan serê xwe tewandiye. Di nav wan welatan de bi mêr û mêrxasî nav û dengê Niyaz Beg belav bûye. Şerê di navbera Emîr Xan û Lala Paşa de ku bi mexlubiyeta Emîr Xan dawî bûye li Şêrwanê Niyaz Beg di Çemê Qan'ayê de xeniqiye (Şerefname, r.388-389). Cegerxwîn ji xeşma neyaran gazin kiriye ku ji ber wan bê war û welat mane. Bi bangkirina Niyaz Beg, deşt û zozanên bi xwîna wan sor bûne ango zilm û zora dîtine diyar kiriye.

44/17 Qiliç Beg rabe ser qe tu Ewîs î
685 Li me Kurdan tu carek xweş bipirsî

44/18 Di nav Kurdan ne mîr mane ne beg man
686 Di piştî we bi carek bûne gavan

Qiliç Beg leqeba wî ye, navê wî yê esil Ûweys Beg e. Dema diya wî ji ber îhtimala Yadîgar Beg çav berde textê mîrektiyê, kurê xwe biriye Qezwînê, Şah Tehmasb ew kiriye nav parêzgerên şahîtiyê. Nêzîkî bîst salan Qiliç Beg bi zabitên payebilind re perwerde bûye. Ji ber Niyaz Beg, ji aliyê kiryarên xwe yên dînî ve hatiye tawanbarkirin Şah Tehmasb wezîfeya wî ya mîrektiya Pazûkî û rêvebiriya Eleşkêrdê daye destê Qiliç Beg. Qiliç Beg demekê wezîfeya mîrektiyê gelek baş bi rê ve biriye. Di vê muddetê de bingeha rafizî û bêdînan ên di nav vî qewmî de ji holê rakiriye. Lê ji ber Şah Tehmasb şert û qewlên siltaniyê xera kirine, ew cardin vegeriyane ser dewr û baweriyên xwe yên berê. Şah Siltan Mihemmed dema hatiye ser text, Mîrektiya Pazûkî kiriye du qism. Qismekî di destê Niyaz Beg de maye, qismê din jî ketiye bin rêvebiriya Qiliç Beg. Di sala 993yê k./1585ê z. de, dema ku Osman Paşa bi armanca dagirkirina Tebrîzê bi rê ketiye bi tesadufî rastî grûbekî leşkerên Qizilbaş hatiye ku Qiliç Beg jî di nav wan de bûye. Di şerê derketiye de Qiliç Beg, di gîrdaba gera avê de xeniqiye, zarokekî kur li pey wî maye (Şerefname, r.390). Qiliç Beg di vê menzûmeyê de bi navê xwe yê esil ê Ewîs (Ûweys) hatiye yadkirin. Cegerxwîn ji Qiliç Beg xwestiye ku ew, wek mîrekî Kurd halê wan bipirse, çimkî Kurd bê serok û rêber mane. Qîmet û rûmeta wan kêm bûye, desthilatdarî ji destê wan hatiye derxistin.

**Tablo 3.2.44.**Begên Pazûkî

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Huseyîn Elî Beg, Şahsiwar Begê kurê Huseyîn Beg, Xalik Begê kurê Şahsiwar Beg, Ûweys Begê kurê Xalid Beg, Qiliç Begê kurê Ûweys Beg, Zûlfiqar Begê kurê Ûweys Beg, Yadîgar Begê kurê Mensûrê kurê Zeynelê kurê Şukurê kurê Huseyîn Elî Beg, | Hisên Beg<br>Şehsiwar Beg<br>Xalid Beg<br>Uweys Beg<br>Qiliç Beg<br>Zûlfeqar Beg<br>Yadîgar<br>Niyaz Beg |

| | | |
|---|---|---|
| | Niyaz Begê kurê Yadîgar Beg, Ûweys Beg (Qiliç Beg) | Qiliç Beg |
| Dem | Sedsala XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Kîxî, Ercîş, Adilcewaz, Eleşkêrd, Xinis, Uçkarmûş(Ohkan-A.Y.), Melazk(g)ird, herêma Zekem | Kîf, Erdîş, Eleşkurd, Xinûş, Elcewaz |

### 3.2.45. Mîrên Bedlîsê

Li gor zanyariyên di nav xelkê de koka mîrên Bedlîsê diçe digihîje Qralên Kisrayê. Ew ji nesla Nûşîrewan û neviyên wî ne. Lê di rastiyê de Qralê pêncemîn ê Kisrayê Camasbê kurê Feyrûz, di dema Nûşîrewan de wek nûnerê Qubad bûye desthilatdarê Ermenîstan û Şêrwanê. Camasb sê kur li pey xwe hiştine. Behwadê kurê Camasb, piştî mirina bavê xwe li Xelatê bicî bûye ku kok û ‘eslê mîrên Bedlîsê digihîje vî begê han. Dema *Şerefname* hatiye nivîsandin li gor tespîta Şerefxan rêvebiriya mîrên Bedlîsê bêyî navber ji çarsed û pêncî salan zêdetir bûye.

Eşîreta Rojkî, Izzeddîn ji bo Bedlîsê, Diyaeddîn jî ji bo hikumdariya Hezzoyê hilbijartine. Meyla xelkê Bedlîsê ji mîrê xwe zêdetir ber bi Diyaeddîn ve bûye. Diyaeddîn ji bo ji vê rewşê îstifade bike û Mîrektiya Bedlîsê bi dest bixe ji Hezzoyê çûye Bedlîsê ziyareta birayê xwe. Bi dîzdarê keleyê re li hev kiriye û bi hîle Keleya Bedlîsê ji destê birayê xwe Izzeddîn stendiye. Izzeddîn naçar maye ku vegere Hezzo û Sasonê û desthilatdariya wî welatî bike. Mîrên Hezzoyê ji nesla Izzeddîn in û bi navê Ezîzan hatine naskirin. Mîrên Bedlîsê jî ji nesla Diyaeddîn in lewma bi navê Diyaeddîn hatine naskirin (Şerefname, r.419-420). Di *Şerefname*yê de dema behsa Hezzoyê hatiye kirin, di derheqê Izzeddîn û Diyaeddîn de hatiye gotin ku Sason ji mirovekî Gurcî yê bi navê Tawît stendine. Di çavkaniyan de Tawitê Gurcî di sedsala XI. de hikumdarî kiriye.

Di *Şerefname*yê de sefheya di derheqê mîrên Bedlîsê de ji Destpêk, Çar Qisim û ji Dawiyek pêk hatiye. Cegerxwîn li ser vê binemalê menzûmeya “Beganê

Bedlîsê" nivîsandiye ku menzûme ji sî û heşt malikan pêk hatiye. Di vê menzûmeyê de navên nozdeh rêvebirên Bedlîsê derbas bûne. Ji bilî vê Idrîsê Bedlisiyê dîplomat ê vê mîrektiyê jî hatiye bibîranîn. Jixwe Şerefxan di *Şerefname*yê de diyar kiriye ku ew hejmara mîrên Bedlîsê yên di kitêbên dîrokê de li ber çavên wî ketine hîjdeh heb bûne (Şerefname, r.421). Ev hejmar tevî Şerefxan gihîştiye nozdeh mîrên Bedlîsê.

45/1 Melek Eşref tu rabe kanî Bedlîs?
687 Bi carek bûne wêran piştî Idrîs

45/2 Xinûs û Mûş li kû ne kanî Exlat?
688 Şerefdîn ka li kû ye tev de bûn tat

Melik Eşref dema hatiye ser mîrektiya Bedlîsê, di destpêkê de li ser navê hikumdarê Misir û Şamê hikum meşandiye û ew bixwe hevdemê Melik Eşref[336] bûye. Siltan Celaleddîn Harzemşah, ji ber Moxolan Îran terk kiriye, berê xwe daye Xelatê. Wê çaxê mîrê Bedlîsê Melik Eşref bûye, lê rêvebiriya Xelatê li ser navê wî di destê birayê wî de bûye. Di vê demê de îstilayên Moxolan û peywendiyên di navbera wan û Celaleddîn Harzemşahde balkêş bûne. Melik Eşref, bêyî serî li ber tu kesî bitewîne kar û barê hikumeta xwe meşandiye. Piştî çûye rehma Xwedê birayê wî Melik Mecdeddîn li ser textê mîrektiyê rûniştiye (Şerefname, r.425-429).

Cegerxwîn menzûmeya xwe bi Melik (Melek) Eşref daye destpêkirin ku di *Şerefname*yê de yekem mîrê Bedlîsê yê di derheqê wî de agahiyên berfireh hatiye dayin ew e. Cegerxwîn di vir de wêranbûna welat bi piştî çûyina Idrîs (Idrîsê Bedlîsî) ve girê daye. Sedemê vê yekê peymana di navbera mîrên Kurdan û Osmaniyan de ye. Bi vê peymana ku bi dîplomasiya Idrîsê Bedlîsê hatiye îmzekirin mîrên Kurdan ji ber xetereya Qizilbaşan ketine bin desthilatdariya Osmaniyan. Cegerxwîn vê geşedanê wek ji destderketin û wêranbûna welat dîtiye û bi nêrîneke neyinî fikra xwe daye xuyakirin.

[336] Melik Eşrefê kurê Melik Adil ê Eyyûbî di dema xwe de rêvebiriya Cezîre û Dimaşqê kiriye (1200-1237ê z.).

45/3 Tu Mecdiddîn î rabe wer temaşa
689 Bi carek Tirk û Tacîk bûne paşa

45/4 Li Bedlîsê binêre bax û beybûn
690 Di bin destê neyaran tev de zer bûn

45/5 Tu Izeddîn î ey şahê ciwanmêr
691 Tu deyne ser serê xwe tacekî zêr

45/6 Li Bedlîsa xwe rûne zû li ser text
692 Ji bo Kurdan ne text maye ne jî bext

Melik Mecdeddînê (Mecdiddînê) birayê Melik Eşref, wek li jor jî hatiye diyarkirin wek temsîlkarê birayê xwe bûye rêvebirê Xelatê. Piştî mirina wî Melik Mecdeddîn hatiye ser desthilatdariyê. Dema Siltan Celaleddîn Harzemşah ji ber dagirkeriya Moxolan Îranê terk kiriye û hatiye Xelatê. Ew wek penaber wî di keleyê de dihewînin lê guh nadinê. Li ser vê, Celaleddîn Harzemşah kela dorpêç kiriye û girtiye bin destê xwe. Melik Mecdeddîn mecbûr maye biçe kela navîn a di bin parêzgeriya Izzeddînê koleyê Melik Eşref. Piştre Melik Mecdeddîn ketiye bin xizmeta Siltan Celaleddîn. Wî, di Dîwana Siltan Celaleddîn de daxwaza efûkirina Izzeddîn kiriye, lê Siltan Celaleddîn ev yek qebûl nekiriye. Izzeddîn jî teslîm bûye û ji keleyê derketiye. Izzeddîn ji bo Siltan Celaleddîn bikuje planek çêkiriye. Siltan bi vê helwesta wî hesiyaye, ew tevî Melik Mecdeddîn[337] xistiye zindanê. Li ser daxwaza Melik Eşref, ji Fermanrewayên Misrê û Şamê alîkarî hatiye. Piştî sê rojan şer bi şikestina leşkerên siltan bi dawî bûye. Li ser agahiya hatina hêzên Moxolan, Siltan Celaleddîn ji bo têkiliyên xwe bi mîrên Bedlîsê re xurt bike Melik Mecdeddîn û Izzeddîn serbest berdaye. Ew, bi keça Melik Eşref re zewiciye. Dema ku xebera hatina Moxolan gihiştiye Siltan Celaleddîn û merivên pê re keleh terk kirine û çûne (Şerefname, 426-428).

[337] Di nusxeya wergera Ziya Avci (r.427) de gotiye ku Melik Mecdeddîn ji ber Izzeddîn girtine, xwestiye wî jî têxin zindanê. Lê di wergera İbrahim Sunkur (r.412) û ya Abdullah Yegin (r.403) de li gor emrê Siltan, tevî Izzeddîn, Melik Mecdeddîn jî xistine zindanê.

Bûyerên bi ser Melik Mecdeddîn û Izzeddînê xizmetkarê Melik Eşref de di heman demê de pêk hatine. Ji ber Izzeddîn jî rêvebirî kiriye, ew di nav mîrên vê binemalê de cih girtiye. Cegerxwin wêranbûna welat û windakirina desthilatdariyê bi bangkirina wan diyar kiriye. Di *Şerefname*yê de di derheqê erdnîgariya Bedlîsêde gelek agahî hene. Cegerxwîn jî ji nebatên li Bedlîsê, behsa bax û beybûnan kiriye ku êdî di bin destê dijmin de zer bûne, ango ji destê Kurdan derketine.

45/7 Ebû Bekrî tu rabe pehlewanî
693 Li ser textê xwe rûne keyxwedanî

45/8 Ne Bedlîs ma ji bo me kanî ew Mûş?
694 Li ber arê neyaran tev de bûn pûş

Amadekarê *Şerefnameya Menzûm* Dîlawerê Zengî, di "Ferhenga Kesan" de Ebûbekir wek kurê Mîrza Mîran Şahê kurê Emîr Tîmûr daye nasîn. Lê Ebûbekirê neviyê Tîmûr her tim bi mîrên Bedlîsê re di nav şer de bûye. Wek ji malikên li jor jî diyar e ev begê Cegerxwîn behsa wî kiriye hatiye ser desthilatdariya Bedlîsê. Cegerxwîn ev hikumdarê Kurd bi bîr anîbe jî rasterast di derheqê wî de agahî tune ne. Lê di *Şerefname*yê de dema behsa bingeh û koka mîrên Bedlîsê hatiye kirin di nav mîrên Bedlîsê de piştî Izzeddîn, navê Mîr Ebûbekir (Ebû Bekir) derbas bûye. Ev agahî ji riwayetekê hatiye girtin ku Şerefxan riwayetê wek riwayeta herî rast bi nav kiriye. Li gor vê riwayetê, piştî Selçûkiyan yanî di dawiya dema Harzemiyan de dema Siltan Celaleddînê kurê Siltan Mehmûdê Harzemşahî hatiye Bedlîsê, Melik Eşref li ser textê mîrektiyê bûye. Piştî wî birayê wî Melik Mecdeddîn, piştre Izzeddîn, piştî wî Mîr Ebûbekir, piştre Emîr Şêx Şeref, piştî wî jî Emîr Diayeddîn hatiye (Şerefname, r.421). Di vir de tê dîtin ku Cegerxwîn ji kronolojiya *Şerefname*yê dûr neketiye. Wî li gor vê riwayetê, ji mîrên Bedlîsê yên destpêkê yên navên wan derbas bûne rêz kiriye. Cegerxwîn Mîr Ebûbekir bi wesfên pehlewanî û hikumdariya wî aniye zimên. Bedlîs û Mûşa berê di bin hikumdariya mîrên Bedlîsê de bû; lê îro ketiye destê neyaran bi bîr aniye.

45/9 Şeref rabe binêre kanî Bilbas?
695 Qewalîsî bi carek mane pêxwas

45/10 Erê Mûtkî li kû ye kanî Kîsan?
696 Li kû mane sera û birc û eywan?

Di agahiyên derheqê bingeh û koka Bedlîsê de li gor riwayetekê; piştî Mîr Ebûbekir, Emîr Şêx Şeref hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.421). Cegerxwîn tevî Mîr Şêx Şeref, eşîretên yekitiya Rojkî jî daye berçavan. Eşîreta Rojkî ji bîst û çar eşîretan pêk hatiye. Ji du şaxên girîng ên Bilbasî û Qewalîsî belav bûye. Her şaxek ji diwazdeh grûban pêk hatiye. Eşîretên Modkî (Mûtkî) û Qeysan (Kîsan) ji pênc eşîretên qedîm ên Bedlîsê ne.

45/11 Diyaeddîn tu rabe wer binêrin
697 Erê Rojkan egîd û mêr û şêr in

45/12 Li her alî binêre tev dibazin
698 Bi serbestî welatê xwe dixwazin

Di *Şerefname*yê de dema behsa bingeh û koka mîrên Bedlîsê hatiye kirin, bi kurtasî di derheqê Emîr Diyaeddîn jî agahî hatine dayin. Emîr Diyaeddîn hevdemê Emîr Tîmûrê Kurganî bûye. Hevdîtinek wî jî bi Tîmûrê Kurganî re çêbûye (Şerefname, r.421). Wer diyar e ku ev Diyaeddînê ku Cegerxwîn navê wî bi bîr aniye Diyaeddînê bavê Hacî Şeref e. Di *Şerefname*yê de di derheqê bavê Hacî Şeref de tu agahî nehatine dayin, tenê wek nav "Hacî Şerefê kurê Diyaeddîn" derbas bûye. Lê li gor agahiyên destpêkê tê dîtin ku Diyaeddîn hevdemê Tîmûrê Kurganiye. Piştî wî, di serdema Hacî Şeref de bi Tîmûr re têkiliyên siyasî hatine dîtin. Cegerxwîn bi van malikên li jor, mêr û mêrxasiya wan a berê û bindestiya niha daye berhev.

45/13 Şeref rabe neyaran em şikandin
699 Kirin perçe ji hevdû em revandin

45/14 Li her alî me Tirk û Firs û Tazî
700 Ji bona me hawar nayê ne gazî

Hacî Şerefê kurê Diyaeddîn e. Bi wesfên wek rastî, qencîxwazî hatiye naskirin û xwediyê hêz û qudretê bûye. Dema Emîr Tîmûrê Kurganî, baregeha xwe li Deşta Mûşê daniye, cihên di bin desthilatdariya xwe de pêşkêşî otaxa Emîr Tîmûr kirine. Hacî Şeref, ji aliyê Emîr Tîmûr ve gelek baş hatiye pêşwazîkirin. Cihên wek Pasîn, Evînk û Melazkîrdê bi wilayeta Bedlîsê ve hatine girêdan. Ew belgeya Emîr Tîmûr a ji bo desthilatdariya Hacî Şeref, heta sala 940ê k./1534ê z. li ba mîrên Bedlîsê maye. Wextê Şemseddînê kurê Emîr Şeref Xan ber bi welatê Ecem ve çûye, belgenameya Emîr Tîmûr tevî belge û beratên din winda bûne. Piştî mirina Hacî Şeref Xan kurê wî bûye cînişînê wî (Şerefname, r.431-432). Cegerxwîn bi malikên ji bo Hacî Şeref rêz kiriye, perçebûna welat daye berçavan. Kurd di bin destê Tirk, Faris û Taziyan de mane. Kesek li hewara wan nayê ku ji bo rizgariyê pêdivî bi xelaskeran re heye.

45/15 Tu Şemseddîn î ey şahê me serbest
701 Binêre em bi carek bûne bindest

45/16 Seraser em, bi carek pîr û kal in
702 Di bin destê neyaran tev dinalin

Mîr Şemseddînê kurê Mîr Hacî Şeref e. Di *Şerefname*yê de bi peywendiya di navbera wî û Qere Yûsifê kurê Qere Mehmedê Tirkmen cih girtiye. Qere Yûsif ji ber Emîr Tîmûr çûye cem Yildirim Bayezîd ku di heman demê de Ehmed Celayirî yê waliyê Bexdayê jî xwe avêtiye ba Bayezîd. Qere Yûsif û Ehmed Celayirî ji wir çûne cem Sultan Ferexê hikumdarê Misrê. Sultanê Misrê ji ber dostê Tîmûr bûye, heta dema xebera mirina Tîmûr, wî û Ehmed Celayirî di zindanê de girtiye. Siltanê Misrê ji ber hêz û qudreta Qere Yûsif tirsiyaye û biryara kuştina wî daye. Lê ew ji wê rewşê xelas bûye û hatiye cem Şemseddînê mîrê Bedlîsê. Mîr Şemseddîn, pêşwaziyeke baş

lê kiriye û bi keça Qere Yûsif re zewiciye.[338] Qere Yûsif bi alîkariya Mîr Şemseddîn, di sala 809ê k./1407ê z. de bi Mîrza Ebûbekirê kurê Mîrza Mîran Şahê kurê Emîr Tîmûr re şer kiriye. Wan, hêzên neviyê Tîmûr têk birine. Saleke şûn de jî şerê di navbera Qere Yûsif û Mîrza Ebûbekîr û Mîrza Mîran Şah derketiye de Qere Yûsif bi ser ketiye. Roj bi roj hêza Qere Yûsif xurt bûye. Di vê navberê de peywendiyên di navbera Mîr Şemseddîn û Qere Yûsif de gelek baş bûne. Mîr Şemseddîn piştî mirina Qere Yûsif ji Mîrza Şahrux re îta'et kiriye. Dema li welat nifûza Tirkmenan rabûye wî serbixwetiya xwe îlan kiriye. Li ser navê xwe sîkke lêdaye û xutbe daye xwendin. Di dawiyê de ji aliyê Mîrza Îskenderê kurê Qere Yûsif ve hatiye kuştin (Şerefname, r.433-438). Cegerxwîn di van malikan de rewşa Kurdan a di bin destê neyaran de daye xuyakirin. Serdema Şemseddîn serdema rizgarî û serbestiyê bûye, lê îro Kurd stûxwar û bindest in.

45/17 Şeref Beg rabe îro serbilind î
703 Xwedan tac û sera û şehr û gund î

45/18 Bi carek bûne wêran, mane kavil
704 Li ser wan xweş dixwînin kund û bilbil

45/19 Were Ehmed binêre bax û bîstan
705 Di Kurdistan nemane bû zivistan

45/20 Ne bax û bexçe mane hem neman rez
706 Erê zozan li ku ye kanî ew pez

45/21 Tu Şemseddîn î rabe ey cihangîr
707 Di Kurdistan nemane begler û mîr

[338] Di nusxeyên wergera İbrahim Sunkur (r.417) û Abdullah Yegin (r.409) de wek Şemseddîn keça xwe bi Qere Yûsif re zewicandiye derbas bûye. Lê di dewama metnê de di herdu nusxeyan de jî ji bo bûyera kuştina Mîr Şemseddîn a ji aliyê Îskenderê kurê Qere Yûsif de hatiye diyarkirin ku li gor riwayetek sedemê kuştina Mîr Şemseddîn wek ji ber li jina xwe ya xwişka Mîrza Îskender xistiye derbas bûye. Lê îhtimalek xurttir ev e ku ji ber Emîr Şemseddîn ji Seraya Şahrux re îta'et kiriye, ji aliyê Mîrza Îskender ve hatiye kuştin. Di wergera Ziya Avci (r.435) de gotiye ku: "Şemseddîn pêşwaziyek baş lê kiriye, gelek baweriya xwe pê aniye, bi keça wî re zewiciye. Di muqabilê vê de Qere Yûsif herêma Pasînê û Kela Ewnikê dayê."

45/22 Hemî îro belengaz û geda ne
708 Di bin destê neyaran tev de mane

Emîr Şeref, piştî kuştina Emîr Şemseddîn hatiye ser textê mîrektiyê. Emîr Şeref ji ber kesekî Xwedêtirs bûye, guhên xwe nedaye kar û barê mîrektiyê. Li gor riwayetekê Şahim Xatûna jina Emîr Şeref, di saxiya Emîr Şeref de ji zanayan fetwayek bi dest xistiye û bi Emîr Seydî Ehmed Nasireddîn re zewiciye. Dema Emîr Şeref çûye rehma Xwedê ji ev jina han zarokek biçûk ê bi navê Şemseddîn li pey maye. Ji ber Şemseddîn hê zarok bûye ji dêvla wî Mîr Seydî Ehmed û jina wî Şahim Xatûn rêvebiriya mîrektiyê kirine. Eşîretên Rojkî nexwestine di bin desthilatdariya wan de bijîn û ji wan her yek di nav sînorên mîrektiyê de bi serê xwe rêvebiriya xwe meşandine. Dema ku Emîr Şemseddîn mezin bûye û bi awayekî tesadufî bi vê rewşê hesiyaye Seydî Ehmed xwe avêtiye cem mîrê Boxtanê. Li ser vê, Emîr Şemseddîn diya xwe di cî de kuştiye û tevî leşkerên xwe çûye ser wilayeta Boxtanê. Li gor plana çêkiriye, berî şer dest pê bike Seydî Ehmed bi dest xistiye û ew kuştiye. Ji wê rojê pê ve navê wî bûye "Emîr Şemseddînê Dijwar". Wextê çûye rehma Xwedê pênc kur li pey wî mane (Şerefname, r.439-443). Bûyerên li ser Emîr Şeref, Emîr Seydî Ehmed Nasireddîn û Emîr Şemseddîn di *Şerefname*yê de di beşa sisiyan a qismê sêyem de cih girtine. Ev qisim bi sernavê "Ew Siyanet û Eleqeyên ku Mîrên Bedlîsê ji Siltanên Kevin Dîtine" de derbas bûye. Beşa sisiyan bi agahiyên di derheqê "Mîr Şemseddînê kurê Mîr Hacî Şeref" dest pê kiriye. Cegerxwîn navê Emîr Şerefê bavê Şemseddîn, Ehmed Nasireddînê zirbavê Şemseddîn û navê Şemseddîn li gor rêza *Şerefname*yê daye. Wî bi van malikan, kavil û wêranbûna axa welat û windakirina dewlemendiya rêvebiriyê carek din aniye zimên.

45/23 Birahîm Beg tu rabe mîrê zana
709 Binêre tu li çehrê me xizana

45/24 Belê mîr in welê çibkim nezan in
710 Belengaz in bi carek bê xwedan in

Emîr Îbrahîmê (Birahîmê) kurê Emîr Şemseddîn e. Piştî mirina bavê xwe hatiye ser desthilatdariyê. Wî demekê welat bi başîtî bi rê ve biriye. Dema çûye rehma Xwedê kurê wî Emîr Hacî Mihemmed hatiye ser desthilatdariyê (Şerefname, r.444). Di *Şerefname*yê de di derheqê Emîr Îbrahîm de zêde agahî nehatine dayin. Lê Cegerxwîn ew bi zanyarî wesifandiye. Mîrên berê zana û çespan bûne; lê mîrên îro nezan û belengaz in. Çimkî bê xwedî ne, li bin destê neyarin.

45/25 Muhemmed rabe ser xwe şahê Bedlîs
711 Ji Bedlîsê tu bigre ta bi Teflîs

45/26 Bira ne em bi carek yek nîjad in
712 Seraser em bi qîr û ah û dad in

Emîr Hacî Mihemmedê (Muhemmedê) kurê Emîr Îbrahîm e. Piştî mirina bavê xwe li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Heta mirina xwe ya di sala 865ê k./1461ê z. de li ser hikumdariyê maye. Piştre li ser wesiyeta wî kurê wî Îbrahîm hatiye ser textê mîrektiyê (Şerefname, r.444). Cegerxwîn bangî Emîr Hacî Mihemmed kiriye û ji bo girtina welat jê alîkarî xwestiye. Cegerxwîn di vir de bi daxwaza yekîtî û bi hevrebûnê, bal kişandiye ser yekîtiya Kurdan.

45/27 Birahîm Beg tu rabe ka Şerefdîn
713 Li ser nemaye îro jar û xemgîn

45/28 Li wî winda ne îro ew dem û pêl
714 Xuya nakin li ser wî koçer û êl

Emîr Îbrahîmê duduyan ê kurê Mîr Hacî Mihemmed e. Serdema wî bi têkoşîna Aqqoyuniyan re derbas bûye. Ew naçar maye ku dev ji mîrektiyê berde û Kela Bedlîsê bide destê Aqqoyuniyan. Mîr Îbrahîm çûye Tebrîzê Seraya Siltan Hesen. Siltan Hesen, ew ber bi aliyê Iraqê ve şandiye û ji hatiniya Qumê jê re tehsîsat veqetandiye. Piştî Siltan Hesen kurê wî Yaqûb hatiye ser textê mîrektiyê. Di dema Yaqûb Beg de rewş guheriye. Yaqûb Beg ji ber ji rewşa Rojkiyan û ji wan

serhildanên ji aliyê wan ve li wilayeta Bedlîsê hatibûn derxistin qehiriye. Lewma ji bo kuştina Emîr Îbrahîm ferman daye û ew li wir hatiye kuştin. Sê zarokên kur li pey wî mane (Şerefname, r.444-447). Cegerxwîn qet li ser serdema Emîr Îbrahîm nesekiniye. Ew wesfên mirovan ên perîşanî û xemgînî li Çiyayê Şerefdînê bar kirine. Bi vî awayî rûxandina mîrektiyê li ber çavan raxistiye.

45/29 Were rabe binêre Şah Muhemmed
715 Welatê te bi carek bûye Serhed

45/30 Bi carek bûne wêran gund û bajar
716 Belê hêj jî bilind û berz e dîwar

Emîr Şah Mihemmedê (Muhemmedê) kurê Emîr Îbrahîm e. Piştî kuştina Emîr Îbrahîm, Mihemmed Begê Kelhokî ji bo rizgarkirina welat herdu kurên wî Hesen Elî û Huseyîn Elî ji bajarê Qumê anîne Hekkariyê. Lê ev herdu mîr di şerekî di navbera Asûrî û mîrên Hezzoyê de hatine kuştin. Li ser vê, Mihemmed Begê Kelhokî xeberê ji Emîr Şemseddîn re şandiye. Emîr Şemseddîn dema Aqqoyunî Kela Bedlîsê dorpêç kiribûn, çûbû cem Eşîreta Boxtî û xwe li wir veşartibû. Emîr Şemseddîn hatibe jî li hemberî Aqqoyuniyan bi ser neketine. Mihemmed Begê Kelhokî vê carê kurê Mîr Îbrahîm ê biçûk ê bi navê Emîr Şah Mihemmed aniye. Bi hatina wî di sala 900ê k./1495ê z. de Bedlîs hatiye girtin. Emîr Şah Mihemmed xwe mîrê welat îlan kiriye. Serdema wî bi dadmendî û xweşî derbas bûye. Ew bi wesfên mêrxasî, qedirnasî û qencîxwaziya xwe hatiye naskirin. Piştî sê salan li ser textê mîrektiyê maye çûye rehma Xwedê. Kurekî bi navê Emîr Îbrahîm ê temenê wî biçûk li pey xwe hiştiye (Şerefname, 444-455). Cegerxwîn bi van malikan diyar kiriye ku welat hatiye wêrankirin û perçekirin. Ew bi risteya "Belê hêj jî bilind û berz e dîwar" bi bend û dîwaran sînorên hatine kişandin daye berçavan.

45/31 Birahîm Beg tu rabe ser xwe dilxwîn
717 Ji Qeqas bigre carek ta bi Hemrîn

45/32 Hemî Kurd in belê îro hemî tat
718 Di bin destê neyaran mane şehmat

45/33 Tu fermo rabe ser xwe ey Şerefxan
719 Binêre birc û eywan bûne wêran

45/34 Ji dijmin re sera û şaneşîn in
720 Heçî Kurd in bi carek dilbirîn in

Emîr Îbrahîmê kurê Emîr Şah Mihemmed, piştî mirina bavê xwe di temenê biçûk de li ser textê mîrektiyê rûniştiye. Ji ber temenê Emîr Îbrahîm biçûk bûye rêvebirî bi fiîlî ketiye destê Eşîreta Qewalîsî. Li ser vê Eşîreta Bilbasî Emîr Şerefê kurê Emîr Şemseddînê pismamê Emîr Îbrahîm, ji Eruxa girêdayî wilayeta Boxtan anîne û ketine bin emrê wî. Ew serdem bi şerê îqtidarê yê di navbera Emîr Îbrahîm û Emîr Şeref de derbas bûye. Di dawiyê de Emîr Şeref hatiye ser desthilatdariyê. Emîr Şeref, Emîr Îbrahîm avêtiye zindanê. Heta dema Emîr Şeref ji aliyê Şah Îsmaîlê Sefewî ve hatiye girtin, Emîr Îbrahîm heft salan di zindanê de maye. Emîr Îbrahîm piştî ji zindanê derketiye dîsa kar û barê mîrektiyê girtiye dest xwe. Lê ji ber îstilaya Qizilbaşan dev ji mîrektiyê berdaye. Piştre Emîr Şeref welatê xwe ji Qizilbaşan girtiye û carek din hatiye ser desthilatdariyê. Emîr Şeref şerê di navbera wî û Ulema Tekelû de piştî têkoşînek gelek giran bi gulleyek tivingê hatiye kuştin (Şerefname, r.459-485). Cegerxwîn li gor kronolojiya *Şerefname*yê Emîr Îbrahîmê kurê Emîr Şah Mihemmed û Emîr Şerefê kurê Şemseddîn bi bîr aniye. Di *Şerefname*yê de bûyerên li ser van mîran di nav şerê îqtidarê de bi hev re hatine dayin. Cegerxwîn ji bo her mîrekî du malik nivîsandine. Cegerxwîn bi van malikan ji destderketin û wêranbûna welat bi xemgînî aniye zimên. Kurd îro tat in (budela ne), çimkî li ber destê neyaran bûne şahmat, ango têk çûne û bêhêz mane. Desthilatdariya wan ketiye destê neyaran.

45/35 Tu Şemseddîn î ey şahê dilawer
721 Ji Kurda re belê zanim tu rêber

45/36 Ji bo me bûye dijmin şahê Eyran
722 Li ser me bûne paşa Tirk û Tûran

Emîr Şemseddînê kurê Mîr Şeref e. Piştî bavê wî di şerê bi Ulame re hatiye kuştin li ser textê Mîrektiya Bedlîsê rûniştiye. Dema Siltan ji bo çûyina ser Azerbaycanê leşkerên Osmanî bi rê xistine, nêzî Diyarbekirê Şemseddîn Beg, bi diyariyên bi qîmet çûye dîtina wan. Wan gelek pêşwaziyeke baş lê kirine û Mîr Şemseddîn bi xwe re birine Tebrîzê. Bi teşwîqkirina Ulame, Dîwana Siltan rêvebiriya Bedlîsê dane destê Ulame. Ji Mîr Şemseddîn re jî fermana rêvebiriya wilayeta Meletyeyê derxistine. Mîr Şemseddîn neçûye Meletyeyê, tevî maiyeta xwe berê xwe daye cem Şah Tehmasb û îta'eta xwe pêşkêşî wî kiriye. Li ser vê Ulame ketiye nav dudiliyê û ji tirsan Bedlîs terk kiriye. Şah Tehmasb pêşwaziyeke baş li Mîr Şemseddîn û yên pê re kiriye. Leqeba Xan dayê û wî xistiye nav fermandarên xwe yên mezin. Emîr Şemseddîn deh salan bi vî awayî derbas kiriye. Di dawiya emrê xwe de ji însanan dûr ketiye û dema çûye rehma Xwedê du kur li pey xwe hiştine. Li pey wî kurê wî Emîr Şeref bûye cînişînê wî. Kurê wî yê din Xelef Beg piştî hin wezîfeyên Seraya Sefewî îta'eta xwe ji Siltan Muradê Osmanî re pêşkêş kiriye. Ji Xelef Beg re wezîfeya Senceqa Eleşkêd û Melazkîrdê hatiye dayin (Şerefname, r.488-495). Cegerxwîn piştî rêberî û hikumdariya Emîr Şemseddîn diyar kiriye, bindestiya Kurdan a di bin desthilatdariyên Eyran (Îran), Tirk û Tûranan de aniye zimên. Dawiyê malikên li ser Emîr Şerefê kurê wî rêz kiriye ku Emîr Şeref bibû cînişînê bavê xwe. Lê behsa kurê wî yê din Xelef Beg nehatiye kirin.

45/37 Şerefxan Beg te tarîxa me çêkir
723 Zimanê van neyaran zû te jêkir

45/38 Digotin hîç ji Kurdan ranebûn jîr
724 Ne paşa ne ne şah û begler û mîr

Emîr Şerefê (Şerefxan) kurê Emîr Şemseddîne. Piştî mirina bavê xwe bûye cînişînê wî. Ew, mirovekî zana û xwedî fezîlet bûye. Ji ber ku di navbera bavê wî û Osmaniyan de hin pirsgirêk çêbûne bavê wî ji welatê xwe veqetiyaye û li welatê

Eceman bicî bûye. Heft sal piştî koçkirinê Emîr Şeref hatiye dinê. Li serayê tevî zarokên Şah Tehmasb perwerde bûye. Dema bavê wî dev ji wezîfeya xwe ya serayê berdaye bi fermana Şah, Emîr Şeref di diwazdeh saliya xwe de bûye desthilatdarê mîrektiyê û rêvebirê herêmên Salyan û Mehmûdabadê. Di serdema Şah Îsmaîlê II. de li ser fesadiya hin dilnexwazan Şah hinek kes kuştine. Emîr Şeref jî bi rêvebiriya Nahciwanê wezîfedar kiriye. Ew, salek û çar meh li ser kar û barê hikumeta Nahciwanê maye. Piştre xebera ji aliyê Siltan Murad Xan ve Eyaleta Bedlîsê dane wî gihîştiyê. Li ser vê xeberê, tevî çarsed kesên bi xwe re hatiye welatê bav û bapîrên xwe (986ê k./1579ê z.). Emîr Şeref deh salan di xizmeta Osmaniyan de maye. Di dawiya emrê xwe de kar û barên rêvebiriyê xistiye destê kurê xwe Ebû'l-Me'alî Şemseddîn Beg. Ew jî bi nivîsandina *Şerefname*yê mijûl bûye ku li gor diyar kiriye wê çaxê temenê wî nêzî şêst salî bûye (Şerefname, r.497-506). Cegerxwîn ji ber Şerefxan dîroka Kurdistanê nivîsandiye minnetdarê wî ye. Çimkî Şerefxan dîroka paşa, şah, beg û mîrên Kurdan piştrast kiriye. Bi vî awayî zimanê neyaran qut kiriye ku kes nikare bibêje Kurd di dîrokê de ne xwedî desthilatdariyê ne.

**Tablo 3.2.45.** Mîrên Bedlîsê

| | Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|---|
| Şexsiyetên Dîrokî | Diyaeddîn, Melik Eşref, Melik Mecdeddîn, Izzeddîn, Mîr Ebûbekir, Emîr Şêx Şeref, Emîr Diayeddîn, Hacî Şerefê kurê Diyaeddîn, Mîr Şemseddînê kurê Mîr Hacî Şeref, Emîr Şeref, Mîr Seydî Ehmed Nasireddînê mêrê Şahim Xatûn,Emîr Şemseddînê kurê Emîr Şeref, Emîr Îbrahîmê kurê Emîr Şemseddîn, Emîr Hacî Mihemmedê kurê Emîr Îbrahîm, Mîr Îbrahîmê Duduyan ê kurê Mîr Hacî Mihemmed, Emîr Şah Mihemmedê kurê Mîr Îbrahîm,Emîr Îbrahîmê kurê Emîr Şah Mihemmed, Emîr Şerefê kurê Şemseddîn,Emîr Şemseddînê kurê Mîr | Melek Eşref<br>Idrîs<br>Mecdeddîn<br>Izeddîn<br>Ebû Bekir<br>Şeref<br>Diyaeddîn<br>Şeref<br>Şemseddîn<br>Şeref Beg<br>Ehmed<br>Şemseddîn<br>Birahîm Beg<br>Muhemmed |

| | | |
|---|---|---|
| | Şeref, Xelef Begê kurê Emîr Şemseddîn, Mîr Şerefê kurê Emîr Şemseddîn,Ebû'l-Me'alî Şemseddîn Begê kurê Mîr Şeref | Birahîm Beg<br>Şah Muhemmed<br>Birahîm Beg<br>Şerefxan<br>Şemseddîn<br>Şerefxan |
| Dem | Sedsalên XI-XVI. | Ji dema niha bangî dema borî dike. |
| Mekan | Bedlîs,Xelat,Mûş,Xinis,Şerefdîn(Çiyaye), Suşehrî,Bîngol,Extemar, Navçeya Tabê, Nahiyên Çukur, Okhan,Tatîk, Amurk, Xwêt,Poxnad,Kerenc,Kêfnedûr(Gelî ye), Pasîn, Evînk, Melazkird, Qonaxa Merku, TaxaKusur,GundênTetwanê,Tirmîtêy(Mûş), Kifû(Gurcikan),Kazux(di navbera Ercîş û Adilcewaz de), Xizonkîn û Êksor (Tetwan), | Bedlîs, Xinûs, Mûş, Exlat, Şerefdîn, |

## 3.3. JI ALIYÊ TERMÎNOLOJIYÊ VE

### 3.3.1. Termînolojiya Navên Avahiyan

Di *Şerefname*yê de avahiyên mîmariya sivîl ji xeynî avahiyên bi îqtidarê re têkildar, yên di jiyana mirov a civakî de cih digirin jî gelek in. Bi gelemperî behsa van avahiyan ji aliyê kîjan mîrî ve kîjan avahî hatine çêkirin derbas bûye. Di *Şerefnameya Menzûm* de avahiyên mîmariya sivîl ên bi îqtidarê re têkildar û avahiyên mîmariya eskerî li pêş in. Ji ber Cegerxwîn ji destderketina desthilatdariyê û bindestiya gelê Kurd kiriye temaya menzûmeyên vê dîwanê, zêdetir cih daye avahiyên îqtidarê û yên eskerî.

Cegerxwîn ji ber gelek girîngî daye zanyariyê û xwendinê behsa çêkirina xwendegehan kiriye. Di *Şerefname*yê de jî behsa avakirina medreseyan tê kirin. Ji mîmariya dînî di *Şerefname*yê de gelek îbadetxaneyên dînê Îslamê derbas bûne. Lê di *Şerefnameya Menzûm* de tenê di menzûmeya di derheqê begên Dêrzînê de îfadeya "dêr"ê derbas bûye. Ji bilî vê hem di *Şerefname*yê de hem jî di *Şerefnameya Menzûm*

de di derheqê navên avahiyan de îfadeyên mecazî jî hene. Di *Şerefname*yê de çend hevokên navên avahiyan ên bi wateya mecazî hatine bikaranîn bi vî awayî ne:

- Ew bixwe jî kehyatiya **seraya** axîretê hilbijart (Şerefname, r.230).[339]

-**Baregah** û bingehê xwe verê kir nav cergê dilxweşiya bajarê bêpejn û bêdengan, di behişta Xwedê de li rexê mirovên merd û aza cihek jê re hat veqetandin (Şerefname, r.171).

-Ji vê dinêya bê peyman bar kir û bû mêvanê **mêvanxane**ya behiştê (Şerefname, r.229).

Carinan ev avahî wek mînakên li jêr tê dîtin, bi wateya şibandinê hatine bikaranîn:

-**Wekêş (aş)**, ser û laşên wan hêran (Şerefname, r.143).

-Ket nav bêaramiyekî kunên mişkan jê re bûn **koşk** û **Seray** (Şerefname, r.103).[340]

Cegerxwîn, taybetiya mirovan a bêdengiyê derbasî kelat, birc û eywanê kiriye. Ji ber demên zêrîn ên xweş li paş mane xemgînî û bêdengiya xelkê li avahiyan bar kiriye. Carinan jî di menzûmeyan de avahiyên desthilatdariyê ji bo ji destderketina îqtidarê bê diyarkirin hatine dayin:

Belê ew çax û gavên te hemî çûn
**Kelat** û **birc** û **eywan** ker bi ker bûn
( Beganê Hekkarê, r.34)

Di nav Kurdan ne Sason e ne Sasan
Ne key mane ne kesra ye ne **eywan**
(Beganê Sason, r.57)

Nexweş bûne ji bo me deşt û zozan
Xerab bûne li ser me **birc** û **eywan**
(Beganê Silêmanî û Qulp û Batman, r.76)

**Sera** û **birc** û **eywan** tev heriftin
Di bin destê neyaran em geriftin
(Beganê Suhran, r.79)

Hisên rab eli te şahî rewa ye
Ji bo te **kunbeda gerdûnseraye**
(Şahanê Erdelan, r.30)

Ne pez maye ne rez maye ne **xanî**
Ne cotmaye ne cobar û kanî
(Beganê Çermûk, r.56)

---

339 Di nusxeya wergera İbrahim Sunkur (r.230) de derbas bûye ku ev îbare ji bo mirina Emîr Îbrahîmê mîrê Egilê hatiye bikaranîn.
340 Ev şibandin di wergera Abdullah Yegin û İbrahim Sunkur de derbas nebûye.

**Tablo3.3. 1.** Navên Avahiyan ên bi Wateya Rasteqîn Hatine Bikaranîn:

| Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|
| **Avahiyên Mîmariya Sivîl:** Seray, Dîwan,Xan,Xanî,Medrese,Nexweşxane,Daru'l-Hedîs,Qonax, Kerwanseray, Dîwana Mal (Darayî), Hemam, Koşk, Rasatxaneyên Stêrnasî, Îmaret, Pir, Dikan, Aş (cihê hêrandinê), Mêvanxane, Kemer, Debaxxane, Kanî, Goristan.<br>**Avahiyên Mîmariya Eskerî:** Kele, Zîndan, Qişle,Girtîxane,Dîwar(Sûr),Qerargeh(Baregeh), Birc, Hîsar.<br>**Avahiyên Mîmariya Dînî:** Mizgeft, Tekya, Mescîd,Qubbe,Gumbet(Kumbet),Îbadetxane û Zawiye,[341]Dergah,Dêr, | **Avahiyên Mîmariya Sivîl:** Sera (Seray), Eywan (Dîwan), Xan, Man, Xanî, Şahnişîn, Xwendegah,<br>**Avahiyên Mîmariya Eskerî:** Birc, Dîwar (Sûr), Kelat, Zindan,<br>**Avahiyên Mîmariya Dînî:** Dêr, |

### 3.3.2. Termînolojiya Qadên Xwezayî

Şerefxan dema behsa sînorên Kurdistanê kirine navên Behra Hurmuz û Okyanûsa Hindî derbas bûye. Ji bilî vê di *Şerefname*yê de navên gelek çem, çiya, gelî û hwd. ên li ser erdnîgariya Kurdistanê cih girtine derbas bûne. Lê ji ber ku nivîsandina navên van cihan di çarçoveya mijara me de nîne û bi tena serê xwe dibe xebatekî lêkolînê me ev cih nenivîsandin. Di *Şerefname*yê de carinan ev nav ji wateya xwe ya rasteqîn dûr ketine û wateyeke mecazî hilgirtine. Yan jî bi hunera teşbîh û teşxîs hatiye nivîsandin. Wek mînak:

-**Çiyayên** wê eynî wek Xizir Nebî –silavên Xwedê li ser bin- kincên kesk li xwe kiribûn (Şerefname,r.395).

-**Deşt** û **çiyan** ji tirsa wî serên xwe kirin ber xwe, stêrkên asîmanan ecêbmayî man(Şerefname, r.243).

-Mîr Şeref ji wan **çiyan** nebû, bi ba û babilîskek ji cihê xwe biheje (Şerefname, r.170)

341 Ev îbare di wergera Abdullah Yegin a dema behsa Esadeddînê kurê Kulabiyê kurê 'Imadeddîn de derbas bûye (r.141). Di vê mijarê de di wergera İbrahim Sunkur de ev îbare derbas nebûye (r.152). Di wergera Ziya Avci de bi îfadeya wek parastgehên pîroz û cihên tobeyên serê siban cih girtiye (r.143). Ji bilî vê di gelek cihên *Şerefname*yê de înşakirina tekyeyê derbas bûye û navê îbadetxaneyan jî hatiye dîtin.

-Îxanetên zemanê dê sedî sed hilweşe û daxwazên wan dê tar û mar bibe; dê bexçeyên dewleta wan wekî "**berriyek bej**" bibin **çolistan** (Şerefname, r.465).

Di *Şerefname*ya Menzûm de navê çemên Amed ango Çemê Dîcle, Ferat, Zab û Ceyhûnê derbas bûye. Di nav van çeman de Çemê Ceyhûnê balê dikişîne. Ev çem ji herêma Pamîr a Efganîstanê derdikeve û heta Gola Aralê tê ku di helbestên Kurdî de navê vî çemî pir derbas nabe. Qadên xwezayî yên din ên wek çiya, newal, deşt, zozan û hwd. derbas bûne. Ev qad carinan bi wateya mecazî, teşbîh û teşxîsê, carinan jî bi wateya yekemînî hatine bikaranîn. Hin mînakên navên qadên xwezayî derbas bûne ev in:

Emîr Hemze ji Palo rabe ey Zal
Hemî **deşt** û **newal** û **kaş** û **berpal**
(Beganê Palo, r.53)

**Çiya** û **deşt** û **zozan** tev de xemgîn
**Çem** û **gol** û **newalên** te hemî xwîn
(Beganê Egîl, r.51)

Li ser **şax** û **çiyan** pêk ve dibazin
Bi serbestî welatê xwe dixwazin
(Beganê Hekkarê, r.33)

Temaşake li **zozan** û li **gerdan**
Hemî sor in ji ber xwîna me Kurdan
(Beganê Behdînan, r.36)

Bi carek em li **çolan** tev dibazin
Bi serbestî welatê xwe dixwazin
(Beganê Biradost, r.84)

Ji derdên me hemî jar û perîşan
Ziwa bûn **çav** û **avên deşt** û **zozan**
(Şahanê Erdelan, r.28)

**Tablo3.3. 2.** Qadên Xwezayî

| Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|
| Çem, Çiya, Deşt,<br>Zinar, Newal, Gol,<br>Çêrgeh,Gelî,Behr(BehraHurmuz),<br>Okyanus(Okyanusa Hindî), Berrî, | Çem, Şax/Çiya, Deşt,<br>Zinar, Newal, Gol,<br>Mêrg, Dar û Ber, Çol,<br>Diyar,Zozan,Gerdan(Gir),<br>Kanî û Çirk, Kaş û Berpal(Kendal),<br>Cobar, |

### 3.3.3. Termînolojiya Faûna (Alema Heywanan)

Hem di *Şerefname*yê de hem jî di *Şerefnameya Menzûm* de navê gelek heywanan derbas bûne. Lê bi gelemperî navên heywanan bi wateya mecazî û şibandinê cih girtine. Navên heywanên wek şêr, piling û gur ji bo cesaret û netirsiyê hatiye bikaranîn. Ev yek carinan bi riya îstiareyê carinan jî bi riya teşbîhê hatiye bikaranîn. Çend mînakên ji *Şerefname*yê hatine girtin bi vî awayî ne:

-Şah Rustem **wek ji teyrê qefesê hatibe berdan** û leza çûna hêlîn û sertêdana têjikên xwe bike, wisan lê hat (Şerefname, r.100).

-**Şêr** li ku be pençên wî pê re ne (Şerefname,r.142): Ji şêr mebest Esededdînê mîrê Hekkariyê ye ku piştî naçar maye ji welatê xwe derdikeve diçe Misrê jî di erkê leşkerî de nav û dengê wî belav bûye.

-Pehlewanên Kurdên Boxtan, wek **gurên** devbixwîn, **pilingên** birîndar, **şêrên** birçî yên nav şikêr û diriyan, bi hêviya hêrana hestiyên neyaran û tîniya xwîna nelibaran, di cengan de sekin û westanê nizanin (Şerefname, r.170).

-Ev **şêrên han**, wek birûskê ji kozik û çeperên xwe derketin, êrîşê wî kirin, ew perçe perçe kirin û giyanê wî ya mexrur û li ser xwe çûyî ji qalibê wî derxistin (Şerefname, r.220).

Herçiqas di *Şerefname*yê de heywanên bi wateya mecazî û sembolîk bi gelemperî ji bo wêrekî û netirsiyê hatibin bikaranîn jî carinan ji bo dijminahî yan biçûkdîtina dijmin jî ji metaforên heywanan sûd hatiye wergirtin:

-Di Bexdayê de dubendî derket, **dûpişk** û **koremarên hesûdiyê** ketine navbera wan (Şerefname, r.104).

- **Wek duvpişkê** bû, bigihîştiya çi ciyî xiştek tê re dikir (Şerefname, r.82).

-Ya heta em bigihîjin Birca Mezin em ê bi dîwarê sûrê re rapeliqin û armanca xwe bînin cih an jî canê xwe yê şêrîn bidin ber îşkenceyên yekîneyên mihafiza, bedenên xwe ji **kûçik** û **pisîkan** re bikin êm (Şerefname, r.428-A.Y./r.435-İ.S.).[342]

Di *Şerefname*yê de ji bo diyarkirina mirinê jî bi riya xweşnavî navê heywanan hatine bikaranîn:

-**Teyr**ê rihê wî yê pak û dilsoz jî ji hêlîna xwe ya di bedena wî de derket û ber bi bihuştê firiya (Şerefname, r.177).

---

[342] Di nusxeya wergera Abdullah Yegin (r.428) de wek kûçik û pisîk derbas bûye. Ev yek di wergera İbrahim Sunkur (r.435) de kûçik û qijak e. Di wergera Ziya Avci de ev îbare cih negirtiye.

-Di hûrê **hûtê (balînayê)** tunebûnê de winda bûne (Şerefname, r.389).[343]

Di *Şerefnameya Menzûm*de jî navên heywanan bi gelemperî bi awayî mecazî û sembolîk, wek metafor an jî wek teşbîh cih girtine. Hin ji van metafor û teşbîh ji bo cesaret û cengaweriyê hatine destnîşankirin. Ji aliyê bêtirsbûn û bihêzbûnê ve peywendî bi şêr, piling û ejder ve hatiye danîn. Carinan jî ji bo hîlebazî û dirindebûna dijmin ji heywanên wek rovî, keftar û weşek sûd hatiye wergirtin. Ji bo yekîtî û hêza dijmin bê diyarkirin peywendî bihevrebûna gur, berx û beran ve hatiye danîn. Gur dijminê berx û beran e; lê li hemberî Kurdan bûne yek. Ji aliyê din ve Kurd nabin yek, yekitiya wan tuneye û ji hev direvin. Di *Şerefname*yê de navê heywanan wek leqeb ji bo mirovan jî tê dîtin ku di mînakên **Fîl** Yaqûb û **Ker** Merwan de ev yek li ber çav e. Di vî warî de hin malikên navên van heywanan derbas bûne ev in:

Were Yûsif kurê Ehmed Etabeg
Li ser **şêran** siwar in **rovî weşek**
(Şahanê Lorê Mezin, r.20)

**Gur** û **berx** û **beran** tev de dirazin
Belê Kurdên me îro tev dibazin
(Melekanê Hesenkêf, r.44)

Were, rabe tu Teymûr Xanê bengî
Egîd û mêr û **şêr** û xweş **piling** î
(Şahanê Erdelan, r.29)

Ji me kuştin piling û **şêr** û **ejder**
Di bin destê neyaran bûne rencber
(Beganê Biradost, r.85)

Carinan balindeyên goştxwir ên wek bûm/kund, pepûk, qirak û çikçikan di temsîla dijmin de hatine bikaranîn. Dijminên hatine ser Kurdan û bûne xwedî gotin sembolîze kirine. Ji holêrakirina Kurdan û bidestxistina hakimiyeta wan a ji aliyê dijmin bi van metaforan hatiye diyarkirin. Balindeyên wek kund bi gelemperî di mîtolojiya rojhilat de wek peyamnêrê xerabî û mirinê hatiye dîtin. Carinan jî ji bo rexnekirina beg û axayên Kurd ji metafora leglegê sûd hatiye wergirtin. Bi şibandina hacîlegleg (legleg), axaftinên beg û axayan, wek leqleqa leglegan bê wate û vala hatiye dîtin. Çend malikên li ser van balindeyan ev in:

[343] Di wergera İbrahim Sunkur de derbas bûye.

Kelaşên me li van çolan mirar in
**Pepûk** û **bûm** û **kunda** tev de xwarin
(Şahanê Erdelan, r.28)

Welatê te çi nêçîr e bi yek car
Belê **kund**ê **şikêran** ew hemî xwar
(Beganê Gurgîl, r.41)

Were rabe binêre ey Melik Beg
Beg û axa hemî bûn **hacîlegleg**
(Beganê Hekkarê, r.33)

Li ser birc û sera û xan û mana
Dixwînin **bûm** û **kund** û **çikçikana**
(Beganê Egil, r.51)

Bi carek bûne wêran, mane kavil
Li ser wan xweş dixwînin **kund** û **bilbil**
(Beganê Bedlîs, r.98)

Li alîkî Qizilbaş û yekîtî Rûm
Kirin wêran ji bo **kund** û ji bo **bûm**
(Beganê Şêrwan, r.65)

Di hin malikan de ji bo bextreşî û hêsîrtiya beg û paşayên Kurdan peywendî bi qijik (manendê zaxa/mîna qijika), kund û qulingê ve hatiye danîn. Û bi heywanek wek mêş a du bask a ji koma kêzikan, ji bo bêserokbûn û bêxwedîtiya Kurdan bê diyarkirin sûd hatiye girtin.

Beg û paşa û mîr û şêx û axa
Siya bext in hemî **manendê zaxa**
(Beganê Botan, r.38)

Weke **mêş** in welê nîn e şivanek
Hemî jar in me nîn e kêxwedanek
(Beganê Botan, r.40)

Li ser şaxan dibazin wek **qulinga**
Neyaran ew didane ber tivinga
(Beganê Tercîl, r.72)

Sera û şehr û eywan bûne winda
Li ser wan em dinalin **rengê kunda**
(Beganê Mehmûdî, r.86)

Cegerxwîn, heywanên wek hirç û beraz ji bo nezanî û paşdemayina Kurdan bîne zimên bi kar aniye. Ji bilî vê navê heywanên wek fîl û kerkedan jî ji bo dijminatiya Kurdan a navxweyî hatiye bikaranîn. Ev yek vê peyamê dide ku Kurd ji hev re jêhatîne, lê li hemberî dijmin belengaz û reben in. Carinan ji bo dijmin jî îfadeya hirç û rovî hatiye bikaranîn. Dîsa ji bo xizanî û feqîriya Kurdan bîne berçavan Cegerxwîn, Kurdan şibandiye marên rût û tazî:

Cîhan tev de xwedan mêr û mirov in
Belê Kurdên me tev de **hirç** û hov in
(Beganê Botan, r.40)

Ji ber destê neyaran em dibazin
Li ser şaxa hemî **hirç** û **beraz** in
(Beganê I'taq, r.71)

Li çolan em dibazin **şêr** û kovî
Li ser me bûne paşa **hirç** û **rovî**
(Beganê Dimbil, r.88)

Were rabe binêre zar û zêrçan
Hemî bûne **kelaş û xurdê hirçan**
(Beganê Mirdas, r.50)

Ji bo hev em çi **fîl** û **kerkedan** in
Di bin destê neyaran em şivan in
(Beganê Kilîs, r.63)

Belê îro di bin destê neyara
Eman em rût û tazî **rengê mara**
(Beganê Mehmûdî, r.87)

Navên heywanan ên bi wateya rasteqîn di *Şerefname* û *Şerefnameya Menzûm* de hatine bikaranîn herî zêde heywanên wek hesp û kihêl in. Ji ber di wê heyamê de ji bo çûnûhatinê û şer hesp, kihêl û hwd. hatine bikaranîn, di van berheman de derbas bûne. Ji bilî vê ji ber Kurd bi xwedîkirina heywanan mijûl bûne, îfadeya pez di *Şerefname*yê de gelek derbas bûye. Cegerxwîn jî kêm bi kar anîbe jî cih daye vê îfadeyê. Çimkî di *Şerefnameya Menzûm* de navê heywanan ji wateya yekemîn zêdetir bi mecazî hatiye bikaranîn.

**Tablo 3.3. 3.** Tabloya Heywanên Van Berheman ên bi Wateya Rasteqînî Hatine Bikaranîn bi Vî Awayî ye:

| Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|
| Hesp, Kihêl, Pez, Bizin,<br>Sey(Seg), Kêrvoşk(Kevroşk),<br>Hêstir, Dewar, Mî, Mirîşk,<br>Berx,[344] Teyr, Çêlek,<br>Rûvî, Jûjî,[345]Mar,<br>Ga û Gamêş, Masî | Hesp, Bergîl,<br>Seglaw(Kihêl), Pez, |

[344] Berx di wergera Ziya Avci de derbas nebûye, di wegera İbrahim Sunkur (r.183) û Abdullah Yegin (r.174) de heye.
[345] Rûvî (rovî) jûjî di wergera Ziya Avci de derbas bûne, lê ev îfade di wergera Abdullah Yegin û İbrahim Sunkur de tune ne.

### 3.3.4. Termînolojiya Flora (Alema Nebatan)

Di *Şerefname*yê de heta sefheya behsa Bedlîsê tê kirin navê “bax, tirî, kişmiş, darên bindeqan, darên qeysî û fêkî” bi wateya xwe ya rasteqîn derbas bûne.[346] Navê çîçekan û daran di Sefhaya Bedlîsê de cih girtine. Şerefxan ji bo xweşikiya wê herêmê bîne berçav, behsa çîçekên li herêmê şîn dibin kiriye. Ji xeynî vê, zadên çandiniyê yên genim, ceh, birinc û garis jî hatiye destnîşankirin. Di *Şerefnameya Menzûm* de navê dexl û zadan derbas nebûye. Tenê di risteyekê de “Ji xwe xurdê me Kurdan nanê gilgil” ango nanê garis tê dîtin. Û di *Şerefname*yê de dema behsa şerê di navbera eşîretên Lorî û Beyatî de hatiye kirin, Lorî malên Beyatiyan talan kirine. Di vir dewek zêrzewat îfadeya “ ji **sîr** heta **pîvaz** tiştek ji wan re nehîştin û **wek çîxên sîran** li wan kirin” derbas bûye (Şerefname, r.105). Di *Şerefname*yê de navê nebatan tenê bi wateya rasteqîn derbas nebûye. Di gelek hevokan de bi wateya mecazî û sembolîk jî nebat hatine bikaranîn.

Di *Şerefname*yê de wateya mecazî carinan ji bo têkiliyên siyasî û rewşa îqtidarê hatiye bikaranîn. Di vî warî de hin mînakên ji hevokên nebatên wek gul, bax, dar derbas bûne ev in:

- **Gulek** ji **baxê** vê wezîrtiyê neçinîbû (Şerefname, r.108).

-**Fêkiya dar**a wî**;** Emîr Bedreddîn li ciyê wî rûnişt (Şerefname, r.166).

-Ebû Tahir, mirovê berdestê Etabeg Sungur bû û **darek** bû bi destê wî hatibû **daçikandin (**Şerefname, r.79).

Di hevoka li jêr de dara çinarê ji bo mezinkirina tiştên biçûk hatiye bikaranîn:
-Ji bo xiyarek **çinarekî** ji holê radikir (Şerefname, r.107-İ.S./r.93-A.Y.).[347]

Di *Şerefname*yê de gelek hevokên navên nebatan derbas bûne jî bi hunera xweşnavî ji bo rewşa mirinê ya tehl ku gotina wê xweş nîne hatiye bikaranîn:

-**Xonce**ya **gul**a jiyana wî ya geş ber bi çilmisandinê ve çûye û malavahî xwestiye û çûye ser heqiya xwe (Şerefname, r.133).

---

[346] Heta Sefheya Bedlîsê di wergera Ziya Avci (r.257) de tenê dema behsa herêma Xîzanê hatiye kirin navê dara şîlanê wek keresteyê sitûnê Mizgefta Mezin a Xîzanê hatiye nivîsandin. Ji xeynî vê yekê ji bo heman herêmê nebatên “bax, hemû cure fêkî, tirî û kişmîş” hatiye diyarkirin. Di nusxeya wergera Abdullah Yegin (r.255) de ji bo Xîzanê tevî bexçe û cureyên din darê fêkiyan, navê darên bindeqan hatiye nivîsandin. Di wergera İbrahim Sunkur (r.258) de ji dêvla darên bindeqan darên qeysiyan cih girtiye.

[347]Ev hevok di wergerên Tirkî yên İbrahim Sunkur (r.107) û Abdullah Yegin (r.93) de hatiye bikaranîn.

-Piştî ev Emîrê han ê bi dostên xwe re dost û bi dijminên xwe re dijmin berê xwe daye **bax** û **baxçên** cennetê (Şerefname, r.155).

Di *Şerefname*yê de ji bo îfadekirina dijmin û dijminatiyê peywendî bi nebata "strî û keleman" ve hatiye danîn:

-Pîr Huseyîn karê paqijiya welatê xwe yê cennetmekan ji **striyên** Qizilbaşan temam kir (Şerefname, r.214).

-Ji **strî** û **kelemên** dijmin û muxalîfan, ji bo vegera ser bexçeyên dewlemend ên Misilmantiyê û gihîştina tama zewq û nîmetên rûniştina welatê bab û bapîrên me jime re mayî (Şerefname, r.407).

-Ji bilî Husameddîn Xelîl kî yê me heye ku **striyên** me ji laşên me derîne û kar û barê Loristanê bimeşîne (Şerefname, r.91).

Navên nebatan di *Şerefnameya Menzûm* de hem bi wateya rasteqîn hem jî bi wateya mecazî hatine bikaranîn. Ji bo xweşikbûna welat bê tesewirkirin bi gelemperî navên çîçekan di menzûmeyan de cih girtine. Lê ev xweşikî, xweşikiya serdemên kevn e. Di dema niha de ji ber talankirina dijminan û wêrankirina welat, peywendî bi hişkbûna bax û baxçe, gul û çîçekan ve hatiye danîn. Çend malikên navê nebatan tê de derbas bûne bi vî awayî ne:

Temaşake li **bostan** û **gulîstan**
Hemî zer bûne rengê jar û mestan
(Beganê Hekkarê, r.33)

Ne **gul** mane di baxan de ne **beybûn**
Di bin lingê neyaran çilmisîn, çûn
(Beganê Silêmanî û Qulp û Batman, r.76)

Hemî **naz** û **binefş** û **xunc** û **beybûn**
Demek ew bûn, demek ev bûn hemî çûn
(Melekanê Hesenkêf, r.44)

Hemî îro **kulîlk** û **bax** û **bostan**
Belê çibkim li wan bûye zivistan
(Beganê Botan, r.38)

Bi av û **mêwe** ye xweş nazenîn e
Belê çibkim he ro lê ah û şîn e
(Beganê Şêrwan, r.65)

Bera cîkî **binefş** û **naz** û **sorgul**
Belê îro bi carek bûye kavil
(Şahanê Erdelan, r.29)

**Tablo3.3. 4.**Termînolojiya Nebatan yên bi Wateya Rasteqîn Hatine Bikaranîn:

| Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|
| **Navên Çîçekan:** Gul, Beybûn, Rihan, Çiçek<br>**Dar:** Bax, Rez, Darên Şîlanê, Darên bindeqan, Darên Qeysiyan, Darên Sêvan, DaraPayizê(A.Y.),DaraÛdê(A.Y.)[348],Daristan.<br>**Fêkî:** Karçîn(Hermî),Tirî, Sêv(Sêvê Xelatê)<br>**Nebatên Din:** Giya, Kişmiş, | **Navên Çîçekan:** Gul, Beybûn, Xunc,<br>Binefş, Naz, Kulîlk,Gulîstan,<br>**Dar:**Bax, Rez,<br>**Bexçeyên Zerzewatan:**Bistan(Bostan)<br>**Fêkî:**Mêwe |

### 3.3.5. Termînolojiya Amûran

#### 3.3.5.1. Nîşaneyên Hikumdariyê:

Di *Şerefname*yê de bi gelemperî amûrên hikumdariyê bi wateya xwe ya yekemîn hatine bikaranîn. Amûrên wek "tac, text, seray, şûr, kemer" ji bo mîrektiyan tevan hevpar in. Mîrektiyên Diyarbekir û Cezîrê, Dînewer û Şehrezor, Lora Mezin, Lora Biçûk û Eyyûbî "al"a saltanat û serxwebûnê bilind kirine. Wan tevî amûrên"tac, text, seray û al" li ser navê xwe xutbe dane xwendinê û sikke dane çêkirin. Hil'at bi gelemperî ji aliyê dewletên cîran ên mezin Osmanî û Sefewiyan ve ji mîrê Kurdistanê re wek nîşaneya hikumdariyê hatiye dayin. Ji bilî vê Mîrektiyên Erdelan, Hekkarî, Imadiyyê û Cezîrê (Ezîzan, Gurgil, Finik, Hesenkêf) herçiqas negihîştibin dereceya serxwebûnê jî hinek caran li ser navê xwe xutbe dane xwendin û sikke çap kirine.

Wek di mînaka "…gelek **hîl'at** û hediye bi ser de rêtin. **Şûr** û **kemerek zêr** û gelek xelatên biqîmet jê re şandin û ew di nav hevalên wî de serfiraz û serbilind kir (Şerefname, r.106)" de tê dîtin hîl'at, şûr û kemer wek nîşaneya hikumdarî û serbilindî hatine dayin.

Hingustîl di *Şerefname*yê de wek nîşaneya soz û peymanê ye. Dema behsa mîrê Lora Biçûk Şuca'eddîn hatiye kirin ku Seyfeddîn Rustemê biraziyê wî ji bo kurê wî Bedir bikuje wek nîşana fermanê **hingustîla apê xwe** Şuca'eddîn jê

[348] Di wegera Abdullah Yegin de bi wateya mecazî de dara payîzê derbas bûye: "Tava gerdûnê ronî dikir, wek ewrê avrêlê cewher, wek dara payîzê derhem dibarand"(r.455). Dîsa di vê nusxeyê de ji bo dara ûdê (öd ağacı/aquilaria agallocha) hatiye gotin ku: " Saturna pîr-î îdrak di keleya felekê de îkamet dikir, dara û dê ya ji Komarê anîbû danî buxdanka tavê…"(r.456).

stendiye(Şerefname, r.89). Dîsa agahiyên di derheqê Mîr Îbrahîmê kurê Mîr Hacî Mihemmedê mîrê Bedlîsê de dema behsa Siltan Hesen hatiye kirin, ji bo ji Emîr Îbrahîm re bide zanîn, şert û mercên lihevhatinê qebûl kirine. Ji bo bîr û bawermendiya Emîr Îbrahîm pê were **hingustîla xwe** jê re şandiye (Şerefname, r.447).

Dehol jî di *Şerefname*yê de wek amûrê hikumdariyê cih girtiye. Wek ku di agahiyên di derheqê Melik Nasirê Eyyûbî de derbas bûye nîşaneya dahol bi vî awayî ye: "Izzeddîn Turkmenî û Qataya, ligel sêsed koleyên helbijartî û mêrxas ên Melik Salih ji destê Nasir rizgar bûn û ber bi Şamê ve bi rê ketin. Di rê de rastî grûbek eskerên Melik Nasir ên ku giraniya leşker, xezîneyên wî, **dehol**, al, alet û edewatên din dibirin, hatin. Izzeddîn, Qataya û sêsed kesên bi wan re, avêtin ser karwên û ew tar û mar kirin. Şemseddîn Lûlû yê sipartedarê Melîk Nasir bi dîl ket destê wan. Ew wekî laşê pez bi 'erdê re kişandin û kuştin. **Dehola** Melik Nasir xird û xaş kirin û xezîneyên wî hemû talan kirin."(Şerefname, r.128). Di agahiyên di derheqê Mîr Budakê kurê Mîr Ebdalê ji mîrên Baban de jî ev îbare derbas bûye: "Bi navê 'Mîrsancaqtî' yê memûr û wezîfedarên xwe şand navçe û derûdoran û **dehul** û al dan destê wan"(Şerefname, r.328).

Wek elametê hikumdariyê û di nav diyariyên hikumdaran ên herî bi nirx de şûr û kemerên zêr hatine destnîşankirin. Ji bo tesdiqkirina soz, peyman, ferman û beratan muhr û tuxra hatine bikaranîn. Di *Şerefname*yê de navê muhr û tuxrayên hikumdarên wek Tîmûr û padîşahên Osmanî derbas bûne. Çend hevokên di vî warî de bi vî awayî ne:

-Fermana paşdevegera wî bi serbilindî, bi serfirazî û bi dewletî ya ji bo merkeza welatê wî hat dan û ev fermana han bi **muhra berz** a ji nexşên Tîmûr hat tesdîqkirin (Şerefname, r.141).

-Tîmûrleng,...fermana Fermanrewatiya Loristanê ji bo Muzafferu'l-dîn **muhr** kir û lê vegerand (Şerefname, r.85).

-Şandibû ber peşkên serderê rehmetî Sultan Murad Xan û serrûpela vê defterê bi **tuxra** Sultan dabû xemilandin (Şerefname, r.356).

Kon (xêvet) û çadirên hikumdartiyê jî bi gelemperî ji bo hikumdarên dewletên mezin ên wek Dewleta Osmanî, Tîmûr, Cengîz û Sefewî hatine bikaranîn. Ev kon bi navê otaxa hikumdar hatiye naskirin. Wek mînak:

-Dema ku **xêvet** û baregahên rengîn li ser erdê bêserûbinî yê xanê Teter berpa kirin, bilindahiya kopên sitûnan û çîtên **kon û çadirên hikumdaran,** ‘ewr ji ber rojêdan alîkî (Şerefname, r.141).

-Qîmet û bihayê **xêvet** û **otaxên** we, li ber çavên me ferqa wan ji pîsîtî, rêxa ga û gamêşan pê ve ne tişteke (Şerefname, r.189).

Amûrên hikumdariyê di hin cihan de bi wateya mecazî jî hatine bikaranîn. Ji destderketina rêvebiriyê, windakirina welat bi riya ji holêrakirina van nîşaneyan hatiye destnîşankirin:

-Tîmûr welat ser û bin dikirin, piştî şewitandina **text** û **tacan,** ew îstila dikirin (Şerefname, r.84).

-Hersê Kevirên telaqê bûka xwe (welatê xwe) bi **tac** û **text** ve avêt (Şerefname, r.128).

Di *Şerefnameya Menzûm* de jî amûrên hikumdariyê ji aliyê Cegerxwîn ve carinan ji bo mezinahî, şan û îhtişama desthilatdariyê; carinan jî ji bo temsîla ji destderketina îqtidarê hatine bikaranîn. Çend malikên navên amûrên hikumdariyê tê de derbas bûne ev in:

Erê **textê** te bû gerdûnê esman
Sîpah û leşkerê te tev ji Kurdan
(Şahanê Lorê Biçûk, r.22)

Belê nav û nîşan û **tac** û **ala**
Ji gerdûş ta bi gerdûn çûne bala
(Şahanê Erdelan, r.32)

**Kemerbest** e bi destê xwe bigir şûr
Bike wêran welatê lawê Tîmûr
(Şahanê Erdelan, r.30)

Şûca’eddîn kurê Xorşîd tu şah î
Belê zanim xwedî **text** û **kulah** î
(Şahanê Lorê Biçûk, r.22)

Were, rabe Muhemmed lawê Mamûn
**Direfş** û **tac** û **textê** me hemî çûn
(Şahanê Erdelan, r.29)

Hilo xan rabe ser xwe rûnê ser **text**
Belê îro ne **text** maye ne jî **bext**
(Şahanê Erdelan, r.30)

Tu Dewlet-xanim î xatûn tu heste
**Heyasa zêr** li pişta xwe vebeste
(Şahanê Erdelan, r.30)

Ne ew beg û ne ew deng û ne nîşan
Ne ew **tac** û **sera** û birc û eywan
(Beganê Kurdikan, r.70)

Cegerxwîn ji bo desthilatdariyê peywendî bi mîta damezrîner a Kurdan dastana Kawa re daniye. Ji xeynî vê ew, ji ber nêrîna eslê Kurdan ji Aryanan tê di vê dîwana xwe de gelek hêmanên Îranî bi kar anine. Yek ji wan jî hikumdarên Îranê yên efsaneyî/mîtolojîk ên Behmen, Xusro, Perwîz û Cemşîd in. Cegerxwîn di vî warî de xwestiye di navbera hikumdarên Îranê yên di nav civaka rojhilat de bi nav û deng in û mîrên Kurdan de peywendiyê deyne. Wî xwestiye ku vê girêdanê di hişmendiya gelê Kurd de bicî bike. Hin malikên desthilatdariya bi vî rengî diyar kirine ev in:

Tu deyne ser serê xwe **tacê Perwîz**
Bikin cengê digel lawanê Cengîz
(Beganê Botan, r.39)

Were rabe ji Çemişgizk tu Milkêş
**Direfşa Kaweyanî** zû bide pêş
(Beganê Çemişgizk, r.45)

Erê Gerşasifê nazdar û xweş rû
Were rûne li **textepayê Xusro**
(Şahanê Lora Biçûk, r.22)

Ji Bexdayê tu bigre ta bi Deynûr
Li te pîroz e ew **tac rengê Şapûr**
(Beganê Kelher û Derteng, r.91)

**Tabloya 3.3.5.1.**Nîşaneyên Hikumdariyê:

| Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|
| Text,Tac, Seray,Hil'at,<br>Al, Kemer, Xutbe, Şûr, Dehol,<br>Pere/Sikke, Kon û Çadirên Hikumdaran,<br>Hingustîl, Muhr/Tuxra, | Tac û Gacî/Kulah, Text/Textepa,<br>Seray, Durefş û Al, Heyase (Kember),<br>Şûr, Def |

### 3.3.5.2. Amûrên Şer:

Amûrên şer ên navên wan hatine zikrkirin amûrên wek "şûr, rim, xencer, tîr, kevan û hwd. in. Çekên agirber ên wek tivingê ji bo sedsalên dawî yên *Şerefname*yê hatine bikaranîn. Lê di *Şerefnameya Menzûm* de ji ber Cegerxwîn ji dema niha bangî dema borî kiriye çekên agirber ji bo demên van çekan tê de nehatine bikaranîn jî daye. Bi gelemperî di wateya xwe ya yekemîn de hatibin bikaranîn û şerên giran û dijwar tesewwir bikin jî carinan bi awayî mecazî jî di *Şerefname* û *Şerefnameya Menzûm* de cih girtine. Çend hevokên di *Şerefname*yê de navên amûrên şer derbas bûne ev in:

-Siyên hev bi **tîran** dihingavtin (Şerefname, r.152).

-Vizîna **tîran** û şirqe şirqa **şûran** guhê asîman kerr dikirin (Şerefname, r.176).

-Bi berê beyana sibê ew bi vê hêza hundur re bûn yek û bi **tiving**, **tîr, rim** û **şûran** êrîşê Emîr Îbrahîm û Boxtiyên pê re kirin (Şerefname, r.190).

-Bi **tîr** û **kevanên** xwe yên rût ve hatin hewara leşkerê wî… (Şerefname, r.330).

-Dengê şêr û şerkeran, gurmîna **mencenîq** û **berqenîkan** nizm û bilind dibûn û guh ker dikirin; **gulle** û **tîr**, ber bi jor û ber bi xwarê ve dihatin reşandin (Şerefname, r.446).

-Li ber **topên giran** û **mencenîqên mezin** birc û surh xera bûn… (Şerefname, r.476)

Di *Şerefnameya Menzûm* de amûrên şer ji bo xelasî, tolhildan û rizgariyê pêwîsthatiye dîtin. Ango riya xelasiyê şer û ceng e. Hin malikên navên amûrên şer tê de derbas bûne ev in:

Bikuj dijmin bi wan **tîrên zerfeşan**
Ji wan bigre îro tu xwîna Kurdan
(Şahanê Lora Biçûk, r.22)

Kemerbesto bide **gurz** û **kilinga**
Were Tirkan weke şêr û pilinga
(Beganê Kurdikan, r.70)

Bi **gurz** û **xencer** û **tîran** û **daran**
Ji Kurdistanê derxin van neyaran
(Şahanê Lora Biçûk, r.22)

Bike dengê **tiving** û **top** û Buxtan
Herin bala di her kêlîk û wextan
(Beganê Botan, r.39)

Hesen rabe temaşake li deştê
Binêr dengê **tematêkan** çi xweş tê
(Şahanê Erdelan, r.28)

Bi **tîrê zerveşan** û **şûrê devtûj**
Bikuj dijmin bikutî **gurzê dilsûj**
(Xondekaranê Kurd, r.14).

Wek li jor jî hatiye diyarkirin Cegerxwîn ji ber nêrîna eslê Kurdan ji Aryanan tê di vê dîwana xwe de gelek hêmanên Îranî bi kar anine. Di gelek malikan de amûrên şer bi hikumdarên Îranê yên efsaneyî/mîtolojîk Rustem, Dara, Xorşîd û Behram re daye berçavan. Di navbera wan û mîrên Kurdan de peywendî hatiye

danîn. Hikumdarên Îranê wek pêşewayê mîrê Kurdan hatiye dîtin. Di vî warî de hin malikên hatine nivîsandin ev in:

Tu deyne ser serê xwe tacê Cemşîd
Bi destê xwe tu bigre **şûrê Xorşîd**
(Beganê Palo, r.53)

Egîd in tev wekî **Ristem kurê Zal**
Dikin cengê bi **şûr** û **gurz** û **mertal**
(Beganê Şêrwan, r.66)

Bi destê xwe tu bigre **gurzê Arî**
Bike agir bi carek jê bibarî
(Beganê Mirdas, r.50)

Were şêrê me Kurdan ey tu Bîram
Bi destê xwe tu bigre **şûrê Behram**
(Beganê Behdînan, r.36)

**Tablo 3.3.5.2.** Navên Amûrên Şer ên Şerefname û Şerefnameya Menzûm:

| Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|
| **Amûrên Şer ên Destan:** Şûr, Mertal, Tîr, Kevan, Xencer, Kalan (Kevlanêşûr û xençeran), Rim, Benên Kemînan, Xelek, Mencenîq, Berqenîk (Amûra şer a kevira davêje),<br>**Amûrên Şer ên Agirber:** Tiving, Tebance, Gulle, Topên giran. | **Amûrên Şer ên Destan:** Şûr, Kalan(Kevlanê şûr û xençeran), Mertal, Tîr, Kevan, Xencer, Kemend, Ço, Dar, Qefda Gurd, Gurz, Kiling(Nebatek e ku bistîkên darê wê stûr in),<br>**Amûrên Şer ên Agirber:** Tiving, Top, Tematîk (Çeka Otomatîk/Tematîk), Rext, Fîşek, |

## 3.3.6. Termînolojiya Îta'et û Dagirkeriyê

### 3.3.6.1. Hêmanên Îta'etê:

Di *Şerefname*yê de ji bo destnîşankirina îta'êtê şibandin herî zêde bi organa "serî(serê mirov)" hatiye danîn. Bi heman awayî ji organên laşê mirov "dest" jî bi wateya hêza otorîte û desthilatdariyê hatiye bikaranîn. Di *Şerefnameya Menzûm* de ji dêvla "serî" "dest" Di vir de hem ji bo îta'etê hem jî ji bo dagirkeriyê hêmana sereke "dest" e.

Di *Şerefname*yê de ji bo hêmanên îta'etê, mirov dikare van hevokan wek mînak bide ku bi gelemperî organên laşê mirovan bi hin peyvên din re bûne wek qalib. Û ji bo îta'etê bi wateya mecazî hatine bikaranîn. Ji xeynî vê bi wateya yekemîn maçîkirina **dest**ê siltanan jî wek nîşaneya îta'etê hatiye dîtin:

- Sê caran bi leşkerên xwe yên giran êrîş anî ser Tekle ku dixwest **serî lê bitewîne** (Şerefname, r.80).

-Herkes di warê pêkanîna hemû karan de **serî li ber wî tewandin** û îta'eta wî kirin (Şerefname, r.194).

-…mîr û begên Kurdistanê bi destê xwe û **bi stûxwarî** bi hev re çûn Seraya Şah Tehmasb û **îta'eta xwe pêşkêşî wî kirin** (Şerefname, r.276).

-Fermanrewatiya Loristanê bi tevayî **ket destê Husameddîn Xelîl** (Şerefname, r.92).

-…ji ber vê jî ji ser xwe çû, **guhê xwe neda** fermana Tîmûr (Şerefname, r.167).

- Riya siyaseta **devê germ** û **zimanê nerm** baştir dît (Şerefname, r.136).

Di *Şerefnameya Menzûm* de îta'et ji serî tewandin zêdetir bi awayî bindestî, belengaziya gelê Kurd hatiye destnîşan kirin. Kurd neçar mane ku îta'êta dewletên serdest qebûl bikin:

Were Şah Rustemê çalak û serdest
Binêr Kurdên te tev de bûne **bindest**
(Şahanê Erdelan, r.31)

Ji pêşî ve we em xistin **binê dest**
Heta îro hemî jar û hemî mest
(Beganê Mirdas, r.50)

Xidir Beg rabe ser xwe ey tu serbest
Erê sûcê we ye em **bûne bindest**
(Beganê Sason, r.57)

Hemî ev Lor û Gor û Bot û Zaz
**Di bin destê neyaran de** belengaz
(Beganê Sason, r.57)

### 3.3.6.2. Hêmanên Dagirkeriyê:

Hêmanên ji bo dagirkeriyê bi piranî ji organên mirov "dest" û ji hin peyvên din pêk hatine. Wek mînak:

-Leşkerên wî ku ji serma ji taqet û mecal ketibûn, dixwestin heta ev hişkesayî û serma di ser wan re derbas be, **dest ji ser girtina vê kela han hilde** (Şerefname, r.74).

**-**Hêdî hêdî cihê pê Surxabê kurê ‘Iyar ê dijminê xwe teng û **destê wî kurt kir** (Şerefname, r.88).

-Qralê Beyatê ku yekî Tirk bû, êrîşê ser Loristanê kir; **dest avêt** talan, birîn û şêlandina xelkê (Şerefname, r.89).

**-**Seranserê welatê wan bi xirûxalî **ket destê** Tirkmenên Aqqoyunî (Şerefname, r.169).

Ji xeynî organên “serî” û “dest” hin organên din ên wek “çav” “guh” “dev”, “ziman” û “gewrî” jî bi wateya îta’et û dagirkirinê hatine bikaranîn. Çend mînakên di vî warî de bi vî awayî ne:

-**Çav berda** welatê Bedir (Şerefname, r.74): Daxwaza bidestxistina welatê wan kirin

-Ben li **gewriya wan** aland û hemû carê ji cara pêşî pîstir ew raqewirand û şikand (Şerefname, r.170).

- Bûn agir û pêt ketin **pêsîra wî** û xewên şevan lê heram kirin (Şerefname, r.101).

Herçiqas *Şerefnameya Menzûm* de jî bo îfadeya îta’et, dîlgirtin, bindestî û belengaziyê herî zêde ji organên laşê mirov “dest” hatibe bikaranîn jî ji xeynî vê, di vê berhemê de organên wek rû (serçav), çehr, pişt, gerden (gewrî), penc (neynûkên tûj û dirêj), ling û poz jî tên dîtin. Çend malikên bi vî awayî hatine sazkirin ev in:

Ji ser me zû tu rake **destê dijmin** Nemane **tûz** û **reng** û **çehr û gwîne**
Tu şah î em ji bo te tev de Kurd in Dilên Kurdan bi carek bûne xwîne
(Şahanê Deynûr, r.16) (Şahanê Erdelan, r.27)

Belê kûra cîhanê tev de agir Belê dîl û şikestî, **dest** û **gerden**
Pêtek rakir **bi ser çavê me dakir** Di çalê de dinalin rengê Bêjen
(Şahanê Lora Biçûk, r.23) (Xondekaranê Kurd, r.13)

Binêre ev Fireng û Ingilîz in Were îro binêre em **bin lingan**
Li ser **pişta me Kurda** tev dilîzin Xelas nabin **ji ber destê Firengan**
(Beganê Suhran, r.80) (Padîşahanê Eyûbî, r.25)

| | |
|---|---|
| Bi qîrîn û bi ah û nal û zar e<br>Belengaz e **di bin pencê neyare**<br>(Beganê Botan, r.40) | Belengazên me **dest** û **pê** di bendan<br>Nexweş mane di kuncê xan û zindan<br>(Beganê Gurgîl, r.41) |
| Hemî îro **di bin destê neyar in**<br>Bi carek xwîn ji çavên wan dibarin<br>(Beganê Egîl, r.52) | Were Mehmûd binêre gul'ezara<br>Hemî sor in **li ber pozê neyaran**<br>(Beganê Şêrwan, r.66) |

**Tablo3.3. 6.** Hêmanên Îta'et û Dagirkeriyê:

| Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|
| Ser, Dest, Pêsîr, Gewri,<br>Dev, Ziman, Guh, Çav,<br>Pişt, Stû, Mil, Pî(Pê),<br>Dil, | Dest, Gerden, Serçav,<br>Pişt, Ling, Pê, Penc,<br>Çav, Poz, Çehr(Gwîn),<br>Dil |

### 3.3.7. Termînolojiya Unwanên Siyasî

Unvanên siyasî yên di *Şerefname*yê de ji bo rêvebirên Kurdan hatine bikaranîn ji unwanên wek "mîr, fermanrewa, beg, emîr, xan, melik, pîr û hwd." pêk hatine. Ji xeynî vê, rêvebirên Kurdan unwana dînî ya "şêx" ku dawiyê wesfê siyasî hilgirtiye û unwana "serdar" a serleşkerî jî girtine. Ji bo rêvebiriya jinan di *Şerefname*yê de unwana "xatûn" hatiye bikaranîn. Wek serdemek desthilatdariyê tenê navê Dewlet Xatûn a Jina Izzeddîn Mihemmed tê dîtin. Desthilatdarên Sefewî bi gelemperî bi unwanên "kîsra, şehînşah û şah" hatine naskirin. Di *Şerefname*yê de ji bo hikumdarên Osmanî unwanên wek "sultan, gazî, padîşah, heqan û xan" hatine bikaranîn. Desthilatdarên Qereqoyuniyan bi unwana "qere", desthilatdarên Tirkmen ên bereya Dewleta Cengîz bi unwana "xan û qaan" hatine nasîn. Ji bo Tîmûrleng unwana "emîr" ji bo hikumdarên Rûm jî unwana "qeyser" hatine destnîşankirin. Ji xeynî vê ji bo kurê hikumdarên Osmanî unwana "şehzade" derbas bûye Di Dewleta Tîmûr de ev yek wek "mîrza"hatiye bikaranîn. Ji bo hin wezîfedarê hikumetê yê piştî hikumdar tên jî wek "beg, paşa, mîrêmîran, mîraxûr, axa, walî û hwd." tê dîtin. Wek mînak di *Şerefname*yê de çend hevokên unwanê hikumdaran derbas bûne ev in:

-**Melik** Efdal, mirovekî gelek bi fezîlet û bi edeb bûye (Şerefname, r.119).

-**Atabeg** Yûsif **Şah** di şer û cengan de xizmetek gelek hêja ji Abaqa **Xan** re kir (Şerefname, r.81).

**-**Piştî girtina biraziyê wî Memûn **Begê** kurê Beyke **Beg,** kar û barê hukumeta Şehrezor û Dalamê bi rê ve bir (Şerefname, r.135).

**-**Piştî Besat **Sultan** çû rehma Xwedê, Tîmûr **Xan**ê biraziyê wî desthilata hukumeta Erdelan girt destê xwe (Şerefname, r.137).

-Îskender **Paşa,** ji tesîra van bûyeran ku bi xwe re anîbûn holê îstifade kir û ji bo desthilata Hekkariyê bidin destê Zeynel **Beg**, rewşa wî pêşkêşî serderê **Sultan** Suleyman kir (Şerefname, r.149).

Bi heman awayî di *Şerefnameya Menzûm* de jî gelek unwanên siyasî yên wek "beg, mîr, melik, xan, şah û hwd." derbas bûne. Carinan van unwanan rasterast bi navê hikumdaran re carinan jî piştî navê wan an jî bêyî navê wan hatine bikaranîn. Di unwanên siyasî de *Şerefnameya Menzûm* girêdayî *Şerefname*yê maye û ji xeynî unwanên *Şerefname*yê tu unwanên din nehatine bikaranîn. Hin malikên *Şerefnameya Menzûm* ên unwanên siyasî derbas bûne ev in:

**Etabeg** Tigle rabe ey ciwanmêr
Tu deyne ser serê xwe tacê tev zêr
(Şahanê Lorê Mezin, r.19)

Elî Erxûn tu rabe ey **Etabeg**
Ji me kuştin neyaran sed hezar lek
(Şahanê Lorê Mezin, r.19)

Cemaleddîn Xidir **Paşa** tu **şah** î
Xwedanê leşker û kom û sipahî
(Şahanê Lorê Biçûk, r.22)

Elî Heyder, **Melek** Efdal tu rabe
Li tûzê me binêre çûn xerab e
(Padîşahanê Eyûbî, r.25)

Were **padîşehê min** ey tu Ilyas
Egîd û pehlewan û mêr û gernas
(Şahanê Erdelan, r.27)

Were **Sultan** Elî, rabe ji gorê
Temaşake welatê Şehrezorê
(Şahanê Erdelan, r.29)

**Emîr** Îsa tu rabe ey serifraz
Binêre em çilon bûne belengaz
(Beganê Botan, r.37)

**Beg** û **paşa** û **mîr** û **şêx** û **axa**
Siya bext in hemî manendê zaxa
(Beganê Botan, r.38)

**Tablo3.3. 7.** Unwanên Siyasî**:**

| Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|
| **UnwanênHikumdaran:** Emîr, Gazî, Fermanrewa/Mîr, Siltan, Heqan, Qere, Padîşah, Xan, Şah, Împerator, Beg, Melik, Qaan(Hikumdarê bereya Cengiz Xan), Xatûn(Dewlet Şah Xatûn), Pîr, Şehinşah, Qral, Etabeg, Kisra, Qeyser, **UnwanênKurênHikumdaran:**Mîrza, Mîrzade, Şehzade, **UnwanênWezîfedarênHikumdaran:**Efenî Wezîrtî,Axa,Mîrêmîran,Mîraxur,Walî, Muxtar(Z.A.), Qeymeqam(Z.A.) | **Unwanên Hikumdaran:** Şah, Beg, Mîr,Kesra(Kisra),Şehinşah, Padîşah,Etabeg,Kemerbest, Melik,Pîr,Xatûn(DewletXanim), Misyu(Misyu Rîşar), Key, Keyxwe **Unwanên Kurên Hikumdaran:** Keyzad **UnwanênWezîfedarênHikumdaran:** Axa, Paşa (Çend mîrên Kurd jî ji aliyê hikumdarên Osmanî ve unwana "paşatiyê" girtine) |

### 3.3.8. Termînolojiya Neteweya Kurd

#### 3.3.8.1. Eşîretên Serekê yên Kurdan

Şerefxan, eşîretên Kurd ên sereke wek **Kirmanc (Kurmanc), Lor, Kelhur** û **Goran** kirine çar beş. Ev yek wek dabeşkirina zaravayên Kurdî jî tê dîtin. Li gor çavkaniyan, lêkolînerê herî zû yê ev dabeşkirin kiriye Şerefxan e. Li pey Şerefxan gelek lêkolîner vê dabeşkirinê li gor bikaranîna ziman ji nû ve saz kirine. Di nav dabeşkirinê de Zaza û Soran jî cihên xwe girtine. Lê wek me li jor jî got, dabeşkirina Şerefxan tenê ne li ser zaravayên ziman e. Dabeşkirina wî di warên ziman, urf û adet û rewşên civakî yên eşîretên sereke de ne. Di *Şerefname*yê de ji xeynî van her çar eşîretên sereke navên gelek eşîretên Kurd derbas bûne ku ev yek tena serê xwe dibe mijara lêkolînê. Ji ber ne di nav çarçoveya xebatê de ye tevahiya eşîretên di *Şerefname*yê de derbas bûne di vê xebatê de cih negirtin. Çend hevokên li ser vê dabeşkirinê bi vî rengî ne:

-Eşîreta **Lor** û Beyat li nêzîkî qesabeya Berucerdê ketin himber hev û şer qewimî (Şerefname, r.105).

-…birrek mirovên betal ên **Kurd** û **Goran** li derûdora xwe berhev kirin û ji bo rakirina Mehdî Sultan berê xwe da Loristanê (Şerefname, r.105).

-…êrîş bir ser welatê kurê Omer Begê **Kelehûrî** û ew talan kir (Şerefname, r.137)

Ji aliyê din ve Cegerxwîn jî di *Şerefnameya Menzûm* de cih daye navê gelek eşîretên Kurd. Ji her çar eşîretên sereke navê Kelhur di risteyên *Şerefnameya*

*Menzûm* de derbas nebûye, valahiya vê eşîretê bi hin eşîretên din tijî kiriye. Di nav wan de Zaz (Zaza) û Soranên di dabeşkirina zaravayan de cih girtine jî hene ku navê Zazan di gelek malikan de bi bîr aniye. Ji aliyê din ve Cegerxwîn li gor kronolojiya *Şerefname*yê di derheqê begên Kelhûrî (Kelher) de menzûmeyên Beganê Kelher û Pilingan, Beganê Kelher û Derteng û Beganê Mahîdeşt nivîsandiye. Lê ji xeynî navê van menzûmeyan navê Kelhûr (Kelher) di *Şerefnameya Menzûm* de derbas nebûye. Lewma di tabloya jêr de tevî navê Kurmanc, Lor, Goran navên Zaz û Soran jî hat nivîsîn. Ji van herdu navan Soran wek eşîret derbas bûye lê navê Zazan di *Şerefnameyê* de nayê dîtin. Ji xeynî navê eşîretên me di tabloya jêr de destnîşan kir navê eşîretên "Bext/Buxt, Gerd, Baban, Mîl, Zîl, Zîbar, Çav, Banokî, Hiweydî, Dilxeyran, Bilbas (Belbas), Qewalîs, Mûtkî (Modkî), Kîsan (Qeysanî) û Rojkan" jî di malikên *Şerefnameya Menzûm* de derbas bûne. Çend malikên di vî warî de bi vî awayî ne:

Perîşan bûne **Lor** û **Zaz** û **Kurmanc**
Li ber tîrên neyaran bûne armanc
(Şahanê Deynûr, r.16)

Biziştin tev ji ber êşan û derdan
Ji **Loran** ta bi **Zazan**, **Bext** û **Gerdan**
(Şahanê Erdelan, r.27)

Çi **Loran** û çi **Goran** û çi **Zazî**
Hemî îro dikin feryad û gazî
(Beganê Behdînan, r.35)

Binêre **Lor** û **Gor** û **Buxt** û **Zazan**
Hemî îro bi carek bûne nazan
(Beganê Egîl, r.51)

Şeref rabe binêre kanî **Bilbas?**
**Qewalîsî** bi carek mane pêxwas
(Beganê Bedlîs, r.97)

Ne **Baban** man, ne **Soran** man ne **Belbas**
Ne **Zaza** man ne **Botan** man ne gernas
(Beganê Baban, r.82)

Ne **Mîl** mane ne **Zîl** mane ne **Goran**
Ne **Zîbar** û ne **Çav** mane ne **Loran**
(Beganê Baban, r.82)

Diyaeddîn tu rabe wer binêrin
Erê **Rojkan** egîd û mêr û şêr in
(Beganê Bedlîs, r.98)

**Tablo3.3.8.1.**Eşîretên Sereke yên Kurdan:

| Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
| --- | --- |
| Kirmanc(Kurmanc),<br>Lor,<br>Goran<br>Kelhur, | Kurmanc,<br>Lor,<br>Goran,<br>Zaz, Soran |

## 3.3.8.2. Netewe û Dewletên bi Kurdan re Peywendîdar in

Hin netew û dewletên di *Şerefname* û *Şerefnameya Menzûm* de derbas bûne bi Kurdan re li ser heman cografyayê dijîn û cîranên wan in. Van netew û dewletan ji yên Tirk (Selçukî, Osmanî, Aqqoyunî, Qereqoyunî), Fars û Ereban pêk hatine. Ji xeynî vê, di van berheman de behsa hin dewletên dagirker ên Tîmûr, Cengîz Xan û hikumdarên ji nesla Cengiz Xan ên parzemîna Asyayê jî cih girtine. Di *Şerefname*yê de ji neteweyên Ewropî yên dagirker Freng ten dîtin. Cegerxwîn ji neteweyên Ewropî Ingilîzan jî di warê dagirkeriyê de lê zêde kiriye. Çimkî piştî nivîsandina *Şerefname*yê di navbera Ingîlîz û Kurdan de rasterast diyalog hatine dîtin. Ji dêvla dewletên wek Selçukî, Osmanî û Sefewî Cegerxwîn navê Tirk û Qizilbaş bi kar aniye.

Ji aliyê dînî ve Kurd wek Sunnî hatibin qebûlkirin jî hem di *Şerefname*yê de hem jî di *Şerefnameya Menzûm* de navê Êzidiyan (Yezidiyan) jî hatiye yadkirin. Ji aliyê baweriyê ve dijminê herî mezin wek Qizilbaş hatine dîtin. Di van berheman de ji aliyê dînî ve milletên wek Kafir/Gawir tên dîtin hene. Di *Şerefname*yê de gotina kafir wateyek neyînî di xwe de dihewîne. Lê di *Şerefnameya Menzûm* de tenê di malikekê de bi wateya milletê Xeyrîmuslîm hatiye bikaranîn. Jixwe berî Şoreşa Frensayê pergala netewî li ser dîn ava bûye (Misilman û Xeyrîmuslîm) û împeratoriyên mezin ên pir-netewî hebûne. Piştî Şoreşa Frensayê ev nêrîn guheriye û netewe-dewlet derketine holê. Van netewe û dewletan bi gelemperî bi peywendiyên siyasî ketine nav diyalogê. Herçiqas ji bo xurtkirina peywendiyên siyasî be jî di navbera wan de zewacên siyasî pêk hatine. Ew ji hev re qîz dane û stendine, bûne xizmên hev. Çend hevokên *Şerefname*yê yên navên wan netewe û dewletan derbas bûne ev in:

-Mihemmedî ji zindanê bê rizgarkirin û wekî rehîne li ba fermandarekî **Qizilbaşan** ê mezin bê danîn (Şerefname, r.102).

-Serwendê kurê Yunis Bitarqe kar û barên Bedlîsê dimeşand, hukumdar û keşîşê Mûş û Sasonê jî **kafirekî** navê wî Senaser bû (Şerefname, r.398).

-…Ubeyd Xanê **Ozbekî** êrîş anî ser Îranê û gihîşt Xorasanê (Şerefname, r.99).

-Ji Dîwana Şah Mihemmedê **Sefewî** jî fermana şahîtî ya fermanrewatiyê jê re derket (Şerefname, r.104).

-El-'Adid ê Xelîfeyê Îsmaîlî yê Misrê ku ji destê **Frengan** bêzar bûbû, xwe avêt ba Sultan Nureddîn Medmûd ku bi hawara wî de biçe (Şerefname, r. 108).

-…di dawiya **Dewleta Cengîz** de, dest daniye ser wilayeta Şehrezorê (Şerefname, r.133).

-…Sultan Suleymanê **Osmanî,** xwest bi destê Sultan Huseyîn Beg ê Fermanrewayê Imadiyyeyê bi hinek emîrên Kurdistanê yên din ve wilayeta Şehrezorê îstila bike (Şerefname, r.134).

Di *Şerefnameya Menzûm* de neteweyên ku derbas bûne. Tev dijminê Kurdan in, axa Kurdistanê dagir kirine. Di navbera wan û Kurdan de tu peywendiyên dîplomasî, peyman û merivahî tune ne. Li gor fikra Cegerxwîn welatên cîran ên Kurdan her tim ji bo berjewendiyên xwe tevgeriyane. Wan xwestine neteweya Kurd bindest be, ew wek dijmin dane berçavan. Di encamê de wek ji têkiliyên *Şerefname*yê de jî hatiye dîtin her tim Kurd bi dewlet û neteweyên derûdora xwe re di nav şer de bûne. Çend malikên li ser vê rewşê ev in:

Belê **Tirk** û **Ereb**, **Rûm** û **Ecem** şûr
Dikêşin ew li ser me rengê Mensûr
(Xondekaranê Kurd, r.14)

Ji Xerpûtê seraser ta bi Tebrîz
Bike leşker, werîn ser **lawê Cengîz**
(Şahanê Deynûr, r.17)

Erê textê te kefte destê **Qehtan**
Belê bextê me kefte şûrê **Tirkan**
(Şahanê Erdelan, r.30)

Xerabûne ji ber xeşma **Mexolan**
Hemî jar û belengaz in li çolan
(Beganê Hîzan, r.59)

Li pê wan bûne para **Tirk** û **Çerkes**
Temaşake l'Kilîsê maye bêkes
(Beganê Kilîs, r.63)

Li her alî me **Tirk** û **Firs** û **Tazî**
Ji bona me hawar nayê ne gazî
(Beganê Bedlîs, r.98)

Li her alî dikin feryad û gazî
Ji destê **Eyran** û **Tirk** û **Rom** û **Tazî**
(Beganê Suhran, r.79)

Binêre ev **Fireng** û **Ingilîz** in
Li serpişta me Kurda tev dilîzin
(Beganê Suhran, r.80)

Were Sibhan binêre ev Çebeqçûr
Kirin kavil ji destê **lawê Teymûr**
(Beganê Siweydî, r.74)

Li her alî **Tirk** û **Firs** û **Tazî**
Ji bona me hawar nayê ne gazî
(Beganê Bedlîs r.98)

Nizanin ev çi bajar û kelat in
Dibên **gawir** berê jê rahilatin
(Şahanê Erdelan, r.28)

Ewed Beg rabe ser xwe ey begê baş
Bi carek bûne begler ev **Qizilbaş**
(Beganê Mehmûdî, r.86)

**Tablo 3.3.8.2.** Netewe û Dewletên bi Kurdan re Peywendîdar in:

| Şerefname | Şerefnameya Menzûm |
|---|---|
| **Netew:** Tirk/Rûm, Ereb, Ecem (Faris), Freng,Moxol(Teter),Ozbek, Asûrî, Tacik, Çerkez (Memlûkî), Tirkmen, Ermenî<br>**Dewlet:**Selçuqî, Sefewî, Dewleta Tîmûr, DewletaOsmanî,DewletaCengîz Xan, DewletênHikumdarên ji nesla CengîzXan(Îlhanî û wd.), Harzemşah, Aqqoyunî/ Qereqoyunî<br>**Ji Aliyê Dînî ve:** Xirîstiyan/Xaçperest, Kafir, Qizilbaş | **Netew:** Tirk/Rom Ecem (Firs), Ereb, Turkuman, Tûran, Tacik, Tazî, Tatar, Mexol, Çerkes, Frenc (Freng), Îngilîz,<br>**Dewlet**: Lawê (Kurê) Qehtan, Lawê Toran, Lawê Cengîz, Lawê Teymûr, Eyran (Îran)<br>**Ji Aliyê Dînî ve:** Gawir, Qizilbaş, |

# ENCAM

Di vê xebatê de, *Şerefname*ya Şerefxanê Bedlîsî û *Şerefnameya Menzûm* a Cegerxwîn ji aliyên serdema tê de hatine nivîsîn, rewşa siyasî û civakî ya gel û bandora wan diyardeyan a li ser nivîsîna van berheman me da berhev û ji aliyê naverokî ve analîz kir.

Ji ber kudi sedsala XVI. de zimanê Erebî û Farisî wek zimanê nivîsê di rewacê de bûye zimanê *Şerefname*yê bi Farisî ye. Lê zimanê *Şerefname*ya *Menzûm* bi Kurdiya Kurmancî ye. Jixwe helbestên Cegerxwîn ên hatine nivîsîn wekî ku tê zanîn bi gelemperî bi zimanê Kurdî, diyalekta Kurmancî hatine nivîsîn. Ji bilî vê çend helbestên wî yên bi diyalekta Soranî jî hene. Cegerxwîn ji ber ku perwerdehiya medreseyê dîtiye dikaribû bi zimanê Erebî yan Farisî jî binivîsanda. Lê di sedsala XX. de rewşenbîrên Kurd ji dêvla zimanên biyanî zimanê dayikê ji bo nivîsên xwe guncav dîtine.

Şerefxan di dawiya *Şerefname*yê de behsa jiyana xwe kiriye ku di derheqê jiyana wî de malûmatên herî baş tên zanîn ev in. Cegerxwîn jî jiyan û bîranînên xwedi berhema xwe ya *Jînenîgariya Min* de nivîsandine. Ji xeynî vê yekê, çawa Şerefxan di dawiya *Şerefname*yê de jînenîgariya xwe daye, Cegerxwîn jî di dawiya dîwana xwe ya yekem *Agir û Pirûsk* de di helbesta bi navê “Bi Kurtî Jîna Min” de behsa jînenîgariya xwe kiriye. Digel vê çawa Şerefxan di dawiya *Şerefname*yê de ji kurê xwe re hin nesîhetan daye, Cegerxwîn jî di helbesta “Ji Keyo re”de ji bo kurê xwe nesîhetan rêz kiriye. Şerefxan di *Şerefname*yê de nexşeya Kurdistanê diyar kiriye. Cegerxwîn jî di helbesta xwe ya “Kurdewarî”de nexşeya Kurdistanê daye berçav. Şerefxan di *Şerefname*yê de armanca nivîsandina *Şerefname*yê daye. Cegerxwîn jî bi heman nêrînê di helbesta “Sebebê Ristê Min”de armanca nivîsîna helbestên xwe destnîşan kiriye.

Hem Şerefxan hem jî Cegerxwîn rastî gelek zehmetiyan bûne. Bavê Şerefxan di sedsala XVI. de koçî Îranê kiriye ku Şerefxan li welatê Sefewiyan hatiye dine. Cegerxwîn jî di sedsala XX. de war û welatê xwe guherandîye û berhemên xwe bi hezkirina xelkê xwe nivîsîne. Şerefxan tenê ev berhema xwe ya dîrokî nivisiye ku di Serdema Navîn de ev kitêb bûye kitêba destan a lêkolîneran. Şerefxan, Şerên Îran-

Osmaniyan ên di sedsala XVI. de şeş caran geş bûne tevî tesîrên wê yên siyasî, civakî, aborî daye. Lê xwe ji hin rexneyan dûr xistiye ku di berhema wî de meyla wî ya li ser Osmanî tê dîtin. Sedsala XX. a Cegerxwîn tê de jiyaye jî bûye qada gelek bûyerên girîng. Cegerxwîn; ji Şerê Cihanê yê Yekem, Şoreşa Oktobirê, avabûna netewedewleta Tirkî, Serhildana Şêx Seîd, Serhildana Agirî, Serhildana Dersimê, dagirkirina Frensayê ya Sûriyê, perçebûna welatê Kurdan, Şerê Cîhanê yê Duyem, avabûn û rûxandina Komara Mehabadê, Şoreşa 1958an a li Iraqê re şahid bûye. Van bûyeran tesîr li helbesta wî kirine. Bi taybetî Şoreşa Oktobirê li ser Cegerxwîn tesîr kiriye ku hin meyla wî ya sosyalîzmê ber rexnekirina zilma Stalîn a li ser Kurdên Sovyetê girtiye.

Şerefxan armanca nivîsandina *Şerefname*yê wek zîndîhiştina dîroka Kurdan daye. Di vê berhemê de tenê bûyerên siyasî cih negirtine. Di heman demê de rewşa cografyaya Kurdan, sînorên wan, ziman, kok û kevneşopiya wan jî cih girtiye.

Berhem ji teoriyên neteweperweriyê ve dikeve nav teoriya prîmordîalîzmê. Li gorî prîmordîalîstan netewe hebûneke dîrokî ye. Di demên ku nayê bîra mirov de ava bûye. Di *Şerefnameya Menzûm* de Cegerxwîn ji sedsala XX. bangî mîr û fermandarên Kurdan ên kevn kiriye kuwerin axa xwe ji destê dijmin xelas bikin. Bal kişandiye ser wêranbûn û perçebûna welatê Kurdan. Ev berhem ji ber ku di sedsala XX. de hatiye nivîsîn pirsgirêka bêdewletî bûye temaya sereke. Berhem dikeve nav teoriya etno-sembolîzmê. Cegerxwîn di helbesta xwe de hem cih daye dîrok û mîtên Kurdan hem jî daxwaza Dewleta Kurdan a serbixwe aniye zimên. Li gor etno-sembolîstan neteweyên modern di bin siya çanda etnîk a berê teşe girtine. Li gor vê mît, sembol û kevneşopiyên berê naveroka neteweperweriyên niha diyar kirine.

Serdema Şerefxan tê de jiyaye ji ber ku Kurd di navbera Osmanî û Sefewiyan de wek di herêmekî tamponde bûne, Osmanî û Sefewî ji bo berjewendiyên xwe bi Kurdan re peywendî danîne. Hêza mîrektiyên Kurd di sedsalên XV-XVI. de zêde bûye ku *Şerefname* jî di wê demê de hatiye nivîsîn. Şerefxan xwestiye bi vî awayî diyar bike ku rêveberiyên Kurdan jî hene û Kurd dikarin xwe bi rê ve bibin. Serdema Cegerxwîn têde jiyaye jî Kurd dûçarî polîtîkayên dewletên serdest mane. Di helbestên Cegerxwîn de sekulerîzma siyasî û çandî, neteweperweriya Kurd, nêrînên modernîst xuya dikin. Cegerxwîn, di helbestvaniya xwe de di bin bandora rewşa siyasî û civakî ya Kurdan de maye.

*Şerefname* ji cureyên nivîsevaniya dîrokî bi nivîsevaniya hînker (pragmatîk) hatiye nivîsîn. *Şerefnameya Menzûm* jî ji cureyên nezmê, bi cureya epîk hatiye nivîsîn. Lê ji xeynî vê ji ber ku di temamê *Şerefnameya Menzûm* de rexneya bêdengiya Kurdan a li hemberî zilm û zora dijmin û wêranbûna welatê Kurdan heye, ev dîwan di heman demê de satirîk e. Cegerxwîn bi awayekî sergirtî bi gazîkirina mîr û begên berê, beg û axayên roja xwe rexne kiriye. Ev dîwana Cegerxwîn, ji bo ji xewa bindestiyê Kurdan şiyar bike, hêmanên dîdaktîk jî di xwe de dihewîne. Herdu berheman jî serok û hakimên Kurdan bi awayekî qehremanî û cengawerî anîne zimên. Di herdu berheman de jî bapîrên Kurdan ên bizdonek tune ne. Serok û fermandarên Kurdan egîd û mêrxas in. Lê Şerefxan dema behsa mîrên Kurd kiriye wesfên wan ên neyinî jî li ber çavan raxistiye. Wî cî bi cî ji ber polîtîkayên wan ên şaş  rexne kiriye. Cegerxwîn jî ji şerê mîrên Kurd ên ji bo îqtidarê aciziya xwe aniye zimên. Di vî warî de, hem Şerefxan, hem jî Cegerxwîn bêtifaqiya Kurdan rexne kirine. Ji bo herduyan jî pirsgirêka herî mezin ev e ku fikra yekbûnê bi Kurdan re tune ye. Kesek ji kesekî din re serê xwe natewîne, Kurd pişta hevudu nagirin û nabin yek.

Ji aliyê ziman ve herdu behrem jî bi zimanekî sade û bi uslûbek tijî hatine nivîsandin. Di *Şerefname*yê de ji dêvla zimanekî hişk ê siyasî zimanekî edebî hatiye bikaranîn. *Şerefname* ji ber kitêba dîrokê ye bûyer bi hevokên dirêj û tesewwirên berfireh hatine dayin. Lê *Şerefnameya Menzûm* bi teşeya mesnewî hatiye nivîsîn, lewma tê de îfadeyên wecîz, zimanekî bi coş cih girtine. Di *Şerefname*yê de ji aliyê edebî ve pêşniyarên pragmatîk û karakterên dînî (ayet, hedîs) hene. Lê di *Şerefnameya Menzûm* de hêmanên pragmatîk hebin jî karakterên dînî tune ne. *Şerefname* ji aliyê gotinên pêşiyan û biwêjan ve gelek dewlemend e. Di *Şerefnameya Menzûm* de gotinên pêşiyan û biwêj zêde nehatine bikaranîn. Di herdu berheman de jî ji hunerên edebî teşbîh, teşxîs, kînaye, mecaz û hwd. tên dîtin. Di herdu berheman de jî zimanekî hêmayî û sembolîk hatiye bikaranîn.

Şerefxan di destpêka berhemê de behsa Rustemê Zal, Behramê Çopîn, Gurgîn Mîlad û Ferhadê evîndarê Şêrîn kiriye û li ser Kurdîtiya wan sekiniye. Cegerxwîn jî di menzûmeya xwe ya ewil a bi navê “Xondekaranê Kurd” de bi navê Rustemê Zal dest pê kiriye û di heman menzûmeyê de Guhderz, Reham, Behramê Çopîn, Gorgîn Mîlad, Bêjen û Ferhad bi bîr aniye. Hem Şerefxan hem jî Cegerxwîn, di vî warî de

koka Kurdan gîhandine van lehengên dîrokî. Di *Şerefname*yê de hin eşîretên Kurdan bi eslê xwe gihîştine Ereban jî. Lê Cegerxwîn tenê berê xwe daye fikra Aryaniya Kurdan. Mîta damezrandina nerîtên neteweyî ya bûyera Dehaq û Kawa di destpêka *Şerefname*yê de cih girtiye. Cegerxwîn jî di *Şerefnameya Menzûm* de di du cihan de Kawa tevî "direfş"a wî ya ji nîşaneyên hikumdariyê yad kiriye. Cegerxwîn bi vê yekê dîroka têkoşîna Kurdan daye berçavên xwendekaran û hêza fikra nasnameya neteweyî xurt kiriye. Cegerxwîn gelek hikumdarên Îranê yên serdemên kevn (Behmen, Cemşîd, Şapûr, Perwîz, Xorşîd û hwd.) jî bi bîr anîne. Navên wan lehengên dîrokî/efsaneyî di *Şehname*ya Fîrdewsî de cih girtine û li rojhilat belav bûne. Ev jî nîşan dide ku hem Şerefxan hem jî Cegerxwîn di bin bandora *Şehname*ya Fîrdewsî de mane. Hem Şerefxan hem jî Cegerxwîn di navbera van lehengan û mîrên Kurd de ji aliyê mêr û mêrxasî û hikumdariyê ve peywendî danine. Ew ji mîrên Kurdan re wek mînak rê dane. Ji aliyê din ve Cegerxwîn, bangî mîrên Kurd kiriye û ew ji bo neteweya Kurd wek xelasker rê dane.

Herwiha Cegerxwîn di navbera navê mîran û şexsiyetên dîrokî de bi hunera teşbîhê peywendî daniye. Wek mînak; di navê Emîr Îsayê mîrê Egilê de xuya ye ku Emîr Îsa bi şibandina Nebî Îsa wek xelasker hatiye dîtin. Ew, Rustemê mîrê Pertekê ji aliyê cengaweriyê ve şibandiye Rustemê Zal, yan jî wek di mînaka"Tu Seyfeddîn î şûrê tûj û tazî"de tê dîtin begên navê wan Seyfeddîn ji ber wateya navê wan a "şûrê dîn" şibandiye şûr. Ji xeynî vê Şerefxan mîrê Kurdan tevî navê bavê wan bi bîr aniye. Cegerxwîn jî di hin malikan de mîr tevî navê bavê wan dane. Wek mînak; Şah Mihemmedê lawê Îsa, Zînil Begê lawê Suleyman û hwd.

Digel vê Cegerxwîn mîrên Kurd, ji unwanên *Şerefname*yê yên wek "şêx, pîr, paşa, hacî û hwd". bi heman awayî di *Şerefnameya Menzûm* de jî daye. Wek mînak Esededdînê mîrê Hekkarî ji ber di şer de destê wî jê bûye û ji aliyê siltanên wê demê ve destekî zêr jê re hatiye çêkirin bi leqeba çengzêr bi bîr aniye. Di *Şerefname*yê de di agahiyên li ser Melik Efdalê kurê Selaheddînê Eyyûbî de tê dîtin ku Melik Efdal li hemberî bira û apê xwe yên desthilatdariyê ji destê wî derxistine ji bo ji Xelîfe Nasir Dînullah alîkarî bixwaze çend malik jê re şandine. Di wan malikan de rewşa xwe ya îqtidarê şibandiye ya Hz. Elî. Cegerxwîn jî malika di derheqê wî de bi leqeba Elî Heyder a Hz. Elî daye destpêkirin. Bi heman awayî Melik Xelîlê mîrê Hesenkêfê tevî nasnavê xwe Melik Kamil hatiye bi bîr anîn.

Cegerxwîn ji dema niha bangî dema borî kiriye. Di menzûmeyên wî de tê dîtin ku ew ji bûyerên serdema mîrektiyan zêdetir bi bûyerên dema niha ve têkildar in. Bi vî awayî di navbera serdema mîrektiyan û serdema xwe de pirek çêkiriye û dîroka têkoşîna neteweya Kurdan diyar kiriye. Dijmin carinan dijminên serdema mîrektiyan in, carinan jî dijminên dema niha ne. Lê bi gelemperî pirsgirêk ne yên serdema mîrektiyan in. Pirsgirêk ên dema niha ne. Cegerxwîn di hin malikan de mîrên Kurd sûcdar kirine kuli war û welatê xwe xwedî derneketine. Hin begên di *Şerefname*yê de tenê navên wan derbas bûne yan jî bi hin wesfên nebaş hatine dayin di *Şerefnameya Menzûm* de bi wesfên baş, bi mêr û mêrxasî hatine destnîşankirin.

Cegerxwîn di rêzkirina serdemên mîran de bi gelemperî kronolojiya *Şerefname*yê şopandiye. Lê carinan di rêzkirina navê mîran de ji kronolojiyê dûr ketiye. Di vî warî de menzûmeya herî balkêş manzûmeya "Şahanê Lora Biçûk" e. Di vê menzûmeyê de ji aliyê kronolojiyê ve tevlîheviyek tê dîtin. Diwazdeh mîrên vê binemalê di dawiya menzûmeya "Şahanê Erdelan"de hatiye dayin. Mihtemelen di rêzkirina Cegerxwîn de pirsgirêk tune ye, piştre di tertîpkirina destxetê de xeletî derketiye holê.

Şerefxan mîrektiya Cezîrê kiriye sê beş. Beşa yekem mîrên Cezîrê yên bi navê Ezîzan tên naskirin, beşa duyem di derheqê mîrên Gurgilê de ye, beşa sêyem jî li ser mîrên Finikê ye. Cegerxwîn li gor vê dabeşkirinê neçûye. Piştî menzûmeya bi navê "Beganê Botan" menzûmeya "Beganê Gurgîl" nivîsiye; lê li ser mîrên Finikê nesekiniye.

Mîrên Mirdasî di navbera xwe de wek mîrên Egil, mîrên Palo û mîrên Çermûkê bûne sê şax. Di *Şerefname*yê de di serî de behsa nesla vê binemalê hatiye kirin. Emîr Bulduk û mîrên li pey wî hatine di nav mîrên Egilê de cih girtine. Lê Cegerxwîn mîrên ji şaxê Egilê; Emîr Bulduk, Emîr Îbrahîm, Emîr Mihemmed û Emîr Îsa di nav mîrên destpêkê yên Misdasî de dane.

Cegerxwîn di hin cihan de çend şax kirine yek û li ser wan menzûmeyek nivîsandiye. Mîrên Silêmaniyê Di *Şerefname*yê de bûne du şax. Şaxa yekem mîrên Qulp û Batmanê ne. Şaxa duyem a Meyafariqînê ye. Cegerxwîn ev şax kirine yek û bi sernavê "Beganê Silêmanî û Qulp û Batman" nivîsandiye. Herçiqas di sernavê de cih nedabe mîrên Meyafarqînê jî di naveroka menzûmeyê de mîrên Meyafariqînê jî cih girtine. Di *Şerefname*yê de mîrên Biradostî jî bûne du şax. Ev şax, şaxa Somayê û

şaxa Tergewer û Kela Dawudê ne. Cegerxwîn van şaxan bi menzûmeya “Beganê Biradost” kiriye yek.

Di *Şerefname*yê de qismê duduya ê sefheya sisiyan ji diwazdeh beşan pêk hatiye. Begên Kelhurê di vir de wek beşa dehan cih girtiye. Piştî beşa şeşan a di derheqê begên Dinbiliyan de Şerefxan derbasî agahiyên di derheqê begên Kelhurê bûye. Di vê navberê de beşa heftan a li ser Begên Zerzayê, beşa heştan a li ser Begên Istunê, beşa nehan a li ser Begên Dasnî tenê bi sernav nivîsiye û derbas bûye. Cegerxwîn jî behsa van mîrektiyan nekiriye. Di heman sefheyê de Begên Gulbaxî di beşa diwazdehan de cih girtiye. Cegerxwîn cih nedaye vê mîrektiyê ku vê beşê di hin nusxeyên *Şerefname*yê de jî cih negirtiye. Di *Şerefname*yê de qismê sisiyan ê sefheya sisiyan li ser begên Îranê ye. Ev qisim di nav xwe de bûye çar şax. Ev şax li ser begên Siyamensûr, Çegnî, Zengînê û Pazûkî de ne. Cegerxwîn ji van çar şaxan tenê li ser begên Pazûkî menzûme nivîsandiye. Beşên Siyamensûr, Çegnî û Zengînê di hin nusxeyên *Şerefname*yê de jî cih negirtine.

Begên Kelhurê di *Şerefname*yê de wek sê şaxan cih girtine. Piştî agahiyên li ser nesla Begên Pilingan, Begên Dertengê û Begên Mahîdeştê derbas bûye. Cegerxwîn di menzûmeya xwe de ev şax wek Beganê Kelher û Pilingan, Beganê Kelher û Derteng, Beganê Mahîdeşt bi nav kirine.

Di navbera navên Hesen û Huseyîn (Hisên) de jî di *Şerefnameya Menzûm* de şaşiyek tê dîtin. Cegerxwîn ev her du nav di gelek risteyan de ji dêvla hev bi kar anîne. Navê di *Şerefname*yê de Hesen, di *Şerefnameya Menzûm* de wek Hisên; navê Hisên jî wek Hesen daye. Lê îhtimal heye ku ji ber di gelek cihan de bi vî awayî hatiye bikaranîn ev yek ne tesadufî be.

Di *Şerefname*yê de wek rêvebir a jin navê Dewlet Xatûna Şahbanûya Lora Biçûk derbas bûye. Navên hin jinên din ên bi karê desthilatdariyê mijûl bûne jî hene. Lê ji ber wek rêvebir tenê Dewlet Xatûn hatiye ser desthilatdariyê Cegerxwîn xwe bi vê yekê serbilind û kêfxweş kiriye.

Cegerxwîn ji ber neteweperwerê Kurd e, di bikaranîna gelek peyvan de girîngî daye destnîşankirina Kurdîtiyê. Di *Şerefname*yê de bikaranîna peyva Mecengird/Mecengerd, Cegerxwîn bi şêwaza Mecenkurd, Mîrektiya Gurdikan wek Kurdikan, Eleşgîrd wek Eleşkurd û hwd. destnîşan kiriye.

Wek ku di termînolojiya peyvan de hatiye dîtin, hem di *Şerefname*yê de hem jî di *Şerefnameya Menzûm* de gelek peyv ji wateya xwe ya rasteqîn dûr ketine û wek metafor hatine bikaranîn. Ji van metaforan herî zêde ji navê heywanan sûd hatiye wergirtin. Di termînolojiya *Şerefnameya Menzûm* de hêmanên derbas bûne, bi gelemperî bi wateya hêmanên siyasî ne. Di *Şerefname*yê de ji xeynî hêmanên siyasî gelek termên bi jiyana civakê re eleqedar jî derbas bûne.

Di vê xebatê de bi berawirdkirina *Şerefname* û *Şerefnameya Menzûm* cudahî û wekheviyên di navbera van berheman de hat tespîtkirin. Herdu behrem jî, bi taybetî hêja ne ku ji aliyê edebî ve bibin mijarên lêkolînên nû.

# ÇAVKANÎ


ADAK, Abdurrahman, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, Nûbihar, Stenbol, 2014.

ALAKOM, Rohat, "Di Medya tirkî de karîkaturîzekirina Serhildana (1930î)" **Çira**, (j.14), Havîn 1998, rr.78-92.

ALAN, Ramazan, **Zanista Edebiyata Modern**, Peywend, Stenbol, 2015.

ALAN, Ramazan, "Em di Eyna Dîrokê de" **Bendname,** Avesta, Stembol, 2009, rr.217-250.

ALSANCAKLI, Sacha, "Matrimonial Alliances and the Transmission of Dynastic Power in Kurdistan: The Case of the Diyâdînis of Bidlîs in the Fifteenth to Seventeenth Centuries", **EURASIAN Studies**, vol.15, 2017, rr.222-249.

ALSANCAKLI, Sacha, "Historiography and language in 17th-century Ottoman Kurdistan: A study of two Turkish translations of the Sharafnama" **Kurdish Studies**, vol.6, (j.2), 2018, rr.171- 196.

ALSANCAKLI, Sacha, "From Bidlîs to Ardabîl Via Aleppo and Işfahân" **EURASIAN Studies**, (j.13), 2015, rr.133-152.

ALSANCAKLI, Sacha, "Tiştên Kevn Niha Nû ne: Lêkolînek li ser Şerefnameya Şeref Xanê Bidlîsî (1005-7/1596-99)" (wer.) Fexriye Adsay, **Zarema**, j.11, 2017, rr.108-126.

ANDERSON, Benedic, **Hayali Cemaatler** "**Milliyetçiliğin Kökenleri ve Yayılması**", (wer.) İskender Savaşır, Metis, İstanbul, 1995.

ASLAN, Azad, "Folklor û Netewetiya Kurd a Ewil /Guherînên Girîng ji Osmanîtiyê ber bi Netewetiya Kurd ve" **Edebiyata Kurdî ya Gelêrî (Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî)-I**, (ed.) Ramamzan Pertev, Avesta, Stenbol, 2015, rr.111-138.

AŞKIN, Muhittin, "Kimlik ve Giydirilmiş Kimlikler", **Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü**, b.10, (j.2), 2007, rr.213-220.

BAJALAN, Djene Rhys, **Jön Kürtler, Birinci Dünya Savaşı'ndan Önce Kürt Hareketi (1898-1914)**, (wer.) Burcu Yalçınkaya, Avesta, Stenbol, 2010.

BAJALAN, Dijene, "Erken Modern Dönem Etno-Politikası: Şerefhan'ın Şerefname'si ve Kürt Beyleri", (wer.) Alp Kanzık, **Toplum ve Kuram**, (j.1), Mayıs 2009, rr.239-249.

BARNAS, Rojen, “Uyanış ve Aydınlanma Şairi Cegerxwin”, **İnatçı Bir Bahar**, amd. Vecdi Erbay, Ayrıntı, İstanbul, 2012, rr.508-525.

BEDLÎSÎ, Şerefxan, **Şerefname**, (wer.) Ziya Avcı, Azad, Stenbol, 2014.

BİTLİSİ, Şerefhan, **Şerefname Kürt Tarihi**, (wer.) İbrahim Sunkur, Sîtav, Van, 2016.

BİTLİSİ, Şerefhan, **Şerefname Osmanlı-İran Tarihi**, b.2, (wer.) Osman Osmanoğlu, Nûbihar, İstanbul, 2018.

BILBIL, Mîkaîl, **Helbesta Cegerxwîn û Îqtidar**, Lîs, Diyarbakir, 2016.

BOZARSLAN, Hamit “Türkiyede Kürt Milliyetçiliği: Zimni Sözleşmeden İsyana (1919- 1925)”, **Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri**, (wer.) Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç, Avesta, Stenbol, 2005, rr.199-229.

BRUINESSEN, Martin van, **Ağa, Şeyh, Devlet**, (wer.) Banu Yalkut, İletişim, İstanbul, 2015.

BURSALI, Mehmet Tahir(195-1916), **Osmanlı Müellifleri**, amd. İsmail Özen, Meral, İstanbul, 1975.

CEGERXWÎN, **Agir û Pirûsk**, Avesta, Stenbol, 2014.

CEGERXWÎN, **Sewra Azadî**, Avesta, Stenbol, 2014.

CEGERXWÎN, **Zend-Avista**, Avesta, Stembol,2014.

CEGERXWÎN, **Şefaq**, Avesta, Stembol, 2014.

CEGERXWÎN, **Hêvî**, Avesta, Stembol, 2014.

CEGERXWÎN, **Ronak,** Avesta, Stembol, 2014.

CEGERXWÎN, **Aşitî**, Avesta, Stembol, 2014.

CEGERXWÎN, **Şerefnameya Menzûm**, Avesta, Stenbol, 2014.

CEGERXWÎN, **Jînenîgariya Min**, Apec, Stockholm, 1995.

DEHQAN, Mistefa - Genç, V. ,“Şerefxan Bo Çi Hat Kuştin?” (wer.) Fexriye Adsay, **Zarema**,( j.7), Diyarbekir, 2017, rr.31-43.

DEHQAN, Mustafa, “Literary Citations in The Sharaf-name”, **Nûbihar Akademî**, (j.2), sal 1, 2014, rr.11-32.

DEHQAN,M.- Genç V., ”Reflections On Sharaf Khan’s Autobiography”, **Manuscripta Orientalia**, Vol.21, (j.1) June 2015, rr.46-61.

EDMONDS, C. J., **Kürtler, Türkler ve Araplar; Kuzey-doğu Irak'ta Siyaset, Seyahat ve İnceleme (1919-1925)**, (wer.) Serdar Şengül-Serap Ruken Şengül, Avesta, İstanbul, 2003.

EHMED, Kemal Mezher, "Şerefname" (wer.) Ziya Avci, **Nûdem,** (j.22), Havîn 1997, rr.42-51.

ERGÜN, Zülküf, "Gotara Dijkolonyal û Wêneyê Serdestiya Tirkan di Kovara Hawarê de" **Tîr û Armanc**, Peywend, Stenbol, 2014, rr.23-48.

ERGÜN, Zülküf, "Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn", **Nûbihar Akademî**, (j.1), 2014, rr.11-33.

FUCCARO, Nelida, "Manda Yönetimi Suriye'sinda Kürtler ve Kürt Milliyetçiliği: Siyaset, Kültür ve Kimlik", **Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri**, (wer.) Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç, Avesta, Stenbol, 2005, rr.231-260.

GLASSEN, E., "Bedlisi Şaraf-al-Dîn Khan", **Encylopaedia Iranica**, b.4, 1990, rr.76-77.

GÜRÜR, Zeki, "Polîtîkayên Dewleta Tirk ya Çandkujî û Zimankujiya Kurd û Dengbêjî", **Toplum ve Kuram**, (j.2), Güz 2009, rr.133-149.

HASSANPOUR, Amir, "Şeref-name: Dewlet-Avakirin, Derebegîtî û Desthilatî" (wer.) Ergîn Opengin, **Yazınca**, (j.7), 2005, rr.91-118.

HASSANPOUR, Amir, "Kürt Kimliğinin İnşası: Yirminci Yüzyıl Öncesi Tarihsel ve Edebi Kaynaklar", **Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri**, (wer.) Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç, Avesta, Stenbol, 2005, rr.135-198.

HAWAR, "Armanc, Awayî Xebat û Nivisandina Hawarê" (j.1), Nûdem, Stockholm, 1998, rr.1-3.

IBRAHİM, Ibrahim, **Rengvedana Dîroka Kurdî Di Helbestên Cegerxwîn De**, (Teza Lisansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artûklûyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê), 2016.

JWAİDEH, Wadie, **Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi**, (wer.) İsmail Çeken-Allper Duman, İletişim, İstanbul, 2014.

KARADEMİR, Nihat, **Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler**, Nûbihar, Stenbol, 2017.

KAYNAK, Yusuf, **Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî**, Do, Stenbol, 2010.

KESKİN, Abdullah, “Kürtçe Araştırmaların Seyri”, **İnatçı Bir Bahar**, (amd.) Vecdi Erbay, Ayrıntı, İstanbul, 2012, rr.388-393.

KSENOPHON, **Anabasis-Onbinlerin Dönüşü**, (wer.) Oğuz Yarlıgaş, Kabalcı, İstanbul, 2014.

KUTLAY, Naci, **Osmanlı’dan Günümüze Kürtler**, Dipnot, Ankara, 2014.

NATALİ, Denise, **Kürtler ve Devlet; Irak, Türkiye ve İran’da Ulusal Kimliğin Gelişmesi**, (wer.) İbrahim Bingöl, Avesta, İstanbul, 2009.

MALMİSANÎJ, M., “Riya ku ji antîkurdolojiyê ber bi kurdolojiyê ve diçe û Îsmaîl Beşîkçî” **Le Monde diplomatique kurdî**, (j.13), Çileya pêşîn 2010, rr.14-17.

NEBEZ, Jemal, **Kurd (Dîrok û Kultura Wan)**, (wer.) Ergîn Opengîn, Avesta, Stenbol, 2008.

OLSON, Robert, **Kürt Meselesi ve Türkiye-İran İlişkileri**, (wer.) Hikmet İlhan, Avesta, 2010.

ORDÎXANÊ Celîl, **Cegerxwîn’in Yaşamı ve Şiir Anlayışı**, (wer.) Edib Polat, Evrensel Basım, İstanbul, 2004.

ÖZGÜDENLİ, Osman, “Şeref Han” **TDV İslam Ansiklopedisi**, b.38, 2010, rr.549-551.

ÖZKIRIMLI, Umut, **Milliyetçilik Kuramları,** Doğu Batı, Ankara, 2016.

SAFRASTİAN, Arshak, **Kurd û Kurdistan**, (wer.) Ergîn Opengîn, Avesta, Stenbol, 2007.

SUVARİ, Çakır Ceyhan, “Şerefname’den Günümüze Aşîret Kimliği”, **VII. Uluslar arası Van Gölü Havzası Sempozyumu**, 04-07 Ekim 2014, rr.313-318.

ŞEMSİ, M. İ., **Şerefname ve Şerefxanê Bedlîsî**, (wer.) Hejarê Şamil, Avesta, İstanbul, 2010.

VALİ, Abbas, **Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri**, (wer.) Fahriye Adsay, Ümit Aydoğmuş, Sema Kılıç, Avesta, İstanbul, 2005.

YEKDEŞ, Ömer Faruk, **Nazım Hikmet ve Cegerxwin de Aşk Şiirinin İdeolojisi,** (Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Bilkent Üniversitesi Türk Edebiyatı Bölümü), Ankara, 2008.

YILDIRIM, Kadri -Ramamzan Pertev-Mustafa Arslan, **Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî**, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, İstanbul, 2013.

YILDIRIM, Kadri, "Şerefname'de Mînyatür Tablolar", **Tîroj**, (j.30), 15 Adar, 2008 ,rr.4-6.

YILDIRIM Nimet, **Fars Mitolojisi Sözlüğü**, Kabalcı, İstanbul, 2017.

YÜKSEL, "Metin, Qêrîn Dikim Ku Şiyar Bî: Helbest û Siyaseta Şiyarkirinê Ya Cegerxwîn" (wer.) Fexriye Adsay, **Zarema**, (j.6), Diyarbekir, 2016,rr. 20-39.

ZEKÎ BEG, Mihemed Emin, **Dîroka Kurd û Kurdistanê**, ed. Abdullah Keskin, Avesta, Stenbol, 2012.

**Çavkaniyên Dijîtal**

Alsancakli,Sacha,"El Sharafnama de Sharaf Khan Bitlisi"https://www.academia.edu (30.12.2018)

Ciwan, Murad, "Şerefname;Pencereya KurdanA Ber Li Mejûyê", https://muradciwan.com (12.02.2018)

Ciwan, Murat, "Rola Şeref Xan di Peydabûna Bîrûbaweriya Neteweyiya Kurd de" https://muradciwan.com/2017/03/29/rola-seref-xan-di-peydabuna-birubaweriya-neteweyiya-kurd-de(03.01.2019)

İz, Necip Mansı, "Şerefhan Bitlisi'nin Şerefnamesi'nde Kürtler", http://diroknass.bolkspot.com.tr (15.01.2018)

Merdux, Ebdulla,"Şerefname û Şerefxanê Bedlîsî", (wer.) Sidqî Hirorî, http: //www.bitlisname.com/ 2015/11/19/ serefname-u-serexane-bedlisi/ (12.01.2019)

Nezan, Kendal, "Bi Awayekî Giştî Dîroka Kurdan",https://www.institukurde.org (05.03.2018)

Omerî, Heyv, "Di Helbestên Cegerxwîn de Vebêj û Hêmanên De-Kolonyal",http://www.academia.edu/32264544/dı_helbestên_cegerxwîn_de_vebêj_û_hêmanên_de_kolonyal.docx (08.03.2018)

Oramar, Kakşar, "Seyda Cegerxwîn Azadîxwazê Neteweyî û Helbestvanê RewşenbîrîyaNetewîDiNavaKurdanDe",http://www.kncsite.com/kurdi/latin /cgerxwen.pdf (04.03.2018)

Yazgan, İlhami, "KürtTarihiŞerefname'ninBatıSerüveni",http://www.bitlisname.com/2015/ 11/17/kurt-tarihi-serefnamenin-batiseruveni/(23.12.2018)

**T.C.**
**Mardin Artuklu Üniversitesi**
**Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü**
**Kürt Dili ve Kültürü ABD**
**Yüksek Lisans Tezi**

# ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ’NİN *ŞEREFNAMESİ* İLE CEGERXWÎN’İN *MENZÛM ŞEREFNAMESİ’*NİNKARŞILAŞTIRILMASI

**Şükran COŞKUN**
**16711007**

**Danışman**
**Doç. Dr. Hayrullah ACAR**

**Mardin 2019**

T.C.
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü ABD
Yüksek Lisans Semineri

# ŞEREFXANÊ BEDLÎSÎ'NİN *ŞEREFNAMESİ* İLE CEGERXWÎN'İN *MENZÛM ŞEREFNAMESİ*'NİNKARŞILAŞTIRILMASI

**Şükran COŞKUN**
**16711007**

**Danışman**
**Doç. Dr. Hayrullah ACAR**

**Mardin 2019**